



**ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ**

**BÎRA CIVAKÎ DI KILAMÊN DENG BÊJ ŞAKIRO DA**

**Amadekar  
Türkan TOSUN**

**TEZA DOKTORAYÊ**

**Şêwirmendê Tezê  
Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**Bîngol-2023**



**T.C. BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI**

**DENGBÊJ ŞAKIRO'NUN KILAMLARINDA TOPLUMSAL HAFIZA**

**Hazırlayan  
Türkan TOSUN**

**DOKTORA TEZİ**

**Tez Danışmanı  
Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**Bingöl-2023**

## NAVEROK

<b>DESTPÊK</b> .....	1
Mijara Tezê .....	2
Armanca Tezê .....	2
Girîngiya Tezê.....	3
Rêbaza Tezê .....	3
Çavkaniyên Sereke yên Tezê .....	4
Sînorên Tezê.....	5
Astengî û Pirsgirêkên Tezê .....	6
Plana Tezê .....	8
<b>BEŞA YEKEM</b> .....	10
1. BÎR, BÎRANÎN Û JIBÎRKIRIN .....	10
1.1. BÎR .....	10
1.2. BÎRANÎN .....	14
1.3. JIBÎRKIRIN .....	16
1.4. CUREYÊN BÎRÊ.....	18
1.4.5. Bîra Civakî (Collective Memory) .....	21
1.5. ÇAVKANIYÊN BÎRA CIVAKÎ AVA DIKIN .....	25
1.5.1. NASNAME .....	26
1.5.2. ZIMAN.....	31
1.5.3. MEKAN .....	34
1.5.4. DÎROK .....	41
1.5.4.1. Cudahiya di Navbera Dîrok û Bîra Civakî da .....	44
1.6.5. TEVGERÊN BEDENÎ (BODILY PRACTICES).....	45
<b>BEŞA DUYEM</b> .....	51
2. DENG BÊJ, ÇANDA DENG BÊJYÊ Û DENG BÊJ ŞAKIRO .....	51
2.1. ÇAND .....	51
2.1.2. Çanda Devkî.....	52
2.1.3. Çanda Nivîskî.....	54
2.1.4. Çanda Elektronîk.....	56
2.2. DENG BÊJ Û ÇANDA DENG BÊJYÊ .....	59
2.3. DI DENG BÊJYÊ DA PERWERDE.....	66
2.4. MEKANÊN KU DENG BÊJ HUNERA XWE LÊ PÊŞKÊŞ DIKIN.....	68
2.4.1. Dîwanxane.....	68
2.4.2. Mala Dengbêjan .....	71

2.5. MIJARA BERHEMÊN DENGBÊJAN .....	73
2.6. GER Û RÊWÎTIYA DENGBÊJAN .....	74
2.7. DI DENGBÊJIYÊ DA ŞÊWAZ (USLÛB).....	76
2.8. DENGBÊJÎ Û PATRONAJ .....	78
2.9. DENGBÊJÎ Û JIN .....	83
2.10. DI DENBÊJIYÊ DA CUREYÊN BERHEMAN .....	87
2.10.1. Kilam.....	88
2.10.2. Kilamên Şînê (Zêmar).....	89
2.10.3. Kilamên Şer (Serhildan, Pevçûn û Qehremanî) .....	90
2.11. DENGBÊJÎ Û AVAKIRINA BÎRA CIVAKÎ .....	91
2.12. VEGUHASTINA ÇANDA DENGBÊJIYÊ .....	93
2.13. JIYAN Û DENGBÊJIYA DENGBÊJ ŞAKIRO (1936-1996).....	96
2.13.1. Jiyana Dengbêj Şakiro.....	96
2.13.2. Dengbêjiya Dengbêj Şakiro .....	98
<b>BEŞA SÊYEM</b> .....	102
3. HÊMAN Û BÛYERÊN DÎROKÎ YÊN BÛNE PAŞXANEYA KILAMÊN DENGBÊJ ŞAKIRO .....	102
3.1. CUREYÊN KILAMÊN ŞER Û PEVÇÛNÊ.....	102
3.1.1. Kilamên Şer û Pevçûnê yên Dijî Dewletê (Serhildan).....	103
3.1.2. Kilamên Şer û Pevçûnê yên di Navbera Eşîran da.....	104
3.1.3. Kilamên Şer û Pevçûnê yên Behsa Lehengiya Hin Kurdan Dikin.....	104
3.1.4. Kilamên Şer û Pevçûnê yên li Hemberî Nijadên Din .....	105
3.2. ÇEND BÛYERÊN SEREKE YÊN JI KILAMÊN ŞER Û PEVÇÛNAN RA BÛNE PALGEH .....	105
3.2.1. Şerên Balkanan (1912-1913) .....	106
3.2.2. Şerê Dinyayê yê Yekemîn (1914-1918).....	108
3.2.3. Serhildana Şêx Seîd (1925).....	109
3.2.4. Serhildana Agiriyê (1926-1930) .....	111
3.2.5. Komkujiya Geliyê Zîlan (1930).....	116
3.3. ÇEND HÊMANÊN SEREKE YÊN BÛNE PAŞXANEYA KILAMÊN DENGBÊJ ŞAKIRO .....	118
3.3.1. HIN ÇEK Û ALAVÊN ŞER YÊN JI HÊLA LEHENGAN VA HATINE BIKARANÎN .....	119
3.3.2. SIWAR Û ALÎKARÊN WAN: HESP .....	128
3.3.3. MALBAT Û EŞÎR .....	137
3.3.3.1. Pevçûna Eşîrên Reşkotan û Sînika: Kilama “Şerê Mala Nêsir” .....	144
3.3.3.2. Xwişkên Li Dû Cinazê Birayê Xwe Dikevin: Kilama “Elîfê-Emînê- Ûskan” .....	148

3.3.3.3. Du Birayên Şervan Tewfîq û Seyîdxan: Kilama “Ez Reben im”.....	150
3.3.3.4. Şerekî Birakujîyê ya Li Ser Kejikê: Kilama “Dêran” .....	158
3.3.4. JI BO TOLHILDANÊ CEZAYEK: SIRGÛN .....	162
<b>BEŞA ÇAREM</b> .....	171
4. RENGVEDANÊN BÎRA CIVAKÎ DI KILAMÊN DENG BÊJ ŞAKIRO DA	171
4.1. ŞOPÊN NASNAMEYÊ .....	173
4.2. ŞOPÊN ZIMAN .....	198
4.3. ŞOPÊN MEKANÊ .....	204
4.4. ŞOPÊN DÎROKÊ .....	232
4.4.1. Serhildaneke Têkçûyî: Kilama “Kekê Xiyasedîn” .....	234
4.4.2. Kilama “Asyayê” û Serpêhatiyên Ferzende Beg .....	242
4.4.3. Mêrxasên Mala Emer: Kilama “Silêmanê Ehmed” .....	257
4.4.4. Mêrekî Ji Eşîra Zîrkan: Kilama “Keremê Qolaxasî” .....	262
4.4.5. Hevalbendiya Du Biyarên Şerker: Kilama “Axao” .....	266
4.4.6. Bûyereke Ji Dema Komkujiya Geliyê Zîlan: Kilama “Keremê Elî” .....	275
4.5. ŞOPÊN TEVGERÊN BEDENÎ .....	281
4.5.1. Destên xwe li çokênxwexistin.....	284
4.5.2. Tunekirina Zayendê (Jinbûnê): Gulbîrîn-Porkurkirin.....	289
<b>ENCAM</b> .....	298
<b>ÇAVKANÎ</b> .....	304
<b>PÊVEK 1</b> .....	317
LÎSTEYA KILAMÊN KU BÛN MIJARA VÊ XEBATÊ .....	317
<b>PÊVEK 2</b> .....	319
ÇEND KILAMÊN SEREKE YÊN BÛN MIJARA VÊ XEBATÊ.....	319

## **BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ**

Doktora tezi olarak hazırladığım *Bîra Civakî di Kilamên Dengbêj Şakiro da* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

11/01/2023

Türkan TOSUN

**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ'NE**

*Türkan TOSUN* tarafından hazırlanan *Bîra Civakî di Kilamên Dengbêj Şakiro da* başlıklı bu çalışma 11/01/2023 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [oybirliği ile] başarılı bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı*'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

**TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)**

<b>Başkan:</b> Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN	İmza:.....
<b>Danışman:</b> Doç. Dr. Canser KARDAŞ	İmza:.....
<b>Üye:</b> Doç. Dr. Metin YÜKSEL	İmza:.....
<b>Üye:</b> Dr. Öğr. Üyesi Fırat TAŞ	İmza:.....
<b>Üye:</b> Dr. Öğr. Üyesi Zafer AÇAR	İmza:.....

**ONAY**

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun ..... tarih ve .....sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA  
Enstitü Müdürü

## KURTE

Xebatên li ser bîra civakî tên kirin ji ber ku behsa bûyerên girîng yê mohra xwe li ser civakê xistine dikin, nasnameyên hatine dîkekirin derdixin pêş û hewl didin ku travmayên hevpar û dîroka dij baş bîn fêmkîrin xebatên girîng in. Berhemên devkî yê civakên ku çanda wan ya nivîskî zêde xurt nîne ji hêla bîra civakî va agahiyên gelek girîng dihewînin. Ji ber ku derfeta Kurdan tunebûye ji bo nivîsandina dîrokekê hawîrekî pêk bînin û bi vî awayî bikaribin bîra xwe zindî bigrin, ew ji berhemên çanda devkî sûd werdigirin. Yek ji hêmanên girîng yê çanda devkî ya kurdî jî dengbêj ye û dengbêj jî wek kesên girîng tên nirxandin ku berhemên devkî ava dikin û digihînin nîfşan. Ji bo ku bûyerên dîrokî bi çavê gel bê zanîn, bi taybetî yê di sedsala 20emîn da qewimîne baş bîn fêmkîrin lêkolînên bîrê yê li ser van berhemên devkî pir bi qîmet in. Materyalên herî girîng ên ku tesîra nêrîna fermî li ser tuneke kilamên dengbejan yê der barê bûyerên dîrokî da ne. Li gor vê çarçoveyê şopên bîra civakî yê di kilamên Dengbêj Şakiro da hatin vekolîn. Naveroka van kilaman jê qîsmeke mezin ji bûyerên ku beriya avabûna Komara Tirkiyeyê û piştî avabûnê qewimîne pêk tên û em dikarin ji vê ra bibêjin dîroka nêzîk. Kilamên ku behsa bûyerên wek serhildan, pevçûn, şer, travma û bûyerên din yê civakî yê ku wê heyamê çêbûne dikin hatin hilbijartin û li ser wan xebat hat kirin.

Armanca xebatê ew e ku li ber roniya bûyerên dîrokî yê di kilaman da şopên bîra civakî tesbît bike. Ji bo çarçoveya bîrê baş bê fêmkîrin, behsa şert û mercên wê heyamê yê bûne sedema gotina van kilaman hat kirin. Ji bilî vê, di bin siya çavkaniyên devkî û nivîskî da behsa bûyer, şexs, mekan û komên bûne mijara kilaman hat kirin. Li gor çarçoveya rê û rêbazên bîra civakî ava dikin ev kilam hatin şîrovekirin. Wek encam hat dîtîn ku Dengbêj Şakiroyê ku yek ji wan dengbêjên hilgirê bîrê ye di kilamên xwe da behsa bûyerên dîrokî û civakî kiriye û feydeya wî gihîştîye avakirina bîreke hevpar. Hat tesbîtîkirin ku bi saya van kilamên ku berhemên çanda devkî ne hişmendiyeke dîrokî ya dij hatiye avakirin û di navbera kilaman û bîra civakî da têkiliyeke xurt heye.

**Peyvên Sereke:** Dengbêj Şakiro, Bîra Civakî, Dengbêjî, Dîroka Devkî, Kilam, Folklor



## ÖZET

Toplumsal hafıza çalışmaları toplumda iz bırakmış önemli toplumsal olayları, travmaları, ötekileştirilmiş kimlikleri ve alternatif tarihi anlamak açısından önemli çalışmalardır. Yazılı kültüre geçemeyen toplumların sözlü ürünlerinde toplumsal hafızaya dair önemli veriler bulunmaktadır. Kürtler de hafızalarını diri tutabilecek resmi bir tarih yazım imkanına sahip olamadıklarından, hafızalarını diri tutmak amacıyla sözlü kültür ürünlerinden faydalanmışlardır. Bu sözlü ürünlerin en önemli taşıyıcısı konumunda da dengbêjler yer almaktadırlar. Özellikle 20. yüzyılda yaşanan tarihi olayların halkın gözünden nasıl görüldüğünü anlamak amacıyla sözlü ürünlerin hafıza açısından incelenmesi önem arz etmektedir. Resmi bakış açısının etkisi olmadan tarihi olayları konu edinen en önemli malzemeler dengbêj kilamlarıdır. Bu kapsamda çalışmamızda Dengbêj Şakiro'nun kilamlarında toplumsal hafızanın izleri incelendi. Bu kilamların büyük çoğunluğunun içeriğini yakın tarih diyebileceğimiz Türkiye Cumhuriyeti'nin kuruluşundan önce ve sonra yaşanan gelişmelerin yer aldığı olaylar oluşturmaktadır. Bu dönemde yaşanan isyan, çatışma, savaş, travma ve diğer toplumsal olaylardan bahseden kilamlar seçilmiş ve onlar üzerinde çalışılmıştır.

Çalışmanın amacı kilamlardaki tarihi olaylar ışığında toplumsal hafızanın izlerini tespit etmektir. Hafızanın boyutunun anlaşılabilmesi için kilamların söylenmesine sebep olan o dönemin koşullarından da söz edilmiştir. Ayrıca yazılı ve sözlü kaynaklar ışığında kilamlara konu olan olaylar, kişiler, mekanlar ve toplumsal gruplardan bahsedilmiş, bu kilamlar toplumsal hafızayı oluşturan ilkeler çerçevesinde analiz edilmiştir. Sonuç olarak hafızanın taşıyıcısı dengbêjlerden biri olan Dengbêj Şakiro'nun kilamlarında önemli tarihi ve toplumsal olaylardan bahsettiği, ortak bir hafızanın oluşmasına katkı sağladığı görülmüştür. Sözlü kültürün ürünü olan bu kilamlar sayesinde alternatif bir tarih anlayışı geliştirildiği, kilamlar ile toplumsal hafıza arasında güçlü bir ilişkinin olduğu tesbit edilmiştir.

**Anahtar Kelimeler:** Dengbêj Şakiro, Toplumsal Hafıza, Dengbêjlik, Sözlü Tarih, Kilam, Folklor

## **ABSTRACT**

Studies on collective memory are important for an understanding of important social events, traumas, marginalized identities and alternative history. Oral narratives have important information regarding collective memory in the societies that do not have a written culture. As the Kurds did not keep a written record of their history, they benefited immensely from the products of oral culture in order to keep alive their collective memory. *Dengbêjs* are the primary agents of Kurdish oral performances. Especially to understand the way in which the historical events in the 20th century have been viewed by Kurds, it is important to examine their oral culture from the point of view of memory. The songs of *dengbêjs* are primary sources for the study of history far from the effects of official narrative. This thesis examines Dengbêj Şakiro's songs as reflections of Kurdish collective memory. The majority of these songs pertain to events that took place before and after the establishment of the Turkish Republic. The pieces about revolts, conflicts, wars, trauma and other social events are the focus of this dissertation.

The aim of the study is to trace collective memory in the light of historical events as reflected in specific songs performed by Dengbêj Şakiro. In order to understand the effect of memory, the conditions of the period that gave way to the composition of these songs are also investigated. Moreover, in light of written and oral sources; events, places and social groups that are the topic of songs are examined. These performances are analyzed within the framework of the principles that make up the collective memory. This dissertation argues that Dengbêj Şakiro narrates important historical and social events in his songs and contributes to the formation of a Kurdish collective memory. It is concluded that an alternative understanding of history is formed through Kurdish oral culture, and that there is a strong relationship between songs and collective memory.

**Keywords:** Dengbêj Şakiro, Collective Memory, Oral History, Kilam, Folklore

## PÊŞGOTIN

Her xebatek xwedî paşxaneyek û çîrokekê ye, lewra zanîn, tecrube û serpêhatiyên wî/wê kesî/ê xebatê derdixê holê ku ez jî dixwazim behsa paşxaneya vê xebatê bikim. Ji ber ku mijara me bîr û bîra civakî bû der barê bîrê da hin bûyerên sereke hene ku ji binê hişê (bîra) min derketin û bûn sedema amadekirina vê xebatê. Dema em biçûk bûn malbata min (bavê min, apê min û pîrika min) bandên dengbêjan guhdar dikirin ku yek ji wan jî Dengbêj Şakiro bû. Sewta dengbêjan ji mala me kêm nedibû, lê wê demê ji ber ku em pir biçûk bûn (10-12 salî) me jê fêm nedikir ka dengbêj çi dibêjin û çima mezinên me ne bi guhekî, bi deh guhan û kêfxweşî guhdariya wan dikin. Ji ber ku muzîk û enstruman tunebû û wan bi “lê lê” û “lo lo”yan peyv li dû hev dirêj dikirin em wek zarok ji dengê dengbêjan aciz dibûn, me hez nedikir ku em guhdar bikin. Lê me pelên xemginî, keser û kêfxweşiyê yê ji ber kilaman di rûyê mezinên me da xwe didan der bi eşkere didît. Wê çaxê me nizanibû ku dema em mezin bibin em ê jî dengbêjan hez bikin û xebateke doktorayê wê bi destê me li ser wan bê kirin.

Xala duyem jî di navbera salên 2008-2009an da ez salekê li Amerîkayê jiyam. Wê demê ez û birayê xwe yê mezin Servet ji bo karê wî qasî mehekê bi hev ra ji New Jerseyê diçûn Connecticutê ku bixebitin. Di rê da wî CDya Şakiro diavêt teyîba wesayîta û heta em diçûn kar dengê Dengbêj Şakiro di wesayîta da olan dida. Di rêya vegeerê da jî heta em digihîştin malê gelek caran dîsa Şakiro ji me ra kilam digot. Rêya me bi çûyîn û hatinê qasî du saetan dikişand û ez carna êdî ji dengê Şakiro aciz dibûm, min dixwest ez muzîkeke bienstrûman guhdarî bikim. Min rojekê ji birayê xwe ra got “De bes e Şakiro, ka muzîkeke din veke”.

Birayê min ji vê gotina min aciz bû û got “Qaşo tu ji kurdî hez dikî, ka tu jî wiha bikî yê din wê çi bikin?”. Bawer im ew kêlî û ew sohbeta di nav me da çêbû jî wek mixekî di mêjiyê min da hat kutan û îro bû yek ji wan sedeman ku ez li ser vê mijarê xebitîm. Ji bo paşxaneya vê mijarê herî dawîn dixwazim bînim ziman ku bi salan e dema ez pirtûkan dixwînim an jî li kargehê dixebitim bê muzîk nikarim bixebitim. Dixwazim ji bilî mêjiyê min bila rûhê min jî têr bibe ku ez tehmê ji kar û xwendina hildim. Gelek caran jî ez Dengbêj Şakiro guhdar dikim. Dema min dengbêj û bi taybetî Şakiro guhdar dikir her carê peyveke nû hîn dibûm, bi mijareke nû dihesiyam û hestên ji hev cudatir li min peyda dibun ku ev jî sedemeke din a vê xebatê ye. Dema min kilamên dengbêjan guhdarî dikirin çîrokên van kilaman bala min dikişandin, ka ev kilam li ser çi hatine gotin û armanca gotina van kilaman çi ye? Dema

meriv dengbêjan guhdar dikin çima evqas xemgîn, kelogirî an jî kêfxweş dibin? Ev mijarên ku dengbêj di kilamên xwe de behs dikin û mirov wan ji bîr nakin kingê û çawa qewimîne, kurd çima wan ji bîr nakin? Gelek pirsên bi vî rengî yên dikevin sînorên dîrok, çand û bîrê bala min dikişandin, jixwe me jî hewl da di vê xebatê da em bersiva van pirsan bidin û van mijaran zelaltir bikin.

Di amadekirina vê tezê da min kilamên ku bûne mijara vê xebatê yên bi salan e guhdar dikirin vê carê bi çavê lêkolînerê bi dehan caran guhdar kirin. Dem dihat min kilamek rojê heft heyşt caran guhdar dikir û nedixwest ez çend rojan ji bin tesîra wê derkevim. Lewra rûhê min bi kilamê va dibû yek û ez bi gotin û mijarên kilamê ditevizîm. Beriya vê xebatê wek şexsekê ez li ser wê baweriyê bûm ku li her derê cîhanê dîrok gelemperî yekalî tê nivîsîn, kesên hêzê di destê xwe da digrin li gor xwe dîrokekê ava dikin û li gor berjewendiyên xwe wê dîroka ku nivîsîne belav dikin. Ew bi hemû hêza xwe hewl didin civakê bi vê dîrokê bidin bawerkirin ku endamên civakê li gor berjewendiyên xwe bi kar bînin. Îro jî rewş neguheriyê û wê sibê jî her wisa dewam bike. Bi vê xebatê va jî bi saya çanda devkî, şahidên bûyeran û belgeyan me vê fikra xwe piştrast kir.

Her çiqas min tena serê xwe vê xebatê amade kiribe jî di vê rêya zehmet û dirêj da hin kesan bi zanîn, agahî, pêşniyaz û piştgiriyên xwe hêza min xurt kirin ku divê ez navê wan bi lêv bikim û bibêjim mala wan ava be. Ewil spasiya şewirmendê xwe Doç. Dr. Canser Kardaş dikim ku wî bi zanîn û rêberiya xwe her tim rêya min ronî kir, kingê ez tengezar bûm piştgirî da min û bû sedema motîvasyonê ku ez bikaribim vê xebatê bibim serî. Prof. Dr. Zahir Ertekin, Doç. Dr. Metin Yüksel, Dr. Fırat Taş û Dr. Zafer Açar wek mamosteyên di lijneya tezê da cih digirin bi sebir xebata min xwendin ku ez ji dil û can spasiya wan jî dikim. Ömer Güneş û İbrahim Şahin ji min ra hemû kilamên Dengbêj Şakiro yên bi mijara min ra eleqedar in wek deng şandin ku ez bikaribim li ser wan rehetir bixebitim, ji ber vê spasdarê wan im. Ömer Güneş di berhevkirina hin agahiyan da ji min ra bû alîkar, di navbera min û hin kesên din da bû pire ku ez xwe bigihînim wan, mala wî hezar carî ava be. Dengbêj Sebriyê Agirî der barê hin kilaman da agahî dan min û ji min ra bû alîkar ku ez spasiya wî jî dikim. Birayê Dengbêj Şakiro Tevfik Denizê bi xwe jî dengbêj e û kurê Dengbêj Şakiro Metin Deniz jî der barê bavê xwe da gelek agahî bi min ra parve kirin, mala wan jî ava.

Hin kesên ku bi agahî, çavkanî, belge û parvekirina fikrên xwe va xebata min hêsantir kirin hene ku ez dixwazim navê wan jî bînim ziman û bibêjim mala wan ava

be. Ez spasiya İsmail Beşikçi, Ahmet Aras, Süleyman Çevik, Rohat Alakom, Dengbêj Salihê Qûbînê, Hanifi Taşkın, Ferhat Çaki, Ali Rıza Emre, İlyas Sayım, Murad Celalî, Mehmet Yıldırımçakar, Murat Budak, İbrahim Yenigün, Dilawer Zeraq, Mehmet Tosun, Dilşêr Bêwar, Mehmet Nur Yavuzer, Ekrem Malbat, Ridvan Xelîl dikim ku ji min ra bûn alîkar.

**Türkan TOSUN**

**Ankara – 2023**

## **KURTKIRIN**

<b>bnr.</b>	:	binêre
<b>ed.</b>	:	Edîtor
<b>hwd.</b>	:	her wekî din
<b>j.</b>	:	jîmar
<b>r.</b>	:	rûpel
<b>wer.</b>	:	wergêr

*Ez vê xebatê Dengbêj Şakiro di serî da diyariyê hemû dengbêjên ku vê çanda qedim  
ji me ra hiştine û dengbêjhezên ku bûne bengiyê dengê dengbêjan dikim...*

## DESTPÊK

Bûyerên li ser rûyê dinyayê qewimîne û diqewimin bi saya bîrê tên bibîranîn, însan der barê wan da bi saya bîrê dibin xwedî fikr û nêrînekê. Lê ew gelek caran van bûyeran yên wek şerên navxweyî, şerên dijî kom û welatên din, qeyranên siyasî, qeyranên aboriyê, qeyranên dînî, sirgûn, komkujî û travmayan li gor nêrîn û hişmendiya fermî dinirxînin. Lewra desthilatdar van bûyeran di hemû qadên jiyane yên wekî çand, ziman, dîrok, edebiyat, perwerde, siyaset û hwd da li gor berjewendiyên xwe bi kar tînin. Bi polîtika û dîroka xwe ya fermî va hewl didin kom û nijadên din bitepisînin û desthilatdariya xwe rehetir bimeşînin. Ji ber vê jî çavkaniyên bîra civakî diguherînin, didin jibîrkirin an jî bi tevahî ji holê radikin. Lê kom û nijadên ku rastî van tevgeran tên jî vê yekê qebûl nakin, li ber xwe didin û hewl didin jiyana xwe ya dijî nêrîna fermî biparêzin. Bîr û bîra civakî di vê keliyê da derdikeve holê û digihêje hewara van kom û nijadan. Lewra bîra civakî jiyaneke alternatîf ya dij ava dike, wê diparêze û digihîne nifşên nû. Destûrê nade serdestan ku ew hespên xwe li ser hiş, rûh û jiyana mirovan bi rehetî bidin bezê. Ji ber vê sedemê ye ku di salên dawîn da li dinyayê xebatên der barê bîr û bîra civakî da her ku diçin zêde dibin. Kom û nijad li dû dîrok û bîra xwe ya civakî dikevin da ku hişmendiya fermî rexne bikin, li gor fikr û nêrîna xwe li ziman, çand û dîroka xwe xwedî derkevin. Çawa ku li dinyayê ev xebat zêde dibin, her wisa li Tirkiyeyê jî Kurd û komên din li gor bîra xwe ya civakî xebatan dikin û hewl didin çand û dîroka wan a li gor nêrîna fermî hatiye avakirin bi çavekî din jî bê dîtî.

Piştî Şerê Yekem ê Dinyayê sinor û nexşe guherînin û netewedewlet ava bûn ku yek ji wan jî Komara Tirkiyeyê ye. Komara ku li ser kaviyên dewleta Osmaniyan ava bû îro hema bibêje gihîştîye sed saliya xwe. Him di destpêka avabûna komarê da û him jî piştî avabûnê gelek serhildan, şer û pevçûn çêbûn ku jê hinek rasterast der barê Kurdan da ne. Ev bûyer di dîrok û bîra fermî da bi berfirehî hatine beshkirin û li gor çarçoveya hişmendiya fermî di civakê da tînin dubarekirin. Lê wek ku tê zanîn tevahiya dinyayê di gel bîr û dîroka fermî bîreke civakî û dîrokeke devkî ya dijî fermiyetê jî heye ku ew gelemperî bi rêya çanda devkî û li gor gotinên şahidan ava dibe. Di vê xebatê da jî perçeyeke bîra civakî ya Kurdan ya ku bi rêya çanda devkî (dengbêjî) li dijî bîra fermî derketiye holê hatiye analîzkirin. Kilamên Dengbêj Şakiro yên dikevin nav sînorên vê xebatê û di nav Kurdan da gelekî tînin guhdarîkirin bûn mijara me.



Armanca vê xebatê ew e ku şopên bîra civakî yên di nav risteyên kilaman da bên tesbîtkirin û der barê wan da agahî bên dayîn.

### **Mijara Tezê**

Di salên dawîn da hejmara xebatên akademîk ên li ser mijara bîr û bîra civakî li gor berê zêdetir dibin. Mijara teza me jî bîra civakî û rengvedanên wê yên di kilamên Dengbêj Şakiro da ye. Me xwest em di kilaman da mijarên dikevin nav sînorên bîra civakî tesbît bikin û nîşan bidin ka Dengbêj Şakiro bi dengê xwe ev mijara çawa gihandiye roja me. Ev mijara navberdisiplînî (interdisciplinary) ya ku dikeve nav sînorê gelek qadên cuda bi mijara dengbêjiyê û dîroka devkî ra jî gelekî eleqedar e. Ji ber vê, me hin têgehên der barê bîr û bîra civakî da pênase kirin û hewl da di dîroka Kurdan a devkî da şopên bîra civakî bidin nîşandan. Her wiha me hewl da em derxin holê ka bîra civakî wek bîreke dij û alternatîf di dîroka Kurdan a devkî da çawa bûye bîreke dijî dîroka fermî.

### **Armanca Tezê**

Xebatên bîra civakî hewl didin civak û nasnameyên ji hêla çanda serdest va hatine cudakirin, jibîrxistin, rastî eş û travmayên mezin hatine derxin holê, li ser dîroknivîsiya alternatîf ya dijî hegemonyayê bisekinin. Ev mijara navberdisiplînî wek gelek qadan dikeve nav sînorên çand û dîroka devkî jî. Ji ber ku dengbêjî jî di qada çanda devkî da beşek e me ji bo wê beşê Dengbêj Şakiro û kilamên wî hîlbijartin. Di avakirina nasnameya neteweyî û bîra civakî da wek gelek berhemên çanda devkî kilam jî xwedî roleke girîng in. Dengbêjên ku çanda dengbêjiyê dimeşînin bi rêya van kilaman bîrê diparêzin, digihînin nîşanên nû û nahêlin ziman, nasname, çand, bûyerên girseyî, dîrok û şexsiyetên navdar bîr jibîrkirin. Di vê xebatê da armanca me ya sereke ew e ku em nîşan bidin Dengbêj Şakiro di civaka Kurdan da dengbêjekî çiqas girîng e û wî bi rêya kilaman bîra civakî û dîroka devkî çawa heta roja me parastiye û vê bîra dijî fermiyetê çawa aniye zimên.

Armanca ew e ku têkiliya bîra civakî û kilamên Dengbêj Şakiro bi hev ra bîr girêdan û li ser vê mijarê analîz bîr kirin. Me xwest ku kilamên wî yên di civaka Kurdan da bîreke çandî û civakî ya hevpar ava kirine û tesîr li ser civakê kirine bîr destnîşankirin. Kilamên di bîra Kurdan da heman hest û hişmendiyê ava dikin, bi sembol û metaforên hevpar va civakê tînin bal hevdu û nahêlin bûyerên komî yên wek

şer, serhildan, pevçûn, koç, sirgûn, erdhej û hwd bên jibîrkirin, kûr û dûr bên veçirandin.

### **Girîngiya Tezê**

Der barê Dengbêj Şakiro da beriya vê xebata me hin pirtûk, maqale û tez hatine nivîsîn û lêkolînên akademîk hatine kirin. Lê cara peşîn e ku kilamên Dengbêj Şakiro ji hêla bîra civakî va bi berfirehî tîrîn velêkolîn, bûyerên girîng ên mohra xwe li ser dîroka Kurdan xistine bi rêya kilamên wî kûr û dûr tîrîn analîzkirin. Ji ber ku mijara vê xebatê jî bîra civakî ye ji vê hêlê va ev xebat dibe wek xebateke girîng bê hesibandin.

Her wisa girîngiya vê xebatê ew e ku me hewl da em nîşan bidin bîr, jibîrkirin û bîra civakî hem ji bo merivan û hem jî ji bo civakê mijarên girîng in û tîkiliya wan bi dengbêjiyê ra jî heye. Ev tez girîng e, lewra dixwaze bide zanîn ku dengbêjî ji bo ziman, çand û dîroka devkî ya kurdî çandêke qedîm û taybet e, Dengbêj Şakiro hewl daye dîroka kurdî ya devkî û bîra civakê biparêze, zindî bihêle û bigihîne nîşên nû.

### **Rêbaza Tezê**

Ji bo ku xebatek derkeve holê her lêkolînerêk dide dû berhem û daneyên curbicur ku xebata xwe bibe serî û ji xwe ra cureyeke lêkolînê hildibijêre. Me jî di vê xebatê da lêkolîna çawaniyê (*qualitative research*) û dahûrandina naverokê (*content analysis*) bi kar anî. Lêkolîna çawaniyê şûna ku li ser mijarên berfireh û gelemper bixebite, hejmar û reqaman berhev bike ji xwe ra mijareke teng û sînordarkirî hildibijêre û li ser wê dixebite, di dawiyê da jî digihêje encamêkê (Baltacı, 2019: 370). Di vê xebatê da me jî ji xwe ra lêkolîna çawaniyê hildibijart da ku em sînorên xebata xwe xêz bikin. Ji ber vê me mijareke taybet û sînordarkirî ya ji kilamên Dengbêj Şakiro û bîra civakî pêk tê hildibijart. Paşê em li gor rêbaza dahûrandina naverokê tevgeriyan û me kilamên wî yêrî ku naveroka wan me eleqedar dikin şîrove kir.

Kilamên Dengbêj Şakiro yêrî ku daneyên me yêrî sereke ne gelek caran hatin guhdarîkirin. Ji bilî vê, deşîfreya kilaman ji pirtûkên “Antolojiya Dengbêjan 2- Dengbêj Şakiro” û “Şakiro Kewê Ribat” hatin xwendin. Dema kilam di hişê me da zelal bûn me li ser wan xebata xwe pêk anî û em gihîştin encama xwe. Li gor rêbaza vê lêkolînê me ewil sînorên kilaman xêz kir û yêrî der barê şer û pevçûnan da hildibijart, paşê me yêrî ku bi mijara bîra civakî ra eleqedar in ji nav wan derxist û nirxand, piştî nirxandinê jî me encam nivîsî. Dema ev rêbaz hat bikaranîn kilam li gor şert û mercên

dema xwe û ji ber sedemên hatine gotinê bi hûrgilî hatin nirxandin. Ji bo dahûrandineke baş bê kirin bûyer, şexs û mijarên di kilaman da derbas dibin bi çavkaniyên wek pirtûk, tez, maqale, kovar, belge û çavkaniyên devkî va hatin piştrastkirin ku xebateke xurt derkeve holê.

Ji bo bidestxistina hin agahiyan û çîrokên kilaman bi hin dengbêj, lêkolîner û ferdên malbatên ku di kilaman da behsa wan tê kirin ra sohbet hatin kirin û ji wan agahî hatin berhevkirin. Lê piraniya wan ne rûbirû bûn, me ji dûr va li ser înternetê û têlêfonê ji wan agahî hildan. Lewra dema ev xebat hat amadekirin nexweşiya koronayê (Kovid-19) li dinyayê belav bûbû û ji ber vê şewbê demeke dirêj însan ji malên xwe derneketin û rûbirû hevdu nedîtin. Wê demê derfeta me jî çênebû ku em rûbirû bi însanan ra biaxivin. Ji ber van şert û mercan me li ser têlêfonê xwe gihand çavkaniyên xwe yê devkî û ji wan agahî hilda. Ji wan kesan hinek jî ji ber ku dervayî bajêr û welêt bûn me dîsa bi rêya têlêfonê xwe gihand wan û ji wan agahî hilda.

### **Çavkaniyên Sereke yê Tezê**

Beriya nivîsîna vê tezê gelek pirtûk, maqale, kovar hatin xwendin, kilam hatin guhdarîkirin û bi hin kesan ra sohbet hatin kirin ku paşê ew hemû ji me ra bûn çavkaniyên sereke. Di vê tezê da hin çavkaniyên sereke xebata me hêsantir kir û ji me ra bûn palgeh. Di beşa teoriyê ya vê xebatê da me fikr û nêrinên civaknasê fransî Maurice Halbwachs, antropolog Jan Assmann û Paul Connerton ji xwe ra kir bingeh û li ser teoriyên wan hîmê xebata xwe ava kir. Lewra mijara bîra civakî bi saya Halbwach ji qadên derûnnasî û norolojiyê derketiye bûye mijara civaknasî û qadên din. Assman û Connerton jî li ser vê mijarê fikr û ramanên xwe anîne ziman û xebatên li ser vê mijarê pêşva birine ku ew jî ji me ra bûn çavkaniyên sereke.

Pirtûk, maqale, tez, kovarên zanistî yê li ser bîrê hatine nivîsandin ji me ra bûn palgeh ku em pişta xwe bidin wan û xebata xwe bimeşînin. Me ji çend pirtûkên sereke yê der barê mijara bîr, çand û civakê da hatine nivîsandin sûd wergirt. Pirtûkên Maurice Halbwachs ên bi navê Bîra Civakî (*Kolektif Hafıza*) û Çarçoveyên Civakî yê Bîrê (*Hafıza'nın Toplumsal Çerçeveleri*), pirtûka Jan Assman a Bîra Çandî (*Kültürel Bellek*), pirtûka Paul Connerton Civak Çawa Bibîrtînin? (*Toplumlar Nasıl Anımsar?*), pirtûka Nuri Bilgin Dîrok û Bîra Civakî (*Tarih ve Kolektif Bellek*), pirtûka Mithar Sancar Hesabpîrsîna ji Rabirdûyê, Ji Çanda Jibîrîkirinê Ber Bi Çanda Bîranîne (*Geçmişle Hesaplaşma, Unutma Kültüründen Hatırlama Kültürüne*) û pirtûka M.

Emir İlhan Bîra Çandî, Ji Çanda Devkî ber bi Çanda Nivîskî Bîranîn (*Kültürel Bellek-Sözlü Kültürden Yazılı Kültüre Hatırlama*) di beşa yekem ya teoriyê da wek çavkaniyên sereke xebata me ronî kirin.

Di beşa duyem da der barê çanda devkî, dengbêj û dengbêjiyê da pirtûk, tez, maqale, nivîs û berhemên hatine amadekirin bûn çavkaniyên me yên sereke. Pirtûka Walter Jackson Ong a bi navê Çanda Devkî û Nivîskî: Teknolojîbûna Gotinê (*Sözlü ve Yazılı Kültür: Sözü'nün Teknolojileşmesi*), pirtûka Canser Kardeş a bi navê Tenbura Aşiq, Dengê Dengbêj (*Aşığın Sazı Dengbejin Sesi*), teza doktorayê ya Wendy Hamelinkê ya bi navê Mala Dengbêjan: Vegêran, Exlaq û Neteweya Kurd (*The Sung Home: Narrative, Morality And The Kurdish Nation*), teza lîsansa bilind ya Fırat Taş Çanda Dengbêjiyê û Veguhastin (*Dengbêjlik Geleneği ve Dönüşümler*), teza lîsansa bilind ya Zeki Gürür Dengbêjî Di Peywenda Patronajê De, teza Yusuf Uygur Bîra Çandî û Dengbêjî: Di Çanda Dengbêjiyê ya Li Rojhilatê Anadoluyê da Avakirina Bîrê (*Kültürel Bellek ve Dengbêjlik: Doğu Anadolu'daki 'Dengbêjlik' Geleneğinde Bellek Üretimi*), teza Serdar Öztürk ya bi navê Di Tradîsyona Dengbêjiya Kurdî De Şakiro Jiyan û Berhem, hin maqaleyên di Sempozyuma Navneteweyî ya Çanda Dengbêjiyê û Dengbêjan 19-20ê Nîsana 2019an Şîrnex (*Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyumu 19-20 Nisan 2019 Şırnak*) hatine pêşkêşkirin û çend maqaleyên di kovarên Kovara Civakîyê (*Sosyoloji Dergisi*), *Weje û Rexne* û *Dîroka Kurdistan (Kürt Tarihi)* da hatine weşandin jî wek çavkaniyên sereke alîkariya me kirin.

Di beşa sêyem da kasetên Şakiro yên bi kilamên wî hatine dagirtin, dengê wî yê li ser înternetê hatiye belavkirin bûn çavkaniyên me yên sereke. Pirtûka bi navê Antolojiya Dengbêjan 2- Dengbêj Şakiro ya ku ji hêla Ömer Güneş û İbrahim Şahin va hatiye amadekirin, pirtûka bi navê Şakiro Kewê Ribat ya bi hevkarîya Ayhan Yıldız û Hanifi Taşkın hatiye amadekirin û pirtûka Ahmet Aras a Serhildana Seyîdan û Berazan (Seyîdxan û Elîcan) ji bo vê xebatê bûn materyalên me yên sereke. Ji bilî van di şîrove û analîzên kilaman da çavkaniyên me yên devkî yên ji lêkolîner, dengbêj, mamoste û endamên malbatên ku di kilaman da behsa wan hatine kirin pêk tînin jî wek çavkaniyên vê tezê xebata me hêsantir kirin.

### **Sînorên Tezê**

Dema tez tînin nivîsîn lêkolîner mecbur in sînorên teza xwe eşkere bikin ku me jî sînorên teza xwe bi mijara bîra civakî û dengbêjiyê ra sînardar kir. Di nav vê mijarê

da jî me kilamên Dengbêj Şakiro yên bi vê ra eleqedar hilbijart. Kilamên wî yên rasterast nakevin sînorên vê mijarê dervayî xebatê man. Ji bo ku xebat bigihêje armanca xwe me mijar bi ziman, mekan, nasname, dîrok û tevgerên bedenî yên ku bîra civakî ava dikin va sînardar kir. Hewl hat dayîn ku kilamên hatine hilbijartin li gor vê çarçoveyê bîn analîzkirin ku şopên bîra civakî di wan da baştir bîn nîşandan. Bi vî awayî tezeke lokal a sînorên wê bi eşkere hatiye xêzkirin derket holê û em hêvî dikin ewê ji bo vê qadê bibe çavkaniyek.

### **Astengî û Pirsgirêkên Tezê**

Di xebatên wiha yên dikevin sînorên çend qadan (dîrok, çand, edebiyat, folklor û civaknasî) da bibê nebê hin pirsgirêk derdikevin holê ku em jî rastî van pirsgirêkan hatin. Ji ber ku çanda nivîskî ya kurdî dereng dest pê kiriye, vê derengketinê wek gelek qadên din tesîr li ser qada lêkolînerî û akademiye jî kiriye. Ne tenê ji bo vê tezê, ji bo gelek tezên din jî pirsgirêka herî mezin kêmasiya berhemên teoriyê yên bi kurdî ne. Di kurdolojiyê da êdî li ser gelek mijaran xebatên akademîk tên kirin û tezên nivîsîn. Lê dema nivîsandinê lêkolîner ji ber kêmasiya berhemên teoriyê yên bi zimanê kurdî zehmetiyê dikşînin û nikarin wek çavkanî wan nîşan bidin. Ji ber vê kêmasiyê her tim çavkaniyên biyanî yên ji zimanên din (gelemperî tirkî, îngilizî, farisî, fransî û erebî) tên bikaranîn û ji wan werger tên kirin. Lêkolîner li gor zanîn û hişmendiya xwe hin têgeh û terminolojiyan bi xwe ava dikin ku ev jî hin caran dibe sedama agahiyên şaş û aloziyê.

Pirsgirêka me ya ewil a vê tezê wek ku hat destnîşankirin ew bû ku der barê bîr û bîra civakî da têra xwe berhemên teoriyê yên kurdî tunebûn, têgeh û terminolojiyeke bi rêk û pêk ya beriya vê xebatê hatiye avakirin ku em jî piştî xwe bidin wan tunebû û vê rastiye hinekî xebata me zehmettir kir. Dema me der barê bîr û bîra civakî da beşa teoriyê nivîsî me li gor zanîn û nêrîna xwe çav da berhemên zimanên biyanî û li gor wan hin têgeh pênase kirin û hewl da der barê vê mijarê da bingehek ava bibe da ku ev tez bibe çavkanî ji bo wan kesan yên li ser bîrê bixebitin.

Xebata li ser mijara bîra civakî ewil hêsan û balkêş xuya bike jî, dema meriv dest pê dike hin arîşe derdikevin pêşberî me. Têgehên bîr, bîranîn, jibîrkirin, şahidî, rabirdû, dîrok, ziman, nasname, civak, mekan û tevgerên bedenî wek mijarên sereke dikevin nav sînorê bîrê. Ev mijar hin caran rasterast (yekser) û hin caran jî ne yekser bi hev ra têkildar in û dikevin nav sînorên qadên cuda (folklor, dîrok, çand, civaknasî,

derûnnasî, edebiyat) ku ji ber vê me jî eleqedar dikin. Ji vê aliyê va me jî hinekî zehmetî kişand ku em li gor çarçoveyeke çawa kilamên Dengbêj Şakiro şîrove û analîz bikin û sînorên wan çawa xêz bikin ku em dernekevin dervayî mijara teza xwe. Di dawiyê da me çarçoveyeke dîrokî, civakî û çandî ya ku bi folklorê ra jî eleqedar e ava kir û xebata xwe wisa tamam kir.

Tengasiyeke din ya vê tezê jî ew bû ku dema kilam hatin hilbijartin di destê me da agahiyên tekûz yê ku meriv bibêje ev kilam sedî sed kilamên Dengbêj Şakiro ne tunebûn. Lewra tê zanîn ku Dengbêj Şakiro kilamên Dengbêj Reso û dengbêjên din jî gotine. Jixwe di çanda dengbêjiyê da dengbêj kilaman ji hev digirin, li gor deng û şêwaza xwe wan kilaman dibêjin. Lê paşê ji ber ku dengbêj wê kilamê li gor dengbêjên din zêdetir dibêje, an jî civak hez dike ku kilamê ji dengê wî dengbêji guhdar bike ev kilam êdî wek ku malê wî kesî tê zanîn, lê di rastiyê da ne wisa ye. Wek ku tê dîtin me jî hem navê tezê û hem jî naveroka tezê wek kilamên Dengbêj Şakiro diyar kir, lê divê bê zanîn ku hemû kilam ne yê Şakiro ne. Ji ber ku me ev kilam ji dengê wî guhdar kirine, me ev serenav bi kar anî û xebata xwe wisa meşand.

Di dabeşkirin û şîrovekirina kilaman da jî her çiqas pirsgirêkeke mezin nebe jî me hinekî zehmetî kişand. Lewra dema kilam hatin hilbijartin û ew di bin beşên ziman, mekan, dîrok, nasname û tevgerên bedenî da hatin nirxandin hat dîtin ku ji wan kilaman hinek dikevin bin beşa van hemûyan, hinek jî dikevin bin beşa ji van hêmanan yekî. Ji ber vê di xebatê da kilamek hin caran li gor yê din zêdetir hat analîzkirin û derket pêş ku divê ev jî bê zanîn.

Kilamên hatin hilbijartin ji ber ku behsa bûyerên dîrokî (serhildan, komkujî, pevçûn, sirgûn) dikin me xwest em bi belge, şahid û materyalan va şîroveyên xwe saxlem bikin ku mijar zêdetir bîn fêmkin. Lê mixabin dîroka kurdî bi nivîskî têra xwe ne xwedî berhem û belgeyan e ku em sûtê ji wan bigirin. Dîroka fermî jî li gor nêrîna xwe bûyer nirxandine û yekalî behsa wan kiriye. Ji ber vê me fêm kir ku çavkaniyên fermî yê ku zêde bîn nîşandan wê pir xurt nebin û armanca me dernexin holê, lê dîsa jî dema hewce kir me hin belge û agahiyên fermî jî wek çavkanî nîşandan. Ji aliyê din va me hewl da em guh bidin dîroka devkî jî bila teza me xurttir bibe û yê dixwazin li ser mijarê lêkolînê bikin her duyan jî bidin ber hev û berawird bikin. Ji bo vê jî me hewl da em xwe bigihînin endamên malbatên ku di kilaman da behsa wan tê kirin, lê mixabin ev jî zehmetiyeke tezê bû ku me têra xwe şahid nedîtin. Yê

ku me xwe gihandinê jixwe bi dilxweşî alîkariya me kirin, lê me dixwest çavkaniyên devkî hê zêdetir bin ku mijar zelaltir bin.

### **Plana Tezê**

Ev xebat ji destpêkê û çar beşan pêk tê. Di destpêkê da me çarçoveya teza xwe anî zimên. Beşa yekem beşa teoriyê ye ku bi mijara bîrê ra eleqedar e. Di vê beşa ewil a bi navê “Bîr, Bîranîn û Jibîrkirin”ê da têgehên bîr, bîranîn û jibîrkirinê hatin terîfkirin, pênaseya cureyên bîrê yên wek bîra şexsî, bîra demkurt, bîra demdirêj, bîra çandî, bîra ragihandinî, bîra fermî, bîra zindî, bîra civakî û hwd hatin kirin û ji hêla teoriyê va naveroka wan hat xêzkirin. Di nav van cureyan da mijara bîra civakî mijara me ya sereke ye û ji ber ku me zêdetir eleqedar dike ew li gor cureyên din hinekî bi hûrgilî hat nirxandin. Bîra civakî wek mijar çawa û ji hêla kî va bûye teorî, çawa hatiye şîrovekirin, ji qadên cuda ra çawa bûye bingeh me ev mijar destnîşan kirin. Ji bilî vê civak çawa bîreke hevpar ava dikin, ev bîra wan a hevpar a bi nasname, ziman, dîrok, mekan, tevgerên bedenî, sembol, bîranîn û hwd va tê avakirin çawa li hemberî fermiyetê û hegemonyayê dibe bîreke alternatîf, bi çi awayî tê parastin, çawa dibe sekneke hebûnê, çawa ziman, çand, dîrok û nasnameyeke alternatîf diparêze me bi hûrgilî behsa van mijaran kir. Mijarên mekan, ziman, nasname, dîrok û tevgerên bedenî (bodily practices) yên ku çavkaniyên bîra civakî ava dikin jî di beşa ewil da hatin behskirin.

Di beşa duyem a bi navê “Dengbêj, Çanda Dengbêjiyê û Dengbêj Şakiro” da behsa çanda devkî û girîngiya wê hat kirin. Civakên çanda wan a nivîskî pêşva neçûne û ji ber vê bi çanda xwe ya devkî va li ser piyan mane jê yek jî civaka Kurdan e. Ev çand çima di civaka Kurdan da zêde pêşva çûye û çima tesîreke mezin li ser jiyane kiriye der barê vê da agahî hatin dayîn. Têgehên dengbêj û dengbêjiyê, rola dengbêjan a di nav civakê da (dîroknivîsîn, şahidiya bûyeran, di şîn û şahiyên da kontrolkirina civakê), cih û mekanên dengbêj hunera xwe lê pêşkêş dikin bûn mijara vê beşê. Çanda dengbêjiyê, çavkaniyên çanda dengbêjiyê xurt dikin û mijara patronajê jî di vê beşê da hatin behskirin. Herî dawîn me behsa jiyana û dengbêjiya Dengbêj kir. Ew li ku hatiye dinyayê, li ku jiyaye, dengbêjiya wî çawa dest pê kiriye û rola wî ya dengbêjiyê ya di civaka Kurdan da çawa ye me behs kir.

Navê beşa sêyem “Hêman û Bûyerên Dîrokî Yên Bûne Paşxaneyê Kilamên Dengbêj Şakiro” ye. Beriya ku behsa kilamên mijara vê xebatê bê kirin, çend bûyerên

dîrokî û hin hêmanên sereke yên ji van kilaman ra bûne palgeh hatin nirxandin. Me ev bûyer wek “Şerê Dinyayê yê Yekemîn”, “Şerê Selanîkê”, “Serhildana Şêx Seîd”, “Serhildana Agiriyê û “Komkujiya Geliyê Zîlanê” dabeş kir. Ji bilî van, me çend hêmanên sereke jî ji bo vê beşê dabeş kirin ku navê wan; “Hin Çek û Alavên Şer Yên Ji Hêla Lehengan va Hatine Bikaranîn”, “Siwar û Alîkarên Wan Hesp”, “Malbat û Eşîr” û “Ji Bo Tolhildanê Cezayek: Sirgûn” e. Kilamên wî yên behsa serhildan, sirgûn û cezakirin, pevçûnên di navbera eşîran da, komkujiyê dikin kakilê vê beşê ne ku ew bi hûrgilî hatin analîzkirin.

Navê beşa çarem “Rengvedanên Bîra Civakî Di Kilamên Dengbêj Şakiro Da” ye ku di vê beşê da jî mijara me ya sereke dîsa kilamên wî yên bi bîra civakî ra eleqedar in. Têkiliya wan kilaman ya bi mekan, ziman, dîrok, nasname û tevgerên bedenî ra hatin şîrovekirin. Me ev beş jî wek “Şopên Nasnameyê”, “Şopên Ziman”, “Şopên Mekanê”, “Şopên Dîrokê” û Şopên Tevgerên Bedenî” dabeş kir. Ev kilamên ji vê hêlê va dikevin qada bîra civakî ligel çavkaniyan hatin nirxandin. Hewl hat dayîn ku bê nîşandan ka ev kilam di civaka Kurdan da çawa bîreke hevpar ava dikin, têkiliya wan û bîra civakî çi ye baş bê fêmkirin.

Piştî van her çar beşan herî dawîn encama tezê ya ku em di vê xebatê da gihîştinê hat nivîsin. Di encamê da me li gor çarçoveya bîra civakî fikr û ramanên xwe anîn ziman.



## BEŞA YEKEM

### 1.BÎR, BÎRANÎN Û JIBÎRKIRIN

#### 1.1.BÎR

Mijara bîrê salên dawîn di nav xebatên civaka zanistî da ji wan mijarên herî zêde balê dikşîne yek e ku xebat li ser tê kirin. Bîr mijareke interdisiplinar (navdisîplînî) e û divê bi vê nêrînê bê nirxandin. Bi taybetî li welatên dagirkirî di xebatên li ser edebiyata postkolonyal, edebiyata rizgariya neteweyî, edebiyata nûjenbûnê, xebatên dîroka devkî, edebiyata otobiyografîyê û yên bi vî rengî da têgeha “bîr”ê xwedî cihekî taybet e. Felsefenas û derûnnas di mijara bîrê da aliyê kesayetiyê (Îlhan, 2018: 11), civaknas jî aliyê wê yê civakî derdixin pêş (Sancar, 2016: 39). Dîroknas li ser bîra şexsî hûr dibin û hewl didin bizanibin li hemberî çavkaniyên dîrokî pêbawerîya wê heye yan na. Ev qadên behsa wan hatin kirin û yên li ser bîrê dixebitin dibe bên zêdekirin, lê tiştê em dixwazin bibêjin bîr mijareke wisa ye ku ji bilî derûnnasî, felsefe û civaknasiyê dikeve qada edebiyat, folklor, dîrok, çand û siyasetê jî, yanê mijareke navdisîplînî ye û qadên din jî eleqedar dike. Di van qadan da dema xebat li ser bîrê tê kirin dîrok, ziman, nasname û çand dibin mijarên sereke, lewra têkiliyeke xurt a bîrê bi wan ra heye. Ji ber vê ev xebat her çiqas di beşeke edebiyatê ya kurdî da li ser dengbêjiyê hatibe nivîsandin jî, ewê bi nêrîneke navdisîplînî bê nirxandin.

Xebatên li ser bîrê gelemperî li ser bîra şexsan û civakan, bîranîn û jibîrkirina wan tên kirin. Ev xebat mijarên bîranîn, jibîrkirin, înkâr, travma, bêdengî, desthilatdarî, rîtuêl, sembol, rabirdû, dîrok, derûnasî û hwd di xwe da dihewînin. Xebatên li ser bîrê ji salên 1920î vir va di qada zanistên civakî da roleke girîng dilîzin, lê Frederict Bartlett û Maurice Halbwachs bi hewldanên xwe va gihandine asteke sereke ku roja me jî her ku diçe xebatên li ser bîrê girîngtir dibin (Bilgin, 2013: 39).

Peyva bîrê ya ku di lîteraturê da derbas dibe di gelek zimanan da bi peyvên wî zimanî tê bikaranîn. Ji bo wê bi yûnanî *mneme*, latînî *memória*, îngilîzî *memory*, fransî *la mémoire*, osmanî *hafıza*, tirkî *bellek*, erebî *hifz* û kurdî jî *bîr* tê emilandin. Di hemûyan da jî wateya wê veşartin û parastina tişt, şexs, mijar û bûyeran ya di hiş da ye. Parastina wan, bibîranîna wan û têkiliya wan ya bi rabirdûyê ra jî dikare wek meneyeke din bê şîrovekirin.

Bîr bi meneya xwe ya herî giştî tê meneya bîranîna tiştên mirov di hemû jiyana xwe da hîn dibin. Bi hevokeke din bîr, di hiş da bi zanetî hêza veşartinê ya tecrubeyên

jiyanê, mijarên hînbûyî û têkiliya van a bi rabirdûyê ra ye (Bakırcıoğlu, 2012: 146). Yanê mirov di jiyanê da tiştan hîn dibin, tecrube dikin, li gor wan tevdigerin ku ev tişt di hişê wan da bi cih digirin û wextê dem tê jî ew wan tiştan tînin bîra xwe yan jî dixwazin ji bîr bikin. Ji bo behsa bîrê bê kirin divê “*hînbûn*” hebe, li ser vê hînbûnê ra dem derbas bibe, ew agahî di mêjî da bîr parastin û piştî demekê ew ji nû va bîr bikaranîn. Di nav rojê da hema bibêje çavê me bi hezaran tiştan dibîne, gelek tişt li ber guhê me dikevin û dikevin destê me, lê em wan parzûn dikin û jê hinekan di bîra xwe da vedişêrin. Bi hevokerê din bîr tiştên qewimîne an jî bûyerên bi rêya neqilkirinê hatine hînbûn û têkiliya wan a bi bûyerên din ra çêbûne, di hiş da bizanetî veşartin û parastin e (Erkal, 2017: 151). Bîr ji ber ku di serî da biyolojî û derûnnasiyê eleqedar dike ewil di van qadan da hatiye pênasêkirin û li ser xebat hatiye kirin. Lê paşê qadên din jî dest avêtine mijara bîrê ku wan jî li ser xebat kiriye û ev geşbûn heta îro hatiye.

Bîr navê wê pergalê ye ku rabirdûya me qeyd dike û dema hewce dike em serî li wê didin û ji ber vê ye ku tiştên bi rêya tecrubeyê em hîn dibin di hişê me da tîr parastin (Karaaslan, 2014: 5). Heke em bala xwe bidinê peyva bîrê di kurdî de tê çend wateyan. Wateya ewil hafiza, hiş, aqil, zêhn e. Ji bilî vê tê wateya “kuyu”ya bi tirkî, “well”a inglîzî yanî çaleke kûr ya tê vekolan da ku av bê dîtin. Jixwe bîr cihekî di binê erdê da ye, kûr e, mirov nikare xwe bi rehetî xwe bigihîne wê derê, tarî ye. Yan tişt û av jê derdikevin an jî meriv tiştan diavêjin bîrê û li ser wê tê girtin. Ji bo bîra merivan jî heman gotin dibe bîr bilêvkirin, lewra di bîra merivan da jî tişt û bûyer tîr veşartin û dema hewce bike tîr bibîranîn.

Li gor bikaranînê bîr tê meneya jibîrêkirinê, bîranîn û şahidiyê jî. Jan Assmannê ku di qada bîrê da xebatên wî bûne çavkanî dibêje bîr zindî ye û her tim di nav ragihandinê da hebûna xwe diparêze. Heke ev dayîn û stendina ragihandinê raweste, sînorên wê biguherin an jî ji holê rabin, jibîrêkirin dest pê dike (2018: 45). Dîsa li gor nêrîna Assmann bîr ji nû va çêdibe, lewra rabirdû di bîrê da hema wisa nasekine. Di nav çarçoveya têkiliyên guherbar (changeable) ên dema niha da her tim ji nû va çêdibe (2018: 50).

Mirov bi saya hin tiştên wek deng, bêhn, tehm, şexs, cih û bûyeran di bîra xwe da tiştan vedişêrin, tînin bîra xwe yan jî ji bîr dikin. Dîn, malbat, dibistan, çapemenî, civak, mekan, ziman, nasname, edet û kevneşop hemû di avakirina bîrê da xwedî hêzekê ne û tesîra wan li ser bîrê çêdibe. Barbara A. Misztal jî dema behsa bîrê dike balê dikşîne li ser aliyê wê yê civakî û tîne ziman ku ew bi

pêwendiya kesên din ra çêdibe, ziman, sembol, bûyer, naverokên civakî û çandî hemû tesîrê li ser bîrê dikin û wê ava dikin (2003: 11).

Derûnnasî mijara bîrê di çarçoveya bîranîn, jibîrkin, hînbûn, dubarekirin û paşveanîna agahiyên da dinirxîne. Felsefe zêdetir li ser zeman (dem), mekan û bîranînê radiweste. Civaknasî li ser aliyê wê yê civakî yê ku ji şexsan zêdetir civakê eleqedar dike radiweste. Siyaset aliyê wê yê bi îqtidar, hêz û siyasetê va girêdayî ye dixê armanca xwe. Bîra civakî jî bîranîn, jibîrkin, nasname, mekan, civak, travma û hwd dixê nav sîronên xwe û li ser bîrê wisa lêkolînan dike. Kesên wek Aristo, Platon, Hegel, John Locke, Henry Bergson, Emile Durkheim (bîr, xwekuştin, civaknasî), Sigmund Freud (xewn, binhiş, jibîrkin, tepîsandîna fikr û hestan), Karl Marx (burjuva û hişmendîya proleteryan) yê di qada derûnnasî, civaknasî, felsefeyê da bi nav û deng in ji hêlekê va behsa bîrê kirine.

Aristo di xebata xwe ya bi navê De Memoria et Remiscentiayê (Bîr û Bîrveanîn) da destnîşan dike ku mijara bîrê rabirdû ye (Ricoeur, 2017: 34). Freud jî hêla derûnnasiyê va li ser bîrê sekiniye û hewl daye nîşan bide ku rabirdû ne ew tişt e ku derbas bûye û çûye, ew li cihekî disekine û dema wextê tê, şert û mercê ava dibin ew tiştên di bîra însanan da li cihê ku lê veşartî ne derdikevin ser hiş. Li gor filozofê fransî Henri Bergson jî rabirdû derbas nabe û naçe, ew di nav dema niha da dewam dike û dijî. Bergson bedena însan jî di navbera rabirdû û dahatûyê da wek sînorekî hereket dike dinirxîne û dibêje rabirdû bedenê her tim ber bi dahatûyê da dehf dide (2015: 59). Kesên dane li ser şopa van zanyaran jî fikrên xwe li ser vê mijarê zêde kirine, rexne li fikrên wan kirine û teoriyên berevajî wan ava kirine.

Bîr bîranînên ku dîrok wan nabîne û pespaye dike pîroz nîşan dide. Ji ber ku çavkaniya xwe ji koma ku tîne bal hevdu hildide bi nasnameya wê komê ra jî eleqedar e, çiqas kom hebin ewqas jî bîr hene (Bilgin, 2013: 68). Bîr li hemberî dîroka fermî dibe dîroka kêmteweyan, dîroka kesên biçûk tîne dîtin û êşê dikşînin. Ji hêlekê va tolhildanek e jî, lewra agahiyên pûç, derew û alîgir qebûl nake, li hemberî van agahiyên ku hatine berevajîkirin agahiyên dij tîne rojevê ku nîşan bide her tiştên tîne gotin ne rast in. Heke hin xalên sereke ji bo bîrê bîrên rêzkerin ev xal dikarin bîrên gotin;

- Bîr şexsî ye, lê tîkiliya wê bi civakê ra heye ji ber vê ew jî hêla civakê va tê avakirin.

- Bîra şexsî ji hêla kom û civakên ku şexs tê da dijîn va ava dibe. Malbat, dibistan, komên dînî, nijadî û civakî ji van koman hinek in.
- Bîr zindî ye, li gor der û dora xwe, civaka ku têkiliya wê pê ra heye li ser piyan dimîne, heke ji wan dûr bikeve û tenê bimîne ji bîr dike.
- Bîr yek bi yek tiştan bi bîr nayne, bûyerên wek çîrokê bi hev ra têkildar in bi bîr tîne
- Tu kes nikare yek bi yek hemû bûyeran di bîra xwe da veşêre û ji bîr neke.
- Civak bi rêya ziman, dîrok, mekan, peyker, bibîranîn, rîtuelan yanê sembolên cuda, referansên hevpar ji xwe ra bîrekê û nasnameyekê ava dikin.
- Bîr li hemberî dîroka fermî dibe berxwedanek.

Rîchard Sennet ji bo bîrê dibêje ew hişmendiya zemanê derbas dibe ye û wiha pê da diçe, “Bîreke heqîqî defterên kevn yên ku tê da şopa pevçûn, têkçûyîn û felaketê hene, nayên jibîrkin û wê tu caran neyên jêbirin ji nû va vedike” (2017: 10). Wek Sennet jî tîne ziman di rabirdûyê da çiqas tiştên nayên jibîrkin hebin bi saya bîreke rastîn mimkun e bên rojevê û bigihêjin nişên nû. Michael Schudson jî di pirtûka xwe ya bi navê “Di Bîra Amerîkayê da Watergate” (*Watergate in American Memory* (1992) da dibêje gel bîrê şaş fêr dike, lê pisporên zanistên civakî bîrê baştir dizanin. Schudson tîne ziman ku bîr bi tenê di çarçoveya civakî da cih nagire, ew di qanûn, qayde, qeyd, pirtûk, peyker, cihên betlaneyê, alav û materyalên diyariyê da, bi kurtasî di gelek waran da heye (1992: 51). Pierre Nora ji bo bîrê dibêje ew ji hêla komên dijîn va tê avakirin, jiyan bi xwe ye. Ji ber vê bîr ji bibîranîn û jibîrkinê ra vekiriye, her tim pêş va diçe. Bîr xwe dispêre hestan, ji bîranînên taybet û sembolîk, yên biraz (bisêr), tevlihev û ketine nav hevdu çêdibe. Dijî hemû perde, neqilkin û sansuran e (1984: 19).

Bîr ji bo dîrokê ji nû va ber bi çavan ra derbas bike û ji nû va ava bike çavkaniyek e. Ji ber vê desthilatdar li ser bîrê lîstikan dikin, wê berevajî dikin û li gor xwe diemilînin. Rejîmên totalîter ji bo bîra welatiyan ji holê rakin, tiştên şaş fêr wan bikin û bîrê li gor berjewendiyên xwe ji nû va ava bikin mekanîzmeyên dewletê bi kar tînin. Paul Connerton tîne ziman ku hêzên serdest ji bo welatekî ji hişmendiya neteweyî ji dûr bixin, jibîrkinê bi rêk û pêk dixin rewacê û Çekoslovakayê ji bo vê mijarê mînak nîşan dide (2014: 30).

Ji bo baş bê fêmkirin bîr çawa dixebite du têgehên sereke hene ku ew bîranîn û jibîrkirin in û divê behsa wan jî bê kirin. Tesîra zeman, mekan, dubarekirin û mudaxeleyên ji derva li ser bîranîn û jibîrkirinê heye. Em berê xwe bidin van du têgehên ka tesîra wan a li ser bîrê çawa ye.

## 1.2. BÎRANÎN

Mêjiyê însanan xwediyê wê hêzê ye ku bi hezaran tiştan hîn bibe û wan veşêre. Ev tiştên di bîra însanan da tîstên parastin hin caran ji cihê ku tê veşartin derdikevin, tîstên bikaranîn ku ew wek bîranîn dibe bê pênasekirin. Bi gotineke din bîranîn (remember) dema şopa bîrê ya tiştên hînbûyî û bûyerên rabirdûyê derkevin ser hiş ev wek bîranîn tê binavkirin. (Karaaslan, 2017: 26) Yûnaniyên berê bîranîn xistine du beşan wek *mneme* û *anamnesîs*. *Mneme* bîranîna hema ji nişkê va tê hiş, yanî bîranîna pasîf e. *Anamnesîs* jî bi zanetî li dû bibîranîna tiştêkî ye, aktîf e. Yanê di ya ewil da bîranîna xwebixwe tê hiş, ya duyem da jî bîranîna li dû dikevin heye (Ricoeur, 2017: 22).

Dema em berê xwe bidin têgeha bîranînê hin xalên sereke yên wek şexs, civak, çand, ziman, wate, şîrove û dîrok tîstên pêşberî me. Bîranîn tevgerêke pîralî ye, ev hemû tesîrê li ser bîranînê dikin û tîkiliya wan bi hev ra heye. Ji ber vê ew ne tenê tevgerêke rêzê ya hişê însanan e (Îlhan, 2018: 25-26). Ji bo bîranînê dubarekirina agahiyan, bikaranîna wan û tîkilîdanîna wan a bi tiştên din ra pîr girîng e. Heke agahiyek bigihêje bîrê û ew di nav demê da neyê dubarekirin piştî wextê ew tê jibîrkirin, neyê jibîrkirin jî wek roja ewil bi awayekî xurt nayê bîra meriv. Ji ber vê divê ew bê dubarekirin ku ji tesîra jibîrkirinê rizgar bibe. Bikaraneîna agahiyan jî piştî demê dibe sedem ku ew bîst jibîrkirin. Ji bo vê jî divê agahiyên di jiyane da hatine hînbûn bîst bikaranîn ku neyên jibîrkirin. Xala din jî tîkildarkirina agahiyên nû û yên berê ye ku ev harmoniyekê derdixe holê, agahiyên di bîrê da di nav xwe da eleqeyekê datînin û meriv rehetir dikarin bi bîr bînin.

Zeman, mekan, şexs û bûyer li ser bîranînê tesîrê dikin. Dema tiştêk tê bîra me cihê û wextê wê yan jî şexsên ku bi mijarê ra eleqedar in ewil tîstên bîra me. Mînak xwarineke cara ewil me xwariye, muzîkeke cara ewil me guhdarî kiriye, bûyereke cara ewil hatiye serê me hemû bi zeman û mekanê ra, bi şexsan ra girêdayî ne û wisa tîstên bîra me. Yanê zeman û mekan ji bo bîr û bîranînê mecbur e, aliyekî wê yê ontolojîk heye. Heman tişt ji bo bîranîna civakan jî dibe bê gotin. Civak jî heke bûyeran, agahiyan bi rêya dubarekirin, bikaranîn û girêdana bi hev ra binirxînin ew tîstên bîranîn.

Erdhejek, şerekî mezin, komkujiyek, şoreşek, mirina serkirdeyên civakê û bûyerên wek van yên girseyan eleqedar dikin dema bên bîranîn mekan û zeman derdikevin pêş.

Însan gelemperî kes, bûyer û agahiyên di rabirdûyê da jê kêfxweş in tînin bîra xwe. Tiştên nebaş ên wek şer, pevçûn, êş û travmayan naxwazin bi bîr bînin. Lewra ew êş, îşkence, zehmetî û rûreşiya wê demê heke bê bibîranîn wek ji nû va qewimîne dîsa hestên nebaş di dilê însanan da peyda dikin û tesîrên nebaş li ser derûniya wan dikin. Bi taybetî jî heke serdestan li hemberî civakên hêza wan kêma neheqiyek kiribe ew van neheqiyên bi bîr naynin, heta wisa ku hewl didin ew bîr jibîrkin. Ji bo vê jî dîrokeke alîgir, derew ava dikin, bi saziyên fermî va şopa wan didin jibîrkin. Lê berevajî vê yê bîndest hewl didin van jî bîr nekin, gelek çalakiyan dikin, merasimên bibîranînê li dar dixin û nahêlin ew tişt jî bîrê biçin. Mînak ji bo Japonan bombebarankirina Hîroşîma û Nagazagiyê, ji bo Cihû, Ermenî û Boşnakan komkujiya wan, ji bo Kurdan komkujiya Helebçe û Enfalê, terteleya Dêrsimê, komkujiya Geliyê Zîlan û êşên bi vî rengî dikarin bîrêz kirin. Ev şer, pevçûn, komkujî di nav civakan da tînin bi bîr anîn ku hestên hevpar ava dibin û ev jî dibe sedema bîr û nasnameyeke hevpar. Ji bilî vê bibîranîna bûyerên hovane, şer, komkujî û pevçûnan jî hêlekê va rê li ber digire ku heman tişt di dahatûyê da careke din biqewimin, dubare bibin û hestên tolhildanê nerm bibin.

Bîranîn li hemberî jibîrkinê berxwedanek e, bîreke dij yanî alternatîf e, bi saya bîranînê meriv jî hêlekê va hebûna xwe diparêzin. Ji bilî vê hewldana bibîranînê ji bo civakan rewşa hesabpîrsînê, efûyê, aştî û lihevhatinê jî derdixe holê. Lewra civakên bûne sedema şer, komkujî, êş û travmayê piştî salan dixwazin wî barê giran ji piştî xwe bavêjin û xwe ji wan rûpelên reş yê di dîroka wan da cih girtiye rizgar bikin. Ji bo vê dewlet û civakên neheqî li yê din kirine ji wan lêborînê dixwazin, tazmînatan didin, sûcdaran di mehkemeyan da ceza dikin, dîrokeke nû dinivîsin ku lekeyên reş yê dîroka xwe paqij bikin. Ev gavên tînin avêtin demokrasiyê pêşva dibe, edaletê û aştîyê pêk tîne, mafên mirovan derdixe pêş û têkiliyên xurt di navbera civak, mexdûr û sûcdaran da ava dike. Ev gav di salên dawîn da pêşva diçin, lê berê ne wisa bûye, dewletan xwestine gel bûyeran jî bîr bikin, bi bîr neynîn. Mînak piştî şerên Peleponezê li Atînayê qanûnek hatiye derxistin ku gel bûyerên biêş û rewşên xirab bi bîr neyne. Cîcero piştî kuştina Sesar li hemberî Senatoya Romayê xwestiye hemû bîranînên der barê kuştina wî da bila ebedî bîr jibîrkin. Piştî şerên Sî Salan ên li Ewropayê çêbûn peymanên aştîyê ya Westphalyayê hatiye îmzekirin ku madeyeke wê dibêje sûcên di

dema şer da hatine kirin bila bèn efûkirin. Napolyon ji bo ku Şoreşa Fransayê neyê bibîranîn rê li ber girtiye ku xebatên dîrokê yên der barê şoreşê da neyên weşandin (Sancar, 2016: 37).

### **1.3. JIBÎRKIRIN**

Bîranîn û jibîrkirin wek du rûyên pereyekî ne, nabe ji hevdu cuda bèn nirxandin (Îlhan, 2018: 38). Meriv xwedî bîr in, lê her tiştê di bîra wan da tê veşartin ne xwedî wê erkê ne ku heta hetayî tê da bimînin û neyên jibîrkirin. Lewra hin bûyerên diqewimin, mudaxeyên ji derva tèn kirin, zemanê ji ser ra derbas dibe û sedemên biyolojîk li ser bîrê tesîreke neyînî dikin û hin tişt tèn jibîrkirin. Agahiyên berê hatine hînbûn heke di hiş da êdî nehatibin qeydkirin, an jî yên hatine qeydkirin qels bibin û bi tu awayî têkiliya wê bibîrxistinê va çenebe ev wek jibîrkirin (forgetting) tê binavkirin (Karaaslan, 2017: 26).

Du teoriyên sereke yên jibîrkirinê hene. Teoriya ewil dibêje hemû agahî di bîrê da bi awayekî mayînde tèn veşartin, sedema jibîrkirina wan ne ji ber depokirinê ye, sedem ew e ku ev agahî piştî demekê paşve nayên xwestin û nayên bikaranîn ku ji ber vê ew tèn jibîrkirin. Li gor vê teoriyê heke rê û rêbazên baş bèn bikaranîn ku meriv van agahiyan paşva bixwaze û bîne bîra xwe, ew agahî dîsa derdikevin holê û nayên jibîrkirin. Teoriya duyem jî dibêje şopa bîrê heke rasterast ji holê rabe, winda bibe jibîrkirin çêdibe. Li gor teoriyê çiqas rê û rêbazên paşveanînê bèn bikaranîn jî ew paşve nayên. Ji bo sedema vê jî pirsgirêkên depokirina agahiyan, xisara di mêjî da çêdibe, kodkirina agahiyan ya şaş, bîra nû ya ku cihê depokirina bîranînê berê diguherîne nîşan dide (Winn, 2001: 642).

Derûnnas Daniel Schacter behsa heft kêmasî û qusûrên bîrê dike û dibêje ji ber van xalan meriv tiştan ji bîr dikin û wan wiha rêz dike; Gunehê berwextbûnê (The Sin of Transience), Gunehê neberdewamiyê (The Sin of Absent-mindedness), Gunehê astengkirinê (The Sin of Blocking), Gunehê atifkirina xelet (The Sin of Misattribution), Gunehê pêşniyazkirinê (The Sin of Suggestibility), Gunehê pêşdarazê-pêşniyazê (The Sin of Bias) û Gunehê mayîndeyê (The Sin of Persistence). Schacter li ser van hûr dibe û dibêje bîranîn di nav demê da kevn dibin, bîranîn di zeman û mekanê da bi awayekî xelet tèn atifkirin (misattribution), bîranîn li gor pêşniyar û mudaxeyan tèn guherandin, em tiştan li gor xwe bi bîr tînin, hin bîranîn li hemberî hemû hewldanên me dîsa jî nayên jibîrkirin (2001: 4-5).

Der barê jibîrkinê da mînakeke balkêş jî derûnnas Aleksandr Romanovich Luria dide. Luira behsa eskerekî Êris yê bi navê Zazetskî yê di şer da mêjîyê wî ji ber gulekeyekê xisar dîtiye dike, bi awayekî berfireh nîşan dide ku esker çawa her tişt ji bîr kiriye. Zazetskiyê guleyê zirar daye mêjîyê wî navê xwe, navê malbat û eqrebayên xwe, navê bajarê xwe û şerê li eniyê ji bîr kiriye. Ji bilî van, wî birîna daran, dirûtina polikan, navê alavan, nebatan, xwarinan, tevgerên bedenê yên wek silavdayîn, destdayîna hev, xatirxwestin û hwd yanê bi kurtasî meneya tiştan û tevgerên herî hêsan ên meriv dikarin bikin jî ji bîr kiriye (1971: 76-109). Di vê mînaka li ser esker hatiye dayîn da tê dîtin ku heke mêjîyê însanan rastî derbeyekê bê ji hêla fîzîkî va ew xisarê dibîne û tiştan ji bîr dike. Ev jibîrkinin çawa ku tesîrê li ser jiyana rojane bike, her wiha tesîrê li ser derûniyê jî dike.

Li gor Sigmund Frued jî jibîrkinin ne ew e ku bîranin ji bîrê derkevin û herin, lewra ew dilqê (şikl) xwe diguherînin û di kûrahiya rûh da xwe vedişêrin. Lê dema şert û merc ava bibin ew ji nû va tînan bîranîn, yanê heke ezayên rûh derbeyekê hilnedin, ji ber travmayekê xisarê nebînin bîranînên di bîrê da bikevin kîjan dilqê jî, dikarin dîsa bînan bibîranîn (Îlhan, 2018: 40). Bîranînên însanan bi tenê ji ber şert û mercên ku diguherînin nayên jibîrkinin, ji derva jî tesîreke xirab li ser heye. Her tim behsa “dafikan” û “jîrêderxistinê” (aqilbirinê) jî tê kirin (Assmann, 2018: 234).

Jibîrkinin ne tişteki îradî ye ku însan li gor kêfa xwe tiştan ji bir bikin û paşê bînin bîra xwe. Sedemên fîzîkî, biyolojîk, derûnî û civakî hene ku tişt û bûyer bînan jibîrbikin. Travmayên mezin yên wek şer, pevçûn, destdirêjî, komkujî, tirsandin, zor û zext, asîmîlasyon û yên bi vî rengî, xisardîtina mêjî, nexweşiyên wek amnezya (amnesia) û alzaymirê (alzheimer) tesîreke neyînî li ser hiş û mêjî dikin û dibin sedema jibîrkininê. Piştî jibîrkininê him tesîrên fîzîkî û him jî yên derûnî xwe nîşan didin.

Tevger û polîtîkayên kom û dewletên serdest ên li ser komên bindest, zor û zexta bi rêk û pêk tê meşandin jî dibin sedemên jibîrkininê. Lê dîsa jî meriv dikare destnîşan bike ku hêzeke ji derva çî dike bila bike, nikare bîra civakê ji tevahî ji holê rake an jî bi tevahî biguherîne, lewra ev dijî tebîeta bibîranîn û jibîrkininê ye. Ji bo vê jî mînaka Naziyan a ku Cihû qirkirine dibe bê nîşandan (Karaaslan, 2017: 30). Heman tişt ji bo Kurd, Ermenî, afrîkî û gelek nijad û neteweyên din yên bindest jî dibe bê gotin. Lewra di van civakan da ji derva mudaxeyên pir hişk û xirab hatine kirin, lê dîsa jî wan dev ji ziman, dîn, çand û bîra xwe bernedaye û jibîrkinineke girseyî çênebûye.



Di navbera bîranîn, jibîrkin, zeman û dubarekirinê da têkiliyek heye ku dema em bala xwe bidinê em dikarin vê têkiliyê baş bibînin. Agahiyek kîngê gihîştîye hişê me ev bi zeman ra eleqedar e. Li ser wê agahiya ku gihîştîye bîrê çiqas dem derbas bûye, ev jî xaleke girîng e. Hişê mirovan gelek caran bûyerên di dema nêzîk da qewimîne nikare bi bîr bîne, lê navan, tişt û bûyerên berê yên ku bi salan berê çêbûne dikare ji bîr neke. Mînak navê mamosteyê me yê dibistana seretayî, hevalê me yê zaroktiyê, rojên xirab an jî baş yên bi salan berê hatine serê me zûbizû nayên jibîrkin ku têkiliya bîrê û zeman di vê xalê da dibe bê dîtin. Xala din jî ev e ku tişt çiqas bîrê dubarekirin ewqas zindî dimînin û bi hêsanî nayên jibîrkin. Yanê dubarekirin rê li ber jibîrkinê digire ku zanista derûnnasiyê jî vê rastiyê nîşan dide.

Ji van hemû agahiyan em digihêjin wê encamê ku heke bîr ji tevahî ji holê ranebe, mêjî xisarê nebîne çiqas tiştên neyînî çêbibin û mudaxleyên ji derva va bîrê kirin jî însan her tiştî bi tevahî ji bîr nakin. Çawa ku jibîrkirineke tevahî tune, her wisa bîranîneke tevahî jî tune. Lewra di nav demê da agahî û bûyer di hişê merivan da hêdî hêdî tînin jibîrkin. Em li vir êdî mijara bîr, bîranîn û jibîrkinê yên me çarçoveya wan xêz kir dawî bikin û berê xwe bidin cureyên bîrê.

#### **1.4. CUREYÊN BÎRÊ**

Cureyên bîrê çi ne û gelo ew çawa hatine senifandin? Dema em li dû van pirsan dikevin em dibînin ku qadên wek derûnnasî, biyolojî û civaknasiyê bîr li gor xwe senifandine. Der barê cureyên bîrê da meriv dikare bibêje ku bîrên cuda hene û yên sereke ev in; bîra şexsî (personal memory), bîra fermî (official memory), bîra çandî (cultural memory), bîra civakî (collective memory), bîra ragihandinî (communicative memory), bîra zindî (living memory), bîra negatîf (negative memory), bîra hişdarî (cognitive memory), bîra qeydker (recorder memory), bîra bikêrhatî (functional memory), bîra demdirêj (long-term memory), bîra demkurt (short-term memory) û bîra otobiyoğrafîk (autobiographical memory).

Ji ber ku bîra civakî mijara me ya sereke ye û li gor cureyên din me zêdetir eleqedar dike divê der barê wê da ku bi hûrgilî agahî bînin dayîn. em ê bi çend hevokan va behsa çend cureyên sereke yên dikevin sînorenê wê xebatê bikin û paşê derbasî bîra civakî bibin. Wek Assman jî tîne ziman rabirdû xwebixwe çênabe, bi saya sazûmaniya çandî û temsîliyetê derdikeve holê. Her tim bi hêvî, daxwaz û armancan va piştgiriya wê tê kirin û di çarçoveya dema niha da şikil digire (Assmann, 2018: 98). Nexwe ev

rabirdûya di bîra me da cihê xwe digire bi kîjan cureyan ve çêdibe ka em bala xwe bidinê.

#### **1.4.1. Bîra Şexsî (Personal Memory)**

Di nav cureyên bîrê da ya herî sereke bîra şexsî (personal memory) ye ku her yek endamê civakê xwedî vê bîrê ye. Heke kesek tiştên bi xwe kiriye bi bîr bîne ev wek bîra şexsî dikare bê binavkirin. Lewra ev cure bîr ji bûyerên hatine serê kesekî, tiştên jiyaye an jî di jiyana wî da mene û girîngiya wan tiştan ji bo wî/wê heye pêk tê. Di vê bîrê da du “ez”ên cuda hene ku ji wan yek “ezê/a niha” û ya din jî “ezê/a berê” ye. Ji bo şexs rabirdûya xwe xwedî derkeve û bi rabirdûya xwe ra rû bi rû bimîne bîreke girîng e, lewra rabirdû li ser şexsiyetê tesîrê dike (Çeviker, 2009:15). Li gor Paul Connerton mijara bîra şexsî ji jiyana kesekî û bibîranîna van pêk tê û bi rabirdûyê ra eleqeyeke wê heye. Lewra kesê ku niha dijî serî li rabirdûya xwe dide û tiştên berê tîne bîra xwe. Mînak dibêje ez filan demê çûm van deran, min ev tişt kirin û hwd (Connerton, 2014: 42).

Der barê bîra şexsî da Halbwachs jî dibêje bîra şexsî girtî nîne, têkiliya wê bi der û dorê ra heye, lewra dema mirov bixwazin rabirdûya xwe bi bîr bînin serî li rabirdûya kesên din û civakê didin. Ji ber vê bîra me di nav demê û mekanê (şûn) da sînordar kiriye (2018: 46). Jan Assmann jî ji bo bîra şexsî dibêje dema kesek bikeve nav pêvajoya ragihandinê ev bîr bi saya wê pêvajoyê pêşva diçe. Ji malbat, komên dîni û neteweyî bigre bi beşdarbûna gelek komên cuda yên civakî va ev bîr çêdibe (2018: 45).

#### **1.4.2. Bîra Fermî (Official Memory)**

Bîra fermî cureyek bîrê ye ku ji hêla îqtidarê va tê nivîsandin û belavkirin. Ev bîr di civakê da ji bo avakirina nasnameya civakî tê bikaranîn, li gor vê wezîfeyê pêk bîne xizmetê dike (Bilgin, 2013: 15). Di vê bîrê da rabirdû ji hêla serdestan va tê hilbijartin, li gor hişmendî û fikra wê komê tê belavkirin. Gelemperî tiştên neyînî, yên nebaş, an jî yên dijî hişmendiya serdestan tîne veşartin û berevajîkirin. Bûyer û tiştên erênî tîne nîşandan, li gor fikra serdestan leheng tîne avakirin û pesnê wan kesan an jî bûyeran tê dayîn. Armanca ew e gel ji van bûyeran û agahiyan bawer bikin ku serdestî rehetir bê meşandin. Li vir divê bê gotin ku ev cure bîr û bîra civakî hema bibêje li dijî hev in. Ev bîr çiqas pesnê serdestan bide, li gor berjewendiyên wan bê bikaranîn, bîra civakî jî ewqas li dijî vê bîrê hewl dide bibêje ew tiştên tîne gotin an jî erênî tîne

nîşandan di rastiyê da ne wisa ne, ew hatine berevajîkirin. Tiştê herî girîng a vê bîrê ew e ku ew tê hilbijartin û bi rêya civakîbûnê va tê fêrbûn.

### **1.4.3. Bîra Negatîf (Negative Memory )**

Bîra negatîf bîreke neyînî ye ku bûyerên nebaş, şer, pevçûn, travma, tundî, komkujî di vê cure bîrê da tên parastin. Ev bûyerên nebaş, xirab, şerm û biêş yên di hişê mirovan û civakê da cih girtine piştî ku tên qedexekirin ku civak wan bi bîr neyne, bitepisîne û dernexe rojevê wek bîra negatîf dibe bê pênasekirin. Rê li ber tê girtin ku ev bîra negatîf dernekeve pêş, lewra civak û kes ji ber van bûyerên nebaş xwe sûcdar dihesibînin, dixwazin ji wê barê giran xelas bibin. Dema dîrok bê guhertin û berevajîkirin ji bo binê barê rabirdûyê da nemînin hewldaneke taybet tê dayîn ku ev jî wek qedexekirina bibîranîne derdikeve hemberî me. Di vê rewşê da her tiştê nebaş û aciziyê dide, rabirdûyê tîne bîrê tê înkarkirin û tepisandin (Sancar, 2016: 49).

### **1.4.4. Bîra Çandî (Cultural Memory)**

Ji cureyên bîrê yên ku me behs kirin hemû jî girîng in, kêma zêde dikevin qada mijara me, lê herî zêde bîra çandî û bîra civakî bi mijara me ra eleqedar in. Beriya ku em behsa vê bîrê bikin wek pênase em bi çend hevokan va bidin zanîn ku çand çi ye. Çand (culture) hemû berhemên civakekê an jî komekê ne ku di qadên madî û menewî da hatine çêkirin an jî avakirin. Alav û navgînên ji bo peydakirina xwarin, vexwarin û sitargehan, fikr û raman, teknîk, agahî, bawerî, kevneşopî, pergala dînî û polîtîk, sazî, tevger û şiklê jiyanê hemû hêmanên avakirina çandê ne (Örnek, 1971:148). Wek hat gotin çand ji serî bigire heta binî jiyan bi xwe ye û ji hêla civakê va tê avakirin.

Têgeha bîra çandî ji hêla Jan Assmann va hatiye bikaranîn û paşê belav bûye. Jan Assmann ji bo bîra çandî dibêje bîra çandî li ser hin xalên rabirdûyê disekine, lewra rabirdû wisa rawestiyayî nasekine, zêdetir li ser figurên sembolîk disekine. Ji bo bîra çandî rastî ne girîng e, ya girîng dîroka tê bibîranîn e, heta wisa ye ku ew dîrokeke efsaneyê ava dike (Assmann, 2018: 60-61). Îdiaya bîra çandî ew e ku wan xalên bîra civakî û bîra şexsî bi tîra xwe ronî nekirine vebêje û kêmasiyên wan li holê hiştine tamam bike (Îlhan, 2018: 12).

Hewcedariya bîra çandî honaka (fiction) rabirdûyeke sabit ya ku endamên wê komê li ser bi awayekî hevpar difikirin heye. Ji ber vê rabirdûya hevpar a hatiye honandin, bûyerên girîng û şîroveyan wan ên ne dijî hevdu, avabûna civak û

nasnameya komî hêsan dibe. Di belavbûna vê rabirdûyê da bîra çandî derdikeve holê ku ew zindî ye û berdewam e (Erkal, 2017: 151). Ev bîr merasimî ye, ne wek bîra şexsî ye. Lewra rola civakê li ser bîrê heye ku ew beşdarî vê bîrê dibe. Ew xwebixwe belav nabe, hin kesên taybet vê bîrê radigihînin nifşên nû. Assmann dibêje şaman, ozan, keşîş, mamoste, filozof, nivîskar û kesên wek van ên di civakê da girîng agahiyan, bîra çandî, dîroka dûr an jî nêzîk radigihînin nifşên nû (2018: 62). Mijara xebata me ji ber ku bîra civakî û dengbêjî ye, wek Assmann dibêje em jî dikarin dengbêjan mîna kesên bîrê ava dikin û radigihînin nifşên nû binirxînin. em ê di beşên din ên vê xebatê da berfirehtir behsa vê mijarê bikin.

Naveroka bîra civakî ji stran, mît, reqs, rîtuêl, gotinên pêşiyên, wêne, neqş, hin cihên diyarkirî yê erdnîgariyekê û hwd pêk tê. Bi taybetî rîtuêl, şahî û eyd ji ber ku her tim tîna dubarekirin û dewam dikin, nasnameyê, bîra çandî û bîra civakî ava dikin. Civak van qeyd dikin, radigihînin nifşên nû û parve dikin. Assmann tîne ziman ku mirov bi saya bîra çandî di nav rastiya jiyana rojane ya ku pê tengezar dibe da ji xwe ra derfeteke bêhnvedanê ava dike. Ev ji bo bîranîna rabirdûyê jî wisa ye. Bîranîna rabirdûyê dikare bibe sedem ku fikrên talûke derkevin meydanê, civaka heyî ji naveroka bîrê ya ku texrîbkar ditirse. Ji ber ku ne pêkan e bîra çandî bi awayekî biyolojîk bê dewirkirin, divê ew nifş bi nifş zindî bimîne. Ev jî bi qeydkirina wateyê, zindîkirinê û îfadekirinê yanê bi teknîka bîra çandî va tê kirin. Armanca vê teknîkê ew e ku domdarî çêbibe û berdewamiya nasnameyê bê parastin (Assmann, 2018: 94-98).

#### **1.4.5. Bîra Civakî (Collective Memory)**

Ji ber ku mijara me bîra civakî ye em ê li gor cureyên din ên bîrê berfirehî li ser vê cureya bîrê bisekinin. Bîranîna û jîbîrkirin du taybetmendiyan sereke ên hiş in. Meriv ji bo tiştên êş û xemgîniyê didin rûhê wan hewl didin van tiştan ji bîr bikin, ji bo yê kêfxweşî û lezzetê didin jî dixwazin her tim bi bîr bin. Lê gelemperî meriv tiştan bêyî ku hewl bidin ji bîr dikin û tîna bîra xwe, ev taybetmendiyeke biyolojîk a hişê merivan e. Wek berê jî hatibû gotin bîr taybetmendiyeke bingeîn ya hişê mirovan e ku tê da agahî tîna berhevkirin, senifandin û weşartin. Meriv çawa ku tiştên biçûk ên rojane dikarin di hişê xwe de veşêrin û paşê bîna bîra xwe, bi heman awayî dikarin şexs an jî bûyerên mezin jî di bîra xwe de veşêrin û paşê wan bi bîr bin. Ji bo şexsekî bîra kesane tîkiliyên wî yê bi kesên din û civakê re çêdibe. Ji malbatê bigire, dîn, civakên neteweyî yanê bi gelek komên din ra bi tîkîlî danîna vê derdikeve holê

(Assmann, 2015: 45). Ji bilî bîra kesan bîreke civakê jî heye. Ev bîr çawa çêdibe û girseyek çawa ji bîr dike yan jî bi bîr tîne divê hinekî behsa vê mijarê bê kirin.

Bîra civakî (ing. *collective memory*, frs. *la mémoire collective*, tirkî *toplumsal bellek*) bîr û bîranînên ji hêla komeke civakê va tîne bibîranîn ra tê gotin. Wek hewzeke tê de agahî, bûyer, belge û bîranîn kom bibin û paşê kesên di civakekê da dijîn van hêmanên hevpar bi hev ra parve dikin û bi bîr tînin. Hemû tiştên çandî, folklorî, aborî, eskerî, exlaqî, edebî, dîrokî, tecrubeyî yanê kereste û dewlemendiyên civakê yê rabirdûyê digihêjin dahatûyê bîra civakî ava dikin ku ev ji hêlekê va hişmendiyeke neteweyî ye. Dibe ku bîra civakî wek têgeheke pênasekirina çandê bê nirxandin, çand jî bi hevkarîya şaristaniyê navê hişmendiya neteweyî ya miletekî ye ku heta îro hatiye avakirin (Erkal: 2017, 152).

Têgeha bîra civakî (collective memory) ji hêla Maurice Halbwachs (1877-1945) va hatiye pênasekirin û wek teorî di nav zanistên civakî da cih girtiye. Beriya Halbwachs nivîskarê awisturyayî Hugo von Hofmannsthal cara ewil di sala 1902yan da têgeha bîra civakî (*memoire sociale*) bi kar aniye (Bilgin, 2013: 73). Ev têgeh di sala 1925an da di berhema Halbwachs a bi navê Çarçoveyên Civakî yê Bîrê (*Les cadres sociaux de la mémoire*) da hatiye bikaranîn. Him di vê berhemê da û him jî di berhemên wî yê din da fikra sereke ev e; her çiqas bîr tiştêkî şexsî xuya bike jî civak bîra kesan ava dike, bîr girêdayî rewşên civakî ye û ew tesîrê li ser bîrê dike. Halbwachs di berhemên xwe da behsa meneya bîra civakî, tîkiliya ziman û bîrê, çarçoveyên bîrê, bîra şexsî, tîkiliya malbat û bîra civakî, tîkiliya zeman, mekan, dîrok û bîra civakî dike, hewl dide der barê van da bi hûrgilî nîşan bide ku ew çawa ava dibin, tesîrê li ser hevdu dikin û çawa ji hevdu vediqetin. Halbwachs bi van xebatên xwe va bûye kesê ewil yê li ser vê mijarê xebitiye. Xebatên wî yê di vê qadê de ji lêkolîneran ra bûye çavkanî. Lewra beriya wî bîr wek bîra şexsî, takekesî dihat nirxandin, li ser aliyê bîrê ya komî û civakî nedihat rawestandin.

Halbwachs dema xwendekarê Lîseyê Henryê IVemîn e dibe xwendekarê filozofê fransî Henri Bergson (1896) û paşê bi civaknas Emile Durkheim ra dixebite. Bergson mijara bîrê dixê navenda felsefeyê, Durkheim jî têgeha hişmendiya civakî tîne rojevê. Halbwachsê li ser şopa wan meşiyaye ewil li Zanîngeha Strasburgê û paşê jî Zanîngeha Sorbonê dersên civaknasiyê dane. Halbwachs ne ji hêla biyolojîk û derûnnasiyê ji hêla civakî va bîrê dinirxîne, ji bo avakirin û parastina bîrê çarçoveyeke civakî derdixê pêş. Piştî wî nêrîneke civakî li ser bîrê ava dibe, lêkolîner û ramangêr li

ser vê meseleyê hûr dibin. Çawa ku kesên fikra wî qebûl dikin yê wî rexne dikin û li ser nêrîna wî hin tiştan zêde dikin jî paşê (Paul Connerton, Jan Assmann, Paul Riceour) derdikevin meydanê. Halbwachs hema xwe bi xwe bê bingeşê vê têgehê ava nake, beriya wî lêkolînerên wek Emile Durkheim, Henri Bergson, Sigmund Freud, Aby Warburg, Arnold Zweig, Karl Mannheim, Frederck Barlett û Walter Benjamin jî li ser têgehên “çand”, “civak” û “bîr”ê sekinîne û li ser van mijaran gengeşî kirine. Halbwachs li ser fikr û ramanên wan hûr bûye, rexne li wan kirine û paşê li gor xwe çarçoveya bîra civakî honandiye.

Henri Bergson bîrê tîne nav qada felsefeyê, ji ber ku ter tişt di bîrê da kom dibe girîngiyê dide wê. Bergson bîrê û bedenê ji hev cuda dike, lê ji bo bîrê dibêje dema ew bixwaze bigihêje armanca xwe dikare bedenê jî bi kar bîne. Yanê li gor wî di navbera bîr, beden û hiş (zêhn) da têkiliyek heye ku divê ew bi çavekî wiha bê nirxandin (Karaaslan, 2017: 32). Emile Durkheimê ku Halbwachs li ser şopa wî meşiyaye her çiqas rasterast behsa bîra civakî nekiribe jî behsa civakê, bîra rêxistinî û hişmendiya civakî kiriye, ev jî jixwe kêma zêde derdixe holê ku bîreke komî heye. Li gor vê fikra Durkheim hemû kom xwedî nasnameyeke civakî ya hevpar in û bi vê nasnameya xwe va ji yê din cuda difikirin, dijîn, dan û stendîne dikin. Durkheim destnîşan dike ku malbat an jî civak dema bîranînên xwe parve dikin bêtiir nêzîkî hevdu dibin, bûyerên wek şer û felaketên aboriyê, yê travmayê bi bîr bînin jî dema tîne bal hevdu hevkarîyeke xurt ava dikin, ev jî tê wê meneyê ku bîra civakî ji bo hêza civakî çavkaniyek e (Sennet, 2017: 11). Durkheim li ser mijara xwekuştinê jî sekiniye û hewl daye nîşan bide ev ne tevgerêke şexsî ye, tesîra civakê li ser xwekuştinê heye. Bi vî awayî hişmendiya komî, tesîra civakê ya li ser bûyerên ferdî xistiye rojeva civaknasiyê û bal kişandiye mijarên bi vî rengî.

Li gor Halbwachsê xwendekarê civaknas Durkheim û yê ekola Durkheim şopandiye bîra kesan ji pêvajoyeke kesayetiye zêdetir di nav civakê da û girêdayî civakê pêşva diçe. Ew ne ji hêla biyolojî, norolojî û fîzyolojiya hiş ji hêla civakî va bîrê dinirxîne, dibêje ji bo bîra şexsî çêbibe û bê parastin çarçoveyeke civakî şert e (Assmann, 2018: 44). Yanê li gor Halbwachs kesekî tena serê xwe bijî, têkiliya wî bi civakê ra tunebe nikare bibe xwedî bîr, lewra bîr ji hêla civakê va tê avakirin. Ji ber wê ew li ser malbatê, polên dibistanan, yeqîneyên eskerî, komên seyahetê û yê bi vî rengî hûr dibe, li ser bîra wan lêkolînan dike û dixwaze nîşan bide ku bîra kesane tena serê xwe ava nabe, girêdayî civakê û komên din e. Di xebat û nêrînên Halbwachs da

tesîra Durkheim û Bergson tê dîtin. Li gor teoriya Halbwachs di navbera bîra civakî û komekê da dan û stendinek, têkiliyeke beranberî hev û dualî heye, ev bi zeman û mekan ra têkildar e, ew kom di nav zeman û mekanê da hin tecrubeyan bi dest dixê, wan diparêze û digihîne nîfşên din. Bûyerên diqewimin girêdayî şert û mercên civakî ne û kesek tena serê xwe nikare bîrekê ava bike, lewra aliyê bîrê yê civakî heye. Dîsa ew dibêje bûyerên di demeke nêzîk da qewimîne zû tên bîra mirovan, lê dema ji ser ra wext derbas dibe tên jibîrkirin, der barê wan da di bîrê da valahiyek çêdibe. Di vê rewşê da, yanê dema em bîranînên xwe ji bîr dikin çarçoveya ku wan dîsa tîne rojevê, yanê wan tîne bîra me bîra civakî ye (Halbwachs, 2016; 171).

Wek di fikrên Halbwachs û Assmann da jî tê dîtin bîra şexsan bi saya têkiliya kesên din ra ava dibe û ew tesîrê li ser hevdu dikin. Di bîreke hevpar a neteweyekî da ne şert e ku civak bi hev ra bûyerên dîrokî bijîn, tiştên serê hemûyan, ya girîng ew e ku civak bi hev ra wan bûyeran bi bîr bînin (İnce, 2016: 40). Li ser rabirdûyê parvekirin çiqas zêde bin, hêza bîra civakî jî ewqas zêde dibe. Bi vê nêrînê va heke mijar bê nirxandin tê dîtin ku jiyana kesane ji bîra civakî sûtê werdigire (Atik-Erdoğan, 2014: 3). Hin sazîyên bîra civakî ava dikin hene ku ew dibistan, malbat, cihên dînî (dêr, mizgeft, sînagog û îbadetxaneyên din ên baweriyên cuda) û hwd dikarin bîrên rêzkirin. Misztal jî li ser vê yekê disekine û balê dikêşîne li ser dibistan, mehkeme, muze, alavên ragihandinê yê girseyî û dibêje ev bîra civakî ava dikin (2003: 19). Li cîhanê hin bûyerên sereke hene ku bûne sedem bîra civakî bê rojevê. Ji wan hinek ev in;

- Şoreşa pîşesaziyê, pêşvaçûna makîneyan û teknolojiyê
- Bûyerên siyasî yê girîng wek Şerê Dinyayê yê Yekemîn û yê Duyemîn
- Komkujiya Cihûyan û gelên din
- Koçberî, zilm, penaberî û komkujiyên ji ber şer û pevçûnan çêbûne

Bûyerên bi vî rengî him jiyana mirovan guherand û him jî tesîr li ser dîrokê kir. Hemû guherînên dîrokî yê mezin qada bîra hevpar fireh dikin (Nora, 2006: 20) Ji bo ew neyên jibîrkirin bi rîtuelan, sembolan, peykeran, merasiman û bibîraninan tîne parastin, bi vî awayî bîr zindî dimîne. Şerê Dinyayê yê Duyemîn ji bo rabirdûya civakan xaleke girîng e, lewra bûyerên wê demê qewimîne mekanîzmayên jibîrkirina civakî ya piştî şerên din derketine holê bêtesîr hiştine û hesabdayîne mecburî kiriye (Bilgin, 2013: 39). Bîra civakî li ser pêvajoya bibîranînê disekine û ji aliyekî va ji rabirdûyê hesab dipirse, pê ra eleqeyê datîne. Ji ber vê bîra civakî di destê îqtidar,

dewlet an jî desthilatdaran da hêzeke pir xurt e, çiqas bibêjî ewqas bihêz pêkan e bê bikaranîn. Lê dijî wê bireke zindî û dij jî her tim ava dibe ku hin caran ew li gor ya desthilatdaran zêdetir qada xwe fireh dike.

Di rejimên dîktator da li hemberî zext û texrîbkirina bîrê, ziman, fikir, raman, evîn, jiyan, bi kurtasî li dijî her tiştî bîr hêzeke gelekî xurt e û wek çekekê dikare xwe biparêze. Wek Assmann û Connerton jî tînin ziman berhama nivîskarê amerîkî George Orwell a bi navê 1984 ji bo vê rejima otorîter û karên nebaş ên ji bo jiholêrakirina bîrê nîşan bide mînakeke baş e. (Assmann, 2018: 94- Connerton, 2014: 30). Di vê romanê<sup>1</sup> da rejima totalîter hemû qeyd û dîrokê diguherîne, pirtûk û nûçeyan ji nû va li gor xwe dinivîse û yên berê jî davêje boriyên jê ra dibêjin “qulika bîrê” da ku ew winda bin û ji holê rabin. Hemû welatiyan her tim dişopîne (Big Brohter), tirsê li ser wan ava dike û wan dide zanîn ku heke ew şaşiyekê bikin wê bîrê cezakirin. Bi vî awayî civakeke bê dîrok, bê rabirdû, bê bîr û bê nasname ava dike ku welatî li hemberî wan serî hilnedin û ew jî desthilatiya xwe li gor dilê xwe û berjewendiyên xwe bidomîne. Lê ev zor û zexta totalîter çiqas tund be jî nikare rê li ber wê hêza azadiyê ya di nav rûhê însanan da bigire, hin welatî (serlehengê romanê Winston û hezkiriya wî Julia) li hemberî wê zext û zilmê li ber xwe didin. Her çiqas piştî îşkence û zordariyan paşê ew ji hêla rûh û mêjî va teslîm bibin, mêjîyê wan bê şûştin, ew bê kok û bê bîr bimînin jî hewldana wan berxwedanek e. Em ji vir digihêjin vê encamê ku dema îqtidar hêza xwe winda bikin destê wan qels dibe. Ji ber vê ye her tim hewl tê dayîn ku bireke hevpar a fermî û dîrokeke fermî di civakê da belav bibe ku ev hêz û otorîteya nebaş bê parastin. Bîra civakî ji ber vê gelekî girîng e. Bîra civakî tenê bûyerên berê û rabirdûyê nîşan nade, ne hewzeke bîranînan e, ew çarçoveyê rûhî, meneyan, nirxan û sembolan jî çêdike ku ev ji bo rewşa îro dibin bingeş û komên muxalif li dijî îqtidaran diparêze.

### **1.5. ÇAVKANIYÊN BÎRA CIVAKÎ AVA DIKIN**

Mîrov di nav civakê de bûyeran tînin bîra xwe, tiştan ferq dikin û wan sînor dikin. Wek bîra şexsan, bîra civakan jî heye lê ew ne berbiçav e, civak dikarin bîra kesan çêbikin û biguherînin. Naxwe civak çawa dikarin bîra civakî ya hevpar ava bikin û vê biparêzin? Civak çawa tiştan û bûyeran bi bîr tînin û ji bîr dikin? Dema ji bîr dikin kîjan encam derdikevin holê, reng û rûyê civakî çawa diguhere divê behsa van bê kirin. Ji bo bîra civakî çêbibe û zindî bimîne hin hêmanên sereke hene. Ev ji bo bireke hevpar

---

<sup>1</sup> Romana “1984” wek film di sînemayê da jî hat nîşandan.



ava bibe tèn bikaranîn ku ew wek nasname, ziman, dîrok, cih (mekan) û tevgerên bedenî (bodily practices) mimkun e bèn rêzkirin. Helbet ji bilî van çand, folklor, sembol û gelek tiştên din jî li ser avakirina bîra civakî tesîrê dikin, lê yên hatin behskirin têgehên sereke ne û divê li ser van bê rawestin.

### 1.5.1. NASNAME

Peyva nasnameyê (îng. *identity*) ya ku koka wê bi latînkî ji “idem”ê tê û meneya wê “eynî”, “heman”, “wekhev” e xwedî dîrokeke dirêj e, lê heta sedsala 20emîn wek têgeheke populer nehatiye bikaranîn. Têgeha nasnameyê ewil ji hêla teoriyên derûnnasî û civaknasiyê va hatiye nirxandin. Herdu jî her çiqas li ser hin aliyên wê yên cuda bisekinin jî di rastiyê da fikra wan a hevpar ew e ku nasname tê avakirin (Marshall, 2005: 405-408). Beriya behsa nasnameyê bê kirin divê hinekî behsa têgeha neteweyê bê kirin, lewra ew bi hev ra têkildar in û ev pêwendiya wan gelekî girîng e. Netewe têgeheke balkêş ên zanista civakî ye ku gelemperî bi heyama modern ra tê têkildarkirin û bi wan argumanan tê şîrovekirin. E. J. Hobsbawm dibêje netewe qasî dîrokê ne qedîm in, meneya modern a peyva neteweyê ji sedsala 18emîn pê va derketiye holê (2010: 17). Li gor Benedict Anderson netewe civakeke siyasî ya xeyalkirî ye. Endamê neteweya herî biçûk jî wê tu carê yên din nas nekin, der barê ji wan gelean da wê tişteki nebihîzin. Lê dîsa jî di hişê her yekî de xeyala pevrabûnê heye ku ev xeyal dijî (Anderson, 1995: 20).

Ernest Gellerê di mijara neteweyê da her tim referans tê nîşandan jî der barê têgeha neteweyê de dibêje heke du kes xwe wek endamên neteweyekê qebûl bikin û heman çandê parve bikin ancax wê demê dikarin ji heman neteweyê bèn hesabandin (1992: 28). Li aliyê din Ernest Renan jî dûr û dirêj balê dikşîne li ser neteweyên ewil yên dewletên Ewropayê ava kirine û dibêje neteweyeke arî ya xwîna wê bi xwîna neteweyeke din va tevlihev nebûye tune, xwîna hemû neteweyan bi xwîna neteweyeke din va tevlihev bûye (2016: 33-45). Li gor Renan ji bo avabûna neteweyekê hin tiştên sereke û ferz hene ku ew yekîtiya nijad, dîn, ziman, erdnîgarî û berjewendiyên hevpar û mecburiyetên leşkerî ne, heke ev şert pêk neyên behsa neteweyekê ne mimkun e bê kirin û girîngiyê dide rûhê hevpar a civakê, mîrata hevpar a rabirdûyê û bîrê (45-50).

Wek ku tê dîtin der barê neteweyê de nêrîn û şîroveyên cuda hene, lê ya hevpar a balê dikşîne ew e ku ev têgeheke modern e û ji bo behsa neteweyê bê kirin çand,

ziman û fikra hevrabûnê girîng e. Netewe bi nasname, ziman, çand, folklor û dîroka xwe va li ser piyan dimînin, ji bo parastina van hêmanan jî civak her tim bi hin dem û dezgehên xwe yê wêk saziyên dewletê, dibistan, malbat, çand, dîn, sînema, edebiyat, huner û hwd va hewlê didin. Ji bo neteweyan hin sembolên neteweyî yê sereke hene ku meriv dikare wan wek ala, welat, erdnîgarî, çand, dîrok, ziman, dîn û wêje rêz bike. Dema em bala xwe bidin van sembolan tê dîtin ku ev di nav neteweyekê da têkiliyên xurt ava dikin ku gel bi hev ra bê girêdan û bizanibin ew ji heman neteweyê ne.

Piştî pênaseya neteweyê em niha behsa têgeha nasnameyê (identity) bikin. Ev têgeh yek ji wan têgehên e ku li ser zêde tê axaftin, nîqaş tê kirin. Ew zanistên civakî û siyasetê jî eleqedar dike. Gelek zanistên cuda yê wêk derûnnasî, civaknasî, felsefe, edebiyat, antropolojî û hwd li gor nêrîna xwe li ser vê têgehê radiwestin. Nasname ew hesta yekbûyîna kirdeyî, hevgerî û domdariyê ye ku şexsek duh, salên berê çî be, xwedî kîjan kesayetiye be dîsa ew kes e, vê yekê nîşan dide. Pirsra “Ez kî me?” dibersivîne, bersiva yektabûn, bêhempabûnê tîne zimên (Bakırcıoğlu, 2012: 750). Nasname bi taybetî li ser du tiştan disekine ku yek xwe pênasekirin, ya din jî aîdiyet e. Yanê li ser pirsên “Ez kî me?” û “Aîdê li ku me?” disekine û di navbera şexs û civakê de têkiliyekê ava dike. Lê di heman demê da bi sergirtî xaleke wê ya dijber jî heye, lewra kesek bi saya nasnameyê jî yê din cuda dibe.

Heke pirsra “Tu kî yî?” ji kesekî bê pirsîn ewê ewil nav û paşnavê xwe bibêje û paşê wê bifikire ka bi rastî jî ew kî ye, ji kîjan malbat, zayend, welat û nijadî ye. Piştî van wê nasnameya xwe bibêje. Dema nasname bê terîfkirin dibe ku nasnameya kesî ji xalekê bêdetir be, yanê ew xwe aîdê çend nasnameyan bibîne. Mînak kesek dikare bibêje ez kurd im, jin im, misilman im, nivîskar im, yekî din dikare bibêje ez mêr im, cihû me, amerîkî me, mamoste me, yekî din dikare rasterast bibêje ez îngiliz im û xiristyan im û h.w.d. Ji ber derfetên teknolojî, pîşesazî û rêwîtiyên bi balafiran va hêsanî tên kirin dinya êdî wek gundekî biçûk tê şîrovekirin. Bi saya van civak û welat xurttir bi hev ra têkildar dibin, jiyana navdewletî her ku diçe pêşva diçe. Ev jî dibe sedem ku meriv xwe bi çend nasnameyên ji hev cudatir pênase bikin û di bin banê wê sîwana pirjimarî da bijîn. Di avabûna hesta nasnameyê da qasî ferasetên bedenî, hêmayên bedenê, armanc, nirx, jiyîn, zayend, nijad, temen û statûya şexsekî û kesên din bi çavekî çawa wî/wê dinihêrîn jî tesîrê dike (Bakırcıoğlu, 2012: 750).

Carinan meriv di bin giraniya van nasnameyên cuda da aciziyê jî dikşînin. Lewra dema xwe dispêrin nasnameyekê, wek ku ji ya din bêpar dimînin. Bi hemû

nasnameyan di nav hev da bihelînin û wî kirasî li xwe bikin jî wek ku ew nasname carna dijî hev bin aciziyê dide rûhê wî kesî. Bilgin nasnameya koman dişîbîne pêlîstokeke Ûrisan a bi navê matrûşkayê (ev bûkek e û yekê vedikî, bûkeke din jê derdikeve, paşê ya din û wiha çend heb ji nav hevdu derdikevin) û wiha mînakê dide “Mînak ez ji Brukselê me, Belçîkayî me, Ewropî me. Ev nasnameyên cuda yan bi bîrên cuda an jî yê reqîb va girêdayî ne. Lewra her yek hewcedariya nasnameyên cuda tamam dikin” (Bilgin, 2013: 37). Nivîskar Amin Maaloufê di pirtûka xwe ya “Nasnameyên Didin Kuştin” (*Les identités meurtrières*) da li ser têgehên nasname û aîdiyetê bi awayekî berfireh disekine ji bo vê mijara me behs kir ji nijad, dîn, netewe, welat, zayendên cuda mînakên balkêş dide. Li gor Maalouf nasname nayê dayîn, ew di nav rûhê zeman û jiyandê da ava dibe û diguhere. Aîdiyetên nasnameyê ava dikin û şikil didin wê dema bi nasnameyê ra wekhev bîr nixandî, meriv bi tenê li ser aîdiyetekê hûr bibin û yê dîn qebûl nekin ew nasnameyê dikujin (2020: 25-27).

Wek Bilgin û Maalouf jî tînin ziman însan xwedî gelek aîdiyetan in, yanê kesek dikare kom, nijad, zayend, welat û dînen cuda di jiyana xwe da bihewîne û wan ji hev cuda neke, hemûyan di bin sîwana nasnameyê da biparêze. Lê helbet ji van aîdiyetan kîjan hatibe binpêkirin, êrîş li ser hatibe kirin û biçûk hatibe dîtin însan zêdetir wê aîdiyetê derdixin pêş û wê ji xwe ra wek nasname hildibijêrin. Lewra der barê wê da birînen wan çêdibin, êş, azar û travma di bin hişê wan da kom dibin.

Zygmunt Bauman dibêje fikra nasnameyê ne tiştêkî xwezayî ye, li gor tecrubeyan çênebûye, meriv bi zorê di nav çarçoveya vê fikrê da hatine asêkirin. Lewra nasname hê tiştêkî temamnêbûyî ye, xelas nebûye û dewletên modern wek tiştêkî mecburî û wezîfe li ser mirovan ferz kirine (Bauman, 2017: 30). Assmann jî nasnameyê wek mijareke hiş û bîreweriyê (conscious) dinirxîne û dibêje heke kesek der barê kesayetiya xwe da bibe xwedî agahî, xwe wek şexsekî baş bizanibe, ev hişmendiya derkeve ser hiş, ev dibe nasname. Nasnameyê jî wek “ez” yanê nasnameya şexsî û “em” yanê nasnameya hevpar dike du beşan û ji bo ferqa wan jî dibêje nasnameya hevpar sembolîk e, komek an jî endamên civakekê wê ava dikin, tena serê xwe ew çênabe (2018: 139-142). Nasnameya civakî (Collective identity) bi mîrata rabirdûyê ya ji sembol, bîranîn, berhemên hunerê, edet, kevneşopî, nirx, bawerî û agahiyan derketiyê holê tê avakirin (Bilgin, 2013: 41).

Di civakan da di nav demê da gelek bûyerên girîng diqewimin û di nav rûpelên dîrokê da cihê xwe digrin. Her çiqas hinek baş bin jî, jê hinek bûyerên biêş û xirab in.

Ji bo ev ji hêla civakê va bên bibîranîn, ders ji wan bê hildan, nifşên nû ra bibin neynik, ferd xwe yek ji endamê wê civakê bihesibînin di civakê da bîrek ava dibe ku ev wek bîra civakî tê şîrovekirin. Bîra civakî ji danehev û tecrubeyên civakê kom kiriye pêk tê, hişmendiya gelan ava dike. Zindî ye, dibe ku biguhere û mudaxele li ser bê kirin. Bi dîrokê ra jî ji nêz va têkildar e. Bîra civakî dema nasnameyê ava dike, hewl dide dîrokeke hevpar jî binivîse. Ji ber ku mijara me bîra civakî ye divê behsa çend fonksiyonên bîra civakî yên bi nasnameyê ra eleqedar in bê kirin. Bîra civakî ji bo avakirina nasnameyê girîng e, tesîra wê li ser nasnameyê heye. Licata, Klein û Gely rola bîra civakî ya li ser nasnameyê wiha derdixin pêş:

1. Pênaseya nasnameyê: Bîra civakî ji endamên komê ra behsa çîroka wan ya ew kî ne, ji ku tîne û diçin ku dike. Behsa rabirdûyeke hevpar dike û di navbera endamên civakê da hevkarîyeke berwarî, bi nifşên rabirdûyê ra jî hevkarîyeke çikwar ava dike.
2. Bilindkirina nasnameyê: Serkeftinên rabirdûyê ya komê derdixe pêş, bûyerên neyînî, dijî exlaqê, şaşiyên vedîşêre û bi vî awayî xwegiranî (self esteem-öz saygı) tê parastin û bilindkirin.
3. Nîşandana meşrû ya çalakiyên komê: Hilbijartina rabirdûyeke li gor krîter û rêzîkên niha, tevgerên me yên niha jî mafdar nîşan dide.
4. Komê radike ser piyan ku ew tevbigerê: Ji bo komeke rabirdûyê rake ser piyan ku kom tevbigerê çavkaniyeke girîng e. Lewra di bêjarên daxwaza nasnameyê dikin da referansên rabirdûyê xwedî tesîrekê ne (Bilgin, 2013: 35).

Bîr, bibîranîn, hînbûn û jinûvesazkirin ji bo însanan taybetmendiya bingehîn in. Lewra insan bi saya bîrê dibe xwedî nasname, di nav civakê de wek ferd cih digire û xwe tîne ziman. Karaaslan van xalan tîne ziman û ji bo hêla zanistên civakî va girîngiya bîrê bide nîşandan romana Cengiz Aytmatov ya bi navê “Roj Heye Dibe Berdêla Esrê” mînak dide (Karaaslan, 2014: 14-15). Ev romana ku wergerandine gelek zimanan û wek şano li gelek welatan hatiye lîstin bi rastî jî ji bo bîr, nasname û mirovahiyê mînakeke baş e. Min bi xwe jî şanoya wê temaşe kir, ez dixwazim bi kurtasî behsa wê bikim da ku em bibînin ji bo mijara bîrê zelal bibe ew çima girîng e. Di romanê da gelê jê ra dibêjin Juan-Juan çav berdidin ax û ava Qazaxan û ji bo bi dest bixin çî ji destê wan tê dikin. Juan Juan dema Qazaxan dîl digirin ji bo ew ji nasname, çand û dîroka xwe ji bîr bikin eziyetê li wan dikin û wan dikin “mankurt”. Ji bo insan ji nasname, ziman û çanda xwe dûr bikevin û ji bîr bikin hewldanek tê dayîn ku

mimkun e ev pêvajoyê wek “mankurtkirinê” bê şîrovekirin. Kesên jê ra dibêjin Juan Juan porê Qazaxên ku dîl girtine kur dikin, postê heştireke nû hatiye serjêkirin dikşînin serê wan kesan û berdidin çol û beyarên Asyayê. Çend roj şûn da diçin teseliya wan dikin, heke ew sax bin nan û avê didin wan. Postê heştirê yê ku serê wan pêçayî nahêle porê wan ji aliye derva va dirêj bibe. Porê wan kesan di bin çermê serê wan da ber bi jêr dirêj dibe, zirarê dide hiş û bîra wan û ew her tiştî ji bîr dikin, êdî tu kesî nas nakin û dibin nebanê nasname, jiyan û çanda xwe. Ji ber vê wan kesên ku nan û av dane wan wek efendî û serdest dibînin û êdî dikevin bin emre wan, mirovahiya wan namîne. Lehengê romanê Kolaman jî rastî vê tevgerê tê û ji ber ku dîya xwe Naymanê nas nake wê dikuje. Wek ku me bi kurtasî behsa vê berhema Aytmatov kir nasname û bîr reng û şiklê didin hevdu, têkiliyeke hevpar û xurt ava dikin, dema zirarê bibînin meriv dibin dijminê netewe, gel û çanda xwe.

Nasname mijareke bîr û bibîranînê ye. Çawa ku şexsek bi saya bîrê dikare nasnameya xwe ava bike, komek jî dikare nasnameya komê bi tenê bi saya bîrê ava bike. Cudahiya wan ev e ku bîra komê ne xwedî bingeheke norolojîk e, şûna wê mît, stran, reqş, gotinên pêşiyên, qanûn, metnên pîroz, neqş, wêne, rê û heta wisa ku wek mînaka Awistralyayê hemû erdnîgarî yanê çand dikarin wê ava bikin (Assmann, 2018: 98). Keslasy û Rosenbaum (2007: 78-84) jî dibêjin tesîra bîrê li ser avakirina nasnameyê heye, divê rabirdû xwedî hin taybetmendiyên be ku van taybetmendiyên rabirdûyê jî wiha tînin zimên:

1. Hin bîranînên rabirdûyê qedirbilind tînin nîşandan ku rabirdû li gor hestên îroyîn yê xwedî giramî (self esteem) û qîmetê (eigenvalue) bin. Ev jî nasnameyê diparêze, hesteke pozîtîf derdixe holê.
2. Şerên lehengî tînin vegotin ku ew ji bo rewşa niha bibin îlham û hest. Her welat lehengên xwe derdixe pêş, behsa qehremaniyên wan dike û wan bi bîr tîne.
3. Êşên hevpar ên berê derdixin pêş. Komkujî di têkiliya hin koman û ya bi rabirdûyê da xwedî girîngiyeke bingehîn e (protestan, cihû, ermenî hwd.) (Bilgin, 2013: 42-43).

Heke şexsek xwe aîdê civakê û çanda wê bibîne, vê aîdiyeta hevpar bîne ziman ancax wê demê nasnameya hevpar çêdibe. Lewra însan jixwe xwezayî di nav civakê da cih digirin ku ew rewşa hevpar çêdibe, ya girîng ew e ku meriv piştî dîtina komên din, civakên din û jiyanên cuda nasnameya “em”ê ya hevpar bizanefî qebûl bikin û ew di wan da xurt bibe. (Assmann, 2018: 143) Di avabûna nasnameyê da tesîra

ziman jî pir zêde ye. Lewra însan bi saya ziman him xwe nas dikin û xwe didin nasandin û him jî têkiliya xwe ya bi civakê ra bi saya ziman dimeşînin.

### 1.5.2. ZIMAN

Di navbera însanan da ji bo hevdu fêm bikin hin rê hene; axaftin, jest û tevgerên bedenê û nivîs. Her yek xwedî taybetmendiyên cuda ye û ji hev nikarin bên veqetandin, lewra ew alîkariya hevdu dikin ku ragihandinek, têkiliyeke xurt di navbera însanan da ava bibe. Di nav van rêyên ragihandinê da ya sereke axaftin e ku ew jî bi saya ziman pêk tê. Ziman navgînek e (wasite) ku bi saya wê mirov hevdu fêm dikin, haya wan ji hev çêdibe, fikr, raman û hestan parve dikin. Ziman pergaleke rêk û pêk e ku meneyan ava dike, bi wan meneyan dinyayê û însanan fêm dike. Mirov bi saya ziman diaxivin û axaftin ji bo yê din (yê li hember) teqez hebûnek e (Fanon, 2020: 17). Ziman rewşa hebûnê ya kesan e ku ji ber hewcedariya têkilî danînê xwe dide der, lewra bi saya ziman mirov xwe didin zanîn û haya wan ji yê din çêdibe, pergaleke civakî ye, barê çand û bîrê jî hildigire ser xwe.

Meriv dema tên dinyayê xwe di nav malbatekê da dibînin ku zimanek lê tê axaftin, a ew ziman çarçoveya kesayetiyê ava dike, di hişê wan da rûdinê û bi saya vî zimanî nasnameyeke wan çêdibe. Zimanê zikmakî (zimanê dayikê) zimanê esas, sereke, bingehîn e ku dema zarok tên dinyayê ewil peyvên vî zimanî dikevin guhên wan û paşê ew bi vî zimanî diaxivin. Dema em li zimanên din dinihêrin wan jî ji bo “zimanê zikmakî” hin peyv bi kar anîne wek; bi almanî “ursprache, hauptsprache”, bi fransî “langue mère”, bi îngilizî “main language, native language”, bi tirkî “ana dil”. Çawa ku tê dîtîn di hemûyan da jî zimanê bingehîn û sereke zimanê dayikê ye. Ev zimanê sereke hebûna şexsan bi xwe ye. İsmail Beşikçi jî ziman wek rewşa hebûnê ya kesan dinirxîne û dibêje ev rewşa hebûnê ji têgeha “maf”ê (heq) ya di nav hiqûq û edaletê da cih digire pêştatir e û hevoka Kadir Cangızbay a “Ziman wek xurexura zik e, ma qey hûn dikarin rê li ber xurexura zik bigirin?” bilêv dike (2013: 208).

Ziman stûna sereke ya neteweyekê ye ku gelek tiştên din li ser vê stûna bingehîn tên avakirin, di navbera rabirdû, îro û dahatûyê da ew dibe pireyeke qedîm û xurt. Ziman nasnameya neteweyî û yekîtiya hevpar ava dike, endamên wê neteweyê bi saya ziman bi koka xwe, çand û rabirdûya xwe dihesin, lewra têkiliya mirovan bi ziman çêdibe û jiyan ji serî heta binî bi saya ziman dimeşe. Ziman mîrata çand û civakê ye ku neteweyan li ser piyan dihêle. Ji ber vê ye ku girîngiya ziman gelekî zêde ye.

Dema di civakekê da ziman biguhere, bê jibîrkin an jî rastî êrîşê bê hema bibêje her tiştê jiyane, şiklê fikr û ramanê jî diguhere û çandêke din ava dibe. Ziman bê jibîrkin her tişt têk diçe, lewra ziman çandê radigihîne û bîrê ava dike. Bi saya ziman meriv xwe wekî ku li mala xwe ne dibînin, loma aîdiyeteke pêk tê, lê dema ziman têk diçe wek ku ji mala xwe hatine qewirandin xwe tik û tenê bê parastin dibînin.

Ziman ne bi tenê deng û gotin e, ew di fetlonekên bîrê da pergaleke e ku têkiliya wê bi bîranîn û jibîrkinê ra heye (Îlhan, 2018: 19). Zimanzanê amerîkî Joshua Aaron Fishman têkiliya xurt a di navbera ziman û çandê da bilêv dike, pîrsa “dema ziman bê jibîrkin çî dibe?” jî wiha dibersivîne “Ziman ji çandê dûr bixin, hûnê selaman, çêran, pesindayînan, hiqûqê, edebiyatê, stranên, tiştanokan, gotinên pêşiyên, şifayê, zanebûnê, diayan her tiştî ji dûr bikevin.” (1996: 81). Halbwachsê me nêrînên wî yê der barê bîra civakî da bi hûrgilî anîbû ziman jî dibêje dema ziman wînda bibe, xirab bibe bîranîn nikarin zindî bin, meriv dikare bibêje bîr xwe dispêre gotinan û zimên (2016: 95).

Nifşeke di pêşa zimanekî ku tê axaftin da tê dinyayê heman bîra çandî û bîra şexsî ya wî zimanî hildide û ne pêkan e ji hevdu bîr veqetandin (Îlhan, 2018: 16). Di navbera ziman û bîra civakî da têkiliyeke xurt heye. Bi rêya ziman bîr û dîrokeke hevpar tê avakirin, berdewamiya neteweyê bi saya ziman dimeşe û ew bîr heta roja îroyîn tê. Ji ber vê kesên heman zimanî diaxivin di navbera îro û rabirdûyê da bi saya ziman pîreyekê ava dikin, haya wan ji dîrok û nasnameya wan çêdibe. Ev zimanê hevpar fikr, raman, hest û hişmendiyeke hevpar û yekrengî ava dike ku jixwe ew jî eleqeyekê bi nasname û neteweyî ra girê dide. Dîsa bi saya ziman ew bîra rabirdûyê ya îro ava dibe jî digihêje dahatûyê û bi vî awayî bîra gelan tê parastin.

Li hemberî tevgerên kolonyal çeka herî xurt a gelên bindest ziman e, lewra ew bi saya ziman li ber xwe didin, li ser piyan dimînin û tevgerêke dij-kolonyal ava dikin. Erdnîgariyên mêtîngerî, dagirkerî û kolonyalîzm lê hene mêtînger ji bo serdestiya xwe bi zorê bidin qebûlkin, gelên bindest li gor berjewendiyên xwe bi kar bînin ewil êrîşê dibin li ser ziman. Dema ziman bê xirabkin, ji holê bê rakin û têkbirin ew dikarin bi hêsanî hêza xwe bidin qebûlkin. Nivîskarê kenyayî Ngugi wa Thiong’o der barê vê mijarê da gelek mînakên balkêş dide, behsa devjiberdana zimanê xwe yê dayikê “gikuyu” û bikaranîna zimanê îngilîzî dike (ji ber dibistan û perwerdeya mêtîngeran), dibêje çek û gule ji bo bindestkirina fizîkî tîrî bikaranîn, lê ziman ji bo bindestkirina

rûh tê bikaranîn (Thiong'o, 2018: 41). Helbet ew jî piştî salan ji vê asîmîlasyonê azad dibe û vedigere zimanê xwe yê dayikê û berhemên xwe bi vî zimanî dinivîse.

Halbwachs dema behsa kesên nexweşiya afaziyê (nexweşiya jibîrkirina meneya têgeh û peyvan) bi wan ra heye dike, dibêje gelek kes wisa bawer dikin ku ev nexweşî ji ber xisareke fizîkî derdikeve holê, lê na ew ji ber ku têkiliya kesan a bi civakê ra xirab dibe, hêza ziman kêm dibe derdikeve holê. Halbwachs kesên nexweşiya afaziyê bi wan ra heye dişibîne wan kesên ku li welatekî xerîb zimanê wî welatî nikarin biaxivin, lê dîroka wî welatî dizanin û dîroka xwe jî ji bîr nakin. Halbwachs bi van tespîtên xwe va balê dikşîne ser girîngiya ziman û tesîra wê ya li ser hiş, hest û şexsiyeta mirovan (2016: 101-113).

Ji ber ku ziman mîrata çandî bi xwe ye çand û gelên cuda bi saya ziman tînan pêşberî hevdu, jihev cudabûna xwe bi rêya ziman nîşan didin, hin caran jî di navbera wan da reqabet çêdibe, têkoşînê didin ka kî dê bibe serdest. Amin Maalouf dema li ser nasnameyê disekine dibêje Tirk û Kurd herdu jî misilman in, lê ji ber cudahiya ziman di navbera wan da pevçûn çêdibe (2020: 18). Ji bo em balê bikşînin reqabeta li ser hebûnê û ziman çarîneke Qedrîcan a di kovara *Hawarê* da hatiye weşandin mîna keke baş e û ew wiha dibêje:

“Mirovên çavsor hatin, jê re digotin rom e

Zmanê me î delal (yasaq) kirin bizorî

Zmanê xwe î dixwar bo me kirin mecburî

Êdîn curmek mezin bû, bi Kurdmancî berdan” (Qedrîcan, 1932: 5).

Wek ku tê dîtîn di vê çarîne da pesnê zimanê kurdî ya li hemberî zimanê tirkî hatiye dayîn û armanc ew e ku qedrê zimanê kurdî li cem gelê kurd zêde bibe û gelê din jî bizanibin rûmeta vî zimanî zêde ye. Feqî Huseyn Sağniç jî der barê girîngiya ziman da di kovara *Nûbiharê* da nivîsek nivîsandîye û dibêje ji bo ku ziman pêşva here û dewlemend bibe divê her tim bê axaftin. Sağniç ziman dişibîne gîsin û dibêje çawa ku gîsin dema neyê xebitandin, zeng digire, pûç dibe û ji kar dikeve, ziman jî dema neyê bikaranîn, pêşî peyv jê dikevin û winda dibin. Paşî hêdî hêdî jar û qels dibe û ber bi windabûnê ve diçe.” (1994: 15)

Dîsa di nav civaka Kurd da straneke navdar ya ku gotinên wê ji hêla helbestvan Şikoyê Hesên va hatiye nivîsîn û behsa zimanê kurdî dike jî êdî li ser zimanê her kesî ye. Çend rêzikên wê stranê wiha ne:

Bi xeml û rewş e,



Şêrîn û xweş e  
Şêrîn û xweş e  
Zimanê kurdî

Bi xweş awaz e  
Letîf û naz e  
Letîf û naz e  
Zimanê kurdî

Beyta Feqî ye  
Kubra Xanî ye  
Kubra Xanî ye  
Zimanê kurdî<sup>2</sup>

Wek di gotinan da jî tê dîtin helbestvan pala xwe daye zimanê xwe yê dayikê û behsa xweşbûna zimanê xwe kiriye. Di gotinan da kodên neteweyî û çandî jî xwe didin der ku mînak behsa Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî tê kirin. Di dîrokê da gelek rewşenbîr, zimanzan, nivîskar û helbestvanên kurd bangî gel kirine ku ew bi rêya ziman bibin yek, dijî mêtînger, dagirker û tevgerên kolonyal ziman biparêzin, şûna xizmeta zimanên din xizmeta kurdî bikin û dîroka xwe serbilind bibin. Cegerxwîn, Xelîl Xeyalî, Qedrîcan, Celadet Alî Bedirxan, Evdîrehîm Rehmî Hekarî, Ordîxanê Celîl, Casimê Celîl, Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Pîremêrd wek çend navên sereke dibe bên rêzkirin. Her wiha kovarên Hawar, Jîn, Rojî Kurd, rojnameyên Kurdistan û Riya Teze jî weşanên sereke ne ku berpirsyariya vê armancê hildane ser xwe.

Em li vir dikarin bibêjin bi saya ziman û dengbêjên ku bi zimanê kurdî bi kar anîne bîreke civakî û çandî ava bûye. Ziman li hemberî bîra fermî li ber xwe daye, bûye avakerê bîreke dij ya ku bîra serdest qebûl nake. Li ser vê mijarê wê paşê bi hûrgilî bê rawestî.

### 1.5.3. MEKAN

Meriv di jîyanê da heta mirinê hewl didin tiştan pêk bînin û piştî mirinê jî şopa wan li dû wan bimîne. Ewil xwe û der û dora xwe pênase dikin, hebûna xwe qebûl dikin, ji alav, xurek û hunerê bigire heta gelek tiştên taybet hilberînin û paşê rastiya

---

<sup>2</sup> Bnr. Ev stran li ser înternetê pêkan e bê guhdarîkirin  
<https://www.youtube.com/watch?v=W10df5jEQR0>

mirinê yanê jiholêrabûnê qebûl dikin. Piştî qebûlkirina mirinê dixwazin li dû wan mekan, huner, fikr û raman bi kurtasî tiştên ji bo însanan bi qîmet in bimînin. Ev hemû jî bîrê û çandê ava dikin. Di vê beşê da em dikarin behsa mekanê bikin ku jiyana merivan li mekanaan derbas dibe. Avahî, dibistan, mizgeft, dêr, perestgeh, sazî, gund, bajar, kuçe, kolan û gelek cihên din ên ku têkiliya merivan bi wan ra heye tesîrê li ser bîra merivan dikin. Heta wisa ku di salên dawîn da albumên tê da wêne tînan parastin, defterên not li ser tînan nivîsandin, ewraq û dosyayên noterê jî ji hêla dîroknan ve wek mekanên bîrê tînan nixandî (Nora, 2006: 14)

Meriv dema li cihekî dijîn ji bo ku ew der ji wan ra bibe jîngeh, pêwendiyêke rûhî bi wê derê ra çêbibe hewl didin, guherînan dikin, berheman ava dikin, şopên dîrokî lê dihêlin. Piştî van hemû tiştan ew abîde, avahî, kuçe, kolan, muze, pirtûkxane, salonên sînema û şanoyê, cihên konser lê çêdibin, cihên îbadet lê tînan kirin, rê, bazar, çayxane, qehwexane, cihên huner lê tînan kirin, mal, kargeh û hemû mekan dibin qada bîrê. Lewra mîratek, bîrek, rûhek, kevneşopiyek, dîrokek li wir ava dibe û bîreke hevpar derdikeve holê. Halbwachs behsa têkiliya di navbera bîr û mekanê (cih) da dike û dibêje çawa ku bîr mekanê ava dike, mekan jî bîrê ava dike. Halbwachs destnîşan dike şopên mekanî him rastî bîrê tînan û him jî modifikasyonên nû ava dikin. Li gor nêrîna wî bîranînek ji bo ku demeke dirêj bijî pêdiviya wê bi mekanê ra heye, lewra ew bîranînan li mekaneke derbas bûye. Bêyî mekanê bîranînan fantasma ye, pêbaweriya wê tune û di nav demê da ji holê radibe (Çelik, 2015).

Di nav mekaneke bîrê da cihên ewil tînan hişê me kuçe, kolan û meydan in ku ew di nav bajaran da xwedî cihekî taybet in. Danûstendin ji dikan û kargehên li ser van kolanan tînan kirin, însan li ser van kuçe û kolanan dimeşî, diçin malên xwe û karên xwe. Zarok di van kuçe û kolanan da dileyîzin, jin bi hev ra li ser piyan li van deran sohbetê dikin. Bi kurtasî kuçe û kolan û meydanên bajaran di bîra civakî da xwedî roleke mezin in. Civak navê hin şexsiyetên navdar ên di wê civakê da rêber, rûspî an jî qedirbilind li van kuçe û kolanan dikin ku navê wan bê parastin, abîde û peykerên wan li van cihên hevpar datînin ku şopa wan neyê ji bîr kirin ku ev hemû bi bîrê ra eleqedar in. *Kolana Avenue des Champs Elysees* (Şanzelîze) ya li Parîsa paytextê Fransayê, *Kolana Îstiklalê* ya li Stenbola Tirkiyeyê, kuçeyên teng ên Mêrdînê, kuçeyên Sûra navçeya Diyarbekirê, Meydana *Times Square* ya li New Yorka Amerîkayê, Meydana Tehrîrê ya li Qahireya Misrê, Meydana Çarçirayê ya li Mehabadê, Meydana

Şêx Seîd ya li Diyarbekirê, Meydana Sor a Moskovaya Rûsyayê, *Piazza del Campo* ya li Sieneya Îtalyayê û hwd wek mekanên bîrê dibe mînak bên nîşandan.

Di navbera mekan, nasname, bîr û zemanê da têkiliyeye xurt heye. Di çanda bibîranînê da, rê û rêbazên xurtkirina bîra civakî û çandî da mekan di rêza serî da cih digirin. Mekan him ji bûyer û çîrokên behsa wan tînin kirin ra dibin malxwe û him jî agahiya civakî ya ku tê vegotin ra ji nû va şikil digire. Pierre Nora dibêje di serî da bermayî (ruin), muze, arşîv, goristan, cejn, salveger, peyman, zabitname, cihên pîroz, komele û hwd yê mekanên bîrê ava dikin şahidên serdemeke dinê ne û xeyalên bêdawîtiyê ne (1994: 23). Wek Nora jî bale dikêşe ev hemû bîra civakê ava dikin, ji rabirdûyê heta îro pîreyekê çêdikin ku endamên civakê bi saya wê pîreyê diçin şopa dîroka xwe û têkiliya wê bi îro ra girê didin. Ji ber vê ye ku tesîra erk û desthilatîyê li ser bîrê zêde ye, wek ku di dîrokê da jî gelek caran tê dîtin dema li cihekî desthilatdar biguherin, mêtîngerî çêbibe, erk bikeve destê hinekên din ew ji bo hebûna kesên li wir ji holê rakin ewil dest diavêjin van hêmanên bîrê û wan ji holê radikin. Bi vê tevgerê va dixwazin pêwendiya civakê bi bîrê, çanda neteweyî ra qut bikin ku gotina xwe rehetir bidin kirin. Ji ber vê ye mekanan, peykeran, muzeyan, arşîvan, îbadetxaneyan û gelek tiştên bi vî rengî an ji holê radikin, hildiweşînin û dişewitînin an jî li ser wan hin guherînan dikin, bi rûyekî nû didin van tiştan ku civak êdî wek berê wan bi bîr neynin û têkiliya xwe ji wan qut bikin. Frantz Fanon jî balê dikişîne ser vê tevgerê û dibêje çanda neteweyî ya di bin zexta mêtîngeriyê da maye dibe çandê wisa ku ew bi awayekî sistematîk bê tunekirin û mehkûmê dereqanûniyê bibe (2020: 231).

Di nav mekanên bîrê da wek ku me di hevokên ewil da jî anî ziman muze gelekî girîng in. Muze ew mekan in ku çand, dîrok, nasname û bîra civakî lê tê parastin. Li van cihên ku meriv dikare bibêje zeman lê sekiniye bîra civakî çawa ku tê parastin û wisa jî dewrî nifşên dahatûyê dibe. Lewra sembol û metaforên bûyerên qewimî, alavên di rabirdûyê da hatine bikaranîn, belge û alavên şexsan ên di nav demê da jiyane, huner û çanda ku li ser rûyê dinê şopa xwe hiştiye bi saya van mekanan radigihêjin roja îroyîn. Belge, dîmen, alav, koleksiyon, neqş, nivîs, sembol û hemû tiştên yek bi yek di muzeyan da tînin parastin şopên bîra civakî ne. Li dinyayê gelek muzeyên navdar hene ku ji wan çend heb ev in; Muzeya *Vatikanê* (Vatîkan-Îtalya), Muzeya *Louvre* (Parîs-Fransa), *Rijksmuseum* (Amsterdam-Hollanda), Muzeya *Topkapıyê* (Stenbol-Tirkiye), *Hermitage* (St.Petersburg-Rûsya), *British Museum* (Londra-Îngiltere), *Metropolitan Museum of Art* (New York-Amerîka), *Egyptian Museum* (Qahire-Misir). Li

Amerîkayê Muzeya *National Museum of African American History and Cultur* ya li paytext Washingtonê jî muzeyeke balkêş e. Ev muze jî wek mekanekî bîrê dîroka kesên çermreş (reşik) yê ji Afrîkayê wek kole anîne Ewropa û Amerîkayê bi gelek wêne, dîmen, alav û muzîkan radixe ber çavan. Dîsa muzeya Cihûyan a *Museum of Jewish Heritage* ya li New Yorkê di 1997an da hatiye vekirin jî der barê komkujiya Cihûyan, jiyana, çand û dîrokan da gelek bîranînan diparêze ku ew jî ji bo tîkiliya bîr û mekanê xurt nîşan bide li ber çavan e. Ji bo Kurdan jî mînak herî baş Muzeya Helebçeyê ya li Hewlêrê ye. Muzeya Helebçeyê bi alav, belge, dîmen û tiştên tînan parastin va mekanekî bîra civakî ye, him bûyerên Komkujiya Enfalê û ya Komkujiya Helebçeyê (16ê Adara 1988an) diparêze û him jî wê bîrê digihîne dahatûyê. Herî dawî dibe bê gotin ku jimara muzeyên li ser navê şexsan û yê bi tenê bi mijarekê ra (wêne, peyker, cil û berg, alavên muzîkê hwd) eleqedar in jî her ku diçe zêde dibin.

Bajar jî di hişê merivan da wek mekanên bîra çandî xwedî cihekî taybet in û tesîra wan li ser jiyana û bîra civakî hene. Meriv li bajarên tenê bi fizîkî cih nagirin, bajar ji wan ra dibe sitargeh, cihekî taybet, li wir cihê sînorên nasnameya wan ava dibe, cihê ku ziman tê axaftin ew der e, bîranîna lê çêdibin, çand û kelepora civakê lê dimeşe. Ji ber van sedeman di navbera merivan û bajarên da tîkiliyêke taybet ava dibe, ew xwe perçeyekî bajêr dibînin, ev der ji bo wan wek hêlnekê ye. Dema ji ber sedemên wek şer, koç, sirgûn, siyasî û aborî ew mecbur dimînin ji bajêr veqetin wek ku nasnameya wan ji dest çûye, her tişt di bin piyan da maye hîs dikin. Halbwachs ji bo vê mijarê dibêje dema kesek mala lê dijî terk dike wek ku perçeyekî xwe li wir bihêle dihesibîne, lewra çarçoveyêke mekanî wînda dibe û hemû bîranînan bi vê çarçoveyê ra eleqedar in talûkeya jîholêrabûnê ra rûbirû dimînin (Halbwachs 2016: 134).

Rûhê bajarên heye, ew ji ber hin bûyer, şexs an jî tiştên xwe yê taybet va dibin simbol, di hişê însanan da bi wan taybetmendîyan va cihê xwe diparêzin. Wexta behsa hin bajarên dinyayê tê kirin di hişê mirovan da çend tişt derdikevin pêş. Mînak *Paris* wek bajarê evînê, *Chicago* wek bajarê mafyayê, *Zurîh* wek bajarê banka û dewlemendan, *Las Vegas* wek bajarê qumarxaneyan derdikevin pêş (Bilgin, 2013: 131). *Konya* wek bajarê Mewlana, *Hiroşîma* wek bajarê bombeya atomê lê hatibû teqandin, *Vietnam* bi şerê ku lê hatibû kirin, *Srebrenitsa* û Helebçe jî bi komkujiya ku li vir hatibû kirin va tînan hişê însanan. Henri Lefebvre behsa Venedîka (*Venice*) bajarê Îtalyayê ya bi kolanên xwe yê çem dikişin navdar e dike û dibêje mekanekî wek wêneyek an jî peykerekî xwedî îfadeyêke xurt û meneyan di xwe da dihevine,

mekanekî tekane, lê yekgirtî ye. Kolanên av lê hene, kuçeyên bi keviran hatine çêkirin ne beranberî hevdu ne, bi hev ra mekanekî xurt ava kirine (2016: 100).

Dîsa hin bajarên li Rojhilat yên wek Nîşabur, Mekke, Medîne, Tebrîz, Semerqend, Bexda, Şam, Îsfehan û Qahire jî di dîrokê da bûne bajarên bi nav û deng û mora xwe li ser dîrok û çandê xistine. Li ser van bajarên berhem hatine nivîsandin, helbest û kilam hatine gotin, lewra ew ji hêla bazirganî, çand, dîn û kevneşopê va bajarên qedîm in. Gelek gerok, mîsyoner û alimên Rojhilatî hatine van deran û der barê van bajaran da seyahetname nivîsandine. Helbet di nav dem û dewranê da tesîra zeman li ser bajaran çêdibe û ew him ji hêla fizîkî û him jî ji hêla mene, jiyana û çandê va diguherin ku ev jî tesîrê li ser hestên însanan dike. Felsefenas Paul Ricoeurê li ser mijarên bîr, dîrok û jibîrkinê pirtûkeke berfireh a bi navê (*Bîr, Dîrok, Jibîrkin*) nivîsiye tesîra zeman a li ser mekanan tîne ziman û dibêje bajarek di heman mekanan da heyamên cuda pêşwazî dike, bermayiyên zewq û şiklên çandî nîşan dide. Bajar cihê ku him lê tê jiyîn û him jî cihê ku divê bê analîzkirin e, bajar hestên cuda û tevlihev dide destpêkirin (2017: 171).

Heke em vegerin ser bajarê Enqereyê ya di beşa têkiliya bîrê û kilamên Şakiro da bi hûrgilî behsa wê bê kirin ew jî paytextê Tirkiyeyê ye û ji bo her kesê ku li Tirkiyeyê dijî fermiyetê, qanûnan, cihên ku serkirdeyên dewletê lê dijîn temsîl dike. Lê ji bo Kurdan Enqere navenda dewletê ye ku qanûn ji wir derdikevin, ferman li wir tînin dayîn, qedera însanan li wir di nav du lîvên temsîlkarên dewletê da ye. Temsîliyeteke neyînî ya Enqereyê di bîra civaka Kurdan da heye ku di kilamên dengbêjan da ev tê bilevkirin, em ê di beşa sêyem da behsa vê mijarê bikin. Lê niha ji bo ku em nimûne nîşan bidin wek mekan yanê bajar Enqere di bîra Kurdan da çawa temsîliyeta fermiyetê dike û çawa cihê ku lê ferman tînin dayîn tê hesibandin em çend rêzikên kilameke ku Dengbêj Şakiro dibêje bidin. Ev kilam bi navên cuda tê pêşberî me ku jê yek “Mala Mehmûd Begê” û ya din jî wek “Heseno Lo Lawo” hatiye nivîsandin. Di perçeyekî kilamê da wiha dibêje;

“Bekirê Axê bi sê denga ba dikirî go Heseno lo lawo

Ez tu cara terka şewitî golê nadim

heyani fermana mi ranebe ji Şam û Heleb ji Anqerê ê hê yê, hê yê, hê yê,

hê yê yê Diyarbekir

Ax delîlim yadê, seflim yabo, firar im wayê wax wayê”<sup>3</sup>

Dema em berê xwe didin kilamê tê dîtin ku ferman ji hin bajaran tê. Me behsa Enqereyê kiribû û li vir jî tê dîtin ku ew dibêje heta ferman ji Enqereyê neyê ew terka golê nake. Enqere fermiyetê, qanûnan, fermanan, dewletê û hêzê temsîl dike. Ji bo Kurdistan heke behsa yek ji mekanên bîrê, bajaran bê kirin, ji bilî Enqereyê Diyarbekir jî navekî balkêş e. Diyarbekir ne tenê ji bo Kurdistan ji bo dinyayê jî bajarekî qedîm e ku di listeya UNESCOyê da jî cih digire. Li vir bazirganî tê kirin, şehirekî giran e ku nasnameyê merivan pê ra ava bûye û temsîliyeta Kurdistan dike. Enqere çiqas fermiyetê simbolîze bike, Diyarbekir jî ewqas qedîmbûnê, nêzîkbûnê, xweyîtiyê temsîl dike. Di gelek kilaman da navê wê derbas dibe û ew baş tê pênasekirin. Dêrsim (Tuncelî) jî ji bo Kurdistan bajarekî sembol e ku li wir gelek Kurd hatine kuştin. Ev bajar jî di gelek kilaman da tê bilevkirin, paşê wê bi hûrgilî behsa wê jî bê bikin.

Ricoeur balê dikşîne ser bîra mekanan û ji bo girîngiya wan bîne ziman dibêje cihên dibin mesken ji bo bînan bibîranîn mekanên biqîmet in, lewra bîranîn girêdayî van mekanan e. Dema însan cihê xwe vediguhêzin, mekanên xirabkirin, bûyerên li van deran qewimîne wezîfeya bibîranînê (*reminder*) dikin (2017: 61). Halbwasî jî ji bo girîngiya mekan û bîrê nîşan bide dibêje avahî û dîwar bi sed salan li ser piyan nasekinin, dema hûn wan biguherînin li hemberî we li ber xwe nadin, lê koma mirovan

---

<sup>3</sup> <https://www.youtube.com/watch?v=EnRjV26s3D4> 29.12.2019/21.45

Deşifreyê li ser vê lînkê înternetê ji hela me va hat kirin. Di pirtûka Ayhan Yıldız û Hanifi Taşkın ya bi navê “Şakiro Kewê Ribat” da ev kilam bi serenava “Mala Mehmûd Begê” hatiye nivîsandin (r. 343) û qîsma ku me jê mînak nîşan da jî wiha hatiye nivîsandin;

“Bekirê Axê bi sê dengê ba dikirî digo Heseno lo lawo

Ez tu carî terka Golî şewîti nadim heyani

Fermanê min ranebe ji son mehelê, ji Diyarbekir Enqerê

Delîl im yadê, sefil im yabo, firar im”

Heman kilam di pirtûka “Antolojiya Dengbêjan-2” ya ku ji hela Ömer Güneş û İbrahim Şahin va hatiye amadekirin da jî wek “Heseno Lo Lawo” cih digire û ev rêzikên me mînak nîşan dan jî wiha hatiye nivîsandin;

“Bekirê Axê bi sê dengê ba dikirî digo Heseno lo lawo

Ez tu cara terka şewîti Golê nadim

Heyani fermana mi ranebi

ji Şam, û Heleb ji Anqerê ê hê ji Diyarbekir

Ax delîl im yadê, sefil im yabo, e firar im” (r. 481)

ne wisa ye, ew li hemberî guherînekê li ber xwe didin. Lewra kesên li wir dijîn ji ber ku bîranînên wan, jiyana wan diguhere xemgîn dibin, êşê dikişînin, hêrs dibin û berxwedana xwe xurt nîşan didin (2018: 146).

Li gor vê gotina Halbwasch divê çend hevokan va behsa mekanên sirgûnê (nefi) jî bê kirin. Wek ew jî dibêje dibe ku zimanê mekanan hebe, lê însan xwedî ziman in, bertekê nîşanî guherînan didin ku yek ji wan jî sirgûnkirin e. Mekanên sirgûnê bi bîrê ra gelekî eleqedar in û balê dikîşînin. Di bîra civakî ya Kurdan da navê hin bajaran sirgûnê tîne hişê Kurdan ku ew bi darê zorê şandine van deran, Kurd li vir di nav rewşeke zehmet û stûxwar da jiyane. Lewra di bingeha sirgûnê da kokbirîn û bişaftin heye, armanc tunekirin û tepisandina ziman, nasname, çand, dîrok, vîn û bîrê ye. Di armanca sirgûnê da çavtirsandin, jidûrxistin û poşmankirin heye. Tiştê tê xwestin ew e ku ew kes an jî gel dîsa venegerin ser esl, nasname, vîn û fikra xwe û li cihê bo wê hatine şandin bîrê asîmîlekirin, bişaftin û helandin. Edward Said ji bo sirgûnê dibêje ew di navbera însan û cihê ku lê hatiye dinyayê û mezin bûye da, qûlek e ku bi zorê hatiye vekirin, di navbera kesayetî û hêlîna rastîn a kesayetiyê da tu carê nayê girtin û ne mumkin e ku meriv ji kedera wê xwe xelas bike (2006: 28).

Kesên bi zorê hatine van mekanan helbet nikarin tîkiliyeke hêsan bi van deran û gelên li vir dijîn ra ava bikin, ev jî tesîreke neyînî li ser ziman, nasname, aborî û derûniya sirgûniyan dike, şopên wan ên nebaş di nav demê da xwe didin der. Kesên tîr sirgûnkirin him ji aliyê derûnî va û him ji aliyê bedenê va tîk diçin, diçilmisin, êş, birîn û travmayên wê bi salan dikîşînin. Ji bo vê keliyê terîf bike ji kilameke Dengbêj Reso ya bi navê “Serê Quranê Elîf û Bê ye” hevokek heye, dibe mînak bê nîşandan ku ji hezkiriya xwe ra wiha dibêje;

“Delaliyê xwezila bi wê gavê, wê saetê ez hatim mala bavê te  
Min dî tu sekinî li ser kaniyê,  
Mi bala xwe da rengê te  
Fena rengê xelkê merû wan sirgûn bike  
Berê wan bide xerîbiyê...” (Güneş-Şahin, 2018: 248)

Dengbêjê navdar ji bilî kilamên şer, pevçûn û serhildanan di kilameke evînê da balê dikîşîne ser kesên tîr sirgûnkirin û berê wan didin xerîbiyê, dixwaze bîrê ziman ku ew kesên tîr sirgûnkirin êş û azara rûhî dikîşînin, ev êşa dil û derûniya wan di rûyê wan da jî xwe dide der. Ji bo hevokên dawîn ên der barê vê mijarê da Nora dibêje mekanên bîrê, ne ew tişt in tîr bîra me, lê ew cih in ku bîrê lê haveyn digire, kevneşop

bi xwe ye, laboratuvara wê ye (2006: 12). Di bin ronîya van gotinên Nora da bi çend hevokan va meriv dikare behsa mekanên kolektîf ên civat lê kom dibin û rûhekî hevpar parve dikin jî bike. Hin mekanên wek şano, sînema, konser, cihên îbadet lê tîn kirin, malên dengbêjan, dîwanên dengbêjan dibe di nav çarçoveya vê da bîn nirxandin.

#### 1.5.4. DÎROK

Gotineke pêşiyana Afrîkayê dibêje “Heke neyê zanîn ka ji ku tê, nayê zanîn ka diçe ku jî.” (Başkaya, 2009: 7) Ger em bala xwe bidin vê gotinê wê bê dîtin ku rabirdûyeke divê bê zanîn, agahiyên der barê wê da bê hînbûn hebin da ku însan dahatûyeke baş ava bikin, ev jî dîrok e. Hobsbawm ji bo dîrokê dibêje dîrok guherînek e ku li ser îstiqameteke diyarkirî dimeşe (2001: 35). Dîrok tiştên êdî ji holê rabûne ji nû va avakirin û nivîsandin e. Di navbera îro û rabirdûyê da avakirina pireyekê ye, nivîsandina bûyer û bîranînên berê ye, veşartina şop û bîranîna wan e. Peyva dîrokê ya ku zêdetir wek ‘tarîx’ tê bilêvkirin bi zimanê akadî, hebeşî, sabî û îbranîkî ji peyva ‘yareah/yerah’ê pêk hatiye ku meneya wê ‘qamer (hîv), zeman’ an jî ‘dîtina hîvê’ ye. Ev peyv paşê wek peyva ‘erreha/werraha’ derbasî zimanê erebî bûye û ji wir jî wek ‘tarîx’ berbelav bûye. Meneya tarîxê li gor hîvê tayînkirina wextê ye, roj û sala bûyereke ku qewimiye bi reqeman va nivîsandin e, tespîtkirina bûyeran û zimanê wan e (Fayda, 2011: 30). İlber Ortaylı pênaseya dîrokê wiha dike: “Peyva dîrokê ya ku bi latînî “historia” ye bi yûnanî tê meneya agahiyê, melzemeyeke berbiçav. Bi erebî jî tarîx e ku koka vê peyvê ‘agahiya hîvê’ ye, yanê agahiya salnameyê ye (2011:11).

Heke em bûyerên berê yên di rabirdûyê da qewimîne wek xêzeke dirêj binirxînin, dîrok vê xêzê wek heyaman perçe perçe dabeş dike û paşê li ser her perçeyekê dixebite. Şexs, mekan û bûyerên wê demê, tîkiliya wan a bi hev ra û bi civakên din ra hemû tîn nirxandin û nivîsandin. Agahiyên wan bi roj û sal, yanê bi zimanê qewimî tîn diyarkirin. Assmann destnîşan dike ku civak ji bo xwe pênase bikin hewcedariya wan bi rabûrdiyê heye û dibêje nivîskarekî misrî tîne ziman ku neteweyek bi tenê rabûrdiya xwe bide jîyin dikare bijî (2018: 142). Halbwachsê ku teoriya bîra civakî xistiye nav zanistên civakî jî li ser mijara dîrokê disekine û dîrokê wek berhevoka bûyeran ya di bîra mirovan da cihekî mezin girtiye pênase dike. Ji bo armanca nivîsandina dîrokê jî dibêje: “Hewcedariya nivîsandina dîroka heyamekê, komekê heta kesekî dema ew kes, kom û bûyer di rabirdûyê da dimînin, êdî li der û



dora me tu şahidên bîranînên wan biparêzin namînin, a wê hingê ev pêdivî derdikeve holê” (Halbwachs, 2018: 78).

Di rabirdûyê da her tim hewcedariya însanan bi nivîsandina dîrokê çêbûye, kesên jê ra dibêjin ‘dîroknas’, ‘dîroknûs’ bûyeran li gor sal, roj, heyam û mijarên wan nivîsandine. Dema dîrok tê nivîsandin gelo bêalî tê nivîsandin an na? Divê ev pirs bê pirsîn û li ser vê mijarê bê rawestîn. Nora dibêje dîrok tesewîra rabirdûyê ye, malê her kesî ye. Dîrok karekî hişî (zêhnî) û jihev cudaker e ku ji ber vê hewcedariya wê bi analiz, bêjar (*discourse*) û rexneyê heye, bîrê davêje derva û wê pespaye (*vulgarization*) dike (2006 :19). Wek Nora û gelekên din jî bilêv dikin dîrok bêalî nîne, gelemperî li gor berjewendiyên serdestan tê nivîsandin. Qehremanî, başî, tiştên erenî yê miletekî tî vegotin, pesnê wan tê dayîn, hemû xirabiyên wan tî veşartin, an jî bi awayekî erenî tî veguhaztin. Dîroka kesên din jî biçûk tê dîtîn, ew nebaş tî terîfkirin û bi agahiyên şaş an jî manîpulatif va ew neyînî tî sembolîzekirin. Ji ber vê ye kesên dijî dîroka serdestan in her tim vê gotina pêşiyên afrîkayîyan vedibêjin “Heta şêr xwedî dîroka xwe derkevin, çîrokên nêçîrvaniyê wê her tim pesnê nêçîrvanan bidin.” Di dîrokê da her çiqas serdestan li gor xwe dîrokek ava kiribin jî yê dijî wan jî hewl dane hêza wan tîk bibin, agahiyên şaş hatine nivîsandin û belavkirin ji holê rakin.

Li gor Connerton avakirina dîrokê ne girêdayî bîra civakî ye, lewra agahiya hemû çalakiyên berê yê ji hêla mirovan va hatine kirin ancax bi rêya şopa wan mimkun e bê bidestxistin. (2014: 27) Bilgin jî dibêje dîrok tiştên êdî tunene, ji holê rabûne bi kêmasî û xwedî pîrsgirêk ji nû va tesîs dike, lê berevajî wê bîr her tim di dema niha da dijî, aktûel e. Ji ber ku xwe dispêre hîs û pejnê bi agahî û hûngiliyan va li hev tî, ji bîranînên taybet û sembolîk avê vedixwe û bîranînan pîroz nîşan dide (2013: 68).

Merivên berê gelemperî ji bo ku ji rabirdûyê dersekê hildin, bizanibin çi qewimiye dîrok dinivîsandin, dixwendin û şîrove dikirin, lê îro civak li ser hîmên din dîrokê dinivîsin û şîrove dikin. Jiyana nû rewşeke wisa ava kiriye ku dîrok ji bo avakirina dahatûyê û li gor berjewendiyên serdestan tê nivîsandin ku ev jî manîpulasyonê, serobinokirina agahiyan û şaşnivîsandina bûyeran derdixe holê. Wek Hobsbawn jî tîne ziman dîrok ji hêla îdeolojîk va tê îstismarkirin ku ji derewan zêdetir anakronîzm, mît û îcad tîne kirin, hewl tê dayîn ku fikra “em ji yê din cudatir in, baştir in” meşrû bê nîşandan, polîtîkayeke nasnameyê bê avakirin (Hobsbawn, 2001: 12-

13). Helbet cureyên anakronîzmê hene, lê di qada dîrokê da gelemperî bizanetî şaşî û texprîfat tên kirin, agahî û bûyer tên berevajîkirin. Başkaya jî bo dîrokê dibêje bûyerên berê qewimîne li gor hewcedariyên desthilatdaran tên honandin ku ji bo vê jî hewl tê dayîn bîra civakî bê tunekirin, bîra fermî bê nivîsandin. Başkaya ji bo armanca nivîsandina dîroka fermî jî wiha dibêje: “Armanca dîroka fermî avakirina îdeolojiya fermî ye. Welhasil ji bo avakirina îdeolojiyê avakirina dîroka fermî, ji bo avakirina dîroka fermî jî tunekirina bîra civakî, guhertin û xirabkirina bîra civakî hewce dike da ku bîreke li gor pêdiviyên serdestên îro çêbibe.” (2009: 7)

Halbwachs dema behsa mijara jinûvanivîsandina dîrokê dike mînaka fetihkirina Qudsê dide. Quds dema ji hêla cihû, xirisityan, misilman û romayîyan va tê fetihkirin her yek li gor nêrîn û fikrên xwe dîroka wê ji nû va dinivîsin, navenda wê diguherin. Halbwachs bi vê mînakê va dixwaze bibêje dîrok ji nû va tê nivîsîn û mînaka Qudsê nîşan dide ku tu navendeke menewî ya ku emrê wê dîrêj e tune (Sennet, 2017: 19). Heke em berê xwe bidin mijara dîroka fermî, jinûvanivîsandina dîrokê, guhertin û tunekirina bîra civakî em dikarin bibêjin civakên ji bîra xwe ji dûr ketine, bûne nebanê bîra xwe û bîra wan hatiye tunekirin rehetir dikarin bên asîmîlekirin, birêvabirin, zor û zext li ser wan neyê kêmkirin ku desthilatî bê parastin. Lê gelemperî serpêhatiyên travmatîk, êş û azarên bi hev ra hatine kişandin, şahidiya kesên bûyerên nebaş dîtine li hemberî vê dîroka fermî bîreke dij û rabirdûyeke hevpar ava dike ku ev jî bîra civakî ye û bi qîmet e.

Di vê xalê da divê hinekî behsa dîroka devkî jî bê kirin. Dîroka devkî qadeke xebatê û rêbazek e ku agahiyên rabirdûyê yên di bîra kesan da mane berhev dike, jiyana kesan a rojane qeyd dike, bi taybetî bi kesên wek “ne dîrok in” an jî “yên din” tên nirxandin va diaxive (Kardaş, 2017: 6). Dema belge kêmbin, hindik bin, an li holê alîgiriyek hebe dîroka devkî derdikeve meydanê û asoyên nû li ber însanan vedike. Dîroka devkî wek çavkanî berê xwe dide şahidan, bîranînên wan û gotinên wan ên der barê bûyeran da. Çavkaniyên bîra devkî ji jiyana mirovan, efsaneyan, çîrokên gel, mîtos û menqîbeyan pêk tê. Ji ber vê mimkun e wek dîrokeke alternatîf û dijber jî bê nirxandin. Dîroka devkî li gor dîroka nivîskî û fermî yên li gor berjewendiyên serdestan tên bikaranîn pala xwe dide bîrê û şahidên di rabûrdiyê da bûyer li serê wan qewimîne, êş kişandine, travma ji bîr nekirine, ji ber vê gelekî girîng e. Leyla Neyzi jî balê dikşîne vê xalê û dibêje bîra devkî dikare feydeyê bide vekolîna bûyerên bûne mijara nîqaşê yan jî hatine piştguhkirin (2013: 10). Li vir xalek jî heye divê bê gotin

dîroka devkî gelemperî ji bo dîroka nêzîk pêkan e, lewra şahidên bûyeran jî piştî demekê dimirin û ev dîroka bi guhdarîkirina wan, xwendina rojnivîsk û pirtûkên wan tê avakirin jî dixitime. Der barê dîroka devkî da meriv dikare çend gotinan jî ji Stephen Caunce veguhêze. Caunce dibêje dîroka devkî dikare qeyd bike ka mirov der barê bajarok, gund û taxên xwe da çi difikirin, li hemberî hemû kêmasiyên van mekanan kîjan tişt dikarin van mekanan bikin mekanên mirovî ew dikare li ser van xalan lêkolînan bike. Bîra devkî şûna ku dozerek li ser rabirdûyê derbas bibe dikare bibe alîkar ku hesta jinûvaavakirinê zindî bike (2018: 46).

#### **1.5.4.1. Cudahiya di Navbera Dîrok û Bîra Civakî da**

Dîrok û bîr herdu jî li ser rabirdûyê û bûyerên berê qewimîne kûr dibin û li ser wê dixebitin, hinekî jî dikevin nav sînorên hevdu, lê di navbera wan da ji hin aliyan va çend cudahî hene ku Nuri Bilgin wan bi çend xalan ve tîne ziman. Li gor Bilgin, di vegotina dîrokê da zimanê “em”ê nayê bikaranîn, lê vegotina bîra civakî divê li gor şiklê aîdiyetê bê nivîsandin. Naveroka ku dîroknas ava dike cuda ye, ew hewl dide bûyeran di nav pergaleke ji dûr va fêhm bike û tê bigihêje, lewra dîrok lêkolîn û lêpîrsînek e, lê ya bîra civakî (bi taybetî bîra zindî) herêmî ye, bi rêya jiyane ava dibe. Bîra dîrokî wek tevgera zanistekî ji nû va avakirina rabirdûyê ye, lê bîra civakî berevajî vê şopa wan digihîne nîşan. Herdu jî ji hevdu dûr nînin, lê divê neyên tevlihevkirin. Bîra civakî ji bo ku rûhekî dîrokî bide wê nasnameya hewl tê dayîn ku bê avakirin, kûrahiyekê bide wê û di nav endamên civakê da hesta ew heman qedere parve dikin bide jiyîn dixebite. Bîr rabirdûyê rasterast naporêze li gor bendewarî û hewcedariya şexsan û koman xizmetê dike, ji ber vê eşkere ye ku armanca wê ya “divê rast be” tune. Komên bi daxwaza nasnameyêke cuda hewl didin, şûna dîrokên neteweyî behsa dîroka xwe dikin ku ev jî bîreke civakî ava dike û li hemberî dîroknasan meydanxwendinek e (2013: 28-31; 33).

Her çiqas dîrok û bîra civakî bikevin nav sînorên hevdu, gelek nivîskar û ramangêr li ser xalên wan ên cuda bisekinin jî, xala wan a hevpar ew e ku bîra civakî dîroka gelan e, dijî bîra fermî ye, li gor dîrokê zindî ye, li hemberî xirabkirin û manîpulekirinê berxwedêr e. Li gor Nora bîr teqez e, lê dîrok tiştên îzafî dizane, di navenda dîrokê da nirxandineke hewl dide bîra xwezayî hilweşîne heye. Ji ber vê, li ber çavê dîrokê bîra ku dîrok hewl dide wê xirab bike û paşguh bike her tim bi şik e. Nora cudahiyan di navbera bîrê û dîrokê da dîsa didomîne û dibêje dîrok tiştên êdî

tunene ji nû va ava dike, le ev her tim kême û xwedî pirsgirêk e, Lê bîr her tim rojane ye, di dema niha da dijî (2006: 19). Bi dayina van agahiyan va derdikeve holê ku di navbera dîrok û bîra civakî da hin cudahî hene ku girîngiya dîroka devkî jî li vir derdikeve holê, lewra ew piştî xwe dide bîrê û şahidan ku jixwe me jî di vê xebatê da hewl da em li ser van xalan hûr bibin.

### **1.6.5. TEVGERÊN BEDENÎ (BODILY PRACTICES)**

Beden (laş) bi terîfa xwe ya fizîkî perçeyê jîndaran ye ji bilî ezayên serî, mil û çîpan e (Bakırcıoğlu, 2012: 139). Lê ew bi mene û cismê xwe va ne tiştê wiha sade ye, beden ne tenê navgîneke dervayî ya kesayetîya me ye, ew ji tecrubeyên me ava dibe. Mene û îfadeyan nîşan dide (Bourse, 2009: 163). Her çiqas ji hêla fizîkî va evqas hêsan bê pênasekirin jî mijareke hêsan nîne. Di dîrokê da li ser bedenê her tim nîqaş hatine kirin. Aliyekî gotiye beden şexsî ye, aliyê din jî gotiye beden ne şexsî ye, ew aîde civakê ye. Çawa ku di serdemên berê da hatiye pirsîn di jiyana modern da jî li ser mijara bedenê û tevgerên bedenî pirsî “beden ya kî ye, xwediyê wê kî ye?” hatiye pirsîn. Ji hêla şexsî, tenduristî, dînî, mewqî û meqamê va nerînên cuda li gor xwe bersiva vê pirsê didin. Yê girîngiyê didin şexsan dibêjin beden şexsî ye û divê şexs bi xwe der barê wê da biryarê bidin. Yê dewlet, dîn û hêza serdestan diparêzin jî dibêjin heqê dewletê û dîn li ser bedena şexsan heye û ancax ew dikarin biryaran bidin. Ji bo vê jî der barê kurtaj, otanazî (euthanasia), rojiya mirinê, rojiya birçîbûnê, îdam, xwekuştin û mijarên bi vî rengî da herdu alî li gor fikrên xwe nêrînên xwe parve dikin û dixwazin fikra xwe bidin qebûlkirin (Karaaslan, 2014: 120). Îro hê jî der barê van da gelek tiştên gotin, nîqaşên kirin û wisa xuya ye wê dewam jî bike.

Li dinyayê gelek jin li ser wê fikrê ne ku beden şexsî ye yanî ya jinê ye, heke jin bixwazin divê ew ducanî bimînin û zaroka xwe bînin dinyayê, dema nexwazin dikarin zaroka xwe bi kurtajê hildin an jî zara wan li ber wan biçe. Lê malbat, erkên dînî, mêr û dewlet dibêjin ev qetl e, biryara vê ne di destê jinê da ye, jîndarek li gor kêfa jinê nabe bê kuştin û divê mudaxele li bedena wan bê kirin. Ji ber vê qanûnên ku rê li ber vê yekê digirin dixin rewacê da ku ev tişt neyê kirin. Nêrînên ‘şexs azad in, çî dixwazin dikarin bikin’ û yê dijî vê derdikevin û dibêjin ‘azadî jî heta astekî ye, sînorên wê hene’ gefê li hevdu dixwin û tên li hemberî hevdu.

Der barê bedenê da dîsa mijareke din jî ew e ku kesên giran nexweş dikevin û bi salan erdê dimînin, yan jî yê kal û pîr dibin û êdî naxwazin bikevin li ber destan û

bijîn, dibêjin beden şexsî ye û heqê jiyânê di destê şexsan da ye. Ev kes dibêjin dema şexs bixwazin divê alîkariya wan bê kirin ku ew dawiyê li jiyana xwe bînin, navê vê jî wek otenazî tê binavkirin. Li vir jî dîsa heman erk yanê malbat, dîn û dewlet dengê xwe bilind dikin û dibêjin ev ne mumkin e, lewra jiyân pîroz e, kuştina kesekî qetl e û divê ev yek neyê kirin. Ji bo vê qanûnên otenaziyê qebûl nakin û naxin rewacê. Lê di 14ê mijdara 2020î da hikûmeta Hollandayê plana destûrê da otenaziyê ku zarokên temenê wan di navbera 1 û 12yan da ne û nexweşiyên wan ên giran ên dibin sedema mirinê hene pesend kir. Li hin welatên din jî ji bo ew bikeve rewacê nîqaş dewam dikin. Ji ber ku em li ser bedenê û otenaziyê diaxivin di vê mijarê da filmeke balkêş heye ku behsa çîrokeke rastîn dike û divê navê wê li vir bê bilêvkirin. Navê filmê *The Sea Inside* (Behra Di Hundirê Min Da) e. Fîlm di sala 2004an da ji hêla derhênerê îspanyol Alejandro Amenabar va hatiye çêkirin û behsa jiyana rastîn a nivîskar Ramon Sampedro Camean dike. Ji hêla mijarê û lîstikvanîyên baş va filmê gelek xelat hildane. Serlehengê filmê Javier Bardem (Ramon) ji ber qezayekê di 26 saliya xwe da felc dibe, ji bilî serî nikare bedena xwe bixebitîne û ji ber vê 30 salan li erdê dimîne. Dema dixwaze jiyana xwe dawî bike hiqûq, dewlet, dîn û malbat li hemberî vê yekê disekin. Axaftinên li ser bedenê, mafê jiyânê û mirinê yên di navbera Ramon, keşîş û yên din da gelekî balkêş in.

Di mijara rojîya birçîbûnê, rojîya mirinê, îdam û xwekuştinê da jî her tim nîqaş hatine kirin û wê bînin kirin jî. Gelek sazî, sektor û navend yên wek leşkerî, tip, moda, saziyên perwerdeyê, girtîgeh, navendên bedewbûnê, teşkîlata ewlehiyê, qadên wek televizyon reklam, danasîn û mankeniyê rasterast an jî bi sergirtî li ser bedena însanan guherînan, ceribandinan dikin û mafê mudaxeleya li bedena însanan wek mafê xwe yê xwezayî dibînin (Karaaslan, 2014: 120-121). Beden ji ber ku evqas pîroz û girîng tê nirxandin her kes dixwaze li ser bedenê bibe xwedî gotin. Erkên siyasî, desthilatdar çawa mudaxeleyî mekan, dîrok, ziman, nasname û çandê dikin wisa jî mudaxeleyî bedenê û tevgerên bedenê dikin ku hiş, beden û hêza însanan li gor berjewendiyên xwe bi kar bînin. Der barê bedenê û tevgerên wê da filozofê frensî Michel Foucault jî fikrên balkêş anîne ziman û dibêje beden di qada siyasî da cih digire, têkiliyên îqtidarê rasterast li ser bedenê hêza xwe nîşan didin û wiha pê da diçe:

“Ew bedenê dorpeç dike, mohra xwe lê dixwe, terbiye dike, ezabê dide kişandin, kar pê dide kirin, ji bo merasiman zorê didê, îşaret ji bedenê tê hêvîkirin. Ji hêla siyasî va sedema dorpeçkirina bedenê ew e ku li gor têkiliyên tevlihev û beranberî hev bikaranîna bedenê

girêdayî aboriyê ye. Sedama herî mezin a dorpêçkirina bedenê ya ji hêla têkiliyên îqtidar û desthilatiyê ji ber hêza wê ya hilberînê ye” (1992: 31).

Çawa ku Foucault jî destnîşan dike îqtidar dixwazin bedenê ji bo aboriyê, kar û xebatê bi kar bînin û ji bo ku bedenê li ber hêza xwe bitewînin û di aboriyê da bi kar bînin jî sazî û qanûnan bi kar tînin. Foucault ji bo van sazî û rêyên serîtewandinê jî dibêje nexweşxane, timarxane, cih û malên sêwî lê tîn xwedîkirin, dibistan, fabrîqe, atolye û girtûgeh her yek li gor xwe disîplînekê bi kar tîne û hewl dide alîkariya îqtidarê bike ku bedena însanan, hebûn û wextê wan bê bikaranîn (2011: 126). Lewra beden dikare otorîteyan qebûl bike, serî bitewîne an jî berevajî vê dikare meydanê bixwîne û serî hilde. Wek ku tê dîtin beden û bikaranîna wê di dîrokê da jî, di jiyana modern da jî gelekî girîng e û tevgerên bedenî jî ji ber vê girîngiyê xwedî hêzekê ne.

Beden herçiqas li gor hinekan şexsî bê nirxandin jî, aliyekî wê yê civakî jî heye. Ew çawa ku tesîrê li ser civakê dike, civak jî tesîrê li ser bedenê dike. Di navbera beden û civakê da têkiliyê dualî heye ku tevgerên bedenî bi saya vê têkiliyê çêdibin. Niha em hinekî behsa tevgerên bedenî, tesîra wê ya li ser merivan, civak, rabirdû û dahatûyê bikin. Di hemû civakan da hin tevger û sembolên hevpar hene meriv meneyan lê bar dikin, li gor hin qaydeyan wan dimeşînin ku ew wek tevgerên bedenî dibe bê pênasekirin. Rabûn û rûniştin, silavdayîn, sekna li ser piyan, destdayîna li hev, hejandina serî, ken û bişirîn, deng û axaftin, jest û mimîk (gestures) yanê hereketên dest û rû hemû dikevin nav sînorên tevgerên bedenî. Her yek li gor xwe xwedî meneyekê ye û dema tîn bikaranîn peyaman didin kesên li hember. Çawa ku em fikr, nêrîn û hestên xwe bi devkî an jî nivîskî tînin ziman, em bi saya bedenê, tevgerên xwe û sekna xwe dikarin nîşan bidin û ragihînin kesên li hember. Heta wisa ku hin caran nêrînek, awirek, sekinandina li ser piyan, tevgerên dest, serî û lingan ji gelek gotinan û nivîsan zêdetir xwedî mene ne, hest û derûniya însanan nîşan didin. Ev jî cureyekî ragihandinê ye ku ne devkî û ne jî nivîskî ye, lê xwedî wate ye. Jest û helwestên (posture) me wek rêzimanekê ava bikin, hestên me û rûhê me îfade dikin. Ev tevgerên dest û bedenê gelek caran bi nezanî bin jî der barê însanan da gelek agahiyên taybet didin (Bourse, 2009: 163). Connerton dibêje dixwazî bila zanetî yan jî nezanî, şexsî yan jî komî be ev tevger hin peyaman didin ku ew wek tevgerên bedenî dibe bîn nirxandin (2014: 124). Ev tevgerên ji nîşan derbasî yê din dibin di bîrê da cih digirin û di civakê da bi awayên cuda tîn bibîranîn û bikaranîn. Endamên civakê van ji hevdu dibînin, tecrube dikin û digihînin nîşên dahatûyê. Gotin, tevger û çalakiyên di

rabirdûyê da tèn bikaranîn di nav bîra civakî da cih digirin û di dema niha da ji hela şexsan va tèn bikaranîn û wisa tèn parastin (Oral, 2018: 33).

Connertonê hewl dide nîşan bide rabirdû çawa şopa xwe li ser bedena merivan dihêle, behsa du tiştên civakî dike ku yek pratîka bedenîkirinê (incorporating practise), ya din jî pratîka qeydkirinê (inscribing practise) ye. Di ya ewil da mînak dema meriv bi yekî ra diaxivin destê xwe didin hev, dikenin an jî tiştan dibêjin. Di rastiyê da bi saya van tevgeran hin wate û peyaman didin hevdu, heta ku ew beden li wir bin ev peyam digihêjin yê li hember. Di ya duyem da jî agahî tèn qeydkirin û paşê ew bi saya ansîklopedî, bîblografya, wêne, bandên dangan û komputeran dîsa dikarin derkevin holê yanê ew têkiliya bedenana ya wê demê qût bûbû dîsa wek berê dibe bê dîtin (2014: 124). Connerton him bi devkî û bedenî û him jî bi rêya qeyd û belgeyan xweîfadekirina merivan tîne ziman û dibêje bi van awayan ev tevgerên bedenî ji nîşan derbasî nîşên din dibin, şopa rabirdûyê li ser îro çêdibe. Jixwe dema em civakekê, tevgerên wan ên bedenî dinihêrin em dibînin ku kal û bavê wan çawa tevgeriyane nîşên li dû wan hatine jî çav didin wan û wisa tevdigerin. Helbet di nav demê da hin guherîn çêbibin jî gelemperî ew tevger şopa rabirdûyê di xwe da dihewînin û wek çandekê wisa dewam dikin. Mînak Japon dema silavê didin hev serê xwe berjêr dikin û bedena xwe wek ku rêzê nîşan bidin hinekî ditewînin, Hindû herdu kefa destên xwe didin hev hinekî destê xwe ber bi singa xwe va bilind dikin silavê didin, li gelek welatan meriv destekî xwe radikin nêzîkî eniya xwe silavê didin. Yan jî dema meriv hevdu maç dikin, diçin dest û rûyê hev gelemperî biçûk destê mezinan maç dikin û dibin eniya xwe, ev hemû perçeyekî tevgerên bedenî ne.

Me ji welatan hin mînak dan, dema em berê xwe bidin civaka Kurd mînakeke der barê maçkirinê da dibe bê dayîn. Maçkirina dest û çavan di nav Kurdan da balkêş e ku ew girêdayî rêznîşandanê û hezkirinê ye. Heke em mînak nîşan bidin dema jinek deste kalekî an jî mêrekî mezin maç bike gelemperî mêr ji ber ku destmêja wî dişikê (li gor baweriya mezhebê Şafîyan) nahêle ew bê deste wî. Jin ji ber vê gelemperî diçin milê wan maç dikin (li ser cakêt, cil û berg). Yan jî di civakê da mezin diçin çavê biçûkan maç dikin ku ev jî tevgereke bedenî ya balkêş e, lewra ev hezkirineke mezin nîşan dide. Çav ji ber ku ezayê dîtinê ye, meriv bi wê dinyayê dibînin pir girîng e, ji bo wê zêdetir ew tê maçîkirin. Heta wisa ku ji bo girîngiya çav û qîmetdayîna însanan nîşan bide hin gotin jî hene. Mînak; “tu li ser serê min û çavê min ra hatî”, “çavê min birije”, “tu ronîya çavê min î”, “çav ji çavan şerm dike” û hwd. Ev tevgera bedenî

sembola rêznîşandan, hezkirin û edetan e ku di hişê merivan da cih digirin û eleqeya wan bi çand, kevneşopî û neteweyê ra heye. Wextê em bala xwe didin van mînakên hatin rêzkirin em dikarin bibêjin ew ji kal û bavan hatine hînbûn, ji rabirdûyê heta îro hatine û ewê bigihêjin nîfşên dahatûyê jî.

Gelek tevger û helwestên bedenî yên me behsa wan nekirin jî di bîrê da tên veşartin. Ew biçavdayîne, xwebixwe tên hînbûn yanê civak wan wek dersekê yan jî qaydeyekê nade hînkirin, lê Connerton dibêje di civakê da hin tevgerên bedenî bi zanetî tên hînkirin, ji bo mînakê jî rûniştandina qîz û kuran ya ji hevdu cudatîr e nîşan dide û dibêje ev di nav bîra civakê da cih digirin (2014: 125). Bi rastî jî dema em berê xwe didin gelek civakan malbat, dibistan, baweriyên dînî û edetên civakê hin tiştan hînî qîzan dikin û dibêjin qîz wiha rûnanên, wiha xeber nadin, wiha tevnagerin, wiha naxwin, cil û bergên wisa li xwe nakin, wiha nameşin û hwd. Tiştên dixwazin hînî wan bikin li gor xwe hildibijêrin û wan hînî qîzan dikin. Heman tişt ji bo mêran jî tê gotin, mînak dibêjin mêr nagrîn, mêr hestên xwe nîşan nadin, divê veşêrin, mêr xwarinê çênakin, mêr dergûşê nanihêrin û hwd. Bi gotina Connerton û van mînakên me rêz kirin jî tê dîtin çawa ku hin tevgerên bedenî xwebixwe tên hînbûn, hin tevger jî bi rêya malbat, dibistan û edetan tên hînbûn.

Heke behsa tevgerên bedenî û bîra civakê bê kirin dibe bê gotin beden tesîrê li ser bîra civakî dike, bîra civakî jî tesîrê li ser wê dike ku ev têkiliya wan a dualî her tim dewam dike. Rabûn, rûniştin, cil û berg, xwarin û vexwarin, îbadet, rîtuêl, xuy û xeysetên tên hînbûn hemû tiştên civakî û çandî ne. Çawa ku eleqeya wan bi kevneşopî, dîn, çand, siyaset û civakê ra heye her wisa eleqeya wan ji nêz va bi bîra civakî ra jî heye. Peyam, mene, fikr û baweriyên radigihînin ku ev di avakirina bîra civakî da xaleke girîng e. Ev tevgerên bedenî yên ku her tim di nav jiyane da tên dubarekirin, diherikin û der basî nîfşên din dibin bîrekê jî ava dikin. Dema civakek bê guherandin wek ku berê jî me anîbû ziman ewil li ser nasname, ziman û çandê guherîn tê kirin jixwe wisa bi wan ra beden û tevgerên bedenî jî tên guherandin, bi vî awayî jiyana rojane û qada civakê ya ku sînorên wê îdeolojiya fermî ava dike jî bi xwe diguhere. Serdest rabûn û rûniştinê, tevgeran, cil û bergan hin caran bi qanûn û rêbazên fermî, hin caran jî ji bin va hêdî hêdî bi rêya dibistan, nûçe, danasîn, bernameyên medyayê, moda, weaz û axaftinên li îbadetxaneyan diguherînin û hemû jiyane li gor xwe saz dikin. Bi rêya vê dixwazên peyamê bidin civakê ku hêz û kontrol di destê wan da ye û divê her kes li gor wê revbigere.



Însan ji hêla hin xusûsiyetên xwe va ji candarên din vediqetin ku yek ji wan jî fikr û raman e. Ew bi saya mêjî û hiş difikirin û ji ser ra çiqas wext derbas bibe jî dikarin van fikr û bûyeran dîsa bi saya hiş bînin bîra xwe. Bîr ji bo însanan nîmetekî mezin e û ji gelek hêlan va tesîrê li ser jiyane dîke. Di vê beşê da me der barê bîrê da agahî da ku em nîşan bidin bîr çiqas girîng e û çawa tesîrê li ser jiyana civakê dîke. Me destnîşan kir ku bîr, bîranîn û jibîrkirin sê têgehên bi hev ra têkildar in, hin cureyên bîrê yên sereke hene ku ew bi taybetî ew dikevin qada vê xebatê. Me kurtasî behsa bîra şexsî, bîra fermî, bîra negatîf û bîra çandî kir û me paşê bîra civakî ya ku kakilê vê xebatê ye bi berfirehî nirxand.

Zanistên derûnnasî, civaknasî û norolojiyê li ser bîrê bi salan xebatên berfireh kirine û xwestine girîngiya bîra şexsî nîşan bidin. Lê civaknasê fransî Maurice Halbwachs teoriyek ava kiriye û derxistiye holê ku çawa bîra şexsan hebe, her wisa bîra civakan jî heye û civak dikarin bi hev ra li ser bûyeran bifikirin, bi bîr bînin an jî ji bîr bikin. Ev teoriya Halbwachs ji Jan Assmann û Paul Connerton ra jî bûye palgeh û wan jî ev teorî hê pêşva birine. Me behsa fikrê van teorîsyenan kir û anî ziman ku endamên civakê her çiqas xwedî bîrên şexsî bin jî, her wisa dikarin bi hev ra bûyeran bi bîr bînin an jî ji bîr bikin, ev jî bîra civakî ye. Li gor teoriya wan me fikrên xwe parve kir ku bîra civakî ji hêla endamên civakê va tê avakirin, parastin û digihêje nîşên nû.

Pênc çavkaniyên bîra civakî ava dikin hene ku me wek nasname, ziman, mekan, dîrok û tevgerên bedenî behsa wan kir. Her yek tesîrê li ser însanan û jiyane dîke, bi têkelbûna wan di civakê da bîreke hevpar ava dibe. Şexsên civakî bi saya wan dibin xwedî bîreke hevpar û bûyeran bi hev ra bi bîr tînin. Ev beşa ewil a vê xebatê ya bi teoriyê pêk hat li ser van mijaran rawestiya û bingeha mijara me ava kir.

## BEŞA DUYEM

### 2. DENG BÊJ, ÇANDA DENG BÊJİYÊ Û DENG BÊJ ŞAKIRO

#### 2.1. ÇAND

Wextê behsa însanan û civakên cuda tê kirin peyva “çand”ê gelek caran tê bilêvkirin, tê gotin “çanda wan ne wek ya me ye” û “çanda wan ji ya me cudatir e”. Nexwe ev çand çi ye û çima ji hev cudatir e? Li ser rûyê erdê bi sedan civak, ziman û nijad hene ku her yek li gor xwe diaxive, dixwe, vedixwe, difikire, amûran bi kar tîne û dijî. Dîn, ziman, huner, kevneşopî, cil û berg, xwarin û vexwarin, xwendin û nivîsandin, tevgerên bedenî, rabûn û rûniştin, exlaq, hiqûq bi kurtasî hemû tiştên madî û menewî û amûrên tînan bikaranîn jiyanêke taybet ava dikin ku bi saya wan civakê ji civakên din cuda dibe û em ji vê yekê ra dibêjin çand.

Însan li gor candarên din bi tenê ji hêla genetîkê va nikare li siruştê bijî, ji ber vê mêtîyê wî çêkirina alav û melzemeyan û pergaleke sembolan a pêşvaçûyî hînî wî dike û ew bi saya van dikare bi rehetî bijî ku tevahiya van derfetan çandê ava dike (Emiroğlu-Aydın, 2003: 521). Yanê ji çand hemû nirxên madî û menewî ra tê gotin ku di pêşketina dîrokî û civakî de hatine afirandin û derfetê dide însanan ku ew di siruştê da bi rehetî bijî. Bi gotîneke din; tevahiya tevger, fikr û berhemên hunerî yê wê civakê nîşan didin, yekîtiya fikr û tevgera civakê pêk tînin (Bakırcıoğlu, 2012: 788) çand e. Peyva çandê latînî ye ku wateya wê ‘reşandina axê’ ye, lê di zimanên biyanî da wate guheriyê û wek ‘agahiya giştî ya zêde’ derbasî tirkî bûye û di her civakê da ji bo çandê pênasîyê cuda hatiye kirin. Sedema vê ew e ku diyardeyê (phenomenon) di civakê da pir girîng e, dibe ku di civakê din da qet girîng neyê hesabandin (Kardaş, 2017: 1).

Cureyên çandê hene ku ew çanda devkî, çanda nivîskî û çanda elektronîk e. Li ser rûyê erdê ewil çanda devkî hebûye ku bi hezaran salan mirovahî li ser vê çandê meşiyaye. Di nav demê da paşê çanda nivîskî derdikeve holê. Demeke dirêj ev herdu çand bi hev ra di jiyana însanan da cih digirin û herî dawîn bi saya pêşketina teknolojiyê çanda elektronîk rûyê xwe nîşan dide. Niha ev her sê cure çand bi hev ra hene ku li gor civakan tesîr û hikmê wan diguhere. Di hin civakan da hê jî çanda devkî xurt e, di hinekan da ya nivîskî êdî zêdetir berbelav e. Ji bo çanda elektronîk meriv nikare bibêje di demên dawîn da ew jî gelekî xurt bûye û wisa xuya dike ewê qada xwe firehtir bike.

### 2.1.2. Çanda Devkî

Ji destpêka mirovahiyê heta niha însan diaxive û guhdar dike. Însanan bi saya ziman, tevgerên bedenî (hereketên çav, dest, guh, rû û serî) gotin, nivîs û hwd di nav xwe û civakên din da têkilî danîne, bi vî awayî ji xwe ra çand û şaristanî ava kirine. Her çiqas roj bi roj hejmara wan kêr bibe jî li ser rûyê erdê bi hezaran ziman hene û însan bi wan pêwîstiya xwe ya ragihandinê pêk tînin. Beriya nivîs û çapxaneyê bi hezaran salan li cihanê çanda devkî hespê xwe daye bezê. Di çanda devkî de agahî, tecrube, ber û berhem bi kurtasî her tişt bi devkî tînin bidestxistin, dubarekirin û parastin. Paşê ew hemû bi devkî digihêjin nifşên dahatûyê û ev pêvajoyên wisa dewam dike. Gotineke berbelav heye dibêjin “gotin diçe, nivîs dimîne”, ev li hemberî çanda devkî xweparastina çanda nivîskî ye. Lewra em dizanin ku beriya nivîs bê dîtin û çanda nivîskî belav bibe gotin û deng her tim hebû û mirovahî bi saya vê çanda devkî li ser piyan ma.

Propp (1998, 14) ji bo folklorê (zargotin) dibêje ew fenomeneke edebî û hunereke devkî ye. Ev hunera devkî ya bi hezaran sala ji hela însanan va hatiye afirandin gelekî xemilî û dewlemend e. Însanan bi gotin, axaftin, biwêj, gotinên pêşiyar, destan, çîrok, zêmar, dia, nifir, lorik û helbestan çanda devkî parastine, paşê bi dîtina nivîsê çanda nivîskî derketiye holê. Rewş wisa nemaye helbet, îja piştî çanda nivîskî çanda elektronîk derketiye holê ku ew jî her ku diçe geştir dibe.

Piştî çanda nivîskî belav bû li hin welat û civakan çanda devkî hinekî qels bû, lê ew hê jî berbelav e. Walter J. Ong (2018: 21) dibêje axaftin (gotin) piştî îcadê nivîsê bi sedsalan e ji sêhra (sihr) xwe tiştek ji xwe kêr nekiriye. Gelo çanda devkî bi hezaran sal derbas bibe jî çima hê xurt e û li hemberî çanda nivîskî û elektronîk hebûna xwe diparêze? Ji bo bersiva vê pirsê bê dayîn divê pênaseya çanda devkî bê kirin û taybetmendiyên wê bîn zanîn, lewra bersiv di wan agahiyan da veşartî ye.

Çanda devkî civandina hemû danehev û agahiyên civakî yê mirovan e ku bi rêya veguhestina devkî tînin parvekirin û di nav jiyana rojane de dîsa tînin avakirin (Taş, 2015: 5). Bi gotinên Kardaş bi rêya tecrubeyan her cure agahî tînin bidestxistin, ev agahî bi rêya ber û berhemên devkî tînin parastin û sazkirin û paşê dîsa ew bi rêya van berhemên devkî digihêjin nifşên nû û tînin arşivkirin (2017: 2). Kêr zêde van pênaseyan em têdigihêjin ku çanda devkî siruştî ye û bi rêya tecrubeyan derdikeve holê. Gonca Gökalp Alpaslan (2002: 2-3) dema çanda devkî û ya nivîskî berawird dike taybetmendiyên çanda devkî xal bi xal wiha destnîşan dike:

Çanda devkî perçeyekî rituelê ye, ji wê dizê, ewil çanda devkî derketiyê hole, çanda devkî xwezayî ye, bi devkî ye, nivîskarê wê tune, gelêrî ye, bê metn e, bi devkî belav dibe û vediguhêze, xwe spartiyê jiberkirina devkî, dikare biguhere, ciyawaz be, herdem diherike, pala xwe daye bîra civakî, du kesên sereke hene; kesê vebêj û guhdar û di navbera wan da ragihandineke zindî heye, guhdar bi bûyer û leheng va dibe yek, xwe dixê şûna wî (mîmesîs) ku ji ber vê hez (kêf û tehm) çêdibe, hevpar (kolektîf) e yanê ne şexsî ye, bi rexne, xwendin an jî armancên bi vî rengî meriv nikare bizivire destpêka gotinê, girêdayî deng e û tevgerên bedenî dibin alîkar, kesan dicivîne hev; civakî ye, bi saya wê şexs kêmtir vedikişin dinyaya xwe ya hundirîn, ew bi dinyaya derva û civakê ra zêdetir dikevin têkiliyê, qalibên wê hene, dubarekirin û ritm/aheng esas in, girêdayî rewşa şênber e, dahûrandin (tehlîlkirin) û li ser lêhûrbûn tune.

Di çanda devkî da her yek endamê civakê bi zanîn, agahî, tecrube û serpêhatiyên xwe dibin perçeyekî vê çandê û li ser tiştêkê zêde dikin. Du kesên girîng ên vê çandê hene ku ew vebêj (yê ku diaxive, gotinê dibêje) û guhdar (yê ku axaftvan guhdar dike û gotinên wî/wê di mêjiyê xwe da bi cih dike) in. Di navbera wan da ragihandineke dualî, aktîf û zindî heye. Keskin der barê vê têkiliya rasterast û rû bi rû da dibêje endamên civakê ji bo hînbûna van tiştan wek şagirt naçin saziyan ji pisporan dersan hilnadin, perwerdeyê nabînin, ew ji bav û kalên xwe, dê û dapîrên xwe hîn dibin ku ji ber vê di çandên devkî da zû bi zû guhertinên mezin çênabin (2019: 140).

Çanda devkî hevpar e, di nav demê da çêdibe, li ser tişt zêde dibin û ew neqlî nifşên dahatûyê dibe. Sanders jî balê dikêşîne kolektîfbûna çanda devkî ku ew karekî civakî ye, ev hişmendiya hevpar bi hev ra tê avakirin û wiha dibêje: “Di çanda devkî da agahî ne tecrubeyê şexsî ye, diyardeyê (phenomenon) civakî ye. Ji ber vê kesek ji yekî din gêjtir an jî zîrektir nayê hesibandin” (2010: 22).

Çanda devkî ji ber ku di civakê da bi awayekî hevpar tê avakirin, di nav gel da gelekî berbelav e, ji agahiyên bi rêya tecrube, dubarekirin û ceribandinan pêk tê ew girîng e, bi hezaran sal dewam dike. Ong çanda devkî wek “çanda devkî ya yekemîn” û “çanda devkî ya duyemîn” bi du awayan dabeş dike, çandên ku haya wan ji hebûna nivîs û çapxaneyê tune û ragihandin bi tene rêya ziman pêk tê wek “çanda devkî ya yekemîn” pênase dike. Çandên ku bi rêya teknolojîya pêşketî alavên wek tîlefona, radyo, televîzyon û yên elektronîk bi kar tînin û ji ber wê wan yên ‘devkî’ hilberîn û fonksiyona wan her tişt ewil ji nivîs û metnê derdikeve paşê veguhere zimanê axaftinê jî wek “çanda devkî ya duyemîn” bi nav dike (2018: 23-24).

Bi agahiyên Ong em dikarin van xalan derxin pêş ku mirovahî bi hezaran salan li gor çanda devkî ya yekemîn jiyaye. Lewra însanan nivîs nedîtine, alavên teknolojiyê bi kar neanîne, hişê wan ji ber van alavan nehatiye sîordarkirin, têkiliyeke aktîf ava kirine. Ew bi devkî fikirîne, rabûne û rûniştine, bi bîr anîne û ev hemû agahî, zanîn û tecrubeyên xwe bi zelalî dîsa bi devkî gihandine nifşên din. Ji ber vê di çanda devkî da ziman, dubarekirina gotinan (ji bo neyên ji bîr kirin û bigihêjin nifşên din) guhdarîkirin (ji ber ku her tişt bi rêya guhdariyê tê fêrbûn guhdarî hunerek e), jibîrnekirin û parastina edet û kevneşopiyan gelekî girîng e.

Civaka Kurd jî yek ji wan civakan e ku xwedî zimanekî dewlemend e û bi saya wê çanda devkî ya xurt xwe bi hezaran sala parastiye. Wek gelek civakên din nivîs dereng gihîştîye civaka Kurd jî. Ji ber vê derengmayîne çanda nivîskî di nav Kurdan da li gor ya devkî lawaztir e. Di vê civakê da deng û gotin xurt û serdest e, loma dengbêj vebêjên herî biqîmet, parêzvanên ziman û çandê ne û tena serê xwe hêjayî xebatên berfirehtir in. Ji ber ku rola dengbêjan û çanda dengbêjiyê evqas girîng e, deng û rengê çanda kurdî digihînin dinyayê wê di vê beşê da wek perçeyekî çanda devkî bi berfirehî behsa dengbêjan û çanda dengbêjiyê bê kirin.

### **2.1.3. Çanda Nivîskî**

Dîroka mirovahiyê digihêje hezaran salan û di nav vê dema dirêj da ji bo ku bi hev ra bikevin têkiliyê û ragihandinê pêk bînin însanan gelek rê û rêbaz bi kar anîne. Yek ji wan jî nivîs e ku ew li gor deng û gotinê nû ye. Bi bikaranîna nivîsê jiyan hinekî guheriye û paşê çanda nivîskî derketiye holê. Çanda nivîskî ew çand e ku piştî çanda devkî ji xwe ra kiriye palpişt. Nivîsandin tê wateya qeydkirin, belgekirin, kontrolkirin, desthilatî, serastkirin û kodkirinê (Assmann, 2018: 276). Ji ber ku her tişt belgekirî ye bi nivîsê berpirsyarî dikeve li ser milê merivan û rêvebiryan. Ew simbol, neqş û wêneyên li ser dîwarên şikeftan hatine xêzkirin bûn bingeha nivîs û çanda nivîskî, di nav sedsalan da gelekî guherî û bi çapxaneyê gihîşte asteke bilind.

Belavbûna çanda nivîskî li her welat û deverê di heman dem û astê da pêk nehatiye. Lewra ew girêdayî çapxaneyê ye ku çapxane jî girêdayî rewşên aborî û teknolojiyê ye. Wek ku tê zanîn teknoloji li her derê zûtir pêşva naçe, şert û mercên siyasî, aborî û çandî teknolojiyê pêşva dibin. Civakên pêşketî yê ku aboriya wan baş e zû gihîştine teknolojiyê, amûrên curbicur çêkirine û ev çand pêşva birine. Bi saya van pêşvaçûnan jî ji xwe ra edebiyateke navneteweyî û kanonîk, hiqûq û qanûnên

navneteweyî ava kirine û bi piştgiriya teknoloji û çanda nivîskî hêza xwe li ser civakên din xurt kirine.

Dema em berê xwe didin çanda nivîskî du kesên girîng balê dikşînin; nivîskar (yê ku dinivîse) û xwîner (yê ku berhemên nivîskar dixwîne). Bingeha vê çandê li ser têkiliya van herdu kesan ava bûye. Di navbera wan da ragihandineke dualî heye, yek metnê saz dike, yê din jî wê dixwîne û dibe perçeyekî vê çandê. Lê têkiliya wan wek çanda devkî (vêbêj û guhdar) aktîf û zindî nîne, têkiliyeke çêkirî ye. Yanê ew rûbirûhevdu nabînin, naaxivin, pirsan ji hevdu nakin û nagihêjin encamekê. Têkiliya wan a li ser metnê ango nivîsê heye û ew wisa dewam dike.

Li gor agahiyên Neteweyên Yekbûyî li ser rûyê erdê qasî sê hezar ziman tên axaftin, lê ji van zimanan bi tenê heftê û heştêyê wan ji xwe ra edebiyatek ava kirine. Ji wan jî bi tenê pênc an jî şeş heb xwedî xwînerên navneteweyî ne, lewra li dinyayê hejmara kesên xwendî pir kêm e, lê ew hêza xwe li ser zêdetir kesan nîşan didin (Sanders, 2010: 13). Dibe ku nivîs û çanda nivîskî paşê derketibe holê, lê hêza wê xurt e û tesîrê li ser dinyayê dike. Her çiqas kesên çanda devkî diparêzên rexneyan lê bikin jî, ew textê xwe diparêze û wê biparêze jî. Ji van rexneyan em dikarin mînakê Platon ya ji devê Sokrates vedibêje nîşan bidin ku dibêje nivîs hişê însanan genî û lawaz dike, kesên hînî nivîsê dibin zû ji bîr dikin, girêdayî tiştên derva dibin, ji çavkaniyên xwe yê hundirîn winda dikin û rexneya ji bo çanda nivîsê wiha didomîne:

Nivîs di bingeha xwe da nikare bersivê bide. Heke hûn ji însanekî meneya gotinên wî bipirsin hûn dikarin bersiveke zelal hildin, lê heke hûn pirsekê ji metnekê bikin ji bilî dubareya peyvên dibin sedema pirsê -gelemperî eletewş in-tu tişt bi dest nakeve. Peyva nivîskî wek peyva devkî nikare xwe biparêze, wek axaftina xwezayî û fikirînê, di navbera însanan da danûstendina gotinê çênabe. Nivîs tebatî (pasîf) ye, ji dinyaya xwe ya derî rastiye, çêkirî ra wek komputerê girtî ye (Ong, 2018: 98).

Dema çapxane pêşva diçe bi destan nivîsîna pirtûkan kêmtir dibe, berevajî wê hejmara pirtûkên çapkirî li dinyayê zêde dibe. Xwendin û nivîsandina ku berê di destê hin kesên derfêtdar (keşîş, arîstokrat, dewlemend) da bû êdî di nav gel da berbelav dibe. Helbet wek aliyên erênî hin aliyên neyînî jî çêdibin ku li vir em ê cihê bidin rexneya Hieronimo Squarciaficcioyê. Ew rexneyê li zêdebûna pirtûk û metbeyê dike û dibêje însan li gor berê ne xwedî xîret in. Lewra ev bereket hiş mehf dike, hiş dide rawestandî, ji ber vê alava nû (wekî makîneya hesaban) jin û mîrên zana bê qîmet dibin (Ong, 2018: 99).

Rexneyên wek van yê dijî çanda nivîskî dibe bên zêdekirin, lê aliyên wê yê erênî jî hene. Ew şexsî ye yanê nivîskarekî wê heye û tesîra civakê zêde li ser çênabe. Şexsî xuya bike jî peyama ku tê dayîn civakî ye, agahî li ser zanîna civakê zêde dibe. Dema derdikeve holê mimkune bi dehan caran bê kontrolkirin, guherandin û ji nû ve bê nivîsandin, yanê şaşî û kêmasiyên metnê beriya ku ew bigihêje ber destê xwîneran dibe bên sererastkirin. Jacques Ellul jî der barê gotinên nivîskî da dibêje ew di pergala rastiyê da cih digire, perçeyekî rastiyê ye; lewra her tim tê dubarekirin û naguhere, meriv dikare heman rûpelê ji nû va bixwîne (2017: 79).

Gonca Gökalp Alpaslan (2002: 2-3) taybetmendiyên çanda nivîskî wiha rêz dike:

Piştî çanda devkî derketiye holê, çêkirî ye, nivîskî ye, nivîskarekî wê ye diyar heye, girêdayî metnê ye, bi rêya nivîsê derbasî kesan dibe yanê vediguhêze, xwîner biguhere jî metin naguhere, piştî xwe daye bîra şexsî, du kes hene; nivîskar û xwîner, di navbera nivîskar û xwîner da ragihandineke çêkirî heye, hevyeke (identification) xirab dibe, hilberîner yanê nivîskar tenê ye, li ser her beşeke metnê qasî ku bê xwestin guherîn dibe bê kirin, xwe dispêre çavan (ji ber xwendinê), şexsan xweser û ferdî dibe, şexsan vedigerîne dinyaya wan a hundirîn, qalibên wê tune; bêtir curbicur û rehet e, nedîtbar (razber) e, dahûrandin (tehlîlkirin) û li ser lêhûrbûn heye.

#### **2.1.4. Çanda Elektronîk**

Harold Innis dîroka mirovahiyê li gor amûrên ragihandinê yê di dîrokê da hikmê wan çêbûye wek devkî, nivîskî û elektronîk dabeş dibe (Koç, 2019: 35). Di dîroka mirovahiyê da însanan her tim hin alav û amûr çêkirine. Wan bi van amûran xwe gihandine girseyên mezin û di nav demê da yê hê bêtir pêşvaçûyî çêkirine. Bi saya wan jiyana gelekî hêsantir bûye. Amûrên wek metbee, telgraf, gramafon, plaq, kaset, pîkap, radyo, tîlefon, televizyon, tîlefonên bêrîkê, komputer û herî dawîn jî înternet (rasterast wek amûr neyê hesibandin jî teknolojiya nû û elektronîk e) di jiyana însanan da bûne hêzên xurt, guherînên mezin pêk anîne, bi saya vê teknolojiya pêşketî çandêke nû ava bûye ku em ji wê ra dibêjin çanda elektronîk.

Bi nêrîna Assmann nivîs tê wateya sererastkirin, plankirin û veqetandina perçeyan û paşê dibe amûra temsîliyeta îqtidarê, lewra bi saya nivîsê tiştên dihatin nivîsandin bûn gotinên îqtidarê, nasnameya fermî, qanûn, rêzîkname, çalakî, rîtuêl û qurbanîkirin (2018: 276). Ev gotinên Assmann yê ji bo nivîsê bi lêv kirine êdî

mimkun e ji bo teknoloji û internetê yanê ji bo çanda elektronîk jî bîn gotin. Lewra êdî li dinyayê welat û civakên çanda elektronîk lê geştir e dibin iqtidar, qanûnan derdixin, ji hêla aborî, çandî û siyasî hikmê xwe li ser tevahiya dinyayê û însanan dikin, fikr û hişmendiya xwe didin meşandin.

Ji ber ku internet êdî him bûye radyo, him bûye televizyon û him jî bûye rojname û bi saya wê agahî tî belavkirin em ê bi taybetî behsa wê bikin. Di çanda devkî da vebêj û guhdar hebû, gotin û deng jî peyama bû ku di navbera wan da dibû pire û tîkiliyek ava dibû. Di çanda nivîskî da nivîskar û xwîner hebû, metna nivîskî jî di navbera wan da dibû pire û ragihandin wisa pêk dihat. Di vê çanda elektronîk da jî êdî vebêj internet e (radyo, televizyon, rojname hemû bi hev ra ne) û guhdar/xwîner/temaşevan jî kesê li hember e. Gotin, deng, nivîs, wêne û dîmen jî pîreya di navbera wan da ye ku ragihandin bi vî awayî pêk tê. Di vê çandê da tîkiliyeye aktîf heye, lewra bi saya paşdavegerînê (*feedback*) demildest peyama tî şandin û di navbera kesê diaxive û yê guhdar dikin da bi zindî tîkiliyek pêk tê, lê dîsa jî ew qasî ya çanda devkî rehetir û rûbirû nîne.

Bi teoriya Marshall McLuhan ya bi navê gundê kurewî “*global village*” (Koç, 2019: 36) dinya êdî bûye gundekî biçûk ku haya her kesî ji yê din heye. Bi saya komputer û tîlefônên bêrîkê yê tî da internet tî bikaranîn, çanda elektronîk hikmê xwe dajo. Li kîjan devera dinyayê dibe bila bibe kesek dikare êdî bi saya vî teknolojiyê bi devkî, nivîskî û dîmenkî yê din ra bikeve tîkiliyê.

Bi tîlefôn, tablet an jî tîlefoneke bêrîkê ya ku tî da internet heye însan êdî dikarin muzîkê guhdar bikin, fîlm û şanoyan temaşê bikin, pirtûk, rojname û kovaran bixwînin, wêne û dîmenan bixînin û belav bikin, konferans û panelan li dar bixin, danûstendîne bikin, reklaman (danasînan) bikin, perwerdeyê bibînin, muzeyan bigerin, di hîlbijartinan da dengê xwe bidin, ji bo tenduristiya xwe bi doxtoran ra biaxivin dermanan bistînin, karên online (xebata naçî kar li mala xwe li ser internetê dixebitî) bikin, mehkemeyan li dar bixin û kesan bidarizînin û lêkolînan bikin. Bi kurtasî gelek karên çandî, civakî, aborî, siyasî, perwerdeyî, ragihandinî, teknikî, hiqûqî û hwd bi saya amûreke tî da internet tî bikaranîn (komputer, tablet, tîlefôn) tînin kirin û tesîra wê digihêje hemû dinyayê.

Bi taybetî di şewba vîrusa koronayê ya nû (Kovîd-19) da ev tiştên hatin rêzkirin û tiştên hê ji van zêdetir li ser internetê (online) çêbûn û êdî jîyan ber bi jiyana elektronîk diqulibe ku em ê di dahatûyê da hê tiştên nedîtî bibînin. Heta wisa ku êdî bi



saya vê teknolojiyê behsa jiyaneke mimkun e li fezayê bê jiyîn tê kirin û ji bo vê lêkolîn û amadehî tên kirin. Ev çanda elektronîk her roj tiştêkî nû li ser xwe zêde dike û her ku diçe wê xurttir bibe.

Bi saya înternetê û bi taybetî medyaya civakî (social media) ya ku ji gelek malper an jî pergalan pêk tê însan êdî pir hêsanî li ser van platforman dicivin, agahî, deng û dîmenan parve dikin û bi hev ra diaxivin. Ji van malper û pergalan yê hêza wan pir xurt in jê hinek ev in; Twitter, Facebook, Instagram, Youtube, Tiktok, Snapchat, Pinterest, Tiktok, Tumblr û Soundcloud. Bi saya hêza medyaya civakî kesek dikare xwe bigihîne milyonan û gotinên xwe belav bike. Îro bi taybetî li ser Twîtterê dema mijarek dibe mijara herî zêde tê behskirin (trend topic) li ser wê etîketê (hashtag) bi milyonan peyam (tweet) tên nivîsandin, dîmen tên parvekirin û bi saya vê platformê pêkan e gelek guherîn çêbibin.

Şexs an jî sazî dikarin li ser medyaya civakî propagandaya xwe bikin, nûçeyên xwe belav bikin û fikrên xwe bigihînin bi milyonan. Lê dewlet hin caran van propagandayan tevgerên dijî xwe dihesibînin û ji bo ku rê li ber wan bigirin hin qanûnan derdixin. Li Tirkiyeyê bi navê Qanûna Têkoşîna Dijî Terorê (*Terörle Mücadele Kanunu*) qanûnek heye ku sînoren wê gelekî fireh in. Li gor madeyên vê qanûnê, heke kesek bi rêya çapemeniyê (medya civakî jî dikeve navê) propagandaya rêxistinekê bike û ev rêxistin an jî sazî li gor pênaseya qanûnê rêxistineke sûcê be ew kes tê cezakirin.<sup>4</sup> Di demeke nêzîk da jî (Cotmeha 2022yan da) li ser Qanûna Çapemeniyê (*Basın Kanunu*) hin guherîn hatin kirin û sînoren cezakirinê hatin berfirehkirin. Li gor vê qanûna nû ya wek Qanûna Medyaya Civakî (*Sosyal Medya Kanunu*) tê zanîn û tê da behsa qanûna dezenformasyonê jî tê kirin gelek tişt hatin qedexekirin û guherandin. Sedema van guherînan jî wek rêlibergirtina dezenformasyonê (agahiyên şaş û derew) hat eşkerekirin. Ev guherîn di nav civakê da gelekî hat rexnekirin û wek sînordarkirina azadiyê ya fikr û ramanan hat nirxandin.

Heke nûçeyek şaş û manîpulatif be dîsa li ser medyaya civakî bi van peyaman va zextek çêdibe û ew şaşî an jî kêmasî tê duristkirin. An jî heke siyasetmedarek û rayedarekî dewletê (serokomar, serokên dewletan, serokwezîr û parlamenter jî di nav da) şaşiyeke bike bi saya van peyaman lêborînê dixwaze heta wisa ku carna îstifa jî dikin. Bi kurtasî ev çanda elektronîk êdî li dinyayê qada xwe firehtir dike, xwediyê

---

<sup>4</sup>Bnr. [https://www5.tbmm.gov.tr/tutanaklar/KANUNLAR\\_KARARLAR/kanuntbmmc074/kanuntbmmc074/kanuntbmmc07403713.pdf](https://www5.tbmm.gov.tr/tutanaklar/KANUNLAR_KARARLAR/kanuntbmmc074/kanuntbmmc074/kanuntbmmc07403713.pdf)

wan malper û pergalan bi milyon dolaran pereyan qezenc dikin, agahiyên însanan berhev dikin û paşê ji bo reklam û danasînan wan difroşin şirketên din. Ew jî ji hêla dewlet û hikûmetan va ji bo armancên aborî, civakî û siyasî tîn bikaranîn.

Merivan berê bi zehmetî xwe digîhandin agahî û zanistê, lê êdî kedeke mezin nayê dayîn, lewra bi saya înternetê êdî bi tikandina lînk û malperekê her tişt tê ber destê mirovan. Helbet ev çanda ku me berfirehî behsa wê kir çandeke rehet e, lê qasî ku hêsan xuya bike ewqas jî dikare bibe talûke, lewra ew di xwe da hin xetereyan jî dihewîne. Bi saya vê çanda elektronîk agahî dibe bi rehetir bî guherandin, berepaşkirin û tehrîfkirin, propagandayên reş mimkun e bilez û xurt bî meşandin, însan bi gotinên nebaş û giran bî lînkirin û biçûkxistin.

## 2.2. DENGÊJ Û ÇANDA DENGÊJIYÊ

Civakên çanda nivîsê lê tune, kê e yan jî tîra xwe pêşva neçûye çanda devkî geş û dewlemend e, di wan civakan da kê kes xwendin û nivîsandinê dizanin. Ji ber vê wezîfeya avakirin, parastin û belavkirina çand, huner, dîrok û folklorê dikeve li ser milê hin kesên taybet. Li gor civakan navê van kesan û wezîfeya wan diguhere, lê gelemperî kesên jê ra dibêjin hozan, aşiq, kêşe, mela, çîrokbêj, destanbêj û dengbêj mîrat û çanda civakê ava dikin, diparêzin, belav dikin û nahêlin bî jibîrkirin. Civaka Kurd jî xwedî çandeke devkî ye ku tiştên vê çandê ava dikin ji gelek aliyan va cihêreng û dewlemend in. Di vê çandê da jî kesên jê ra dibêjin “dengbêj” kesên taybet in.

Dengbêj nîrxên dîrokî, çandî û civakî bi awayekî hunerî û estetîk bi dengê xwe digihînin nîfşên nû. Wextê behsa dengbêjan û dengbêjiyê tê kirin ev pîrs tîn hişê meriv “gelo dengbêj kî ye” û “çanda dengbêjiyê kîngê dest pê kiriye?” Hin kes bi agahiyên pişt xwe naspêrin çavkaniyên zanistî bersiva van pîrsan didin û dibêjin dengbêjî hema bibêje ji destpêka mirovahiyê vir va heye û rehê dengbêjiyê digihêje beriya zayînê. Hin kes jî li gor wan hinekî ber bi dîroka nêzîk va tîn û dibêjin çanda dengbêjiyê digihêje salên berê yanê dema di malan da televizyon, radyo, înternet û rojname tunebûn. Helbet ev agahiyên giştî ji ber ku xwe naspêrin delîl û belgeyên berbiçav, kê e û şaş in, ne mimkun e sedî sed bî piştrastkirin.

Der barê destpêka dengbêjiyê da agahiyên tekûz ên çavkanî bî nîşandan tune, lê wisa xuya dike ku wek çîrok, destan û kartekên din ên çanda devkî dengbêjiyê jî gelek salên berê dest pê kiriye. Bedran Hikmet dibêje çanda dengbêjiyê dikeve nav sînorên edebiyat, muzîk û şanoyê û ji ber vê heke em bi çavê çîrokgotin û

guhdarkirinê berê xwe bidin dengbêjiyê em dikarin bibêjin ew dîgihêje demên arkaîk. Lewra di rûhê însanan da vegotin û guhdarkirin wek tiştêkî xwezayî û hundirîn heye û dengbêjî jî wek perçeyekî çandê digihêje formeke xweser (2012: 288-289).

Li gor agahiyên Mehmet Gültekin dide dîroknasê Ermenî Moses Van Choren di pirtûka xwe ya “Dîroka Mezin a Ermenistanê” da behsa qralê dewleta Medyayê Astiyax (Ajîdehaq) û dengbêjê welatê Medan ê navdar Angares dike û dibêje Qralê Medan şevêkê şahiyekê li dar dixê û dengbêj Angares jî beşdarî şahiyê dibe, kilaman dibêje û hişyariyê dide Ajîdehak ku bila ew li hemberî xetereyan hişyar be (Güneş-Şahin, 2018: 22). Ev agahî çiqas mimkun e bê piştraskirin, der barê vê da nîqaş dibe bên kirin, lê ya rast ew e ku dengbêjî çandê qedîm e û bi salan li ser rûyê vî erdê hebûye.

Li ser dengbêjan hin nivîs, tez, pirtûk û maqale hatine nivîsîn û lêkolîn hatine kirin. Dema em berê xwe didin tezên li Bakur ser dengbêjan hatine nivîsîn em dibînin ku di serê salên 2000î da ev qad hinekî geş bûye û ji dehan zêdetir tez li ser Navenda Teza Neteweyî hatine weşandin. Him di van tezan da û him jî di xebatên din da ji bo têgeha dengbêj û dengbêjiyê pênase û nêrînên cuda hene. Hin kes li ser etîmolojiya peyvê hûr bûne, hinek li ser taybetmendiyên dengbêjan sekinîne û hinek jî li ser karê ku ew dikin rawestiyane. Ji bilî pênaseya şexsan di ferhengan da jî pênaseyên cuda hene. Em ê bala xwe bidin wan, lê beriya wê divê bê destnîşankirin sînoren dengbêjiyê fireh in û ew dikeve nav qadên cuda yên wek muzîk, şano, edebiyat, folklor, derûnnasî, erdnîgarî, civaknasî, dîroka devkî û heta wisa ku qada polîtîkayê jî.

Peyva “dengbêj”ê peyveke hevedudanî ye, ji du peyvan pêk tê ku yek “deng” û ya din jî “bêj” e. Zana Farqînî wek têgeha muzîkê ji bo “deng” dibêje “deng, ew vîbrasyon in ku di nav xwe da xwedî aheng in, hewayê ji nav dil û hinavan tê û vîbrasyonê dike” (2004: 460). Peyva “bêj” jî gotin e, bilêvkirin e. “Bêj” dema bê (dahatû) tîne hişê meriv û ferman e (Yorulmaz, 2017: 56). Ev du peyvên li ba hev û dibin “dengbêj” ku deng bi rêya gotinê digihêje însanan. Li ser vê agahiyê be, gelo dengbêj kî ye? Farqînî dengbêjan wek “hozan û aşiqê gel, hunermendê deng” pênase dike (2004: 461). D. Îzolî ji dengbêjan ra dibêje “stranbêj, kilambêj” (2007:152). Ferhanga Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ji bo dengbêjan dibêje “hozan” (2021). Di ferhanga Yusuf Ziyaeddin Paşa ya erebî û kurdî da jî dengbêj wek “hunermendê deng” tê pênasekirin (1978: 65). Ji ferhengan em herî dawîn pênaseya Mehmet Emîn Bozaslan jî bidin ku ew dengbêjan wek hunermendên gotina stranan bi nav dike û wiha

dibêje “Hunermendê ku di gotina stranan da hêgîn û jêhati ye; hunermendê ku li gora meqam û awayên stranan, stranan dibêje” (2011: 614).

Piştî pênaseyên ferhengî heke em berê xwe bidin pênasekirina akademîsyen, lêkolîner û nivîskaran em dibînin ku pênasaye Mehmet Uzun wek çavkaniya sereke di gelek da hatiye bikaranîn. Uzun ji bo dengbêjan wiha dibêje “Dengbêj ew kesek e ku rûh dide deng, deng zindî dike, wek hoste deng ji xwe re dike pîşe, mekanê wî deng e. Dengbêj ew kesek ku deng dike kelam, kelamê dike kilam û stran wek Homerosê ewil yê edebiyata nivîskî ye” (2007: 11-12). Wek tê dîtin Uzun zêdetir li ser deng û hostatiya deng disekine û di dengbêjiyê da deng, gotin û newayê derdixe pêş.

Bedran Hîkmet jî li ser etîmolojiya “deng” û “bêj”ê disekine û tîne ziman dengbêj ew kesên dengê civakê ne, deng didin tiştêkî. Hîkmet paşê ji deng zêdetir li ser karên ku dengbêj dikin û taybetmendiyên wan disekine: “Ew ji deng zêdetir çandê neqil dikin û radigihînin. Ji ber vê deng tenê têrê nake, divê ew xwedî repertuareke dewlemend bin û rewşa civakê baş bizanibin” (2012: 292).

Kendal Nezan ji bo dengbêjan dibêje ew ji xwezayî xwedî bîrekê ne, çanda Kurdan belav dikin, feydeya wan digihêje pêşvaçûna çanda kurdî, ew şair û bestevan in (1996: 13).

Gelek lêkolîner wek pênaseya Uzun pênaseya Abidin Parilti jî ji xwe ra dikin palpişt ku ew jî ji bo dengbêjan dibêje dengbêj xwendin û nivîsandinê nizanin, lê bi taybetmendiyên çanda devkî û nirxên wê mezin dibin, çand û rewşa civaka xwe baş dizanin, xwedî bîreke xurt in, bi awayekî estetîk şikil didin deng û gotinê, çîrokên gelê Kurd bi newayê, hin caran jî bi enstrumanê li ber guhdaran dibêjin (2006: 65).

Li gor Ahmet Aras dengbêj hunermendê gel û hozan in ku qasî mijarên dîrokî, rewşên rojane, mijarên eşq, evîn û dijminatîyê jî bêyî bikaranîna enstumanê bi awayekî newayê tînin ziman (2004: 7). Pênaseya Mushin Kızılkaya zêdetir li ser patronajê ye, dengbêj debara xwe çawa dikin, li cem kê hunera xwe pêşkêş dikin behsa vê yekê dike. Kızılkaya ji bo dengbêjan dibêje ew an xweser an jî di xizmeta began da dixebitin, li der û dora xwe ya nêzîk digerin kilaman dibêjin, didin ber hev û bi saya alîkariya li wan tê kirin debara xwe dikin (2000: 15).

Salihê Kevirbirî dengbêjan wek kesên “zana” bi nav dike û li ser keda wan a edebiyata devkî hûr dibe. Kevirbirî ji bo dengbêjan dibêje ew gund bi gund digerin kilamên gel bi çîrokên wan va vedibêjin û hewl didin ev berhemên edebiyata Kurd a devkî bigihînin heta roja me (2009: 24). Erol Mutlu jî dengbêjan wek “hosteyên deng

û gotinê”, “hozanê gel”, “şair û bestekar” bi nav dike û dibêje ew çavkaniyên çandî û dîrokî yên muzîka kurdî ne (1996: 55).

Dilawer Zeraqê pênaseyên Mehmet Uzun û Erol Mutlu ji hin aliyên va rexne dike jî dibêje ew pênase kêr in, romantîk in, dengbêjiyê tenê di ‘newa û kilamên muzîkî’ da bi cî dikin û rê li ber digirin ku em hay ji hêla ‘vebêjiya civakî ya polîtîk’ ya dengbêj û dengbêjiyê bibin. Zeraq (2020: 8) ji bo dengbêjiyê wiha dibêje:

Dengbêjî wekî gerdîşeke vegotina gotinkî (devkî), her tim behsa tiştên qewimî dike û peyvên kilamên dengbêjiyê, yên ku di nava deng da cî didin xwe û di rêzîleya hevokîbûna zimên da wateyan ava dikin jî, bi hin sembolen hevpar, vegotinê digihîjînin asta civakî û bi hostetîya zimanî û bi gelek şeweyên (ve) gotinê amaje bi mebest, boçûn û nêrîneke civakî û polîtîk dikin.

Yusuf Uygur (2009: 27) dibêje ji ber ku dengbêj çîrokên xwe bi newayan û meqamkî dibêjin di navbera wan û çîrokbêjan da cudahiyeke heye, lewra ev hesta muzîkî rasterast xwe digihîne dilê merivan. Avaşin Yorulmaz (2017: 53) jî pênaseyên ji bo dengbêjiyê hatine kirin ji ber ku ew dengbêjiyê bi qadên muzîk, çanda devkî û çîrokbêjiyê va sînardar dikin, rexne dike û dibêje dengbêjî di nav hunerên dikê (sahne) û xwepêşanê da bi tena serê xwe cureyek e û divê wisa bê nîrxandin.

Hamelink Wendelmoet û Hanifi Barış ji bo dengbêjan dibêjin ew kilambêj-helbestvan in ku di civaka gundekî an jî dawetekê da stranên dibêjin (2014: 173) û ji bo kilamên dengbêjan jî destnîşan dikin ku ew jiyana gund, begên herêmê, şivanan, serhildêran û şerên çêbûne bi bîr tînin û dîroka Kurdistanê dubare pêşkêş dikin (2014: 174).

Necat Keskin jî dema behsa îcrakerên kevneşopîya devkî ya kurdî dike dengbêjan wek kesên sekûler (yên derveyî dîn) dinirxîne, dibêje ew bi dengê xwe gotinê zindî dikin, kilamên evîn û qehremaniyê dibêjin, di heman demê da kevneşopiyekê jî dihewînin (2019: 151).

Ömer Güneş û İbrahim Şahin (2018: 19-20) jî ji ber naverok, vegotin û meqama kilaman û pêşkêşkirina wan dengbêjan wek helbestvan, çîrokbêj û muzîkjen pênase dikin. Behsa antolojiyan hat kirin di vê keliyê da em pênaseya Antolojiya Dengbêjan a ji hêla Şaredariya Mezin a Diyarbekirê hatiye amadekirin jî bidin ku Mehmet Öncü (2011: 23) li wir ji bo dengbêjan dibêje: “Dengbêj kesê ku bûyerên dîrokî û çandî bi şewaza dengî li gor meqamekî taybetî stran, bi hunereke wêjeyî radigihîne civakê ye.

Ango dengbêj gotinê vedijîne, nirx û rûmetên gel bi efsûna peyvên ku bi hunera xwe jiyandayî dixemilîne û ji nifşan radigihîne nifşên din”.

Kardaş dengbêjan wek hunermend û hozanên gel bi nav dike û li gor kesên din pênaseyeke berfireh û xurttir dike. Kardaş dibêje dengbêj şerên di navbera eşîran da, şerên eşîran ên li dijî otorîteyê yên ku tesîreke mezin li ser civakê kirine, bûyerên dîrokî, afatên xwezayî yên wek erdhej, lehî û hwd, eşq, jihevveqetîn, qîzrevandin, çîrokên gel li gor herêman bi enstruman an jî bê enstruman bi awayekî newayî hunera xwe bi cih tînin, ew civakê bi pîralî nas dikin, aliyên civakê yên erênî û neyînî dixin nav berhemên xwe û bi rêya vegotinên xwe çanda gel digihînin civakê (2017: 10).

Hiş û mêjiyê dengbêjan hêlîna ziman, dîrok, çand û hunera kurdî ye, ji ber vê sînorên dengbêjiyê nabe bê tengkirin. Ev pênasê dibe hê jî bîr zêdekirin, lê ji bo ku em panaromayeke berfireh a li ser pênaseya dengbêj û dengbêjiyê hatiye kirin bibînin, ev bes in. Qasî ku em dibînin li ser têgeha “dengbêj” û “dengbêjiyê” fikr û pênaseyeke hevpar tune. Lewra her kesekî li gor xwe pênaseyek kiriye û li ser hêleke wê agahiyek daye, lê wê demê di pênaseyê da ji hin aliyan va kêmasiyek maye. Dema em berê xwe didin van pênaseyan xuya dike bi rastî jî dengbêj kesên ne ji rêzê ne, şexsên taybet in, dengbêjî jî hunereke pîralî ye û dikeve nav sînorên qadên cuda, eleqeya wê bi qadên din ra çêdibe.

Heke em hin nirxandinan bikin, ewil em dikarin bibêjin ji ber ku deng, newa û gotin di dengbêjiyê da heye, hin dengbêj jî enstrûmanan bi kar tînin dengbêjî dikeve qada muzîkê. Jixwe gelek kes li ser heman fikrê ne ku Güneş û Şahin jî der barê mijarê da dibêjin: “Dengbêj bêyî awaz û sewt, bêyî xulxulandin û strandin tenê bi “bêj”ê nabe dengbêj. Lewma jî dengbêj ji hêlekî ve muzîkjen e. Dengbêj di mijarê de ewil peyvê, peyva herî bedew hildibijêre, paşê peyvê dike awaz. Peyvan ditewîne, ter û can dike, ruhdar dike” (2018: 20).

Paşê em dikarin bibêjin ji ber ku di dengbêjiyê da deng, forma vegotinê û tevgerên bedenî hemû bi hev ra tîr bikaranîn dengbêjî ji şanoyê ra dibe çavkaniyeke dewlemend, ji ber vê jî tîkiliya wê û şanoyê heye. Duygu Çelika mijara teza wê ya doktorayê çanda dengbêjiyê û tesîra dengbêjiyê ya li ser şanoya kurdî ye jî behsa vê mijarê dike. Çelik di pêşgotina teza xwe da dibêje şanogerên Kurd ên di sala 2012yan da li Diyarbekirê beşdarî “Konferansa Şanoya Kurdî ya Neteweyî ya 1emîn” bûne jê gelek gotiyê dengbêjî ji ber ku ji şanoya kurdî ra çavkanî ye, cihê dengbêjiyê cuda ye. Heta wisa ku jê hinekan dengbêjî wek formeke şanoyê nirxandine (2017-v).

Dîsa ji ber ku behsa hîmên civakê, çand, edet, kevnoşopî û têkiliyên însanan ên bi hev ra, bi kom û nijadên din ra dike dengbêjî dikeve qada civaknasiyê jî. Hanifi Taşkın û Ayhan Yıldız (2018: 39) jî li ser wê fikrê ne ku têkiliya dengbêjî û civaknasiyê heye û wiha dibêjin:

Her berhemeke çanda dengbêjîyê helbet li ser têkiliyeke civakî derketiye. Ji kilamên zarokan (lorî) heta kilamên dilan, kilamên şeran, kilamên şînê, kilamên dînî û kilamên dawetê gişt bi awayekî ji awayan bi jiyana civakî û mirovan re têkildar in. Dayîneke keçekê bi awayê bêdil, şer û pevçûnên nav eşîr û desthilatdaran, neheqiyên navxweyî, bi gelek hêlên xwe, dibe ku ji zanista civaknasiyê re bibin çavkanî.

Ji ber ku kilamên dengbêjan behsa şer, pevçûn, serhildan, şîn û şahiyên dikin dengbêjî dikeve qada polîtîka û dîrokê jî. Çima? Lewra ev bûyerên çêbûne der barê wê heyamê, der barê şexsan (axa, mîr, beg, serbaz, hikûmdar, padîşah, mela, şêx û hwd), der barê nijadên din (Ereb, Ecem, Ermenî, Tirk û hwd) û der barê kom, eşîr û dewletan da agahiyan didin, şahidiya wan bûyeran dikin û wek belgeyên dîroka devkî bi kilaman di hişê merivan da dimînin. Ji ber ku tê da destan, çîrokên gelêrî, helbest, zargotin û hwd hene dengbêjî dikeve nav sînoren folklorê. Bûyerên di kilaman da tên gotin, metaforên tên bikaranîn, qehremanên pesnê wan tên dayîn, evîndarên serpehatiyên wan balê dikşînin û evîna wan tê gotin, sembolên tên bikaranîn, şîn, şahî, zêmar, şer hemû formên çanda devkî carna rasterast carna veşartî di kilaman da xwe didin der ku ev jî nîşan dide dengbêjî û folklor bi têkiliyên saxlem va girêdayî hevdu ne.

Ji ber van taybetmendiyan e ku kesên pênaseya dengbêjîyê kirine her yek li ser aliyekî wê hûr bûye. Dîsa ji ber vê piralîbûna wê ye ku di salên dawîn da li ser dengbêjan û dengbêjîyê xebatên akademîk zêde tên kirin, helbest û roman tên nivîsîn û film tên çêkirin. Belê, dengbêjên jê ra dibêjin hozan, çîrokbêj an jî kilambêj di çanda devkî da wek dîroknûsan bi dengê xwe dîrokê dinivîsin. Em ê pênaseyêke cuda û resen nekin, lewra kêma zêde em jî li ser wê fikrê ne ku dengbêj kesên ne ji rêzê ne, ew kesên taybet in, berpirsyariya wan ya avakirin û belavkirina çand, bîr û dîrokê heye. Lê ji bo ku ev xebat li ser qada dengbêjîyê kevirekî zêde bike emê behsa têkiliya dengbêjîyê û bîra civakî bikin ku cudahiya xebata me û yên din zelaltir eşkere bibe. Ji bilî mijarên eşq, xweza, evîn, çîrokên gel dengbêj bûyerên wek koç, şer, pevçûn, erdhej, serhildan, wêrekî, qehremanî yên hemû civakê eleqedar dikin jî bi dengên xwe yên xweş digihînin dahatûyê ku ev mijarên bîra civakî kakilê xebata me ye. Ji bo ku ji van

pênaseyan û agahiyên me li jor dan der barê dengbêjan û hunera dengbêjiyê da çarçoveyeke zelal derkeve holê û em ê çend xalên girîng rêz bikin;

- Dengbêj hozan, şair û hunermendên civakê ne
- Dengê wan xweş e, xurt û zelal e
- Dengbêj zimanê kurdî baş dizanin, ziman bi hostatî û xweş (metafor, sembol, biwêj, gotinên pêşiyên û hwd) bi kar tînin
- Dengbêj civak, çand û erdnîgariyê baş nas dikin û ji wan çavkaniyan avê vedixwin
- Dengbêj xwedî bîreke xurt in, şexsan û bûyeran zûbizû ji bîr nakin
- Repertuara dengbêjan a kilaman dewlemend e, her cure kilaman (şer, şîn, destan, lawij û hwd) dizanin û dibêjin
- Dengbêj ji ber ku hozan in ji ber xwe kilaman derdixin, lê yên heyî (yên ji dengbêjên beriya wan gotine) jî gelek caran dibêjin
- Mijara kilamên dengbêjan şer, pevçûn, serhildan, bûyerên dîrokî, eşq, evîn, afatên xwezayî (erdhej, hezaz, lehî, bager, şepe û hwd), qîzrevandin, zewacên bêdil, hêwîtî, çîrokên gel, destan û bûyerên polîtîk in
- Dengbêj gelemperî bê enstrûman (yên ji Serhed û Xerzan) bi dengê xwe hunera xwe pêşkêş dikin, lê yên enstrûmanên wek bilûr, ribab, dûdik, erbane, tenbûrê bi kar tînin jî hene
- Dengbêj debara xwe bi saya alîkariya civakê, axa û began dikin, dengbêjên xweser jî hene lê ew nikarin rasterast bi vê hunerê jiyana xwe bi hêsanî bimeşînin
- Dengbêj di bîra xwe da bûyeran arşîv dikin û bi kilaman wan dixin nav bîra civakê, paşê wê bîra civakê diparêzin, zindî dihêlin û bi vê peywirê nahêlin bîra civakî ji holê rabe
- Bûyereke li herêmekî diqewime li herêmen din nayê bihîstin, lê bi saya kilamên dengbêjan ew digihêjin herêmen din û belav dibin

Me hinekî dûr û dirêj behsa mijarê kir û pênaseyên ji bo dengbêjan rêz kir. Sedema wê ew e ku bi vê xebatê va der barê dengbêjan û dengbêjiyê da agahiyên berbelav bînin komkirin, çarçoveyeke giştî û tekûz derkeve holê û kesên li ser mijarê dixebitin bila bikaribin fikr û ramanên cuda hêsantir bi dest bixin. Wek ku tê dîtin pênase her çiqas ji hev cudatir bin, hin agahî kêr hatibin dayîn jî xalên wan ên hevpar hene. Ew jî nîşan dide ku dengbêj kesên taybet in, dengê wan xweş e, bîra wan xurt e,



kilaman dibêjin û di civakê da wezîfeyeke wan a girîng heye. Ew gula meclis, dîwanxane û cimaetan in, di şîn û şahiyana da cih digirin, çand û bîra civakî zindî dihêlin û digihînin dahatûyê.

Der barê senifandina dengbêjan da her çiqas senifandîneke hevpar tunebe jî pêkan e behsa çend cure dengbêjan bê kirin. Li gor Antolojiya Dengbêjan sê cure dengbêj hene ku ew; dengbêjên gel, dengbêjên mîr û began û dengbêjên mitrib in (2011: 23). Kardaş vî sînorî firehtir dike û li gor cihên ku dengbêj lê gihastine wek; dengbêjên gundan, dengbêjên eşîran, dengbêjên axayan, dengbêjên gerok û dengbêjên terîqatan (qesîdebêj) dabeş dike û mijarê zelaltir dike (2017: 32-33).

Bi çend gotinên kurt em behsa dengbêjiyê jî bikin. Ew huner û karê ku dengbêj dikin, çanda bi destê wan belav dibe jî dengbêjî ye. Bozarslan (2011: 614) dengbêjiyê wek “Huner û hêgîniya kesê dengbêj; huner û hêgîniya hunermendê gotîna stranan; huner û hêgîniya gotîna stranan” pênase dike. Farqînî (2004: 461) jî bo dengbêjiyê dibêje “hozanî, aşîqtî, hunertiya deng”, Îzolî (2007: 152) dibêje “stranbêjî, kilambêjî” û Ronî jî (2012: 282) dengbêjiyê wek hunera deng û gotinê ya çanda gel a Kurdan bi nav dike û tîne ziman ku di nav vê çandê da hemû rengên hunerên edebî hene. Bi van pênaseyan û agahiyên me baş tê fêmkirin ku dengbêjî çi ye û rola wan a di civaka Kurd da çiqasî girîng e.

### **2.3. DI DENGBÊJIYÊ DA PERWERDE**

Civakên çanda devkî lê berbelav in û nivîs dereng gihîştîye wan perwerde li hin deran tê dayîn, lê ew der ne wek roja îroyîn mekteb an jî sazî ne. Heyamên berê yên ku mekteb, zanîngeh û saziyên fermî tunebûn perwerde û fêrkirin bi tîkiliya hoste û şagirtan çêdibû. Ev jî bo hunerên destan, zinaet, kar û barên aboriyê û qadên hunerê jî (çîrokbêjî, stranbêjî, muzîk, peykersazî, wênesazî û hwd) wisa dimeşîya. Kesên pispor yên di civakê da bi nav û deng bûn kar û hunera xwe hînê şagirtên xwe dikirin.

Di dengbêjiyê da jî ev bi vî awayî dimeşîya. Dengbêjên nûnerên çanda devkî û bîra civakî ne bi destê dengbêjên hoste perwerde dibûn. Ew şagirtên ecemî bi saya dengbêjên pispor di nav demê da dibûn dengbêjên navdar, wek kesên taybet di civakê da dihatin hezkirin û rûmeteke mezin didîtin.

Di çanda devkî da kesên taybet yên ku bîra çandî û civakî digihînin nîfşên nû hene. Ev kes beriya ku bibin pisporên vî karî li cihekî an jî li cem kesekî perwerdeyê dibînin, jî bo xwe perwerde bikin kedê didin ku Assmann jî bo van kesan hin mînakan

dide. Dibêje li Çînê zanebûna van kesan bi ezmûneke formel tê ceribandin, li Yûnanistanê bi zanebûna zimanê yûnanî û li Ewropaya sedsala 18emîn da jî bi zanebûna frensî ew tî ceribandin, zanebûna operayên Wagner jî bi lêxistina piyanoyên taybet tê ceribandin (2018: 63). Ev mînakên ji bo kesên taybet û perwerdebûna wan hatin dayîn li gor civakan diguherin. Di civaka Kurd da jî wek me berê jî got dengbêj kesên taybet in. Dengbêj mecbur in zanebûn û pisporiya xwe nîşan bidin, civakê xwe bidin bawerkirin ku ew dengbêjên baş in û dikarin vê hunerê pêşkêş bikin.

Dema em berê xwe didin dengbêjiyê tê dîtin ku perwerdeyê wisa rêk û pêk ya di saziyekê da tê dayîn tune. Her çiqas Waide Jwaideh (2009: 56-57) bibêje mektebên dengbêjan yê lê perwerde didîtin hebûn, li wir kilam, helbest, destan û çîrok dihatin hîn kirin jî, ev agahî nayê wê meneyê ku ew sedî sed rast e û wek mektebên îro yê bi rêk û pêk bûn. Dengbêjên divê xwedî dengêkî xweş û zelal bin, bîreke wan a xurt hebe, ziman (biwêj, gotinên pêşiyên, bikaranîna peyvên hwd) baş bizanibin, civakê, gel û çandê baş nas bikin helbet ji bo ku bibin dengbêjên hoste perwerdeyê dibînin, lê ne wisa li mektebekê an jî saziyekê. Di çanda dengbêjiyê da perwerde bi tîkiliya hoste û şagirtiyê dimeşe. Dengbêjên temenên wan biçûk in li ber destê dengbêjên mezin gava xwe davêjin vê qadê. Diçin dîwanxane, şevbuhêrk, dawet û şahiyên li van deran li cem dengbêjên navdar û temenê wan mezin in rûdinên û guhdariya wan dikin. Dengbêjên nûgihîştî li van deran him atmosfera civatê dibînin, rabûn û rûniştinê hîn dibin û him jî kilamên dengbêjan guhdar dikin. Paşê wan kilamên ji ber dikin dubare û sêbare dibêjin, dema dibin hoste jî tûrê xwe yê bi kilaman tijî kirine li ber civakê vala dikin. Yanê perwerdeyê çandî ya xwedî hin rê û rêbazan di navbera hoste û şagirtan da heye.

Dengbêjên nû digihêjin çav didin, deng, gotin û tevgerên hosteyan, rêz û hurmetê hîn dibin, qayde û tevgerên wan teqlîd dikin da ku paşê zêde zehmetiyê nekşînin. Hoste kilamên kin, yê ku ew bikaribin bi rehetî ji ber bikin hînê şagirtên xwe dikin, yek çar di nav cîmaetê da destûrê didin wan ku ew jî kilaman bibêjin. Sanders dibêje di çanda devkî da gotin dema ji dev derdikevin wîna dibin, fikir li hewayê belav dibin û dema cardin bîna dubarekirin wek cara ewil hatine gotin nayên bîra însanan, teqez li ser hin guherîn çêdibin (2010: 28). Dengbêj jî dema kilaman dibêjin biçûk be jî hin guherînan dikin, an peyvekê li ser kilamê zêde dikin, an jî kêr

dikin. Wek Sander jî tîne ziman her çiqas li ser guherîn çêbibe jî ew di nav demê da pisporiya xwe îsbat dikin.

Dengbêjên hoste ji bo dengbêjên ciwan rêber û zana ne, kilaman bi dehan caran didin gotin ku ew baş hîn bibin, kilam di hişê wan da bi cih bibin û ew bi hêsanî ji bîr nekin. Dema di kilamgotinê da şaşî û kêmasiyek hebe hoste ji şagirtên xwe ra wan dibêjin da ku ew şaşî dîsa neyên dubarekirin. Ji bo vê mijarê bibe mînak Güneş û Şahin didin zanîn ku Dengbêj Şakiro ewil ji Dengbêj Bedîhê Çavuşê nêzikî deh salan û paşê jî ji Dengbêj Mihemedê Xilxile qasî salekê hînî kilaman bûye û mînakên perwerdeya hoste û şagirtên din jî wiha rêz dikin: “Dengbêj Sadiq (xwarziyê Dengbêj Reso) sê salan di mala Dengbêj Ferzê de maye û jê kilaman hîn bûye. Nesoyê Zado bi dehan car Feqiyê Qizqapanê ziyaret kiriye, di mala wî de her carê du-sê rojan an hefteyekê maye û jê kilaman fêr bûye” (2018: 27).

Dema behsa dengbêjiyê tê kirin li ser mijara xewndîtinê jî hin agahî tên parvekirin, lêbelê der barê vê meseleyê da agahiyên tekûz yên kesên xewndîtinê jî di perwerdeya dengbêjiyê da wek astekê nîşan didin tuneye. Tenê der barê xewna Evdalê Zeynikê da hin agahî hene, tê gotin Evdal xewnek dîtiye ku vedireşe û garis ji devê wî dipekin, piştî vê xewnê dest bi dengbêjiyê kiriye (Aras, 2004: 24).

## **2.4.MEKANÊN KU DENG BÊJ HUNERA XWE LÊ PÊŞKÊŞ DIKIN**

Dengbêjên dengê wan xweş e hin cihan kilaman dibêjin û hunera xwe pêşkêş dikin. Ji bo heyama berê ev der li odeyên gundan, mala axa û began, şevbuhêrk, dawet û şahî bûn. Heta wisa ku hin caran qadên şer û pevçûn lê diqewimîn jî ji dengbêjan ra dibûn mekan ku ew kilaman bibêjin. Ev der ji hêla çanda devkî va ji bo civakê mekanên hevpar in. Civak li van deran kom dibe, şîn û şahiyê parve dike, hesteke hevpar derdikeve holê û nasnameyêke hevpar çêdibe. Ji ber van sedeman ev der ji bo avakirina bîra civakî jî cihên girîng in. Dengbêjên li dîwanxane, şevbuhêrk, dawet, şahî, pêşbirk û zozanan kilam digotin îro jî li mala dengbêjan, li ser radyo û televizyonan û li ser medyaya civakî hunera xwe pêşkêş dikin.

### **2.4.1.Dîwanxane**

Cihê sereke yê ku dengbêj lê kilaman dibêjin dîwanxane ye, ev der mimkun e wek cimaeteke ji giregir û maqûlan pêk tê bê teswîrkirin. Dîwanxane li qesra mîr, axa û began, mala zana û rûspiyan civakê dihatin avakirin. Li dîwanxaneyan ji rabûn û

rûniştinê bigire heta axaftinê, ji xwarin û vexwarinê (çay, av, şerbet, êmîş, şêranî, fêkî, goşt û birinc) bigire heta dekorasyonê (xalîçe, mînder, balgî, palpişt û hwd), ji hatinê bigire heta çûyînê hin rê û rêbaz hene. Kesên di vê cimaetê da rûdinên guh didin van qaydeyan û li gor giraniya wê atmosferê tevdigerin. Kardaş (2017: 35) ji bo dîwanxaneyan dibêje ev der dibe ku wek qesr û qonaxa mîr û begekî, mala serokê eşîrekê, odeya gundekî, qesreke femandarekî eskeriyê bê rêzkirin û diwanxaneyên berê û yê rojane wiha muqayese dike:

Di dîwanxaneyên berê da serokê dîwanxaneyê li serî, li gor çep û rastê li cihekî hinekî bilind rûdinişt. Mêvan li saliyê rastê, şêwirmendên mîr û began (serokê eşîrê, giregirên gund) û dengbêj jî li aliyê çepê rûdiniştin. Îro pergala dîwanxaneyan hinekî guheriye. Dengbêjê herî hoste li serî rûdinê û cimaetê bi rê va dibe.

Li van dîwanxaneyên ku li qesr û qonaxa mîr û begekî, li mala serokê eşîrekî an jî li odeya gundekî dihatin avakirin heta şev dereng dewam dikirin ku ji van ra dibêjin şevbuhêrk. Kesên li wir amade dibûn guh didan dengbêjan û kêfa şevbuhêrkan derdixistin. Peyva şevbuhêrkê peyveke hevedudanî ye ku ji peyvên “şev” û “bihûrandin”ê pêk tê. Şev wek ku tê zanîn ew wext e ku êdî kar û barê jiyana rojane diqede, meriv îstirehet dikin, bêhna xwe didin û radizên. Bihûrandin jî dîsa dem derbaskirin e, xerckirina wext e. Herdu peyv dema bi hev ra tên bikaranîn meneyeke nû derdikeve holê ku meriv şeva xwe bi hev ra dibuhirînin, diaxivin, kêf û şahiyê dikin, yanê şevbuhêrkan li dar dixin.

Ev çandeke berê ya Kurdan bû ku dema televizyon, radyo, înternet û tiştên bi vî rengî tunebûn, merivan li şevên dirêj ên zivistanê bi hev ra wextê xwe derbas dikirin. Di vê civîna şevê ya li mala axa, beg, giregir û serokê eşîrê çêdibû da behsa mijarên rojane dihat kirin, cimaetê hal û hewalê hevdu dipirsî, dixwarin û vedixwarin, paşê heta şeveqê dengbêjan kilam digotin û davêtin ber hev. Mêvanên rûniştine jî guhdariya wan dikirin, hey cara bi kilamên wan xemgîn dibûn, hey caran jî ji ber coş û kêfxweşiya kilaman sermest dibûn. Di şevbuhêrkan da dengbêjan gelemperî destanên “Mem û Zîn”, “Ristemê Zal”, Ta’(ha)r û Za(ha)r”, “Dewrêşê Evdî”, Siyabend û Xecê” û yê bûne malê neteweyê distiran, li rex dengbêjan jî çîrokzanên ji hêla mîr û began va dihatin xwedîkirin, xebatkarên wan ên qehweçêker, xwarinçêker û xizmetkar jî hebûn (Antolojiya Dengbêjan, 2011: 24). Ji bilî van destan û çîrokên “Memê Alan”,

“Kerr û Kulîk”, “Derwêşê Evdî”, “Metran Îsa”, “Kela Dimdimê” û “Zembîlfiroş” jî gelek navdar in û ji hêla dengbêjan va kilamkî dihatin gotin.

Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo şevbuhêrkan dibêje şevên zivistanê yên dirêj gel li odeyên axayan kom dibûn, çîrok digotin, behsa şerên berê dikirin, bi gûzan wek qumarê dilîstin û wiha dewam dike: “Û ciwanêd wan, law û keç û bûk zivistanan her şevê li malekê yeğnağê<sup>5</sup> li wê malê berhev dibin. Eger saz heyin sazan diqutin. Eger saz tunînin lawêd dengbêj û bûk û keç tevî hevdu bêrete dibêjîn û distirên û govend digrîn û direqisin, heta nêzûkî subeyê (Celalî, 2016: 240-241).

Der barê şevbuhêrkan da Serdar Öztürk (2014: 28) jî destnîşan dike her kes dihat cem hev, dengbêjan çîrok û kilam digotin û wiha agahiyan dide:

“Di van şevbihêrkan de dengbêj li serê dîwanxaneyê dihate rûniştandin, balif didan paş piştê wî û dora wî. Bi vî awayî cihê dengbêj xweş dikirin û derfetên vegotina dengbêj amade dikirin. Vê rewşê dilê şagirtên dengbêjiyê germ dikir û ji bo ku rojekê zûtirîn bigihîjin cihê dengbêj hewl didan.”

Di nav demê da ji ber teknoloji, şert û mercên pêşvaçûyî jiyana merivan û civakan diguhere, tiştên berê an tevahî ji holê radibin, an jî forma wan diguhere. Guherîna şevbuhêrkan jî ji van yek e ku êdî wek demên qedîm şevbuhêrk çênabin, reng û rûyê wan li gor jiyana nû têşe girtiye. Ji ber jiyana modern a ku îro zêde guheriye êdî şevbuhêrk jî bi formeke cuda xwe nîşan didin. Di roja me da şevbuhêrk gelemperî li navendên çandan, mihîrcanan û şahiyên çêdibin (Kardaş, 2017: 37).

Di nav civaka Kurd da çawa ku şîn û merasimên ji bo rojên reş û xerab tîr lidarxistin girîng in, şahî û dawet jî ewqas taybet in. Dengbêjên ku li dîwanan kilam digotin hin çarçûnên şahî û dawetan bi kilamên xwe kêfa civakê bêtîr xweş dikirin. Axa, beg, giregirên civakê yên ku halê wan xweş û dewlemend bûn di dawet û şahiyên xwe da ne dengbêjek tenê, çend dengbêj bi hev ra dianîn ku ji xwe ra bikin nav û deng û heta hetayî behsa şahî û daweta wan bê kirin û mêvan jî kêf û coş bibin. Kesên derfeta wan tunebûn jî qet nebe dengbêjek be jî vedixwendin şahiyên xwe.

---

<sup>5</sup> Yexnax di civaka Kurd da şahiyêke taybet e. Dema kesek ji Xwedê tiştêkî bixwaze û bibêje “ev daxwaza min biçe serî, filan nexweş şifayê bibîne ez ê yexnaxekê ji bo ciwanan li dar bixim.” Di vê şahiyê da keç û xortên nezewicî, bûk û zavayên nû yên gund tîr vexwendin, kilam tîr gotin, govend tîr girtin û şahiyêke bicoş tîr lidarxistin. Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Murad Celalî, “*Mela Mehmûdê Bazîdî û Adat û Rusûmatname’ê Tewaftiyê Ekradiye*”, r. 184.

Dawet û şahiyên dengbêj nedîçûn wek tişteki kêm hebe lawaz derbas dibûn. Lewra bi deng û kilamên dengbêjan rengê şahiyê xweştir û geştir dibû. Li gor derfeta malbatê dengbêj dihatin xelatkirin, rêz li ber wan dihat girtin û ji bo ew bîn dawet û şahiyên din jî ji wan soz dihat xwestin. Kesên dewlemend bûn çend dengbêj bi hev ra vedixwendin ku coşa şahiyê zêdetir be. Dengbêjan piştî kilamgotinê ji bo keda xwe ji gundiyan hinek xelat werdigirtin û debara xwe wisa dikirin. Ev xelat ceh û genim, heywan (pez û dewar), xwarin û tiştên bi vî rengî bûn (Uygar, 2009: 31).

Der barê xelatkirin, şabaş û alîkariya ku li dengbêjan dihat kirin da em dikarin behsa bîranîneke Dengbêj Reso bikin. Elî Rizayê kurê siyasetmedar Şêx Xiyasedîn Emre<sup>6</sup> dema behsa Dengbêj Reso dike dibêje Reso çûye eskeriyê û dema ji eskeriyê ziviriye di bêrika wî da qet pere û xerclixê wî tunebûye. Wextê li ser rêya xwe diçe gundekî, dibîne ku dawetek li gund heye û dengbêjek kilaman dibêje (Got ez baş nizanim, lê bawer im Dengbêj Ferzê bûye). Reso ji wî kesê ku li kêleka wî rûniştiye ra dibêje “Ka ji wan ra bibêje ez jî kilamekê bibêjim” û çend caran vê daxwaza xwe dubare dike. Ew kesê êdî niçandina Dengbêj Reso aciz dibe ji cimaetê ra dibêje “Evî rihê min xwar, ka bihêlin bila ew jî kilamekê bibêje”. Piştî kilamgotina Dengbêj Reso dengbêjê din dibêje “Reso lawo tu kîngê hatî, xêr hatî, êdî tu kilaman bibêje” û dorê dide Reso. Wextê dawet xelas dibe pere û şabaşê didin Reso û ew wisa dizivire mala xwe (Elî Riza Emre, Pêwendiya tîlefoni, 30yê Gulanê 2021).

#### **2.4.2. Mala Dengbêjan**

Jiyana niha bi her awayî ji ya berê cudatir e ku em şopên van cudahiyan di çanda dengbêjiyê da jî dibînin. Dengbêjên ku berê li mala axa, mîr û began civat şên dikirin, di dawetan da kilam digotin, di şevbuhêrkan da heta serê sibê dikirin kalekal, şevên dirêj ên zivistanê kin dikirin êdî li mala dengbêjan hunera xwe pêşkêş dikin. Şaredarî û navendên çand û hûnerê ji bo ku çanda dengbêjiyê ji holê ranebe û nifşên

---

<sup>6</sup> Şêx Xiyasedîn Emre (li gor nasnameyê Gıyasettin Emre) siyasetmedarekî Kurd e ku di navbera salên 1910-2008an da jiyaye. Eslê xwe ji Kopa navçeya Mûşê ye û li Tirkiyeyê parlamenterê xweser ê ewil e. Di sala 1954an da ketiye meclisê. Di sala 1957an da ji Partiya Demokrat wek parlamenterê Mûşê hatiye hilibjartin. Dema derbeya 27ê Gulanê ya 1960î di girtîgehê da maye, paşê derketiye û di sala hatiye girtin. Ji bo ku êdî siyasetê neke siyaset li wî hatiye qedexekirin. Dengbêj Reso gelekî li cem wî maye, di civata wî da kilam gotiye.

nû jî bikaribin dengbêjan guhdar bikin di salên dawîn da avahiyeke li gor çanda dengbêjiyê hatiye xemilandin ava dikin ku ji wan ra dibêjin “Mala Dengbêjan”.

Ji bo ku dengbêj li van meknan kilaman bibêjin ew gelemperî dildarî tîn û ji civatê ra kilaman dibêjin. Rêvebir û şaredariyên ev mal ava kirine ji bo alîkariya dengbêjan bikin mehaneyê (hin caran pereyekî sembolîk e) û hin xelatan didin dengbêjan ku ew her tim bîn û kilaman bibêjin. Çawa ku li diwanxane û şevbuhêrkan rê û rêbazên pêşkêşkirina hunera dengbêjiyê heye, li mala dengbêjan jî hin rê û rêbazên divê dengbêj û mêvan li gor wan tevbigerin hene. Kardaş (2017: 37) wan qayde û rîtuelan wiha rêz dike;

- Di diwanxaneyê da dengbêjê temenê wî herî mezin e dest bi kilaman dike.

- Heke li diwanê dengbêjê hoste hebe, dengbêjekî din bêyî destûra wî nikare kilaman bibêje, lewra ev tevgereke dûrî edebê ye. Ji bo vê divê teqez hosteyê wî (bi rêya çavqirpandinê an jî devkî) destûrê bide wî.

- Heke dengbêjek kilamekê bibêje, dengbêjekî din nikare heman kilamê bibêje ev eyb e. Her dengbêjek divê kilameke cuda bibêje ku sedema vê heye. Ji bo ew forsê neavêjin hev, hevdu bêqîmet nekin û dilê hevdu nehêlin ev rêbaz hatiye danîn.

- Dema kilamek tê gotin çiqas dirêj dibe bila bibe ew nayê birîn, lê dengbêj berê tê hişyarîkirin ku ew li gor demê xwe amade bike û wisa tevbigere.

Li Mala Dengbêjan a Diyarbekirê me çend caran ev yek çavdêrî kir. Mînak dengbêjê herî temendirêj Dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî yê di demek nêzîk da (2020) wefat kir kilam digot û paşê yê din bi dorê dest bi kilaman dikirin. Dema dengbêjek kilaman dibêje mêvan û dengbêjên din ji bo ku ew bêtîr coş bibêje û kêfxweş bibe hin caran wek kewan dikin qaqibo, hin caran dibêjin “can can”, “canê can” û “sihet xweş”, car caran jî dibêjin “hahîî”.<sup>7</sup> Ev têkiliya di navbera dengbêj yanê kesê ku karê xwe îcra dike û guhdaran da çêdibe nîşanî me dide. Herdu alî bi awayekî aktîf tesîrê li ser hev dikin, dengbêj bêtîr cezbê dikeve û bi coş performansa xwe îcra dike, guhdar jî bêtîr guhê xwe didin ser kilamê.

---

<sup>7</sup> Dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî kilama bi navê “Berîvanê” dibêje, Dengbêj Eliyê Qerejdaxî jî (di deqîqeyên navbera 02:52- 03:02an da) jê ra dibêje “Erê erê Seydo tu nemire”, “canê canê” da ku ew xweştir bibêje. <https://www.youtube.com/watch?v=gaZOhXnogwA>

Li van deran dengbêjî bi awayekî modern dimeşe ku Hamelinka li ser mala dengbêjan xebateke berfireh kiriye jî behsa girîngiya van meknan dike, dibêje ev der ji dengbêjan ra bûne cihên ku ew bikaribin hunera xwe lê pêşkêş bikin, girîngiya ziman derdikeve pêş, aîdiyeta kevneşopîyan çêdibe, hedefên siyasî yên di pêvajoyeke dirêj da derdikevin pêş, her çîrokeke kilamekê heye ku ew tecrube tînan parvekirin û hwd (2014: 20).

## 2.5. MIJARA BERHEMÊN DENGBÊJAN

Barry Sanders dibêje “zimanekî baş diaxive ji xwe ra guhekî dost digere” (2010: 16). Ev gotineke xweş e helbet, lê heke ziman baş biaxive, lê naverok pûç û vala be tu meneya ziman û guhdariyê jî namîne. Ji ber vê ye, di dengbêjiyê da qasî deng û vegotinê mijara kilaman jî gelekî girîng e. Mijarên kilaman rasterast bi erdnîgarî, civak û çanda kurdî ra eleqedar in. Gelemperî mijara kilaman şer, pevçûn, serhildan, bûyerên dîrokî, qehremanî, koçberî, nefikirin, afatên xwezayî (erdhej, hezaz, lehî, bager, şepe û hwd), bûyerên polîtîk û dîrokî ne ku der barê civakê û rewşê da gelek agahiyan didin.

Mînak di sedsala 20emîn da hin serhildanên Kurdan ên li hemberî dewleta Tirkîyeyê çêbûne, lê ew hatine têkbirin û dewletê zexteke mezin li ser Kurdan kiriye ku dengbêjan wek berdevkên civakê behsa van serhildanan, şerpezebûnê û şîwariyiyê kirine (Güneş-Şahin, 2018: 23). Ji bo kilamên mijara wan şer, serhildan û qehremanî ne “Kekê Xiyasedîn”, “Ferzende Beg”, “Îbo Begê Parsînî”, “Keremê Qolaxasî”, “Xalid Begê Cibrî”, “Şerê Tarxan”, “Şerê Selanîkê”, “Mala Hacî Axa” û “Axao” dibe mînak bînan nîşandan ku hê jî ji hêla gelek dengbêjan va tînan gotin. Dîsa kilamên “Alîkê Battê”, “Mala Aliyê Ünîs”, “Cemîlê Çeto”, “Bişarê Çeto” û “Emê Gozê” jî yênan navdar in ku ji hêla Dengbêj Miradê Kinê va hatine gotin (Kardaş, 2017: 29). Dengbêj van bûyeran li gor naverokê bi dengekî xemgîn û şewat an jî bi kelecana û coş distrînan. Hin caran wek kesekî derva çavdêriya bûyerê bikin bi dengekî nerm û hin caran jî ji ber ku xwe dixin şûna lehengan bi dengekî bilind û mêrxasî kilaman dibêjin.

Ji bilî van eşq, evînan, qîzrevandin, destan, çîrokên gel, zewaca bêdil, evîna di navbera du kesên ji dînan û nijadên cuda jî mijara kilaman in. Ji bo destanên dirêj ên ku dengbêj dibêjin “Mem û Zîn”, “Dewrêşê Evdî”, “Zerîfe Xanim û Elîşêr”, “Kela Dimdimê”, “Mala Zalê”, “Kawayê Hesinkar”, Kerr û Kulik” û “Şemîkê Bêdiran” dibe mînak bînan nîşandan (Taşkın-Yıldız, 2018: 27).



Der barê kilamên eşq û evîniyê da kilamên li ser zimanan belav bûne û zêdetir tîr gotin “Siyabend û Xecê”, “Mem û Zîn”, “Derwêşê Evdî”, “Sînem”, “Têlî”, “Wey Dil”, “Dîlber”, “Zembîlfiroş”, “Lê Lê Qazê”, “Misafiro”, “Kewê”, “Lawikê Metînî”, “Esmer”, “Helîmcanê”, “Xezal Dînê”, “Salih û Nûrê”, “Emro” û “Şarê” mînakên baş in.

Çîrokên gelerî jî mijareke din e ku “Fatima Salih Axa”, “Bedran û Huzna”, “Reşît Paşa” û “Huso û Nazê” dibe mînak bîr nîşandan (Taşkın-Yıldız, 2018: 29). Ji bo zewaca bêdil a ku jin ji mêrê xwe nerazîne û her tim ji wan ra dibêjin “mêrê kotî”, “miskînê mêran” û hwd jî mînak dikarin bîr nîşandan. Kilamên “Bermaliya Mêrê Kotî” û “Xalê Cemîl” zêdetir tîr zanîn. Her çiqas ji bo zewaca bêdil mînakên jin ji mêrê xwe ne razî ne bîr nîşandan jî di civakê da mîrên ku nexwestine bi jinekê ra bizewicin, lê ji ber zora malbatê, şert û mercan hatine zewicandin (mînak bira dimire bi jinbira ra dizewicin) jî hene. Bi kurtasî mijara kilamên dengbêjan li ser kar û bûyerên dinyayê ne ku em bi çend hevokên Öncü yêr der barê mijarê da gotinên xwe dawî bîrîn ku ew wiha dibêje:

“Bi pîranî mijara berhemên ku dengbêj diafirînin evîn û evîndarî, xweza, qencî û neheqî, şer û pevçûn û hê di gelek mijarên weke van de, gotin li ser gotinê, bi kurdiyê herikbar û şêwazê wêjeyî dirêj dibe û diçe. Bûyer carinan doza di nav mîran de ye, carinan di nav du hezkiriyên belengaz de ye, carinan jî doza di nav du gel an eşîran de ye” (Antolojiya Dengbêjan-1, 2011: 25).

## 2.6. GER Û RÊWÎTIYA DENG BÊJAN

Di nav taybetmendiyên dengbêjan da taybetmendiyeke jî ew e ku ew gerê, civatê, dîtina welêt û herêmên din hez dikin. Lewra her rêwîtî û ger ji bo wan tecrube, serpêhatî û çavdêrî ye, dîtina û zanebûna wan a li ser dinyayê û însanan zêde dibe. Bi saya van ger û tecrubeyan ew dikarin di navbera civaka xwe û civaka ku nû nas dikin da muqayeseyê bikin, dan û stendina agahî û çandê bikin. Dengbêj kîsê xwe bi bûyer, çîrok, kilam, serpêhatî, çand û keleşorê tijî dikin, paşê bi deng û vegotina xwe wan digihînin civaka ku lê dijîn. Berê her yek ferdê civakê wek niha ne xwedî derfet bû ku here welat, herêm û duwalên din bigere û bê mala xwe. Lê dengbêjên ku diçûn dihatin bi saya kilamên xwe der barê wê civak, çand û herêma ku çûne da agahî didan, behsa serpêhatiyên xwe dikirin. Walter Benjamin jî der barê ger û rêwîtiyê da wiha dibêje:

“Gotineke pêşyan dibêje ‘Yê ku derdikeve rêwîtiyê xwedî tiştan e ku wan bibêje’, naxwe li ber çavê gel çîrokbêj ew kes e ku ji dûr tê. Lê ji bo wan

guhdarîkirina kesê li mala xwe maye, bi namûsa xwe jiyana xwe didomîne, çand û çîrokên herêmê dizane jî tiştêkî bi kêf e. Heke em van herdu çîrokbêjan bi rêya nûnertiya çaxên berê simbolîze bikin, yek cotkar e û yê din jî behre van e.” (1993: 168).

Wek Benjamin balê dikşîne ser çîrokbêjan, dengbêj jî bi çand û kelepura lê dijîn kîsê xwe tijî dikin, paşê diçin cihên dûr û dema vedigerin behsa serpehatiyên xwe dikin, bi kilaman va ji civaka xwe ra behsa gelek agahiyan û tiştên qewimîne dikin. Yan jî agahiyan civaka xwe dîsa bi rêya kilaman digihînin wan cih û waran. Der barê mijarê da Kardaş (2017: 28) jî dibêje dengbêjên mezin çûne xurbetê, li erdnîgariyên cuda geriyane Evdalê Zeynikê û Karapêtê Xaço ji wan du kes in û wiha dewam dike:

Evdalê Zeynikê li Serhedê jiyaye, lê ji ber sedemên cuda çûye hemû rojhilat û başûrê rojhilatê, heta wisa ku çûye seferên şer (Di sedsala 19emîn da şerê Xozanê ya ku ew dev ji jiyana koçberiyê berdin) û heta Behra Spî jî çûye... Salihê Şirmexî jî ji bo hunera xwe pêşkêş bike û bi sedemên cuda gelek caran çûye Îran û Iraqê.

Dengbêj Karapêtê Xaçoyê ku jiyana wî bi gelek zehmetiyan derbas bûye jî her çiqas li Batmanê hatibe dinyayê jî, çûye Ermenistanê, Sûriyeyê li herêma Qamişlo û Hesîçeyê û Beyrûta Libnanê (Kevirbirî, 2009: 56). Dengbêj dema diçin xurbetê, li warên cuda digerin helbet bi tenê der barê jiyana, civak, çand, huner, ol û edetên wan deran da agahiyan naynin nav civaka xwe, di heman demê da der barê civaka xwe da jî gelek agahiyan dibin wan cihên ku lê bûne mêvan. Di navbera civakan da wek pireyekê wezîfeyekê pêk tînin, roleke wan a civakî û çandî jî heye. Hikmet (2012: 290) der barê mijarê da wiha dibêje:

Dengbêjan îlahiyên olên ku jê dihatin bawerkirin (Mîtraîzim, Magîcîfî, Zerdûştî) wek kilam digotin, wekî keşîş û wezîfedarên dînî diyar diyar digeriyan û hewl didan civak van baweriyên bawer bikin. Dengbêjan van îlahiyan dixwendin û dema rîtuêlên olî çêdibûn rîtuêl bi rê va dibirin. Tesîr li ser aliyê manewî û derûniya civakê dikirin.

Remezhan Alan (2013: 2529) jî wek Hikmet li ser rola wan civakî û birêvebirina wan a merasimên dînî hûr dibe û dibêje:

Di destpêkê da muzîk û helbest yek bû. Ne ji hikmê wan ji rola dengbêj jî wisa bû. Vî kesê payebilind, merasimên herî kevn (ku tev olî bûn) bi rê ve dibir, di wan de bi meqamî helbest dixwend, ji xeybê xeber dida, nexweşî û bêyomî dahf dikirin... Di nezera pir gelî de dengbêj, remildar û kahîn bû jî.

Dengbêj ji ber ku ji bo şahiyana diçûn duwalên din û dawetên wan deran şên dikirin wek kesên şahiyê bi rê va dibin jî tên nirxandin. Mela Mehmûdê Bazîdiyê ku behsa edet, jiyan, folklor û civaka Kurda dika balê dikşîne ser vê yekê û wiha dibêje: “Û dawetên wan jî zaf bi deng û istiran dibin, ew berîte dibêjin. Dengbêjêd wan heyin, berîtan dibêjin, ew jî bi govend reqs dikin. Lakîn jin û mêr keç û law hemû têk da destêd yekûdu digirin û reqsê dikin” (Celalî, 2016: 180).

Mehmet Öncü jî dibêje dengbêj gerokên dema xwe bûn û mijarê wiha dawî dika:

“Demekê li der û dora Cebel el-Ekrad digeriyan, demeka din li herêma Serhedê li rex serokeşîr, mîr û began bûn û li dîwan û dîwanxaneyên wan cihekî bi rûmet digirtin. Kesên dengbêj peyvên xwe weke libên tizbiyê berdidan ser hev û kesên li doraliyên wan ji xwe re heyran dihîştin. Bi huner û zarxweşiya xwe her dem hemû kes li benda hatina wan bûn, çima ku guhdarîkirina wan bextewariyeke mezin û rûmeteke giranbiha bû” (Antolojiya Dengbêjan, 2011: 23-24).

Dengbêj çiqas bigeriyan, çiqas beşdarî dîwan, şevbuhêrk, dawet û şahiyana bûbûna bîra wan ewqasî xurt, nêrîna wan jî ewqasî firehtir dibû. Bi saya van tecrube, ger û rêwîtiyan ji ber xwe gelek kilam derdixistin û ev kilam dibûn nav û dengê wan. Assmann dibêje di çanda devkî da qîmeta hozanekî çend çîrok vegotina wî va (7, 20, 300) dihat nirxandin, yanê çiqas zana bûbûya qîmeta wî jî ewqas zêde dibû (2018: 107). Heman gotin dibe ji bo dengbêjan jî bê gotin, lewra wan jî çiqas kilam ji ber xwe derxistana, çiqas kilam bigotana, li çiqas dîwan, şîn, şahî û cimaetan cih bigirtana qîmeta wan ewqasî zêde dibû, nav û dengê wan dihat bihîstin.

## **2.7. DI DENG BÊJİYÊ DA ŞÊWAZ (USLÛB)**

Uslûb peyveke erebî ye ku tê meneya rê û awaya vegotinê, şêwaz û rêbazê (Komisyon, 2011: 2451). Dema tiştêk bê gotin, hunerek bê pêşkêşkirin an jî xebatek bê kirin ziman, vegotina hest, fikr û ramanan, hunandina wê kartekê bi şêweyeke taybet û xweser derdikeve holê ku ev wek uslûb tê pênasekirin. Deng, vegotin, metafor, bikaranîna ziman, tevgerên bedenî û gelek tiştên din dikevin qada uslûbê û der barê kesekî (nivîskar, şair, dengbêj, hunermend û hwd) da agahiyan didin me.

Her dengbêjek xwedî uslûbekê ye ku bi wan taybetmendiyên xwe tînen hezkirin û mora xwe li ser civakê dixin. Heke dengbêjek ziman baş bizanibe, di kilaman da biwêj û gotinên pêşiyana di cih da bi kar bîne, metafor û sembolan bixwe naveroka

kilamên xwe, peyv û gotinên curbicur bi aheng û newayeke xweş bilêv bike, hunerên vegotinê û lihevanîne baş bike û dengê xwe xweş û rewan bigihîne guhdaran wê demê di hişê civakê da li gor dengbêjên din baştir cih digire. Ev hemû uslûb û şêwaz e ku di nav demê da, bi saya tecrubeyê çêdibe.

Dengbêj dema kilaman dibêjin tizbiyê dikşînin, destekî xwe dibin ber guhê xwe, carna çavên xwe digirin, carna xwe li gor rîtm û newaya kilamê dihejînin. Ev tevgerên bedenî ji wan ra dibe alîkar ku ew him kilamê ji bîr nekin û him jî hêsantir bistirên. Bi van hereketan dengbêj nahêlin ew ji wê rewşa efsûnî derkevin û li ser kilamê bêtir hûr dibin. Çavgirtin ji bo wan dibe rê û rêbazek ku ew xwe di nav kilamê da veşêrin û bi dengê xwe wê tehmê bidin cimaeta ku guhdariyê dike. Li gor kilamê carna deng zêde, carna jî kêm dibe, carna bi coş derdikeve û carna jî xemgîn û êş di dengê dengbêj da xwe dide der ku ev hemû jî ji bo dengbêjan şêwe, uslûb û taybetmendî ne.

Her dengbêjek xwedî uslûb, reng û dengê ye û ji van tevgerên bedenî yekê yan jî çend heban bi hev ra bi kar tînin. Helbet her tevgerê wan xwedî meneyekê ye, mînak ji ber ku ew dengê xwe baş bibihîzin destekî xwe dibin guhê xwe. Der barê vê da Kevirbirî wiha dibêje:

“Gelek dengbêj, wexta ku kilam û stranên xwe distrînin an jî hunera xwe bi cih tînin, destên xwe dibin ber guhên xwe. Gelek kes vê yekê bikin jî sedema wê nizanin. Ya rastî ev teknîkeke dengbêjiyê ye. Destê diçe ser guhê dengbêj, bi rastî peywîra monîtoreke tekûz dike. Bi saya vê teknîkê, dikarin guhê bidin dengê xwe û bi vî awayî dikarin dengê xwe kontrol bikin.” (2009: 64)

Di çanda dengbêjiyê da gelemperî du cure dengên sereke tên bikaranîn ku ew li gor cihê ku jê derdikevin wek sewta serî û sewta qirikê tên binavkirin. Dengbêj van sewtan bi kar tînin ku sedemên wan jî hene. Heke dengbêjek kilaman bi sewta qirikê bibêje piştî demekê dengê wî wê bikeve, ew ê kilaman ji bîr bike û biweste. Jixwe ev deng piştî salan ji ber kalbûn û pîrbûnê lawaz dibe û wek berê xurt dernakeve. Lê heke dengbêj sewta serî (sewta mêjî) bi kar bîne dengê wî bêtir wê xurt bibe û ew ê hê demeke dirêjtir bikaribe kilaman bibêje. Dengbêjên serkeftî yên ku navê wan heta îro hatine bêtir bi sewta serî kilam gotine. Dengbêj Şakiroyê ku mijara vê xebatê ye sewta serî bi kar aniyê. Dîsa dengbêjên wek Evdalê Zeynikê, Şêx Silê, Reso, Kawis Axa, Mihemed Arifê Cizîrî, Hesên Axayê Cizrawî, Salihê Bênaî, Huseynoyê Mûşî, Zahiro û Salihê Qubînê sewta serî bi kar anîne (Kevirbirî, 2009: 64). Dengbêj Zahiro wextê

behsa Dengbêj Karapêtê Xaço dike, pesn û wesfên wî dide dibêje bi sewta serî kilamgotin ne karê her mêrî ye (2009: 69) ku Karapêt dikare bi sewta serî kilaman bibêje. Li gor vê agahiya Zahiro jî em têdigihêjin bi sewta serî kilam gotin pisporiyek e, uslûbeke xweser û taybet e.

Bikaranîna enstrûmanê jî di dengbêjiyê da uslûbeke ku li gor herêm û dengbêjan diguhere. Çawa ku dengbêjên enstrûman bi kar anîne hene, yên qet enstrûman bi kar neanîne jî hene. Enstrûmanên muzîkê yên ku dengbêjan bi kar anîne wek ribab, bilûr, def, tembûr û hwd dibe bên rêzkirin. Kendal Nezan (1996: 14) dema behsa muzîka kurdî dike dibêje li herêmên çiyayî bêtir enstrûmanên pifkirinê yên wek dûdik û bilûr ewên olanê didin tîk bikaranîn, lê li cihên deştî jî zêdetir enstrûmanên wek tenbûr tîk bikaranîn. Miradê Kinê ribab bi kar aniye, Mihemed Arifê Cizirî tembûrê xistiye, hêla Serhedê jî (Mûş, Agirî, Îdir û hwd) bilûr tîk bikaranîn (Kardaş, 2017: 38).

Di dengbêjiyê da çawa uslûb, qayde û stîleke taybet hebe, ji bo guhdaran jî divê çend gotin bîkî bilêvkirin. Wextê dengbêj bizanibin cimaeta guhdaran zêde ye û xweş guhdar dikin ew bêtir tîk coşê û xweştir kilaman dibêjin. Ji ber vê ye civat ji dengbêjan ra dibêje “can can”, “sihet xweş”, “bikal keko bikal”, “hahîîî” û hwd. Ejder Ulutaş (2017: 147) jî balê dikşîne ser tîkiliya di navbera dengbêj û guhdaran da û wiha dibêje “Kesek an jî çend kes ji bo alîkariya vegotina dengbêj bikin carna dibêjin ‘hahîîî’, dengê wî metih dikin, ji bo leheng gotinên erênî dibêjin, kelecana dengbêj û xwesteka wî ya kilamgotinê zêde dikin”. Tîkiliya di navbera dengbêj û guhdaran da jî rasterast nebe jî bi vî awayî tesîrê li ser vegotin û uslûbê dike.

## **2.8. DENG BÊJÎ Û PATRONAJ**

Ji demên berê pê va di her civakê da desthilatî (îqtidar) heye ku ev hin caran şexsek e, hin caran saziyek e û hin caran jî komek e ku û ew hêzê di destê xwe da digire û di her qada jiyanê da ya xwe dide kirin. Desthilatî hêzê, dewlemendiyê, şan û şerefê, navdariyê, qabiliyetê û nîrxên wek van yên di civakê da pesnê wan tîk dayîn di destê xwe da digire û dilê wî çawa bixwaze wisa tevdi gere. Lê gelek caran ev hêz û dewlemendî dibe sedema tevgerên hişk ku civak ji vê aciz dibin. Çawa ku di qada siyaset, perwerde û aboriyê da desthilatîyek heye, her wisa di qada hunerê da jî ji mîj va desthilatîyek heye, hinek hunermend, hozan, şair û nivîskar li gor yên din zêdetir derdikevin pêş. Sedema vê jî helbet bi tenê hunera ku pêşkêş dikin nîne, piştgiriya ku

ji desthilatiyê hildidin jî dibe sedema vê desthilatiyê. Têkiliya huner û îqtidarê ya ku wek patronaj tê binavkirin ji hêla aborî, siyaset, azadî û tehakûmê va dibe bê nixandin. Demên berê ji ber ku teknoloji û metbee pêşva neçûbû hunermend, nivîskar, hozan û helbestvanên ku di civakê da dijiyan bê piştgirî (piştewaniya aborî, siyasî û çandî) nikaribûn kar û hunera xwe bi hêsanî bimeşandana. Bibê nebê hewcedariya wan bi piştgiriye çêdibû û wan wisa hunera xwe pêşkêşî giregiran û civakê dikirin.

Înalcık jî balê dikşîne ser patronajê û dibêje heta metbee belav bû nivîskaran jî berhemên xwe yên ilmî û edebî têra xwe debar bi dest xistin hewcedariya zana û hunermendan piştgiriya hikûmdar û kesên payebilind hebû (2003: 9). Lewra hêza wan ya aboriyê kêmtir bû û ji ber vê destê wan nedigihêste cih û deverên dûr ku ew xwe bidin nasîn, hunera wan li ser zar û zimanan belav bibe. Ji ber vê jî di navbera wan û îqtidarê (dewlet, qral, padişah, mîr, axa, beg û hwd) da têkiliyêke dualî çêdibû û herdu aliyan jî ji hevdu sûd werdigirt. Van kesan di berhemên xwe da pesnê îqtidarê û giregiran didan, rûmet nîşanî kesayetî, hêz û otorîteya wan didan. Bi saya gotin û berhemên hunermendan nav û hêza giregiran li cihanê belav dibû. Helbet ji ber vê piştewaniyê carna nikaribûn bi dilê xwe gotinan bibêjin û îqtidarê têra xwe rexne bikin. Gelemperî azadiya wan sînordar dibû, lê hin caran ji ber hêza hunera tê kirin ew bêminet tevdiageriyan û bi tundî rexne jî dikirin. Ji ber hunerê û rewşa dualî îqtidarê û giregiran piştewaniya huner û hunermendan dikirin, hêza wan xurt dibû û navê van kesan û hunera wan belav dibû. Ev têkiliya di navbera wan da bi salan dewam kir heta ku rewşa siyasî, aborî, çandî û civakî li welat û cihanê guherî.

Em dizanin ku demên berê padişah û rêvebirên payebilind ên civakê her tim zana, hunermend, şair û hozanên navdar kişandine tûşa xwe û xwestine ku ev kes li cem wan hunera xwe pêşkêş bikin, pesnê wan bidin û bi hunera xwe va dilê wan xweş bikin. Ji bo vê jî pere, mal û milk dane, bi piştgiriya xwe va hêza wan xurt kirine. Ev têkiliya wan a dualî ya patronajê bi sed salan dewam kiriye. Hin caran dema padişahan cih û war fetih kirine şair û hunermendên navdar yên wê herêmê bi zorê be jî bi xwe ra birine an jî sirgûn kirine (Înalcık, 2003: 12).

Di civaka Kurd da jî heta sedsala 19emîn rêvebirî di destê mîr, beg, axa û serokeşîran da bû, civak bi destê wan kesên arîstokrat (begzade, axazade, mîrzade) dihat rêvebirin. Lê piştî bûyerên dîrokî, siyasî û civakî (şer, pevçûn, desthilatiya nijadên din ên wek Ereb, Tirk, Eceman) hêza wan lawaz bû, ew tîk çûn û di dawiyê da mîrektî ji holê rabûn. Tekin der barê jîholêrabûna mîrektî û begtiyên Kurdan da

dibêje gava di Împaratoriya Osmaniyan da heyama Tanzîmatê dest pê dike qismekî mezin yê begên Kurdan tên sirgûnkirin, împaratorî dest dide ser mal û milkên wan û mehaneyê dide wan ku êdî ew nikaribin bibin pêşengên civaka xwe û bikevin bin emrê dewletê (2017: 62). Em ê bi hûrgilî behsa dîroka mîrektiyan, guherîna rewşa siyasî û civakî û sedemên têkçûna wan nekin, lê em dikarin bibêjin di heyama mîrektiyan da rewşa Kurdan ji hêla aborî, çandî, hunerî û civakî xweş bû. Gelek medrese, qesr, qonax û avahî dihatin çêkirin, kesên xizan dihatin xwedîkirin, piştewaniya feqî, mela, dengbêj, hozan, zana û şairan dihat kirin. Ji ber vê rewşa xweş helbet tesîreke baş li ser huner û edebiyatê jî çêdibû. Wê demê edebiyata klasîk û çanda devkî geş bû, kesên wek hozan, dengbêj û şair di bin hîmayeya mîr û began da dikaribûn rehetir hunera xwe pêşkêş bikin. <sup>8</sup> Aykaç (2020: 61) dema behsa çanda patronajê dike civaka Erebb, Faris, Tirk û Kurdan berawird dike, bi hûrgilî mijarê dikole û dibêje di mîrektiyên Kurdan da patronaja berhemên edebî li gor yê din qasî du sed sal dereng dest pê kiriye.

Ji ber ku axa, beg, mîr, rûspî û serokeşîr xwedî hêz û giraniyê bûn, gotin û tevgerên wan jî wek otorîte dihatin hesibandin meriv li ser şopa wan dimeşiyar, qîmeteke mezin didan şexsiyet û desthilatiya wan. Ev kes li dengbêj û hozanan xwedî derdiketin, destê xwe piştta wan dixistin û alîkariya wan dikirin. Dengbêj û hozanên di bin hîmayeya axa, mîr û began da bûn jî di şîn û şahiyên wan da kilam digotin, pesnê wan didan, şer û pevçûnên qewimîne bi kilaman wek dîroknûsekî li ser çandê zêde dikirin û hewl didan civakê ji van rûdanan haydar bikin. Yanê patronaj û piştewaniyek li holê hebû. Çaçan jî balê dikşîne piştewaniya wan û dibêje dengbêj bi navê axa, beg û mîrên xwe dihatin binavkirin, mînak “Dengbêjê Mala Faro” û “Dengbêjê Xelîlan” (2013: 43).

Zeki Gürür tîne ziman ku gelek dengbêjan hunera xwe li qesr û qonaxên mîr û began îcra dikir, lê çaxê şert û mercên polîtîk û pêwendiyên hegemonîk veguherîn ew xizan bûn, bê hamî man, şêwe û naveroka berhem û kilamên wan jî qels bûn. Gürür (2014: 27-28) mehrûmiyeta wan a ji patronajê wiha destnîşan dike:

Taybetmendiya wê yê destanî tîk çûn, epîk xerab bû û kesên ku ew huner îcra dikirin jî di nav xizaniyê de man. Van geşedanan, hunera dengbêjiyê bi awayekî esasî veguherand û mirov dikare wê serdemê wekî serdema klasîk bi

---

<sup>8</sup> Der barê rewşa mîrektiyên Kurdan da û patronaja edebî ya di van mîrektiyan da teza doktorayê ya Yakup Aykaç çavkaniyeke girîng e û agahiyên zêdetir dihebin.

nav bike. Bi guherîna têkiliyên hegemonîk ve, piştî ku mîr û begên Kurdan têk çûn ew jî êdî ji patronajê/hîmayeyê mehrûm man. Piştî sedsala XXan bi pêşveçûna îmkânên nivîsê û tezahurên şoreşa teknolojiyê rituelên devkî zû guherîn.

Alan (2013: 252) jî piştî têkçûna mîrektiyan (rastî sedsala 19emîn tê) behsa rewşa nebaş a ku hatiye serê dengbêj dike û vê wek “qedandina bohemyayê” bi nav dike. Alan dibêje ew kesên dengbêjê filan mîr, axa û paşayan bûn êdî wê payeya maqûliyê winda dikin, dibin sazbandên dîlan û şahiyên, di şer û cengan da rola wan a nivîsandina waqayînameyê ji ber bêpiştbûnê ji holê radibe û ew dibin kesên ji rêzê.

Dengbêjên ku dixwestin bi nav û deng bibin, navê wan li ser zimanan belav bibe û dengê wan bigihêje herêmên cuda helbet dixwestin mîr, beg û axa piştevaniya wan bikin û ew jî civatên wan bixemilînin û pesnê wan bidin. Van kesên xwedî hêz û esalet jî dixwestin ji hêza dengbêjan sûdê werbigirin. Di navbera dengbêj û van kesên arîstokrat da têkiliyeke dualî hebû ku Güneş û Şahin (2018: 28) jî fikrên xwe wiha tînin ziman:

Dengbêj di hêlekê de weke çapemeniyeke devkî xebitîne. Bûne berdevkê îfadekirina bûyer û kirinên giregirên Kurdan. Giregirên Kurdan jî xwestine ku vê hêza dengbêjan bi kar bînin. Bi vî awayî herdu terefan bi hev re pêwendîdariyek sist lê bi aqilane pêk anîne. Lêbelê ev rewşa nayê wê wateyê ku dengbêj tevahî bi van kesên navborî ve girêdayîne. Di navbera van kesan û dengbêjan de pêwendiyek sist heye. Dengbêjek kîjan mal û dîwanê bixwaze dikare biçe wir û li wir bistrê.

Dengbêjên li cem axa, mîr û began bûn an jî civata wan dixemilandin dema ger, şer û bûyereke girîng çêdibû li gel axa, mîr û began amade dibûn û ew jî diçûn. Serkeftinên axa, mîr û began yê di şeran da bi kilamên xwe vedigotin ku ew di bîra civakê da bîr parastin. Dîsa têkçûn, komkujî, erdhej, mirina egîd, axa, mîr û began û bûyerên neyînî jî ji hêla van dengbêjan va wek kilam dihatin gotin ku civak wan jî ji bîr nekin û jê dersekê hildin.

Dema em berê xwe didin dîrokê, Surmeli Memed Paşa xwedî hin dengbêjan e ku yek ji wan jin e û navê wê “Gulê” ye. Gulê eslê xwe Ermenî ye, rojekê ew û dengbêj Evdalê Zeynikê davêjin ber hev û lecê dikin. Dema Evdalê Zeynikê bi ser dikeve dibe dengbêjê Surmeli Memed Paşa (Ulugana, 2015:167). Şêx Silê dengbêjê Tahirxanê Qeleniyê ye ku ew û dengbêj Evdalê Zeynikê li Îranê li dîwana Tahirxan heft roj û heft



şevan ketine lecê û Evdalê Zeynikê bi ser ketiye (Aras, 1997: 120). Selîmê Silêman dengbêjê begê Hîzanê Mîr Şeref e, Izerê Mecîd dengbêjê Bedirxan Beg e, Evdilhadî dengbêjê malbata Cemîl Paşa ye, Karapêtê Xaço jî dengbêjê serokê eşîra Reşkotanan Filitê Quto ye (Kardaş, 2017: 32). Dengbêj Resoyê Gopala wek dengbêjê dîwana Mela Yehya (Gunduz) tê naskirin (Yıldız-Taşkın, 2018: 33) û paşê li gundê Koxakê ya li ser Kopa (Bulanik) navçeya Mûşê bûye dengbêjê Şêx Xiyasedîn Emre (Yüksel, 2011: 111).

Dengbêj Karapêtê Xaço (Karapêt Xaçaturyan) yê ku dengbêjê Filitê Quto ye di hevpeyvîneke xwe ya li gel Salihê Kevirbirî (2009: 39) da behsa dengbêjiya berê dike. Em ji agahiyên wî der barê patronajê da digihêjin hin hûrgiliyan û ev mijar bêtir zelal dibe. Karapêtê Xaço wiha dibêje:

Lawo qey dengbêjiya berê ma? Berê jixwe axa hebûn û dengbêjan jî ji wan re digot. Ku dengbêj li gorî dilê axê kilamên xwe bigotana, axê jî dengbêj û jin û zarokên wî xwedî dikir. Deng tê te? Axa û beg biçûna kû derê, dengbêjê xwe jî bi xwe re dibirin. Heke li ba axayê din dengbêjek hebûya, wê herdu dengbêjan bi hev re heta sibê bigotana, heta zora hev bibirana. Dengbêj ji bo axan kêf bûn. Ev hemû dengbêjiya berê bû.

Wek Xaço jî tîne ziman dengbêjiya berê ji ya îro cudatir bû, axa, beg, mîr û serokên eşîran xwedî dengbêjan bûn, di rojên girîng, şîn û şahiyên da dengbêj diezimandin. Ji bo wan dengbêj nîşaneyê hêz, rûmet û serbilindiyê bûn, lewra dengbêjan pesnê axa, beg û mîrê xwe didan, bi wan ra diçûn şer û seferan li wir bêhna wan dianîn ber wan û dilê wan xweş dikirin. Dema dengbêjên axa û mîran bi hev ra diketin pêşbaziye, davêtin ber hev kî bi ser biketa bi awayekî ji bo beg axa û mîrê xwe dibûn sedema serfiraziyê û pesindayîne. Îro ev cure dengbêjî û tîkiliyên patronajê hema hema bibêje nemaye, pir kême. Lê siyasetmedar Şerafettîn Elçiyê demekê wezîrî kiribû qedrê dengbêjan girtiye û alîkariya wan kiriye. Elçî, Aşiq Selîm (Mehmet Selim) bi xwe ra biriye meclis û sohbetan, hewl daye ew kilaman bibêje û hunera xwe pêşkêş bike (Kardaş, 2017: 32). Dîsa ji dîroka nêzîk meriv dikare behsa siyasetmedar Xiyasedîn Emre û xwedîderketina wî ya Dengbêj Reso jî bike. Evdilkerîmê kurê Dengbêj Reso dema behsa bavê xwe dike dibêje di dawiya emrê wî da Xiyasedîn Emre Dengbêj Reso biriye nexweşxaneyê, li Enqereyê li wî xwedî derketiye (Yüksel, 2011: 111). Elî Rizayê kurê Şêx Xiyasedîn jî dema behsa Dengbêj Reso û tîkiliyên bi bavê xwe ra dike, dibêje Dengbêj Reso û Dengbêj Huseyno gelek

caran di cimaeta bavê wî da kilam gotine, avêtine berhev, kasetên tê da 40-50 kilam hene tijî kirine û wiha dibêje: “Min xizmeta wan û şofêrtiya wan dikir. Bavê min helbet alîkariya wî jî dikir, şabaş didayê, îxtiyacên wî êdî nizanim her çi hebe peyda dikir. Di nexweşxaneyê da jî li wî xwedî derket, heta merzelê wî jî da çêkirin.” (Elî Riza Emre, Pêwendiya tîlefônî, 30yê Gulanê 2021).

Mehmet Yıldırımçakar (2020: 92) jî dema behsa patronajê û dengbêjiya jinê dike balê dikşîne ser hin jinên wek dengbêj tîn qebûlîkirin (Eyşe Şan, Meryem Xan, Sûsika Simo, Fatma Îsa, Îran Mucerdî) û dibêje wan di radyoyên Rewan, Bexda û Urmîyeyê da kilam û stran gotine, navê xwe dane bihîstin ango cara ewil di bin patronaja radyoyan da dengbêjiya profesyonel îcra kirine.

Dengbêj Şakiroyê mijara xebata me ye jî di civakê da rûmeteke mezin dîtiye, ji hêla gelek kesan va hatiye hezkirin û qedrê wî hatiye girtin. Lê belê ji ber ku hêz û saziyeke piştewaniya wî bike, li wî xwedî derkeve tunebûye, di pêşkêşkirina hunera xwe da wî jî pir zehmetî kişandiyê. Şakiro wek gelek dengbêjan ji ber bêderfetî û rewşa aboriyê rojên teng dîtiye, koçî çend bajaran kiriye û di dawiyê da li Îzmirê çûye ber rehma Xwedê. Taş (2015: 71) jî behsa vê yekê dike, dibêje mînaka Şakiroyê ku ji hêla Kurdan va dihat nasîn û gel jê hez dikir jî ji ber sedemên aboriyê koç kiriye, li hemberî feqiriyê têkoşiyaye û di nav wê rewşê da miriyê nîşan dide ku şert û merc ji bo dengbêjên din jî çiqas giran e.

## 2.9. DENGBÊJÎ Û JIN

Dengbêjî û jin yan jî dengbêjên jin ji hêla hişmendî û nêrîna zayendî hin pîrsgirêkan di xwe da dihewîne. Lewra wextê zayend tê bilevkirin ji hêlekê va bi veşartî tê gotin dengbêjî qada mêran e, ji jinan ra girtî ye û jin nikarin vê hunerê bikin. Çima nikarin bikin? Ji ber ku ne xwedî wê qabiliyetê ne, kêmasiyên wan heye, eyb û şerm e, ew ne hevtayê mêran in, ev huner ne li gor wan e, şert û mercên wan ên jiyane nahêle ew vê yekê bikin. Yanê dengbêjî ji hêla mekan, çand û civakê va layîqê mêran tê dîtin û tê gotin ne li gor jinan e. Heman tişt ji bo nivîskar, hunermend û helbestvanên jin jî mimkun e ku bê gotin. Huner, zanist, nivîskarî, xebatên entelektuel bi kurtasî karên ku mîr zêdetir dikin û ji jinan ra hatiye sînordarkirin jinê di wê çarçoveyê da asê dike, nahêle kar û hunera wê derkeve pêş û zayenda wê tê rexnekirin. Li ser vê tesbîte gelek şîrove dibê bîr kirin, mijar hê berfirehtir bê veçirandin, lê em ê zêde li ser nesekinin û bi kurtasî behsa mijarê bikin.

Gelê Kurd di nav gelên Rojhilata Navîn da miletekî xwedî dîrokeke kevnare ye. Ji hêla çand û kevneşopiyê ew jî wek civakên din ên vê erdnîgariyê civakeke mêrane ye, serdestiya mêran xurt e. Di civakeke wiha feodal da helbet rola jinê û hêza wê jî li gor mêran kêmtir e û der barê vê da gelek rexne, şîrove, analîz, fikr û raman tîn parvekirin. Lê li gor jinên civakên din ên Rojhilata Navîn jinên Kurd hinekî rehetir tevgeriyane û jiyane. Mînak, jin di dawetan da ketine destê mêran, kilam û stran gotine, yê misilman gelemperî çarşef li xwe nekirine û rûyê xwe tevahî nenixûmandine ku wek Mela Mehmûdê Bazîdî jî dibêje derketine pêş mêran (Celalî, 2016: 163).

Lêkolîner, mîsyoner, dîplomat û siyasatmedarên biyanî yê wek Millingen (1848-1878), Sykes (1879-1919), Hay (1851-1920), Nikitin (1885-1960), Edmonds (1889-1979) jî dema li Kurdistanê mala axa û begên Kurd mane çavdêriya jinên Kurd û statûya wan kirine di bîranîn û berhemên xwe da bal kişandine ser vê yekê û gotine ew li gor jinên Rojhilata Navîn û Ereban bêtir paqijtir, xweşikîtir in, cil û bergên wan rengîntir e, derdikevin pêş mêran, bê rûpoş in (Çifçi, 2014: 81). Di bin siya van agahiyan da dibe bê gotin ew li gor jinên din hinekî rehet bûn, lê ev nayê wê meneyê ku ew gelekî azad bûn, wek hemtayê mêran karibûn her tiştî bi hêsanî bikin.

Di civakeke otorîteya mêran xurt be da him ji ber hêza mêran û him jî ji ber ku kevneşopî û çand ji jinan ra hin sînoran datîne tesîreke neyînî li ser çanda dengbêjiyê û jinê çêbûye. Ji bilî vê dîne Îslamê û mezhebê Şafîyan jî (ev mijar tê nîqaşkirin hin kes dibêjin dîn wisa nabêje) der barê jinan da qedexeyan tîne ku dengê jinê heram e, divê rûyê mêran nebîne, tena serê xwe neçe û neyê ku ji ber van jî jinan bi hêsanî dengbêjî nekirine. Di civakê da wezîfeya dêtiyê (dayik) û kewanîbûnê pîroz tê nîşandan, ji wan ra tê gotin divê ew li gor xweza û biyolojiya xwe tevbigerin. Helbet ev jî jiyana jinê li gor mêran gelekî sînordar dike û di çanda dengbêjiyê da ev jî bûne sedemeke din ku jin nikaribin bibin dengbêj, zarokên xwe û mala xwe bihêlin herin civatan, li şîn û şahiyên, qadên şer û duwalên din dengbêjiyê bikin, bi rojan û mehan ji mal û malbata xwe dûr bimînin.

Kesek çawa dest bi dengbêjiyê dike, li ku perwerdeyê dibîne, çawa diçe dîwan, şevbuhêrk û civatan, çawa bajar û welatên din digere, çawa bi dengbêjên din ra dikeve lecê, hunera xwe çawa di bin patronaja axa, beg û mîran da pêşkêş dike ev hemû bûn xalên girîng ên mijara dengbêjiyê ku me bi hûrgilî behsa van kir. Di bin siya van agahiyan da dema em berê xwe didin dengbêjiya jinê em dibînin jinên bi vî awayî bi rehetî dengbêjî kirine pir kêmtir in. Di dengbêjiyê da ji ber sedemên behsa wan hatin

kirin û patronaja ji bo dengbêjên mêr hebû, ji bo jinan tunebû, jin dervayî vî sînorî dihatin girtin. Hêja (2015: 40) jî dengbêjiyê wek dengbêjiya bi patronaja mîran hatiye palpiştkirin (profesyonel) û dengbêjiya serbixwe (amator) dabeş dike, dengbêjiyê wek çandekê mêrane dinirxîne û dibêje:

Dengbêjiya profesyonel deriyê xwe ji jinan ra girtiye. Nehatiye dîtin ku mîrekî dengbêjê jin ji xwe re girtibe ji bo pesnê wî bê vedan. Loma dengbêjên jin tu car debara xwe bi dengbêjiyê nekirine. Ji ber ku dengbêjên jin yê ne xwedî “pere û ode” (Wolf, 6) ango patronajê bûn, dengbêjiya profesyonel bi gelemperî ji aliyê mêran hatiye îcrakirin û dengbêjiya amator jî ji bo parvekirina jinan û mêran maye.

Her çiqas Hêja û hin kesên din bibêjin mîr û begên xwedî dengbêjên jin di dîrokê da tunebûn jî li gor agahiya hevpar a gelek çavkaniyan em dizanin di dîrokê da dengbêjê jin a bi navê Gulê (Gulêya Fileh) jiyaye û ew dengbêja Surmeli Memed Paşa bûye (Öztürk, 2012: 109, Öztürk, 2014: 41, Kardaş, 2017: 32, Ulugana, 2015: 167, Yıldız-Taşkın, 2018: 47). Paşa yek ji wan serokê alaya Hemîdiyeyê ya Osmaniyan bûye ku Gulê (eslê wê Ermenî ye) û Dengbêj Evdalê Zeynikê li dîwana Paşa ketine lecê, Gulê têk çûye û piştî vê bûyerê Evdal jî bûye dengbêjê Surmeli Memed Paşa. Dîsa behsa dengbêjê jin bi navê Pero ya di sedsala 19emîn da jiyaye tê kirin ku dibêjin ew dengbêja Evle Begê Ebexê bûye (Öztürk, 2014: 41-42). Tê gotin dengbêjê jin bi navê Hemîde ya ji Hekariyê jî di serê salên 1900î da jiyaye (Öztürk, 2012: 109).

Bi mînakê û duduyan va em nikarin vê îdiayê piştrast bikin û bibêjin gelek dengbêjên jin ên wek mêran bi rehetî dengbêjî dikirin hebûn. Ji ber ku me bi xwe dengê wan nebihîstiye, der barê wan da belge û zêde agahî tune. Ji ber van sedeman em nikarin piştrast bikin û bibêjin wan jî wek mêran bi rehetî hunera xwe li her derê (dîwanxane, şevbuhêrk, şîn û şahî) pêşkêş dikirin, ji vê hunerê pere, mal û milk qezenc dikirin, bi kilamên xwe dîrok dinivîsîn, bîra civakê ava dikirin, di bin siya patronaja axa, mîr û began da diçûn şer û cengan, welat û herêmên din digeriyan û repertuara xwe berfirehtir dikirin.

Nivîskar Virginia Wolf dibêje li cihanê jîndara herî zêde nîqaş li ser tê kirin jin e (1988: 32), li gor fikra me jî tesbîta wê rast e. Lewra her çiqas jinan ji bo karên huner û zanistê derfet nedîtibin jî ew her tim bûne mijara sereke ya berhemên mêran û di her qada jiyanê û hunerê da behsa wan hatiye kirin. Di dengbêjiyê da jî rewş wisa bûye,

heke zêde neyê romantîzekirin em dikarin bibêjin di koka dengbêjiyê da avzêmin jin e. Jinan him wek serîrakirin û têkoşîneke li hemberî hişmendîya mêrane (sînordakirina bav, bira, mêt, ap, xal û pismaman) û him jî wek berdevktiya dil û mêjiyê xwe her tim kilam, stran, lorik, zêmar, payîzok, lawîj, heyranok û hwd gotine. Ji bilî gotina van tiştan ew bi xwe jî bûne mijara kilaman û li ser wan bi sedan berhem derketine holê.

Heke di vê çarçoveyê da bê nîrxandin Mela Mehmûdê Bazîdî dema behsa mijara mirin û şînê ya civaka Kurd dike balê dikşîne li ser jinên dengbêj û tîne ziman ew di şînan da lawîjok û siwaroyan dibêjin, dikin kurînî û digirîn (Celalî, 2016: 239). Dîsa di civakê da qîzên xama û ciwan li serê kanî û çeman ji dildar û hezkiriyên xwe ra kilaman dibêjin (Uygar, 2009: 44). Em dizanin hin kilamên mêrxasî û tîkçûyîne jî ji hêla jinan va tîne gotin ku em ji gotinên wek “mala bavê min”, “berxê mala bavê min”, “bavê bavê min” pê derdixin ew ji hêla jinan va hatine gotin (Çifçi, 2014: 96). Dîsa gelek kilamên behsa dîroka Kurd, şerên destanî, çîrokên eşqê yê biêş dikin jî ji hêla jinan va hatine gotin (Schafers, 2016: 25). Di dîroka nêzîk da jî hin dengbêjên jin ên wek Eyşe Şan, Meryem Xan, Werda Şemo, Fatma Îsa, Asa Evdile, Xana Zazê, Naza Kokil, Zadîna Şekir di radyoyên Bexda, Yêrîvan û Urmiyeyê da kilam gotine (Deveci Bozkuş, 2011: 103).

Wek gelek mîletan di nav Kurdan da jî hêz û rola jinê her ku diçe li hemû qadên jiyanê zêdetir dibe. Bi taybetî piştî salên 1980-1990î ji bo ku Kurd jî wek nijadên din azad bibin û wek neteweyên modern li cihanê xwe derxin pêş ji aliyê polîtîk va jin jî derketine pêş. Lê ji bo wan hîn sînor hatine danîn ku divê ew bi abûr û namusa xwe tevbigerin, ji çarçoveya “pîroziya dozê”, “biratî”, “hevrêfî”, “îlahebûnê” (*tanrıçalaşma*) ya ku dîsa ji hêla mêran hatiye xêzkirin dernekevin, ancax li gor van şertan ew dikarin bibin endamê vê civaka nû û dibin xwedî nasnameya nû (Çelik, 2014: 643). Di civakeke wiha nû ya li gor berê hinekî rehetir da helbet cihê jinê û rola wê jî li gor berê guheriye ku tesîrên vê di qada dengbêjiyê da jî tîne dîtin.

Di bin serenava veguhastina çanda dengbêjiyê da me behs kiribû ku îro dengbêjiyê forma xwe hinekî guhartiye, mekanên dengbêjî lê tîne pêşkêşkirin bigire heta mijarên berhemana ew êdî rasterast ne wek berê ye. Di vê guherînê da em dibînin li gor berê êdî hejmara jinên xwe wek dengbêj bi nav dikin zêde bûye. Ew li Mala Dengbêjan, di bernameyên televizyon û radyoyan da û li ser medyaya civakî kilaman dibêjin û behsa zehmetiya dengbêjiya jinan a berê û derfetên îro dikin. Dengbêj Gazina

(Raziye Kızıl) ku di 21ê Tebaxa 2018an da wefat kir di hevpeyvîneke xwe da behsa zehmetiya dengbêjiya jinan dike û hestên xwe wiha parve dike:

Li gund dengbêjî yanê huner ji jinan ra qedexe ye. Li hemberî mêran tu carê tişteki wisa tune. Dema em diçûn çiya û zozanan derfeta me çêdibû û me digot (kilam). Di dawet, şahî û cejnan da me digot, lê di hundir da. Ji bo me tu carê nedibû qîsmet an jî derfeta me çênedibû ku em li cem mêran xwe bînin ziman. Tê bîra min ez biçûk bûm, pîrika min jî dengbêj bû. Jina apê min û bavê min jî dengbêj bûn. Yanê di malbata min da rûhê dengbêjiyê hebû (Öztürk, 2012: 149).

Dengbêj Saîde jî dibêje wê di 15 saliya xwe da dest bi gotina kilaman kiriye ku wê çaxê bi tenê di nav civata jinan de kilam gotina wê serbest bûye û wiha behsa tengasiya rojên berê ya dengbêjên jin dike: “Dema ku dengê min biçûya mêran malbata me, hişyar dikirin û digotin qîz û keçên we kilaman dibêjin. Li ser vê yekê me jî bi dizî kilam digot” (Öztürk, 2014: 41).

Li Mala Dengbêjan a Diyarbekirê Dengbêj Feleknas ya di nasnameyê da navê wê Feleknaz Esmer e û eslê xwe ji Mûşê ye kilaman dibêje (Antolojiya Dengbêjan-1, 2007: 173). Li Mala Dengbêjan a Wanê ya mêr lê zêde ne jî Seîde, Raziye, Altun, Behiye û Meryem li cem dengbêjên mêr rûdinên kilaman dibêjin (Öztürk, 2012: 130).

Di bin siya van agahiyên da heke em wek encam behsa têkiliya dengbêjiyê û jinê bikin em dikarin bibêjin ku jin hatine sîno-darkirin, lê dema bûyerên dişewat çêbûne wek her kesî jinan jî hestên xwe anîne ziman, giriyane, lorandine ku ev gelek caran bûye sedema avakirina kilaman. Çelik (2022: 104) jî der barê zimanê jinane ya di kilaman da dibêje ji bo cihê jinan ya di civakê de baş bê fêmkirin, rol û statûya wan bê dîtin kilam daneyên giranbiha ne.

## **2.10. DI DENBÊJIYÊ DA CUREYÊN BERHEMAN**

Di dengbêjiyê da der barê nav û naveroka cureyan da hin agahiyên ji hevdu nagirin, li ser nîqaş tînin kirin hene. Terminolojiyeke hevpar a her kes li ser hev dike mixabin hê ava nebûye, nav û naverok hê jî ne zelal in. Li herêmekê ji bo cureyekî navek tê gotin, lê navê heman cureyê li herêmeke din cuda ye, an jî nav heman tişt e lê naverok ji hev cudatir e. Dema xebatên hatine kirin bînin lêkolînkirin wê bê dîtin hin agahî hatine dubarekirin û van kêmasiyan her wisa dewam kiriye. Navê cureyên di xebatan da hatine behskirin gelemperî dilan, lawik (lawje), lawikê siwaran, heyranok, payîzok, dîlok (stranên dîlanê), zêmar, kilamên şîne ne. Em ê bi hûrgilî behsa hemû

cureyan nekin lewra cureyên bi mijara xebata me ra eleqedar e kilamên şer (serhildan, pevçûn û qehremanî) û kilamên şînê (zêmar) ne.

### **2.10.1. Kilam**

Kilam di nav çanda dengbêjîyê da cureyek e, xwedî naverokên taybet e û ji hela dengbêjan va tê gotin. Gelek caran peyva kilam û stranê bi hev ra, an jî şuna hev tên bikaranîn, lê ya rast ew ne heman tişt in. Uygur (2009: 27) jî balê dikşîne ser vê û dibêje stran xwedî melodiyekê ne, rîtmekê wan heye û hêsan tên gotin. Kilam peyveke erebî ye, di jêderka xwe ya erebî da jî tê wê meneyê ku karibe di hiş û bîran da bimîne, karibe were dubarekirin û mebesta xwe ya ‘raguhastinê’ bêkêmasî cî bi cî bîne (Zeraq, 2020: 9). Hin kes kilaman wek stran û dîlok pênase dikin (Îzolî, 2007: 336), hin herêman jî ji bo hemû berhemên devkî yê dengbêjîyê ew wek pênaseyeke giştî tê bikaranîn (Kardaş, 2017: 116).

Gelempêrî naveroka kilaman şer, pevçûn, qehremanî, mêrxasî, evîn, xweza, şîn û şahî ne. Piraniya kilamên dengbêjan ji aliyê mijarê va epîk in, yê dengbêjên navdar ên mîna Evdalê Zeynikê, Karapêt, Reso û Şakiro li ser bingeha mêrxasiyê ne. Mijarên dîrokî, civakî û neteweyî di nav hev da cih digirin (Yıldız-Taşkın, 2018: 25). Ji bo taybetmendiyên kilaman jî Yorulmaz (2017: 56) hin xalan derdixe pêş û wan wiha rêz dike;

Hemû kilamên dirêj bi mirina leheng va diqede, lehengên kilaman her tim t êk diçin, kilam bi dawiyêke kêfxweş va naqedin, kilam cidî ne û tu carê tê da ken û mîzah tune, di hemû kilaman da yê ji bilî dîwanan ên pesnan didin ne tê da leheng dilpak in, di kilaman da exlaqekî li gor dilpakiyê heye.

Li gor bal kişandina Kardaş (2017: 116) kilam bi awayekî teatral tên vegotin. Schafers (2016: 25) jî dibêje kilam cureyeke ku ji muzîkê zêdetir nêzî zimên e. Hamelink (2016: 31) jî kilaman wek berhemên taybet dinirxîne û dibêje kilam dîrokî ne, zimanekî wan ê arkaîk heye û ew bi awayekî cuda tên gotin.

Em jî li ser wê baweriyê ne ku kilam ji stranan cudatir in, ji dervayî muzîkê sînoreke wan a berfireh heye. Ew ziman, nasname, bîr, çand û kodên neteweyî di xwe da dihewînin. Ji ber ku em ê di beşa şîrovekirina kilamên Şakiro da zêdetir li ser vê mijarê hûr bibin em bi çend xalan ve mijarê zêlaltir bikin û bibêjin kilamên dengbêjan ne dervayî sînoren dîrok û bîra fermî ne. Li dijî îdeolojiya fermî meydanê dixwînin û qadeke serbixwe û alternatîf ava dikin. Dema li ser kilamên şer, qehremanî û şînê lêkolînên berfireh bînin kirin wê bê dîtin ku dîroka fermî ya hegemonîk û dîroka di

kilaman da xwe dide der ji hev cuda ye. Bûyer çawa qewimîne, tesîreke çawa li ser kesan û civaka Kurd çêbûye bi saya kilaman bi bîreke zindî heta roja me ji nîşan derbasî nîşên din bûne.

### **2.10.2. Kilamên Şînê (Zêmar)**

Ev kilam ji bo kesên mirine ango pey mirina yekî, yan jî piştî bûyerên biêş û xembar tên gotin. Wateyên zêmarê yên di ferhangan da cih digirin bi sê şiklan tê nîşandan; ya ewil mersiye, lawika miriyan, ya duyem girî, girîna diya bûkê û ya sêyem jî helbestên li ser karesatan e û ji wan stranên bi şewat in (Yıldız-Taşkın, 2018: 30). Vladimir Propp (1998: 53) der barê zêmaran da dibêje ew di navbera stranên epîk, lîrîk û ayînî de dimînin, lewra ji aliye ravekirina hestan va lîrîk e, ji aliye fonksiyonê va ayîn û ji aliye unsûrên vegotinê va jî epîk e û li gor çîrokên gel bêtir cureyeke nû ye.

Zêmar piranî ji aliye jinan ve tên gotin, jinên malbata ku mirî jê derketiye eş, jan û xemgîniya dilê xwe bi van kilaman didin der û hestên xwe vedibêjin, dikin kurîn û digirîn. Ev şîn bi rojan dewam dike, başî, qencî, maqûlî, qîmet û mezinahiya kesê mirî tê gotin, pesnê wî tê dayîn, eş û kedera ji bo wî/wê tê parvekirin. Kardaş (2017: 150) dibêje ew cureyeke edebiyata gelerî ye, lê dengbêj jî wan dibêjin û li hin herêman jinên dengbêj bi pere an jî xelatan di şînan da kilamên şînê dibêjin, ji bo vê jî Fato Korê ya li Cizirê jiyaye mînak nîşan dide.

Mer kêman caran zêmaran dibêjin ku Öztürk (2014: 39) sedema wê wiha zelal dike: “Dema ku dengbêj dibêjin jî bi navê jinekê, dayikekê dibêjin. Mêran zêmar negotine; ji ber ku di dema feodaliyê de diviyabû ku mêr negirîn. Zêmar ji ber vê yekê bûye barê ser milên jinan. Hejmara wan kêman be jî em dibînin ku mêran jî zêmar gotine. Heta wisa ku mirî heke nas, dost û eqrebayê dengbêjekî be ew bi xwe kilamekê çêdike û ev kilam di nav civakê da zûtir belav dibe. Çifçi (2014: 70) der barê mijarê da mînaka Dengbêj Zekî û mirina kurê wî nîşan dide:

Kurê Dengbêj Zekî beriya neh-deh salan li Enqereyê di qezayeke trafikê de dimire. Dema ku Dengbêj Zekî vê xebera reş dibihize, bi lez ji malê dertê. Berê xwe dide nexweşxaneyê. Di erebeya nav bajêr de ji ber xemgîniya xwe kilamekê di wê gavê de çêdike û ji rêwiyan re dibêje.

Ji bo heman mijarê Öztürk (2014: 39) jî mînaka qezaya Mûşê ya di salên 80î da çêbûye û gelek kes mirine mînak nîşan dide. Çaxê qeza çêdibe Dengbêj Cahîd



(agahiya rast Dengbêj Zahiro ye)<sup>9</sup> hema li cihê bûyerê li ser miriyan û qezayê kilamekê dibêje.

Zêmar di nav civaka Kurd da mixabin ji ber şert û mercên ew tê da ne berbalev e û cureyên wê hene. Nurettin Ertekin di maqaleya xwe ya “Zêmar Di Dengbêjiyê De: Dengbêj Şakiro Wek Numûne” da li gor senifandina Huseyîn Nezeriyan cureyên zêmaran rêz dike. Ertekin (2019: 856) wan wek zêmarên şexsî, zêmarên navdaran, zêmarên neteweyî û civakî, zêmarên olî û zêmarên felsefî dabeş dike.

### 2.10.3. Kilamên Şer (Serhildan, Pevçûn û Qehremanî)

Kilamên şer behsa serhildan, şer û pevçûnên li hemberî desthilatdariyê û yê di navbera eşîr û malbatan da dikin. Kardaş (2017: 121) tîne ziman ku ew wek stranên mêranî, kilamên mêrxasî, kilamê siwaran, kilamên şeran an jî delal tîne binavkirin, bi şiklê zêmarê tîne vegotin, di naveroka wan da pesnê serokeşîran, malbat û qehremaniyê tê dayîn, di civakê da rêz li ber tê nîşandan û ew dîwanxaneyan da tîne gotin. Wek Kardaş jî balê dikşîne di van kilaman da behsa şer, serhildan û pevçûnê tê kirin, pesnê qehremanan tê dayîn û ew kes wek “egîd”, “mêrxas”, “berxê mala bavê min”, “bavê bavê min”, “gula civatan” û hwd tîne binavkirin. Heke qehreman ji ber dekûdolabê û xayîntiya hin kesan di şer da tîk çûbe jî xemgînî xwe dide der. Vê carê ji bilî pesnê qehremanan ji bo kesên îxanet kirine jî gotinên nebaş û giran tîne gotin, ew wek “xayîn”, “ewan” û hwd tîne binavkirin. Ev kilam ji hêlekê va dîrokê û rabirdûyê tînin pêş çavê însanan.

Ev kilam ji ber ku behsa qewimîna bûyeran û encama wan dikin gelekî girîng in. Her tiştî tînin bîra civakê, ji bo nîşên nû ji van bûyer û şexsan dersê hildin û ji bîr nekin ev kilam divê taybet bînin nîrxandin. Hamelink (2014: 94) di kilamên şer û serhildanê da balê dikşîne ser rola jin û mêran û dibêje repertuara mêran ya van kilaman berfireh e, lehengên sereke bi berfirehî tîne nasandin, mêr bi navê xwe yê resen û eslê xwe tîne behskirin, behsa jinan nayê kirin, jin dikarin behsa şer bikin û di encamê da şîne dikin.

---

<sup>9</sup> Nevzat Eminoğlu der barê heman mijarê da di Rojnameya Duvarê da nivîseke bi navê “Bir Trafik Kazası ve Bir Dengbêjlik Eseri” weşandiye. Di nivîsê da him der barê dîroka qezayê, hejmara mirî û birîndaran da û him jî der barê dengbêjê ku kilam gotiye (Dengbêj Zahiro) da agahiyan dide. Ji bo zêdetir agahiyan bnr. <https://www.gazeteduvar.com.tr/bir-trafik-kazasi-ve-bir-dengbejlik-eseri-haber-1508915>

## 2.11. DENG BÊJÎ Û AVAKIRINA BÎRA CIVAKÎ

Di çanda devkî de gotin pir bi qîmet e, lewra çand, keleşor, dîrok û jiyana civakê li ser wê ava dibe. Ji ber ku nivîs tune ye yan jî kêr e gotin û deng cihê nivîsê distîne, çand û bîra devkî pêşva diçe, qehremanî, pevçûn, bûyerên dîrokî û civakî, çîrokên gelerî, destan, helbest, zêmar, nîrxên neteweyî bi kurtasî her tişt bi saya hin kes û wasîteyan tînin parastin ku ev jî bîreke hevpar ava dike. Di nav çanda devkî da dîroka devkî jî beşeke pir bi qîmet e, Stephen Caunce balê dikêşe ser girîngiya wê û dibêje ew rê û rêbaza berhevkirina melzemyên zêde ye ku ji bo roja îro baş bê fêmkirin, dahatû bê rêvebirin û rabirdû bibe xwedî wateyek (2008: 12). Yanê dîroka devkî ya ku hêza wê xurt e li hemberî dîrok û bîra fermî alternatîf e.

Dema li ser erdnîgariyekê bûyereke an jî şerekî mezin biqewime aliyên beşdarî wê bûne herdu jî zirarê dibînin, lê ew li gor xwe bîreke ava dikin, wê bi bîr tînin û ji neviyên xwe ra dibêjin. Bûyer heman bûyer e, lê bîranîna cuda ne (Connerton, 2014: 39). Bi taybetî jî hêz û îqtidar di destê kî da be ew li gor xwe dîrokeke fermî ava dike, dîrok û çanda kom û nijadên din biçûk nîşan dide, tehrîfatan dike û li ser agahiyan guherînên zirarê dide wan belav dike. Ji bo serkeftinên xwe bêtir xurt nîşan bide dibêje “me dijmin tek bir”, ji bo merivên xwe jî dibêje “qehreman”, “egîd”, “mêrxas” û hwd. Berevajî vê, ji bo yê li hemberî xwe jî dibêje “xayîn”, “dijmin”, “serhildêr”, “eşqiya” û sîfatên nebaş ên biçûkdîtinê bi kar tîne. Li hemû cîhanê rewş bi vî rengî ye û dîrok bi vî awayî tînin nivîsandin. Lê di vî rewşê da dîrok û çanda devkî xwedî hêzeke girîng e, nahêle civak bîr û dîroka fermî rasterast qebûl bike, dijî vê yekê derdikeve. Her çiqas hewleke mezin bê dayîn jî komên hêza wan kêr e û bîndest in bi çand û dîroka devkî li dijî belge, arşîv, agahî û dîroka fermî tevdigerin û li ber xwe didin. Lewra ew dervayî hegemonyaya îqtidarê ye, rexneyan dike û bîreke alternatîf ava dike.

Di avakirin, berhevkirin û parastina dîroka devkî da hin kesên meriv bikaribe bibêje bîra hevpar a civakê hene. Li welat û erdnîgariyên cuda her çiqas ew bi navên cuda bîr binavkirin jî wezîfeya wan hevpar e. Assmann dibêje bîra çandî her tim bi destê kesên taybet hatiye parastin, ji bo wan şaman, grîot, keşîş, hozanên Keltan, mamoste, nivîskar, mandarîn, fîlozof û kesên ku rayeya agahiyê bigihînin însanan di destê wan da ye mînak nîşan dide (2018: 62). Di beşa ewil da em bi hûrgilî li ser têgeha bîrê û bîra civakî sekinîbûn, lê divê dîsa bê gotin çawa bîra şexsan hebe, bîra civakan jî heye û di avakirina vî bîrê da rola gelek kes û sazîyan heye. Dema em berê xwe didin civaka Kurd bi zelalî dibînin tesbîta Assmann rast e, lewra dengbêj jî bîr û

çandêke civakî ya hevpar ava dikin, diparêzin û digihînin nîşan. Ev wezîfeya dikeve li ser milê wan ku qîmeta wan zêdetir dibe. Çaxê çanda devkî, dîroka devkî û dengbêjî bi hûrgilî bîn vekolîn wê bê dîtin ew girêdayî hevdu ne. Dengbêjan dîrok, bîr û çanda devkî, û nasnameya Kurd bi kilaman parastine, rê li ber bişaftinê girtine ku civak nehele û ji holê ranebe.

Dengbêjên ku ji gelek hêlan va xwedî qabiliyet in (deng, ziman, gotin, bîr û hwd) bi saya kilamên xwe van bûyeran neqil dikin, bi bûyerên din ra têkiliyê çêdikin û di civakê da bîreke hevpar ava dikin. Vê bîra hevpar û çandê bi kilaman digihînin dahatûyê û ew wek sembolên çanda devkî di hişê civakê da cihê xwe diparêzin. Albert Lordê li ser hozanên gel ên Yugoslavyayê xebat kirine destnîşan dike ku xwendin û nivîsandin ji bo hozanan qeyd û bend e, lewra di hişê hozanan da têgeha metnekî yê mimkun e bê kontrolkirin ava dike û pêvajoya hunera devkî xirab dike (Ong, 2018: 78). Ev tespîta Lord ji bo dengbêjan jî maqûl e, lewra heke dengbêjan xwendin û nivîsandin bizanibûyana dibe ku nikaribûyana bi hêsanî ji ber xwe evqas kilam derxistana û bi wan bîreke hevpar ava bikirana.

Wek ku me berê jî anîbû ziman dengbêjî çandêke sînorê wê berfireh e, ew bi muzîk û deng va nabe bê tengkirin û romantîzekirin. Lewra aliyekî dengbêjîyê yê polîtîk, dîroknûsî û civakî jî heye ku di vê çarçoveyê da em dibînin gelek rûdanên qewimîne, bûyerên tesîr li ser civakê kirine bûne mijara dengbêjan. Wan bi kilamên xwe bûyerên girîng ên wê demê wek dîroknûsekî di hişê civakê da nivîsîne û nehîştine ew bîn jibîrkin. Rasterast bi şahidiya dengbêjan yan jî bi agahiyên gihîştine ber destên wan wek dîroknûsekî hewl hatiye dayîn ku ev bûyer neyên jibîrkin. Gürür jî (2014: 26) bale dikşîne ser girîngiya dengbêjan a dîroknûsiyê û tîne ziman bi saya kilamên wan îro civak xwedî bîrekê ye û wiha dibêje:

Serhildanên ku nêzî 100 sal berî niha qewimîne, bi teswîrên wan, îro ji aliyê lêkolîneran ve wekî malûmatên dîrokî jî tîne qebûlkin. Li ser Abdal Xan, Yezdan Şêr, Şekir Axa, Şêx Seîd, Nurullah Paşa, Xelîl Begê Cibrî, Îhsan Nûrî Paşa, Biroyê Heskê Têlî, Şêx Mehmûd Berzencî, Seyîd Riza û gelek kesên din, ji aliyê dengbêjan ve wekî lehengên destanan hatine honandin.

Heke em jî hin mînakên li ser mijarê zêde bikin, bi saya dengbêjan şerê di navbera Xanê Lepzêrîn û Şah Ebas, Serhildana Şêx Seîd, Serhildana Agiriyê,

Komkujiya Dêrsimê, Komkujiya Geliyê Zîlan û hwd baştir hatine bihîstin. Di beşa dawîn da em ê bi hûrgilî kilamên li ser van bûyeran hatine gotin, tesîra wan a li ser civakê, parastina nasname û dîroka Kurd nîşan bidin û der barê wan da zêdetir agahiyan bidin.

## 2.12. VEGUHASTINA ÇANDA DENGÊJIYÊ

Jiyan ji her aliyê va li ser guherîna ava bûye, tu tişt wek berê yanê bi halê xwe yê ewil namîne, her tişt kêma an jî zêde diguhere. Li gor mijar û rewşê helbet hin guherîn baş û hinek jî xirab in, lê di dawiya dawî da tesîr û hikmê wan li ser însanan û jiyanê çêdibe. Benjamin dema behsa çîrokbêjan dike balê dikşîne ser zeman û çîrokbêjiyê û dibêje êdî tu hikmê wan di jiyanê me da nemaye, ew ji me dûr ketine û her ku diçe ji me dûrtir dibin, hunera vegotinê ber bi dawiyê diçe (1993: 166). Çawa ku Benjamin jî behs dike êdî hejmara çîrokbêjan û kesên çanda devkî belav dikin îro gelekî kêma bûye. Lê dîsa jî ji ber ku agahî û zanîn bi zehmetî tê bidestxistin bi qîmet e, civak hûmetê nîşanî kal, pîr û zanayên ku dikarin rojên berê vebêjin û diparêzin dide (Ong, 2018: 57). Ji ber ku mijara me dengbêjî ye em dikarin bibêjin Benjamin rast dibêje hejmara dengbêjan jî wek çîrokbêjan êdî her ku diçe kêma dibe û hikmê wan wek berê ne xurt e. Lê dîsa jî ne mumkin e ku em bibêjin dengbêj û dengbêjî êdî nemaye, lewra bi reng û dengê nû, veguhastî dîsa zindî ye.

Hamelik jî der barê mijarê da wiha dibêje: “Di dema lêkolîna min da mirovan gelemperî digotin êdî dengbêj nemane, dengbêjên rastîn di zemanê berê da mane. Ev ji bo ku însan dîroka xwe bikin efsane û mît rêyek e ku ez vê yekê qebûl nakim” (2016: 36). Dengbêjî çima wek berê ne berbelav e û hejmara wan her ku diçe kêma dibe meriv dikare gelek sedeman bibêje. Lê sedemên sereke çandî, civakî, siyasî, teknoloji û aborî ye. Jixwe ev ji bo gelek cureyên çanda devkî jî sedemên hevpar in.

Di salên dawîn da çanda dengbêjiyê ji hêla mekanên lê tînin îcrakirin, enstrûmanên tînin bikaranîn, mijarên tînin vegotin va gelekî guheriye. Dengbêjên berê li qesr û qonaxan, odeyên gundan, civata mîr û began kilamên xwe digotin, bajar û welatan digeriyan êdî li bajaran hewl didin li ser piyan bimînin û ev çand ji holê ranebe. Ronî jî dibêje berê vegotina destanan di dengbêjiyê da hebû ku îro ev taybetmendî hema bibêje nemaye, dengbêjan xwe spartine qada muzîkê û bi tenê deng û muzîkê vê hunerê pêk tînin (2012: 284). Wek Ronî, Hamelink û Barış jî dibêjin ev kevneşopîya

sekuler a sedsalan piştî 1980yî di nav civaka Kurd a Tirkiyeyê da hema bibêje ji holê rabûye, lê di salên 2000î da ji nû va vejîyaye (2014: 173).

Christine Allison behsa guherîna çanda devkî ya Kurmancî dike û dibêje “Kevneşopiyên devkî yên Kurmancî tevahî ji holê ranabin, form diguherin û curbicurbûna wan kêmtir dibe. Lê tesîra wan û hestavakirina wan dewam dike” (2007: 44). Dengbêjî jî wek perçeyekî wê çanda guherî îro rasterast ne wek berê be jî hê dewam dike. Dengbêjên berê li civat, dîwan û şevbuhêrkan kilam digotin di salên dawîn da li Mala Dengbêjan (Wan, Batman, Diyarbekir û hwd) kilaman dibêjin ku em bi xwe jî çend çarçûn li Diyarbekirê çûn guhdariya wan û me ev guherîn çavdêrî kir. Taş dengbêjiya li vir tê kirin rexne dike û dibêje li vir tenê kilam tînin gotin, perwerdehiya dengbêjiyê (hoste û şagirtan) nayê dayîn û kesên bajêr digerin wek gereke turîstîk tînin Mala Dengbêjan û wan guhdar bikin. Taş hişyariyê dide û tîne ziman heke ev dengbêjî bi rengên kevneşopiyê neyê dagirtin ewê wek çandên din ên endûstriya nostaljiyê veguheze û bigihêje dawîyeke bi vî rengî (2015: 80).

Dengbêj Karapêtê Xaçoyê ku ji 100 salî zêdetir emir kiriye jî di hevpeyvînekê da bi xemgînî dibêje dengbêjiya berê nemaye û wiha behsa rojên berê dike (Kevirbirî, 2009: 39):

Na lo, ka ew dengbêjiya berê? Gava em wek dengbêj diçûn dawet, şahî û civatan, ji heft gundan dihatin hafa me. Kesî wan rojan mala xwe nan nedixwar. Her kes dibû mêvanê mala ku em lê bûn. Hatina civatên dengbêjan, wê wextê ji bo kêf û rûmeteke mezin bû. Di civatên dengbêjan da mirovan penêr dixwar, nivîşk dixwar, savar û goşt dixwar. Dawetêke bê dengbêj mîna dawetêke mirî bû.

Heke em vegehin salên 1970-1980yî dengbêj li mala hin malbatan dibûn mêvan, ji xwediyê malê û cîmaeta dora wî ra kilam digotin. Dengê wan bi kasetên teyîban dihatin tijîkirin û paşê di nav civakê da dihatin belavkirin. Güneş û Şahin der barê mijarê da balê dikşînin kesên di salên 1970yî de çûne Almaniyayê, li ber dengê dengbêjan kaset tijî dikirin û wiha dibêjin: “Li ser daxwaza Kurdên li Almaniyayê bi mêvanî çûn (dengbêj) wir û ji civaka wir re kaset tijî kirin. Li ser xerîbîtiya Almaniyayê û li ser keçikên Alamanî jî kilaman strandin” (2018: 28).

Di nav civakê da demekê hin kesan (zêdetir sosyalîst û çepgir) dengbêj rexne dikirin û ew wek berdevkên feodalîteyê bi nav dikirin. Ji ber kilamên dengbêjan ên mijara wan pevçûnên di navbera eşîran da û pesindayîna serokeşîr, axa, mîr û paşayan ji wan ra digotin ew paşverû ne. Lewra li gor wan ev naverok dijî yekîtiya nasnameya

Kurd û netewebûnê ne, li ber tevgera azadiyê ya Kurdan asteng in. Ji bilî vê ji ber ku dengbêj di bin patronaja axa, beg û mîran da bûn, ne xweser bûn ev rexne dihatin kirin. Hamelink der barê mijarê da dibêje heta sala 1960î pergala axatîyê dewam kir, lê piştî “reforma axê” ya bi destê dewletê hat kirin, pergala axatîyê bi piranî ji holê rabû, di dema avakirina Komara Tirkiyeyê da jî ji ber serhildanên li hemberî dewletê ji wan gelek hatin daliqandin û nefîkirin, têkiliya wan a bi herêmê û gund ra nema ku van bûyeran li ser çanda dengbêjiyê tesîr kir û dengbêjî jî guherî (2014: 40) Her wiha ew çanda dengbêjiyê wek çandeke sekuler, naverokên kilamên wan jî sekuler dinirxîne (2014: 34).

Îkram Oğuz jî behsa serpêhatîyeke xwe ya der barê Dengbêj Şakiro da dike, dibêje ew û hevalên wî yê di salên 1960î da di bin tesîra sosyalîzmê da tevdigeriyan, doza perwerdeya bi zimanê zikmakî dikirin, lê di jiyana û tevgera xwe da ew ziman bi kar nedianîn, xwe şoreşger û pêşverû dihesibandin, kesên derdora xwe yanê dê û bav, malbat, şêx û mela, axa û beg, çîrokvan û dengbêjên mîna Şakiro jî wek kesên nezan û paşverû bi nav dikirin. Oğuz (2020) wiha dibêje:

Şakiro, xwedî daw û dozek wisa neba jî, di bin şert û mercên xeternak da bi dengbêjiya xwe ruh dida zimanê me û ew jîndar dikir. Jiber ku, sedema xizaniya Şakiro jî, zanebûna me ya bi nezaniya jî yek bû. Ew jî bindestî û bêdewletî bû. Di ser wan salan ra 40-45 sal derbas bû. Şakiro bi koça xwe ya dawîyê ra ji xizaniya xwe xilas bû. Bayê sosyalîzmê hate birrîn, fizildûmana ku qirna 68 û 78an ji erdê radikir, dawî lê hat. Bi derengî be jî ew li xwe û li zimanê xwe vegehiyan.

Îro teknolojiya pêşva çûye, tîlefona bîrîkan û cîhazên deng û dîmenan bi hev ra qeyd dikin ji hêla merivan va tînan bikaranîn. Meriv bi saya vê teknolojiyê deng û dîmenê dengbêjan qeyd dikin, paşê li ser medyaya civakî û înternetê belav dikin. Ji sala 2019an vir va li dinyayê şewba vîrusa koronayê ya nû (Kovîd-19) heye û hê jî dewam dike. Ji ber vê vîrusê dibistan, zanîngeh, kargeh, kafe, çayxane û gelek cihên bi vî rengî hatin girtin, derketina derva li gelek welatan dem demî hat qedexekirin. Meriv di malan da asê man û nikarin derkevin derva, herin geşt, seyran, dawet, konser û şahiyên. Lê teknolojiya gihîşt hewarê û wan bi saya teknolojiyê li ser înternetê konser, konferans û şahî li dar xist. Dengbêjên berê diçûn Mala Dengbêjan, dawetan, bernameyên televizyonê û mihrîcanan jî ji bo xwe bigihînin merivan beşdarî bernameyên zindî yê li ser medyaya civakî (Twitter, Youtube, Instagram) bûn. Helbet ev bername ne wek dîwan, şevbuhêrk û şahiyên berê ne ku heta nivê şevê û serê sibê

dewam bikin, dema wan sînardarkiriye, lê dîsa jî ji bo çanda dengbêjiyê dewam bike hewldanên girîng in. Di vê xalê da divê bê gotin şewba koronayê jî êdî di nav mijara kilamên dengbêjan da cih digire, lewra êdî li ser koronayê jî kilam hatine gotin.<sup>10</sup>

### 2.13. JIYAN Ê DENGÊJIYA DENGÊJ ŞAKIRO (1936-1996)

Şert û mercên dengbêj tê da dijîn, çand û civaka ew tê da nefesê hildidin tesîrê li ser hiş, rûh û derûniya wan dike, şopa wan di kilaman da xwe didin der. Heke em Dengbêj Şakiro baş nas nekin, der barê jiyana wî da, rewşa tê da jiyaye nebin xwedî agahî, em nikarin li ser kilamên wî analîz û şîroveyên baş bikin. Ji ber vê divê Şakiro bê nasîn ku ew kî ye, ji kîjan malbat û eşîrê ye, zewacên wî çawa çêbûne û wî kîngê dest bi dengbêjiyê kiriye. Ev agahî wê ronahiyê bidin xebata me ku em sewt û dengê wî, dengbêjiya wî, kilamên wî û bîra civakî ya bi saya dengbêjiya wî hatiye avakirin zelaltir fêhm bikin.

#### 2.13.1. Jiyana Dengbêj Şakiro

Dengbêj Şakiroyê ku navê wî ye nasnameyê Şakir Deniz e, dengbêjekî ji herêma Serhedê ye. Ew wek “kewê nêr”, “kewê ribat”, “Şahê dengbêjan” an jî “Şakirê Bedîhê Mihê Zilî” jî tê nasîn. Ji ber xweşbûna dengê wî û şêwaza wê ya cuda nav û dengê wî ji sînorên Serhedê derketiye, li gelek bajar û welatan belav bûye. Der barê gund û navçeya ku Şakiro lê hatiye dinyayê û zewacên wî da di lîteraturê da hin agahiyên li hevdu nagirin hene. Di çavkaniyekî da tê gotin ku ew ji gundê Navikê ya li ser Agiriyê ye (Antolojiya Dengbêjan-1, 2011: 380), çavkaniyeke din dibêje ew ji Qerekoseya Agiriyê ye (Yaş, 2016: 171), çavkaniyeke din jî destnîşan dike ew ji eslê xwe ji devera Patnosê ye (Ulugana, 2015: 173).

Her çiqas hin kes wisa dizanin ku ew ji Qereyaziya navçeya Erziromê û Patnosê ye jî, Şakiro bi eslê xwe ji Elaşgira Agiriyê ye. Li gor nasnameya wî ew di sala 1936an da li gundê Topraxqeleyê ya li ser Elaşgira navçeya Agiriyê hatiye dinyayê, lê malbat

---

<sup>10</sup> Dengbêj Selahattin, Dengbêj Mehmet Emîn û İsmail Seyranoğlu der barê şewba koronayê da kilaman dibêjin <https://www.youtube.com/watch?v=NXmxsXQq1EU>  
<https://www.youtube.com/watch?v=MIRaAvq066c>  
<https://www.youtube.com/watch?v=iK9sMSNi3q8>

vê agahiyê piştrast nake û dide zanîn ku ew di sala 1931ê da hatiye dinyayê.<sup>11</sup> Navê bavê wî Bedîh e. Bavê Şakiro Bedîh du caran zewiciye ku navê jineke wî Cemîle û ya dinê jî Cewahir e. Şakiro kurê Cewahirê ye ku Selîm, Salih, Seîd, Aliya (hemû mirine) xwîşk û birayê wî yên ji vê dayikê ne. Ji dêya wê ya dêmarî Cemîleyê jî Tefîq, Faîq, Sidîq, Mihemed, Xalid, Naîle û Suheylya hatine dinyayê. (Xalid, Faîq û Suheylya mirine) yanê ew tevahî 3 xwîşk û 9 bira bûne.

Malbata Şakiro piştî demekê ji Elaşgirê koçî Cemalvêrdiya gundê Dutaxê (Intab) kiriye. Zarokatî û xortaniya Şakiro li vir dibihûre. Divê bal bê kişandin ku Cemalvêrdî gundê dengbêj Evdalê Zeynikê ye jî (Aras, 2004: 20). Der barê perwerde û çûyîna Şakiro ya dibistanê da kurê wî Fewzî dibêje ew neçûye dibistanê, xwe bi xwe hînî xwendin û nivîsandinê bûye (Fewzî Deniz, pêwendiya rûbirû, 15ê Cotmehê 2010). Kurê wî Metîn jî tîne ziman ku ew li eskeriyê hînî xwendin û nivîsandinê bûye. Herdu agahî hevdu negirin jî xala wan a hevpar ev e ku Şakiro zû an jî dereng hînî xwendin û nivîsandinê bûye (Metin Deniz, Pêwendiya têlefoni, 2yê Çileyê Paşîn 2021).

Di sala 1960î da Şakiro û malbata wî koçî Edeneyê dikin û heta 1966an li vir dijîn. Ew di 1966an de tê Mûşê û heta 1968an da li Mûşê dijî. Di sala 1968an da jî vedigere Qereyaziya navçeya Erziromê û li wir dijî. Şakiro di sala 1983an da koçî Enqereyê dike û demekê li wir dijî, di 1985an da jî koçî Îzmirê dike ku ev bajar ji bo wî dibe bajarê dawîn (Metin Deniz, Pêwendiya têlefoni, 2yê Çileyê Paşîn 2021).

Li gorî agahiyên ku Tewfîqê birayê Şakiro dide ew sê caran zewiciye. Der barê evîndarbûna Şakiro da birayê wî tîne ziman ku ew li Cemalvêrdiyê qîzeke navê wê Esmer e hez dike. Lê ji ber ku Esmerê didin yekî din ew gelekî xemgîn dibe û kilama navdar “Esmer”ê çêdike. Dema Şakiro hê xortek bûye (16-17 salî) dibe evîndarê qîzeke bi navê Dîlber (di nasnameyê da Gulî ye) û wê direvîne. Ji Dîlberê Eyšan, Fewzî û Niyazî hatine dinyayê. Eyšan hê 4-5 salî bûye miriye, yên din jî van salên dawîn da wefat kirine. Navê jina wê ya duyem Sevdaîl e ku ew li Kopa navçeya Mûşê dema di nexweşxaneyê da wek ebe xebitiye wan hevdu nas kiriye. Sevdaîl jineke bî ya dayika sê kuran bûye, lê ji zewaca wê ya bi Şakiro ra kurekî wî yê bi navê Metîn hatiye dinyayê. Zewaca Şakiro ya sêyem jî li Edeneyê bi jineke bî ya ku 6 zarokên (4 kur û 2 qîz) wê hebûne ra çêbûye ku navê wê jina wî jî Xanim e, ji wê jî bi navê Umîd kurekî

---

<sup>11</sup> Tefîq Denizê birayê Şakiro yê li Stenbolê dijî di axaftina me ya li ser têlefoni (30.12.2019) da got ew li gundê Topraxqelejê ya li ser Elaşgira navçeya Agiriyê hatiye dinyayê.



Şakiro hatiye dinyayê. Bi van sê zewacan jê yek qîz û çar jî kur pênc zarokên Şakiro çêbûne (Tewfîq Deniz, Pêwendiya tîlefônî, 30yê Çileyê Pêşîn 2020). Wek ku tê dîtin Şakiro sê caran zewiciye û bavê gelek zarokan e. Helbet niha tesîra van zewacan li ser derûniya wî û dengbêjiya wî çêbûye.

### 2.13.2. Dengbêjiya Dengbêj Şakiro

Dengbêjiya Şakiro dema ew li Cemalvêrdiyê bûne dest pê dîke. Tefîqê birayê Şakiro dibêje, mezinê Sîpkîyan Xalis Begê Sîpkî (Halis Öztürk) kurê Evdilmecîd Beg gelek caran Şakiroyê biçûk (8-9 salî) guhdar kiriye û eleqeyeke mezin nîşanî wî daye.<sup>12</sup> Ahmet Aras jî dide zanîn ku wê demê li Cemalvêrdiyê dengbêjekî navdar yê bi navê Bedîhê Kor (Bedîhê Hemîd) hebûye û Şakiro bûye şagirtê wî (1996: 8). Güneş û Şahin jî vê agahiyê piştrast dikin ku Şakiro ji 10 saliya xwe heta 18-19 saliya xwe wek şagirt ji Bedîhê Çavşûşe (Bedîhê Kor) fêrî kilaman dibe, dengbêjiya xwe pêşva dibe û dengbêjiya tradîsyona Evdalê Zeynikê derbasî Şakiro dibe (2018: 34).

Di bin ronahiya van agahiyên da Şakiro gava xwe ya ewil a di qada dengbêjiyê da li vir, gava xwe ya duyem a dengbêjiyê jî li Qereyaziya navçeya Erziromê avêtiye. Dema malbat ji Cemalvêrdiyê koçî Qereyaziyê dîke ew êdî dengbêj Reso û Ferzê jî nas dîke, di bin tesîra wan da dimîne û ji xwe ra terzekî ava dîke. Ji ber ku ew êdî dibe dengbêjekî navdar wî vedixwînin dawet û civatên giran (Öztürk, 2014: 48).

Him bajarê lê hatiye dinyayê, him cihên ku koç kiriye (Cemalvêrdiya Elaşgirê, Gazbêla Qereyaziyê, Toraqa Milazgirê, Edene, Enqere, Îzmir) û him jî deverên lê geriyaye (Agirî, Erzirom, Mûş, Edene, Enqere, Îzmir, Diyarbekir, Mêrdîn, Ewropa û hwd) Şakiro beşdarî gelek dawet, şevbuhêrk, cimaet û diwanxaneyan bûye û hostatiya xwe ya dengbêjiyê nîşanî civakê daye. Şakiro di bin siya axa, beg, serokeşîr, sazî û dezgehekî da nemaye, yanê ji hêla patronajê va bê nirxandin ew dengbêjekî xweser bûye. Ji dengbêjiyê dewlemend nebûye an jî bi saya patronejê debara xwe nekiriye. Bi kurtasî navika wî bi kesî va girêdayî nebûye, bi dilê xwe kilam gotiye, xelqê li ber dengê wî kaset tijî kiriye, yê ku xwestine hin xelat û pere dane wî bes hew.

---

<sup>12</sup> Birayê Şakiro Tewfîk Denizê li Stenbolê dijî di axaftina me ya li ser tîlefônê da got hê Şakiro gelekî biçûk bûye (8-9 salî) çûye cimaetan kilaman guhdar kiriye û gotiye. Xalis Ozturk Beg gelek caran gotiye Şakiro bînin bila ji wî ra kilaman bibêje. Berf û serma hebe jî merivên Xalis Begê Şakiro birine li cem wî ewî ji wî ra kilam gotine, dema bûye şev ew li wir razaye jî wan Şakiro dane hambêza xwe û ew birine mala wî.

Berê di dîwan û şevbuhêrkan da jin li odeya mêr lê bûn rûnediniştin (ji ber sedemên çanda feodal, dîn û kevneşopiyê), ji ber vê li pişt perdeyê an jî deriyên dengê dengbêjan diçû guhê wan. Li gor agahiyên tînan dayîn Şakiro zêde vê yekê qebûl nedikir, dema di civatê da jin, bûk û qîz didîtin hê xweştir kilam digotin (Uygar, 2017: 31).

Şakiro rûyê dibistan û medreseyan nedîtiye, lê xwe ji hêla dengbêjiyê va gelekî baş perwerde kiriye, nav û dengê xwe hinartîye heta roja îroyîn. Helbet jiyana wî, cîmaetên tê da rabûye û rûniştîye, gera wî ya li bajaran, beşdariya wî ya civat, dîwan û şevbuhêrkan, nasîna wî ya dengbêjên wek Bedîhê Çavşûşe, Reso, Ferzê, Mihemedê Xilxile, Mihemedê Çêrmelî, Huseyno, Zahiro û Sidîqoyê Zorava tesîr li ser dengbêjiya wî kirine (Güneş-Şahin, 2018: 35-36). Her dîwan û cîmaet, şahî û şîn ji bo wî bûye tecrube, wî dengbêjiya xwe pêşva biriye û hê dewlemendtir kiriye. Kilamên şer û pevçûnê, mêrxasî û qehremaniyê, şîn û zêmaran, evîn û hezkirinê gotiye. Bûyerên dîrokî bi taybetî yê destpêka sedsala 20emîn û dema avakirina Komara Tirkiyeyê (serhildanên li hemberî dewletê, pevçûnên navxweyî û yê di navbera eşîran da) bi dengê xwe wek belgeyekê ragihandiye heta roja me.

Bi saya kilamên Şakiro em têkoşîna berxê Mala Ûsivê Seydo, bêbextiya eşîran, qîrîn û gazinên Besrayê, xemên dildara evîna Salih û Nûrê haydar dibin (Öztürk, 2016: 43). Di nav kilamên wî da dewlemendiya zimanê kurdî xwe gelekî zelal dide der. Ji biwêj û gotinên pêşiyên bigire, heta sembol û metaforan, ji huner û estetîkê bigire heta erotîzmê çarçoveyê rengîn heye. Dia, nifir, lorandin, şîret, gilî û gazin, evîn û hezkirin, erotîzm, sondxwarin, edet û kevneşopî hemû tişt ji dengê wî yê taybet gihîştîye kerika guhê Kurdan, ji ber vê ye ew nayê jibîrkin.

Şakiro di nav tradîsyona dengbêjiya Evdalê Zeynikê da cih digire û wek berê jî me anîbû ziman dengbêjekî ji herêma Serhedê ye. Ji ber sewta wî ya zelal û xweş ew wek “kewê nêr”, “kewê ribat” an jî “Şahê dengbêjan” tê binavkirin. Ev agahiyek çandî ye ku divê bê gotin di nav Kurdan da kewê ribat kewê nêr e, deng û qebeqewa wî bilind û xweş e. Heta wisa ku di nav çanda dengbêjiyê da car caran hin dengbêj teqlîdê kewan dikin û wek wan dikin qebeqeb.<sup>13</sup> Şakiro dema kilaman dibêje hin caran gotinan û peyvên li ser kilamê zêde dike, hin caran jê kêr dike, lê tu car taybetiya

---

<sup>13</sup> Ez di cotmeha 2018an da li Mala Dengbêjan a Diyarbekirê bûm şahide vê yekê. Dengbêj Eliyê Qerejdaxî dema di civata dengbêjan da guhdariya Dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî dike wek kewan dike qaçibo. Ji bo temaşekirinê hûn dikarin linkê bitikînin, ew di deqîqeya 02.57an da qaçibo dike. Bnr. <https://www.youtube.com/watch?v=1vmmeXonBQ8>

kilamê, tehm û rengê wê xirab nake. Heke peyvekê ji bîr bike bi hostatî wê vedişêre ku nayê fêmkirin, Dengbêj Zahiro dibêje “Şakiro dema kilamekê bibêje û di wê kilamê de peyvekê ji bîr bike, di şûna wê peyvê de “vê sibengê” dişuxlîne. Xeynî “vê sibengê” gotinên wek “tu seyr bike”, “dilê rezîl”, “kotiyê mêran” jî gelek caran di kilamên cuda da hatine bikaranîn” (Öztürk, 2016: 47).

Şakiro dema biçûk bûye ew û birayê wî Salih bi demançeya bavên xwe dilîzin, birayê wî guleyekê berdide wî ku ew gule bi salan li ser gurçika wî dimîne. Lê di salên dawîn da ew gule dibe sedema aciziya gurçikan û Şakiro emeliyat dibe û gule ji bedena wî tê derxistin. Lê piştî wê emeliyatê rewşa tenduristiyê ya Şakiro her ku diçe xirab dibe. Di dawiya dawî da jî ew nexweşiya pençeşêrê dikeve û di 5ê Hezîrana 1996an da li Îzmirê wefat dike.<sup>14</sup> Gora wî li Altindaxa Îzmirê (Altındağ Köy Mezarlığı) ye û li ser gora wî “Bedih Ağaoğlu Doğu Şairi Şakir Deniz Ruhuna Fatiha 1936-1996” (Ji Rûhê Kurê Bedîh Axa Helbestvanê Rojhilat Şakir Deniz ra Fatiha 1936-1996) hatiye nivîsîn.<sup>15</sup>

Der barê dengbêjiya Şakiro da wek malbata wî jî tîne ziman û bi milyonan kes jî lê guhdar dikin meriv dikare bibêje ew dengbêjekî bi nav û deng e, li gor stîl û qaydeyên xwe xwedî dengbêjiyeke taybet e. Ew bi dengê xwe (zîz û zelal), bi bikaranîna dengê xwe (sewta serî, sewta qirikê, xulxulandin), bi tevger û jiyana xwe bûye dengbêjekî girîng ê Kurdan. Ji ber vê ye ku ji ser mirina wî ra gelek sal derbas bibin jî wî mora xwe li ser dengbêjiyê xistiye û wisa xuya dike ew dengbêjê ji Serhedê wê qet neyê jibîrkirin. Kilamên wî yên behsa şer, pevçûn, dîrok, serhildan û qehremaniyan dikin yên herî zêde tîne guhdarkirin “Kekê Xiyasedîn”, “Ferzende Beg”, “Axao”, “Îbo Begê Parsînî”, “Şerê Mala Nasir”, “Eliyê Purto”, “Nêçîrvano”, “Geliyê Zîlan”, “Bekir Beg û Memed Axa”, “Reben im” û yên bi vî rengî ne. Ji bilî vê kilamên wî yên li ser eşq, evîn û hezkirinê jî hene ku ji wan jî “Emro”, “Dîlber”, “Gulê Dêran”, “Esmer”, “Sebrê”, “Wey Dil”, “Helîmcanê” û “Misafiro” dibe mînak bînan nîşandan. Herî dawîn der barê deng, wêne, vîdeo û kasetên Şakiro da divê agahiyek bê dayîn ku

---

<sup>14</sup> Metin Denizê kurê Dengbêj Şakiro yê li Almanyayê dijî li ser tîlefônê 02.01.2021 ev agahî da me.

<sup>15</sup> Serdar Öztürk dibêje ew goristana Îzmirê ya “Çamlı Kule”yê hatiye definkirin, lê me di sala 2010an da gora wî ziyaret kir ku ewî li Altındağê ye.

ew ji nav gel û saziyan tên tomarkirin û wê bi destê Enstîtûya Çandê ya Kurd û Almanan (Deutsch-Kurdisches Kulturinstitut) bi halekî giştî bên weşandin.<sup>16</sup>

Li ser rûyê erdê çiqas civak hebin her yek li gor derfet, tecrube û zanebûna xwe ji xwe ra jiyaneke taybet ava dike ku bikaribe rehettir bijî. Ew bi berhemên madî, menewî û amûran va hewl didin jiyane dewlemend bikin û ji vê dewlemendiya xwe va ji civakên din veqetin. Ji ber vê jî, dixebitin, fikr û ramanan parve dikin, sembol û nirxên hevpar ava dikin. Ev hemû çandê derdixin holê û endamên civakê dibin perçeyekî wê çanda qedîm. Di vê beşê da wek têgeh me behsa çandê kir û anî ziman ku sê cureyên çandê hene ew çanda devkî, çanda nivîskî û çanda elektronîk in. Ev cureyên çandê her yek xwedî taybetmendiya cuda ne, lê ya ku di vê xebatê da me zêdetir eleqedar dike çanda devkî ye. Ji ber vê me bi hûrgilî behsa çanda devkî kir û nîşan da ku di civaka Kurdan da çanda dengbêjiyê wek çanda devkî gelekî girîng e. Hat nîşandan ku çanda dengbêjiyê ya ji hêla dengbêjan va tê avakirin reng û dengêkî taybet dide çanda devkî ya Kurdî û bi bîrê ra jî gelekî eleqedar e.

Ji bilî vê me behsa mekanên ku dengbêj lê hunera xwe pêşkêş dikin, mijara berhemên dengbêjan, ger û rêwîtiya wan, di çanda dengbêjiyê da şewaz û patronajê kir. Me bi zelalî nîşan da ku avzêma çanda dengbêjiyê jin in û gelemperî dengbêjên mêr berhemên dengbêjiyê bi dengê xwe gihandine roja me. Ji ber ku mijar bîra civakî ye me behsa têkiliya dengbêjan û bîra civakî kir û hat tesbîtkirin ew bi hev ra eleqedar in, berhemên wan dibin perçeyekî bîra civakî. Her çiqas di nav demê da çanda dengbêjiyê hinekî biguhere û wek berê berbiçav nebe jî, bi formeke nû ew hê jî di jiyana Kurdan da xwedî cihekî taybet e û tê parastin.

Herî dawîn me behsa Dengbêj Şakiro yê di nav Kurdên Kurmancîaxêv da navdar e kir û destnîşan kir ku ew di avakirina bîra civakî da dengbêjekî girîng e. Kilamên Dengbêj Şakiro yên behsa şer, pevçûn û serhildanan dikin ji me ra bûn mijar ku em nîşan bidin wî bi dengê xwe bîra civakê çawa parastiye û nehîştîye bûyerên girîng bîn jibîrkirin. Ji vê hêlê va ew hem ji bo bîra civakî ya Kurdan û hem jî ji hêla çanda dîrokî va kesekî girîng e û divê zêdetir xebat li ser kilamên wî bîn kirin.

---

<sup>16</sup> Ji bo ku ev kar bi rêk û pêk bimeşe di navbera enstîtûyê û kurê Şakiro Ümit Deniz da peymanek hat îmzekirin. Bi vê peymanê hemû mafên berhemana kete destê enstîtûyê. Li gor agahiya enstîtûyê nêzîkî 200 kilamên ku Şakiro gotine û yê heta niha nehatine belavkirin wê li gor teknolojiya îro ji nû va bêne saz kirin û paşê wê bîn belav kirin. Der barê mijarê da zêdetir agahî li ser vê linkê tên peydakirin <https://bianet.org/bianet/sanat/236790-dengbejlerin-piri-sakiro-nun-sarkilari-toplu-yayinlanacak>

## **BEŞA SÊYEM**

### **3. HÊMAN Û BÛYERÊN DÎROKÎ YÊN BÛNE PAŞXANEYA KILAMÊN DENG BÊJ ŞAKIRO**

Deng û hişê dengbêjan wek təkiliya hubr û kaxizê ye. Çi ji hiş û devê wan derdikeve wek ku hibra li ser kaxizê bê nivîsîn tê parastin û nifş bi nifş digihêje civakê. Dengê wan carna dibe hewar, gilî û gazî, hin caran dibe evîn, bawerî û berxwedan ku ev çand û dîroka Kurdan wek saya gelek kedkarên ziman, bi saya dengbêjan jî tê parastin. Dengbêjan di civakê da gelemperî hurmeteke mezin dîtine. Sedema vê ne tenê ji bo ku dengê wan xweş e, ji ber ku ew xwedî bîreke xurt in, ji bilî kilamên eşq û siruştê bûyerên girîng ên dîrokî jî dikin mijar jî hurmetê dibînin.

Dema di nav demê da hin bûyer diqewimin û ji ser ra wext derbas dibe ew êdî dibin dîrok. Paşê nivîskî an jî devkî behsa wan bûyeran tê kirin ku ev jî wek dîroka nivîskî û dîroka devkî dikeve nav jiyana civakê. Dema dîroka fermî tê nivîsin bûyer li gor fikr û ramanên fermî tîn behskirin û wisa berbelav dibe. Her çiqas hin caran nakokî û agahiyên ne rast, an jî yên hatibin berevajîkirin hebin jî civak bibê nebê wan dibîhîze û dixwîne. Lê ev dîroka fermî hin caran rastî hin tevgeran tê ku yek ji wan jî tevgerên dengbêjan e. Dîroka fermî bi saya dengbêjan bi awayekî din hatiye vegotin, endamên civakê bi saya kilamên wan hay ji dîrokeke dij û hin rastiyên cuda bûne. Dengbêj Şakiro (Kewê Ribat) jî ji wan dengbêjan yek e ku wek dengbêjekî navdar ê herêma Serhedê bûye mijara vê xebatê.

Di vê beşê da em ê behsa cureyên kilamên şer û pevçûnê bikin ka kîjan cure kilam bûne mijara vê xebatê. Hin bûyerên girîng ên ku şopa wan li ser dîroka dinyayê û Kurdan çêbûne jî wê bîn behskirin ku ew Şerê Dinyayê yê Yekemîn, Şerê Balkanan, Serhildana Şêx Seîd, Serhildana Agiriyê û Komkujiya Geliyê Zîlan e. Piştî van çend hêmanên sereke yên wek çek û alav, hesp û siwarên wan, malbat û eşîr, sirgûn jî ji ber ku ji van kilaman ra bûne paşxane wê ji rêzikên kilamên Dengbêj Şakiro mînak bînin nîşandan.

#### **3.1.CUREYÊN KILAMÊN ŞER Û PEVÇÛNÊ**

Di avakirina bîra civakî da rola dîrokê pir girîng e, her civak li gor xwe dîrokekê ava dike. Dema dîrok tê nivîsîn wek berê jî hatibû destnîşankirin desthilatdar li gor berjewendiyên xwe dîrokeke fermî dinivîsîn da ku însanan li gor xwe bi rê va bibin. Lê komên din ên di civakê da dijîn û ne xwedî hêzeke xurt in jî dijî dîroka fermî li gor

hêz û nêrîna xwe dîrokekê ava dikin û wê digihînin nîfşên xwe yên dahatûyê. Di bin vê bêşê da em ê hin kilaman analîz bikin ku hemû jî der barê şer, pevçûn, kesên navdar (yên di bîra civakî ya kurdî da wek leheng tên qebûlkin) û eşîrên hêza wan xurt û navdar da ne, yanê perçeyekî dîrokê ne. Kilamên xebat li ser hatin kirin dikarin wek çar cure bîna dabeşkin;

- 1- Kilamên şer û pevçûnê yên dijî dewletê (serhildan)
- 2- Kilamên şer û pevçûnê yên di navbera eşîran da
- 3- Kilamên şer û pevçûnê yên behsa lehengiya hin Kurdan dikin
- 4- Kilamên şer û pevçûnê yên li hemberî nijadên din

Piştî vê senifandinê heke bi kurtasî behsa cureyên van kilaman bê kirin mijar wê bi zelalî bîna fêmkirin. Wek di senifandinê da jî tê dîtin kilamên bîna mijara wê xebatê hema bibêje ji sedî nodî zêdetir der barê şer û pevçûnan da ne, wek bîreke dij di nav pelên dîrokê da cih girtine.

### **3.1.1. Kilamên Şer û Pevçûnê yên Dijî Dewletê (Serhildan)**

Di van kilamên behsa şer, pevçûn û serhildanê dikin da bûyer û kesên dîrokî (şexs, leheng) dem û mekanên taybet derbas dibin ku jê gelek di dawiya sedsala nozdemîn û destpêka sedsala bîstemîn da mohra xwe bîra civakî û dîroka devkî ya Kurdan xistine. Di dema Şerê Balkanan, Şerê Dinyayê yê Yekemîn, Serhildana Şêx Seîd, Serhildana Agiriyê, Komkujiya Geliyê Zilan û piştî van gelek bûyerên dîrokî qewimîn e ku dengbêjên herêmê li ser van bûyeran kilam çêkirine. Ji wan hinek ji ber ku ji devê dengbêjekî derbasî dengbêjên din û civakê bîna êdî ji hêla gelek kesan va hatine jîberkirin. Aras jî balê dikşîne ser vê mijarê û dema behsa Serhildana Agiriyê dike dibêje ev kilamên li ser serhildanê (Serhildana Agiriyê) hatine çêkirin qasî panzdeh û şanzdeh heb in ku ji hêla Mistefayê Xellê Heyran va hatine afirandin (2009: 9).

Dema em berê xwe didin kilamên şer yên wê demê dijî desthilatîyê hatine gotin xalên bala me dikşînin ev in; dewlet xwedî hêzeke mezin e, qanûn û zagonên wê yên xurt hene, ji welatîyan bacê zêde distîne, eskeriyê mecburî dike, desthilatîyeke nû (komar) ava kiriye ku ev ya ji berê cudatir e. Ji ber ku hinek (kes, eşîr, nijad û kom) dijî van qanûn û desthilatîyê tevdigerin, serî radikin û qanûnên nû qebûl nakin ew wek “rêbir”, “serhildêr”, “eşqîya” û “talanker” tên binavkirin û ew tên cezakirin. Wek Fanon jî dibêje dewlet şûna ku bi hemû hêza xwe va welatîyên xwe hembêz bike, rûyê

xwe yê ceberût nîşanî wan dide. Bi hemû hêz û artêşa xwe kesên “serhildêr” dikuje, di mehkemeyên xwe da didarizîne û wan îdam dike ku desthilatî dewam bike (2020: 164).

Her çiqas ew kes wisa bên binavkirin jî, li gor Kurdan û komên din yên ku serî hildane ew ne eşqiya ne û ne jî rêbir û paşverû ne. Civak wan wekî şervan, şoreşger, mêrxas, egîd, camêr û hwd bi nav dike. Yanê bûyer heman bûyer e, lê her kes li gor xwe bîrekê ava dike û li gor xwe dîrokê dinîvîse ku em ê di vê xebatê da bi zelalî vê yekê bidin nîşandan. Di van kilamên şer û pevçûnê da behsa Enqereyê, dewlet û hikûmatê, Siltan Ebdulhemîd, komara nû (wek cumhuriyeta teze tê binavkirin) tê kirin ku ew hêzê, hegemonyayê û fermiyetê sembolize dikin. Enqere ji ber ku paytext e wek mekan balê dikşîne, lewra qanûn û ferman ji wir dertên, sembola hêz û fermiyetê ye. Enqere wek metafor di hişê gel da cihê desthilatîyê ye, li hemberî vî bajarî û rêvebiran rêz tê nîşandan ku ev gelek caran ji ber tirs û xofê ye. Çend kilamên sereke yên behsa dijî zordestî, qanûn û nizamên dewletê tên kirin û kirinên wê nayên qebûlkirin ev in; “Asyayê”, “Silêmanê Ehmed”, “Kekê Xiyasedîn”, “Teyrê Îspirê” û “Bavê Şemsedîn”.

### **3.1.2. Kilamên Şer û Pevçûnê yên di Navbera Eşîran da**

Di kilamên şer û pevçûnê yên di navbera du an jî zêdetir eşîran da, em dibînin ku mêrên van eşîran ji ber sedemên wek piştgiriya dewletê, hêz û desthilatîya herêmê, qîzrevandin, mêrkuştin û hwd pev diçin. Di van pevçûnan da ji herdu aliyên jî gelek kes tên kuştin û birîndar dibin. Ev jî têrê nake di navbera wan da dijminatîyeke bi salan dewam bike dest pê dike. Jinên van eşîran li ser şer û pevçûnên di navbera mêran da çêbûne kilamên cureya wan zêmar e dibêjin (di beşa duyem da dema behsa dengbêjiya jinan hatibû kirin li ser vê mijarê agahiyên berfireh hatibû dayîn) û şîna wan kesan digirin.

Di van kilaman da behsa egîdî û mêrxasiya van mêran (bav, ap, xal, kalik, kur, bira) tê kirin û ji ber mirina wan êşeke mezin ya kutê kişandin tê bilêvkirin. Peyvên dilşewat û yên ku pesnê lehengiya wan didin di van kilaman da balê dikşînin. Ji bo cureya van kilaman kilama “Reben im”, “Ûskanê Bira” û “Seîdo” dibe wek mînakên sereke bên nîşandan.

### **3.1.3. Kilamên Şer û Pevçûnê yên Behsa Lehengiya Hin Kurdan Dikin**

Wextê em guhê xwe didin kilamên şer û pevçûnê yên behsa lehengiya hin şexsan dikin em dibînin ku ev kes an di şerên dijî dewletê an jî şerên di navbera eşîran

da bi şervanî û zanebûna xwe va balê dikşînin. Li gor van kilaman ev kes di şer û pevçûnan da ji ber mêranî, cengawerî, wêrekî, başbikaranîna çek û silahan, jîrbûn û jêhatîbûna xwe kesên li hemberî xwe têk birine û bi ser ketine. Di kilaman da ev kes wek qehreman, egîd, mêr, şêr, çargurcîk, dilpola, beg û axa tèn binavkirin. Her çiqas pesnê wan evqas zêde bê dayîn jî hin caran ew di şer û pevçûnan da bi ser nakevin û têk diçin. Ew yan birîndar dibin yan jî tèn kuştin, lê dîsa jî lehengiya wan li ser zar û zimanan bi salan belav dibe û digihêje roja me.

Sedema têkçûyîna lehengan gelemperî ne ji ber kêmbûna mêrxasiya wan e, ew ji ber sedemên cuda têk diçin. Ya herî girîng ew e ku hêza lehengan li gor yê dijî xwe kêm e. Mînak heke leheng dijî dewletê şer bike dewlet xwedî çek û cebilxaneyeke mezin e û bi sedan eskerên wê hene ku leheng nikare bi ser bikeve. Yan jî eşîrên hêza wan xurt in li hemberî leheng dema şer dikin dîsa hêza wan li gor hêza leheng zêde ye û ew ji ber bêpîştiyê têk diçe. Ya duyem jî ew e ku li hemberî lehengan dafîk, kemîn tèn danîn û ji ber şertên ne wekhev ew têk diçin. Kilama “Asyayê”, “Bavê Xalis Kekê Mexsê” û “Bavê Dilşayê” ji bo vê cureyê kilamên sereke ne. Wek leheng jî herî zêde navê “Ferzende Beg”, “Bişarê Çeto”, “Cemîlê Çeto”, “Silêmanê Mistê”, “Filîtê Quto”, “Seyîdxan”, “Elîcan”, “Hemê Mûso”, “Îbo Begê Parsînî” û “Eliyê Ünîs” tèn zanîn.

#### **3.1.4. Kilamên Şer û Pevçûnê yên li Hemberî Nijadên Din**

Di kilamên şer û pevçûnê yên li hemberî kesên ji nijad, dîn û baweriyên din da hin hêmanên balê dikşînin hene. Di van kilaman da zêdetir pesnê şervan û lehengên Kurd tèn dayîn, dînê Îslamê wek dînê pîroz tê nîşandan, li ser navê Xwedê, Pêxember, Qur’an û telaq (jinberdan) sond tê xwarin ku ewên li hember biçûk tèn dîtin. Mînak hin peyvên wek “qetla wî mîna qetla du mirîşkan e”, “kafir”, “marûs”, “gawir”, “duwalê ecnebî”, “rom”, “roma virek”, “eskerên Romê”, “beşîncî mezheb” û hwd ji bo wan kesan tèn bikaranîn. Di nav kilamên Dengbêj Şakiro da kilama “Asyayê”, “Şerê Tarxan”, “Îbo Begê Parsînî” û “Şerê Selanîkê” û ji bo vê cureyê dibe wek mînakên sereke bèn nîşandan.

### **3.2. ÇEND BÛYERÊN SEREKE YÊN JI KILAMÊN ŞER Û PEVÇÛNAN RA BÛNE PALGEH**

Di kilamên Dengbêj Şakiro yên li ser şer û pevçûnan da xaleke girîng derdikeve pêşberî guhdaran ku ew jî çend bûyerên sereke ne. Ev bûyer di dawiya sedsala 19emîn û destpêka sedsala 20emîn da qewimîne û ji kilaman ra bûne palgeh. Van bûyeran tesir



li ser Kurdan û erdnîgariya wan kiriye, êş û keserên wan deman hatine kişandin bi saya şahid, belge û dengbêjan gihîştine heta îro. Di çaryeka sedsala 20emîn da ne tenê erdnîgariya Kurd lê dijîn, li hemû cîhanê gelek bûyerên girîng çêbûn ku ji wan ya herî girîng Şerê Yekemîn yê Dinyayê (1914) ye û tesîreke wê ya mezin li ser hemû cîhanê çêbû. Lewra piştî şer li dinyayê dewra împaratoriyan qediya û ew yek bi yek belav bûn. Şûna împaratoriyan netewedewlet ava bûn, sînorên gelek welatan ji nû va hatin xêzkirin û hin nijadên bê dewlet bûn xwedî dewlet. Di heyameke wiha da li Rojhilata Navîn jî dewletên nû ava bûn, lê Kurd ji ber hin sedeman ji vê rewşê bêpar man, her ku çû di nav Sûriye, Iraq, Îran û Tirkiyeyê da heliyan, tune hatin hesabandin û gelek mafên wan ên bingehîn jî hatin bînpêkirin.

Kurdên li hemberî vê rewşê aciz bûn paşê bêdeng neman, li hemberî desthilatiya van welatan gelek caran serî rakirin, ketin nav şer û pevçûnên giran û navê serhildanên mezin di dîrokê da dan nivîsîn. Ji van serhildan û bûyerên dîrokî çend hebên gelekî girîng hene ku tesîreke wan a mezin li ser Kurdan û erdnîgariya ku dijîn çêbûye. Em dikarin Serhildana Şêx Seîd (1925) û Serhildana Agiriyê (1926-1930) ji wan yê herî girîng binirxînin. Ji bilî van hin bûyer û şerên din jî hene ku yek ji wan Şerên Balkanan (1912-1913) û ya din jî Komkujiya Geliyê Zilanê (1930) ye. Di kilamên me analîz kirin da an rasterast an jî bi awayekî sergirtî behsa van bûyeran, kesên beşdarî van şer û pevçûnan bûne tê kirin. Bi saya van kilaman ew di bîra civakê da zindî dimînin û bîreke hevpar (collective memory) ava dibe.

### **3.2.1. Şerên Balkanan (1912-1913)**

Şerên Balkanan di dîroka Ewropa û Osmaniyan da di nav wan bûyerên herî girîng da cih digirin. Ji ber ku di encama van şeran da nexşerêya welatan guheriye û ew bûne sedema destpêka perçebûna Împaratoriya Osmaniyan û avabûna welatên nû. Piştî van şeran axa Împaratoriya Osmaniyan ya li Arnawûdistan, Bosna Hersek, Yûnanistan, Bulxaristan, Makedonya û Sirbistanê yê bi salan hatibûn parastin ji dest çûn. Di destpêka salên 1900î da li dinyayê fikra netewebûnê belav bû û helbet tesîra vê fikrê li ser nijadên curbicur yê di nav sînorên Împaratoriya Osmaniyan da dijiyan jî çêbû. Sirp, Yûnan û Bulxarên xwestin ji împaratoriye veqetin bi hev ra tevgeriyan û di sala 1912yan da li dijî artêşa Osmaniyan şer kirin. Sirp û Yûnan ber bi Makedonyayê, Bulxar jî ber bi Trakyayê va çûn. Piştî şer û pevçûnan bajarê Selanîkê jî di nav da axa împaratoriye ya li Trakyayê û Edirneyê bi dest xistin û ber bi Stenbolê

va hatin. Paşê Bulxar û Yûnanan li hev nekir û şerê duyem yê Balkanan dest pê kir (Akşin, 1997: 34-36). Di navbera Yûnan, Bulxar û Sirpên ku li ser Makedonyayê li hev nekirin da di sala 1913yan da şer derket, artêşa Osmaniyan bajarê Edirneyê paşve hilda û Arnawûd gihîştin desthilatiya xwe (Faroqhi, 2012: 101).

Di dîrokê da dema behsa Şerên Balkanan bi taybetî yê ji bo Selanîkê tê kirin tê gotin ku artêşa Osmaniyan ji ber birçîbûn, kêmasiya çek û cebilxaneyê û hewayaya sar gelekî zehmetî kişandiye, gelek esker di vî şerî da hatine kuştin û birîndar bûne. Lewra hişmendiya fermî naxwaze bide zanîn ku ji ber tevgerên din ev ax ji dest çûne dixwaze di bîra civakê da wisa bê zanîn. Lê li gor çavkaniyên cuda di şer da dema Hesên Tehsîn Paşayê qumandanê Tirkan dîtiye ku çavê her kesî li Selanîkê ye, hêza wan jî têrê nake ku ew li dijî wan bi ser bikevin û gelên nemisilman yên li bajêr dijîn jî ji wî ra gotine ew naxwazin bajar di şer da bê wêrankirin biryar daye ku şer dawî bibe. Li gor agahiyên dîrokî Hesên Tehsîn Paşa him bi qumandanên artêşa Bulxaran û him jî bi qumandanên artêşa Yûnanan ra hevdiyanan dike. Çaxê dibîne ku Yûnan şert û mercên baştir teklîfî wî dikin agirbestê îlan dike. Di 26ê Cotmeha 1912yan da di navbera Osmaniyan û Yûnanan da peymanek tê îmzekirin û Selanîk dikeve destê Yûnanan (Chasan, 2018: 223). Artêşa Tirkan ya ku Selanîk diparast di 9ê Mijdara 1912yan da teslîmî Yûnanan dibe û Yûnan dikevin Selanîkê û ber bi Manastirê va diçin (Zeyrek, 2012: 386). Artêşa Yûnanan ya ku serkêşiya wan Weliehdê Mîrza Konstantîn dike dikeve Selanîkê û hakimiyeta Osmaniyan ya li bajêr (hema hema 500 salî) ji holê radibe.

Di vê demê da Osmanî, Sirp, Yûnan û Romanyayîyan li hemberî Bulxaran şer kir. Bulxar ber bi Sirbistan û Yûnanistanê va çûn, lê bi piştgiriya Romanyayê wan dijî Bulxaran şer kir û di vî şerî da Osmaniyan Edirne paşve hilda. Bi Bulxaran ra Peymana Bukreşê (1913) hat çêkirin û Bulxaran axa bi dest xistibû ji dest da. Qismekî mezin yê axa li Balkanan yê ku di dema padişahê Osmaniyan Fatih Siltan Mehmet da li ser axa împaratoriye hatibû zêdekirin piştî şerên li Balkanan ji dest çû. Di van şer û pevçûnan da Kurd jî di nav artêşa Osmaniyan da esker bûn û dijî dijminên Osmaniyan şer kirin. Di encamê da gelek esker hatin kuştin, hinek ji ber birçîbûnê mirin, nijadên cuda yên li wan deveran dijîyan ji ber şer koç kirin, gelek li ser rê û dirban mirin û yên xelas bûn jî şepirze û perîşan bûn. Piştî van bûyeran Şerê Dinyayê yê Yekemîn dest pê kir ku ji ber şer li dinyayê felaketên hê mezintir çêbûn.

### 3.2.2. Şerê Dinyayê yê Yekemîn (1914-1918)

Şerê Dinyayê yê Yekemîn di sala 1914an da dest pê kir û di sala 1918an da dawî bû ku di navbera van salan da zirareke mezin gihîşt hemû dinyayê. Ji ber şer gelek kes hatin kuştin, birîndar bûn û seqet man. Êş û travmayên mezin hatin kişandin, gelek welat û nijad di vî şerî da têk çûn û tesîra şer a xirab bi salan li ser welat û civakan çêbû. Dema em çav didin wê demê di sala 1914an da li Ewropayê di navbera Alman û Îngilizan da ji bo bazara derva û desthilatiya dinyayê reqabetek hebû. Li aliyê din jî di navbera Rûsya û Awisturya-Macaristanê da li ser nijadiya Cermen-Slavan pevçûn hebû. Di nav rewşeke wiha da Rûsya, Fransa û Îngiltereyê wek dewletên îtilafê yê sêalî, Awisturya-Macaristan, Îtalya û Almanyayê jî wek tifaqa sêalî di navbera xwe yekîtiyek ava kiribûn. Dema ev hev girtin û tifaq di navbera welatan da çêbûbû û wan li ser erdnîgariyên cuda hesabê bidestxistina dewlemendiyan û desthilatiyê dikirin, şer û pevçûn çêdibûn, lê bûyereke qewimî ku bû sedema destpêkirin û belavbûna şer.

Peşka destpêkirina şer li Sirbistanê bi kuştina Welîhedê Awisturya-Macaristanê Ferdinand û jina wî va çêbû. Di 28ê Tîrmeha 1914an da suîkasta dijî Arşîduk Franz Ferdinand bû sedema rageşiyêke navneteweyî (Üngör, 2016: 114). Piştî vê bûyerê Awisturya-Macaristanê dijî Sirbistanê şer da destpêkirin, Rûsya jî piştgirî da Sirbistanê û Almanyayê jî piştgirî da Awisturya-Macaristanê. Paşê Fransa, Îngiltere û Belçîka jî beşdarî şer bûn. Bi beşdarbûna gelek welatan xeleta şer her ku çû firehtir bû û ev şerê mezin li dinyayê belav bû. Di 29ê Cotmeha 1914an da du keştiyên Almanan (Goeben û Breslau) yê ji destên Îngilizan xelas bûn û ji hêla Osmaniyan va hatine kirîn peravên Rûsya jî bombeyên kirin ku ev bû sedema beşdarbûna şer a Osmaniyan (Bozarlan, 2004: 32). Bi vî awayî Dewleta Osmaniyan jî li gel Almanyayê beşdarî şer bû û hêdî hêdî dawiya xwe anî. Di vî şerî da bi milyonan kes çûn eskeriyê, lê piştî şer qediya hejmara kesên veşeriyên bi hezaran hat qeydkirin. Tesîra şer wek gelek welatan li ser Dewleta Osmaniyan jî çêbû, piştî şer împaratorî hêdî hêdî belav bû û demek şûn da jî komara nû hat avakirin. Kurdên di nav sînorên vê împaratoriye da dijîyan jî ji ber vî şerî gelek êş û azar kişandin, travmayên ji ber vî şerî çêbûne di çanda devkî û bîra civakî ya Kurdan da gelekî cih digirin. Wê demê Êris ketin nav bajarên Kurdan (yên Serhedê) gelek meriv kuştin û zirareke mezin dan herême, Kurdan jî dijî wan şer kir ku hin kilam behsa vê dikin.

Di vî şerî da helbet Dewleta Osmaniyan jî zirareke mezin dît, paşê Peymana Mondrosê hat îmzekirin ku eleqeya vê peymanê û Kurdan heye. Lewra bajarên

Erzirom, Wan, Xerpêt, Bidlîs, Sêwaz, Diyarbekir û yê wêk van di nav xalên peymanê da wê bajarên Ermeniyên hatin binavkirin ku Kurdan bertek nîşanî vê da. Di wê demê da Îngilîzan Mûsil dagir kir, dema Osmanî ji Mûsilê vekîşiyên jî axa Kurdan wêk başûr û bakur hat veqetandin (Özen, 2021: 41).

### **3.2.3. Serhildana Şêx Seîd (1925)**

Serhildana Şêx Seîd ya ku di dîroka Kurdan da wêk serhildaneke girîng tê hesibandin di sibata 1925an da dest pê kir û di hezîrana 1925an da hat têk birin. Beriya behsa serhildanê bê kirin divê der barê şert û mercên wê demê û sedemên serhildanê da çend agahiyên kurt bînin dayîn. Dema Şerê Yekemîn yê Dinyayê bi hemû zîrar û travmayên xwe va qediya li dinyayê bû sedema gelek guherînan. Wêk deverên din ên dinyayê di Împaratoriya Osmaniyên da jî hin guherînan çêbûn ku yek ji wan avabûna komarê bû. Beriya Komara Tirkiyeyê ava bibe di dema Osmaniyên da jîyan li gor şert û mercên saltanatê dimeşiya. Tevgera nû dijî pergala berê tevgeriya û di sala 1923yan da Komara Tirkiyeyê hat avakirin. Di vê komara nû da jî welatîyan dihat xwestin ku ew dev ji jiyana berê ya ku tê da hin kevneşopiyên Îslamê jî hene berdin, her tişt bila li ser hîmê sekulerîzmê bimeşe û ew wêk mîletên Rojavayî bijîn û bifikirin. Ji ber vê jî qanûnên nûjeniyê diparêzin hatin derxistin û makezagoneke nû hat avakirin. Di vê makezagonê da (1924) da serdestiya Tirkan hat pejirandin, Kurd û gelên din tune hatin hesibandin.

Dema Komara Tirkiyeyê hat avakirin gelek polîtîkayên bingeha xwe dispêrin serdestiya Tirkan ketin rewacê, guherînan çêbûn. Ji zîman û alfabe yê bigire heta cil û bergan, ji aboriyê bigire heta zagon û perwerdeyê di gelek qadên jîyanê da civak tevahî hat guherandin. Li gor van polîtîkayên nû neteweyên cuda (Kurd jî di nav da) tune dihatin hesibandin. Hebûna Kurdan dihat înkarkirin, ew wêk kesên “hov” û “paşverû” dihatin binavkirin. Qanûnên nû dibûn sedema guherînan mezînan ku medreseyên Kurdan jî li gor qanûna “girtina teke û zawiyeyan” dihatin girtin. Seyda, alim, zana û melayên Kurdan jî para xwe ji vê rewşê hildidan.

Di vê pêvajoya ku nasnameyên cuda wêk talûke hatin qebûlkirin û hewl hat dayîn ku her kes wêk Tirk bê hesibandin da neteweperwerên Kurd di bin banê Cemiyeta Azadiyê da dest bi xebatan kirin û di Sibata 1925an da serhildanekê dest pê kir. (Fırat, 2015: 234). Serhildan di nav demeke kin da belav bû û hikûmet têgihîşt ku ewê mezînan bibe. Ji bo serhildanê tepisandin û kesên serî rakirine bînin cezakirin

hewleke mezin da. Wextê ev serhildan û serhildanên din çêdibûn desthilatiya fermî nedixwest di navbera van serhildan û polîtîkayên Kurdan tune dihesibînin da têkiliyekê ava bike û bibêje ew ji ber van sedeman çêbûn, şûna wê digot ev serhildan ji ber berjewendiyên dewletên biyanî yê dixwazin welêt perçe bikin û Kurdan gef û gur dikin çêdibin û dixwest înkarkirina nasnameya Kurd bi vî awayî ji rojevê derkeve (Özbilge, 2020: 45-105).

Bûyerên dema serhildanê û piştî wê qewimîn tesîreke mezin li ser erdnîgariya Kurdan kirin. Der barê destpêkirina serhildanê da agahiyên hevdu nagirin hene (13ê sibatê, 17ê sibatê û hwd), lê ya eşkere ew e ku serhildan di meha sibatê da çêbû. Sureyya Bedirxan dibêje ji ber ku Kurdek çû ziyareta Şêx Seîd û di rêya vegeerê da fermandarê Tirkan ew girt û haya wî çêbû ku serhildanek wê bê kirin, nameyek ji Şêx ra şand ku ew here baregehê. Li ser vê Şêx Seîd ji rewşê kete şikê û bangî eskerên xwe kir ku ew serhildanê bikin. Ji ber vê ev serhildan beriya 21ê adarê di 7ê adara 1925an da yanê zûtir çêbû (1994: 51).

Serhildan li Bîngol, Elezîz, Diyarbekir û herêmê ji ber piştgiriya gelek kesan û eşîran belav bû. Çawa ku yê piştgiriya didan hebûn, hin eşîrên beşdarî serhildanê nedibûn jî balê dikişandin. Der barê têkçûna serhildanê da Şêx Elî Rizayê kurê Şêx Seîd dibêje hin axa û şêxên herêmê bêalî neman, piştgiriya dewletê kirin û ji hikûmetê ra telgraf şandin ku eleqeya wan bi vê serhildanê ra tune (Fîrat, 2022: 28, 36). Dewletê gelek esker, cebîlxane û milîs bi kar anî û serhildan tepisand. Piştî ku serhildan têk çû li gor qanûna nû ya bi navê “Takrir-i Sukûn”ê mehkemeyên îstiklalê dîsa dest bi karên xwe kirin û sedan kes bi cezaya îdamê hatin cezakirin (Bozaslan, 2008: 48). Li gor vê, di 29ê Hezîrana 1925an da Şêx Seîd û rêhevalên wî li Diyarbekirê hatin îdamkirin. Ji ber ku komar nû ava bûbû û dixwest hêza xwe nîşan bide, cezayê hepsê neda wan, bi îdamkirinê va çavê civakê tirsand ku dîsa serî neyê rakirin. Gelek kesên beşdarî vê serhildanê bûn an hatin girtin an jî hatin nefkîrin (sirgûn) ku koka wan ji axa ku lê dijîn bê birîn. Wê demê qasî cezayê hepsê nefkîrin jî cezayekî pir mezin bû ku gelek malbat û eşîrên Kurd rastî vî cezayê hatin. Said ji bo nefkîrinê dibêje ew tiştêkî sekuler û dîrokî ye ku bi destê hin însanan ji bo însanên din tê kirin û dibêje qet nebe di mirinê da merhemet heye, lê nefkîrin merhemeta mirinê jî nade bi milyonan însanan, koka wan ji kevneşopî, malbat û erdnîgariya wan dibire (2006: 29).

Wek ku Said jî tîne zimên gelek kesên wê demê hatin nefkîrin an jî ji serhildana Şêx Seîd sax xelas bûn li duwalên din bi van hestên neyînî hisiyane. Her

çiqas hewl bê dayîn ku çavê civakê bê tirsandin jî, piştî vê serhildanê Serhildana Agiriyê çêbûye, kesên hatine sirgûnkirin gelek dîsa vegeriyane axa jê hatine qewirandin û heta hatine kuştin jî beşdarî vê serhildanê bûne. Ji ber ku dengbêjan Serhildana Şêx Seîd, pêşengên serhildanê yê hatine îdamkirin û sirgûnkirin, kesên piştgirî dane vê serhildanê û gelek bûyerên wê demê qewimîne bi kilamên xwe va gihandine roja me li vir bi kurtasî behsa vê serhildanê hat kirin ku paşxaneya kilaman û têkiliya wê ya bi bîra civakê ra bê nîşandan.

#### **3.2.4. Serhildana Agiriyê (1926-1930)**

Serhildana Agiriyê ya ku piştî Serhildana Şêx Seîd di gulana 1926an da dest pê kir, di 1930î da hat têkbirin. Serhildan çawa çêbû û çawa evqas dirêj dewam kir dema em li dû van pirsan dikevin em dibînin ku ew serhildaneke bi rêk û pêk e û bi destê çend kesan û rêxistenekê va hatiye birêvebirin. Piştî Serhildana Şêx Seîd kesên beşdarî vê bûyerê bûn hatin îdamkirin, hinek hatin girtin û hin malbat jî hatin sirgûnkirin. Lê hin kes jî vê serhildanê sax filitîn û derbasî bin xetê bûn ku ew hin rewşenbîr, lehengên navdar û rûspiyên Kurd bûn. Ev rewşenbîrên Kurd ên li Sûriyeyê hatin bal hev piştî xebateke bi rêk û pêk di cotmeha 1927an da li Bhamduna bajarê Libnanê rêxistineke navê wê “Xoybûn” ya ku serokê wê yê ewil Celadet Alî Bedîrxan e ava kirin (Alakom 2011: 28).

Piştî demeke kurt a Serhildana Şêx Seîd li Agiriyê ji hêla Broyê Heskî Telî û rêhevalên wî serhildaneke her ku diçû tora xwe fireh dikir hatibû destpêkirin ku rêxistina Xoybûnê jî piştgirî da wan. Serhildan ne tenê ji bo Tirkiyeyê, ji bo Îranê jî bûbû pirsgirêkeke mezin û ji bo ku bê tepisandin û kesên serî rakirine bîr cezakirin herdu welat bi hev ra tevdigeriyan. Him Tirkiye û him jî Îranê wê demê (1927-1930) hewl dida netewebûnê saxlem bikin, çand û nasnameyên din bitepisînin, tevgerên mixalif ji holê rakin, polîtîkayên çandî, civakî, aborî û siyasî bimeşînin (Yüksel, 2016: 658).

Dema em berê xwe didin serhildanê qasî demekê der barê mijarê da nûçe nehatine çêkirin, serhildan bi zanetî hatiye veşartin ku haya gel jê çênebe. Ji bo ku serhildan li hemberî yekîtiya neteweyî, nasnameya netewî û pergala dewleta modern nebe pirsgirêk û rê li ber qanûn û kirinên komara nû negire ew demekê hatiye veşartin. Sedemeke din jî ew e ku li gor texmîna komarê serhildan ne wisa mezin e û ewê zû bê têkbirin. Lê serhildan her ku çû mezin bû û di çapemeniya dervayî welêt da hêdî hêdî

behsa wê hat kirin. Dema çapemeniya biyanî der barê serhildanê da nûçe belav kir çapemeniya Tirkan jî mecbur ma ku behsa serhildanê bike. Ji bo ku serhildanê di çavê însanan da biçûk bide nîşandan û kesên beşdar bûne reş bike gotinên wek “talanker”, “çete”, “eşqiya”, “paşverû” hatin bikaranîn. Mînak Rojnameya Milliyetê ya ku dîroka wê lê Tîrmeha 1930 ye wiha behsa serhildanê dike:

*“Ağrı dağı hadisesi yeni bir şey değildir. Her vakit tekrarlanan eşkıyalık ve haydutluk vak’alarından biridir. Filhakika İran’da silahlanarak bizim hududumuza geçen bazı haydutlar, fırsat buldukça birçok köylerimizi talan etmekten ve sürülerini İran hududuna kaçırmaktan geri kalmıyorlardı.”*  
(Özbilge, 2020: 103)

“Bûyera Çiyayê Agiriyê ne tiştêkî nû ye. Ji wan bûyerên eşqiyatî û rêbiriyê yê her tim dubare dibin yek e. Ya rast hin rêbirên li Îranê çekdar dibin û derbasî nav hidûdê me dibin, wextê derfetê dibînin gelek gundên me dişêlînin û heywanên wan direvinîn nav hidûdê Îranê.”

Ji ber ku rola rêxistina Xoybûnê di vê serhildanê da girîng e divê hinekî behsa wê bê kirin. Rêxistina Xoybûnê du sal piştî Serhildana Şêx Seîd ava bû, li gelek bajarên dinyayê yê wek Detroit, Parîs, Londra, Beyrût, Diyarbekir, Silêmaniye û Mûsilê xebat pêk anî ku di belge û arşîvên biyaniyan da jî behsa rêxistinê tê kirin. Xoybûnê kesên navdar di nav refên xwe da dihawand ku jê hinek ji hela fikr û ramanê, hinek jî ji hela hêza eskerî ango lehengî û quwet va xurt bûn. Alakom kesên di destpêka avakirina Xoybûnê da cih girtine wiha rêz dike; Celadet Alî Bedirxan, Memduh Selîm, Mehmed Şukru Sekban, Haco Axa, Emînê Perîxanê, Elî Riza (kurê Şêx Seîd), Bozan Şahîn, Mistefa Şahîn, Kerîm Beg, Kamil Beg, Tewfîq Beg, Fehmiyê Liceyî ne. Lê paşê ji ber ku rêxistin her ku diçe tora xwe fireh dike kesên din ên wek Qedrî Cemîl Paşa, Ekrem Cemîl Paşa, Mehmed Cemîl Paşa, Bedrî Cemîl Paşa, Osman Sebrî, Ehmed Nafîz, Arif Ebas, Mehmûd Beg, Hesên Haco, Evdîrehman Elî Yunis, Hesên Hişyar, Nûrî Dêrsimî, Hemzeyê Miksî û Cegerxwîn jî beşdarî Xoybûnê bûne û ji bo rêxistinê gelekî xebitîne (2011: 40-53).

Xoybûna ku serokê wê Celadet Alî Bedirxan û serfermandarê wê Îhsan Nûrî Paşa bû bi kadroyeke berfireh û piştgiriya gel û serokeşîran xebatên xwe meşand, li herêmê hêza xwe xurt kir û di serhildana Agiriyê da cih girt. Rêxistinê Îhsan Nûrî Paşayê ku herêmê baş dizanibû şand Agiriyê. Îhsan Nûrî Paşa û Broyê Heskî Telî Hikûmata Agiriyê ava kirin, alaya Xoybûnê li Agiriyê hejandin û bi saya rojnameya “Agirî”yê propagandayê xurt meşandin (Gorgas, 2020: 22).

Di vê serhildanê da dewletê gelek esker, melzeme û balafir şand herême ku Îhsan Nûrî Paşa der barê wan da wiha dibêje: “Tirkiye ji bo ku şoreşa Kurdistanê têk bibe 66 hezar esker û cendirme û ji 100î zêdetir balafir şandibû û êrîş kiribû” (Alakom, 2011: 156). Belgeyê arşîva dîplomatîk ya Fransayê ya ku dîroka wê 5ê Çileyê Pêşîn a 1927an e dibêje di meha îlonê da 8 hezar Tirk ji bo ku Çiyayên Kîralarê ya li Araratê bi dest bixin ber bi Geliyê Zilanê va çûn, lê wek sala çûyî dîsa têk hatin birin. Ji ber vê jî ber bi Bazîdê va çûn, lê li wir jî Hesên Begê serokê eşîra Heyderan bi alîkariya hêzên ji hêla Îranê hatin va li ser wan da çû, 4 top, 36 mîtralyoz, 14 serfiser û bi sedan esker bi dest xist. Li ser vê hêzên Tirk ber bi Diyadînê va vekîşyan ku heta hêzên alîkar bigîhîje wan (Çiğerli- Le Saout, 2022: 215). Sureyya Bedirxan jî der barê mijarê da dibêje fermanarekî Tirkan, 15 esfer û 800 merivên wan, 20 top, 66 tivingên bimakîne, 1200 tivingên din, 300 bombe û xenimetên din ketin destê Kurdan û ji 2000î zêdetir jî hêzên Tirk hatin kuştin (1994: 52). Der heqê hêzên dewletê yê hatine kuştin û cebilxaneyê ku hatiye xerckirin da çawa ku agahiyên zelal tunebin, her wiha ji bo hêzên Kurd yê di serhildanê da hatine kuştin û cebilxaneyê hatiye xerckirin da jî rewş wisa ye. Lewra çavkaniyên herdu aliyan jî ji bo ku behsa qehremanî û serkeftina xwe bikin, dixwazin xwe hêzdar û xurttir nîşan bidin hejmarên zêde dibêjin.

Di serhildanê da navê hin kesan zêdetir derketiye pêş ku ew Îhsan Nûrî Paşa, Ferzende Beg, Biroyê Heskî Têlî, Xalisê Evdilmecîd Beg, Seyîdxan û Elîcan e. Dema serhildanê bi destê wan dewam dikir hikûmatê efûyek îlan kir ku hêza serhildanê kêmbike û rehetir bitepisîne. Piştî îlana efûyê hin Kurdên hatibûn sirgûnkirin vegeyriyan malên xwe, lê ji ber ku rêxistina Xoybûnê digot divê efûya dewletê neyê bawerkirin serhildanê dîsa dewam kir (Kahraman, 2004: 225-226). Wê demê li gor belge û agahiyên di navbera serhildêrên Agiriyê û wezîfedarên dewletê da hevdiîtinên fermî yê ji bo mizakereyê jî hatine kirin, hin name ji wan ra hatine şandin ku ew teslîm bibin û dawiyê li serhildanê binin. Naci Kutlay çend nameyên Waliyê Bazîdê Sureyya Beg yê ji Biroyê Heskî Tellî ra şandine û yê ji wezîfedarê dewletê Numan Begê di postexaneyê Îdirê da dixebite ra şandine mînak nîşan dide ku di navbera herdu aliyan da rewşeke dîdilî heye û ew baweriya xwe bi hevdu naynin û ji ber vê ew guh nadin efûyê û teslîm nabin (2011: 285-290).

Di avabûna komarê da xala girîng netewedewlet e ku li gor gotinên fermî yê dewletê Tirk neteweya sereke û modern e, kom an jî nijadên din kesên “hov” û “dijî nûjeniyê” ne ku Kurd jî di nav wan nijadan da tên nirxandin. Dema em berê xwe didin



çapemeniya wê demê û dîroka fermî Kurdên beşdarî serhildanê bûne wek, “hov”, “paşverû”, “eşqiya”, “talanker”, “rêbir”, “serhildêr” û hwd hatine binavkirin û kuştina wan jî wek “paqijî”, “berterefkirin”, “îmhekirin” û “jiholêrakirin” tê îfadekirin. Ji hêla eskerî va têkbirina wan têrê nake, ew li gor şertên şerê derûniyê (psychological warfare) sîfat û gotinên bi vî rengî va jî biçûk tên nîşandan. Alakom jî behsa vê mijarê dike û dibêje ev nasnameyên pejoratîf û biçûkdîtinê yên wek “sergerde”, “talanker”, “serhildêr” û “rêbir” ji bo Kurdan tên binavkirin di lîteratûra piştî komarê da jî hatine bikaranîn û Kurd li Tirkiyeyê her tim wek “eşqiya” hatine dîkekirin (2011: 13). Yüksel jî balê dikêşe ser vê xalê û destnîşan dike ku ne tenê di çapemenî û belgeyên fermî yên Tirkiyeyê di yên Îranê da jî Kurd wisa tên binavkirin û ji bo vê jî gotinên “ekrade vahshi” (kurdên hov), “ekrade yaghi” (kurdên serhildêr), “shaghavat” (xirab), “fasad” (fesad) û hwd mînak nîşan dide (2016: 661).

Efserekî îngiliz Edward William Charles Noelê li ser navê Îngiltereyê li herêmê xebitiye dema di rojnivîska xwe da behsa Kurdan dike dibêje Kurd wek merivên sert xuya dikin, lê di binê vê xuyakirinê da hişekî wan ê pratîk heye, ji ber ku rojavayî wan fêhm nakin sîfatên “hov” û “bêmerhemet” ji wan ra layîq dibînin (2014: 128). Ev agahiya bi çavê biyaniyekî va hatiye parvekirin û dîroka fermî ya herdu welatan nîşan didin ku di dîrokê da gelek caran Kurd bi van sîfatan va hatine binavkirin, lê bîra civakî ya Kurdan dijî van gotinan derketiye, dîroka xwe cuda ava kiriye û gotinên erênî yên wek “leheng”, “şerker”, “egîd”, “mêrxas” û hwd ji xwe ra hîlbijartîye.

Çaxê rojnameyên wê demê bîna lêkolînkirin behsa hevkarîya bi Îranê ra tê kirin. Ji Îranê tê xwestin ku ew alîkariya Tirkiyeyê bike ku ev “eşqiya” bi rehetî bîna têkbirin. Mînak di nûçeyêke rojnameya “Vakit”ê da tê gotin divê Îran destûrê nede serhildêran, dest bide Tirkiyeyê ku ev mesele bê saflîkirin, heke wisa neke serhildêr wê piştî demekê di nav sînorên Îranê da jî heman tiştî bikin û dîsa xurt bibin û derbasî Tirkiyeyê bibin (Vakit, 1930: 6).

Her çiqas car caran di navbera hikûmatê û Kurdan da hevdiîtin çêbibin jî encamek nehat bidestxistin û şer her ku çû xurt bû û di îlona 1930î da serhildan hat şikêrandin (Ulugana, 2010: 21). Der barê têkçûyînê da Alakom tîne ziman ku heke Tirkiyeyê bi Îranê ra hin peyman îmze nekiriba û ji hêla polîtîk va nêzîkî Sovyetê nebûya Kurd wisa bi rehetî têk nedîçûn. (2011: 156). Yüksel jî dibêje hêzên Îranê piştgiriyê didin hêzên Tirk û bi hevkarîya wan li herêmê ev şer û pevçûnên giran dawî dibin û gelek kes tên kuştin, birîndar dibin û dîl tên girtin (2016: 660).

Dema serhildan têk diçe di Rojnameya Milliyetê da karîkatûrek tê weşandin ku ji bo nîşandana aqûbeta wan kesan û encama serhildanê dibe sembolek. Li gor agahiyên Îsmail Beşikçi<sup>17</sup> di karîkatûrê da kêlikekî gorê ya li ser “Kurdistana xeyalî li vir hatiye çalkirin”<sup>18</sup> (*Muhayyel-hayali Kürdistan burada gömülüdür*) nivîsandî hatiye xêzkirin ku çavê Kurdan bê tirsandin, îro jî gelek Kurd di bîra xwe da wê karîkatûrê wek belge vedişêrin (Îsmail Beşikçi, Pêwendiya tîlefônî, 12ê Çileyê Pêşîn 2021).

Serhildana Agiriyê ji hêla dîrok, mekan, nasname û ziman (ev bîra civakî ava dikin) va mohra xwe li bîra civakî ya Kurdan xistiye. Nifşên li dû serhildanê mane li vê dîrokê û şexsan xwedî derdikevin ku Hobsbawm dibêje hesta meriv xwe aîdê çanda serhildanê ya kevnar dibînin ji hêla hestan va têrbûneke hestiyarî peyda dike (2001: 33). Serkêşê Serhildana Agiriyê Îhsan Nûrî Paşa (1984: 19) di bîranînên xwe da ji bo serhildanê û yên beşdarî wê bûne da wiha dibêje:

Serhîlanîna Agrî laperek ji mêjûyê xunarî pir bi şanazîyê neteweyê kurdê arîyayî ye di rîya serbestî û azadîya xwe ya neteweyetî de. Serhîlanîna Agrî hewara dilşewêta neteweyê kurdê bêyar û yarerneyê, azar û şekencek diyar kiriye ... Serhîlanîna Agrî qîrîna serbixoyî ya xelqê kurdê dil û reben û belengaz e li hember hemû gel û komelan. Serhîlanîna Agrî belgeyek e bi xwîna kal û pîr, xort û mindalên kurd hatiye nivîsandin û bi destê nuwînerên xwe sipartiye.

Di bin siya van agahîyan da dikare bê gotin ku li aliyekî behsa nebaşî û dijminatîya kesên serî hildane tê kirin, lê li aliyê din jî bîreke alternatîf tê avakirin û yên serî rakirine jî heman tiştan ji bo kesên li hemberî xwe dibêjin û pesnê xwe didin. Bilgin jî (2013: 36) balê dikşîne li ser dualîbûnê û wiha dibêje:

Piştî pevçûnan dema bîra herdu komên pev çûne bê lêkolînkirin, tê dîtin ku herdu kom jî der barê bûyeran da bîra xwe ya fermî ava dikin. Birîn, neheqî, mirîna eqrebayan, zirarên madî, heqaret û biçûkdîtinên ew rast tînin, gefxwarin û talûke ji van bîran ra dibin melzeme... Bîr li hemberî bîrê tê avakirin. Herdu kom

---

<sup>17</sup> Li gor gotina Îsmail Beşikçi ev rojnameya Milliyetê ya ku behsa wê tê kirin ne rojnameya Milliyetê ya îro ye. Ewa berê di 1926an da ji hêla Parlamenterê Sêrtê Mahmut Nedim Soydan va li Stenbolê tê rêvebirin û di 19ê Îlona 1930yan da li wir karîkatûrek tê weşandin. Beşikçi dibêje di çapa ewil a pirtûka wî “Hayali Kürdistan”ın Dirilişi” da ev karîkatûr heye.

<sup>18</sup> Der barê vê karîkatûrê da agahiyên li hev nagrin hene ku gelek lêkolîner hevdu çavkanî nîşan didin. Rohat Alakom di pirtûka xwe ya bi navê “Bir Türk Subayı’nın Ağrı İsyanı Anıları” (r. 147) da dibêje 19ê Îlona 1930î Milliyet, Sedat Ulugana di pirtûka xwe ya bi navê “Ağrı Dağı Direnişi ve Zilan Katliamı (1926-1931)” da (r. 23) dibêje 17ê Îlona 1930î Cumhuriyet.

hewl didin di nav dîroka neteweyî da ji xwe ra cihêkî fireh û xweştir ava bikin.

Ya ku ji bo yekî dibe qehremanî, ji bo yê din dibe îxanet û melûnî.

Serhildana Agiriyê û kesên beşdarî wê bûne di çanda devkî ya Kurdî da ji kilam û çîrokan ra bûne mijarên taybet. Ew wek simbolên lehengiyê hatine şîrovekirin û bi rêya dîroka devkî ji wê rojê heta îro derbasî nifşên nû bûne.

### **3.2.5. Komkujiya Geliyê Zîlan (1930)**

Di navbera salên 1925 û 1936an da li ser axa Kurd lê dijîn serhildan, şer û pevçûnên girîng çêbûne ku yek ji wan jî Komkujiya Geliyê Zîlanê (Qirkirina Geliyê Zîlan) ye. Wextê Serhildana Agiriyê dewam dikir û şer bi awayekî xurt dimeşiya li herêma Geliyê Zîlan a li Erdîşa navçeya Wanê jî di sala 1930yê da komkujiyeke mezin pêk hat. Ev wek “Komkûjiya Geliyê Zîlan” di rûpelên dîrokê da hat nivîsin. Di vê komkujiyê da bi hezaran Kurd hatin kuştin, bi dehan gund hatin şewitandin û herêm hat serobinokirin. Heke em li dû pirsra çima li vir komkujiyek çêbû bikevin em digihêjin wê agahiyê ku herêma Geliyê Zîlan ji hêla zozan, av, kanî, hêşînayî û heywanên tîn xwedîkirin va herêmeke gelekî dewlemend bû. Li gor agahiyên Gültekin (2020: 10) ji ber vê dewlemendiya siruştî û aboriya baş gelê herêmê alîkariya serhildêrên Kurd dikir ev jî bû sedem ku ev der bibe hedefa dewletê û her wiha ji bo ku çavê gelê herêmê bê tirsandin jî ev komkuji hat kirin. Ulugana jî dibêje (2013: 51) serhildêrên Kurd ji bo ku li Agiriyê asê man û xwestin qada xwe berfirehtir bikin ketin Geliyê Zîlanê û li ser vê esker jî kişiya vê derê. Basooğlu jî (2011: 22) ji bavê xwe neqil dike ku li Çaxirbegê serçawîşekî nebaş yê ku zilm li gel dikir hebûye, hin Kurdan ji ber neheqiyên wî di ser qereqolê da girtine, serçawîş û hin esker kuştine. Li ser vê bûyerê kurên Kor Huseyn Paşa (Nadir Beg, Mehmed Beg) û Mala Cewo (Cewer Efendî) cab dane Enqereyê ku gel serî rakiriyê, ev jî bûye sedem ku dewlet bi hêzeke xurt bê herêmê û merivên bêguneh qir bike.

Dema Komkujiya Geliyê Zîlanê çêdibe di rojnameyên wê demê da der barê vê bûyerê da hin nûçe tîn weşandin ku ev komkuji wek “paqijiyaya eşqiyayan” û kesên hatine qirkirin jî wek “serhildêr”, “eşqiya” û “rêbir” hatine binavkirin. Wextê em berê xwe didin van nûçeyan di 10ê Tîrmeha 1930yê da Rojnameya “Resimli Uyanış”ê nûçeyek weşandiye ku dibêje hin talankerên ku eslê wan nayên zanîn serî rakirine ku ew ê bêne kuştin û wiha dewam dike:

*“Şarkta bir takım asılları ne olduğu belirsiz çapulcuların hudutlarımıza tecavüze yeltendikleri ve hükümetin buna karşı şiddetli tedbirler aldığı bilinmektedir. Maalesef son vaziyet karşısında sakilerin İranlılar tarafından*

*silahlandırıldıkları ve harici bazı kuvvetlerin bu hareketleri teşvik ettikleri kanaati hasıl olmuştur. Bu münasebetle Türkiye ve İran hükümetleri arasında notalar teati olunmuştur. Her türlü hazırlık bittiğinden hareket başlamıştır. Dağdaki asilerin kaçmalarına mani olacak tedbirler alınmıştır. Hepsi de dağda imha edilecektir. Çevirme hareketi tamam olmuştur. Tayyarelerimiz, hududu geçerek dağın çevrilmemiş kısmını havadan abluka etmiş, kıtalarımız çevirme hareketini muvaffakiyetle yapmıştır.” (Ulugana, 2010: 221).*

“Li Şerqê hin talankerên eslê wan ne diyar e hewl dane destdirêjiya sînorên me bikin, tê zanîn ku hikûmet li dijî vê yekê tevdîrên xurt dibîne. Mixabin li hemberî rewşa dawîn tê zanîn ku Îranî çekan didin van rêbiran û hin hêzên derva piştgiriyê didin van tevgeran. Bi vê minasebetê di navbera hikûmetên Tirkiye û Îranê da ultîmatom çêbûbûn. Ji ber ku hemû amadehî qediyarî harekatê dest pê kiriye. Ji bo ku rê li ber serhildêrên li serê çiyê bê girtin ku ev nerevin tevdîr hatine dîtin. Hemû jî wê li çiyê bêne îmhêkirin. Harekata dorpêçkirinê temam bûye. Teyareyên me hidûd derbas kirine û qismê çiyê yê ku nehatiye dorpêçkirin ji esman va dorpêç kirine, hêzên me harekat bi serkeftî kirine.”

Li gor nûçeya vê rojnameyê bi hevkarîya Îranê her der hatiye dorpêçkirin û “eşqiya” wê bîn îmhêkirin. Li gor agahiyên şahidan û dîroka devkî hejmarê kesên di vê komkujiyê da hatine kuştin bi deh hezaran e, wisa ku Çemê Zîlanê bi rojan sor gevez xwîn herikiye (Gültekin, 2020: 15). Hin nûçeyên wê demê jî vê agahiyê piştast dikin û dibêjin çem heta dev tijî cesed dibe. Ev jî dide nîşandan ku wê demê çiqas zêde însan hatine qirkirin. Ji ber ku ev komkujî zêde neyê axaftin, lêkolînkirin û rêça kuştîyan neyê şopandin bi salan ev der wek “qadeke qedexe” hatiye îlankirin û çûyîna vê deverê ji sivîlan ra hatiye qedexekirin. Di dema serokwezîrê 9emîn ê Tirkiyeyê Adnan Menderes da ev qedexekirin ji holê rabûye. Süphandağ jî dibêje xelkê Geliyê Zîlanê yê bi zorê hatine koçkirin qasî 20 salan hesreta vegera gundê xwe kişandine û dema piştî xwarinê jî her tim gotine “Xwedê zêde ke, gelî ava ke” û di 1950î da vegeriyan warên xwe (2012: 435).

Wek ku me berê jî gotibû di arşîvên fermî da dema şer, pevçûn û serhildan çêdibin ew bi zimanekî fermî wek bûyerên xirab, nebaş, yê ku yekîtiyê û aramiya desthilatiyê xirab dikin tînin binavkirin. Kesên beşdarî van bûyeran bûne jî wek “serhildêr”, “eşqiya”, “rêbir”, “diz” û “qaçaxçî” tînin binavkirin. Heta wisa ku ew wek heywanên hov, kûlî û kêzikên divê bîn kuştin û paqijkirin tînin nixandin. Li ser vê hişmendî û nêrîna dewletê ya der barê Kurdan da Özbilge tesbîteke balkêş dike û tîne

ziman ku çawa di çandiniyê da kêzik û kûliyên zirarê didin zewiyan tên îmhekirin, dewlet jî kesên wiha ji bo yekîtiya neteweyî ya homojen wek kêzikên zirarê didin vê dozê dinirxîne û wan bi awayekî tund û zext îmhe dike (2020: 27).

Çawa ku bûyerên din bûn mijara dengbêjên Kurd, Komkujiya Geliyê Zîlanê jî her wisa wek bûyereke dîroka nêzîk ji wan ra bû mijar. Bi taybetî dengbêjên herêma Serhedê der barê vê qirkirinê da gelek kilam çêkirin, bi saya sewt û awaza wan ev bûyer gihîşt nîşên din û di bîra civakê da cih girt. Em bi saya kilaman têdigihêjin ku ev bûyera dîrokî di dema Serhildana Agiriyê da çêbûye. Ev serhildan jî wek Serhildana Şêx Seîd di destpêkê da bi serkeftî dewam dike, lê paşê dewlet bi hemû esker, cebîlxane û hêza xwe va li herêmê hewl dide û serhildan tê tepisandin. Di dema tepisandinê da Agirî û dora wê bi bombeyên balafiran hatine bombekirin ku Geliyê Zîlan a Wanê jî bûye warê komkujiyeke mezin ya bi hezaran kes lê hatine kuştin.

Ev travmaya çêbûye di bîra civakî ya Kurdan da hê jî zindî ye. Li ser vê bûyera biêş gelek kilam hatine gotin, pirtûk û nivîs hatine nivîsin û belgefilm hatine çêkirin. Bi van xebatan va hewl hatiye dayîn ku kesên wê demê hatine kuştin bên bibîranîn û ev bûyer di hişê Kurdan da zindî bimîne. Wek K. Olick jî tîne ziman dema bûyerên dîrokî bi awayekî hevgerî û rast neyên vegotin travmayên kolektîf derdikevin holê (2014: 199) ku di dîroka Kurdan da gelek travmayên hevpar hene. Yek ji wan jî Komkujiya Geliyê Zîlanê ye û ev travmaya mezin di nav Kurdan da rûh û nasnameyeke hevpar ava dike.

### **3.3. ÇEND HÊMANÊN SEREKE YÊN BÛNE PAŞXANEYA KILAMÊN DENGBÊJ ŞAKIRO**

Dema kilamên Dengbêj Şakiro tên guhdarîkirin çend hêmanên sereke yên bûne paşxaneya kilamên şer û pevçûnan derdikevin pêşberî me. Ji van hinek balê dikşînin ser bûyer, şexs û alavên wê demê ku em der barê wan da dibin xwedî agahî. Çek û silahên ji hêla şerkerên wê demê hatine bikaranîn hêmaneke girîng e ku bi saya kilaman em cureyên çekan û teknolojiya wê demê hîn dibin. Di kilaman da siwar û wek alîkarên wan hesp jî bale dikşînin, ev jî hêmaneke din a girîng e. Em hin siwarên çeleng ên wê demê gelekî baş hesp ajotîne û pesnê wan hatine dayîn nas dikin. Hespên van kesan jî ji ber hin taybetmendiyên xwe li ser zar û zimanan belav bûne.

Herdu hêmanên din ên bûn mijara vê beşe jî malbat û eşîr û wek cezayekî tolhildanê sirgûn e. Bi saya kilaman em navê hin eşîr û malbatan hîn dibin, an jî wan

bi bîr tînin. Ev malbat hin caran bi zimanekî nerm û erênî tên behskirin, hin caran jî der barê wan da îfadeyên neyînî tên bikaranîn. Sirgûn jî wek qedera gelek şexs û civakan bûye perçeyek civaka Kurd ku em bi saya kilaman hin sirgûnan bi bîr tînin.

### **3.3.1. HIN ÇEK Ê ALAVÊN ŞER YÊN JI HÊLA LEHENGAN VA HATINE BIKARANÎN**

Li ser rûyê erdê her kes çiqas bibêje aşfî baş e, şer û pevçûn xirabî ye jî, mixabin her çar aliyê dinyayê her tîm şer çêbûne. Dema şer û pevçûn çêbûne jî mirovan li gor rewş û teknolojiya wê demê dijî hev çek û muhimat bi kar anîne. Ev çek û alavên şer ketine nav çand û dîroka civakan, li gor heyama hatine bikaranîn di bîra civakê da mane û gihîştine nişên nû. Di civaka Kurdan da jî gelek çek û alav di şer û pevçûnan da hatine bikaranîn, bi rêya çand û dîroka devkî ew di hişê civakê da mane.

Çek û alavên şer di çanda Kurdan da bi tena serê xwe cihekî taybet digirin ku gotineke pêşiyar ya dibêje “Çeka xwe li her derê dernexe, dema te derxist biemilîne” (Öncü, 2009: 108) jî balê dikşîne ser çekan û rewşa bikaranînê. Li vir şîret û pêşniyarek ji însanan ra heye ku divê wisa zûbizû şer û pevçûn neyên kirin û aşfî serdest be, lê heke çêbû jî hişyariyek tê dayîn ku divê mecburî çek bê bikaranîn. Mijara çek û cebilxaneyan di çanda devkî da mijareke balkêş e û gelek caran behsa wê tê kirin. Di nav kilaman da jî navê gelek çek û alavên şer derbas dibin ku ew der barê teknolojiya eskerî ya li herêma, aboriya wê demê ya dewletan û eşîran, marqeyên çek û cebilxaneyan, têkiliya bikaranîna çek û mêranyê, cureyên şer û pevçûnê û hwd da agahiyên gelek berfireh didin me.

Kesên diçin şer hespan siwar dibin, çekên marqeyên wan wê demê navdar in bi kar tînin, cil û bergên ku bikaribin fişeng û guleyên xwe, xençer û şûrên xwe tê da bi cih bikin li xwe dikin, kûm û kolozan didin serê xwe, barûd û alavên din li cem xwe dibin qada şer. Mela Mehmûdê Bazîdî der barê Kurdan da dibêje ew her tim ji bo şer amade ne û her siwarekî cengê pênc agirî dixebitîne û tevdîra ji bo şer jî wiha tîne ziman:

Cotek tepançe di qebûrê da û cotek tepançe li ber piştan û qerebîne û rim û şûr û sê zergan jî li ber tenga hespê da dikin. Xulase siwarekî deh derp heyin. Wisa siwarê mahir heyin ku agir ji agirê nabire, qewî çapik siwar dibin... Ê çek û silahêd wan tijî û tîzkirî ye, lewrane wekû îqtida bikitin ew Ekrad filhal li ser piştê hespê lazim in. Daîm ew hespêd xuyî zînan ce didin û qenc xuyî dikin (Celalî, 2016: 190).

Çawa ku Bazîdî jî balê dikşîne ser şervaniya Kurdan, amadehiya wan a şer, siwarî, çek û alavên wan ên di şer da tên bikaranîn, her wisa di gelek kilamên dengbêjan da jî em van agahiyan dikarin di nav risteyên kilaman da bibînin. Di kilamên Dengbêj Şakiro da jî ev mijar tena serê xwe dikare bibe mijareke berfireh ku xebat li ser bê kirin, lê em ê bi kurtasî behsa vê mijarê bikin. Mînak di kilama Şakiro ya bi navê “Asyayê” da dema Ferzende Beg li hemberî Îraniyan şer dike behsa rewşa xwe ya nebaş a ji ber şer tengezar bûye dike navê hin çek û melzemeyên şer wiha bi kar tîne:

“Ecem e beşîncî mezheb e dîn û duşman e  
**gule barûdê** bi ser serê me da dibarîni fenanî taviyê

...

Ecem e beşîncî mezheb e, bê dîn û bê îman e

li ser serê me hurmîne **topan** e, girregirrê **tomatîkan** û **makînilyan** e”

(Güneş-Şahin, 2018: 61)

Di kilamê da Îraniyên wek Ecem û xwedî mezhebekî cuda (mezheba pêncemîn) hatine teswîrkirin “gule” û “barûd”ê mîna taviyê li ser Ferzende Beg û rêhevalên wî da dibarînin. Ji ber ku ewqas zêde gule û barûdê dibarînin ku li vir ji bo wê şibandinek heye ku ew jî peyva taviyê ye. Wek ku tê zanîn tavî baraneke gur e, ji nişkê va dest pê dike, wisa xurt dibare ku der û dorê şil dike û paşê jî ji nişkê va disekine. Di şerê Ferzende Beg û Îraniyan da jî wisa bûye, şer ji nişkê va dest pê kiriye, gelekî xurt dewam kiriye û ji nişkê va sekiniye ku ev îfadeya taviyê wê rewşê gelekî baş refere dike. Di berdewamiya kilamê da navê çekên wek “top”, “tomatîk”, “kuçik çapilî”, “makînelî” û “sûstematîk” tên bikaranîn û tê gotin ku Îranî ji wan ra qet emanê nadin ku ew bi ser xwe va bînin. Li hemberî vê gulebaran û çekên hatine bikaranîn ji Kurdan gelek kes di wê pevçûnê da tên kuştin û birîndar dibin.

Di gelek kilamên din ên Dengbêj Şakiro da jî der barê çek, sîleh, cebilxane, cil û bergên di şer da tên lixwekirin da agahî tên dayîn ku mîna keke dîn jî ji kilama “Elîfê-Emînê-Ûskan” e. Dema Elîfê bangî xwişka xwe Emîneyê dike wê xewnek dîtiye ku şer û pevçûn çêbûye û cinazeyê birayê wan Ûskan li holê tune wiha dibêje:

“...minê şev

a îşev xewnekî dîtibû di xewê da

dilê mi porkura Xwedê çuqa jê ditirsiya

mi dî eşîra Mala Dîbo, Mala Faro, Mala Quto

li çemê Badîşo, Derbendî Wêran, newala Hopê

bi devê **sûsteman** û **çapiliya** li hevdu dialiya” (Güneş-Şahin, 2018: 482)

Wek ku tê dîtin di vê kilamê da jî behsa “sûste” û “çapilî”yan tê kirin ku em têdigihêjin ev çek wê demê berbelav in, di şer û pevçûnan da gelekî tînan bikaranîn. Çapilî ji zimanê tirkî hatiye ku mezinahî û şiklê çek (çapa wê) îfade dike. Ev çek çekên lûledirêj in û dikarin guleyan li dû hev bavêjin. Sûste jî di zimanê tirkî da wek “susta” tê bikaranîn û li vir bi navê xwe yê tirkî hatiye bikaranîn. Sûstem cureyek tivingê ya wê demê ye ku pênc fişekan diavêje (Kevirbirî, 2009: 34) û di şer da ji bo êrîş û kuştinê hatiye bikaranîn.

Berê dema şer û pevçûn çêdibûn li gor teknolojiyê û rewşa wê demê şûr, rim, mertal û xençer dihatin bikaranîn. Ev alavên şer nîşan didin ku însan wê demê dihatin li hemberî hev, yanê mesafeyeke nêzîk di navbera wan da çêdibû û bi van va êrîşî hevdu dikirin. Lê çawa ku mirovahî bi gelek aliyan va pêşva çû di çekirin û bikaranîna çek û silahan da jî pêşvaçûyinek çêbû û alavên şer jî guherîn. Şûna van alavên ji mesafeyeke nêzîk tînan bikaranîn îja çekên bi gule û barûdan va tînan bikaranîn derketin holê. Ev çekên lûledirêj yê dikarin ji dûr va bînan bikaranîn demekê di şer û pevçûnan da derketin pêş.

Li gor pêşvaçûna teknolojiyê demançe û tiving êdî di şer û pevçûnan da hatin bikaranîn ku di gelek berhemên çanda devkî da navê wan derbas dibin. Di kilameke din a Dengbêj Şakiro ya bi navê “Rizgo” da jî dîsa navê çekekê yanê tivingê tê pêşberî me. Di kilamê da bi zimanekî edebî behsa “tiving”ê tê kirin û şibandineke balkêş xwe nîşan dide. Dema behsa tivinga di destê Rizgo da tê kirin dengbêj tivingê dişîbine purta teyrê tawûs. Pesnê çeka di destê wî da bi hunereke edebî tê dayîn ku rêzikên kilamê wiha ne:

“**Tivinga** destê Rizgo fenanî pûrta teyrê Tawûs e  
Desta da ditaîse” (Yıldız-Taşkın, 2018: 269).

Wek kilama “Asyayê” ya li jorê me behs kiribû di kilama “Siwar” da jî dema behsa xurtbûna şer tê kirin û tê xwestin ku bê zanîn ka rewşa Hesên Axa çiqas xirab e. Li vir jî dîsa navê guleyan derbas dibe û îfadeya “gule mîna tavika teyrokê dibarin”. Ji vê gotina tavî û teyrokê em têdigihêjin ku gelek gule wek baraneke xurt li dû hev hatine berdan û tesîra wan li ser şervanan çêbûye. Şakiro van risteyan wiha dibêje:

“Ji êvar da tu sêr bike şerê herdu lawê Gozelê

**Gule** berîne ser serê Hesên Axa da peya dike fenanî tavika vê teyrokê” (Yıldız-Taşkın, 2018: 301).



Di kilama “Tahir Xan” angò “Şerê Tarxan” da jî rêzikek heye ku tê da behsa navê “Beşlî”yê tê kirin. Şakiro dibêje; “Bêxwediya **bêşliyê** ji êvar da destê kekê mi da zarezar e” (Yıldız-Taşkın, 2018: 306). Ev rêzika kilamê bi me dide zanîn ku çekeke bi navê “beşlî” hatiye bikaranîn û ev jî bi zimanê tirkî ye. Ji ber peyva “beş”ê qasî ku tê fêmkirin pênc gule dikevin hundirê vê sîlehê, angò pêncxur e, ji ber vê ew wek beşlî yanî bi pênc va hatiye binavkirin. Di versiyoneke din a heman kilamê da jî dîsa behsa bêşliyê tê kirin, lê şûna peyva “zarezarê” Şakiro peyva telamê bi kar tîne û wiha dibêje: “Bêxwediya **bêşliyê** di destê kekê te da telam daye” (Güneş-Şahin, 2018: 76).

Di kilama “Ez Reben im” ya ku wê paşê bi hûrgilî behsa wê bê kirin da jî du jinên bi navê “Hedo” û “Têlo” ji bo Tewfîqê tê kuştin dilê xwe dişewitînin, behsa bêçarebûna wî ya di şer da dikin. Di çend rêzîkên kilamê da behsa top, tiving û çekan tê kirin û dibêjin “dengê **topan** û **tivinga** li ser serê egîtê mala bavê min gulîbirê tere tê dizivirî vedigire”. Dema Hedò bangî Têlo dike ku Tewfîq di nav eşîra Xiya da hatiye dorpêçkirin, li aliyekî eşîr, li aliyê din jî dewlet dixwaze wî bikuje, rê li ber wî hatiye girtin îfadeyeke wiha tîne ziman:

“Sêr bike gelo vê sibengê eşîr nemane malxirabo di eşîra da mêr nemane

Keskî xwedanxêr tune bi **orta çapiliyê** xwe bigre

Li meydanê ji peyayê mala bavê mi ra bibi balgîf û berpal e” (Güneş-Şahin, 2018: 103)

Şakiro dema vê kilamê dibêje bi ton û awazeke xemgîn bi kar tîne. Gilî û gazinên Hedò û Têloyê yên ji bo Tewfîq dikin bi guhdaran dide zanîn, dişewatiya wan a ji bo Tewfîq û şerê ku qewimiye jî baş dide hisandin. Li vir behsa çekeke bi navê “orta çapli” tê kirin ku ev jî dîsa bi tirkî ye. Em pê dihesin ku li wê demê top û tivingên curbicur di şer û pevçûnan da tînan bikaranîn ku “çapilî” jî wek çekeke lûledirêj bi navê xwe yê tirkî hatiye bikaranîn. Navê hin çek, kinc û melzemeyên şer jî di kilama bi navê “Sidîqê Delal” da derbas dibin. Şakiro hem behsa siwaran, cil û bergên ku li xwe kirine û hem jî behsa xençer, rext û tivingên wan dike ku rêzîkên kilamê wiha ne:

“Lê dayê wayê...

hewû rebenê sibe ye şereka li me çêbû qaleka li me qewimî

li kîrê Milazgirê li Xilûkê weyla li mi nemayê dilê mi bi deman e

birek **siwar** û peyayê Mala Mîrza Begê ji malê siwar bûne **rextê esilî** li

hev dane

**tivingê** xwe hilanîn, bûne qaçax û firarê serê çîyan e

bi **şal** û **şapikê Madanî**, bi **ebayê Hezroyî**, bi **têlikê tiftikê Silêmanî**

destê xwe dane ser qebzê **xençerane** (Güneş-Şahin, 2018: 52)

Wextê ev rêzîkên kilamê tên guhdarîkirin hin şervanên cil û bergên kurdî yên wek “şal û şapikê Madanî”, “ebayê Hezroyî” û “têlikê tiftikê Silêmanî” li xwe kirine li ber çavê meriv zindî dibin. Wan tiving û xençerên xwe hildane, li hespên xwe siwar bûne û ji bo şer xwe amade kirine. Jixwe tê gotin ku siwar û peyayên Mala Mîrza Begê yên ji şer ra amade ne bûne qaçax û firarên serê çiyayan û ew ê şer bikin. Li gor kilamên din li vir behsa xençeran jî hatiye kirin. Me li ser kilamên ku dikevin nav sînorên vê xebatê dema lêkolîn kir li gor alavên şer yên din xençer zêde derneket pêşberî me. Li gor demançe, tiving û çekên curbicur xençer kêman caran di kilaman da hatiye bikaranîn ku ev kilam jî mînakek bû me li vir nîşan da.

Tê zanîn ku demên berê xençerên Kurdan gelekî navdar bûn, ew her tim li ber piştê mêran amade bûn, lê êdî wek demançe û tivingan zêde nayên bikaranîn. Serdema ku xençer lê dihat bikaranîn êdî li dû me maye û cihê xwe ji teknolojiyê şer a nû û gelekî pêşvaçûyî ra hiştiye. Lê ev nayê wê meneyê ku êdî tevahî dev ji xençeran hatiye berdan, lewra çî di berhemên folklorîk da, çî jî di wêne û gravurên wê demê hatine xêzkirin da tê dîtin ku mêrên Kurd xwedî xençerên curbicur in. Kalanê şûr û xençerên wan li ber piştê wan e û ew simbêlên xwe yên boq, cil û bergên xwe yên kurdî di wêneyan da bi heybet xuya dikin. Di vê keliyê da nivîseke Celadet Alî Bedirxan (1932: 1-2) ya der barê xençera xwe da nivîsiye ku balkêş e divê bê behskirin. Ji ber ku ew êdî xençerê xwe bi kar nayne xençerê wî gilî û gazinan ji wî dike û wiha dibêje:

“...Heke ji min ne bawer î li dora xwe fedikire, tu wê bibînî ko herçî ji min dûr mane, hatine ketine bajaran zimanê xwe winda kirine û îro nedizanan bêjin “lo” ne jî “lê”! Ji ber ko peyayên bêçek wek mirovên bê neynok in, keç jî bi wan dikarin. Ji lewra ezbenî qedrê min bizane, xwe ji min dûr mekeve, min ji xwe dûr mexe û bi min ne qelema xwe lê parsûwên dijminên xwe jêke!...”

Bi vê nivîsa Bedirxan jî tê dîtin ku xençer sembola mêranî, şerkarî, wêrekî û şervaniyê ye û li gor şert û mercên wê demê jî alaveke gelek bi qîmet e. Ji ber vê ye ku xençer gazindê xwe dike û dibêje bila dev ji wî neyê berdan, heke dev jê berdan, ew êdî neyê bikaranîn û kesek bêçek bimîne tu ferqa wî û yên bêneynok namîne. Ji ber vê ew bêhêz dimîne û ji hêla fizîkî va keç jî dikarin êdî wî tîk bibin û ew şermezar bibe.

Di kilama “Îbo Begê Parsînî” ya ku behsa bûyereke gelekî biêş dike da jî navê “çekê rismê”, “gule” “barûd”, “fîşek”, “fîşelix”, “çapilî” û “leganê” derbas dibin û em

têdigihêjin ku legan cureyek demançeyê ye (Güneş-Şahin, 2018: 69). Îbo Beg ji bo kuştina Xaçikê Ermenî û qaymeqamê qumandarê wî legan (cureyek demançe), fişeng, gule û barûd bi kar aniye. Li gor kilamê Xaçikê serxoş û qaymeqamê qumandarê wî tîn mala Îbo Beg çav berdidin jina wî Fadîme Xanim, bûka wî Eyšan Xanim û qîza wî Necîbe Xanimê. Li ser vê tevgera wan a xirab Îbo Beg hem wan, hem jin, bûk, qîz û xizmetkarên malê û hem jî xwe dikuje ku nav û namûsa wî neyê herimandin û ew nekevin bin destan. Li vir jî gule, barûd, fişeng, demançe û tivingên cuda hatine bikaranîn ku ev rêzikên behsa çek û cebilxaneyê Îbo Beg dike bi devê Şakiro wiha tîn bilêvkin:

“...tu sêr bike dema ku **çekê rismê** ji bavê xwe ra tîne  
 Xwedê xira bike çekê rismê bi sûyê xwe da datîne  
**leganê** ji qilif dertîne  
 di ber sapokê da diçikîne  
 xwe bi wî yalê dîwanê ra digihîne  
 nihêrî Xaçikê serxoş e, qaymeqamê kimandanê wî kesekî hay ji xwe nîne  
**leganê** ji ber sapokê dikişîne  
 berî qapaxa serê **Xaçik** tê da qapaxa serê wî hiltîne  
 mejiyê wî **marusê** bi remaqê dîwanê va dimîne  
 koka qaymeqama kimandara li wan tîne

.....

tu sêr bike vê sibengê li Necîbe Xanimê kir qêrîne  
 go dayka bavê xwe yê bike wa bilezîne  
**gule** û **barûdê**, **fişek** û **fişelixê** ji bavê xwe ra bîne  
 lawo va îro roja xêrê nîne  
 bavê te gelo bira kesek tu qisûrê li bedena bavê te nebîne  
 nebêje Îbo Begê berxê Mala Hacı Qero bêîman e bêdîn e  
 lawo dema ku vê sibengê li remaqê jorîn dibîne  
**devê çapiliyê** li ser van marusan digêrîne  
 koka xulam û xizmetkara, esker û vê sibengê xas saldata li van marusa

tîne

**gule barûdê** Îbo Begê xilas bûne  
 sê **fişegê** wî dimîne  
 xwe bi yalê heremê ra digihîne  
 tu sêr bike derî bi ser çolix û çocixê xwe da kilît dike  
 zirza qetlê lê dixîne

vê sibengê koka çolix û çocixê xwe tîne (Güneş-Şahin, 2018: 69-70)

Kilama Şerê Selanîkê ya ku li hemberî Yûnan, Bulxar û nijadên din ên biyanî behsa têkçûyina artêşa Osmanîyan dike jî ji bo vê mijarê mîna keke baş e. Li vir jî Şakiro der barê şerê hatiye kirin da agahîyan dide me ku em hay ji vî şerê girîng yê dîrokî hebin. Li gor kilamên din di vê kilamê da navê gelek çek, demançe, gule û barûdan derbas nabe, lê wek çek “singû” heye. Di kilamê da zêdetir behsa nijadên din, rewşa şer, esker, welat û bajêran tê kirin. Sungî wek ku tê zanîn alaveke şer û pevçûnê ye ku ne wek demançe û tivingê ye. Darekî dirêj e ku ser wî hesinekî tûj heye û di mesafeyê kin da ji bo kesê li hember tê bikaranîn. Ji ber ku ji nêzîk va tê bikaranîn û hesinê serî tûj e, dema pê êrîş bê kirin çerm jêdike û diqelêşe. Hevokên kilamê wiha ne:

“keko Selanîk, Çetelcê, Edirne, Îsqudred, Îskod  
ji xwe ra mabû li mehserê ye  
bavo emelyan e  
xwedyê emelya ne bav e, ne bira ne  
ne kes e, ne xwedî ye, ne guman e  
şer û şerê bi **sungîya** ne (Güneş-Şahin, 2018: 78-79)

Der barê vê kilamê da bi hûrgilî agahî wê paşê bê dayîn, lê ji ber ku mijar li ser çek û cebilxaneyan e dibe bê gotin ku di vî şerî da eskerên Yûnan, Bulxar û nijadên din xwedî çek û cebilxaneyên baş in, ji hêla eskerî va hatine perwerdekirin û ji ber vê jî dikarin gelekî baş şer bikin. Lê berevajî wan eskerên Osmanîyan (Kurd jî di nav da çûne şer) li gor wan ne bi tevdîr in, lewra çek û alavên şer zêde tunene, cil û bergên wan li gor demsalê kêr û kevî in, xwarin û xuregên wan jî têra xwe tune û her çiqas wêrek û şervan bin jî di vî şerî da têk diçin. Li vir peyva “emelî” jî peyveke balkêş e ku li gor agahiyên Dengbêj Sebriyê Agirî dide ew tê wateya eskerê bê rûtbe yanê eskerê piyade, versiyona cuda ya vê peyvê “ermelî” jî heye ku ew jî tê wateya “arma” ya tirkî ya ku rûtbeya eskeran nîşan dide û ew li ser cil û bergên eskeriyê va tê daliqandin. (Sebriyê Agirî, Pêwendîya tîlefônî, 6ê hezîrana 2022yan).

Wek ku tê zanîn di şer û pevçûnan da zêdetir eskerên bêrûtbe tînan bikaranîn, ji ber vê jî ew li gor yê birûtbe zêde tînan kuştin û nikarin wek eskerên payebilind xwe ji şer bidin aliyekî. Li vir jî dengbêj gunehê xwe li wan tînan ku ev eskerên emelyan yê bê bav, bê bira, bê kes û bê pişt ji herdu aliyên jî dijî hev şer dikin û tu gumana wan tune ku ew ji şer xelas bibin.

Mijar singû be dibe bê gotin li gor çek û alavên din navê singûyê di bîra civakî ya Kurdan da zêdetir cih digire. Mînak dema behsa Komkujiya Geliyê Zîlan û Terteleya Dêrsimê tê kirin her yek Kurdek dizane ku gelek însan ji bo ku gule û barûd zêde neyên xerckirin bi singûyan hatine kuştin, heta wisa ku zikê jinên ducanî jî bi singûyan hatine qelaştin ku dergûşên wan jî sax nemînin. Şahidekî Komkujiya Geliyê Zîlan Tahir Nasê wê demê zarokê 10-12 salî bûye birîndarî ji komkujiyê xelas bûye jî vê rastiyê tîne ziman ku di komkujiyê da sungî hatine bikaranîn (Gültekin, 2020: 15, 33, 34). Singûya bûye mijara kuştina Kurdan di kilama “Kerêmê Elî” da jî tê bikaranîn. Di çend risteyên kilamê da behsa êşa Geliyê Zîlan û kesên bi singûyan hatine kuştin wiha tê kirin:

“...herçî kesekê ku navê wî musulman be  
 Dîn û îman ji bonê hebe  
 Heyanî dunya xweş ava be ewê rûnê malxirabo  
 Ji bîr nakî kesîreta Geliyê Zîlan  
 Dayê rebenê çolix û çocicê serê van **singûya**... (Güneş-Şahin, 2018: 93)

Ji ber ku komkujiya Geliyê Zîlan di bîra civakê da xwedî cihekî girîng e, dengbêj jî dixwaze vê hişmendiyê qaîm bike, dibêje kesê ji xwe ra bibêje ew misilman e divê vê kesîretê û zarokên bi singûyan hatine kuştin ji bîr neke. Ji bo vê komkujiyê helbet ne şert e ku kesek misilman be û ji ber misilmantiya xwe û wek kesekî bawermend van bûyerên nebaş ji bîr bike yan jî bi bîr bîne. Her kesê ku xwedî wicdan û edaletê ye divê ji bîr neke, lê dengbêj ji ber civaka misilman (Tirk û Kurd bi hev ra dijîn) bi referanseke dînî li ser mijarê sekiniye û bal kişandiye vê bûyerê.

Di kilama bi navê “Hemedê Elî Begê Kekê Zahido Siwarê Tîran” da jî behsa çekê hatiye kirin ku ew jî “modolî” ye. Di kilamê da Hemedê Elî Begê hespê xwe “Tîran” yê ku boz e û çar salî ye siwar dibe ku pesnê hespê wî xweş hatiye dayîn û paşê tê gotin ew modoliyê davêje milê xwe û diçe. Dengbêj Şakiro van rêzikên kilamê wiha digihîne kerika guhê guhdaran:

“Hemedê Elî Begê Kekê Zahido Siwarê Tîran ji malê siwar bû  
 Vê sibengê li bozî çar salî dêl bihine delûdîni wa di bin da  
 Sêr bike bêxwadiya **modoliyê** ji kêfê ra avêtî alîkî mil da” (Yıldız-Taşkın, 2018: 302).

Behsa modoliyê di kilama “Nemînim Ji Axê ra-Bavê Cemîl” ya ku behsa kuştina Bişarê Çeto dike da jî tê kirin ku wiha ye;

“...Anê lê mehrûmê sibe bû vê sibengê tu sêr biki  
 ji derdê dilê min û te ra siwara ji xwe ra siwar dileqandin  
 Mala Dîbo dizgînê manegiya li destê xwe alandin  
 Mala Sîno fişeng û fişelixê xwe li navê xwe şidandin  
 Mala Remê kozik û mederisê xwe bi serê xwe da welgerandin  
 Mala Faro **qayîşê modoliya** zendê xwe lefandin...” (Güneş-Şahin,  
 2018: 457)

Navê modoliyê li gor cureyên din kêr hatiye bikaranîn, ji bilî van her du kilaman em di kilamên din da rast nehatin, lê dibe ku di kilamên dervayî sînorên vê xebatê da navê modoliyê hatibe bikaranîn. Kilameke din ya ku tê da navê çend marqe çekan bi hev ra derbas dibin yek jî kilama “Bavê Abdulah” e. Di kilamê da behsa demançe, Alaman û şeşagirê tê kirin:

“Sube bû vê subengê mi ji te ra go ji mal siwar nebe  
 bêxwediya **Alamanê**  
 Navêje vê subengê nava pê xwe da gelo şirikê saralixê  
 Danexe ser qebzê **demaça û şeşagira...**” (Yıldız-Taşkın, 2018: 369).

Ji navê “Alaman”ê jî xuya dike ku ev çek ji hêla Almanan va hatiye çêkirin, lûledirêj e û paşê li welatên din belav bûye û ji ber vê bi wî navê tê binavkirin. “Demançe” li gor tivingan çekeke biçûk e, gelek cureyên wê hene û tenê çend gule dikarin bikevin hundirê wê. Ji ber ku wek tivingê dirêj û mezin nîne meriv dikare bi hêsanî li piştê veşêre. Çeka bi navê “şeşagir” jî wek ku bê fêmkirin çekeke wisa ye ku şeş gule dikevin hundirê wê û meriv dikare li dû hev jî biteqîne. Ji ber ku wê demê ev teknoloji heye û di nav sînorên welêt da ew tîk bikaranîn, di kilaman da jî behsa wan hatiye kirin.

Kilama “Mamed Axa û Bekir Beg” jî kilameke Şakiro ya balkêş e. Ji ber ku ziman li ser namûsê (jin li vir wek namûs tê hesibandin) hatiye dirêjkirin û hatiye gotin ku “jina xwe ji min ra bişîne” Mamed Axa û Bekir Beg pev diçin û yek ji wan tê kuştin. Heke li cihekî kesek hatibe kuştin teqez çek û alavek hatiye bikaranîn ku li vir jî her wisa bûye. Di kilamê da hevokek heye ku Bekir Beg ji Mamed Axa ra ji bo şer meydanê dixwîne û ji bo ew bîr pêşberî hev wiha dibêje:

“...go lawo eger tu mêrkî çê yî  
 Were em bikevin ber **almecê tivinga**

Yek ji me yekî bikuje, bira jina me yekî ji yekî ra bî bimîne...”(Güneş-Şahin, 2018: 469)

Piştî van çend mînakên wek ku tê dîtin di kilamên Dengbêj Şakiro da navê gule, barûd, fişeng, singû, xençer, tiving, demançe û cureyên van gelekî derbas dibin. Lewra ev kilam gelemperî li ser şer, pevçûn û serhildanan hatine gotin û perçeyekî dîrokê ne. Ev çek û alav di şer û pevçûnên dijî hêzên Osmanîyan, Komara Tirkîyeyê, Îran, Êrîs, Yûnan, Bulxar û hwd hatine bikaranîn. Ji bilî vê, du yan jî zêdetir eşîr û malbat ji ber sedemên cuda pev çûne, ji hevdu mêr qir kirine ku navê van çek û alavan di kilamên li ser wan hatine gotin da jî derbas dibin. Bi kurtasî bi saya van kilaman dengbêjan di bîra civakê da him bûyerên dîrokî zindî hiştine û him jî bi behskirina siwar, hesp, çek û alavên şer va der barê teknolojiya şer a wê demê da agahiyên berfireh dane civakê.

### **3.3.2. SIWAR Û ALÎKARÊN WAN: HESP**

Ji destpêka mirovahiyê vir va di navbera însanan û heywanan da her tim têkiliyeke taybet hebûye ku ew hê jî dewam dike. Însanan heywanên kûvî kedî kirine, xwarin û vexwarina xwe (goşt, rûn, şîr) ji wan peyda kirine. Ji bilî vê ji bo barkêşiyê ew bi kar anîne û ji bo cil û bergan çêbikin jî ji pûrt û hiriya wan îstifade kirine. Bi hin heywanan ra jî hevaltî û dostaniyeke bêhempa ava kirine ku ev têkilî meriv metel dihêle. Di civaka Kurdan da çandinî û heywandarî gelekî berbelav e û ji heywanan hesp, pez, dewar, ker û mirîşkan cihekî girîng girtine û şopa xwe li ser jiyana wan hiştine. Heta wisa ku gelek caran ji bo heywanekê meriv hatine kuştin û di navbera malbatan da dijminatîyan dest pê kiriye.

Gelemperî heywan baş hatine xwedîkirin, eziyet li wan nehatiye kirin û ji bo wan nav û nûçik hatine hilbijartin ku ji van heywanan yek jî hesp e. Di gelek çand û civakan da însanan girîngî dane hespan, ew hez kirine û bi wan ra wek hevaleyî tevgeriyane. Heta wisa ku di nav salnameyên xwe da navê heywanan û bi taybetî ya hespan bi kar anîne. Mînak di civaka Çîniyan da dema salname bi navê heywanan tê binavkirin sala hespê jî tê bikaranîn. Li gor vê salnameyê kesên di sala hespê da hatine dinyayê kesên şên, bicoş, aktif û bê sebir in, derûniya wan zû diguhere û dikarin zû hêrs bibin. Wek ku tê dîtin taybetmendiyên van heywanan û kesayetîya însanên di vê salê da hatine dinyayê bi hev ra hatine têkildarkirin, ev yeka jî girîngiya hespan ya di jiyana însanan da nîşan dide.

Erdnîgariya Kurd lê dijîn jî ji hela ax, çiya, deşt û zozanan va ji bo xwedîkirina hespan cihekî dewlemend e. Li vê axa ku çanda şivantî, koçerî û rêncberî berbelav e hespên curbicur hatine xwedîkirin û ew di gelek kar û baran da hatine bikaranîn. Ji bilî barkişandin û koçê ew di nêçîr, bazirganî, şer û pevçûnan da jî hatine emilandin. Ji ber ku hesp evqas bi qîmet bûne jiyan li ser piştta wan meşiyaye, ew bi hestên tenik va hatine parastin, xwedî li wan hatiye derketine. Wisa ku ev hespên curbicur ji bo Kurdan bûne nav û nîşan, gelek axa, beg û lehengên dîrokî wek “siwarê filan hespê” bi nav û deng bûne û bi navê hespên xwe di hişê civakê da cih girtine.

Hesp ji ber ku heywanên nêzîkî siwarên xwe ne bi çavê heywanekê nehatine nirxandin, ji bilî bikaranîna wan qîmeteke mezin jî dîtine. Di destan, kilam û çîrokên kurdî da gelek caran ew bûne simbol û motîf, her tim behsa hevaltî û dostaniya wan jî hatiye kirin. Ji ber vê ye ku dema hespan baz daye (hişk bûne) siwarên wan û civakê şîna wan girtiye. Îro çawa ku teknolojî bi makine, robot, komputer, internet û alavên din pêşva çûbe, berê jî hesp gelekî girîng bûn, hem ji bo bar, hem ji bo şer û hem jî ji bo çandiniyê xizmeta Kurdan dikirin. Ew di dawet û şînan da jî hatine bikaranîn (Memê, 2013: 1). Di dawetan da hatine xemilandin, morî û mircan bi wan va hatine daliqandin, bûk lê hatine siwarkirin, heta carinan ew wek diyarî bi zava, beg, axa û şêxan ra hatine şandin. Di şînan da jî heke siwarê hespê mirîbe cil û tiştêkî reş ji bo reşgirêdana wî kesî li ser hespê hatiye daliqandin, hesp hêdî hêdî li dû cinazê siwarê xwe hatiye ajotin. Ji ber vê ye ku ji bo hespên cîsnê wan baş in yê dikarin li ber serma û germê li ber xwe bidin bêne bidestxistin însanan gelekî hewl daye.

Kurdan çawa ku nav bi dewar, kûçik, pez, mirîşk û heywanên din kirine, her wisa navên cuda dane hespên xwe jî. Di zargotina Kurdan da der barê hespan da gelek agahî hene<sup>19</sup> ku ev di destan, çîrok, kilam, helbest û gotinên pêşiyên da xwe didin der. Bo mînak çend gotinên pêşiyên ên tê da hesp derbas dibin ev in;

“Hesp bi xwarinê, keç bi xwestinê xuya ne  
Hesp bimeşe, siwar xwe dipesinîne  
Hesp dimire, bender ji keran re dimîne  
Hesp ji siwaran re, ker ji baran re Xwedê daye  
Hesp ji xelkê, rim ji darê gerzê, ew şer naçe serî

<sup>19</sup> Yê dixwazin di zargotina kurdî da mijara hespan vekolin û zêdetir agahiyan bi dest xî dikarin maqaleya Şemoyê Memê bixwînin bnr.

[https://www.academia.edu/38468141/DI\\_ZARGOTINA\\_KURD%C3%8E\\_DE\\_HESP](https://www.academia.edu/38468141/DI_ZARGOTINA_KURD%C3%8E_DE_HESP)



Hesp li gorî siwarê xwe nas dike  
 Hesp li ser afirê beranan nayê girêdan  
 Hesp li ser çar lîngan bi rê ve diçe, lê dîsa jî lînge wî dişemite û dikeve  
 Hesp siwarê xwe nas dike  
 Hespa çê zengûyan (qamçîyan) nagihîne xwe  
 Hespê bin xwe nede bav û birayê xwe  
 Hespê qule, mêrê file, tajiya tûle, çil rojên çile pê nabe ewle” (Öncü, 209:

306-307-308)

Bi kurtasî hespan ji hêla eskerî, siyasî, çandî û civakî va tesîr li ser jiyana însanan kiriye û bûne hevalê wan. Ev heywanên bûne mijara zargotina kurdî di bîra civakî ya Kurdan da gelekî girîng in. Ji wan hinek wisa navdar bûne ku dema behsa siwarên wan tê kirin navê wan jî li rex navê siwar tînin bilêvkirin mînak; hespê Memê Alan Bozê Rewan e, hespê Siyabend Deybilqiran/Hespê Şê ye, hespê Ristemê Zal Rexşê Belek e, hespê Bavê Fexrî Gêjo ye, hespê Derwêşê Evdî Hedban e, hespê Ferzende Beg Eznawir e, hespê Hesenê Elî Begê Bûgulê Şamê ye, hespê Hisenê Dêmez Lûman e, hespê Teyar Axa Şervan e, hespê Cangir Axa Gawir Hirço ye, hespê Yadoyê Dimilî Nîgar e, hespê Cembeliyê Kurê Mîrê Hekariyan Xemrevîn e, hespê Kulîk Sosik e û hespê Hesê Dûdê jî Bilîcan (Bêcan) e.

Bi van nav û teswîran tê dîtîn ku di navbera siwar û hespê wî da tîkiliyeke xurt heye û wextê behsa navê lehengê tê kirin navê hespê wî jî li gel wî tê behskirin. Lewra siwarê hespê bi navê hespê tê nasîn û civak wan bi hev ra di bîra xwe da vedişêre. Hesp û siwar her tim bi hev ra ne, hesp siwarê xwe tenê nahêle, bi wî ra hevaltîyê dike, di qada şer da wek birûskê dibeze. Siwar jî hespê xwe baş xwedî dike, ceh û alif didê, tîmar dike, dişo, dema lê siwar dibê zêde nawestîne, pê ra diaxive û di navbera wan da hesteke hezkirinê jî her tim heye. Hesp û siwar bi hev ra dijîn, bi hev ra ji xetereyan xilas dibin, bi hev ra digihêjin miradê xwe an jî tîkê diçin. Hespên Kurdan her tim bi zîn û hazir in ku siwar kîngê bixwazin dikarin lê siwar bin, pê bigerin û herin şer. Di hin destanan da jî hesp dikarin bi axivin, bi per û bask in ku pê difirin, ji ber ku zêde aqil û xwedî feraset in siwarên xwe li hemberî xetereyan hişyar dikin û wan ji nav rewşên xirab xelas dikin û digihînin firîqetiyê. Piştî siwarê hespê dimire êdî kes curet nake ku hespa wî siwar be, qêmîşî bîranîna wî kesî û hespê wî nakin.

Charles Noel der barê Kurdan da dibêje ew hespan gelekî hez dikin û gotineke pêşiyane a Kurdan ya ji siwarên hespan ra wek şîretê gotinê jî ji bo vê yekê mînak nîşan dide: “Lê siwar be tatar be, jê peya be mehtar be” yanê dema siwar bî hespê xwe

serberdayî nehêle, lê dema tu jê pêya dibî jî bibe koleyê hespê xwe û qedrê wî bigire (2014: 136). Di nav kilamên dengbêjan da gelek kilamên balê dikşînin ser siwaran hene ku Tuncer û Gülezsoy van kilaman wek cureya “siwaro” tesnîf dikin, dibêjin ev kilamên berxwedanê ne û bangî têkoşîna dikin (2019: 1131). Her çiqas hemû kilamên behsa siwaran dikin bang berxwedanê û tekoşîna nekin jî gelemperî wisa ne, lewra leheng dijî hêzekê (desthilatiya dewlet, axa, beg, malbat û hwd) hespên xwe diajon, wek ba û bahozê dibezin ku vê hêzê tîk bibin. Hin kilamên din ên behsa siwaran dikin jî dîsa pesnê siwar û hespên wan didin, ew hewl didin xwe bigihînin hezkiriyên xwe ku wan birevînin an bi wan ra bizewicin.

Wek motîf hesp di gelek kilam û çîrokên Kurdan da balê dikşînin ku di kilamên Dengbêj Şakiro da jî navê hin hespan li gel siwarên wan derdikevin pêş. Mînak; Kûvî, Felek, Alece, Eznawir, Gêjo, Gogerçîn, Erebe, Rîşal, Têcir, Seyro, Zebanî, Çîçek, Hirço, Xiyal, Şemlan, Tîkran, Wasîk, Gewrê bîna nîşandan (Güneş-Şahin, 2018: 54-55-59-61-74-75-76-80-96-100-101-105-106-470-479-498-499-504-511-512; Yıldız-Taşkin, 2018: 202-203). Di kilaman da behsa wan hatiye kirin û em dibînin ku ev hesp gelekî baş dibezin, jêhatî ne û terka siwarê xwe nakin. Piştî mirina siwarên van hespên ku navê wan hatine rêzkirin dema ji bo siwar zêmar tîna gotin û şîna wan tê girtin, navê van hespan jî tîna bilêvkirin. Mela Mehmûdê Bazîdî dibêje Kurd xwedî hespên çê ne û ji bo cureyên hespan jî dibêje çar cîns hespên Kurdan hene ku ew kihêl (ki'êl), hed, seglawî, mi'eng in, yêna necdî û erebe jî meqbûl in lê kêma in (Celalî, 2016: 189). Lê di nav civakê da behsa navên qule, kumêt û çale jî tîna kirin. Ji bo wesfên hespan jî dibêjin tîtal, navtajî, simkodî, dêlqamçî, guhkêvroşk, gerdenêlî, kapreş û hwd ku ji bo van teswîrkirinan kilameke Şakiro ya bi navê “Lo Qulingo” ya ku pesnê nêçîrvanên welatê Şîrvanê dide dikare mînak bê nîşandan:

“...Binî da seglavî ne

Navê wan e navtajî ne

Simê wan e simkodî ne

Dêlê wan e dêlqamçî ne

Gerdenê wan e zirav e êlî ne

Guhê wan e kêvroşkî ne

Hevraza dibezînin berjêra dixarînin...” (Yıldız-Taşkin, 2018: 263)

Qasî ku tê dîtin ji bo her yek aliyê hespan şibandinek heye ku hewl tê dayîn bê gotin ew heywanên çiqas çê û xwedî taybetmendiyên xweş in. Ji bo hespan wiha be ji bo siwarên wan çî tîna gotin dema em bala xwe didin, em dibînin ku ji bo wan jî sîfatên

wek siwarşeng, cengawer, siwarçeleng û hwd tên gotin. Di kilaman da dema pesnê şervanan tê dayîn carna behsa hespên wan, carna behsa çek, sîleh û xençerên wan tê kirin ku hesp, çek û xençer wê demê ji bo şer û mêraniyê alavên gelekî bi qîmet in. Carnan jî behsa kurê wan, bavê wan, xal û apê wan an jî eşîra wan tê kirin ku ew ji kijan êl, eşîr, malbatê ne bila bê zanîn. Ev jî ji bo nîşaneyê mêranî û hêza xurt gelekî girîng e. Di kilama Şakiro ya bi navê “Bavê Beced (Şêx Fexrî)” da navê hespên wî Kûvî û Felek wiha tên behskirin;

“...agirê kulê bikeve mala eşîra Badika giregirê di Xiya

Ewraqê Bavê Beced **Siwarê Kûvî** hildane

Gelo vê sibengê tu bala xwe bidê

Ji gavê din da li derê hukumata Sînan û Bismilê daîre bi daîre digeriya

...

Temiya mi li we be şîrheramî nankoriyê mekin

Terka cinazê Bavê Beced Şêxê Kubar mekin

**Siwarê Felek** hey wax li min vî xweşmêrî medin” (Güneş-Şahin, 2018:

54-55)

Dema em berê xwe didin kilama “Elî Beg” ya li ser neviyê Kor Huseyn Paşa hatiye gotin di vê kilamê da jî behsa hespekî tê kirin ku em ji peyva “siwarê Seyro” hîn dibin ku Seyro navê hespê wî ye û ew bi xwe jî siwarekî gelekî jêhatî bûye. Qismekî kilamê ya ku behsa Seyro tê kirin wiha ye:

“Digo delê lê Xezalê nemayê

Ezê li Diyarê Hozdemirê warê Mala Paşê diketim

Ji dilê min û te ra gelo vê subengê li hûrzeviya

Hele sêr bike vê subengê

Xwezila ji xweziyê di Xwedê ra mi bi çavê serê xwe bidîta

Bavê Elî Kekê Îsê **siwarê Seyro** ji kavila Qizqapanê siwar bibûya

Komê xulama li dû bûna bi sê ciya...” (Yildiz-Taşkin, 2018: 375)

Hesp gelek caran sembola azadiyê ne ku kesê lê siwar dibe wek birûskê dibeze û heke xetereyek, şerek an jî pevçûnek hebe dikare xwe jê xelas bike. Di kilama Şakiro ya navdar “Asyayê” da jî çend caran navê hespê Ferzende Beg “Eznawir” hatiye bilêvkirin, pesnê egîd û mêrxasiya wî bi rêya hespê wî hatiye dayîn. Besra Xanima jina wî xwestiye bi saya Eznawir û kurê wî Elfesya pesnê mêraniya Ferzende Begê Hesênî bide da ku ew di şer da têk neçe, were ser hemdê xwe û motîvasyonê wî ya şer

û pevçûnê ya li hemberî Eceman kê m nebe. Di navbera Besra Xanimê û Ferzende Beg da axaftineke wiha çêdibe:

“Ferzende mala te xira be  
te digo ez Ferzende me ez Ferzende me  
ez bavê Elfesiyê siwarê **Eznawir** im” (Güneş-Şahin, 2018: 61)

Bi van rêzikên kilamê em dibînin ku ew siwarê Eznewir e, hespê wî biqîmet û navdar e, ji hêla xweyiyê xwe va jî zêde tê hezkirin. Dema em berê xwe didin navê Eznewir (Aznavur) em dibînin ku ew peyveke Gurciyan e û tê meneya “mezin, qerase, bihêrs, sert, rûtirş û zalim” (Komisyon, 2011: 217-218). Li gor van agahiyan em têdigihêjin ku ew hespekî xurt û bi heybet e, çavê însanan ditirsîne û bi zanetî wek nav hatiye bijartin. Wek ku tê dîtin hespa wî wek semboleke alîkar ya ji bo mêranî, mêrxasî û lehengiya wî hatiye bikaranîn.

Dengbêj Şakiro dema kilama “Şerê Tarxan” dibêje em têdigihêjin ku navê hespa Tarxan “Gogerçîn” e. Di şerê dijî Şahê Ecem da dema ew têk diçe berê hespa wî didin Kela Makoyê û wê dikin yextirme. Çaxê ku şîna wî tê kirin qasî siwarê wî navê hespê jî tê bilêvkirin û xembariya yextirmekirina Gogerçîn tê behskirin. Zezo dema behsa apê xwe Tarxan dike wiha dibêje;

“Heyfa mi nayê bi kuştina kekê mi gulîbirê heyfa mi tê li wê heyfê  
Tu bala xwe bidê bi dizgîna **Gogerçîn** girtin  
Berê wê dane Kela Makûyê Sera Mexîna  
Îro ji êvar da kirin yextirme ye....” (Güneş-Şahin, 2018: 76-77)

Yextirme peyveke resen e ku têkiliya wê bi çanda şer ra heye. Dema şerek çêbibe xwediyê hespê bê kuştin an bê têkbirin hesp bêxwedî dimîne û yên bi ser ketine hespê wek xenîmet, xelat û destketiyeke şer ji xwe ra dibin. Li vir jî dizgîna “Gogerçînê” girtine û ew ji xwe ra wek xenîmet birine ku ev ji bo civakeke hesp evqas bi qîmet tê hesibandin da sedema êş û xemginiyeke mezin e. Lewra ew bê xwedî û bê siwar maye, têkiliya siwar û hespê qût bûye û ew ketiye ber destên hinekên din ku ev jî dilê dengbêj û Kurdan pir diêşîne.

Berê dema şer û pevçûn çêdibûn, kî xwedî gelek hespan bûya hêza wî jî ewqas xurt dibû, lewra hesp di van rewşên nebaş da dibûn alîkarê siwarên xwe. Ji ber ku ew sembola hereketê, hêzê, deyaxbûnê û azadiyê bûn li hemberî hespan hezkirin û rêz hebû. Dema em berê xwe didin kilameke din a Dengbêj Şakiro ya bi navê “Seîdo Berxê Min” ew jî behsa hespekî dike. Em dibînin ku ji bo hespê hin teswîr hatine kirin. Ev

kilam cureyekî zêmarê ye û em ji ristên kilamê têdigihêjin şîna Seîdê ku hatiye kuştin  
tê kirin û peyva “mi gulîbirê” tê bikaranîn;

“De lo lo lo lo...

hewî lo lo lo

hewû keser û kedera dilê mi gulîbirê Seîdê mi bexê mi ax

tu dilê dayka xwe da çiqas şîrîn î gidî ewqas tu axa yî

Eyşo, Fato, Gulê, Besê, Wesîla rebenê sibe bû

tu sêr bike vê sibengê mi sond xwarî

li pey Bavê Ehmedê xwe ra **sorboza** xwedî nakim xênî bozê sayî

sibe ye **hespê Bavê Ehmedê** mi sûka Diyarbekir digerlandin

**kumêtê kapreşî zînkirî** gidîno **tiftifandî dël hûnayî**” (Güneş-Şahin,

2018: 500)

Gelek jinên Kurd li piştî mirina bav, bira, kur û eqrebayên xwe yên mêr şînê digirin, dibêjin kesî miriye li ber dilê wan gelekî şîrîn û delal e û piştî mirina wan gelek tiştan êdî ji xwe ra heram dikin. Ew sond dixwin ku ew ê êdî xwe nexemilînin, cil û bergên rengîn li xwe nekin, neçin dawet û şahiyên û nezewicin ku li vir jî heman tişt tînin gotin. Ewîl tê gotin ku ew li ber dilê diya xwe pir şîrîn e û axa ye. Paşê behsa hespê Seîd (Bavê Ehmed) tê kirin ku ew wek “sorboz”, “kumêtê kapreşî”, “zînkirî” û “tiftifandî dël hûnayî” tê teswîrkirin. Heke mijar bi hûrgilî bê analîzkirin û kesên di vê mijarê da pîspor in dibe ku li gor cîsnê hespan, reng û boçikên wan, mezinbûn û biçûkbûna wan, cureya pûrta wan û gelek hûrgiliyên wek van der barê hespan da hê agahiyên berfirehtir binin ziman û civakê ji vê haydar bikin.

Di kilaman da çiqas pesnê hespan tê dayîn, her wisa pesnê siwaran jî berfirehî tê dayîn. Nikitin der barê Kurdan da dibêje hema bibêje hemû Kurd siwarên gelekî baş in, gerok çiqas pesnê mêrxasiya siwarên Kurdan bidin jî ev tîrê nake, kême (1994: 95). Dema em berê xwe didin kilama “Siwaro Ji Xweytê Hetanî Xweytê” peyva siwar him di serenava kilamê bi xwe da ye û him jî di nav rêzikan da derbas dibe. Helê ji Gulê ra dibêje siwarê mala bavê wê birîndar e, doxtor ketiye birînen wî bi kêr û gûzanan diqelişîne û guleyan ji hêta wî derdixe. Siwarê ku navê wî derbas dibe Silê ye û ew siwarê hespa “Gewrê” ye ku wiha tê behskirin:

“**Siwar** heyran sibe ye ji Xweytê hetanî wê ca ji Xweytê

De Helê rebenê Gulê gorîne

Sibe ye birek **siwarê mala bavê mi serkûrê siwar bûne**

Ji Îranê ji Tûranê ji cerdê ji cûrdê

Ji xwe ra dajo li terqa rê tê

**Siwarekî li kumetî kapreşî siwar e**

Qapûtekî reşî li milan e

Tu bala xwe bidê bi tenê dajo li pêşiyê tê

**De siwaro de siwaro de siwaro...**” (Güneş-Şahin, 2018: 511)

Di kilama bi navê “Dêran-Kejik”ê da dema wek siwar pesnê Fetula, Esed û Riza her sê kurên Xêlidê ji malbata Emerî tê dayîn, tê gotin ew ji Milazgira navçeya Mûşê rê dikevin ku herin gundê Kejikê ya li ser Qereyaziya navçeya Erziromê ku bi mala Şewaşiyana ra şer bikin. Ev şerê trajîk ku di bîra civakê da bi bi awayekî neyînî cih digire şerekî di navbera eşîran da ye. Li vir hem wek siwar pesnê Riza û birayên wî û hem jî wek hesp pesnê hespa wî “Gêjo” tê dayîn. Ji bo pesindayîna Gêjo tê gotin Gêjo ji ber kêfê difiskîne û hewadê xwe direşîne. Şakiro vê qisma kilamê wiha distirê:

“...**siwarê li dawiyê dajo** çûyîn çûyîna **Gêjo** ye

şêl û pêla têlî reşkal Riza ye

**Gêjo** kefê diviskîne, hewadê xwe direşîne

tu bala xwe bidê kosteka saeta zêr û zîvîn

bi ser qaşa zîne xwe da dihejîne hey wayê

fenanî sê gurên xwedayî ne...” (Güneş-Şahin, 2018: 449)

Bi ajotina Gêjo, çûyîn û tevgerê va Riza wek siwarekî çalak û hêja tê teswîrkirin. Behsa kosteka saeta wî ya zêr û zîv tê kirin ku ew ser qaşa zîne xwe da dihejîne û wek birayê xwe ew jî mînanî guran jêhatî ye. Îfadeya “fenanî sê gurên xwedayî ne” îfadeyeke balkêş e ku her sê bira wek guran têkoşer, wêrek û jêhatî tên binavkirin. Tê zanîn ku gur heywanekî jêhatî ye, nêçîra xwe bi xwe dest dixê û dijî rûvî û çeqelan jî gelekî wêrek e. Ji bo pesindayîn û şibandîna peyva “gur” hatiye bikaranîn ku car caran di zargotina kurdî da ji bo însanan gotinên bi vî rengî tên bilêvkirin. Gotineke pêşiyana a herî navdar “Şêr şêr e, çi jin e ha çi mêr e” ji bo vê mijarê wek mînaka herî baş dibe bê nîşandan.

Di kilama “Bavê Seyîd Betal” da jî wek siwar û mêrxasekî jêhatî pesnê Seyîd Êsiv tê dayîn. Behsa leqeba wî ya (leqeba kurmancî dibêjin Seyîd Êsivê Dîn), şervaniya wî, şengsiwarbûna wî û ji kîjan malbatê ye tê kirin ku em van hemû agahiyan ji kilamê hîn dibin. Navê hespê wî Ereb e, lewra ew wek “Siwarê Ereb” tê binavkirin û ev kesê ji malbata Şêx Eşûr şervanekî jêhatî ye wiha tê gotin:

“Bê dinyayê hey wayê wayê ax dinyayê nemînim li dinyayê

bê gidiyê sibe ye li dîharê Xanzira şewitî bikevim bavêj e

tu bala xwe bidê vê sibengê malxirabo Gozelê nemayê  
ewê ku mêra dikuje, yextirma vedigerîne  
bavê Seyîd Betal Siwarê Erebbê mêrkuj e, rimavêj e  
ji ocaxa Mala Şêx Eşûr e

....

Ezê bi dîharê Xanzila şewitî diketim berî li bê ye  
sibe ye sura sibê bîna bayê şer bi ser me da tîye  
dema li Bavê Seyîd Betal dibû pêsîrtengiya di mêra  
keskî xwedanxêr tune cewabekî bide kûraniya Intabê ba Têlî Etê ye  
na wele Şêx Mistê Şêxlerê Abiriyê ye...” (Güneş-Şahin, 2018: 96)

Xanzir gundekî li ser Elaşgirê ye ku di Şerê Dinyayê yê Yekemîn da çaxê Êris tîn herêmê Seyîd Êsiv jî li dijî wan şer dike. Ji bo jêhatîbûn û şervaniya wî tî gotin ku ew mêran dikuje, yextirma vedigerîne, mêrkûj û rimavêj e. Rim wek ku tî zanîn alaveke şer e ku pê tî şerkirin û diyar e ku ew gelekî baş rim bi kar tîne û ji ber vê ev sîfat ji bo wî hatiye gotin. Ji ber ku mêran dikuje û hespên wan hildide tîne jî îfadeya “yextirma vedigerîne” hatiye bikaranîn ku ev jî gotineke balkêş e. Di şer û pevçûnan da dema siwarê hespê bê kuştin û hesp bêxwedî bimîne û bikeve destê kesên din ew dibe yextirme ku di kilamê da behsa vê taybetmendiya wî jî hatiye kirin, em dîsa girîngiya hespan a di şer da bi awayekî baş dibînin.

Di berdewamiya kilamê da dîsa bal ser şervaniya “Siwarê Erebbê” tî kişandin û tî gotin Bavê Seyîd Betal yanê Seyîd Êsiv dibû “pêsîrtengiya mêran”. Di kurdî da ev jî îfadeyeke girîng e. Yanê tî gotin ku ew dikete pêsîra mêran, şerekî baş dikir, ew dixistin nav rewşeke wisa teng û xirab ku di dawiyê da bi ser diket. Lê ev rewş wisa dijwar dibe ku ev kesê evqas pesnê wî tî dayîn ji ber ku gelekî zehmetiyê dikşîne di rêzikên li dû tîne da tî gotin kesek “tune cewabekî bide kûraniya Intabê ba Têlî Etê, Şêx Mistê Şêxlerê Abiriyê”. Intab navê Dutaxa navçeya Agiriyê ye, Têlî Etê jî ji bo Evdilmecîdê Sîpkî hatiye gotin. Paşê wê bê behskirin ku Evdilmecîd Begê Sîpkî jî dijî Êrisan şerekî gelekî giran kiriye û bi hêzên xwe va wan ji herêmê derxistiye. Şêx Mistê jî ji şêxên gundê Abiriyê ya li ser Kopa (Bulanık) navçeya Mûşê ye ku ev der bi medreseyên xwe va navdar e, hewar û alîkarî ji wan tî xwestin. Dengbêj dibêje bila Têlî Etê bi hêzên xwe va bê alîkariyê, şêxên Abiriyê jî bi diayên xwe va piştgiriya wî bikin da ku ew tîk neçe û şermezar nebe.

Ev mînakên der barê hesp û siwaran da hatin dayîn nîşanî me dan ku di çanda kurdî da wek heywan hesp heywanên gelekî bi qîmet in, di navbera wan û siwarên wan

da t kiliyeke taybet heye ku di kilaman da nav  wan bi hev ra hatine bikaran n, di gelek berhem n  anda devk  da j  wek metafor bal  dik n n. Dengb j  akiro j  di kilam n xwe da nav  lehengan   hesp n wan hin caran ten    hin caran j  bi hev ra bi kar aniye. Bi deng  xwe hewl daye pesn  m ran     erkariya wan bide ku di b ra civak  da hem ev b yer n d rok , hem ev leheng   hem j  hesp n wan ney n jib rkinin   tim b n bib ran n.

### 3.3.3. MALBAT   E  R

Di destp k  da dema behsa curey n kilam n  er   pev  n  hatib  kirin. Di v  be   da ji bo m nak w  behsa hinek ji wan kilam n li ser  er n navbera malbat   e  ran b  kirin. Peyva e  r  (erb. a ire) bi koka xwe peyveke ereb  ye   t  meneya kom n mezin  n eqrebeyan ku ev kom j  ji mal, malbat, bav   qeb leyan p k t n   her yek xwed  mene   taybetmendiyeke ye (Karacan-Nayman, 2014: 363). Her  iqas ew zarava   devok n cuda bi kar b nin j  zimanek  hevpar diaxivin,  anda wan di ibe hev, li ser esas  ji heman xw n   eqrebatiy  ava dibin   ji h la abor , civak    siyas  va di navbera wan da yek tiyek heye (G ltekin, 2018: 14).

Kaplan dema behsa civaka Kurd   e  riy  dike, ji bo ku e  rtiya di nav Kurdan da ba  b  f mkirin bi h rgil  t geh n wek r  t, h v n, nif , mal, xan , kurmam (pismam), binam, w ris, xw ngir, malbat, ocax, ezbet, ber, babik (bavik), b nebab, binemal, hoz, t re, bel ke,  l   hwd p nase dike   dib je Kurd gelek  gir ngiy  didin esl   eqrebatiy , dikarin nav  heft bav n xwe j  bijm rin (2018: 20-23). Mohammedpour   Soleimani j  d r   dir j behsa t geha e  rtiy  ya di kategoriya kolonyal da t  bikaran n dikin   dib jin wek ku ev qa deyeke xwezay  ya civaka Kurd be b ye sedema  a tens lkirin    asankirina jiyana civak    pol tik ya li Kurdistan    Rojhilata Nav n (2019: 2).

Lale Yal n dema behsa eqrebat    xizimtiy  ya di nav Kurdan da dike dib je Kurd ji bo eqrebatiy  heman term nolojiy  bi kar t nin, pa   peyv n wek xw n, mal, waris, xizm, xal, xalet, mam, jinmam, pismam, bira, jinbira, b k, zava   hwd d r   dir j vedikole da ku t kiliya e  rt    eqrebatiy  ya di nav Kurdan da ba  b  f mkirin (2012: 253-267). Di e  rtiy  da eqrebat , kevne op , r    r baz n civak  hene ku dema li ser civaka Kurd l kol n t n kirin gelek caran behsa e  ran j  t  kirin. Gelek oryantalist, d plomat, m syoner, gerok, niv skar   arkeolog n wek Oscar Mann, Friedrich Edward Schulz, Cecil John Edmonds, Viladimir Minorsky, Basil Nikitin,



Aleksandre Jaba, Claudius Julius Rich, Austen Henry Layard di berhemên xwe da behsa gelên Rojhilata Navîn û bi taybetî jî eşîrên Kurd kirine, der barê jiyan û civaka Kurdan da fikrên xwe parve kirine. Her çiqas sedî sed nebe jî gelemperî li ber çavên wan eşîrtî pergaleke paşverû ye, ji ber kêmasiya şaristaniyê derketiye holê, herêmi ye, ne nûjen e, şervanî û talankeriye di xwe da dihevine. Fırat der barê nêrînên van mîsyoner û Rojavayîyan da agahiyên berfireh dide û dibêje hema hema hemû mîsyoner baweriya Îslamê wek paşverûtiyê dinirxînin, ji ber vê Kurdên misilman jî wek kesên dervayî şaristaniyê tî qebûl kirin û ji ber pergala eşîrtiyê wesfên Kurdan û îmaja wan wek şervan, talanker û şêlanker tî bilêvkirin (2015: 44).

Mijara eşîran ji hêla dewletê va jî her tim “pirsgirêka Kurdan” aniye rojevê, ew wek sedema pirsgirêkê hatine qebûl kirin û ji bo ev pirsgirêk ji holê rabe jî eşîr bi xwe hatine bikaranîn (Özer, 2018: 56). Eşîrên ji hêla dewletê va hatine dîkekirin (cudakirin) ji bo bacê nedin an jî neçin eskeriyê dijî dewletê tevgeriyane, hin caran jî ji bo nav lepên wê dewletê derkevin çûne dewleteke din a li sînorê wê herêmê û paşê xwedîderketina van eşîran di navbera dewletan da wek ku bikevin pêşbirkê bi wî awayî meşiyaye (Çiftçi, 2018: 38).

Di nav Kurdan da tîkiliyên eqrebatî û eşîrtiyê pir xurt in ku em dikarin di mijara qaçax û firaran da jî vê yekê bibînin. Mînak dema kesek bacê nede, neçe eskeriyê, qîzekî birevine, yekî bikûje an birîndar bike û hwd yanê ji ber sûcekî (Kurd ji van tiştan hinekan wek sûc qebûl nakin) qaçax an jî firar be û hêzên dewletê li dû wî bin ferdên civakê wî kesî vedişêrin, teslîmî dewletê nakin. Yalçın jî balê dikşîne ser tîkiliyên xurt ên eqrebatî û eşîrtiyê, dibêje ji bo ew kes bê girtin hêzên dewletê carna birayê wî digirin ku qaçax-firar ji bo berdana birayê xwe were teslîm bibe (2012: 43)

Di eşîrtiyê da xala herî girîng eqrebatî û tîkiliyên xurt in. Kesên dibin serokeşîr divê kesên zane û maqûl bin ku bikaribin eşîrê bi awayekî baş bi rê va bibin û li hemberî eşîrên din û dewletê biparêzin. Di nav Kurdan da wek ku hat destnîşankirin eşîrtî gelekî girîng e, Kurdên ku xwe didin nasîn hê jî behsa kal û bavên xwe û eşîra xwe dikin ku bila bê zanîn ka ew ji kîjan mal û malbatê ne. Eşîran dijî dewletan û eşîrên din gelek caran piştgirî û alîkariya hev kirine, bi hev ra tevgeriyane. Lê her wisa gelek caran jî ji ber sedemên cuda neyartiya hev kirine, gelek kes di pevçûnên navbera wan da hatine kuştin, birîndar bûne û hin malbat jî mecbur mane ku koçî cih û deverên din bikin.

Dema mijar tê li ser van kilamên ku behsa pevçûnên di navbera malbat û eşîrên Kurdan da dikin, hin akademîsyen û lêkolînerên bi çand, dîrok û folklorê kurdî ra eleqedar in ji vê mijarê dûr disekin. Yan hema wisa ser ra bê hûrgilî û şîrove behsa wan dikin, yan jî naxwazin rasterast behsa van kilaman bikin. Lê çawa ku behsa şer û pevçûnên dijî nijad, ol û dewletên din tên kirin divê behsa van kilaman jî bê kirin. Lewra ev şer û pevçûn, ev malbat û eşîrên navên wan di van bûyeran da derbas dibin jî perçeyekî bîra civakî û dîroka Kurdan e. Nihat Argun Çakır der barê vê mijarê û sedema behsnekirina van kilaman da dibêje neteweperweriya Kurd ya ku dixwaze ji xwe ra eniyêke neteweyî ava bike ji ber ku ev kilam di navbera Kurdan da dibin sema cudahiyê naxwaze ku behsa wan bê kirin. Şûna wê ew behsa kilamên dîrokî yên wek serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê dikin, ji bilî vê sedemeke din jî ew e ku bûyerên berê çêbûne dibe ku di nav wan da dîsa biqewimin û zirarê bidin endamên malbatê (2011: 48).

Nijad û civak dema behsa dîrokê dikin gelemperî dixwazin behsa bûyerên erênî bikin, çavê xwe ji yên neyînî û xirab ra digirin û naxwazin behsa wan bê kirin, bi sekneke alîgir û ne objektîf tev digerin. Sedema vê jî ew e ku ew vê yekê wek qelsiyekê dibînin û naxwazin ew bûyerên nebaş bînin bibîranîn û heta wisa ku hewl tê dayîn civak wan ji bîr bikin. Lê wek berê jî hatibû gotin bîr, bîranîn û jibîrkirin (zanetî û nezanî) bi hev ra eleqedar in û divê behsa van jî bê kirin. Jixwe dengbêjan jî bi rêya kilaman wek dîroknûsan ev bûyer heta roja me anîne. Helbet dibe bê gotin ku hin dengbêj bûne alîgirê hin malbat û eşîran û li gor berjewendiyên wan, nav û dengê wan ji xwe ra kilam gotine. Lê her çiqas wisa be jî ew kilam bi saya wan gihîştine îro û haya me ji wan bûyeran çêbûye. Sedemeke din ya behsnekirina van kilaman dibe ku ew kes naxwazin agahiyên şaş bidin, ji malbat û eşîrekî ra wek alîgir xuya bikin, an jî naxwazin Kurdan dijî nijad û civakên din biçûk bidin nîşandan ku ew bibêjin “jixwe Kurd dijminê hev in, hevdu dikujin û qedrê hev nagirin”. Meriv dikare bibêje ku di van tevgeran da parastina nasnameya kurdbûnê, eşîrbûnê û neteweperweriyê xwe dide der.

Ji bilî vê, zarok û neviyên van malbatên ku pevçûne îro dijîn û dema bi awayekî nebaş (xayîn, hov, nezan, dijmin û hwd) behsa kal û bavên wan bê kirin tesîreke nebaş li ser derûniya wan, nav û dengê wan çêdibe. Ev yek jî zirarê dide aîdiyeta wan ya ku ew xwe wek endamê wê malbat û eşîrê dihesibînin. Xwebiçûkdîtin, şermkirin, sûcdarkirina kal û bavên dibe ku di nav endamên van malbat û eşîran da çêbibe. Lê li

aliyê din, ji wan hin kes dibe ku kal û bavên xwe mafdar bibînin, pesnê wan û xwe bidin, ji ber van bûyeran xwe qure bikin û heta wisa ku ev tişt bibin sedema şer û pevçûnên nû û hesta tolhildanê çêbibe û bibe sedema dijminatîyê.

Gelemerî mêrên van eşîran an ji ber piştgirîya dewletê, an ji bo desthilatiya herêmê, an jî ji bo qîzrevandin û sedemên din şer kirine. Di van pevçûnan da mêr hatine kuştin, gelek kes birîndar bûne û neyartîyeke bi salan dewam bike dest pê kiriye. Piştî pevçûnan komên pev diçin der barê bûyeran da bîra xwe ava dikin ku ew ji hevdu cudatir in. Êş, neheqî, mirina eqrebayan, zirara madî, heqaret, biçûkxistin, gefxwarin û talûke di bîra wan da cih digirin ku bîr tê li hemberê bîra din, ev jî rê li ber lihevhatinê digire (Bilgin, 2013: 36). Li gor van gotinên Bilgin dema em kilaman şîrove dikin qasî ku tê dîtin di navbera eşîran da ji ber van bûyerên travmatîk zûbizû lihevhatin çênebûne. Lewra her yek li gor xwe mafdar e, ji wan mêr hatine kuştin, xwîn rijiyaye, zirar gihîştîye însanan. Wek Çelik jî tîne ziman (2015: 181) di civakê da tenê bîreke civakî tune ye, hinek kom û eşîr xwediyê bîreke hevpar a herêmî ne yanê her kom û eşîr li gor xwe dikare bîrekê ava bike.

Di gelek kilam, stran, helbest û destanên kurdî da behsa şerê di navbera eşîr, qebîle, malbat û koman da tê kirin. Di kilamên dengbêjan da jî ev yek xwe bi zelalî dide der ku meriv bi saya van kilaman der barê heyama wê demê yanê dîrokê, çanda Kurdan, rewşa polîtîk û civakî ya Kurdan, erdnîgarî, teknoloji (çek, barûd, hesp, şûr, xençer û hwd) û têkiliyên civakî da dibe xwedî agahî. Ev mijarên behsa wan hatin kirin jixwe di nav bîra civakî da hêmanên girîng in ku reng û dengê xwe didin civakê. Wek gelek civakên din di nav Kurdan da jî eşîr, malbat û qebîleyan neyartîya hev kirine û gelek kes di van şer û pevçûnan da hatine kuştin. Her eşîr û kom li gor xwe bîreke hevpar ava dike, mêr û giregirên eşîra xwe wek egîd, şervan, camêr û hwd bi nav dike, yê li hemberî xwe jî reş dike û nebaş nîşan dide. Lewra şer û pevçûnên di navbera wan da çêbûne, êşên hatine kişandin, neyartîya ku dest pê kiriye li gor her yekê travmatîk e û bi êş e.

Dema em kilaman guhdar dikin em der barê navê hin eşîr û malbatên Kurdan da dibin xwedî agahî ku mînak behsa eşîra Hesenan, Heyderan, Cibirîyan, Xiya, Badika, Birukan û malbatên Mala Mistefa Axa, Mala Emer, Mala Dîbo, Mala Faro, Mala Quto, Mala Êsivê Seydo û hwd tê kirin. Ev nav me didin zanîn ku ew li herêmê eşîr û malbatên mezin û navdar in. Di bîra civaka Kurd da jî ji ber gelek bûyer, şer û pevçûn an jî kirinên xwe yê din cihê girîng digirin. Wextê em guhê xwe didin

kilamên şer û pevçûnê yên behsa lehengiya hin şexsan yên wek Ferzende Beg, Bişarê Çeto, Cemîlê Çeto, Silêmanê Mistê, Filîtê Quto, Seyîdxan, Elîcan, Hemê Mûso, Îbo Begê Parsînî, Eliyê Ûnis, Şêx Seîd û hwd dikin, em dibînin ku ev kes an di şerên dijî dewletê yan jî şerên di navbera eşîran da balê dikşînin. Li gor van kilaman ev kes di şer û pevçûnan da ji ber mêranî, cengawerî, wêrekî, başbikaranîna çek û sîlehan, jîrbûn û jêhatîbûna xwe bi ser ketine û kesên li hemberî xwe têk birine.

Di kilaman da ev kesên wek qehreman, egîd, mêr, şêr, çargurcîk, dilpola, beg, axa tên teswîrkirin û evqas pesnê wan tên dayîn her tim bi ser nakevin. Hin caran ew di şer û pevçûnan da birîndar dibin û tên kuştin ku ev jî ji bo wan dibe sedema têkçûnê. Sedema têkçûyîna wan jî gelemperî ne ji ber newêrekî û nezanbûna wan e. Ji ber ku hêza kesên li hemberî van lehengan zêde ye, dewlet bi hemû hêz, çek û cebîlxane, bi sedan eskerên xwe va li ser wan da digire, eşîrên hêza wan xurt û piştgirên wan zêde ne dijî wan in, peymanên di navbera dewletan da dijî wan e ku ev dibin sedema têkbirina wan. Ya duyem jî li hemberî wan dafîk, kemîn tên danîn û ji ber van şertên ne adil û xiyanetê ew têk diçin.

Li gor normên şer û pevçûnan dema du alî bînin hemberî hevdu divê hêz û cebîlxaneyên wan wekhev bin ku şerekî adil çêbibe. Lê gelemperî kes guh nade van qayîdeyên şer, yên hêzên wan xurt in an bi saya vê xurtbûnê an jî bi bêbextî, dek û dolaban di şer da bi ser dikevin. Jixwe wê demê jî êdî tu meneya şervanî û lehengiyê namîne. Lê dîsa jî hin caran yên tîn têkbirin di dîrokê da navê xwe didin bihîstin. Dîrok bi gelek mînakên va vê piştrast dike û wan di nav perên xwe da vedişêre. Mînak di kilama “Asyayê” da dema Ferzende Beg û yên li cem wî li hemberî Eceman şer dikin Ferzende Beg dixwaze bi jina xwe Besrayê bide fêmkirin ku ev ne şerekî hêsan e. Dema Ferzende Beg behsa vî şerê xurt û mezin dike navê hin eşîran bilêv dike, em têdigihêjin ku ew di nav Kurdan da eşîrên navdar in, hêza wan xurt e û hin caran jî tevî şer û pevçûnan bûne. Bi dengê Şakiro wiha dibêje Ferzende Beg;

“...go Besrayê agirê kulê di qapiyê te ketê  
ezê bi cotek gulê tometîka vî zalimê birîndar im  
eva ne şerê **Hesenan** e  
ne şerê **Heyderan** e  
ne şerê **Cibiran** e  
ne şerê donzdeh bavê eşîran e  
hewşa kafîrê Emîr Tûman e  
Ecem e beşîncî mezheb e, bê dîn û bê îman e” (Güneş-Şahin, 2018: 61)

Her çiqas ev kilam ne şerekî di navbera eşîr û malbatên Kurdan da be jî, ji hêla têkberina lehengekî Kurd (Ferzende Beg) û rêhevalên wî va agahiyên pir girîng dide me. Yên beşdarî vî şerî bûne ji ferdên malbatên cuda ne ku li hemberî Eceman şer kirine. Navê hin eşîrên Kurd yê wek Hesenan, Heyderan û Cibiran jî di kilamê da tên behskirin ku haya guhdaran ji wan çêdibe.

Ji eşîrên di kilaman da navê wan zêdetir derbas dibin hinek Hesenan, Heyderan, Celaliyan, Seyîdan, Berazan û Cibiran in û bo mînak navê eşîra Hesenan di kilama “Teyrê Îspirê” ya li ser Şêx Seîd hatiye gotin da tê bilêvkin. Li gor gotinên kilamê sêsed siwarên vê eşîrê ji ber zexta dewletê ya piştî Serhildana Şêx Seîd berê xwe didin Îranê. Şêx Seîd û yê piştgirî dane wî hatine girtin, di girtîgeha Diyarbekirê da li benda îdamkirina xwe ne û Şakiro wiha dibêje;

“...kesekî xwudanî xêra tunîne  
cuwabekî bide Seyîdê Nêriyê  
bê herê Seyîdo te ocaxî koro  
tuyê li wî kevirî çî sekiniyî  
bavê Şêx Elî Riza şêxê îrşadê dîrega dînê Îslamê  
Teyrê Îspirê birin Diyabekira şewitî  
sêsid suwarê me **Hesena**  
sêr bike îro ji êvara Xwedê da  
rêka Îranê ji xwe ra li me nîvî kir  
kê û kê kir, agirê kulê bikeve mala Misto Kemal  
Reîsê cumhûrê kir...” (Güneş-Şahin, 2018: 66)

Kilama “Dewrêşê Evdî” ya ku wek cureya destanê dikare bê senifandin (Güneş û Şahin wisa senifandine) jî ji bo vê mijarê kilameke balkêş e. Navê hin eşîr, qewm û nijadan di nav risteyên kilamê da hatine bilêvkin ku ev in;

“Li lo li lo li lo li lo lo...  
Yabo keko dilê mi liyan e  
sed û bist û çar car dilê min liyan e  
kone konê Êskan e başî konekî giran e  
kon li ser sed û bist û çar dîregan e  
çar dîrêgê li dewsê **Kîrkan** e  
çar dîrêgê li dewsê **Milan** e  
çar dîrêgê li dewsê **Qeregêçyan** e  
çar dîrêgê li dewsê **Dûvgerînan** e

çar dîrêgê li dewsê **Simbêl û Bendiyan** e  
 çar dîrêgê li dewsê **Akinciyan** e  
 çar dîrêgê li dewsê **Tirkan** e  
 çar dîrêgê li dewsê **Lazan** e  
 çar dîrêgê li dewsê xaniman û kevaniyan e  
 tu sêr bike vê sibekê malxirabo  
 bîst û çar eşîrê giran li konê giran li hev civiyan e  
 bi şev û bi roj dixwin goştê hilika birincê ser siniyan e  
 bûyir bûyirê qehweçîyan e  
 fîncana bilind dîkin bi du tiliyane  
 bi ser xwe de diqelibînînin bi du gulmane  
 dibên Xaliqê Alemê bianiya ser me qewxekî bed giran e  
 Êskan e başî Mîrê **Milan** e  
 sêr bikira li meydanê kî boxe bû kî beran e  
 wêl wêl,  
 gidî gelo virevirê **Kurdan** e  
 ji xwe re di ciyê xwe de rûniştine  
 her yekî pesnekî li xwe dane  
 Tu dênna xwe bidê Êskan e başî Mele Xelîl derketin hêşî konan e  
 pêgermokê digerînin hêla konan e  
 nihêrî sê siwar ji wê da dihatin  
 siwarê **Ubêşan** e  
 kefenê wan e bi terkiyê hespa girêdane  
 rimê wan e bi jehrê kildane  
 rimê wan li ortê wan û zînan e  
 xwe jor da berî nava **Eşîra Mila** dane  
 vê sibêngê tu dêhna xwe bidê  
 serê hespa nadine destê tobadane  
 malxirabo destê xwe kirine binê cêban e  
 kaxiz derxistin piçûk e fenanî rûyê lahîfan e  
 pakî bi navê dostane du pa bi navê dujminan e  
 tu dêhna xwe bidê go pênsid mêrê me ji **Turkan** e  
 pênsid mêrê me ji **Gêsiyan** e

pênsid mêrê me ji **Şemlan** e  
 serekê pênsid mêrê Şemlan e Çîl Îbrahîm Bavê Hamûd Kekê Zulêxane  
 serekê pênsid mêrê **Tirkan** e gera Fermanturkî Şaban e  
 serekê pênsid mêrê **Gêsiyan** e, Mahmûdê Gêsî serekê wan e  
 bê li Çiyayê Dilşanê li Feyzê Qermîtê li Warê Tatokê  
 li Newala Xelflokê, Rasta Qitika  
 Delavî Tatka, Newala Kevirê Nexweş û Miriyan e  
 îro ji êvar de xwe berdane kozik û kermînan e  
 tu sêr bike ji te dixwaze herbekî bed giran e  
 wêl wêl...” (Güneş-Şahin, 2018: 551-552)

Niha em berê xwe bidin çend kilamên rasterast bi me didin zanîn ku şerê di navbera hin eşîr û malbatên Kurd da bi çi awayî çêbûne. Em ê bi rêya van kilaman bizanibin ku ka çi qewimiye, di van şeran da kî hatine kuştin û birîndar bûne û yên piştî wan şîna wan girtine der barê wan da çi gotine.

### 3.3.3.1. Pevçûna Eşîrên Reşkotan û Sînika: Kilama “Şerê Mala Nêsir”

Kilameke behsa şerê di navbera eşîran da dike kilama bi navê “Şerê Mala Nêsir” e. Eşîrên Reşkotan û Sînikan pev diçin, şerê wan li Batmanê çêdibe. Sînikan navê herêm û eşîrekê ye ku dikeve piştî bilindahiya Qîrê (Kevirbirî, 2009: 59). Reşkotan jî hem navê herêmekê ye li Xerzan û dikeve navbera Çemê Bişêriyê û Batmanê û hem jî navê eşîreke mezin a wê derûdorê ye. Kevirbirî (2009: 65) der barê vê herêmê da wiha agahiyên berfireh dide:

Sînorên Herêma Reşkotan, ji ava Bişêriyê dest pê dike û heta Pira Malabadê ku nêzikî Farqînê (Silîvan) ye, diçe. Her wiha ji hêlekê vejî navçeya Hezoyê (Kozluk) wekî sînorê herêma Reşkotan e... Em dikarin gundên Reşkotiyî wisa rêz bikin: Hiznamîrê (Paytexta wan e), Tapiyê, Bolindê, Kurdikê, Hicrê, Delana Paşo, Texeriyê, Kelokê, Mezrikê, Bolindê Dirbêsa, Zivingê, Kezikê, Newala Nazdarê, Qorixê, Bîmêrê, Herfasê, Xîlika, Şerbetkoy, Reşikê, Licika Hacî Şemsedîn, Licika Xasik, Kêrikê, Merîna, Birûka, Mergerîcalê, Kanîkê, Malê Gir û Şabê... Li vê derê file, êzdî û misilman bi hev re jiyana xwe domandine û hê jî ev herêm wekî herêma êzdiyan tê binavkirin.

Li gor agahiyên Dengbêj Salihê Qûbînê, eşîra Reşkotan û Sînika (Mala Nêsir ji Sînikan e) li Batmanê pev diçin. Sedema pevçûna wan jî ew e ku Hesoyê Brahîmê serokê Mala Nêsir û xulamê wî Zekeriya ji bo tiştêkî hev aciz dikin. Piştî vê acizkirinê

Zekariya ji cem Heso radibe diçe cem mezinê eşîra Reşkotan Hecî Mihemedê Mistê. Li ser vê Heso xeberekê ji Hecî Mihemedê Mistê ra dişîne û dibêje Zekariya çûye cem cenabê wî bila biçê, lê tivînga wî ya li cem xwe bila paşve bişîne. Mihemedê Mistê tivingê naşîne û ev dijberiya di navbera wan da dibe sedema pevçûneke giran. Piştî herdu alî pev diçin 5 kes ji Mala Nêsir, qasî 5-6 kes jî ji Eşîra reşkotan tên kuştin (Salihê Qûbînê, Pêwendiya tîlefônî, 12 Hezîrana 2022yan).

Di destpêka vê kilamê da jî dîsa wek gelek kilamên din du jin bi sê dangan bangî hev dikin ku yek ji wan Emîne Xanim û ya din jî Husna Xanim e. Li gor rêzikên kilamê em têdigihêjin ku ew jinên Mala Nêsir in. Emîne Xanima ji xwe ra dibêje “mi gulîbirê” û “rebenê” bangî Husna Xanimê dike ku ew rabin berê xwe bidin Diyarbekirê ku ji Rizgan Axa, Xalitê bira, Tahirê zava (neviyên Mala Nêsir in) ra gule û barûdê bikin:

“Ax lê dayê ha dayê dayê ha dayê ax dayê hey la lê dayê  
sibe bû mi rebenê bala xwe berdayê Emîne Xanimê  
bi sê denga bang dikirî gotî Husna Xanimê  
lê lê dayê rebenê sibe ye  
mi gulîbirê ji te ra nego  
tu rabe emê bi destê hevûdu bigrin  
xwe berdine şehrê bajara Diyarbekir  
qasekî rûnên derê dikanek ji dikanê van heciya  
emê ji siwar û peyayê Mala Nêsir ra bazar bikin gullê û barûdê  
emê ji Rizganê Axa ra na wele vê sibengê ji Xalitî bira ra  
bazar bikin qolek fişengê fîdaliya<sup>20</sup>  
ji Tahirê zava ra bazar bikin cotê şarê Hamûdiya (Güneş-Şahin, 2018: 502)

Jinên ku vê zêmarê dibêjin û dixwazin li Diyarbekirê ji bo şer ji mêrên malbatê ra gule, barûd, fişeng û şarê Hamûdiyan bikin di berdewamiya kilamê da bi awayekî edebî pesnê mêrên Mala Nêsir didin. Di van risteyên kilamê da şibandinên gelekî balkêş hene ku divê li ser bê axaftin. Dibêjin nav û dengê van mêran zêde ye, ew rimê xwe (alaveke şer e) hildidin hespên xwe siwar dibin û xwe berdidin nav heval û hogirên xwe. Şibandina herî balkêş ya ku qîmeta van mêran û mêrxasiya wan bide nîşandan peyva “zêr” e. Wek ku tê zanîn zêr ji berê va madeneke gelekî bi qîmet e, bihayê wê zêde ye û bikeve nav herî û axê jî tu caran qîmeta wê kêm nabe. Li vir jî tê gotin ev

---

<sup>20</sup> Cureyek ji sîlehê ye.



mêrên malbatê wek kulmeke zêrê zer in, wek şimayê ne meriv bi kêfê ra wan ji nav çarîk û mecîdiyan bilind bike û ji xwe ra hilibijêre. Çarîk li vir meneya zêrê çaryek yanê biçûk û mecîdî jî meneya pereyên wek qurîşan in ku di dema Osmaniyan da ji bo danûstendinê dihatin bikaranîn. Şakiro van risteyên kilamê wiha dibêje:

“şahde şûdê torinê Mala Nêsir gelek in li dewrana di dunya  
gava ji malê siwar dibin rimê xwe hiltînin  
xwe berdidin nav heval û hogirê di xwe da  
fenanî kulmek zêrê zerê bi şima  
ji kêf ra xwe xwar bikî bilind bikî  
ji nava çarîkan û mecîdiya (Güneş-Şahin, 2018: 502)

Ev mêrên ku evqas zêde pesnê wan hatine dayîn ji ber ku di wê pevçûna bi Reşkotanan da tên kuştin îja di berdewama kilamê da dibin sedema êş û kesera van jinên malbatê. Peyva “nemînim” wek gelek kilamên din li vir jî tê bikaranîn ku gelemperî jin vê gotinê dibêjin. Ev peyv ji bo xwequrbankirin û fedakirinê tê gotin û tê xwestin ku şûna kesên mirine xwezî ew jin bi xwe bimirana, lê bila mêrên malbatê nemirana. Tê gotin ev mêrên li ser mêran ra ne di konê Hecî Mihemed Axayê Bolîndî da li benda Mehmet Eliyê Reşkotî ne û bûne sedema keder û meraqê ji vir şûn da êdî ka ew wek jin bijîn çî ye an nejin çî ye, hatine kuştin. Risteyên ku bi ez nemînim ra dest pê dikin jî ji hêla Şakiro va wiha tê gotin:

“ez nemînim Rizgan Axa yê bê Xalit bira yê  
le Tahir zava yê Hemîd mêrî mêra yê  
Huznî beranê qemer li welatê xerîbê derdê li ser derda yê  
heya dunya xweş ava be  
ji bona Mihemed Elî Bavê Xezebê  
keder û mereqa me hemya yê  
di konê Hecî Mihemed Axayê Bolîndî<sup>21</sup> da  
li benda Mehmed Eliyê Reşkotî  
ez nemînim îro bi şûnda gulîbirê  
vê sibengê kê dimîne ji bonê heyfa ê lê dayê” (Güneş-Şahin, 2018: 502)

Qismeke kilamê ya ku behsa vî şerî dike da wek destpêka kilamê li vir jî Emîne Xanim dîsa bangî Husna Xanimê dike û jê ra dibêje şevê roja sêşemê rojêke ters e, yanê xirab e lewra li egîdê mala bavê wê ra baş nayê:

“...Lê dayê ax lê lê dayê lê dayê... hey la lê dayê

---

<sup>21</sup> Bolîndî gundekî Bişêriyê ye.

Emîne Xanimê bi sê denga bang dikirî gotî lê Huznayê  
hewû renebê sibe bû mi gulîbira Xwedê  
ji te ra nego tim û tim cara hayê bi min hayê  
şevê roja sêşemê rojeka ters e xirab e  
li egîtê mala bavê mi rebenê nayê ” (Güneş-Şahin, 2018: 503)

Bi van gotinên kilamê ya ku cureya wê zêmar e teqez nebe jî tê texmînkirin şerê herdu aliyan roja sêşemê çêbûye. Lewra piştî îfadeya roja ters yanê nebaş mêrên ku ew wek egîdê mala bavê xwe teswîr dike hatine kuştin û xwîn rijiyaye. Dîsa wek gelek şerên tînin kirin mêran di nav hev da şer kirine, yê hatine kuştin dîsa mêr in û yê li dû mane jî jin in ku ew şîna mêran dikin û êşê dikşînin. Ew hem kesên mêrên malbatê kuştine şermezar dikin û hem jî pesnê mêrên malbata xwe didin ku di berdewamiya kilamê da wiha tê gotin:

“şahde şûdê torinê **Mala Nêsir** gelek in li dewrana di dunyayê  
berî bexê **Mala Ezo** dane Girê Zivînê  
derbas kirin newala Kûrûkî Çayê  
de bira bexê **Mala Ezo** here li dîwana rûnên  
lingê xwe bi ser hev ra bavêjin  
qurab bi qurab cigarê xwe bikişînin  
li kêlekê pîreka pesnê xwe bidin  
bêjin me yê derbekî bi dest berdayê  
bedena Huznî beranê qemer torinê **Mala Nêsir**  
îro sê roj û sê şev e cinyazê vî egîtî mabû  
li Girê Zivînê, newala Çûrikî Çayê  
hewû rebenê tu sêr bike vê sibengê  
li ber surê gidîno vê sermayê  
kedereke giran e mereqeke xirav e  
derdekî bê derman e ji dilê me dernayê (Güneş-Şahin, 2018: 503)

Di vê qismê kilamê da pesnê torinê Mala Nêsir yanê Huznî tê dayîn û tê gotin şahde şûdê wî yanê nav û dengê wî li dinyayê (qesta vê li herêmê) gelek e, ew zêde tê naskirin û navdar e. Îfadeyêke din jî ji bo pesindayîna hatiye bikaranîn ku dengbêj wî wek “beranê qemer” ê torinê (neviyê) Mala Nêsir teswîr dike, ew jî şibandinek e. Wek tê zanîn ji bo pesnê mêran bê dayîn hin caran dibêjin wek şêran e, wek guran e yan jî wek beranan e. Tê gotin ku wî şerekî baş kiriye, lê paşê mixabin di şer da tîk çûye, dest berdane bedena wî yanê ew kuştine, cinazê wî jî sê roj û sê şev e li Girê Zivînê, Newala Çûrikî Çayê li ber sermayê erdê maye. Ji ber kuştin û erdêmayîna cinazeyê wî

li gor gotinên kilamê kedereke giran û mereqeke xirab tê kişandin û ji ber vê derdê bê derman a dilê jinên malbatê jî şingirtineke mezin xwe dide der. Jixwe bi van gotinan va kesên kilamê guhdar bikin jî dikarin heman xembariyê di dilê xwe da bijîn. Kilam bi van risteyan va dawî dibe;

“axao sibe bû Rizgano axao, Xalito birao  
le Tahiro zavao, Hemîdo mêrî mêrao  
Huznî beranê qemer li welatê xerîbê bû derdê ser derdao  
heya dunya xweş ava be  
ji bona **Mihemed Elî Bavê Xezebê**  
keder û mereqa me hemyao  
di konê **Hecî Mihemed Axayê Bolindî** da  
li benda **Mihemed Eliyê Reşkotî**  
ez nemînim îro bi şûnda gelo vê sibengê  
kê dimîne ji bonê heyfa we lê dayê.” (Güneş-Şahin, 2018: 503)

Di dawîya van risteyên kilamê da wek destpêkê li vir jî dîsa navê heman kesan derbas dibe. Huznî jixwe berê jî hatibû gotin, lê behsa Rizgan, Xalid, Tahir û Hemîd tê kirin ku her yek xwedî sifatekê ye, ew wek axa, bira, zava, mêrê mêra, beranê qemer û bavê xezebê tên terîfkirin. Ji tevahiya kilamê em têdigihêjin ku kilam ji hêla jinên Mala Nêsir va wek zêmar hatiye gotin, lewra navê mêrên malbatê yên li jor hatin rêzkirin di kilamê da li dû hev derbas dibin. Şerê di navbera Reşkotan û Sînikan ne tenê ev şer e, gelek caran bi hin hincetan qira hev anîne û bûne sedema dijminatîya salan.

### **3.3.3.2. Xwîşkên Li Dû Cinazê Birayê Xwe Dikevin: Kilama “Elîfê-Emînê-Ûskan”**

Ji bo pevçûna malbat û eşîran kilama “Ûskanê Bira” ya wek “Elîfê-Emînê-Ûskan” jî tê zanîn mîna keke baş e ku divê bê behskirin. Di kilamê da Ûskan di şerekî da tê kuştin û cinazê wî li çol bestan dimîne. Herdu xwîşk Emîne û Elîf li dû cinazê birayên xwe dikevin ku wî bibînin, ji bo vê jî diçin li cem hin kesan û serokeşîrên malbatan. Wextê em kilamê analîz dikin, em dibînin ku du xwîşkên jîr û jêhatî yên ji hêla civakê va “wek mêran” bînin binavkirin an jî wek “şêrejin” bînin teswîrkirin ji bo dîtina cinazeyê birayê xwe Ûskan hewl didin. Ew dikevin pesîra mêran, zimanê xwe li ser mêraniya wan dirêj dikin û dixwazin wê otorîteya wan a mêrane hilweşînin. Lewra li ber çavê wan mîr dikarin mêran bikujin, kuştina mêran ne xem e, lê eyb û şerma giran ew e ku mîr cinazê hevdu veşêrin û nedin malbatê.

Di vê kilama ji devê jinan hatiye gotin da behsa mêrxasî, egîdî, xweşmêrî û kuştina “Ûskan”ê birayê wan tê kirin. Di seranserê kilamê da şîn, êş, xembarî, gilî û gazin heye ku kesê guhdar dike jî wan hestan dijî. Ev kilama şîne ji hêla xwîşkên wî va têra xwe bi hunerî hatiye vegotin. Elîf û Emîneya xwîşkên Ûskan hewl didin cinazê birayê xwe Ûskan yê ku di şerê navbera eşîran da hatiye kuştin bibînin. Ji ber vê derdikevin li hemberî Bişarê Çeto (Bavê Çûrî Kekê Sulhedîn), Emê Gozê (Kekê Şemsedîn) û Hesênê Ozmîn (Kekê Eladîn) û ji wan ra dibêjin berê pêş da ji eşîran mêran mêr kuştine, ev ji bo wan ne tiştêkî nenas e, lê her çiqas mêr hatibin kuştin jî kesî cinazeyê wan veneşartiye, ev tiştêkî bê rûmet e. Ji ber vê dixwazin cinazê birayê xwe bibînin da ku ew li çol û bestan nemîne û goreke wî hebe. Şer di navbera sê malbatan da hatiye kirin ku ew Mala Dîbo, Mala Faro û Mala Quto ne. Xwîşkên Ûskan diçin yek bi yek mêrên ji wan eşîran ra diaxivin ku ka bizanibin cinazeyê birayê wan li ku ye. Şakiro bi devê herdu xwîşkan wiha dibêje;

“...Elîfê go lê lê lê lê  
 lê Emîne xwengê tu rabe  
 minê şeva îşev xewnekî dîtibû di xewê da  
 dilê mi porkura Xwedê çuqa jê ditirsiya  
 mi dî eşîra **Mala Dîbo, Mala Faro, Mala Quto**  
 li çemê Badîşo, Derbendî Wêran, newala Hopê  
 bi devê sûsteman û çapiliya li hevdudialiya  
 orta nîvro bi esrê bû  
 ji girê Xumalo ji hev diqetiya  
 emê geriyan negeriyana cinyazê Ûskanê birayê me nedixûya  
 tu rabe bi nanê mala me kî, bi serê bavê xwe kî  
 ezê bi gora bavê te ketime  
 ca tu rabe emê bi destê hevûdu bigirin  
 emê xwe berdine qesroka tewra di jêrîne  
 cem **Bişarê Çeto Bavê Çûrî Kekê Sulhedîne**  
 hela vê sibengê va camêra hay ji birayê me tunîne (Güneş-Şahin, 2018: 482)

Em ji kilamê têdigihêjin ku ev eşîr û malbatên navê wan di kilamê da hatine gotin pev çûne, di navbera wan da şerekî giran çêbûye û Ûskan hatiye kuştin. Di şexsê herdu xwîşkan da em wê travmaya wan, derûniya wan a nebaş û hestên wan ên xemgîniyê û êşê di hemû jinên Kurd ên ku mêrê wan, birayên wan, xal, ap, pismam, kal û bavên wan hatine kuştin da dikarin bibînin. Mêrek bi destê mêrên eşîreke din

hatiye kuştin û cinazê wî jî xuya nake. Di destpêkê da Elîf bangî xwîşka xwe Emîneyê dike û dibêje wê porkurê di xewna xwe da dîtiye ku Mala Dîbo, Mala Faro û Mala Quto bi çekên jê ra dibêjin çapilî û sûstemê pev çûne û birayê wan hatiye kuştin.

Kilamên li ser xebat hatin kirin jê gelek ji ber ku mêrên malbatê tên kuştin ji devê jinên bê mêr, bê bav, bê bira û bê qewm mane hatine gotin. Ji ber vê ye, wek li vir jî hatiye gotin ew ji xwe ra dibêjin “min porkura Xwedê” yan jî “min gulîbirê, serkurê, rebenê û pepûkê”. Ev îfade nîşan didin ku ew şînê digirin, êşa wan êşeke mezin e. Ew êşa di dilê xwe da bi rêya kilaman digihînin civatê ku îro ew kilam dibin mijara lêkolînan. Li hemberî rewşên travmatîk mêr jî dixwazin gelek tiştan bibêjin, êşa xwe bînin ziman, bigirî û bikin hewar, lê ji ber wê civaka mêr serdest in (patrîarkal) ya ku van tiştan ji bo mêran şerm dihesibîne ew êşa xwe davêjin hundirê xwe. Lê di vê çand û civakê da jin li gor mêran ji wê hêlê va rehetir in, ew êş û xembariya xwe bi rêya kilaman, girî, hewar, şîngirtin û zêmaran dikarin bidin der. Ji ber vê dengbêjên jin an jî jinên ku hestên xwe bi rehetî bi rêya kilaman vegotine ji mêran ra bûne îlham ku gelek dengbêjan kilamên bi devê wan hatine gotine ji xwe ra kirine mijar.

Li gor gelek civakan dema kesek bimre yan jî bê kuştin cinazê wan tê bidestxistin, li gor edet û kevneşopîyan tên veşartin û gora wan tê avakirin ku cihê wan bê zanîn û paşê ew bikaribin bînin ziyaretkirin. Heke ev yek neçe serî û termê kesên hatine kuştin neyên dîtin û veşartin ev binpêkirina rîtuêlên dînî, çandî û kevneşopiyê tê hesibandin. Di kilamê da Elîf û Emîneya şîna birayê xwe digirin jî dixwazin termê birayê xwe bibînin, jê ra gorekê çêkin û veşêrin da ku ji vê şermezariya nedîtina termê wî xelas bibin. Di dawîya dawîn da Elîf û Emîne xwe digihînin Hesênê Ozmîn ku ew dibêje wî Êskan kuştîye. Hesênê Ozmîn cihê cinazê Êskan ji Elîf û Emîneyê ra terîf dike ku ew herin cinazê birayê xwe hildin. Xwîşkên Êskan yên ku êş û kedera birayê xwe dikşînin diçin cinazê birayê xwe dibînin. Ew wiha pesnê birayê xwe didin; “çepildirêjo, simbêlreşo, birûqeytano, namilpeno, pozberano” û dibêjin bi mirina wî va ûrtê mala bavê wan nemaye (Güneş-Şahin, 2018: 488). Di kilamê da pevçûna mêrên eşîrên din, lêgerîna cinazeyekî û di dawîya dawîn serkeftina du jinan a dijî mêran tevgeriyane û gihîştine cinazê birayê xwe bi têrhunerî û zelalî ji devê Şakiro tê vegotin.

### **3.3.3.3. Du Birayên Şervan Tewfîq û Seyîdxan: Kilama “Ez Reben im”**

Di dema Serhildana Agiriyê û piştî wê gelek bûyerên dîrokî qewimîn e ku dengbêjên herêmê li ser wan kilamên cuda çêkirine. Kilama “Ez Reben im” jî di nav

van kilamên klasîk da ye û bi devê dengbêj Reso va belav bûye, lê zêdetir ji Şakiro tê guhdarîkirin. Ev kilam bi devê “Hedo”ya (jina Seyîdxan) jinbira Tewfîq hatiye gotin û li ser kuştina Tewfîqê birayê Seyîdxan e. Di naveroka kilamê da Tewfîqê ji malbata Ûsivê Seydo firarê dewletê ye, ji ber hêzên dewletê direve û xwe dispêre eşîra Xiyan. Li ser vê dewlet zorê dide eşîra Xiyan ku ew Tewfîq teslîm bikin û nehêlin ew bê wan deran. Eşîr demekê Tewfîq û hevalên wî diparêze, lê dema zor û zexta dewletê zêde dibe serokeşîr Mihemed Emînê kurê apê Emer ji Tewfîq ra dibêje bila ew ji gund derkeve here, lê Tewfîq vê qebûl nake û ew bi destê Mihemed Emîn tê kuştin ku kilam behsa vê mijarê dike.

Li gor hevpeyvînên Adnan Çelîk yê bi kesên ji eşîra Xiyan ra kirine (Sidqî, Mihemed, Hediya, Ezîz, Rênas) eşîra Xiyan hevkarîya dewletê û xayîntî nekiriye. Ew dibêjin ji ber ku Tewfîq li hemberî serokê eşîrê Mihemed Emîn bêminet xeberdaye û gotiye ew ji gund naçe ew ketine pêsîra hev, bi mêranî şer kirine û ji ber vê hatiye kuştin û gundên wan jî bi şewitandina dewletê xelas bûye (2015: 189-193).

Li vir du alî “Mala Usivê Seydo” û “Eşîra Xiyan” hene ku herdu jî li gor xwe bîreke civakî ava kirine. Mala Usivê Seydo hewl dide nîşan bide ku mêrê wan ê mêrxas Tewfîq bi destê wan yanê bi xayîntiyê hatiye kuştin, çawa qêmîşî wî kirine û ew kuştine. Aliyê din yanê eşîra Xiya jî dixwaze bide zanîn ku ew ne xayîn in, wan wek mêran beranberî hev şer kiriye û Tewfîq wisa hatiye kuştin. Eşîr vê dexma xayîntiyê ya ku li wan hatiye xistin û ew nebaş tînan nîşandan qebûl nake, wê wek neheqîyeke mezin dibîne û dixwaze ev neheqî ji holê rabe. Li vir heke em berê xwe bidin Fesîhê rêhevalê Tewfîq yê ku di wî şerî da li hemberî eşîra Xiya û dewletê şer kiriye û xwestiye xwe bigihîne Tewfîq ew jî der barê hevkarîya eşîrê ya dewletê da wiha dibêje:

“Herkes û hertişt li me bûbû dujmin. Hukûmat dujminê me bû, lê vî milletê me çi ji me dixwest? Çima li kuştina me digerîyan? ... Wê ji kuştina me çi feyde bidîtana? Sîrf ji bo ku ji hukûmatê ra şelafiyê bikin û bikevin çavê hukûmatê dujminaya me dikirin. Ne dibêjin, kurmê darê ji darê be, xêra darê tune, wê birize. Ya me jî eynî wusa bû. Demekî şûnda birazîyê Bişar Akîf hate cem me û got:

*"Hevalên we xwe ji çemberê xilas kirin û berbe çiyayê Lobasorê vekîşyan. Werin ez we bibim bigihînim wan. "*

Akîf da pêşîya me, em çûn li çiyê gîhiştin hevalên xwe. Li wê derê em pê hesîyan ku Tewfîq û Şakiro hatine kuştin. Feyzulla û hevalekî me yê din jî birîndar bûbûn” (Aras, 2009: 121).

Şakiro vê kilamê bi dengekî gelek dilşewat dibêje ku ev kilam di nav kilamên Şakiro da ji wan kilamên ku zêde tèn zanîn yek e. Dema kilam bê guhdarîkirin ev rewşa travmatîk ya di navbera du eşîran da çêbûye, kodên eşîriyê, metaforên çanda kurdî, pevçûn û encama wê ya bi kuştinê dawî bûye xwe gelekî baş xuya dike. Der barê şecereya malbata Seyîdan (malbata Tewfîq) da Ahmet Aras agahiyê dide ku Seyîdxan, Ûsiv û Tewfîq kurê Seydo ne, du kurên Seyîdxan hene ku navê yekî Sulhedîn û navê yê din jî Mutlîq e, du kurên Tewfîq hene ku navê yekî Salih û navê yê din jî Elîcan e û malbata wan li herêmê eşîreke navdar e (2009: 17). Jixwe di kilamê da jî navê Tewfîq derbas nabe şûna wî îfadeya “Bavê Salih” tê bikaranîn. Her çiqas di gelek kilaman da mêranî û lehengiya Seyîdxan zêdetir derkeve pêş jî Tewfîq jî têra xwe şervan û mêrxasek e ku dema Dengbêj Reso pesnê şervanên Kurd dide der barê wî da jî wiha dibêje:

“Ji êvar da bidim yek bi yek medhê mêran e:  
 Rizakî heye, qisasê serê mêran e  
 Tewfîq, qaçaxê siyasetê serê çîyan e  
 Ji qanûna me hemû dizane  
 ....  
 Îro ji Bostankendê ji Seyîda dudu man e  
 Yek Tewfîq û yek Seydxan e  
 Seydxan jarîya maran e, teyyarê mêran e” (Dît, 2007)

Di gelek kilaman da jinek bangî jinekê dike û dibêje porkurê filankes hela rabe, şiyar be, binihêre û hwd ku di vê kilamê da jî em vê kodên çanda kurdî dibînin. Lewra li vir jî Hedo ji Têlo ra dibêje rebenê şerek çêdibe, egîdê mala bavê wê gulîbirê “Bavê Salih” yanê Tewfîqê ku Reso jî pesnê wî li jor daye li welatê xerîb û xerîbistanê (di nav eşîra Xiya da) bê piştîmêr di kesiriyê da maye û di eşîrê da mêr nemane (hêrs dibe û mêran biçûk dibîne) ku cawê bidin Seyîdxanê Kerr (Bavê Sulhedîn) ku ew bê hewara birayê xwe. Dema em berê xwe didin kilamê em dibînin du jin bangî hev dikin û ji xwe ra dibêjin “ez reben im” û “gulîbir im”. Der barê şexsê Hedo û Têlo da dubendiyek heye ku aliyek dibêje ew ji malbata Seyîdan in, aliyê din jî dibêje ew ji malbata Berazan yanê ji malbata Elîcan in. Ji ber vê dubendiyê divê ez behsa herdu çavkaniyên xwe bikim ku der barê Hedo û Têlo da rewşeke zelal derkeve holê.

Li gor gotina Ahmet Aras Hedo û Têlo ji malbata Elîcan ango eşîra Berazan in. Aras vê gotina xwe jî wiha saxlem dike û dibêje ev kilam ji hêla Dengbêj Mistefayê Xellê Heyran va hatiye gotin û paşê Dengbêj Reso gotiye û wisa wisa gihîştîye

Dengbêj Şakiro. Li gor agahiya Aras Dengbêj Mistefa malbata Elîcan gelekî baş nas dike ji ber wê di kilamanên xwe da behsa qîz, bûk û hemû malbatê dike. Heta wisa ku ji ber vê Seyîdxan ji Dengbêj Mistefa ra dibêje ew çima zêdetir behsa eşîra Elîcan dike û kêmbê behsa eşîra Seyîdan dike. Li ser vê rexne û dilmayîna Seyîdxan, Dengbêj Mistefa dibêje ji ber ku ew wê malbatê heta pisîka li ber derê mala wan jî baş nas dike ji ber wê zêdetir behsa wan dike (Ahmet Aras, Pêwendiya tîlefônî, 25ê Îlona 2021ê) Wek encam Aras dibêje ji ber van agahiyan em dikarin bibêjin herdu jin ji malbata Elîcan in.

Li gor agahiya Ömer Güneş jî, Hedo jina Seyîdxan yanê jinbira Tewfîq e, Têlo jî ji malbata Berazan e. Ji ber ku wê kilamê Dengbêj Reso jî dibêje li wir Dîdarê bangî Hedo dike. Yanê şûna Têlo navê Dîdarê derbas dibe ku Güneş dibêje Dîdar jî biraziya Seyîdxan yanê qîza Derwêş e û heta wisa ku ew jî beşdarî şer bûye, paşê ew û birayê xwe Mistê hatine kuştin (Ömer Güneş, Pêwendiya tîlefônî, 25ê Îlona 2021ê). Ferhat Çakîyê neviyê Seyîdxan jî wê agahiyê piştrast dike û li gor agahiya wî Hedo jina Seyîdxan e (Ferhat Çakî, Pêwendiya tîlefônî, 3yê Mijdara 2021ê).

Piştî van hemû nîqaş û dubendiyan tiştê ku divê bê gotin ew e ku eşîra Seyîdan û Berazan ji ber ku bi hev ra tevgeriyane, hêzên xwe kirine yek û ji hêla polîtîk va wê serhildana herêmî kirine, jinên herdu malbatan jî xwedî heman êş û janê ne. Lewra ha ji malbata Seyîdan û ha jî ji malbata Berazan ji hêla êşê va tu ferq tune ye û jinên wan dikarin di heman kilamê da bangî hev bikin, an jî ji heman malbatê du jin jî dikarin bangî hev bikin û êşa hev parve bikin. Ji ber vê ye ku ji ber kuştina Tewfîq Hedo şînê digire, dike hewar û fixan û ji xwe ra dibêje ew reben û gulîbir e. Hedo û Têlo dibêjin ew reben in, yanî êdî belengaz in, stûxwar in û xemgîn in, lewra egîdê mala bavê wan Tewfîq hatiye kuştin. Ew bi van îfadeyan va mirina xwe didin şûna mirina Bavê Salih, dixwazin ji bo wî xwe feda û qurban dîkin. Piştî îfadeya “reben im”ê îja Hedo ji xwe ra dibêje “gulîbir” ku ji bilî gulîbirê îfadeyên “porkur”, “kezîkur” û “serkur”ê jî di gelek kilaman da rastî me tên. Ev çanda kurdî ya resen wek metafor paşê ji gelek aliyan va wê kûr û dûr bê şîrovekirin.

Piştî wê destpêka kilamê, dema em bala xwe didin dewamiya kilamê em dibînin ku şerê Tewfîq û yê li hemberî wî wek mekan li gor gotina dengbêj li devera Çemê Xezaliyê, li ser Pira Batmanê û li Gura Seyîda yanê li herêma Xerzan çêdibe. Wek cih û war ev der di nav sînorên axa ku Kurd lê dijîn da ye û ne mekanekî xerîb e. Li gor rêzikên kilamê Bavê Salih Tewfîq ji malê siwar dibe û bi sonda qesemê sond dixwe



ku ew heta neyê kuştin venagere. Wek formeke kurdî îfadeya “bavê filankesê” di vê kilamê da jî xwe nîşan dide. Di nav kilamên Şakiro da bi dehan kilamên wiha hene ku ew mêrên di naveroka kilamê da behsa wan tê kirin bi navê kurê xwe tên nasîn. Li vir jî jina ku kilamê dibêje nabêje Tewfîq, şûna wê dibêje “Bavê Salih” û navê kurê wî bi lêv dike. Diyar e ku Bavê Salih sond xwariye û ew ê şer bike û heta di şer da bi ser nekeve yan jî neyê kuştin ew ji rêya xwe venagere.

Di kilamê da şerê di navbera wan da çêbûye wek beşên filmekê li ber çavê me diherike. Lewra herdu alî li hev sor bûne, heta mêr neyên kuştin ewê nesekinin. Bi rêzikên kilamê va em dizanin ku êdî şerê wan dest pê kiriye, gule û barûd hatine berdan û Bavê Salih li wî welatê xerîb yanê di nav eşîra Xiya da ketiye ax û zarê. Li gor gotinên kilamê ew tengasiyê dikşîne û divê Seyîdxanê bira an jî hin kesên din bigihêjin hewara wî û ji wî ra bibin berpâl û piştîmêr. Em rewşa wî di van rêzikan da bi zelalî dibînin;

“...dengê tivinga li ser serê egîtê mala bavê min nemayê nalenal e kalekal

e

gava li Bavê Salih dibû pêsîrtengiya di mêra

keskî xwedanxêr tunîne ji gavê din da

cuwabekî bide li Binxetê li ba Bavê Sulhedîn birayê dilşewitî

bi Tirkî nizanim bi Kurmancî leqeba wî ra dibejin Seyîdxanê Kal e

bê agirê kulê bikeve **Mala Emerê Mihê**, lawê Perîxanê

**Eşîra Xiya, giregirê Badika**

derbekî bi dest berdane bedena Bavê Salih peyayê **Mala Îsivê Seydo**

sêr bike gelo vê sibengê eşîr nemane malxirabo di eşîra da mêr nemane

keskî xwedanxêr tune bi orta çapiliyê xwe bigre

li meydanê ji peyayê mala bavê mi ra bibi balgîf û berpâl e...” (Güneş-

Şahin, 2018: 103)

Li vir îfadeya “egîtê mala bavê min” û “peyayê Mala Îsivê Seydo” nîşan dide ku Tewfîq têra xwe egîd û mêrxasek e, li ber çavê malbatê mêrekî ji ser mêran ra ye, qedir û qîmeta wî jî gelekî zêde ye. Di vê keliyê da divê em hinekî behsa van îfadeyên di kilaman da bûne qalib û her tim tên bikaranîn bikin. Ji ber ku ew reng û dengê çanda kurdî nîşan didin û wek metafor balê dikşînin divê bên behskirin. Ev îfade û versiyonên wek “berxê mala bavê min”, “xortê mala bavê min”, “tayê tenê”, “peyayê mala bavê min”, “palewan” û hwd dema jin pesnê mêrên malbata xwe didin, behsa qehremanî, şervanî û wêrebûna wan dikin tên bikaranîn. Ev gotinên ji bo pesindayîne gelemperî

di stranên şer, qehremanî û cengê da yanê wextê şervanî û wêrebûna mêran derdikeve pêş tên gotin. Ji bo zelaliya mijarê heke em ji van îfade û gotinan çend mînakên bidin di kilama Dengbêj Şakiro ya “Hemê Mûsekî” da wiha tê gotin:

“Ax de wêl wêl wêl

Heya dinya xweş ava **be piştî egîtê mala bavê min** nemayê

Gelo ezê ji xwe ra bikim axîne” (Yıldız-Taşkın, 2018: 217).

Di kilameke din a Dengbêj Şakiro ya “Her Sê Makûmê Sîwerekê” da jî du îfadeyên bi vî rengî hatine bikaranîn hene ku diyar e ew jî ji devê jinekê hatine gotin. Di rêzikên kilamê da Şakiro wiha dibêje:

“Ji êvara Xwedê da ca bi reş im lo bi heş im

Hûn nizanin ji boy **her sê egîtê mala bavê xwe** nemayê

....

Tu hêlîna xwe li Sîwerekê şewitî Qeregêçî mehlesî

Ser Ûlu Camiyê minara tewra jorîn çê kî

Wele çavê min nabîne **xortê mala bavê min**

Serserekê xortê pir cindî ne...” (Yıldız-Taşkın, 2018: 252).

Ev mînakên li ser mêranî, wêrekî û egîdiya ji bo mêran tên gotin di gelek kilamên din da jî derbas dibûn ku ji wan yek jî kilama “Hemedê Elî Begê Kekê Zahido Siwarê Tîran” e. Wek ku di serenava kilamê da jî tê dîtin Hemedê Elî Begê wek Kekê Zahido û siwarê hespa xwe yanê Tîran va tê nasandin. Di vê kilamê da çend rêzikên li dû hev tên balê dikşînin. Yek “berxê ber malê”, ya din “Egîtê mala bavê te” û ya din jî “Heftsaliya xwe da” ye. Ev her sê hevok jî mêranî, cengawerî, şervanî û wêrekiya kesê ku behsa wî tê kirin nîşan didin. Şakiro wiha dibêje:

“Metê marûmê Mihemedê Elî Begê ye

**Berxê ber malê** ye

Ezraîlê kulê melekê mewtê ye

Bi rojê li çiyê ye; bi şevê li deştê ye

Erê metê marûmê tu nizanî

**Egîtê mala bavê te** rabûye ranebûye

Heftsaliya xwe da qesasê ser mêrê çê ye...” (Yıldız-Taşkın, 2018: 303-

304).

Der barê “Hemedê Elî Begê” (Mehmedê Elî Begê) neviyê Hecî Ûsiv Paşayê serokê eşîra Sîpkan û çîroka vê kilamê da Aras agahiyên berfireh dide ku ew kesekî şerûd bûye, dema diçe şer cil û bergên spî li xwe dikir ku sembola kefenê spî bû û

meneya wê jî yan ewê kesên li hemberî xwe bikuje an jî wê were kuştin. Jixwe ji ber ku mêrê meta xwe û kurên wî dikuje meta wî jî dek û dolabekê li serê wî dike, dibêje bila bê malê ew ê wî efû bike, lê du kurên xwe yê kerr û lal li pişt histêrê nivînan da vedişêre, dema ew tê wî bi destên van herdu kurên xwe dide kuştin (2018: 136).

Di kilama ji bo mirina Elî Begê neviyê Kor Huseyn Paşa da jî îfadeyên “torinê Mala Paşê beranek ji beranê pezkoviya”, “axa”, “maqûl, “efendî” û “berxê mala Kor Huseyn Paşa” hatine bikaranîn;

“Xelkê winda kiriye tek û tûk e min ê winda kiriye Bavê Elî

Kekê Îsê siwarê Seyro

Tu sêr bike torinê mala Paşê beranek ji beranê pezkoviya

...

Nemînim nemînim ji siwara ji peyara nemînim

Ji axa ra vê sibengê nemînim ji efendiya ra nemînim

Ji maqûla ra

Vê sibengê ji berxê mala Kor Huseyn Paşa ra ha hî ahî” (Yıldız-Taşkın,

2018: 375).

Di kilama “Bavê Evdila” da jî gotinên bi vî rengî hene ku balê dikşînin. Kilam ji devê jinekê li ser kuştina mêrekî hatiye gotin. Di kilamê da pesindayîna mêr û merxasiyê heye û kesê hatiye kuştin wek “gula civata”, “berdevkê mîran û hakima” û “berxê mala Hecî Temir Axa” tê teswîrkirin:

“Li birayê min derketin vê subengê çewa nazêkê di xorta

Gula civata berdevkê mîran û hakima

Kinê mêra gelo vê subengê berxê mala Hecî Temir Axa vê

Subengê dikuştin” (Yıldız-Taşkın, 2018: 369).

Piştî van mînanan heke em dîsa berê xwe bidin kilamê jina ku kilamê dibêje dixwaze bîne ziman ku mêrekî evqas camêr û qehreman (Tewfîq) çawa dibe ku di şerekî wiha giran da tenê maye û tu kes piştîmêriya wî nake. Ew balê dikşîne ser bêçaretî û tenêmayîna Tewfîq û dibêje “keskî xwedanxêr tunîne cuwabekî bide Seyîdxan”. Di gotina “keskî xwedanê xêra tune” da hesta gilî û gazîne, neçariyê û bêçaretîyê xwe dide der. Lewra egîdê wan di nav rewşeke xirab û tengizî da ye. Destê wan nagihêje egîdê mala bavê wan û divê hinek herin hewara wî, alîkariyê bikin û wî ji vê rewşa xirab xilas bikin. Di vê îfadeyê da ji kesên din medet û çareyek tê hêvîkirin ku ew cawê bidin Seyîdxan ku ew here hewara wî.

Îfadeyeke din jî di kilamê da hatiye bikaranîn ku ew jî “agirê kulê bikeve Mala Emerê Mihê, lawê Perîxanê” ye. Ev gotina “agirê kulê bikeve mala filankesê” hin kilamên din da jî derbas dibe ku cureyek nifir e. Hestên hêrsbûnê, bêçaretîyê, tolhildanê û hwd di xwe da dihewîne. Çima wisa hatiye gotin dema em lê dinihêrin, em têdigihêjin ku ev malbat û eşîrên navên wan tê gotin derbekî dest berdane Bavê Salih û ew kuştine, ji ber vê divê ev nifir jî li wan bigire û dilê kesê ku vê nifirê dike rehet bibe.

Dema Tewfîq tê kuştin serê wî tê jêkirin, lewra dewlet serê wî dixwaze. Li gor agahiya Kalê Sidqî (kesê ji eşîra Xiya yê ku Adnan Çelik pê ra hevpeyvîn kiriye), porê Tewfîq dirêj bûye û dema ji wî tê pirsîn ka ew çima porê xwe dirêj dike Tewfîq dibêje wexta yekî pîs serê wî jêke qe nebe destê xwe bavêje porê wî û wisa serê wî jê bike (Çelik, 2015: 190, 193). Bi nêrîna îroyîn dema em li mijarê binihêrin serjêkirina însanekî bi rastî jî tevgerê “hovane” ye, lê di şerên wê demê da ev wek tiştêkî ji rêzê tê qebûl kirin. Lewra di gelek şer û pevçûnan da serê mêran tî jêkirin, ew li ser stûn, dar, keleh, dîwar an jî kevirêkî bi rojan tî pêşandan û helbet sedemên vê jî hene. Serî ji laş jêkirin hem tolhildanek e, hem nîşaneyê serketinê ye û hem jî ji bo yê li dû mane dersdayîn û çavtirsandin e. Lewra serî sembola nîşaneyê desthilatîyê, serfirazîyê û serînetewandinê ye. Ji bo ku bê nîşandan kesê tîk hatiye birîn êdî ji holê hatiye rakirin bila êdî behsa wî neyê kirin, nîşandana hêz û otorîteya şexsî yan fermî ye. Ya duduyan jî ji bo tirs û xof di dilê kesên din da peyda bibe ku ew jî hewl nedin serî ranekin, dijminatîyê nekin û dernekevin pêşberî kesê ku ev serî jêkiriye. Yanê bi serjêkirinê an jî îdamkirinê va tê gotin ku fikra ku dihat şopandin û ji bo wê serî dihat hildan êdî ji holê hatiye rakirin.

Li gor agahiyên Aras dide piştî kuştina Tewfîq ji firaran 18 kes dimînin û ew jî ji hev belav dibin ku derbasî Sûriyeyê bibin. Fesîhê hevalê Tewfîq yê der barê şer û serhildanan da gelek agahiyên dide jî piştî gelek serpêhatiyên balkêş xwe digihîne Sûriyeyê (2009: 124). Her çiqas kilama “Ez Reben im” behsa kuştina Tewfîq bike jî xaleke din a balê dikşîne jî ew e ku bi saya vê kilamê em dikarin dawîhatina serhildanên Kurdan, tîkçûyîna wan, zor û zexta dewletê ya li ser kesên serî hildane meşandiye, belengaziya firaran ya ku ew ji cih û warên xwe dûr ketine û nikaribûne êdî li ser axa xwe (di nav eşîreke Kurd da) di nav êl û eşîrên cînar da bihewin baş bibînin. Lewra êdî qîmeta mêranî û şervaniyê namîne, ew çiqas jîr û jêhatî bin jî ji ber gelek sedemên wek hêza dewletê li gor wan zêdetir xurt e, kêmasiya çek û cebilxaneyê

heye, hin eşîr piştgiriya dewletê dikin û wek milîs dixebitin, rê û dirb hin caran ji ber sermayê û hin caran jî ji ber germê tengasiyê dide kişandin, xwarin, xurek, hesp, cil û berg têra xwe tune û hwd ew zû yan jî dereng têk diçin. Yanê ev serhildana dorteng ya Seyîdan û Berazan ya ku piştî Komkujiya Geliyê Zîlan dest pê kiriye bi kuştina Seyîdxan, Elîcan û Tewfîq va tê tepisandin, ev bûyer û ew kesên behsa wan tînin kirin jî bi saya kilamê di bîra civakî ya kurdî da navê xwe diparêzin.

#### **3.3.3.4. Şerekî Birakujiyê ya Li Ser Kejikê: Kilama “Dêran”**

Di civaka Kurd da şer û pevçûnên di navbera malbat eşîran da gelek in û yek ji wan jî “Şerê Kejik”ê ye. Ev şer di navbera Mala Emerîyan û Şewêşîyan da çêbûye û wek şerekî birakujiyê jî dibe bê nîrxandin, lewra herdu malbat jî wek binemal bi çend bavan va digihêjin eşîra Hesenan. Li gor gotina Ahmet Aras di sala 1890î da Emerî, Eshedî û Farizî dibin yek û diçin gundê Kejikê ya li ser Qereyaziya navçeya Erziromê û bi Şewêşîyan ra ji bo Kejikê pev diçin û hin kes tînin kuştin (2009: 28). Lê li gor agahiya Dengbêj Sebriyê Agirî dide jî tenê Emerî û Şewêşî pev diçin, yê din (Eshedî û Farizî) piştgiriya wan nakin (Sebriyê Agirî, Pêwendîya tîlefônî, 19ê Gulana 2022yan). Di van agahiyên Aras û Agirî da her çiqas dubendiyek hebe jî, xala hevpar ev e ku Emerî û Şewêşîyan dijî hev şer kirine, şerê wanê mezin bûye sedema kuştina mîrên malbatê û ev trajediya mezin bi saya kilama dengbêjan gihîştîye heta îro û di bîra civakê da cih girtiye. Dema em berê xwe didin vê pevçûna wan li gor Aras (2009: 28-29) bûyer wiha çêbûye:

Eshedê Xalid ku ji apê xwe Sofî Paşa dixeyide diçe di Kejik da bi cîh dibe. Ji Siwêşîyan Hesênê Ecem ji Eshed ra dibêje; "Îlla tu yê mala xwe wekî ku te çawa anîye tu yê wusa barkî û derkevî." Eshed dibêje; "Bihêlin ez vê zivistanê li vir derbaskim, bi biharê ra ezê barkim û herim." Hesênê Ecem merivekî bîhteng bûye. Daxwaza Eshed qebûl nake. Li ser wê birayê Eshed Fethulla û Riza tevî Eshedî û Farizîyan êrîşê tînin ser Kejik. Rizayê Xalid di serî da birîndar dibe, şer nake. Wanên din lê dixin Hesênê Ecem, birayê wî Huseyîn û kurê wî Hemzo dikûjin. Birayê Hesên Mîrze (Kalikê Fesîh) li cîhekî din bûye. Wexta ku xeberê didinê, ew jî diçe Kejik lê dixê ji Emerîyan Esed (Esedê Xalid) ji Farizîyan Metoyê Fariz, ji Eshedîyan jî du kurê Mistefayê Cindî dikûje. Serê wana bi wî karî xilas dibe. Li gor gotina Mihemedê Qancîyan ji Berazan jî hinek kes çûne

Kejik şerê wana temaşe kirine. Ser gava ku kêş û vês dibe, yekî Berazî ji para va gulleki berî Mîrze dide û wî dikûje.

Dîsa li gor agahiyên Aras (2009: 29) dide Gulêya jina Esedê Xêlid vê kilama ku behsa bûyereke trajîk dike gotiye. Lê li gor Dengbêj Sebriyê Agirî her çiqas kilam wek ku devê jinekê hatibe gotin jî Dengbêj Zeynelê Kor ev kilam gotiye, lewra dema kilam tê guhdarkirin terz û meqama wî di kilamê da xwe dide der (Sebriyê Agirî, Pêwendiya têlefoni, 19ê Gulana 2022yan). Her kî/kê gotibe jî di nav rêzikên kilamê da tê destnîşankirin ku ev kilam wê sibê ji hêla dengbêjan va bê gotin. Lewra di kilamê da îfadeyeke wiha heye “*dengbêjê sibê bikin kilam û meqam*”. Dema kilam tê guhdarîkirin ji ber van gotinên jinane yê devê jinekê hatine bilêvkirin; “*Gulê dêranê sibe ye dilê mi gulîbira Xwedê*”, “*Lê lê Gulê Fatimê rebenê sibe ye Kejikê wêran bişewite*”, “*peyayê mala bavê mi gulîbirê*”, “*her sê egîtê mala bavê mi rebena Xwedê nexîne reben ez im*” û “*Hedê digo Gulê rebenê tu rabe emê serê xwe kurr kin bi heft gûzan û donzdeh kêra*” tê dîtin ku dîsa mêran hevdu kuştine û şîngirtina wan jî ketiye li ser milê jinan. Jin dîsa reben in, gulîbir in û ji bo şîna mêr û egîdên hatine kuştin serê xwe bi heft gûz û donzdeh kêran va kurr dikin. Kilam bi teswîrkirina gundê Kejikê û gundên li der û dorê Colava (wek Corovan hatiye deşîfrekirin), Delo Elo, Girecîrn û Hesnavayê dest pê dike. Kejika li ser zinaran e, ji hêla siruştê va wek donzdeh tîş li ser şax vedidin cihekî xweş e, lê ji ber vî şerê xirab tê gotin ku ew bişewite û wêran bibe:

“Erî dêran were dêran dêran... hey wayê  
Gulê dêranê Kejikê wêran bişewite li zinêr e  
wa li zinêr e hey wayê  
ava Corovanî kivil, Delo Elo, Girecîrnê wêran, Hesnavayê  
bi donzdeh tîşa bi ser da şax vedaye  
îro ji êvar da himî xar e himî nêr e hey wayê  
mi dî sê siwar siwar bûne ji Milazgira tewra jêre  
siwarê pêşîn Esedî Xêlit e  
siwarî selefî siwara Fetula ye  
siwarê li dawiyê dajo çûyîn çûyîna Gêjo ye  
şêl û pêla Têlî Reşkal Riza ye  
sewta wî sewta kewî nêr e hey wayê  
Hemzoyê Hesên bi sê denga bang dikirî  
go Rizakê ez bi qurban tu nizanî Kejik ji berê di paş da

mexelê pezê meyî nêr e hey wayê  
 Riza bi sê denga li Esed û Fetulah kirî gazî  
 go em îro ji ber koma Şewêşiya bikişin  
 Mistefayê Cindiyê Eshediya bi Hesên Paşayê Eshediyê neyar e  
 emê sibê li Milazgira jêrê  
 çî bidin cuwab apê xweyî Têlî Reşkali Mistefayî kalemêr e  
 gere em qira Şewêşiya biqelînin  
 bûkê serbixêlî ser malê bava da vegeînin  
 herkes ji xwe ra bi destê qîzê xwe bigire bide mêr e hey wayê  
 dêran dêran dêran...  
 dêrana Esed û Fetulah Riza  
 hersê siwarê mala bavê xwe bi tenê me hê hî bê hoy hoy (Güneş-Şahin,  
 2018: 447)

Bi îfadeyên kilamê va em têdigihêjin ku sê siwarên ji Esedê Xêlid, Fetula û Têlî Reşkal Riza pêk tên ji Milazgirê rê dikevin ku herin Kejikê ku qira Şewêşiyên bînin. Ji bo pesnê jêhatîbûn, wêrebûn û şerkariya siwaran (sê birayên hev yê kurê Xêlid in) bê dayîn îfadeyên wek *“fenanî ba ne”*, *“sê gurên xwedayî ne”*, *“dil û cegeerê xwe guven in”* û *“navê xwe qeyd kirin dosyayê hukumetê derbas kirin nav duwala”* hatine gotin. Siwarên ji Milazgirê rê ketine ku herin Kejikê vî gundî wek milkê kal û bavên xwe dibînin. Bi van gotinan *“Kejik ji berê da mexelê pezê bavê bava ye”* û *“Rizakê ez bi qurban tu nizanî Kejik ji berê di paş da mexelê pezê meyî nêr e hey wayê”* va dixwazin vî gundê ku wek yê kal û bavên xwe dihesibînin ji destê Şewêşiyên hildin.

Îfadeyeke hişk ji bo kuştina Şewêşiyên heye ku di kilamê da tê gotin divê qira wan bê (koka wan bê qelandin), *bûkên wan ên ser bixêlî ji ber ku wê bê mêr bimînin vegeînin mala bavên xwe û her kes destê qîzên xwe bigre û bide mêr*. Ev neyartî, dijminatî û nefreta hişk eşîrek dijî eşîreke din nîşan dide ji bo civaka Kurd ne tiştêkî ecêb e, lewra ji berê va dijminatî û neyartiyeke mezin di nav gelek malbat û eşîran da çêbûye, bi salan wan mêrên hevdu kuştine. Di gelek kilamên din da jî Kurdan ji ber sedemên biçûk qira hevdu anîne û tundiya ku divê nîşanî dijminên xwe yê rastîn bidin nîşanî hevdu dane û bûne sedema trajediyên mezin. Kilama ku bi pesnê Esed, Fetula û Riza va dest pê kiribû îja vê carê vedigere ser endamekî ji malbata Şewêşiyên û ew dibêje ku divê herdu bira bînin kuştin û Esed jî dîl bê girtin ku şewata binê sêlê ji diya wan ra bîne. Hemzoyê Hesên yê ji eşîra Şewêşiyên ra wiha dibêje:

"...tu ba xwe bidê Hemzoyê Hesên  
 bi sê denga li koma Şewêşiya kir qêrîne  
 emê go Riza û Fetula bikujin, Esedî Xêlît dîl bigirin  
 bira ji dayê ra şewata sêlê bîne hey wayê  
 bûka malê serê xwe bilind kir ji xewa şêrîne  
 go metê marûmê eyb e  
 merû di mala xwe da xeyba mêrê camêr nake  
 egîtê mala bavê mi bi dil û cîgerê xwe guven in  
 peyayê ji dayê ra şewata sêlê bîne ji wan peya nîne hey wayê  
 metê marûmê peyayê mala bavê mi gulîbirê  
 mêrê tu li meydanê berdî şêra  
 xwe bidî dîhara lê bikî guhdar û sêra  
 tu bala xwe bidê herçî hespê li meydanê têne nava mala  
 ez ji te ra sond bixwim zînê vala, zengû bi xwîn e hey wayê  
 peyayê mala bavê mi gulîbirê  
 xênc ji xulama kuştine peyayê bi nav û nîşan  
 Hesên û Husên, Elî û Mihemed  
 Hemzo zavayê teze dîl girtine  
 daxistin Milazgira tewra di jêrîn e reben ez im  
 dengbêjê sibê bikin kilam û meqam  
 li civatê mîran û hakima rûnên  
 êvara Xwedê da ji xwe ra li hevduvegerînin hey wayê  
 dêran dêran dêran...  
 dêrana Esed û Fetulah, Riza  
 her sê siwarê mala bavê xwe bi tenê me, bê hoy hoy  
 Erî dêran dêran dêran... hey wayê" (Güneş-Şahin, 2018: 449)

Wextê Hemzoyê Hesên ji bo biçûkxistinê û bêqîmetkirinê wê gotinê dibêje ku Riza û Fetula bikujin û Esedê Xêlît dîl bigirin ku bila ew ji diya wan ra şewata binê sêlê tê şewitandin bîne, bûka malê vê gotinê qebûl nake serê xwe bilind dike û dibêje ew ne mêrên wisa ne ku ev gotin ji bo wan bîlêvkirin. Ew mêrên camêr in, wek mêrên gurçikpola ji bo şer ji dil û cegerê xwe bawer in (guven in - peyveke tirkî ye) û ne mêrên wisa ne ku hûn wan dîl bigirin û ji bo anîna şewatê wan bi kar bînin. Ji hêla gotin, mene û hunerê va bi rastî jî îfadeyên balkêş di kilamê da hatine bikaranîn ku ev jî dewlemendiya ziman nîşan dide.

"...Hedê digo Gulê rebenê tu rabe



emê serê xwe kurr kin bi heft gûzan û donzdeh kêra  
çawa cuwabkî nebxêrê hatî dibê li Kejîkî wêran  
Mala Emer, Mala Şewêş li hev anîne qira şêran û mêra  
he hû bê ho oy oy. (Güneş-Şahin, 2018: 450)

Kilam bi van risteyan diqede, lê dema dawî dibe dîsa jinên malbatê Hedê û Gulê bi peyva “rebenê” bangî hev dikin û dibêjin ew ê porê xwe kur bikin bi gûzan û donzdeh kêran. Çima reben in û porê xwe kur dikin? Lewra herdu malbatan mêr ji hevdu kuştine û qira hevdu anîne.

### **3.3.4. JI BO TOLHILDANÊ CEZAYEK: SIRGÛN**

Sirgûn, nefîkirin an miştexî hemû jî di kurdî da tên heman meneyê ku kesek an jî komek an bi darê zorê an jî bi mecburî ji welat û axa ku lê dijîn tên dûrxistin. Hema bibêje gelek malbat, eşîr û navdarên Kurd rastî vê yekê hatine û hê jî tên. Sirgûna ku di navenda wê da pasîfîzekirin û kedîkirin heye di dîrokê da bûye para gelek şexs û miletan. Ji ber ku xebata me li ser Kurdan e sirgûnkirina Seîdê Kurdî, sirgûnkirina malbata Bedirxaniyan, malbata Şêx Seîd û malbatên Kurdên Anatolyaya navîn, dikarin wek mînakên sereke bîn dayîn. Kesên hatine sirgûnkirin her çiqas li wan deran zehmetî û perîşanî kişandibin jî ji hêlekê va jî neteweperweriya xwe parastine û xebatên xwe dîsa meşandine. Der barê vê mijarê da Bruinessen piştî balkişandina sirgûnkirina Kurdan dibêje di navbera sirgûn û neteweperweriyê da têkiliyeke nêzîk heye, jiyana sirgûnê perçeyekî dîroka neteweperweriya Kurdan ne ku neteweperwerî ava kiriye û mînakên rojnameyên kurdî yên li Qahire û Stenbolê hatine weşandin, rêxistinên Kurd ên li Ewropayê hatine avakirin û siyaseta li dîasporayê tê meşandin dide (2009: 181-193).

Dema em hin mekanên sirgûnê dinihêrin ew wek bajarê Stenbol, Isparta, Konya, Gîrît, Samsun û hwd tên pêşberî me. Em dibînin ku ev der ji bo kesên bi darê zorê hatine şandin cihên xerîb û nenas in. Li van deran zimanekî din tê axaftin (tirkî û zimanên din), çandê cuda li van deran heye, çûyîn û hatin, xwarin û vexwerin her tişt gelekî cuda ye. Bi kurtasî jiyana van bajarên Kurd hatine sirgûnkirin ji serî heta binî xerîb û cuda ye.

Sirgûn her tim bi darê zorê pêk nayê helbet, cureyên wê hene ku ew wek sirgûniya bidilî, sirgûniya derûnî, sirgûniya şexsî û sirgûniya komî dibe bîn rêzîkirin (Yeşilmen, 2014: 19). Sirgûniya bidilî ew e ku kesek bi xwe yanî bi zanetî cih û warê

lê dijî ji ber sedemên siyasî, aborî, malbatî, tunebûna mafên mirovan û demokrasiyê terk dike, xwe dispêre bajar û welatên din. Di nav Kurdistan da dema behsa sirgûnê bê kirin Swêd û paytexta wê Stockholm, hin welatên Ewropayê yên wek Almanya, Fransa û Belçîka mekanên sereke ne ku gelek kes çûne wir. Lê ferqa vê sirgûnê û ya li me jorê behs kir ew e ku kesên çûne vir ji ber ku bi xwe çûne bêtir ziman û nasnameya xwe xwedî derketine û bîra civakî parastine. Ji ber ku rewşa jiyane bi hin aliyan va li vir hêsantir e, sansûr kêr e an jî qet tune meriv li ser xebat û jiyana xwe zêdetir hûr bûne. Ji bo civaka Kurd gelek nivîskar û rewşenbîrên navdar ji wan kesên çûne sirgûnê derketine mînak; Mehmed Uzun, Zinarê Xamo, Murad Ciwan, Reşo Zilan, Firat Cewerî, Mustafa Aydoğan, Fawaz Husên, Helîm Yûsiv û hwd.

Di beşa ewil a xebatê da bi hûrgilî behsa vê mijarê hatibû kirin, ji ber vê em ê agahiyan dîsa dubare nekin. Lê sirgûna ku em zêdetir dixwazin behs bikin ya di kilaman da derbas dibe yanê sirgûna bi darê zorê ye, bê dilî ye û ji nişkê va ji ber hin sedeman derdikeve pêşberî Kurdistan. Ev jî gelemperî piştî serhildanan, nedana bacê ya dewletê, neçûyîna eskeriyê, kuştina endamên hin eşîran an nijadan çêdibe. Di nav kilamên Dengbêj Şakiro da ya ku em dikarin ji bo vê mijarê mînak bidin jê yek kilama “Kekê Xiyasedîn” e. Ev kilam behsa girtina Şêx Seîd, têkçûna serhildanê û cezakirina serhildêran dike ku li vir mijara kesên hatine sirgûnkirin (nefi) jî derbas dibe. Mînak di van rêzikên kilamê da behsa kelemçekirina destê Şêx Seîd û rêhevalên wî tê kirin:

“...Bi destê kekê Xiyasedîn digirtin kelemçe dikirin

Dane pêşiya cotê cendurmê sungûlî ne

**Berê wî dane Enqerê Horgofê nava hezar û pêncsed mêrê di mefine**

Feleka malixirab lema keleka dînê Îslamê weldigerîne

Xoce Elyas xocê cumhûretê

Rûniştî li Enqera rengînê

Têl li ser têtê li Şêx Elî Riza ra dişîne lo oy oy

Dibê rabin kilîtan li derê hucran û camiyan û medresa bixîne

Tu nizanî li piştî kekê Xiyasedîn

Qanûna me bû qanûna Nîgalo duwalê ecnebîne (Güneş-Şahin, 2018: 57-

58)

Çaxê ku kilam tê guhdarîkirin tê fêmkirin ku serhildan têk çûye, destê Şêx Seîd û yên piştgiriya wî kirine hatine kelemçekirin, ji bo cezakirine berê wan dane Enqereyê û hezar û pêncsed kes jî ji bo bîna sirgûnkirin hatine hilbijartin. Helbet ev hejmara hezar û pêncsedê hejmareke sembolîk e, di çend kilaman da jî bi vê versiyonê hatiye vegotin.

Mijara ku bal tê kişandin ew e ku ji bo bê îfadekirin ka çiqas zêde însan bi sirgûnê va hatine cezakirin. Di dewama kilamê da wiha tê gotin:

“Hela tu rabê emê bi destê hevdu bigirin xwe berdine bajara Diyarbekir  
Li ser tirba Şêx Şemsedîne  
**Belkî ji ba Xwedê da ricaçî be efya van mefiya derîne**  
Fezîle bûka sê mehan e  
Bira çavê wê li rê û dirba nemîne lê hê  
Lê bira tu gula şêxan î bira  
Piçûkê biran î bira  
Xûlyê di şewqan î bira  
Hêsîr û dilê Misto Kemal qanûna ters e giran î bira  
Welatê xerîbê derdê pûçê bê derman î lo bira  
Hela bala xwe bidê heya dunya xweş ava be  
keder û keser û meraqa me hemyan î  
lo oy lo bê hoy oy oy (Güneş-Şahin, 2018: 57-58)

Di vê hevoka ewil a jor da jî tê gotin ew ê destê hevdu bigirin, herin ser tirba Şêx Şemsedîn (li Diyarbekirê ye) ku bila ew diayan bike, li cem Xwedê ricayê bike ku ev kesên hatine cezakirin û sirgûnkirin ji hêla dewletê va bîn efûkirin. Referansên dîni di kilamê da gelek in ku ev jî ji wan yek e. Hin bawermendên Kurd dema ji mezin, rûspî, şêx û melayan ji bo xwe û hezkiriyên xwe diayan dixwazin di dilê xwe da dibêjin li ser xatirê wan dibe ku Xwedê diayên wan qebûl bike. Ji ber vê, ji wan kesan diayan dixwazin û li vir jî bi vê hişmendiye wisa hatiye gotin. Helbet wek ku tê zanîn piştî serhildanê gelek kes hatine îdamkirin, hepiskirin û nefîkirin ku şopên wan di dîrokê da mane. Kilam ji hêlekê va rasterast der barê dîrokê û bûyerên qewimî da agahiyan dide guhdaran.

Her çiqas di kilamê da bê gotin ji bo efûkirina wan ew ê dia bikin jî, em dizanin gelek malbat hatine nefîkirin, li wan bajarên xerîb û nenas gelek tengasî û zehmetî kişandine. Di vê xalê da heke em hinekî behsa nefîkirinê û kesên nefî bûne bikin meriv di rûyê kesên hatine sirgûnkirin da dikare mohra biyanîbûnê bibîne, her yek qelîşteken li ser eniyên wan û dora çavên wan hesta xerîbiyê, tenêtiyê û biyanîbûnê xwe dide der. Herî zêde jî ew çavên bi xemgînî dinihêrin û dilê wanê şikestî rewşa wan a nebaş nîşan dide. Tirseke nevrofîk di dilê wan kesan da pêl bi pêl mezin dibe. Lewra cih û warên nenas, zimanekî biyanî, merivên xerîb ên ne ji qewm û gelê wan e çavê wan ditirsîne. Aboriyeke nebaş, çand û jiyaneke cuda vê tirsê mezin dike û dibe sedema tengezarî û

tenêtiyê. Ji bilî kesên hatine nefkîrin nîfşên ji wan malbatan tîn jî dema behsa nefkîrîna kal û bavên wan tê kirin xemgîn dibin û pêlên êş û keserê di çavên wan da jî xuya dike. Said dema dûr û dirêj behsa nefkîrîna û tesîra wê dike dibêje ew ji bo nasname û jiyaneke têr û tijîtir tecrubeyek e ku divê li hemberî wê meriv li ber xwe bide û wiha dewam dike:

“Fikra ‘bi saya nefîbûnê rizgarî’ wesfekî dînî di xwe da dihewîne, lê gelek çand, siyaset, îdeolojî, mîtolojî û kevneşopî li vê fikrê xwedî derdikevin û nefîbûn ji bo rewşeke hê baştir dibe şertekî eslî. Em vê rewşê di nefîbûna milletên beriya ku bûne dewlet da, di çîrokên pêxemberan ên wek Mûsa, Mihemed û Îsa yên beriya ku bi ser bikevin û vegerin ji malên xwe tîn nefkîrin da dibînin” (2006: 38).

Di nav kilamên Şakiro da yên ji hêla vê mijarê va balê dikşînin yek jî kilama “Bavê Baran Begê” ye ku behsa sirgûnkirina Seyfedîn Paşayê (Sevdîn) Mîrê Hezroyê tê kirin. Seyfedîn Paşa wek gelek kesên din ên ji civaka Kurd bi navê kurê xwe Baran Begê tê binavkirin. Di kilamê da ji bo pesnê wî bê dayîn bejna wî wek “zirav e gula tevî biya” tê teswîrkirin. Ev kilam li ser girtin û sirgûnkirina wî hatiye gotin ku me hûngiliyên der barê mijarê da ji neviyekî malbatê girt. Li gor agahiyên Murat Budakê yek ji neviyekî ji wê malbatê ye (Seyfedîn Paşa, kurê wî Îbrahîm, kurê wî Husnî, kurê wî jî Murad Budak) Seyfedîn Paşa di dema paşayê Osmaniyan Evdilhemîd da Mîrê Hezroyê ye û wek piştgirê wî û wezîfedarê dewleta wê demê (Alayên Hemîdiyeyê) xwedê hêz û rûmetekê ye. Lê dema di 1908an da Evdilhemîd ji text tînin xwarê û serdestiyeke nû dest pê dike, rayedarên nû yên wê demê ji ber ku ew jî wezîfedarekî ji dema Evdilhemîd yê li herêmê ye li dû wî jî dikevin.

Li gor gotina Budak, dema ji bo padişahê nû Mehmed Reşad wek bajarên din li Diyarbekirê jî merasima cilûsê tê lidarxistin, Seyfedîn Paşa jî li wir mala xwezûrê xwe li Diyarbekirê bûye. Her çiqas ji wî ra gotine derneke derva ewê te bigirin jî, ew guh nade van gotinan. Ji wan ra dibêje min evqas sal xizmeta dewletê kiriye ewê çima min bigirin û diçe beşdarî wê merasime dibe. Li wir esker wî digirin û di nav wê xirecirê da dema dixwaze ji dest wan xelas bibe erdê dikeve parsûyên wî dişkên û bi wî halê birîndar wî û çend kesên din Tahir Axa (kalikê Abdulkadir Aksu) û Hecî Niyazî Axa (malbata Çıkıntaş) dibin Sêwasê, li wir jî wan li keştiyê siwar dikin û dişînin Stenbolê. Niyazî Axa ji dest wan difilite li keştiyeke Fransiyan siwar dibe û demekê li wir dimîne û paşê dîsa vedigere welêt. Budak destnîşan dike ku wê demê di girtîgehê

da birîna wî derman nakin, her ku diçe rewşa wî xirabtir dibe û ji hal dikeve. Piştî demekê efûya wî tê û wî berdidin, lê ew ji ber ku gelekî nexweş e di sala 1909an da li oteleke wê demê ya li Stenbolê di nav çend rojan da wefat dike. Eqrebayên wî yên di dema 1835an da sirgûnê Edirneyê kirine û di 1865an da ji sirgûnê vegeyriyane malên xwe jê hinek wê demê li Stenbolê bûne û hinek ji ji derva hatine û wî li Goristana Karacaahmetê ya Stenbolê defin dikin. Budak dibêje gora wî hê jî li wir e û li ser Tellî İbrahîmzade Recep Bey Oğlu Seyfettin Paşa dinivîse. (Murat Budak, Pêwendiya têlefoni, 16ê Hezîrana 2022yan).

Dema em berê xwe didin kilamê ew bi gotina “Ay de mîr im loy, mîr im loy” dest pê dike ku bi vê îfadeyê em têdigihêjin dengbêj bi xemgîniyekê heyfa xwe li Bavê Baran Beg tîne, li ber wî dikeve û wiha dewam dike:

“hey la mîro bejna Bavê Baran Begê Mîrê Hezroyê zirav e gula tevî biya  
 hêşîn dike li kaviliya Hezroyê cotkaniya  
 hela bala xwe bidê mi dî li rû Axdenizê, Qeredenizê têne cotê qeretiya  
 ezê çûme pêşiya qomsêr û xebtana dipirsiya  
 minê go mala we xira be gelo ji wê da têne çi qeretî ne  
 go ocaxa te kor be ji wê da têne sê gemî ne  
 gemiya pêşî yarim dunya  
 gemiya ortê cemal dunya  
 gemiya paşîn ewraqê Bavê Baran Begê  
**hezar û pêncsed mîrê di mefiya**  
 mîr im loy... ax mîr im loy mîr im loy...  
 mi dî gemiya paşîn ewraqê Bavê Baran Begê  
 hezar û pêncsed mîrê di mefiya...” (Güneş-Şahin, 2018: 72)

Di girîzgaha kilamê da behsa gemiyan (keştî) tê kirin ku ew li ser Behra Spî (wek Akdeniza bi tirkî) û Behra Reş (wek Karadeniza bi tirkî) diçin û tînen. Dengbêj xwe davêje li ber qomser û xebtanên (qeptan) keştiyan ku rewşa Bavê Baran Beg bipirse û têdigihêje ku di keştiya dawîn da fermana (ewraqa) Bavê Baran û kesên din heye. Ev hejmara hezar û pêncsedê wek kilama Kekê Xiyasedîn li vir û di gelek kilamên din da jî bi vî şiklî hatiye bikaranîn ku em dizanin ev hejmareke sembolîk e. Lewra di destê me da agahiyên tekûz tunene ka çend kes hatine nefîkirin. Di berdewamiya kilamê da ji ber vê rewşa xirab êş tê kişandin û tê gotin ka kesek tune xeberê bide Mîrê Xerza Cemîlê Axê ku ew bê hewara Baran Beg û yên tînen sirgûnkirin:

“kesek tunîne cuwabek bide Cemîlê Axê mîrê di Xerza

bibê mala te xira be destê Bavê Baran Begê Mîrê Hezroyê  
girtin avêtin qayikan û gemiyan

li rû Axdenizê, Qeredenizê berê wî dane **duwalê ejnebiya**

ê şûşa bilûrê danîne ser eniya Bavê Baran Begê

ji êvar da dişewitîne goşt û movika tevî van hestiya

mîr im loy ax mîrim loy mîr im loy...

ezê bi rebena Bavê Baran Begê Mîrê Hezroyî me lo lo lo li min lo (Güneş-Şahin, 2018: 72)

Di gelek kilamên Şakiro da behsa duwalê “ec(j)nebiyan” tê kirin ku ji vê gotinê em têdigihêjin ku ev der ne cih û warê Kurdan in. Ew cihên xerîb û nenas in, kesên nijad û dîne wan cuda ne li van deran dijîn û ji hêla çand û jiyane va li gor civaka Kurd civakeke cuda ye. Hem ji hêla mekan û hem jî ji hêla nasnameyê va cudahiyek tê destnîşankirin. Di vê kilamê da jî Bavê Baran Begê dixin keşiyê û berê wî didin duwalê xerîb û em têgihêjin ku ji ber sedemeke polîtîk, ji bo cezakirinê sirgûn ji bo wî hatiye hilibjartin û ew ê cezayê xwe bikêşîne.

Dema em malbat û eşîrên tînan sirgûnkirin dinihêrin tê dîtin ku malbat belawela dibin, wek keriyên pez ên gur bikevin navê birbirî dibin. Hinek li cihên hatine sirgûnkirin dimirin û li wan deran defîn dibin, hinek di rê da dimirin li wê mintiqeyê tînan binaxkîrin û hinek jî piştî fermana wan ya efûyê derdikeve vedigerin li ser axa xwe dimirin. Ji ber vê perçebûnê goreke wan a hevpar gelek caran çênabe. Wek mînak Budak jî da qasî 22 endamên vê malbatê li Edirneyê hatine defînkirin, Seyfedîn Paşa li Stenbolê û hinek jî li Hezroyê hatine defînkirin. Ew jî wek neviyê vê malbata birbirî bûye li Îzmirê dijî. Yanê malbat li çar aliyê welêt perçe bûye û gora her yekî li cihekî ye ku ev ji bo gelek malbatên Kurd ne tiştêkî xerîb e.

Berê jî hatibû gotin ku çend cureyên sirgûnê hene ku yek ji wan jî her çiqas ne bi darê zorê be jî ji ber mecburiyetê, ji ber şert û mercên baştir û aboriyeke baştir çêdibin. Kurd ji bo ku di nav rewşeke baştir da bijîn, ji malbata xwe ra pereyan bişînin her tim derketine xurbetê (mekanên xerîb û nenas) ku ev jî cureyekî sirgûna şexsî ye. Der barê vê da jî kilameke Şakiro ya “Welatê Qurbetê” kilameke balkêş e. Ji bo welatên xerîb yê ku ejnebî (gawir) yanê kesên nemisilman lê dijîn ev kilam dibe mînak bê nîşandan. Dema me behsa jiyana Şakiro kiribû hatibû gotin ku ew li Agirî, Mûş, Qereyazî, Edene û Îzmirê jiyaye û demekê jî li ser daxwaza Kurdên ji bo xebatê koçî Almanyayê kirine wek mêvan çûye Almanyayê. Di vê mêvantiyê da Şakiro li ser

koçberî û xerîbiya kurdên li Almanyayê, şert û mercên wan ên li welatê biyanî û li ser qîz û jinên Almanan jî kilaman çêkirine.

Kilama wî ya “Welatê Xurbetê” ya li ser “Mehmûdê kurê Îsmâilê” ji Qereqoçanê çêkiriye her çiqas rasterast nekeve nav sînorên kilamên şer û pevçûnê jî, ji hêla mijara sirgûnê va kilameke girîng e ku divê bê behskirin. Kilam her çiqas wek ku li ser şexsekî hatibe gotin xuya bike jî, di bingeha xwe da ji bo nîşandana mekan, sirgûnî, koç û nasnameyê ya bîra civakî kilameke balkêş e. Lewra kurdên ji bo şert û mercên baştir ên aboriyê mecbur mane terka welatê xwe bikin mijareke civakî ye, bi aborî û siyasetê ra jî eleqedar e. Di salên 1960î da li Tirkîyeyê ber bi Almanyayê va koçeke mezin çêbû ku gelek kes ji ber şertên baştir wek karker çûn vî welatê biyanî. Her çiqas gelemperî Tirk çûbûn jî, qîsmeke wê qefleyê ji Kurdan pêk dihat û gelek Kurd wê demê ji malbat, jin û zarokên xwe, welatê xwe dûr ketin. Ji bo zêdetir pereyan qezenc bikin û ji malbatên xwe ra bişînin an jî hinek pere kom bikin vegezin welatê xwe ku jiyaneke baştir bijîn van însanan li wir gelekî zehmetî kişand. Di nav salan da ew asîmîle bûn, bi jinên biyanî ra zewicîn, di nav gelek şertên zehmet da xebitîn, êşa sirgûniyê di rûhê xwe da kişandin û aliyekî wan her tim kêma.

Şakiro dema diçe vî welatî ji hêla Kurdan va baş tê mazûvankirin. Şakiro wek dengbêjekî serwest civaka wir baş çavdêrî dike û ihtimaleke mezin ev kilama ku navê wê bihûrî jî li wir hatiye hişê wî. Di kilamê da kodên nasnameyê baş xuya dikin lewra Şakiro behsa welat, Serhed, Tirkîye, Almanya, qurbetî û gawiran (gotiye gêwir) dike. Di nav risteyên kilamê da xemgînî û êşa dilê Şakiro xwe dide der. Li gor wî Mehmûd ji ber feqîriyê terka welatê xwe kiriye û hatiye welatê “gawiran”, “qurbet”, “nenas”, “qerebalix” û “dûr” ku ji wan ra dixebite. Heke em risteyên ewil ên kilamê binihêrîn wiha tê gotin:

“...Xwedê xira bike derd û kulê feqîriyê  
em xerîb in lo ho lo li **welatê qurbetiyê**  
malxirabo ca rabe  
çima te terka **welatê Serhedê** avê sar û cemidî kiriye  
gelo berê xwe da **welatê Almaniyê**  
hela bala xwe bidê li te vê kirinê lo bêbextiyê  
te çû serê xwe kire qerebalixê  
lawo ji **gêwir** ra dixebitî bi feqîriyê (Güneş-Şahin, 2018: 536)

Di kilamê da her çiqas navê şexsekî “Mehmûdê Îsmâil” derbas bibe jî ew wek sembolekê hatiye bikaranîn, gelemperî rewşa hemû Kurdên koçî welatê qurbetê kirine

û di nav şertên nebaş da dixebitin û dijîn tê teswîrkirin. Lewra wan ji ber feqîriyê terka ava sar a Serhedê kirine, ketine vî welatê qerebalix û mezin ji gawiran ra dixebitin. Risteyên kilamê wiha dewam dikin:

“...welatê me xerîb e lo çuqa dûr e  
ez ji te ra sond bixwim **welatê Tirka Musulman** e  
dîsa alîkî gul e yek jê nûr e  
Xwedê xirab bike **Alman gawir** e bê dîn û bê îman e  
ez ji te ra sond bixwim çuqa pîs e ewqasa bê huzûr e  
ji zulmê zelaletê tu bala xwe bidê malxirabo fenanî behr e  
ne delav e ne buhur e lo Rebiyo lo çuqa kûr e...” (Güneş-Şahin, 2018:

536)

Di kilaman da dema behsa Tirkan û welatê wan bê kirin ew wek “rom”tên teswîrkirin û bi gotinên neyînî yên wek “virek”, “xayîn” “kesên dek û dolaban dikin” tên binavkirin. Di nav vê xebatê da jî gelek mînakên bi vî rengî dikarin bînin dîtin, lê di vê kilamê da xaleke balkêş ew e ku li hemberî Almaniyaya welatê “gawiran” welatê Tirkan erênî tê wesîfandin ku sedema wê jî ew misilman in. Li gor vê nêrîn û hişmendiyê ji ber ku Tirk jî wek Kurdan misilman in nasnameyeke dînî ya hevpar di navbera wan da heye û tê gotin her çiqas tiştên wan ên nebaş hebin jî ew misilman in, wek “gawiran” ne bê dîn û bê îman in. Ji ber vê jî xebata Kurdekî misilman ya ji gawiran ra nebaş tê hesibandin ku di kilamê da tê gotin ya hatiye serê Mehmûd (ew sembola Kurdên li qurbetê ye) bila neyê serê kevir û kuçik, hirç û guran. Di dawiya kilamê da tê gotin yên ji ber feqîriyê çûne xebatê û li welatê gawiran feqîr mane, hustûxwar in, hêsîr û dîl in û ewê piştî zemanekê poşman bibin ku terka welatê Tirkiyeyê kirine û wê dîsa vegerin welêt.

Bi van kilamên mînak hatin nîşandan em têdigihêjin ku Kurd ji ber sedemên cuda gelek caran li ser axa xwe nemane, di rê û dirban da bûne koçber, li bajar û welatên xerîb jiyane û gelek zehmetî kişandine. Ev hin caran ji bo berdêla serhildanan wek ceza ji bo wan rewa hatiye dîtin, hin caran ji ber rewşên siyasî û polîtîk, hin caran ji ber sedemên aboriyê û hin caran jî ji ber biryareke şexsî çêbûye. Dengbêjên civakê jî çav dane van bûyeran û der barê vê mijarê da li ber xwe kilam derxistine û hewl dane ku ev neyên jibîrkirin û di bîra civakê da her tim bînin bibîranîn.

Di destpêka sedsala 20emîn û piştî wê çawa ku li hemû dinyayê bûyerên girîng çêbûne her wisa li ser axa ku Kurd lê dijîn jî bûyer qewimîne. Me di vê beşê da behsa çend bûyerên sereke kir û hewl da ku em nîşan bidin tesîra wan li ser kilaman çêbûye.



Şerê Dinyayê yê Yekemîn, Şerê Balkanan ji bo beşdarbûna gelek kom, nijad û welatan şerên sereke ne ku piştî wan nexşerê guherîn, hin nijad gihîştin azadiya xwe û axa hin welatan jî ji destê wan çû. Piştî ku Împaratoriya Osmaniyan hilweşiya û komara nû ava bû di nav sînorên wê da jî bûyerên Kurdan eleqedar dikin çêbûn ku me behsa wan jî kir û tesîra wan a li ser kilaman hat şîrovekirin. Serhildana Şêx Seîd, Serhildana Agiriyê û Komkujiya Geliyê Zîlan ji van bûyeran yên sereke ne ku ji kilamên dengbêjan ra bûne paşxane. Kilamên dengbêjan dema tîrîxandin gelek agahî, sembol û metafor di wan da tîrîxin, me di vî beşê da hinekî behsa wan jî kir. Hin hêmanên wek çek û alav, hesp û siwarên wan, malbat û eşîr, sirgûn jî ji bo van kilaman bûne paşxane ku me ji rêzikên kilamên Dengbêj Şakiro mînak nîşan dan. Bi saya van mînakan tê fêmkirin ku ev hêman di avakirina kilaman da çiqas girîng in.

## BEŞA ÇAREM

### 4. RENGVEDANÊN BÎRA CIVAKÎ DI KILAMÊN DENG BÊJ ŞAKIRO DA

Kilamên ku bi saya deng û hestan bi têrhuner û poetîk hatine avakirin ji hêlekê va perçeyekî bîra civakî ne û gelek hûrgiliyên der barê jiyanê da di xwe da dihewînin. Dema em berê xwe didin van kilaman, em dibînin ku gelemperî ew behsa bûyerên di navbera dawîya sedsala nozdemîn û destpêka sedsala bîstemîn da qewimîne dikin, yanê dîroka nêzîk bûye mijara van kilaman. Helbet hejmara wan kêm be jî kilamên behsa beriya vê demê û piştî wê demê dikin jî hene. Ev kilam der barê bûyer, mekan û şexsan da agahiyan didin ku him bi saya çanda devkî û him jî bi rêya belgeyên fermî em têdigihêjin ku ew perçeyekî dîrok û bîra civaka Kurd in.

Der barê hîlbijartina kilamên hatin deşîfrekirin, şîrovekirin û analîzkirin da divê ewil çend agahî bîn dayîn. Kilamên li ser xebat hatin kirin hemû ne yên Dengbêj Şakiro bi xwe ne, lê me rasterast ji dengê wî guhdar kirine û wisa hildaye nav sînorên vê xebatê. Jixwe kîjan kilam yên Dengbêj Şakiro bi xwe ne, kîjan ji dengbêjên din hatine girtin zelalkirina wan yek bi yek ne hesan e. Agahiya tê zanîn ew e ku hin kilam yên Dengbêj Reso, hin kilam yên Dengbêj Mistefayê Xellê Heyran, hin kilam yên dengbêjên din in û hinek jî yên Dengbêj Şakiro bi xwe ne ku wî li ber xwe gotine. Hin berhemên beriya xebata me hatine amadekirin jî ev kilam di nav kilamên Dengbêj Şakiro da nîrxandine (Serdar Öztürk, 2014; Ömer Güneş-İbrahim Şahin, 2018; Hanifi Taşkın-Ayhan Yıldız, 2018). Di çanda dengbêjiyê da gelemperî dengbêj kilaman ji hev digirin û ew kilam êdî dibin malê hemû dengbêjan û civatê. Ji ber vê, me jî kilamên rasterast ji deve Dengbêj Şakiro guhdar kirin û yên di van berhemên behsa wan hatin kirin da tomar bûne ji bo vê xebatê hîlbijartin.

Pirtûk, tez û maqaleyên li ser Dengbêj Şakiro hatine nivîsîn ji bo vê beşê ji me ra bûn palgeh. Yek ji wan xebatan “Antolojiya Dengbêjan 2 - Dengbêj Şakiro” ye ku ew ji hela Ömer Güneş û İbrahim Şahin va hatiye amadekirin. Pirtûka bi navê “Şakiro Kewê Ribat” ya ku Hanifi Taşkın û Ayhan Yıldız bi hev ra amade kirine jî bû berhema duyem ya me jê sûd wergirt. Nivîskaran piştî guhdarîkirina kilaman ew deşîfre kirine

û bi nivîskî gihandine ber destê xwendevanan<sup>22</sup>. Di deşîfrekirina kilaman da hin caran di navbera herdu berheman da nakokî çêbûne. Sedema vê jî ew e ku Şakiro dema heman kilamê careke din dibêje hin gotinan bi awayekî cuda diguherîne û ev jî di kilaman da ji hêla hin peyv, hevok û gotinê da cudahiyan derdixe holê. Ya duduyan jî hin caran dema kilam hatine deşîfrekirin hin peyv şaş hatine fêmkirin û hema wisa hatine nivîsîn. Rê û rêbaza deşîfkirina kilaman û berhemên çanda devkî mijareke din e ku divê li ser vê jî xebatên akademîk bînin kirin û perwerde bê dayîn ku reseniya wan xirab nebe û ew bi halê xwe yê resen bînin parastin. Ji ber ku deşîfreya kilaman di van berheman da hebû me careke din deşîfreya wan nekîr, me rasterast ji wan berheman girt. Ji ber vê yekê dubendiyên çêbûne ne ji ber deşîfreya me bi xwe ye, lê ji ber berhemên me sûd wergitin çêbûne.

Helbet bi salane me ji devê Dengbêj Şakiro kilam guhdar dikirin, hin caran jî me kilam deşîfre dikirin. Lê dema ev xebat hat amadekirin kilam dubare, sêbare heta wisa ku hinek ji wan bi dehan caran hatin guhdarîkirin û paşê li ser şîrove hatin kirin. Kilamên Dengbêj Şakiro yê di antolojiya Güneş û Şahin da hatine berhevkirin û deşîfrekirin qasî 265 heb in ku cureyên wan cuda ne. Yê dikevin nav sînorên mijara me qasî 55 kilamên li ser serhildan û pevçûnan, şerên dijî desthilatîyê û şerên di navbera eşîran da ne. Dema şîroveya kilamên Dengbêj Şakiro hatin kirin çarçoveyek hat avakirin, yê behsa evîn, xweza, raman û jiyane dîkin dervayî vê çarçoveyê man. Ji ber ku ew gelemperî mijara xebatên din in (her çiqas ji hin hêlan va bikevin nav sînorên mijara me jî) û sedî sed ne mijarên bîra civakî ne, me ew cure dervayî vê xebatê hîştin.

Ji bilî van pirtûkan hin kovar, tez û maqale wek çavkaniyên nivîskî gihîştin hewara me ku em ji wan îstifade bikin. Dengbêj, nivîskar, lêkolîner, hin malbatên ku behsa wan di kilaman da derbas dibin, akademîsyen û hwd jî bînin çavkaniyên me yê devkî ku em vê beşê bi rehetî binivîsin. Kilamên Dengbêj Şakiro yê behsa serhildanên Kurdan, sirgûn û cezakirina wan, pevçûnên di navbera eşîran da, komkujî, şerên dijî hêzên dewletê kakilê vê xebatê ne ku ew bi hûrgilî hatin analîzkirin. Lewra ev kilam di civaka Kurdan da bîreke hevpar ava dîkin û tesîrê li ser civakê dîkin. Ji ber vê,

---

<sup>22</sup> Divê bê gotin ku mala wan ava be ku bi kedeke mezin kilam deşîfre kirine, lewra deşîfreya kilaman tena serê xwe karekî gelekî zehmet e. Ev barê giran bi saya van pirtûkan li ser milê lêkolînerên wek me rabû û karê me hêsantir bû.

têkiliya wan a bi mekan, ziman, dîrok, nasname û tevgerên bedenî ra hatin şîrovekirin. Ev kilamên ji vê hêlê va dikevin qada bîra civakî bi analîzan va hatin nirxandin. Hewl hat dayîn ku bê nîşandan ka ev kilam di civaka Kurdan da çawa bîreke hevpar ava dikin, têkiliya wan û bîra civakî çî ye baş bê fêmkirin.

Di beşa ewil ya vê xebatê da me xalên girîng ên bîra civakî wek mekan, ziman, dîrok, nasname û tevgerên bedenî nîşan dabû ku di vê beşê da em li gor wê rêzê çûn û me kilamên dikevin nav sînoren van mijaran şîrove kir. Der barê wan da gelek kilam hene, lê ji ber ku ev xebat sînordarkiriye me hemû kilam yek bi yek analîz nekirin. Me ji bo mînak tenê çend kilamên sereke yên bi van mijaran ra eleqedar hîlbijartin. Lê dema xebat hat kirin, hat dîtin ku hin kilam ji hêla mijarê va dikevin nav sînoren van qadan hemûyan (mekan, ziman, dîrok, nasname û tevgerên bedenî), di hinekan da jî tenê xalek heye. Ji ber vê, li ser kilamên ku ji van çend xalan (mekan, ziman, dîrok, nasname û tevgerên bedenî) di xwe da di hewînî zêdetir şîrove û analîz hatin kirin. Mînak “Asyayê”, “Reben im”, “Kekê Xiyasedîn”, “Şerê Selanîkê” û “Elîfê, Emînê-Ûskan” wek kilamên sereke ne ku li gor yên din me zêdetir behsa wan kir.

#### 4.1. ŞOPÊN NASNAMEYÊ

Mijara nasnameyê di salên dawîn da ji her aliyan va bi hûrgilî tê lêkolînkirin ku ew bi dîrok, civak, derûnî, polîtîka û çandê ra girêdayî ye. Taybetmendiyên ku şexsek, civakek û nijadek xwe pê teswîr dike yanê nasnameyê ava dike pîrsa “tu kî yî?” an “hûn kî ne? dibersivîne. Pîrsa “tu kî yî?” pîrseke girîng e, lewra bingeha nasnameyê dadigire ku em bi tiştên di bîra me da hatine veşartin bersiva vê pîrsê didin, em yan bi bîr tînin yan jî bi zanetî ji bîr dikin û naxwazin agahî bîna bîra me. Bi saya ziman, çand, bîranîn, jîbîrkirin û bibîranînan nasnameyek ava dibe ku ew hem bi rabirdû û hem jî bi roja îroyîn ra têkildar e. Ji hêla meneyê va nasname tîşteki wisa mayînde û temambûyî nîne, di nav demê da dibe hinekî biguhere, ji hêla mene û naverokê va her tim xwe temam dike û mijareke civakî ye (Arslan, 2015: 14).

Di destpêka vê xebatê da dema behsa mijara bîr û bîranîne hat kirin hat destnîşan kirin ku bîreke şexsî heye, hebûna kesan ava dike û diparêze. Wek bîra şexsî bîreke civakî jî heye û taybetmendiyeke girîng a vê bîra civakî jî avakirin û parastina nasnameyê ye. Her şexsê civakê di bin sîwana vê nasnameya hevpar da dicive û der barê şexs, bûyer û tiştan da gotinên “ev ya me ye”, “ev ji me ye”, “em wiha ne”, “em li ser filan dîna ne”, “em ji filan malbatê ne”, “ev ji çanda me ye” û hwd dibêjin. Bi van gotin û hestên afdiyetê (em) ew di navbera xwe û ferdên civakên din da sînorekî

xêz dikin. Helbet ev afdiyet nayê wê meneyê ku her şexsê di vê civakê da wek hev dijî û wek hev difikirin, lê dîsa jî hevpariyek heye ku ew jî nasname ye. Kesek çawa xwedî çend nasnameyan be, civak jî her wisa xwedî çend nasnameyan e û ew bi hev ra têkildar in.

Ji bo avakirina nasnameyeke hevpar û avakirina dewleteke yek neteweyî di dîrokê da gelekî hewl hatine dayîn. Hem hêzên eskerî, çek û cebilxane hatine bikaranîn, hem bi rêya siyasî û îdeolojîk xebat hatine kirin û hem jî propagandaya reş ya yekalî hatiye meşandin. Ji bo avakirina nasnameyeke hevpar û avakirina dewleteke yekneteweyî bi nijad û komên din ra şer û pevçûnên giran hatine kirin, nijadên din bi komkujiyan hatine qirkirin û asîmfîlekirin. Kar û barên guherîna nifûsê herêman jî hin caran ji hêla desthilatdaran va hatiye meşandin. Ji bo vê jî şûna gelên li herêmekê ji nijadên din meriv hatine anîn û li wan herêmên diyarkirî hatine bicihkirin ku nifûsê gelên nayên xwestin kêm bibe. Ji bilî vê, dîrokeke fermî ya ku netewe û dewletê baş û qehreman, yên dijî wê jî nebaş û serhildêr nîşan dide hatiye nivîsîn. Bi rêya dîn, pirtûk, medya û hemû alavên jiyanê hewleke mezin hatiye dayîn ku nasnameyeke hevpar di nav civakê da çêbibe.

Di bin banê mijara nasnameyê da kilama Şakiro “Şerê Selanîkê” ji bo bê analîzkirin mînaekeke baş e. Li gor agahiyên Yıldız û Taşkın ya ji Dengbêj Zahiro girtine ev kilam ya Dengbêj Reso ye (2018: 141). Di kilamê da navê gelek nijad, bawerî (dîn) û qewmên din derbas dibe. Kilamê navê xwe ji Selanika paytextê berê yê Yûnanistanê hildaye û der barê dîroka vî şerî û gelên din da gelek agahiyên dide. Selanîk li Balkanan bajarekî Osmaniyan yê gelekî girîng bûye ku hem Yûnan, hem Bulxar, hem Makedon, hem jî Sirpan xwestiye bibin xwediyê wê. Bi erdnîgariya xwe va di salên 1900î da ji hêla rêbeja, rêhesin û behrê va Selanîk bajarekî ticarî yê mezin e, nêzîkî Uskup û Manastira bajarên Makedonyayê ye û ber bi Behra Egeyê va dirêj dibe. Ji hêla rewşa civakê va jî ji ber ku gelek însanên ji nijad û dînên cuda lê dijîn bajarekî kozmopolît e. Ev taybetmendiyên wê yên girîng dibin sedem ku ji bo Selanîkê şer bîn kirin û ew bê bidestxistin.

Dema li dinyayê fikrên netewebûnê û avakirina dewletan geş dibe nijad û neteweyên di bin banê Împaratoriya Osmaniyan da dijîn jî dixwazin ji împaratoriye veqetin û dewleta xwe ava bikin. Ji ber vê dest bi xebat û hewldanan dikin û xwe davêjin hembêza şer. Di navbera salên 1909 û 1912yan da hêza Împaratoriya Osmaniyan kêm dibe, êdî dengê gavên perçebûna dewletê tê bihîstin ku ev kilama ku

em ê şîrove bikin jî behsa wê serdemê dike. Di vê heyamê da jontirkên dijî Siltan Evdilhemîd (padişahê welêt e) tevdigerin piştî têkoşîneke çend salan di sala 1908an da Siltan Evdilhemîd ji text dadixin û wî sirgûnê Selanîkê dikin. Di vê demê da li Balkanan şer û pevçûn xurt dibin ku yê dixwazin Selanîkê bi dest bixin jî ji bo vê planan dikin. Di nav rewşeke wiha da artêşa Yûnanistanê di cotmeha 1912yan li hemberî dewleta Osmaniyan şer dide destpêkirin û di demeke kin da digihêje Selanîkê. Kîlama Şakiro “Şerê Selanîkê” behsa vî şerî dike ku Bulxar, Yûnan û Sirp hemberî Osmaniyan şer dikin û Kurd jî wek welatîyên Împaratoriya Osmaniyan di nav artêşê da li hemberî wan têkoşînê didin. Kîlama ku tê da navê gelek dîn û nijadan derbas dibe wiha ye;

“Lo bavo şerekî li me çêbû Selanîka şewitî wa bi rê ye  
 hê yê yê hê yê yê ... ca bi rê ye wê ca bi rê ye  
 keko qalekî li me qewimî li Selanîka şewitî ha bi rê ye  
**Sirb û Qeredax, Yûnan û Bûlxar, Aleman û Emirîkan**  
 eskerê **Sirpê** giran e, lêmişt girtiye bi maşîna jor da têtê  
 Sultan Evdilhemîd bi sê denga bang dikirî digo Sultan Ebdireşad  
 mala te xira be eskerê te tamamî **canturk**, êrmelî, mekteblî  
**Kurdistan** e talîma ling nizane  
 te yê toprax biderdane  
 çima wisa şer bi ê şer da **kafirê Sirpê** ye wê  
 hê wêê wêê wêê wêê... hey bavo  
 keko Selanîk, Çetelcê, Edirne, Îsqudred, Îskod  
 ji xwe ra mabû li mehserê ye  
 bavo emelyan e  
 xwedyê emelya ne bav e, ne bira ne  
 ne kes e, ne xwedî ye, ne guman e  
 şer û şerê bi sungiya ne  
**Tirka** namûs firotiye bi peran e  
 sêr bike li cinyazê lawê bavan e  
**musulman** di nava **gawir** û **ejnebî** da bêxwedî mane  
 gumana me li jorê ji Xaliqê Alemê Rebê Jorîn mîrê di mîran e  
 li jêrê pênsid jinê **Lazan** e  
 zendê spî çîl û qerqaş hildane  
 dişon cinyazê **şehîdan** û **xaziyan** e  
**musulmana** derdixin ji nav duwalê **gawir** û **ejnebiyan** e

bîst û çar saeta ber dînê xwe da canê xwe feda dane  
wê yê wê yê yê yê wê wey bavo...” (Güneş-Şahin, 2018: 78-79)

Dema em berê xwe didin van rêzikan em têdigêhijin ku şerekî gelek mezin çêbûye, “Sîrb”, “Qeredax”, “Yûnan”, “Bulxar”, “Tirk”, “Alman”, “Amerîkî”, “Laz” û “Kurd” gelek nijad û qewmên cuda di nav vî şerî da ne. Ji hêla dîn û baweriyê va jî ev şerê “gawir-eynebî” û şerê “misilmanan” ne. Hesên Tehsîn Paşayê qumandanê Tirkan dema dîtiye çavê her kesî li Selanîkê ye û hêza wan têrê nake ku ewê bi ser bikevin, agirbestê îlan dike û bi peymanekê Selanîkê teslîmî Yûnanan dike ku ji ber vê teslîmkirinê hê jî gelek kes wî bi nefretê bi bîr tînin.

Di kilamê da nasnameyeke hevpar ya di bin sîwana Împaratoriya Osmaniyan da xwe nîşan dide. Ev nasnameya hevpar ya ji Kurd, Laz, Tirk û hemû nijadên di nav sînoren împaratoriye da dijîn û misilman in li hemberî dijmin (wek gawir û ejnebî hatiye terîfkirin) şer dikin, birîndar dibin (wek xazî hatine binavkirin) û tîn kuştin (wek şehîd hatine binavkirin). Ji bo hêza eskerên Sîrb û Yûnanan zêde bîn nîşandan di kilamê da ew wek lemîştê yanî lehî û laserê hatine binavkirin, bal li ser zêdebûna hejmara wan tê kişandin.

Siltan Evdilhemîdê Padişahê Osmaniyan yê ku bi destê jontirkan ji text hatiye daxistin û li Selanîkê sirgûn e jî di kilamê da tê behskirin. Ew bangî Siltan Ebdireşadê (padişayekî din ê Osmaniyan e) dike û dibêje hemû eskerên wan jontirk (cantirk) in, bi êrme (arma, nîşan û rûtbe) ne, ji Kurdistanê ne û li hemberî eskerên Sîrpan ne bi telîm û perwerde ne. Kilamê da tê destnîşankirin ku ji ber vê ye ku di vî şerê giran da gelek esker tîn kuştin, cinazê wan di nav gawiran da li welatê ejnebiyan dimîne. Ancax ji wan hinek xwedî şans in ku cinazê wan bi destê jinên Lazan tîn şuştin (risteya zendê spî çîl û qerqaş hildane dişon cinyazê şehîdan û xaziyan e), yê mayîn jî bê şuştin û bê definkirin li wir dimînin. Ji ber ku Hesên Tehsîn Paşayê Osmaniyan dawiya şer neaniye û Selanîk bê şer û têkoşîneke mezin teslîmî Yûnanan kiriye di kilamê da tevgera wî biçûk tê dîtin, ew bi firotina namûsê tê rexnekirin ku Şakiro wiha dibêje;

“**Tirka** namûs firotiye bi peran e

sêr bike li cinyazê lawê bavan e

**musulman** di nava **gawir** û **ejnebî** da bêxwedî mane

gumana me li jorê ji Xalîqê Alemê Rebê Jorîn mîrê di mîran e...” (Güneş-

Şahin, 2018: 79)

Di kilamê da şîna cinazê eskeran tê girtin, hesab tê pirsîn û tê gotin nexwe wê bajar bihata teslîmkirin (firotina namûsê), çima ev ewladên misilmanan bi destên

gawiran hatin kuştin. Ew çima birîndar bûn, birçî, tî û tazî li qada şer man, cinazêyên wan di nav gawir û ejnebiyan da bêxwedî man. Nasnameya dînî li vir derdikeve pêş ku eskerên Osmaniyan (ji gelek nijadan mêr tê da hene ku kurd jî ji wan hinek in) yanê lawên misilmanan tên kuştin û cinazê wan li wê erdê xerîb dimînin.

Nasnameya Kurdan a neteweyî rûhê xwe ji edebiyata devkî digire ku Kurd di kûraniya hişmendiya xwe da vê ji bo hebûna xwe dikin mertal (Cizirî, 2020: 13). Heke em vê hevoka Cizirî ji xwe ra bikin palgeh em ê bibînin ku kilamên dengbêjan hem ji hêla nasnameyê û hem jî hêla dîrok û çandê va berhemên gelekî bi qîmet in. Di van kilaman da kodên nasnameyê yên wek kurdbûn, dîn, bawerî, mêranî û hwd xwe nîşan didin ku me di kilama Şerê Selanîkê da van hêmanan destnîşan kir.

Di kilamên şer û pevçûnê yên li hemberî nijad û kesên ji dîn û baweriyên din da hin hêmanên balê dikşînin hene ku ji bo van jî divê mînak bèn nîşandan. Di van kilaman da zêdetir pesnê şervan û lehengên Kurd tê dayîn, dînê Îslamê li hemberî dînen din wek dînê pîroz tê nîşandan. Ji bilî vê, li ser navê Xwedê, Pêxember, Qur'an, telaq û jinberdanê sond tê xwarin ku ew ê li hemberî yên xwe bèn kuştin û heyf wê wisa bê hildan. Hin peyvên di kilaman da xwe didin der wek “qetla wî mîna qetla du mirîşkan e”, “kafir”, “marûs”, “gawir”, “duwalê ecnebî”, “Rom”, “Roma virek”, “eskerên Romê”, “beşîncî mezheb” û hwd dibe mînak bèn nîşandan.

Piştî kilama Şerê Selanîkê mînakeke din jî ji kilama “Xalis Begê” dibe bê dayîn. Di kilamê da navê “Rom”ê û eskerên wê tê bilêvkirin ku di gelek kilaman da jî em rastî peyva “Rom”ê tînin. Rom ji bo Tirkan û Osmaniyan tê bikaranîn ku ew wek xayîn, virek, neewle, sêrbaz, ji pişt meriv xençerkirî û hwd dîn tînin teswîrkirin. Di vê kilamê da jî Rom wek zalim û virek tê nasandin ku, nasnameya kurdbûnê ya dijî Romê bi zelalî tê nîşandan. Şakiro wiha distrê:

“Lê Xalis Begê bi sê denga ba dikirî go Ahmedo

Lo lawo tu çê be çê bixebite

**Eskerê vî zalimî** bihurê Muradê li me biriye

Tu dehna xwe bidê îro ji êvar da

Koka xulam û xizmetkara li me qeliya

Bê axawo li minê, li minê, li minê, li minê, hey way wayê

Agirê kulê bi mala **Roma virek** dadayê

Çawa bi zora darê tivingê dajo ser

Kozika Bavê Xanimê gula qaçaxa

Nemînim ser qedayê...” (Yildiz-Taşkin, 2018: 297)



Di vê kilamê da Şakiro hin caran jî gotiye “eskerê vî zalimê Cumhûra teze ye buhurê Mûradê li me biriye” (Güneş-Şahin, 2018: 44). Wek ku tê dîtîn eskerê komara nû wek “zalim” tê binavkirin û wek dijmin tê hesibandin. Sedema vê binavkirinê jî ew e ku ji destê eskeran gelek zilm hatiye kişandin, baca zêde ji welatiyan hatiye hildan û evqas zor û zextiya dijî gel wan aciz kiriye û wan jî ew bi sifate zalimbûnê bi nav kirine. Ew ji gel, nijad û nasnameyeke din in û li hemberî Xalis Beg û rêhevalê wî rê dibirin û êrîşî wan dikin.

Li gor Bilgin netewe gelemperî piştî qeyran an jî şerekî ava dibin û ji bo rêza netewebûnê û îmajê kesayetiyê ya di van şer û qeyranan da tesîreke nebaş dîtiye cardin bi qîmet bibe bîra civakî mîsyoneke mecburî ya ku wê paşê bê jibîrkirin hildide ser xwe (2013: 34). Bîra civakî hewl dide di bin sîwana neteweyekê da mirov kom bibin, aîdiyeta rabirdûyeke hevpar ava bibe. Di vê aîdiyete da ferdên neteweya xwe ji yên din “cudâ” dibînin, gelemperî xwe ji yên li hember mezintir û rêzdar dinirxîn û yên li hember xwe jî “biçûk” dibînin. Ji hêla nirxandina nasnameyê va heke em hinekî jî li ser kilama “Ferzende û Xalis Beg” hûr bibin di kilamê da gotinên “ordiya kafirê Êris”, “qarîşî Turkiyê” û “hukumata Turkiyê” derbas dibin. Di nav rêzîkên ewil ên kilamê da Ferzende Beg bangî Evdal û Kerem dike ku eskerê Tirkîyê li dora wan girtiye û ew bê tevdîr hatine dorpeçkirin. Di rêzîkeke din da jî Besraya jina Ferzende Beg bangî xwesiya xwe Asya Xanimê (dayika Ferzende Beg) dike û dibêje “hukumata Turkiyê” bi ser serê wan da rabûye, ji bilî vê Xanima qîza Xalis Beg bangî Gulnazê dike û dibêje ordiya kafirê Êris li pêşiya wan dimeşe. Di van hemû rêzîkan da tê dîtîn ku nasnameyên “Tirk” û “Êris”an derdikevin pêş Kurdan û ew wek kesên xwedî nasnameya “kurdûnê” dijî wan şer dikin. Li hemberî dost û dijminan dixwazin nîşan bidin ku ew serî natewînin ku Şakiro kilamê wiha distrê:

“Ferzende bi sê denga bang dikirî Evdal û Kerem  
 Go mala we şewitiyo hûnê ji xewa şîrîn rabin  
 Esker dora me girtiye  
 Çima em mane bê tevdîro lo lo Mîro  
 Tu dêhna xwe bidê vê sibengê malxirabo roja îro  
 Teze emê ji xwe ra giranya Silêmanê Ehmed kekê Şeşê  
 Vê sibengê nava dostan û dujmina **qarîşî Turkiyê** dîsa ji xwe ra bînin

biro

...

Besrayê bi sê denga bangî dikirî go Asya da-dayê

Sibe ye ez ê li devê Mûradê diketim gelo bi dar û bî ne darê çûkê  
Hela bala xwe bidê vê sibengê malxirabo li mi bextê mi gulîbira Xwedê  
Ezê ji xwe ra vê sibengê sêr bike gelo li şansê zava û bûkê

**Hukumata Turkiyê** îro bi ser serê me rabiye

Tu dêhna xwe bidê vê sibengê

Li vê qedayê li vê belayê geli li vê gêdûkê

...

“Gelo Xanimê bi sê denga bang dikir go de lê lê Gulnazê

Wey la gulîbirê tu serê xwe ji xewa şîrîn bilind ke

Eskerê bavê Xalis Kekê Mexsê giran e

Vê sibengê **ordiya kafirê Êris** li pêşiya me ji xwe ra dimeşiya...”

(Güneş-Şahin, 2018: 41-42)

Di heman kilamê da behsa “alayê Kurdan” û “eşîrê Kurdan” jî tê kirin ku peyva Kurd bi tena serê xwe binê nasnameyekê xêz dike û wê ji Tirk, Ecem, Êris, Erebi û nijadên din yê li wê herêmê dijîn vediqetîne û di navbera wan da cudahiyekekê nîşan dide. Dema em berê xwe didin kilamê Şakiro wiha dewam dike:

“Têlî Etê bi sê denga bang dikir go Mexsê lo lawo

Ez ji te ra sond bixwim îro vê sibengê derdê me giran e

Hela tu sê denga bang bike sê sibengê **alayê Kurdan e**

Tu dêhna xwe bidê vê sibengê li milê me yê çepê esker e eskerê **Hesenan**

e

Li milê yê rastê vê sibengê **eskerê Kor Husên Paşa**

**Donzdeh alay e eskerekî pir giran e**

Vê sibengê malxirabo bang bike bêje derdê me îro derdekî pir giran e

Tu sêr bike Mexsê bi sê denga bang dikir bavo tu cara

Vê sibengê apo tu bang neke **eşîrê di Kurdan e**

Ex ji te ra sond bixwim vê sibengê dîsa bi dengêkî êlî bang dike

Di nav xwe da bêje va hicûm hicûma mêrê di **Sîpka** ne...” (Güneş-Şahin,

2018: 43)

Di van rêzikan da jî dîsa navê hin şexsan û eşîran derbas dibe ku ew jî dîsa bala me dikşîne ser nasnameya kurdbûnê, eşîrtiyê û dijayetiyê hêzên li hember. Eşîrên Hesenan û Sîpka wek vê kilamê di kilamên din da jî derdikevin pêşberî me û di nav Kurdan da eşîrên navdar in.

Kilameke din ya ku tê da behsa Tirkan, qanûna wan û eşîrên Kurdan tê kirin jî kilama “Geliyê Zîlanê” ye. Li gor rêzîkên kilamê Tirk wek nasnameyeke cuda li

hemberî Kurdan in, qanûna wan heye, dikarin ji bo Kurdan fermanan derxin û Kurdên ku ji bo wan ferman hatine derxistin bigirin û ceza bikin. Ev Kurdên ku fermana wan hatiye derxistin jî çareyê ji destê wan xelasbûnê dibînin û dixwazin berê xwe bidin nav eşîrên Kurd. Lewra her çiqas ew eşîrên cuda bin, di navbera wan da car caran şer û pevçûn çêbibin jî nasnameyê wan a hevpar heye ku ew jî kurdbûn e. Ji ber vê her tim nebe jî gelemperî ew di rojên teng da, li dijî fermanan mil didin hev û piştgiriya hevdu dikin. Risteyên kilamê wiha ne;

“Heya Dunya xweş ava be gelo vê sibengê emê ji xwe ra bigerin

li Zorava li **Mala Hecî Mistefa**

ez ji te ra sond bixwim vê sibengê tim û tim cara sax be

li serê çolan û çiya be

heya fermana me li **qanûna Tirka** da rabe

ez ji te ra sond bixwim vê sibengê

ez dizanim heya sax û silamet bim di nava eşîrê da vê sibengê

derd û kulê me bi serê Geliyê Zîlan be

tu rabe vê sibengê malxirabo

min ji te ra nego mala **Şêxê Borezan** tu cara ji me ra nabe

de rabe de rabê de rabe...

axayê axa de rabe maqûlo de rabe

li Bavê Xanimê berxê **Mala Etê**, torinê **Mala Sêrxwûn**

tu rabe emê berê xwe bidine welatê Serhedê

av û rizqê me bira dîsa li nava **eşîra Kurda** be” (Güneş-Şahin, 2018: 48)

Di kilamê da behsa Xalis Begê bavê Xanimê yê ji Mala Etê û neviyê Mala Sêrxwûn tê kirin. Li gor kilamê fermana wan hatiye derxistin ku ew dixwazin ji ber vê fermanê têbikoşin. Ji bo navlêka malbatê peyva “sêrxwûn” hatiye bikaranîn ku peyveke balkêş e. Aras dema behsa kilama “Haylê Metê” ya kuştina Mihemedê Elî Begê neviyê Hecî Êsiv Paşa (serokê eşîra Sîpka) dike dibêje ji mala Hecî Êsiv Paşa ra dibêjin “Mala Sêrxwûn” (2018: 136). Li gor agahiyên Îbrahim Yenigülê neviyê Xalis Begê jî ev navlêk “sêlxwîn” e û çîroka wê jî heye. Yenigül dibêje malbat ji ber ku zehf mêvandar e û ji kesên tên mêvandariyê ra heywanan serjê dike û goşt dide wan, sêlê wan her tim li ser agir e û hê goştê li ser sêlê napije mêvanên din tên û ew dîsa sêlê didin ser û goşt dipêjin. Ji ber vê nandayîn û mêvandariyê ev nav li ser malbatê dibe nîşaneyê maqûltî, mêrxasî û mêvandariyê (Îbrahim Yenigül, Pêwendiya tîlefônî, 24ê Adara 2022yan).

Kilama “Tahir Xan” jî yek ji kilameke herî navdar e ku di nav Kurdan da tê zanîn. Di vê kilamê da behsa erdnîgariya Kurdan ya li herêma Îranê tê kirin. Ev kilam qasî tê zanîn ji hêla Evdalê Zeynikê va hatiye gotin û paşê ji hêla gelek dengbêjan va hatiye belavkirin ku yek ji wan jî Dengbêj Şakiro ye. Serdarê Kurdên Îranê Tahir Xanê Qeleniyê li hemberî Şahê Îranê (Eceman) serî hildide, lê Şahê Ecem bi eskerekî giran di ser Tahir Xan ra digire. Paşê ji ber ku eşîrên Kurd (eşîra Celaliyan û eşîrên din) piştî wî nakin û wî bêpişt dihêlin ew têk diçe. Di kilamê da behsa sê birayan tê kirin ku Tahir Xan, Tar Xan û Têmûr Xan. Şakiro wiha dibêje:

“De lo lo de lo lo  
 Lê dayê rebenê va şerê ha şerê Tahir Xan e  
 Keko va dawa giran dawa Tahir Xan e  
 Tar Xan bi sê dangan ban dikirî digo Têmûr Xan  
 Bira tu çê be çê bixebite ji birayê xwe ra bernede hêlî konan e  
**Eskerê şahê Ecem eskerekî giran e**  
**Hezar û pêncsed mêr e fena mija rûesman e**  
 Ji êvar da hilşiyaye ser serê me her sê biran e  
 Girtiyê serê çilan û çiyar ra” (Yıldız-Taşkın, 2018: 306)

Tar Xan bi sê dangan bang dike Têmûr Xan ku hezar û pêncsed eskerên Şahê Ecem li ser serê wan her sê birayan da hilşiyane, wek mij û dûmana esman girtine serê çil û çiyar e û rê li ber wan girtine, lê dîsa jî ew natirsin. Di vê kilamê da behsa Şahê Ecem tê kirin ku şopên nasnameya kurdbûnê xwe zelalî dide der. Lewra di tevahiya kilamê da behsa şer, Şahê Eceman, eskerên Ecem yê hejmara wan gelek zêde ne tê kirin. Bi van va em têdigihêjin ku nasnameya Kurd (serdarekî Kurd) li hemberî nasnameyeke din yanê Şahê Îranê (Ecem) şer dike û ew rê nadin hev. Di her civakê da der barê kom û nijadên din da hin îmaj û teswîr tî avakirin ku rastiya wan bi şik e. Lewra îmaj gelemperî ji hin hest û fikrên rastiya wan nayên lêpirsîn, ji pêşdarazan pêk tê (Arslan, 2015: 13). Di beşeke kilamê da Ecem biçûk tî dîtin heta wisa ku kuştina Şahê Ecem wek kuştina mirîşkan bê qîmet tê teswîrkirin û ew biçûk tî dîtin ku Şakiro wiha dibêje:

“**Qetla Şahê Ecem ber çavê birayê te fenanî qetla du mirîşkan e**  
 Birayê te sond xwarî bi sonda qesemê  
 Serê Şahê Ecem davê nava napî di gîzman e  
 Êrtqeliya me li pêşîya te koma Celaliyan e...” (Yıldız-Taşkın, 2018:

Di kilamê da em têdigêjin ku Kurdên Îranê li hemberî Şahê Ecem serî hildane, lê ji ber ku beg û eşîrên Kurdan alîkariya Şah kirine Taxir Xan têk çûye. Eşîra ku navê wê di kilamê da derbas dibe eşîra Celaliyan e ku ji bo wan peyva “ûrtqeliya” hatiye bikaranîn. Ev peyveke balkêş e ku meneyeke neyînî di xwe da dihewîne û wek nifirê hatiye gotin. Ev peyva ji “ûrt” (malbat, zuriyet, eşîr) û “qelandin”ê (tunebûn, jiholêrabûn) çêbûye tê meneya koka wan biqele, ew ji holê rabin, ew nemînin. Li gor agahiyên Aras dide (2018: 125) Tahir Xanê ji eşîra Heyderî û neviyê Mala Şero di vî serî da (1892) bi birayê xwe Emir Xan va dîl tê girtin, pismamê wan Kor Huseyn Paşa bi pencî siwarê xwe va êrîşî Îranê dike û hêla Qeleniyê zeft dike. Ev bûyer di navbera Ecem û Tirkan dibe sedema qeyranê, paşê hevdiştin tîn kirin û ew tîn berdan, Huseyn Paşa jî ji Îranê derdikeve. Dema em berê xwe didin rêzikên din ên kilamê Tahir Xanê kekê Zezo li hemberî Îranê qasî dewletekê xwedî hêz û wêrekiyê ye;

“Zezo digo Cemîlê lê dayê wele kekê mi xweşmêr e xweş axa ye

**Qarişê Şahê Ecem yarim dewlet e**

Wey la lê nemayê yarim şah e

Çawa li topaxa **vî kafirî** bê piştîmêrî bê bira ye...” (Güneş-Şahin, 2018: 76)

Tiştî balkêş li vir ev e ku Kurdên ji heman nasnameyê yanê Tahir Xan û eşîra Celaliyan li hemberî Şahê Îranê yanê Ecemên ku ji nasnameyê din in nabin yek, piştgiriyê nadin hev û ji ber vê lihevnegirtinê jî têk diçin. Nasnameya Kurd li hemberî Eceman têk diçe, tê bînpêkirin û xemginiya ku peyda dibêjî wek “li hemberî kafiran bê piştîmêrî” tê teswîrkirin. Di risteyên “kekê mi xweşmêr e xweş axa ye, qarişê Şahê Ecem yarim dewlet e” da mêr û mêrxasî derdikeve pêş ku di nav neteweya Kurd da ev taybetmendiyên girîng in, kurdbûnê û werêktiyê simbolîze dikin.

Mîna keke din jî di kilama “Kekê Xiyasedîn” da heye ku navê Nîgalo û ecnebiyan derbas dibe. Ev jî nasnameya Êrisan nîşan dide û ji vê hêlê va nasnameya Kurd û Êrisan ji hev tê veqetandin. Di kilamê da Şakiro dibêje:

“Tu nizanî li piştî kekê Xiyasedîn

Qanûna me bû qanûna Nîgalo **duwalê ecnebî**...” (Güneş-Şahin, 2018: 58)

Wek ku tê zanîn ev kilam li ser tîkçûna Serhildana Şêx Seîd, dardakirina wî û rêhevalên wî û rewşa Kurdan a piştî serhildanê dike. Dema em berê xwe didin tevahiya kilamê em dibînin ku Şêx Seîd ji ber ku têk diçe tê dardakirin û Kurdên xwe perçeyek dîne Îslamê dihesibînin jî li hemberî qanûn û zagonên nû xemgîn dibin. Lewra li ber çavên wan êdî ev komara nû hatiye avakirin wek qanûna Nîgalo yanê “gawir”an

tevdigere, hesasiyetên dînî nade ber çav û hemû jiyanê li gor xwe ji nû va ava dike, kesên dijî xwe jî qebûl nake û ji holê radike. Dema em berê xwe didin beriya avakirina Komara Tirkiyeyê li erdnîgariya Kurd lê dijîn gelemperî hakimiyeta dînê Îslamê heye ku cînarên der û dora Kurdan yanê Tirk, Ereb û Ecem jî misilman in, yanê fikra umetê serdest e. Jixwe wê demê nasnameyeke dînî di navbera van gelan da heye ku ew jî ne li ser nijadê li ser dîn radiweste û Şêx Seîd jî bi nasnameya xwe ya Kurd û misilman va wek şexsiyetekî girîng derdikeve pêş.

Dema ew li hemberî komara nû derdikeve di heman demê da serî li hemberî qanûna nû, ya ku dixwaze dînê Îslamê gav bi gav ji holê rake jî derdikeve. Di kilamê da Şakiro dema dibêje “piştî kekê Xiyasedîn Qanûna me bû qanûna Nîgalo duwalê ecnebîne” balê dikşîne li ser nasnameya dînî ya Şêx Seîd û Kurdan. Nîgaloyê ku navê wî di kilamê da derbas dibe gelo kî ye? Heke em lê binihêrin ew ne Tirk e, ne Ereb e û ne jî Ecem e, yanê ne kesekî ji dînê Îslamê ye. Nîgalo ango navê wî yê eşkere Nîkolay Aleksandrowîç Romanov (1884-1917) Çarê 2yemîn ê dewleta Êris e ku dema Şoreşa 1917an çêdibe, Bolşevîk dibin desthilat û dewleta wê demê hildiweşe, desthilatiya Nîgalo jî ji dest diçe. Di kilamê da Şakiro li vir şibandineke balkêş dike. Dema ku Komara Tirkiyeyê ava dibe, xilafet têk diçe û desthilatiya nû dest pê dike, jiyan bi tevahî serî heta binî diguhere û qanûnên nû di jiyana însanan da dibin rê û rêbaz. Ji ber vê ye ku di kilamê da tê gotin keleka dînê Îslamê welgeriya, Kekê Xiyasedîn ango Şêx Seîd têk çû û qanûna berê êdî tune, qanûna nû heye ku vê jî dişibe qanûna ecnebiyan ango Êrisan û kesên nemisilman.

Di vê xalê da heke em mînakeke guherandina civakê û qanûnên nû yên ku hatine derxistin binihêrin em dibînin ku der heqê cil û bergan da jî qanûnên nû ketine rewacê ku ji wan yek jî qanûna şewqeyê ye. Di kilama Şakiro ya “Silêmanê Ehmed” da wiha tê gotin:

Silêmanî Ehmed bi sê denga bang dikirî go  
 Ferzende, Keremê Qolaxasî bavê bavê mino hûnê rabin  
 Li pêşiya me gaziya Celalyanî bêbext e  
 Li milê me yê rastê eskerê qerenîzamê giran e  
 Taqeta bavê te pêda nare bi  
 Lê bavê te sond xwariye bi sonda qesemê  
 Li piştî qanûna Sultan Evdilhemîd qebûl nakim  
 Dîn û mezhebê Misto Kemal, bê şewqê vî zalimî  
 Min sond xwarî bi sonda tamam

Qebûl nakim tu zagon û tu qanûnê...” (Güneş-Şahin, 2018: 60)

Şewqe aksesuareke cil û bergan e ku ji Ewropayê û parzemînên din ên Rojavayî belavî dinyayê bûye. Em ê dûr û dirêj behsa dîroka şewqeyê û belavbûna wî ya li dinyayê nekin helbet, lê bi kurtasî em dikarin bînin ziman ku li ser erdnîgariya Rojhilatê şewqe sembola jiyana modern e, nasnameyeke nû ya nûjen ango ewropî temsîl dike, dijî şaşik, kûm, koloz û tiştên din ên li vê erdnîgariya ku Îslam serdest e xuya dike. Li gor kilamê şewqe qanûnên nû, jiyaneke nû ya dijî Îslamê û metaforên nû simbolîze dike. Behsa guherînê, zagona nû tê kirin û ji gotinên kilamê tê fêmkirin ku ev guherîn ji hêla civakê va nayê pejirandin. Di kilamê da şewqe sembola qanûna nû, komara nû ye û ji ber ku tê mecburîkirin ev wek zilm tê nirxandin. Li gor dîroka fermî gel bi kêfxweşî qanûnên nû qebûl kiriye, piştgirî daye ku ew bikevin rewacê. Lê heke mijar bi çavê bîra civakî, nasnameya Kurd û dîroka devkî bê nirxandin wê bê dîtin ku ev qanûnên nû yên komarê nehatine pejirandin.

Bîra civakî dema nasnameyê ava dike, hewl dide dîrokeke hevpar jî binivîse. Nasnameya civakî (collective identity) bi mîrata rabirdûyê ya ji simbol, bîranîn, berhemên hunerê, edet, kevneşopî, nirx, bawerî û agahiyan va derketiye holê tê avakirin (Bilgin, 2013: 41). Kilama “Teyrê Îspîrê” ya ji bo Şêx Seîd tê gotin jî (Îspîr navçeyeke Erziromê ye) ji gelek xalan va kilameke balkêş e. Wek Bilgin jî aniye ziman di vê kilamê da rabirdû û dîrokeke hevpar heye, nasnameyeke hevpar (ew kurdbûn û misilmanbûn e) ya bi destê dewletê tê tepisandin heye. Em bi navê hin kes, nijad, mekan û referansên dînî va dizanin ku yê behsa wî tê kirin Şêx Seîd e. Di kilamê da bûyereke dîrokî (girtin û dardakirina Şêx Seîd û rêhevalên wî), kodên dînî (dîrega dînê Îslamê, şêxê îrşadê, şêx, murşîd), nijad û nasnameyên cuda (Hurum, Tat, Laz) şewqa xwe didin der. Çaxê em guhê didin Şakiro ew wiha distrê;

“...bi destê bavê Şêx Elî Riza **şêxê îrşadê**

**dîrega dînê Îslamê** Teyrê Îspîrê girtiye

li sûka bajara Diyarbekir

sed siwarê bir ber daraxacê

dusid suwarî dane destê **Huruman û Tatan û Laza**

serê van **şêxan** û **murşîda** ji xwe ra bi balta jêkir nemînim...” (Güneş-

Şahin, 2018: 66)

Navê Şêx Seîd rasrerast di kilamê da derbas nabe, lê bi gotinên “bavê Şêx Elî Riza”, “şêxê îrşadê”, “dîrega dînê Îslamê” û “Teyrê Îspîrê” va Kurd têdigihêjin ku ew Şêx Seîd e. Fermana darvekirina Şêx Seîd û hevalên wî (şêx û murşîd) hatiye dayîn.

Navê hin nijadan jî tê behskirin ku ew bi eslê xwe “Hurum”, “Tat” û “Laz” in. Ev esker û wezîfedarên dewletê yên ji nijadên din in ku wek welatîyên vê axê di civaka Osmaniyan da dijîn. Ew li Diyarbekirê benda fermanê ne ku bi destê wan Şêx Seîd û rêhevalên wî bîr darvekirin. Tat peyveke balkêş e ku ew şaxeke gelê Îranê ne, li rojhilatê bakurê Azerbeycanê û başûrê Daxistanê dijîn û qismeke wan Cihûyên çiyê tîr binavkirin, lê di nav Tirk û Ezeriyan da asîmîle bûne (Rohat Alakom, Pêwendiya tîlefoni, 15ê Sibata 2022yan)

Hurum, Ûrim û versiyonên wek vê jî ji bo Rûman tê bikaranîn ku em hin kilamên din da jî rastî vê peyvê tîr wek “dêûrimê” û “bavkafirê” hwd. (Îlyas Sayim Pêwendiya tîlefoni, 21ê Çileyê Paşîn 2022) Rûm di dîrokê da ji wan kesên di nav sînorên Împaratoriya Romayê da dijiyan ra dihat gotin ku ew bi zimanê latînî diaxivîn, lê di nav demê da paşê ew bi yûnanî axivîn. Ji van agahiyan em tîdigihêjin ku nijad û nasnameyên din bi aliyekî va biçûk tîr dîtin û tê gotin ku ka çawa dibe evên ku em qîma xwe li wan naynin, wan naecibînin şêx û murşîdên me girtine û ewê wan îdam bikin. Peyva “Hurim” ya ku di kurdî da ji bo kesên kesayetiya wan req û hişk yêrê û rêbazan nizanin, eletewşo tevdigerin jî tê bikaranîn. Dibe ku ev peyv ji vir hatibe û ji bo biçûkdîtinê û nerazîbûnê hatiye bilêvkirin. Çawa peyvên “tixa”, “fileh”, “gawir” ji bo biçûkdîtinê tîr bikaranîn ji bo Rûman jî dibe ku “Hurim” hatibe gotin û wisa belav bûye, lê dîsa jî ev ne fikreke wisa ye ku teqez bê piştrastkirin.

Di kilama “Bavê Şemsedîn” da jî peyva “Kurmanç” û “busulman” (misilman) derbas dibe ku tê gotin ji ber ku Kurmançan cotek topê şerepnarê avêtine teyarê û teyare anîne xwarê ku ji ber vê heyfa teyarê ji “Bavê Şemsedîn” tê sitendin. Ev beşên kilamê wiha ne;

“tê bîra te da cotek topê şerepnarê biniyê kona da çar kirin  
avêtin teyarê teyara anîne xwarê, alet û hacetê teyarê belav kirin  
tu nizane va heyfa cotê teyara ne ji te derkirin  
go mala te şewitiyo em hene **busulman in înanca me tamam e**  
eger ku nefî bim sibê li pêşiya min heye mirin

...

“bi destê bavê Şemsedîn girtin ji qawûşa cendurma derkirî  
fermana wî nivîsî avêtin stûya go Xalito tu nizanî  
hukumata niha tiştê ji bîr nake vê sibengê tê bîra te da  
**Kurmanca** cotek topê şerepnarê di biniyê kona da ça kirî  
avêtin teyarê teyara hanîne xwarê, halet û hacetê teyara belav kirî



tu nizanî îro heyfa cotê teyara ne gelo ji xwe ra ji te derkirî  
gidî dema li Bavê Şemsedîn dibû pêsîrtengiya di mêra  
bira hewara Bavê Şemsedîn bihata mêrê mêrxas, împolatê dewletê  
gelo vê sibengê bavê eşîrê Xalit begê Cibirî (Güneş-Şahin, 2018: 67)

Di perçeya ewil da misilmantî û bawerî derdikeve pêş ku li gor gotina dengbêj dîn û bawerî girîng e. Lewra bi devê wî tê gotin ku ew ji axiretê bawer dikin, sibê mirin li pêşiya wan heye û ew bên nefîkirin, cezakirin an jî dardakirin jî ev ne xem e, lewra baweriyêke xurt bi wan ra heye. Nasnameyêke dînî di van gotinan da xwe dide der ku ew di bin sîwana dînê Îslamê da wek misilman cih digirin. Di qisma duyem a kilamê da jî destê Xalitê Bavê Şemsedîn ku ew Kurd e hatiye girtin, fermana wî avêtine li stûyê wî û ewê bê cezakirin. Sedema cezakirina wî jî ew e ku Kurmancan teyareya hikûmatê anîne xwarê û alavên wî belav kirine. Ev nasnameya kurdbûn û kurmancbûnê di van rêzikan da xwe dide der ku bi awayekî xurt nîşan dide ku ew ji ber dijayetiya dewletê tên cezakirin.

Heke mîna keke din bê dayîn ew jî dibe ku kilama “Axao Ferman e” be. Di vê kilamê da risteyêke rasterast behsa neteweyê yanê kurdbûnê dike heye ku dengbêj dibêje “çi bikim destê **Kurdane** li ber rûyan e”. Dema em berê xwe didin kilamê ji deve Şakiro wiha tê gotin:

“...ferman e fermana Mîrê Mîran e  
tivêka teresê cendurman e  
hewar û gaziya qereqol û qaymaqaman e  
çi bikim destê **Kurdane** li ber rûyan e  
eşîr ji xwe re hêsîr mane  
berxê li peşya bavê te ne havîn e, ne buhar e,  
li pêşya me herçar rojê sar e  
ez nemînim vê sibengê qoce payîz û dîsa zivistan e...” (Güneş-Şahin,

2018: 80)

Risteya ewil a peyva fermanê hatiye dubarekirin ku balê dikşîne ser hêza dewletê, esker û cendirmeyên wê û fermana wan a serê Kurdan. Wek vê kilamê di gelek kilaman da behsa fermana Kurdan, fermana mîr, axa, şêx û began tê kirin ku ev hin caran ji bo dardakirina wan, hin caran ji bo kuştina wan û hin caran jî ji bo sirgûnkirina wan tê derxistin. Dema em berê xwe didin dîrokê him di dema Osmaniyan da û him jî di dema komarê da em rastî gelek polîtîkayên ji bo fermandayîne hatine meşandin tên.

Di kilama bi navê “Geliyê Zîlan” da jî gotinên “qanûna Tirka”, “siyaseta hukumata Tirkiyê” tên bilêvkin ku dîsa behsa Tirk û Tirkiyeyê tê kirin. Ji van rêzikan dîsa xuya ye ku nasnameyeke Tirkan a dijî nasnameya Kurdan heye, qanûnan derdixe, siyaseteke li ser tunekirina wan dixebite. Rêzikên kilamê ji hêla Şakiro va wiha tên bilêvkin:

“...Heya dunya xweş ava be gelo vê sibengê emê ji xwe ra bigerin

Li Zorava li Mala Hecî Mistefa

Ez ji te ra sond bixwim vê sibengê tim û tim cara sax be

Li serê çolan û çiya be

Heya fermana me **li qanûna Tirka** da rabe

Ez ji te ra sond bixwim vê sibengê

Ez dizanim heyra sax û silamet bim di nava eşîrê da vê sibengê

Derd û kulê me bi serê Geliyê Zîlan be...

...

Wey axao wey axao wey axao...

Bi kavirtî têr neçêriyayo bi berxtî têr nemijiyao

Li vê sibengê ji **siyaseta hukumata Tirkiyê** tu sêr bike

Di dêrîsê gunda da malxirabo ji xwe ra eman û sitara xwe nediyo

Tu sêr bike şevkî di nava cî û nivîn û yataxê xwe da ranezao” (Güneş-

Şahin, 2018: 48-49)

Mînakeke din jî dibe li ser kilama “Axao” bê dayîn. Di rêzikên ewil ên kilama “Axao” da dema behsa şer tê kirin tê gotin ku tivinga destê Seyîdxan tivinga Romê ye û ew xweş guleyan davêje, ew mêrekî mêran e ku methê wê divê bê dayîn. Dema kilam dewam dike Seyîdxan bangî Sidîqê Hecî Mistefa Begê dike ku bila rê li ber firaran berde ku ew bi silametî derbas bin herin. Lê Sidîqê Hecî Mistefa Begê nahêle ew derbas bibin û herin. Seyîdxan lê hêrs dibe, bangî wî dike û dibêje hukumeta Cumhûriyetê li dû kuştin û birîna serê wan e divê rê li ber wan bê vekirin. Di nav van rêzikên kilamê da em dibînin ku nasnameya kurdî xwe dide der, lewra ew wek firarê dewletê direvin, ew hikûmat ne hikûmata Kurdan e, nû hatiye avakirin, Kurdan tune hesab dike û dijî Kurdan e. Ji ber vê ye ku gelek serhildan çêbûne. Lê xala balkêş ew e ku ew li vir wek du eşîr û malbat dijî hev şer dikin ku Şakiro wiha distrê:

“Lo Axao Axao Axao...

Lo lo maqûlo sibe bû li diharê Cemalverdî diketim bavêj e

Tu bala xwe bidê helehelê lawê bava

Qîrçînê çapiliyan û martêlya  
 Tivinga destê Seyîdxan **malê Romê ye**  
 Barûda xwe dirêj e, gulê xwe xweş davêje  
 Herçî dîwana egîtê mala bavê mi tê da runîştî be  
 Bira kes rûmenê methê mêranya xwe nede, xeberê kin û dirêj mebêje rabe  
 .....  
 Sibe ye Seyîdxan derketî banê qesrê  
 Bi sê denga bang dikirî Sidîqê Hecî Mistefa Begê  
 Di bextê gora bavê te ketime  
 Pêşiya firarê me berde  
 Gidî firarê gune ne bira derbas be here  
 Hey malmîrat!  
 Çima tu nizanî çend salê me tamam bû **hukumeta Cumhûriyetê**  
**Li sirgûnkirina çolix û çocux û birîna serê me digere**  
 Sidîqê Hecî Mistefa Begê digo wele nabî bile nabî  
 Mi bi serê Şêx Badînê Dignûgê sond xwarî tu car nabî  
 Heya li dunyayê sax û silamet bim  
 Firarê Seyîdan û Beraza nayê bi silametî bi ser mi ra derbas nabî rabe...”

(Güneş-Şahin, 2018: 46)

Di dîrokê da şerê di navbera Êris û Osmaniyan da gelek in ku di Şerê Dinyayê yê Yekemîn da dema ew xwe digihînin Serhedê di navbera Êris û Kurdan da pevçûn çêdibin ku meriv dikare şopên wê demê di gelek kilamên dengbêjan da bi zelalî bibîne. Di van kilaman da tişta ku dikeve nav sînorên mijara nasnameyê balkêş e ku ew wek “Êris”, “kafir”, “gawir”, “sarî moskof” û hwd tîneswîrkirin. Dîsa li gor agahiyên van kilaman Kurdên dijî wan şerkirine û hatine kuştin jî wek leheng hatine qebûlkirin û ew wek “şehîd” hatine binavkirin. Di vê xalê da jî hêla nijad û baweriyê va du nasnameyên cuda hene; Êris yanê miletekî din, yê jî nijadeke cuda ne û ew jî hêla baweriyê va ne misilman in, gawir in, ya duyem jî Kurd in û ew misilman in. Ji bo ku em mînakekê bidin dema em berê xwe bidin kilama Şakiro ya bi navê “Bavê Dilşayê” em bi eşkere vê yekê bibînin. Ev kilama li ser Seîdê Nadoyê ji eşîra Cibran hatiye gotin behsa şerê di navbera komê eskerên Êris yê di 1915an da ketine Kopa navçeya Mûşê û Seîd (Bavê Dilşayê) dike. Li gor agahiyên Güneş û Şahin Seîdê Nado ji Anêra gundê Gimgima (Varto) navçeya Mûşê ye ku di vî şerî da tê kuştin (2018: 74). Di risteyên kilamê da agahiya berbiçav ew e ku Seîdê siwarê Gêjo (navê hespa wî ye) hatiye kuştin

û hespê wî Gêjo di bin cesedê wî da nikare bimeşe. Dengbêj Şakiro van agahiyên wiha li me dide zanîn;

“Axao şerekî li me çêbû li orta Kopê li Dêrikê  
hê wê hê bi qewaxê  
şahde û şûhdê Bavê Dilşayê li dinyayê pir gelek e  
firqekek eskerê **kafirê Sarî Moskof**  
îro ji êvar da rakiriye ji Kopê hê hê ji toprax e  
mi dî ji gavê din da Kokê ji wê da dihat li çogê xwe dixist gelo digiriya  
heywax li mi hê hê wê hê waxewaxê  
digo Cindî korayî di çavê min û te da hato  
derbekî **gawir** bedena Bavê Dilşayê ketiye  
tu sêr bike cinyazê Bavê Dilşayê  
li ser piştê Gêjo girêdane qisqivrax e  
bê Seîd here hê wê hê ku rêya dîn e ye (Güneş-Şahin, 2018: 74)

Wek ku tê dîtin firqeyeke eskerên Êris yên wek kafir û Sarî Moskof hatine teswîrkirin di navbera Dêrik û Kopê da şer kirine, Bavê Dilşayê jî di vî şerî da hatiye kuştin. Kokê destên xwe li çokên xwe dixê û ji Cindî ra dibêje çavên wan kor be ku cinyazê Seîd li wan vegeyriyaye, urt û ocaxa mala Elî Axa qeliyaye. Du navên di kilamê da derbas dibin li gor agahiyên Güneş dide ji malbata Seîd in, Kokê diya Seîd û Cindî jî apê wî ye (Ömer Güneş, Pêwendiya têlefônî, 16ê Çileyê Paşîn a 2022yan). Ev kilam cureyek zêmar e, êş û elema ji ber kuştina Bavê Dilşayê ya bi destê Êrisan bi me dide zanîn. Kodên nasnameyê di kilamê da zelal in, Êrisên ji dîn û nijadeke din in ketine axa Kurdan, Kurd jî li hemberî wan ji bo ax û welatê xwe şer dikin û nahêlin nav û namûsa wan biherime û ew têk biçin.

Peyva “Sarî Moskof” ya di kilamê da çend caran derbas dibe gotineke balkêş e ku ji bo Êrisan hatiye gotin. Peyva “sarî” peyveke tirkî ye ku ji bo rengê zer hatiye bikaranîn û wisa xuya dike ku ji ber porê wan ê zer Êrisan teswîr dike. Heke li gor konteksta kilamê bê nirxandin Êris wek nijad gelemperî çêrmspî, porzer û çavşîn in û peyva “sarî” ji bo wan dibe ku hatibe gotin. Lê li gor agahiyên Güneş û Şahin (2018: 74) jî rastiya peyvê “tsarî” ye, dema tê bilêvkirin tîpa “ts”yê di navbera “s” û “ç”yê da ye, yanê ne “s” ye û ne jî “ç” ye û dengbêjan ev peyv wek “s”yê bi lêv kirine û gotine “sarî” ku ev peyv di tirkî da jî wek “çar-çarlik” tê bilêvkirin. Yanê ji bo Êrisan û rêvebiriya wan a “çaritiyê” hatiye gotin. Jixwe dema meneya “moskof” jî bê lêkolînkirin ew ji bo Êrisan tê gotin (Îzolî, 2007: 409). Li gor ferhenga tirkî jî

(Komisyon, 2011: 1697) “moskof” sifatek e û ji bo kesên zalim, xedar, dilkevir û bêrehm tê bikaranîn.

Kilam bi pesnê Bavê Dilşayê va dewam dike ku dengbêj dixwaze bide nîşandan mêr li ser wî ra tune û ew her çiqas bê kuştin jî ew şehîd e. Ji bo ku ev êşa ji ber kuştina wî tê kişandin siviktir bibe û li hemberî vê êşê ew bikaribin xwe ragirin wiha tê gotin;

“...bi gotinê alim û kitêba dibê herçî kesê gula **Ûris** pêra lêkeve  
hewû gidî gelo xalis **şehîd** e şik û şubhe ji bonê tunîne  
Axaho şerekî li me çêbû li orta Kopê li Dêrikê  
hê hê hê wê hê hê hê hê li bilindciya  
şahde û şûhdê Bavê Dilşayê li dunyayê pir gelek e  
firqeke eskerê **kafirê Sarî Moskof**  
îro ji êvar da rakiriye ji Kopê hê wê hê ji mewziya  
mi dî ji gavê din da Kokê ji wê da dihat  
li çogê xwe dixist gelo bi waxê waxê hê hê digiriya  
digo Cindî korayî di çavê min û te da hato  
derbekî gawir bedena Bavê Dilşayê ketiye  
hînga mi dizanîbû ûrt û ocaxê Mala Elî Axa  
ji dine hê wê hê diqeliya  
bê Seîd here hê wê hê ku rêya dîn e  
bi gotinê alim û kitêba dibê herçî gula **Ûris** pêra lêkeve  
xalis şehîd e şik û şubhe ji bonê tunîne.” (Güneş-Şahin, 2018: 74)

Li gor baweriya Îslamê misilmanek heke li hemberî kesekî nemisilman (di kilamê da **Ûris** gawir û kafir in) cîhadê bike, ax û namûsa xwe biparêze û bê kuştin ew şehîd tê hesabandin. Li vir jî nasnameyeke dînî xwe dide der û Bavê Dilşayê li hemberî kuştina **Ûris**an wek “şehîd” tê qebûlkirin. Ji bo vê yekê jî alim (mela, seyda, rûspî, zana) û kitêb (Qur’an) referans tînan nîşandan. Yüksel jî dema balê dikşîne ser mijara “şehîdbûna” Seîd dibêje teseliya şehîdbûnê di çarçoveya civakî, siyasî û çandî da tê nirxandin û bi otorîteya axa û aliman tê îqrarkirin (2019: 341).

Binavkirina “şehîdbûnê” di kilama “Bavê Xalis Kekê Mexsê” da jî derbas dibe, tê gotin heke ew bimire şehîd û bimîne jî xazî ye. Lewra Evdilmecîd Begê Sipkî yê ku wek Bavê Xalis pesnê wî tê dayîn wek leheng tê teswîrkirin. Wî bi alayên xwe yên Hemîdiyeyê va ajotiye ser hêzên **Ûris** û bi zora şûrê xwe topa **Ûris** ji destê wan stendiye (Yıldız-Taşkın, 2018: 144). Di kilama ku Güneş û Şahin wek “Bavê Xalis Kekê

Mexsê”, Yıldız û Taşkın jî wek “Şerê Êris” di berhemên xwe da behskirine wiha behsa şehîdbûn û xazîbûnê tê kirin:

“...Axao li dîharê Dutaxa şewitî diketim ji dilê min û te ra bi dar û bî ye  
eskerê Bavê Xalis Kekê Mexsê dikişiya fenaî sî ye  
şahde şûhdê Bavê Xalis Kekê Mexsê li dunyayê pir gelek in  
bi zora şûr ajotiye ser topa Êris ji destê alayê sitandiye  
hûn ji bo Xwedê şahde bin heger bimire **şehîd** e  
gidfno bimîne **xazî** ye...” (Güneş-Şahin, 2018: 82)

Ji van risteyan em têdigihêjin ku şerê di navbera Osmaniyan û Êrisan şerekî dijwar e, tesîreke mezin li ser gelên herêmê kiriye. Bi saya kilamê agahiyên der barê şer da digihêjin nifşên nû, hişmendiyêke dîrokî çêdibe û her wisa bîra civakî ava dibe. Nifşên sed sal piştî vê bûyerê bijîn jî bi saya van kilaman têdigihêjin ku di rabirdûyê da di navbera gelan da şerekî mezin çêbûye. Her çiqas ew li gor dîroka xwe ya fermî xwe qehreman bihesibînin jî di wê demê da yên ji wan kêmtir nemane (lehengiyêke mezin nîşan dane) jî li ser wê herêmê jîyan e.

Di vê xalê da em bi kurtasî çend mînakên va behsa îfadeya “bavê filankesê” bikin. Di civaka Kurd da gelemperî mêr bi navê kurê xwe û bavê xwe tên zanîn û forma “bavê filankesê” û “kurê filankesê” zêdetir berbelav e. Lê her çiqas kêr be jî îfadeyên dervayî vê gotinê jî hene mînak her kes Dengbêj Evdalê Zeynikê bi navê diya wî va nas dike. Di kilaman da jî hin caran em rastî vê îfadeya ku mêr bi navê qîzên xwe tên binavkirin tên. Nasnameya mêrbûnê bi navê qîza xwe va tê saxlemkirin ku di kilama jor da îfadeya “Bavê Dilşayê” vê bikaranîna bi me dide nîşan. Kilam ji ber ku bi navê “Bavê Dilşayê” tê zanîn bi kurtasî dibe bê gotin ji ber jêhatîbûn û jîrekiya hin qîz û jinan ev form dişkê û bav bi navê qîzên xwe tên binavkirin. Mînakeke din jî “Bavê Xanimê” ye ku di kilameke din da Şakiro wiha behs dike;

“eskerê vî zalimê Cumhûra teze ye buhurê Mûradê li me biriye  
kesekî xwedanê xêra tunîne cewabekî bide Evdilmecîd li kavilya meftiyê  
bivê mala te xira be derbekî bi dest berdane bedena Xalis Begê  
berxê Mala Sêrxwûn **Bavê Xanimê** gula qaçaxa  
birîna vî xweşmêrî kûr e xedar e destê rastê nemînim wa li tiliyê” (Güneş-Şahin, 2018: 44)

Ji bilî vê di kilama li ser Cewher Axayê biraye Simko (ji eşîra Şikakî) yê bi destê hêzên Îranê hatiye kuştin tê gotin da jî navê wî wek “Bavê Gulîzerê” tê

binavkirin. Em bi saya kilamê têdigihêjin ku navê qîza wî Gulîzer e û ew siwarê Rîşal e;

“agirê kulê bikeve qewl û qirar û soz û bextê Şahê vê Îranê  
çawa bi destê **Bavê Gulîzerê**, siwarê Rîşal girtin  
li qonaxa kafirê Emir Nîzam cotek gulê tegeyayê bi dest berdanê”

(Güneş-Şahin, 2018: 100)

Ji bo îfadeya referansê dide qîzê minaka dawîn ji kilama “Silêmanê Keçel Bavê Mexsê” bo gotina “Bavê Hedyayê” dibe bê dayîn ku di rêzikên kilamê da ev nav jî wiha dibihûre;

“derbekî bi dest berdane bedena lawê Hesên  
tu bala xwe bidê heyfa teze hildan heyfa kem digere  
axao hûn bermedin, li orta Horîşanê û Qeregaziyê hûn bermedin  
le terka cinyazê **bavê Hedyayê** Siwarê Kuvî nedin” (Güneş-Şahin, 2018:

504)

Ji bilî navê qîzan û bavê wan hin caran em di kilaman da rastî îfadeya “kekê filankesê” jî tên. Ev gelemperî ji bo mêran tê bikaranîn, lê hin caran ji bo nîsbetê bide xwîşkan jî tê gotin. Mînak dîsa di kilamên “Silêmanê Keçel Bavê Mexsê” û “Bavê Xalis Kekê Mexsê” da em dibînin ku navê “Mexsê” heye ku ji bo xwîşkê ev hatiye gotin (Güneş-Şahin, 2018: 82-504).

Ji bo nasname û aîdiyetê mînakeke balkêş jî perçeyek ji kilama “Melûl Siwaro” derdikeve. Di kilamê da behsa lehengekî berê “Rustemê Zal” û “eshabên berê” tê kirin. Ji ber ku hem Rustemê Zal û hem jî eshabên berê ji bo dîne Îslamê şerên mezin kirine û gelekî wêrek bûne ev nav referans tên nîşandan, tê gotin ew ê jî îro li Qerqebazarê (gundekî li ser Kanîreşa Bîngolê ye) wek wan bi wêrekî şerekî mezin bikin;

“Melûl siwaro şerekî li me çêbû  
li Çemê Qasimiyê Melexidira şewitî hê hê li Pîngê Kelê  
Bavê Heydo Apê Romî ji malê siwar bû  
kumêt diavêt di yêrdegê çî go mi go he hû bi lebê belê  
Şerîfê Xelîlê Xeto bi sê denga bang dikirî go  
Hesê Muxsî lawo tu bavê bavê min bî çê be çê bixebite  
emê îro şerekî çêbikin li ser kaviliya Qerqebazarê  
fenanê şerê **Rustemê Zal, Eshabê he hû bi dewra berê**” e (Güneş-

Şahin, 2018: 505)

Civak hin caran bi lehengên berê yê wêrek ra pesnê xwe didin û xwe wek perçeyeke nasnameya wan dibînin ku ev hesta aîdiyetê li vir jî wisa ye. Bi referanseke dînî (eshab) va ev hatiye saxlemkirin û tê gotin çawa ew eshabeyên ji bo dîn şer dikirin, ji tu tiştî neditirsiyan ew ê jî wek wan jêhatî û wêrek bin û xwe ji bo vî şerî amade bikin. Li vir bi eshabeyan qesta wî kesên di dewra Hz. Mihememed da ji bo dînê Îslamê cîhad kirine, yê wek Elî, Emer, Ebubekir, Osmanî Hemze hwd in. Ew bi navên “şêrê Xwedê”, “şûrê Xwedê”, “nêçîrvanê şêra” û hwd. va bi nav û deng bûne û di hişê misilmanan da bi wêrekiyên xwe va cih girtine. Îfadeya “çê be, çê bixebite” jî di kurdî da îfadeyeke resen e, tê da hem şîretdayîn û hem jî hişyariyek heye. Ji kesê ku şîret lê tê kirin ra tê gotin ku bibe merivekî çê (baş), xwedî şexsiyet û jêhatî, paşê çê (baş) bixebite, hewl bide, xîretê bike ku tu bigihêjî armanca xwe û bi ser bikevî.

Kilameke din a behsa misilman û gawiran, nasnameyên dînî dike jî “Bavê Evdila” ye. Di kilama Şakiro ya bi navê “Bavê “Evdila” da diyar e ku xwîşka wê li ser mirina wî kilam gotiye. Peyvên misilman û gawir li vir jî balê dikşînin ser nasnameyeke dînî ka em binihêrin çî hatiye gotin:

“Lo lawo lo lawo lo lo lawo lo bira

Sube ye vê subengê ya ku hatiye pêşiya birê mi

Bira neyê serê kevir û kuçika vê sibengê û hirç û gura

Tu sêr bike ji gavê din va

Vê subengê bira neyê serê misilman û van gawir a” (Yıldız-Taşkın, 2018:

368)

Di kilama “Îbo Begê Parsînî” da der barê têkiliya Kurd û Ermeniyan da xalên balkêş derdikevin pêş me ku nasnameya kurdbûn û ermenîbûnê û têkçûna têkiliyan xwe dide der. Di dîrokê da kirîvatiya Kurd û Ermeniyan navdar e û gelek caran wan wek “kirîvo-kirîvê” bangî hev kirine. Ev gelên xwedî nasnameyên cuda her çiqas ji hêla dîn û nijadê va ne wek hev bin jî, ji ber ku li ser heman erdnîgariyê jiyane, bi dilgermî hev ra cînartî û bazirganî kirine, zarokên wan di pêşa hev da mezin bûne wek kirîv hatine binavkirin. Lê di nav demê da vê kirîvatî û têkiliya herdu gelan zirareke mezin dîtiye. Di çand û edebiyata kurdî da ev kirîvatî bûye mijara berhemên edebî jî, mînak di romana Eliyê Evdirehman ya bi navê “Xatê Xanim”ê da îmajê Ermeniyan îmajê baş e. Malbata Karapêtê Ermenî û Xatê Xanima hewl dide kurê xwe Sultan ji nav lepên eskerên dewletê xelas bike alîkariya hevdu dikin û wek kirîv pir qîmetê didin hev (Evdirehman, 2004).



Çelik jî bi hûrgilî behsa kirîvatiya Kurd û Ermeniyên dike û dibêje peyva kirîvatiyê di xwe da dostanî, nêzîkatî, hezkirin û muhebetê dihewîne, her çiqas bi qaydeyekî ne nivîskî be jî cureyek eqrebatiyê ye û ji ber vê xwedî hêzeke menewî ye jî (2015: 55, 71). Ev qewmên bi hev ra dostanî û hevaltî kirine hin caran xebatkar û berdestan jî li cem xwe dane xebatê û karê xwe teslîmî hevdu kirine. Lê ji ber sedemên polîtîk di nav demê da (piştî 1914-1915yan) dijminatîya wan çêbûye û ji herdu aliyên va jî gelek kes hatine kuştin. Kilama Îbo Begê Parsînî heke ji hêla nasnameya Ermenî û Kurdan va bê analîzkirin wê bê dîtin ku Ermeniyekî bi navê Xaçîk li ber destê wî xebitiye û wek ferdekî malê hatiye qebûlkirin, lê paşê wî îxaneteke mezin li axayê xwe kiriye (Güneş-Şahin, 2018: 68-71).

Di dema Şerê Dinyayê yê Yekemîn da (1914-1915) da Êris êrîşî axa Kurdan dikin, Ermeniyên wek çete tînin binavkirin jî piştgiriya didin wan û li gel wan tevdigerin. Li Parsîna Erziromê kesekî bi navê Îbo Begê Parsînî yê wek navdarê herêmê ye jî naxwaze malbata wî bikeve nav dest û piyan, ji bo vê jî dixwaze bar bike û ji herêmê here. Lê Xaçîkê berdestê wî jê ra dibêje ew ê wek xizmetkarekî wî piştgiriya bide axayê xwe ku bila ew ji wir neçe. Dibêje ew ê ji Êrisan ra bibêje Îbo Beg yekî baş e û bila dest nedin wî û malbata wî. Lê Xaçîkê vê gotinê dibêje paşê xiyanetê ji axayê xwe ra dike û dibe sedema qetilkirina hemû malbatê. Xala herî girîng ew e ku Ermeniyê di kilamê da wek “Xaçîk” û “marus” tê binavkirin çav berdide jinên malbata Îbo Beg û ji ber vê nebaşîya wî rewşeke gelekî trajîk diqewime û malbateke Kurd tevahî ji holê radibe.

Di kilamê da Îbo Begê torinê Mala Hecî Qero yê li herêmê navdar e ji qehweçiyê xwe ra dibêje qasî ku bi dûrbînê xuya dike Xaçîkê Ermenî û qaymeqamê qumadarê wî rê ketine ber bi mala wî va tînin. Fermanê dide qehweçî ku ji wan ra qehwe û çayê çêke, ew bi awayekî mêvanperwer mazûvaniya wan bikin, li ber wan şermî nebe da ku ew qisûrekê nebînin û dest nedin malbatê. Şakiro bi devê Îbo Beg wiha bangî qehweçiyê xwe dike:

“vê sibengê li qehweçî kir qêrîne  
go bexê vê sibengê bike wa bilezîne  
tevdîra çay û qehwekî wa bibîne  
şitavekî ji dîwana axayê xwe ra bibîne  
minê du siwar li rêya Parsîna Jêrîn dîne  
**Xaçîk** e bi tevî **kamandarê wî ne dîn e dujman e**  
bira neyê tu qisûrê li Axayê te da nebîne

dema vê sibengê qahweçî qehwa şîr û şekir dikelîne  
berdabû fincana zêrîn e  
dabû ser tabla zîvîn e  
vê sibengê malxirabo çavê wî li rê û dirbê dimîne  
nêhêrî vê sibengê **kafirê Xaçîk** e  
siwarê li dû dajo qaymeqamê kimandanê wî ne  
gelo vê sibengê di derê dîwanê xwe li erdê dixîne  
tu sêr bike vê sibengê Îbo Beg hespa ji desta distîne  
tevê qehweçî hespa li hêwşa tewla da dikişîne” (Güneş-Şahin, 2018: 68)

Bi fermana axayê xwe qehweçî qehweyê çêdike û li ser tablaya zîvîn dibe ber mêvanan îkramê wan dike. Lê Xaçîk û qumandarê wî (wek kafir, marus, serxosên aqil di serî da tune tèn teswîrkirin) pêhna xwe li siniya qehweyê dixin dirêjînin û çav berdidin namûsa (jin, bûk û qîza wî) Îbo Beg. Ev jî dibe sedema kuştina Xaçîk, qumandar û hemû ferdên malbatê. Di dawiya dawî da jî xwekuştina Îbo Beg tê behskirin. Heke dewama kilamê bê guhdarkirin ev bûyera trajîk wiha diqewime:

“...sêr bike vê sibengê tu dêhna xwe bidê qehweçî  
qehwê li ber **Xaçîkê kafirê** Xaçî qaymeqamê kimandanê wî digerîne  
papaxê xwe ji serê xwe dertîne  
**serxoş e aqil di serî da tunîne**  
li binê tablê dixîne  
qahwê di ser qahweçiyê Îbo Begê da werdigerîne  
go lawo tu here ji Axayê xwe ra bibêje bidikirîne  
Necîbe Xanim qîza wî ye, Eyšan Xanim bûka wî ye  
Fadîme Xanim jina wî ye  
bira ji min û qaymeqamê kimandanê mi ra bîne  
tîne bira bîne gava ku nayni  
ezê seferekî li ser çêbikim  
heyânî dunya ava be kesî ji bîr neke  
kesî di emrê bavê xwe da şixulê wiha nedîne  
vê sibengê malxirabo qahweçî dike fixan dizarîne  
xwe bi tewlexanê ra digihîne  
tu sêr bike vê sibengê ji Îbo Begê ra dibê didikirîne  
Îbo Beg dike wa dilezîne  
vê sibengê ra xwe bi yalî heremê ra digihîne  
tu bala xwe bidê li Necîbe Xanimê kir qêrîne

go dayka minê bike bilezîne  
 qatek çekê rismê ji bavê xwe ra bîne  
 vê sibengê van **kafira dîn û dujman e**  
 dewa namûsa me dikîne  
 lawo Mala Hacî Qero malekî giran e  
 heyani roja îro kesîretîke weha giran li ber çavê xwe nedîne...” (Güneş-Şahin, 2018: 68-69)

Şakiro dema vê kilamê dibêje bi dengê gelek bi şewat distirê ku yên guhdar dikin jî xwe di nav wê rewşa xirab da hîs dikin. Wek tê zanîn ewlad û malbat li ber şevê her kesî şirîn e, lê dema Necîbe Xanima qîza Îbo Beg ji bavê xwe ra dibêje ji bo ku namûsa wan di dest û piyan da nemîne qetla wî li bavê wî helal e, destê Îbo Begê naçe ku qîza xwe bikuje. Ji qîza xwe ra dibêje “piştî xwe bizivirîne” ku ew bikaribe wê bikuje. Di gelek kilamên kurdî da peyva felekê derbas dibe, yên navê felekê bi kar tînin dijî qedera xwe derdikevin, gilî û gazindê şans û siûda xwe dikin û jê dixeyîdin ku çima ev tişt hatiye serê wan û aqûbeta wan wisa xerab bûye. Dawiya kilamê bi gazinda felekê va diqede ku wiha ye:

“go hey wax felek te çima li me wa kir  
 xelkê çolix û çocixê xwe bi destê xwe xilas kir  
 Îbo Begê torinê Mala Hacî Qero, berxê Mala Dîbo di Sîbo  
 tu sêr bike koka çolix û çocixê xwe anî  
 bi destê xwe çolix û çocixê xwe di binê şûr ra derbas kir  
 ax hey wax wax wax hey wax û wax  
 heya dunya xweş ava be Îbo Begê torinê Mala Hacî Qero  
 berxê Mala Dîbo bi Sîbo  
 emê vê sibengê ji xwe ra bikin axîn û hey waxîne hey waxîne. (Güneş-Şahin, 2018: 71)

Di çanda kurdî da peyva felekê gelekî berbelav e, felek wek “feleka xayîn”, “feleka malixirab”, “feleka zalim” û hwd tê terîfkirin û berpîrsê her tiştî xerab tê nîşandan. Sûcê li holê li stûyê felekê tê alandin ku mînak helbesta Berken Bereh ya bi navê “Qelen” ji rasterast dijî felekê hatiye nivîsin û Bereh ji felekê ra meydanê dixwîne:

“Feleka xayîn  
 Ji xelkê re şîr û mast  
 Ji me re  
 êş û jan

Xem û kul didoşe  
Ka bêje  
ey feleka xayîn  
Qelenê te  
çend qurîş e?  
Ger xwîn bixwazî  
Va ye ez  
serê xwe datînim  
li ber xencerê  
pêşî min bikuje! (2011: 41 )

Wek vê helbesta Bereh di vê kilama Îbo Beg da jî gilî û gazind ji felekê tê kirin ka çima aqûbeta torinê Mala Hecî Qero wiha bû. Dijî nasnameya Ermeniyana ya ku bû sedema qetla malbatekê nasnameya hevpar a kurdbûnê derdikeve pêş û êşeke hevpar di dilê guhdaran da xwe dide der. Bi vê rêzika dibêje “xelkê çolix û çocixê xwe bi destê xwe xilas kir” va tê gotin xelk û alem li ser axa xwe bi zar û zêçên xwe ra di nav aramiyê da dijîn û paşê dimirin, lê Kurd mecbur dimînin bi destê xwe zar û zêçên xwe bikujin. Yan jî şert û merc wan dixê nav atmosfereke wisa ku Kurd an yek bi yek an jî komî tên kuştin. Gilî û gazinda ji felekê tê kirin di kilama “Kekê Xiyasedîn” da jî tê bihîstin. Lewra di vê kilama ji bo Şêx Seîd hatiye gotin da Şakiro li ser navê Kurdan, nasnameya Kurdan û dîndarên Kurd yê baweriya wan bi Îslamê heye ji felekê dixeyîde, wê sûcdar dike ka çima Şêx Seîd hatiye girtin û keleka Îslamê welgeriya ye:

“Bi destê kekê Xiyasedîn digirtin kelemçe dikirin

Dane pêşiya cotê cendurmê sungûlî ne

Berê wî dane Enqerê Horgofê nava hezar û pênsed mêrê di mefine

**Feleka** malixirab lema keleka dîne Îslamê weldigerîne...” (Güneş-

Şahin, 2018: 58)

Nasnameya ku meriv wextê xwe terîf dikin bi kar tînin piralî ye û kesek dikare çend nasnameyan bi hev ra di şexsiyeta xwe da bihewîne ku ev ji zayend, dîn, nijad, ziman û hwd pêk tê. Di van kilamên Dengbêj Şakiro yê hatin şrovekirin da jî hat dîtin ku kurdbûn wek nasnameyê sereke xwe dide der. Lê di heman demê da nasnameya dînî ya ku baweriya Îslamê ji xwe ra dike palgeh jî li gel kurdbûnê di kilaman da hatiye bikaranîn. Ji hêla zayendê va jî gelemperî bal li ser nasnameya mêrbûnê hatiye kişandin ku ev hemû bi rêya kilaman gihîştine roja îro û di bîra civakê da cih digirin.

## 4.2. ŞOPÊN ZIMAN

Têkiliya însanan ya bi ziman ra ji destpêka mirovahiyê vir va heye ku li ser rûyê erdê çiqas civakên cuda hebin hema bibêje ewqas zimanên ji hev cudatir hene. Ziman wek navgînekê di navbera wan da têkiliyê ava dike ku ew hevdu fêm bikin, binasin, fikr û hestan bi hev ra parve bikin. Ji ber erdnîgariyê, hawirdor, çand, bazirganî û têkiliyên însanan di navbera zimanên li herêmekê tên axaftin da danûstendin çêdibe, ew bandorê li ser hev dikin û hin gotin û peyv derbasî hev dibin. Kurdî jî wek ziman ji malbata Hînd-Ewropayê (Indo-European) ye. Di nav vê malbatê da bi sedan ziman û zarava hene ku ew ji hêla milyonan însanan va tên axaftin. Di vê malbatê da ji bilî kurdî zimanên wek îngilizî, farisî, hindkî, peştûkî, urdukî, ermenkî, îspanyolî, fransî, almanî û rûskî cih digirin. Wek zimanekî ji malbata Hînd-Ewropî kurdî jî bi 4 zaraveyan xwe yên sereke kurmancî, soranî, goranî û zazakî (kirmanckî) va zimanekî girîng e ku ji hêla milyonan Kurdan va tê axaftin.

Ziman tenê ji bo ku di navbera însanan da têkilîdanînê ava bike nayê bikaranîn, ew di heman demê da ji bo avakirin û parastina nasname, dîrok û çandê jî tê bikaranîn. Zimanê ku di civakê da tê axaftin ferdên civakê haydar dike ku ew xwedî nasnameyekê ne, dîrokeke wan a hevpar heye û çandê wan a taybet ya ku wan ji çandên din cuda dike para wan. Ev xalên ku hatin rêzkirin paşê bîreke hevpar ava dikin, ew bîra hevpar jî dîsa bi saya ziman derbasî nifşan dibe û tê parastin.

Hemû gotin bi saya ziman tên vegotin ku çanda dengbêjiyê jî li ser ziman û vegotinê ava bûye. Kilamên dengbêjan bi rêya deng û zimanê wan neqlî roja me bûne ku girîngiya ziman wek navgîn bêtir derketiye pêş. Ev kilamên hatine gotin ne çîrok in, hemû kodên çand, dîrok û kevneşopiyê di xwe da dihewînin. Bi saya ziman em hay ji mijarê, lehengan, dîrok û mekanên ku bûyer lê derbas bûne dibin. Kilamên ji ziman tesîrê digirin dîsa vedigerin tên bîrê diparêzin ku ev jî xaleke balkêş e. Kilam ji ber ku ne berhemên nivîskî ne, bi saya ziman yanê gotin û deng hatine avakirin û feydeyê didin civakê ku haya ferdên civakê ji çand, dîrok û kevneşopiyan çêbibe.

Di vê xalê da heke bi çend hevokan va behsa zimanê ku Dengbêj Şakiro bi kar aniye bê kirin wî bi zaravayê Kurmancî û devoka Serhedê kilam gotine. Çawa ku her dengbêj xwedî uslûb û şêwazekê ye Dengbêj Şakiro jî her wisa xwedî şêwazê taybet e. Wî kilam li gor deng û hestên xwe gotine, devoka Serhedê gelekî baş bi kar aniye, peyv û gotinên vê herêmê bi zelalî ji devê wî herikîne. Hema bibêje ji sedî sed bi Kurmancî kilam gotine, lê di nav kilamên wî da hin peyv û gotinên ji zimanên din yên

wek tirkî, erebî, farisî û rûsî jî hene. Ev jî wek ku hatibû gotin tesîra zimanan a li ser hevdu ye ku ev nijad wek herêm cînarên hev in û bixwazî û nexwazî têkiliya aboriyê, çandê û siyasî çêdibe û ziman ji hev pey û gotinan digirin. Dengbêj Şakiro kilamên curbicur (mijarên wek evîn, eşq, siruşt, jin) gotine, lê mijara me kilamên li ser şer, pevçûn, serhildan û komkujiyan in. Ev kilam dîroka fermî rasterast qebûl nakin ku em li ser wan hûr bûn. Li vir jî em dikarin bibêjin ziman dikare dîroka fermî ya ku hînbûna wê li ser însanan tê ferzkirin û tê xwestin ku her kes lê bawer bike serobino û pûç bike.

Zimanê kurdî her çiqas ji hêla milyonan va bê axaftin jî di dîrokê da gelek caran rastî astengî û qedexekirinan hatiye ku hê jî ev astengî dewam dikin. Li Komara Tirkîyeyê di 1925an da dema Plana Islahatê ya Şerqê hat îmzekirin di vê çarçoveyê da zimanê kurdî jî hat qedexekirin. Her çiqas ziman bê qedexekirin jî Kurdan di malên xwe da zimanê xwe parastin û nehîştin ku ew bê jibîrkirin. Ji bilî ferdên civakê û malbatên ku kurdî diaxivin ziman bi saya berhemên çanda devkî jî hat parastin û ji holê ranebû. Dengbêjan jî wisa zûbizû dev ji ziman û kilamên xwe bernedan. Kilamên wan ên behsa şer, pevçûn, evîn, siruşt, qeza, afat, qîzrevandin, şîn û şahiyên dikin bi saya ziman û sewta wan her mayînde man û bîra civakî jî her wisa bi rêya kilaman hat parastin. Dengbêj Şakiro jî yek ji wan dengbêjan e ku bi ziman û devoka ku bi kar aniyê va bîra civakî parastiye. Kilamên xwe bi kurdî gotiye, heta wisa ku di nav risteyên kilaman da navê zimanê kurdî an jî zaravayên kurdî (kurmancî, zazakî, soranî û goranî) rasterast bilêv kiriye. Mînak di kilama “Ferzende û Xalis Beg” da risteyeke behsa zaravayê “kurmancî” dike wiha derbas dibe:

“Ezê çi bikim îro ji êvara Xwedê da felek xayîn e

Emê ji xwe ra bi **Kurmancî** bibêjin dayê gelo bi berjêrî bibêjin yadê

Tu dêhna xwe bidê vê sibengê bihara welatê me Serhedê hatiye...” (Güneş-Şahin, 2018: 105-41)

Di van risteyên kilamê da peyva kurmancî balê dikşîne ser ziman û paşê behsa hin hûrgiliyan tê kirin. Dengbêj dixwaze nîşan bide ku heman peyv (dayê-yadê) li deverekê cuda û hin deverên din jî cuda tê bikaranîn. Dibêje li Serhedê ji bo dayikê peyva “dayê” tê bikaranîn, lê herêmên berjêr “yadê” tê gotin. Zimanê kilamê kurdî û zarava jî kurmancî ye, lê heman peyv di nav sînorên heman civakê da bi awayên cuda tên bikaranîn. Ev dewlemendiya ziman nîşan dide. Lewra Kurdên ji herêmên cuda bibêjin dayê, yan jî bibêjin yadê ev ne pirsgirêk e, bi van peyvyan va di hişê civakê da

teswîra “dayik”ê çêdibe û ev zimanê hevpar wan tîne bal hev û di nav endamên civakê da têkiliyeke xurt ava dike.

Ji risteyên kilamê peyveke balkêş jî felek e. Dema ev peyv bê gotin endamên vê civakê yên ziman baş dizanin fêhm dikin ku gilî û gazindek heye û ew gazin ji felekê tînin kirin. Li gor çanda kurdî dema bûyereke xirab çêbibe, aqûbeteke nebaş bê serê yekî ji bo sûcdarkirinê kesek/tiştêk tê hilbijartin ku ew jî “felek” e. Di rastiyê da felek ne kesek e û ne jî tiştêkî şênber e. Meneyeke simbolîk û metaforîk li felekê hatiye barkirin ku ji bo hemû şaşî, xirabî, nebaşî û fitneyê ew tê sûcdarkirin. Meriv dikare bibêje ew şûna qedêr, siûd an jî bextê tê bikaranîn û ji bo ku li hemberî Xwedê û qedêrê serfirakirinek çênebe, rewşa heyî bi hêsanî bê qebûlkirin ew wisa tê qebûlkirin. Wek ku me berê jî anîbû ziman li ber çavê civakê felek xayîn e, ne baş e û ne adil e ku ev tiştên xirab tînin serê Kurdan û ew her tim êşê dikşînin û dimirin. Bi mînakê peyva felekê va em taybetmendiyêke ziman dibînin ku ew jî ev e; bi saya ziman û peyvên di hişê civakê da simbol û metafor dikarin bi hêsanî bînin avakirin.

Di kilama “Hemê Mûsekî” da jî îfadeya “kurê kurmancan” derbas dibe. Heke em li ser vê gotinê hûr bibin, em dibînin ku ew hem balê dikşîne li ser nasnameya kurdûnê û hem jî wê meneyê dide ku Kurmancên bi zimanê kurdî diaxivin jîr û jêhatî ne. Lewra di vê îfadeyê da pesnê Kurmancan hatiye dayîn ku ew bi şervanî û lehengiya xwe va tirsê didin kesên li hemberî xwe. Di risteya kilamê da hişyarî û çavtirsandin heye, ziman bi hostatî û edebî hatiye bikaranîn ku Şakiro wiha dibêje:

“Gelo vê sibengê malxirabo

Dema ku vê gotinê divê dinirkîne

Go lawo te daxê **kurê kurmancan** li ber çavê xwe nedîne

Ku bi ser meriv da dikine qîrin û qûtîn e

Meriv dizgîna hespê xwe şaş dike riya xwe nabîne

Serê rima di qolinca meriya da diçikîne” (Yıldız-Taşkın, 2018: 216)

Ji bilî kilama “Hemê Mûsekî” ya li jor hat behskirin, di kilama “Bavê Tesîmê” da jî dîsa îfadeya “kurmancan” derbas dibe. Em li vir jî dikarin bibêjin gelê jê ra dibêjin Kurd heye ku ji wan yên kurmancî diaxivin hatine teswîrkirin. Tê gotin ji wan hinekan fesadî û şeytanî kirine û caw dane Kelhan Paşa û wî jî hêzên xwe berhev kiriye, li dora “Bavê Tesîmê” yê ku wek kelehêkî li hemberî wan xurt e girtiye û di dawîya dawî da ew hatiye kuştin. Ev perçeya kilamê bi îfadeyêke balkêş dest pê dike ku ew jî “lawo tiliya bavê te çavê min û te ra here” ye. Yên ziman baş dizanin ji vê îfadeyê têdigihêjin

ku meneya rastîn ne ev e ku tiliya xwe ji çavê kesekî ra bikî, meneyeke mecazî di vê gotinê da xwe dide der. Yê ku heyfa xwe li wî tîne ji ber rewşa Bavê Tesmîmê li ber xwe dikeve û êşa dilê xwe bi vê îfadeyê tine ziman. Şakiro wiha dibêje:

**“go le lawo tiliya bavê te çavê min û te ra here**

le belkî agirê kulê bikeve mala fesad û şeytanê me **Kurmanca**

li kîrre Qirîjdaxê ciwab didane Kelhan Paşa

berhev kirî firqa Entabê, Helebê, Mêrdîn û Meraşê, Siwêrek û Meletiyê

le gava dor li bavê te digirtin tu kesekî nedisekinî wa li pêşiyê

bavê te fenanî kelakî disekinî wa li pêşiyê

derbekî bi dest berdane bedena bavê te da

birîna wî kûr e xedar e li deqa pêş eniyê

îstiqameta bavê te dane şehre Qamişliyê

cinyazê bavê te ma li Çiyayê Selexanê li nava xelkê Qeregêçiyê <sup>“23</sup> (Güneş-Şahin, 2018: 90)

Ziman ji bo îfadekirina hest û fikran, fêmkirin û ferasetê navgîneke bêhempa ye ku em di kilaman da hem ji hêla gotin û îfadeyan û hem jî bi rêya hunerên edebî yê ku hatine bikaranîn dewlemendiya zimanê kurdî dikarin bibînin. Bi saya ziman em di kilaman da şîn, şahî, xemgînî, kelecânî, tirs, evîn, lehengî û hemû hestên mirovî dibînin û dibin şahidê gelek bûyeran. Di kilama “Eliyê Purto” da hin gotin û îfadeyên wisa têrhuner hene ku meriv metel dimîne. Ji wan îfadeyan hinek wiha ne;

“Elî berxê dilê dayika te bi deman e wê yî e... hê bi deman e

Eliyo berxê dilê dayika te bi deman e

**genimê rasta Bişêriyê hêşîn bûne**

**li çemê xwûnê tamamî simbil dane**

temî weyseta mi li te be

xwe ber mede pêşiya vî Dewazî vî qewazî

va zalima mêrekî bi kefilê bi deman e

şûrê xwe şandî li Bilîsê girêdaye bi donzdeh kîsan e

li ser şûrê wî dinivîse **“qesasê serê bîst û çar mêrê busulman e”**

dilo hayê ha ha li mine” (Güneş-Şahin, 2018: 453)

Di destpêka kilamê da gotin ji deve dayika Eliyê Pûrto derdikevin. Ew kurê xwe dişibîne berxan û jê ra dibêje “Elî berxê”, paşê teme û wesyetan li wî dike ku ew dernekeve pêşiya Dewazê Pûrmîs. Lewra ew merivekî zalim e, zalimbûna wî wisa

---

<sup>23</sup> Eşîreke Kurdan e.



navdar e ku li ser şûrê wî “**qesasê serê bîst û çar mêrê busulman e**” hatiye nivîsin. Şibandina Elî ya wek berxan hunera ziman nîşan dide ku hunereke edebî hatiye bikaranîn. Gotina “qesasê serê bîst û çar meran” jî bi meneya kujerê bîst û çar merivan yanî ji bo nîşandana zalimbûn û nebaşbûna wî wek sembol hatiye bilêvkirin. Ev hejmara bîst û çaran helbet rasterast ne bîst û çar e, lê armanc ew e ku bê nîşandan ka ew yekî çiqas kujer û zalim e. Ev îfadeyên bi rêya ziman hatine gotin wek gelek zimanên din ji bo zimanê kurdî jî dewlemendiyê nîşan didin. Wek gelek zimanan di kurdî da hin hejmar sembolîk in û ew wek 2, 4, 6,7 12, 24, 40, 70, 100, 1000 û hwd dikarin bên rêzkirin, Ji bo her yekî meriv dikare şîroveyên berfireh bike û ji zargotina kurdî mînak nîşan bide. Ji bilî vê, kilam bûyerê bi têrhunerî radigihîne civakê ku bîreke hevpar di hişê civakê da çêbibe, haya civakê ji wan kesên navên wan tên behskirin çêbibe. Rêzikên kilamê yên paşê dewam dikin jî bi devê Elî tên gotin. Ew ji diya xwe ra dibêje dema mêrikê fileh hacetên di destên wî da hildide îfadeya “berxê te” yanê kurê te bi kar tîne, ev îfade di nav xwe da hezkirin û şîrîniya berdil jî nîşan dide û ji bo dijminê li hember jî dibêje mêrikê fileh (nemisilman). Rêzikên kilamê wiha ne;

“Dayê rebenê dema Dewazê Pûrmîs li koka darê li mi qêriya  
le **mêrê fileh** halet hacetê **berxê te** hilda direviya (Güneş-Şahin,  
2018: 453)

Di zimanê kurdî da hin îfade hene ku ji bo mêranî, şervanî û qehremaniyê tên bikaranîn ku gelekî balkêş in. Di gelek kilamên ji bo vê xebatê hatin hilbijartin da ev îfade yan rasterast an jî bi veşartî dibe bên dîtin. Armanc pesindayîna mêrbûn û wêrebûnê ye ku mînak; dibêjin “mêrekî çargurçik e”, “dilê wî wek polayê ye”, “ew mêrekî wek şêran e” û hwd. Îfadeyên “çargurçik”, “dîlpola” û “şêr” ji bo bale bikîşînin ser cesaret û mêrxasbûnê tên gotin ku di kilamê da jî ev riste xwe dide der. Elî xwe wek çargurçik bi nav dike û dibêje **çar gurçikê dilê berxê te bûn gurçikek ji nava dilê mi qetiya**”. Her çiqas çargurçikbûna (cesaret) wî tîk biçe jî ew wek kesekî wêrek tê zanîn, bi saya ziman û îfadeyên hatine bikaranîn civak wî di hişê xwe da diparêze û nahêle ew bê jibîrkirin.

Dema kesek di civakê da tê dinyayê rasterast zimanê wê civakê hîn dibe û bi saya wî zimanî bîr û baweriyên wê çandê di mêjiyê xwe da bi cih dike. Lewra ew êdî perçeyek wê çandê ye û ziman ji bo wî/wê dibe navgînek ku bi ferdên din ra tîkiliyê daye. Ji bo civaka Kurd jî her wisa ye, mînak di nav gel da hin îfade hene ku gelekî

balê dikşînin, dema ew bi rêya ziman tên bilêvkirin wateyeke xurt çêdibe û endamên vê civakê têdigihêjin ku ka xwestiye çi bê gotin. Di kilamê da dema diya Elî dibêje “**lawo dayika te bibe hirça şengêla dev geliya/gurê pişt hêşînê dû keriya**” guhdarên ku ziman baş dizanin û ne xerîbê vê çandê ne fêhm dikin ku dilê dayikê ji bo kurê wê pir dişewite, ew heyfa xwe kurê xwe tîne û xembariya xwe tîne ziman. Ji bo vê jî van gotinan bilêv dike ku bê zanîn ka ew çiqas bêçare maye, çiqas diljan e û dixwaze tiştek neyê serê kurê wê. Ev gotin heke rasterast bînin guhdarkirin wê bê gotin ku dayik dixwaze bibe gur an jî hirç, lê bi rêya ziman bi awayekî xurt hunera şibandî (teşbîh) hatiye bikaranîn û meneyên din derketine holê. Dîsa gotina “hêsirê çavê dayika te tê fena avê cûckê çavkaniya” jî nîşan dide ku diya Elî ji bo kurê xwe gelekî digirî, rondikên çavên wê, hesîrên ku dibarin wek çavkaniyekê ne, wisa zêde ne ku nikare bê terîfkirin. Ev hemû kodên ziman û çandê ne ku meriv şopên wan di kilamê da dibîne.

Hemû kilamên Dengbêj Şakiro bi kurdî hatine gotin, lê di nav van kilaman da hin peyv û gotinên ji zimanên din (tirkî, erebî, farisî, rûskî, ermenkî û hwd) ên ji hêla cînarên Kurdan va tînin axaftin jî tînin dîtin. Ev jî nîşan dide ku civakên cînarê hevdu ne bi rêya ziman ji hev peyv û îfade hildane, têkiliya wan bi hev ra çêbûye ku şopên wan hem di ziman da û hem jî di çandê da tînin dîtin. Ji navê kesan bigire heta navê mekanan, ji navê nebat û heywanan bigire heta navê eşyayan şopa zimanên din bi rehetî di nav civakan da tînin dîtin. Cînartiya civakan xwe di cînartiya zimanan da jî nîşan dide. Ji ber vê ye ku folklor, edebiyat, çand û huner jî ji vê bêpar namînin. Mînak di kilama “Ez Reben im” da Şakiro dibêje bi tirkî nizane navê wî çi ye, lê kurmancî leqeba wî ra dibêjin Seyîdxanê Kal e û li me nîşan dide ku zimanê tirkî jî li rex civaka Kurdî ye.

“Gava li bavê Salih dibû pêsîrtengiya di mêra

Keskî xwedanxêr tunîne ji gavê din da

Cuwabekî bide li Binxetê li ba Sulhedîn birayê dilşewitî

Bi Tirkî nizanim bi **kurmancî** leqeba wî ra dibêjin Seyîdxanê Kal e

(Güneş-Şahin, 2018: 103)

Ji bo vê mijarê heke em behsa hin peyv û gotinên ji zimanên din ketine nav zimanê kurdî û ji hêla Kurdan va tînin axaftin bikin, em dikarin ji kilama “Teyrê Îspir”ê jî çend mînan nîşan bidin. Di rêzikeke kilamê da peyvên “galoş”, “potîn” û “îrşad”ê hatine bikaranîn ku Şakiro wiha dibêje;

“Ez nemînim nemînim

li piştî bavê Şêx Elî Riza şêxê **îrşadê**

cotê **galoş potînê** Diyarbekirê neqetînim

neqetînim dayê...” (Güneş-Şahin, 2018: 103)

Galoş (galoche) peyveke fransî ye ku ji bo layloneke wek poşetan tê bikaranîn. Dema meriv dikevin cihên wek nexweşxane, muze yan cihên divê zêde qirêj nebin galoşan li ser solên xwe da pê dikin ku ev mekan paqij bimînin. Potîn (bottine) jî dîsa wek galoşê peyveke fransî ye ku di kilamê da derbas dibe. Potîn tê meneya solên lastîk yê heta quzeka lingan dirêj dibe û bendên ji bo girêdanê li ser wan heye. Her çiqas gelê Fransayê ne cînarê Kurdistan bin jî zimanê wan ji heman malbatê (Hînd-Ewropî) ye. Dibe ku ji ber vê, yan jî ji ber ku gelek peyvên fransî derbasî civaka Tirkan bûye û ji wir jî derbasî zimanê kurdî bûne. Peyva “îrşad”ê jî peyveke erebî ye ku di kilamê da bala me dikşîne. Ev jî tê meneya hişyariyê, nîşandana rêya rastîn ku Ereb û Kurd heman peyvê bi kar tînin û termînolojiyeye dîni di xwe da dihewîne. Mînakên bi vî rengî dibe gelekî bînan dayîn, lê ev çend peyvên hatin dayîn têrê dikin ku mijar zelalî bê fêmkirin.

Ji van mînakên hat dîtin ku ziman wek navgînekê kilaman gihandiye roja me, nasname û bîra civakê parastine. Kilamên bi saya ziman hatine gotin wek neynikekê şîn, şahî, evîn û lehengiya civakê nîşanî me didin, nahêlên şexs û bûyer ji bîra civakê derkevin. Di mijara ziman da herî dawîn em dikarin bibêjin ku di navbera ziman û civakê da têkiliyeye xurt heye, dema ziman qels bibe, hest, raman û tevgerên civakê jî qels dibin. Piştî ku feraseta civakê kêmbibe civak ber bi tunebûnê va diçin û piştî demekê jî ji holê radibin. Tesîrên demografîk, afat û belayên siruştî, şer, pevçûn û komkujî, tesîrên civakî, zor û zextên çandî, aborî û polîtîka û alavên ragihandinê yê girseyî ji bo qelsbûnê û jîholêrabûna ziman û civakan çend hêmanên sereke ne ku li hemberî wan divê ziman bê parastin.

### 4.3.ŞOPÊN MEKANÊ

Cihê ku behsa însanan lê bê kirin ziman û mekan jî rasterast dibin mijar ku ev him bi tena serê xwe û him jî bi hev ra jiyanê diherikînin. Însan li gor çand û civaka xwe mekanên ku lê dijîn bi nav dikin. Ev mekan ji mal, tax, kuçe, kolan, gund, bajarok, navçe û bajaran pêk tên û tevahiya wan jî jixwe welat û erdnîyariyekê ava dikin. Ji ber vê binavkirinê şopên ziman, çand û civakê li ser navê mekanan çêdibin. Însanên li van deran dijîn mohra xwe li ser navan dixin û ji ber vê ye ku di hişê her yek endamê civakê da ew nav erdnîgariyeye fîzîkî û hişî ava dikin. Lewra tiştê kolektîf heye û her kes endamê wê erdnîgariyê ye û ji ber vê ev hişmendî ava dibe.

Delikaya jî balê dikşîne ser girîngiya ziman û binavkirina cih û waran û wiha dibêje: “Kontrola erdê bi rêya zimên pêk tê -çunku navê cih pêkhênereke ziman e- û di nav vegêranên zimanî de wekî parçeyêke jiyana rojane navê cihan jî tesîrê li têgihîştina me dike” (2021: 5). Lê dema ev nav bi destê erkekî (desthilatdariyekê) bi zimanekî din bîn guhertin, binavkirinên nû derkevin holê ku desthilatiya vê erkê li ser van mekanan çêdibe û ziman jî tesîrê dibîne, hişê merivan jî û ji bo desthilatiyê meşrûiyetek çêdibe. Ew êdî li gor xwe civakê bi rê va dibe, pergalekê ava dike û civak jî ji gelek aliyan va diguhere. Yanê êdî kontrol dikeve destê desthilatiyê û ew li gor daxwaz û berjewendiyên xwe tevdigere, jiyana û hişê însanan bi destê xwe diguherîne.

Dema însan dijîn di nav zemanekî da, li mekanekê (cih û war) dijîn û bi saya ziman bi hev ra têkiliyê datînin. Yanê ew (zeman, mekan, ziman) perçeyên bîra çandî û civakî jî ava dikin ku me berê jî behsa girîngiya mekanê kiribû. Mekan ji bo bîr zindî bimîne hêmaneke gelek girîng e û însan bûyeran gelemperî bi mekanê va bi bîr tînin. Mal, tax û gund, bajar, welat û ax yên ku çarçoveyêke mekanî ava dikin çawa ku ji bo bîra şexsî girîng bin, her wisa ji bo bîra civakî jî pir girîng in. Ev ne tiştên wisa bêrûh, bêhereket û bêwate ne, bereqsê vê ew bîr û bîranînê diparêzin, tesîrê li ser ziman û nasnameyê dikin û rê li ber jibîrkinê digirin. Mekanên hişî, mekanên fizîkî, mekanên civakî û mekanên bajarî hene ku her yek tesîrê li ser bîra însanan dike.

Wextê însan diçe rojên xwe yên berê û tiştêkî tîne bîra xwe ev tişt ne di valahiyekê da ye, li mekanekê ye. Ew rojên bihûrîne di mekanekê da derbas bûne û bûyerên qewimîne an jî kesên bi wan ra têkilî hatine danîn jî her wisa li wî mekanê bûne. Yanê bîreke mekanî jî di hiş da derdikeve pêş û însan bîranînên xwe wisa parve dikin. Helbet navên taybet ên van mekanan hene û ew bi zimanê wê civakê va hatine binavkirin. Di navdayîna cih û waran da bîr, dîrok, bûyer, çîrok, serpehatî, erdnîgarî, nasname, ziman, folklor û çanda devkî şopa xwe nîşan didin û her nav xwedî paşxaneyekê ye jî. Ji bo însanan nav û navdayîn çiqas girîng be, ji bo navê mekanan (cih û war) jî nav ewqas girîng e. Rasterast nebe jî gelemperî meriv dikare bi navên mekanan va der barê civakekê da bibe xwedî hin agahiyan.

Cih û warên Kurdan jî ji bo wan cihên ewle ne, ew xwe di nav van cihên nas da muhim dibînin, xwe aîdê van mekanan dihesibînin û li van deran xwe aram hîs dikin. Lewra ev der ji bo wan wek malzaroka dayikê ewle ye. Him li ber çavê wan û him jî di hişê wan da nexşeyêke cih û waran ya ku bi ziman, nasname, çand û dîrokê hatiye xêzkirin heye ku ferdên civakê xwe girêdayî vê çandê dibînin. Dema mirov ji

mekan, cih û warên nas û xwe afd dibînin diqetin an jî tên jidûrxistin (sirgûn) hesteke xerîb û nebaş xwe davêje dilê wan, lewra ew ji koka xwe û civaka lê dijîn dûr dikevin. Bi taybetî jî dema ev jidûrketin ne li gor dilê wan be, ew bi zorê hatibin qewirandin ku sirgûn jî yek ji wan e ew bêtir aciz dibin û zehmetiyan dikşînin. Lewra ev cihê nû ji bo wan xerîbistan e, talûke ye û ne aram e.

Heke em berê xwe bidin têkiliya mekan û bîra civakî di kilamên Dengbêj Şakiro da em dibînin ku bi sedan navê gund, navçe, bajar, çiya, zozan, çem, kolan, deşt, newal, gelî û hwd derbas dibin ku her yek bi tena serê xwe lêkolînê heq dike. Ev rêzikên kilaman ên ku navê mekanan lê derbas dibin ji ber ku bi zimanê kurdî hatine binavkirin, li van deran bûyer qewimîne, şopa lehengan li bajar, çiya, gund û navçeyan heye ev mekan ji hêla bîra civakî va gelekî girîng in. Lewra ew kodên zimanî, çandî, dîrokî û civakî di xwe da di hewînîn, der barê çand, civak û nasnameya kurdî da agahiyan didin me. Me di vê binbeşê da kilamên ku tê da navê mekanan derbas bûne berhev kirin û xwest nîşan bidin ku ew di kurdî da çawa hatine binavkirin, li van mekanan çi bûye, di hişê civakê da ew çima bîreke hevpar ava dikin.

Di kilaman da gelemperî mekanên cihên ji hêla civaka Kurd va baş tên zanîn (Serhed, Çemê Muradê, Çiyayê Bilîcanê, Xinûs, Milazgir, Pira Batmanê, Elcewaz, Diyarbekir, Bidlîs, Entab, Xerzan û hwd) cihên hin bûyer, şer, pevçûn lê qewimîne (Geliyê Zîlan, hepîsxaneyê Diyarbekirê, der û dora Çiyayê Agirî) an jî hin kesên di civakê da pêşeng in tînin hişê mirovan (Xinûs, Qolhesar, Enqere) hatine bikaranîn. Gelemperî cih û warên di nav sînorên Tirkiyeyê da derdikevin pêş ku jixwe hema bibêje ji sedî nodê wan wek cihên Kurd lê dijîn tên pêşberî me. Ji ber ku Dengbêj Şakiro ji herêma Serhedê ye û bûyerên qewimîne zêdetir li navçe û bajarên Serhedê çêbûne cih û mekanên Serhedê di kilaman da zêdetir hatine bikaranîn. Lê hin cihên wek Enqere, Stenbol, Zongildax, Selanîk, Almanya û hwd yên ji dûrî erdnîgariya Kurdan in jî balê dikşînin.

Ji bilî erdnîgariya Tirkiyeyê navê cih û warên din yên wek Îran, Sûriye, Misûl, Bexda, Heleb, Şam yanê cihên ku Kurd ji bakur reviyane çûne van deran ku xwe ji destê dewletê an jî kesên li dû wan ketine xelas bikin jî di kilaman da hatine bilêvkirin. Almanya û welatên xerîb yên wek duwalên ecnebî tên binavkirin û tê gotin li wir kesên nemisilman û ji nijadên din dijîn jî di hin kilaman da hatine behskirin. Lewra Kurd ji bo xebatê çûne wan deran an jî hatine sirgûnkirin ku ev welatên xerîb jî di kilaman da wek mekan bûn mijara me.

Kilama Şakiro ya bi navê “Sê Zerî” rasterast nakeve sînoren xebata me, lê ji ber ku ev mekanên me li jor behsa hinekan kir ji devê wî çawa hatine teswîrkirin û di bîra Kurdan da çawa tînan zanîn bê nîşandan em ê qismekî kilamê li vir binivîsin. Wê bê dîtin ku cih û warên Kurdan ên navê wan hatine gotin li gor ziman û çanda wan û li gor taybetmendiyên wan deran tînan zanîn. Şakiro wiha behsa hin bajar û navçeyan dike;

“...Ciyê me Bexda yi  
 Entaba Helebê ciyê weliya yi  
 kaviliya Mûşê ciyê feqiya yi  
 Korta Bîtlîsê ciyê şexan û mela yi  
 welatê Elaşgirê ciyê rênberan û çifçiya yi  
 kûraniya Entabê ciyê axa û axalera yi  
 nav Hesena ciyê siwaran û rimbaza yi  
 Eledax mexelê hogeçan û miya ye meskenê yêşilbaşa yi  
 Kosedax mîrê çiya yi  
 Gilîdax mexelê pezkuyiya yi  
 Sîpandax ciyê şehîdan û xaziya yi  
 belekê berfê heliya li etegê Bilêcanê mayi  
 Enqere şewitî textê di paşa yi  
 Sûra Diyarbekirê sertacî sûra yi  
 Siwêrekê li me anî koka feqîr û fiqara yi  
 Erzuruma rengîn ciyê zozana yayle yi...” (Güneş-Şahin, 2018: 249)

Kilamên navê mekan, cih û waran lê derbas dibin ji hêla civakî û polîtîk va nexşerêyeke balkêş ava dike. Guhdar dizanin ku kal û bavên wan li van cihan jiyane û li van deran bûyer qewimîne, ji ber vê hişmendiyê kolektîf ava dibe. Ev jî ji hêla bîra civakî va pir girîng e, lewra ev mekan tiştên hevpar tînan hişê mirovan. Bi saya van kilaman û mekanên wek, çiya, gelî, çem, bajar, hepîsxane, gund, pire û hwd di hişê civakê da nexşerêyek, dîrokek, zimanek, nasnameyek, çandek tê avakirin û parastin. Mekanên navê wan di kilaman da derbas dibin hin caran dibin sembola berxwedanê, hin caran dibin sembola têkçûnê, hin caran jî dibin sembola eşq û evînê. Rêyên leheng tê da meşiyane, çiyayên ew hilkişiyane, bazarên tişt lê hatine firotin û kirîn, bajarên şer û pevçûn lê çêbûne, hin şexsiyet lê hatine kuştin, dardakirin an jî hepiskirin, kelehên însanan ji êrîşan parastine, çemên însanan tê da avjenî kirine an jî

xeniqîne, pireyên însan ji ser ra derbas bûne û hwd hemû di qada mekan û bîra civakî da têkiliyekê ava dikin.

Di kilaman da herêmên Kurd lê dijîn nav bi nav derbas dibin ku nexşerêyek li ber çavê mirov xêz dibe. Ev nexşerêya bi awayekî xeyalî li ber çavan zindî dibe der barê herêmê da agahiyên berfireh dide guhdaran. Hamelink û Barış jî balê dikşînin li ser kilamên dengbêjan yên ku erdnîgariyeke Kurdan ya bi nexşeyeke xeyalî hatiye xêzkirin ava dikin û dibêjin dengbêj behsa navên cih û waran, nîşaneyên fizîkî dikin û herêma Kurdan di di hişê Kurdan da ava dikin (2014: 184).

Connerton balê dikşîne rejimên totalîter ku ew hişê civakê heps dikin, wan jî bîra xwe dûr dixin û bi awayekî rêk û pêk hewl didin tiştan bidin jibîrkirin (2014: 30). Desthilatdar her tim jî bo ku têkiliya rûhî û fizîkî ya civakê ji van mekanan qut bikin, dîrokeke fermî binivîsîn, erdnîgariyeke li gor berjewendiyên xwe bi nav bikin, navê cih, bajar û gundan diguherînin ku ev jî di nav demê da hêdî hêdî bîra civakî ji holê radike. Lê çawa ku darek nikare bê şax bigihêje, civak jî her wisa nikarin bê dîrok, bê bîranîn li ser piyan bimînin. Her çiqas ev bîranîn jî gel di nav xwe da dîsa jî şûna navên nû yên hatine guherandin navên wan ên resen bi kar tînin, li dijî fermiyetê tevdişerî ku ev jî li ber parastina bîra civakî sekneke xurt e û ji hêlekê va jî parastina bîra mekanî ye.

Heke em berê xwe bidin hin kilamên Dengbêj Şakiro yên navê mekanan rasterast lê derbasbûne, em dikarin bi dehan mînak nîşanê bidin. Di hinekan da navê bajarên sereke derbas dibin ku mînak wek bajarên Diyarbekir, Enqere, Erzirom û Mûşê ev çend caran derdikevin pêş me. Di kilama “Hemê Mûsekî” da Hemo bangî Şarê dike ku ew qehweyeke ji şîr û şekir ji apê xwe ra bikelîne û berde fîncana zêrîn ku navê bajarê Diyarbekirê derbas dibe ku Şakiro wiha dibêje

“Bi bîst û çar awayê qîzanî xortanî li ber apê xwe bigerîne  
Xwe bi heremodasiyê ra bigihîne zîne Seklavî ji qilif derîne  
Seklavî ji tewlê bikşîne zîne **Şamî** li nav milê bîne

Gema **Diyarbekirî** vê sibengê malxirabo li dêv bixîne...” (Yıldız-Taşkın, 2018: 217)

Bi vê rêzîkê va em hem navê Diyarbekirê dibihîzin û hem jî em pê derdixin ku gema ku davêjin devê hespan li Diyarbekirê zêde tê firotan û gema wê derê tê firotan navdar e. Lewra ev bajar cihê bazirganiyê ye, qerebalix e ji ber vê her tiştê lê tê firotan. Di heman kilamê da navê hin mekanên din jî derbas dibin ku ew “Şam”, “Rasta

Rasteleyn”, “Gêdûka Elorozi”, “Diyarê Beytulxidir” û “Kevirê Xidirbekirê” ne. Di vê kilama behsa lehengiya Hemê Mûsekî tê kirin da dema qîza malê Şarê li ber derî ji apê xwe Hemo ra qehweyê dikelîne dibîne ku sîwarek ji dûr va xuya dike û ber bi mala Hemo va tê ku xeberekê ji wî ra bîne. Hemo jî dixwaze dûrbînê bide ber çavê xwe ku siwarê tê baş bibîne ka ew kî ye, gelo jê ra xebera nexêr tîne an jî wê mizgîniya tiştêkî bide wî. Ji ber vê ew ji Şarê ra wiha dibêje:

“Darê dûrbînê ji apê xwe ra bîne

Apê te derkeve Remaqê tewrê jorîn e

**Rasta Rasteleynê li gêdûka Elorozi**

Li diyarê **Beytulxidirê** ji kevirê **Xidirbekirê** wê da

Ew sîwarê tu dibê hela bi çavê xwe bibîne” (Yıldız-Taşkın, 2018: 215)

Wextê em kilamê guhdar dikin şûna apê Şarê em dûrbînê didin ber çavê xwe û çavê xwe li wan cihên ku Hemo yek bi yek rêz dike digerin. Her çiqas em van deran bi çavê xwe bi awayekî fizîkî nebînin jî, di hişê me da mekanekî hişî ava dibe. Ew der perçeyek erdnîgariya Kurdan e ku ew lê dijîn. Lewra binavkirina van deran bi zimanê kurdî ye, Şarê û Hemo Kurd in, mekanê behsa wan tînin kirin jî perçeyên axa Kurdan in. Îhtimaleke mezin niha navê van cihan bi zimanê tirkî hatine guherandin, lê ev kilam nahêle di bîra civakê da ew der bi navên xwe yên kurdî bînin jibîrkirin. Hem haya me ji bûyerê çêdibe, hem zimanê kurdî tê parastin û hem jî dîrok û mekan di bîra civakê da zindî dimînin.

Di hişê Kurdan da bajarê Enqereyê (paytexta komarê) her çiqas sembola dewletê û fermiyetê be, cihê ku ferman lê tînin dayîn û qanûn jê derdikevin be zanîn jî, navê Diyarbekirê jî hin caran li cem navê Enqereyê bi hev ra tê bilêvkirin. Lewra lingekî dewletê yê herêmê jî li Diyarbekirê ye, ew kar û barên xwe yên der barê herêmê da li wir bi rê va dibe. Wek kilama li jor navê Diyarbekirê derbas bû di kilama “Mala Mehmûd Begê” da jî em navê Diyarbekirê û Enqereyê li gel hev dibihîzin ku Şakiro wiha dibêje:

“Bekirê Axê bi sê denga ba dikirî digo Heseno lo lawo

Ez tu carî terka **Golî şewitî** nadim heyânî

Fermanê min ranabe ji son mehelê ji **Diyarbekir Enqere...**” (Yıldız-Taşkın, 2018: 343)

Kilamên ku navê Diyarbekirê tê da derbas dibin gelek in ku em çend mînakên din jî bidin. Di kilama “Teyrê Îspîrê” ya li ser girtin û dardakirina Şêx Seîd hatiye gotin



da jî wek mekan navê Diyarbekirê derbas dibe. Lê ji bilî Diyarbekirê navê hin cihên din jî derbas dibin ku ew “Kop”, “Melazgir”, “Mûş”, “Xinûs” û “Îran” in. Diyarbekir di vê kilamê da jî dîsa mekanekî girîng e. Lewra em ji rêzikên kilamê têdigihêjin ku “Bavê Şêx Elî Riza”, “Teyrê Îspirê”, “Şêxê îrşadê û dîrega Îslamê” yanê Şêx Seîd û hin kesên li ser şopa wî beşdarî serhildana dijî komarê bûne û hatine girtin. Ew li Diyarbekirê di girtîgehê da ne û ewê li wir bèn dardakirin. Ev mekanên behsa wan hatin kirin di nav rêzikên kilamê da wiha derbas dibin;

“Le hê hayê hayê hayê...

sibe ye Qudretê bi sê denga bang dikirî

go de lê lê Muhbetê korê bi nemayê

sibe bû minê li dîharê Kelê bi **Kopê**

**Mûş** û **Melazgirê**, **Xinûsê** diketim

minê li qêrînê li qûtînê li hewarê li gaziyê

tu sêr bike li vê zulmê wa zilaletê

kesekî xwedanî xêra tunîne

cuwabekî bide Seyîdê Nêriyê

bê erê Seyîdo te ocaxî koro

tuyê li wî kevirî çî sekiniyî

bavê Şêx Elî Riza şêxê îrşadê dîrega dîne Îslamê

Teyrê Îspirê sibengê tu sêr bike

li bajara **Diyarbekir** girtin

tevî dusid suwarî ji êvara Xwedê da avêtin vê nezaretê...” (Güneş-Şahin,

2018: 65)

Wek ku tê dîtin, hem behsa navê bajarê Diyarbekirê, Mûşê û hin navçeyên wê (Kop, Melazgir) hatine kirin, hem jî behsa Xinûsa navçeya Erzîromê tê kirin. Ji bilî navê meknan haya me ji bûyereke dîrokî jî çêdibe ku ew jî Serhildana Şêx Seîd e, em têdigihêjin ku serhildan têk çûye, pêşengê wê Şêx Seîd û rêhevalên wî li Diyarbekirê hatine girtin û paşê jî li wir hatine îdamkirin. Bi saya vê kilama Şakiro hin mekan, hin şexs û bûyereke dîrokî di bîra civakê da tê bicihkirin û rê li ber tê girtin ku ew bèn jibîrkirin.

Dema meriv kilamên dengbêjan guhdarî dike û çîrokên wan hîn dibe, êdî meriv bi çavekî din û bi hişmendiyêke din kilaman guhdar dike. Lewra êdî peyama di kilamê da tê dayîn, hûngiliyên der barê ziman, çand, huner, nijad, kevneşopî, civak, şexs, bûyer, mekan û erdnîgariyê da baştir tîr fêmkirin û ew hunera bi rêya deng û gotinê

dikeve kerika guh agahiyên gelek berfireh dide guhdaran. Di kilama “Lê Lê Dayê (Mala Nêsir)” an jî “Şerê Mala Nêsir” da dema behsa şerê navxweyî tê kirin, jinên malbatê vê kilamê wek zêmarê dibêjin. Kilam bi devê Emîne Xanimê tê gotin û ew ji Huzna Xanimê ra wiha dibêje:

“Tu rabe emê bi destê hevdu bigrin xwe berdine şarê bajara **Diyarbakir**

Qasekî rûnên gelo derê dikanek ji dikanê van heciya

Emê ji siwar û peyayê di mala Nêsir ra

Bazar bikin gule û barûdê vê sibengê

Ji Rizgan Axa ra, ne wele vê sibengê ji Xalîte bira ra

.....

Şahde şihûdê torinê mala Nêsir gelek in li dewrana di dinyayê

Berî berxê Mala Ezo dane **Girê Zivînê** derbas kirin **newala Çurîkî Çayê**

De bira berxê Mala Ezo herin li dîwana rûnên

Lingê xwe bi ser hev ra bavêjin qulab qulab cixarê xwe bikşînin

Li kêleka pîrekan pesnê xwe bidin

Bêjin me yê derbekê bi dest berdayê

Bedena Huznî beranê qemer, torunê Mala Nêsir

Îro sê roj û sê şev e cinyazê vî egîtî mabû li **Girê Zivînê**

**Newala Çurîkî Çayê** li ber surê vê sermayê wayê...” (Yıldız-Taşkın,

2018: 213)

Wek ku tê dîtin navê bajarê Diyarbakirê di kilamê da tê bilêvkirin, behsa dikanan, firotina gule û barûdan tê kirin. Di mînakê jor da jî behsa “gemê Diyarbakirê” yên hespan hatibû kirin. Bi van mînakên va tê dîtin ku Diyarbakir bajarekî mezin û qerebalix e. Li wir Kurd, Tirk, Ermenî, Suryanî, Ereb û hin nijadên din bi hev ra dijîn, danûstendinê dikin, tesîrê li ser çanda hevdu dikin. Di vî bajarê ku navên wê di dîrokê da wek Amed, Kara Amid, Dîgranagerd, Amida tê binavkirin (Nişanyan, 2010) bazirganî pêşva çûye, ew cihê çûyîn û hatinê ye, ji bo herêmê navendeke girîng e. Diyarbakira bi sîr û bircên xwe yên dirêj, Baxçeyên Hewselê, dêr û mizgeftên xwe va wek muzeyeke servekirî ye li dinyayê jî baş tê zanîn û di van salên dawîn da ji ber ku ev der bîst parastin li ser Lîsteya Mîratên Dinyayê ya UNESCOyê hat zêdekirin. Ev bajarê Kurdan a xwedî nîrxên hunerî, berhemên qedîm û dîrokeke taybet e, bi vê xebatê va êdî bûye bajarekî dinyayê.

Ji bilî Diyarbakirê di kilamê da navê du cihên herêmê “Girê Zivînê” û “Newala Çurîkî Çayê” jî derbas dibin. Qasî ku tê fêmkirin şer li vê herêmê çêbûye û cinazê

Huznî yê ku wek bi sîfat û şibandîna “beranê qemer” pesnê wî tê dayîn û dibêjin ew egîdê mala bavê wan e bûye çend roj ku li wir maye. Yıldız û Taşkın dema kilam deşîfre kirine wek “*Newala Çurîkî Çayê*” nivîsîne, lê Şahin û Güneş navê kilamê wek “Şerê Mala Nêsir” bi nav kirine û li cihekî navê van deran jî wek “*Newala Çurîkî Çayê*”, li cihekî din jî wek “*Newala Kûrûkî Çayê*” deşîfre kirine (Şahin-Güneş, 2018: 503).

Yek ji kilamên Şakiro ya herî navdar jî kilama “Reben im”ê ye ku ew behsa neyartiya du eşîrên Kurd dike. Hin peyv hene ku bi devê jinan tèn vegotin, yanê peyvên jinane ne ku meriv dizane ku jin wê peyvê bi kar tînin. Wek “ez gulîbira Xwedê”, “min porkurê”, “min rebenê” û hwd. Peyva “reben”ê jî di destpêka vê kilamê da qasî heft û heşt caran li dû hev tê gotin ku meriv dizane ev kilam seranserê xwe şîngirtinê di xwe da dihewîne û bi deve jinekê hatiye gotin. Dubarekirina vê peyvê him ji hêla hest û gotinê û him jî ji hêla hunerê va kilamê xurttir dike û tesîreke hestiyar li ser guhdaran dihêle. Jina ku vê peyvê dibêje bi awayekî belengaz û bêçare behsa êş û xemgîniyê dike û xebera reş dide. Dibêje ji wî kesî an jî ji wê rewşa xirab a qewimiye ra heyf û guneh e ku ev tişt çêbûne. Ji ber peyva “reben im”ê meriv têdigihêje ku tiştên nebaş hatine serê kesekî. Jixwe dema meriv denge Şakiro guhdar dike, ev êş, keder û xemgîniyê xwe bi zelalî dide der. Di vê kilamê da behsa neyartiya Mala Emerê Mihê (eşîra Rema) û Mala Êsivê Seydo dike ku ev du malbat dibin dijmin hev. Di kilamê da navê hin mekanan “Çemê Xezaliyê”, “Pira Batmanê” û “Gura Seyîda” dibihûrin ku Şakiro wiha dibêje:

“Hedo digo Têlo rebenê sibe ye şerekî li me çêbû

Li **Çemê Xezaliyê**, li ser **Pira Batmanê**, li **Gura Seyîda** bi kendal e...”  
(Güneş-Şahin, 2018:103)

Di gelek kilaman da bi taybetî jî yên ji herêma Serhedê da kilam bi bangikirinê dest pê dikin. Kesek bangî kesekî dike ku ew guhê xwe baş bidê ka çi qewimiye. Hin caran jinek bangî jineke din dike (xwesî bangî bûkê dike an jî xwîşk bangî hev dikin), hin caran mêrek bangî jinekê dike (kur bangî diya xwe dike wek dayê rebenê), hin caran jî mêr bangî mêran dikin (xal, ap, xwarzî û birazî). Di vê kilama ku jinek bangî jina din dike da jî navê hin mekanan (çem, pire, gur) derbas dibin. Ev mintîqeya behsa wan di kilamê da tê kirin di nav sînoren Batmanê da ye. Jixwe herdu eşîr jî li wir pevçûne û meriv hatine kuştin. Yanê dîsa mekanên li ser erdnîgariya Kurdan pevçûn çêbûye.

Kilama “Ûskanê Bira” an jî ya wek “Elîfê-Emînê-Ûskan” tê zanîn behsa kuştina birayê wan “Ûskan” dike. Herdu xwîşk Elîf û Emîne ji bo cinazê birayê xwe bibînin derdikevin rê. Ev kilama ku Reso dibêje ji hêla Dengbêj Şakiro va jî hatiye gotin ku ji herêma Xerzan e. Elîf û Emîne heta cinazê birayê xwe bibînin gelekî ked didin, diçin cem axa û serokeşîran, li hin deveran dinihêrin û di dawiya dawî da xwe digihînin cinazê Ûskan. Di kilamê da navê “Çemê Badîşo” “Girê Derbendê”, “Girê Xumalo”, “Qesroka Ortê”, “Qesroka Jor”, “Qesroka Jêrîn”, “Newala Hopê”, “Erzika Jêrîn”, “Erzika Jorîn” û “Dara Silo Hemzo” wek meknanan derbas dibin ku ev beşa kilamê wiha ye:

“Elîfê go lê lê lê lê Emînê xwangê tu rabe  
 Minê şeva îşev xewnekî dîtîbû di xewê da  
 Dilê min porkura Xwedê çuqa jê ditirsiya  
 Mi dî eşîra Mala Dîbo, Mala Faro, Mala Quto  
**Li çemê Badîşo, Derbendî Wêran, newala Hopê**

Bi devê sûsteman û çapiliya li hevdu dialiya...” (Güneş-Şahin, 2018:

482)

Di kilamê da dema Elîf û Emîne piştî bi çend kesan ra diaxivin û xwe digihînin Hesênê Ozmîn yê ku birayê wan kuştîye cihê cinazeyê hîn dibin. Hesênê Ozmîn cihê kozika xwe ya ku Ûskan lê hatiye kuştin ji xwîşkên wî ra salix dide. Di vê qisma kilamê da jî navê hin cih û meknanan derbas dibe ku wiha hatine bilêvkirin:

“...tu rabe ez salixê kozika xwe ji te ra bidim  
 xwe berde **Ezika Jorîn, Ezika Jêrîn**  
**qesroka jorîn qesroka jêrîn**  
 li ber **dara silo Hemzo deviya piçûk**  
 kozika ortê kozika min e  
 cinyazê birayê xwe bibîne  
 sed yazixa vî xweşmêrî lê...” (Güneş-Şahin, 2018: 488)

Ev navên meknanan yê hatine bilêvkirin di nav risteyên kilamê da çar pênc caran tèn dubarekirin ku di hişê guhdaran da ev mekan zexm bi cih bibin û bibîranîna van deran hêsantir bibe. Lewra di çanda devkî da dubarekirin pir girîng e û meriv bi saya van dubarekirinan tiştan ji bîr nakin û bi salan ew berhemên devkî digihêjin roja îro. Ong jî balê dikşîne li ser vê mijarê û dibêje di çanda devkî da ji bo agahiyên hatine hînbûn neyên jibîrkirin dubare kirin hewce dike (2018: 37). Li gor agahiyên Dengbêj Salihê Qûbînê dide Iskanê Qesîm di şerê Emê Gozê da hatiye kuştin texmînî di sala

1892yan da ev bûyer qewimî ye û destnîşan dike ku Newala Hopê ya li gundê Hopê ya di binê Qubîniyê da ye, Erzika Jêrîn û Erzika Jorîn yên ku navê wan di kilamê da hatine gotin jî gund in eşîra Elika lê dijîn û ew jî dîsa li herêma Qubîniyê ya Batmanê ne. (Salihê Qûbînê, Pêwendiya têlefônî 12ê Hezîrana 2022yan)

Mînaekeke der barê mekanan da jî ji kilama “Xalis Begê” dibe bê nîşandan ku di kilamê da navê “Bana Xopa”, “Gawir Mencûlî û “Murad” tèn bilêvkirin ku Şakiro wiha distrê:

“Axawo, axawo

Sibe ye şerekî li me çêbû qaleka li me qewimî

Heyla lo mîro li **Bana Xopa** ji xwe ra vê subengê çiya bi çiya

Sibe ye min dî dîkê **Gawir Mencûlî** li ser kozika

Xalis Begê Bexê Mala Serxûn Bavê Xanimê gula qaçaxa

Ji êvar da li hev geriya

Lê Xalis Begê bi sê dengê ba dikirî go Ahmedo

Lo lawo tu çê be çê bixebite

Eskerê vî zalimî bihurê **Muradê** li me biriye...” (Yıldız-Taşkın, 2018:

297)

Navê Banê ya ku wek Bana Xopa di kilamê da tê bilêvkirin gundekî li ser Milazgira navçeya Muşê ye. Ev gund li quntarê çiyayê Qertewînê (navê tirkî wek Kartavin Dağı hatiye guherandin) ye. Ev çiya jî dikeve navbera herêma Milazgira navçeya Mûşê û navçeyên Dutax (Entab) û Patnosa Agiriyê. Gawir Mencûlî jî dîsa li herêma Serhedê cihek e ku tê fêmkirin eskeran li nêzîkî çemê Muradê ew dorpeç kirine û li van mekanên navê wan derbas dibe bûyer qewimîne.

Di kilama “Siwar” da navê “Horîşan”ê tê bilêvkirin û ew wek “Horîşana şewitî” derbas dibe. Ev îfadeya bişewite, wêran bibe, xirab bibe, kavil bibe û hwd di gelek kilamên din da jî derdikevin pêşberî me. Mînak dibêjin Mûşa şewitî, Bîngola şewitî û hwd. Çima wisa dibêjin heke bê şîrovekirin meriv dikare bibêje li van deran bûyerên xirab qewimîne, meriv lê hatine kuştin û birîndarkirin. Ji ber van bîranînên nebaş ev der li ber çavê van kesên wisa dibêjin êdî reş dibin û ji ber vê hestê ev gotin ji devê wan dipekin. Horîşan herêmeke li ser navçeya Dutaxê (Entab) ya li ser bajarê Agiriyê ye. Navê Dutaxê jî niha bi zimanê tirkî wek “Tutak” hatiye guherandin. Di kilamê da mijar dîsa şer e, du lawê Gozelê gula li ser Hesenê lawê Xelîl da berdane ku Şakiro wiha dibêje:

“...lê dayê rebenê sibe ye şerekî li me çêbû

li **Horîşana şewitî** li nokê...” (Yıldız-Taşkın, 2018: 301)

Kilama “Tahir Xan” yek ji kilameke herî navdar a Şakiro ye ku di nav Kurdan da tê zanîn. Di vê kilamê da jî behsa erdnîgariya Kurdan ya li herêma Îranê tê kirin. Serdarê Kurdên Îranê Tahir Xan li hemberî Şahê Eceman serî hildide, lê ji ber ku eşîrên Kurd piştta wî nakin û wî bêpişt dihêlin ew têk diçe. Di vê kilamê da jî behsa navê “Çiyayê Qeleniyê”, “Çiyayê Sîpanê-Sîpandaxî” û “Kela Makuyê” tê kirin. Çiyayê Qeleniyê li tanga Bazîda navçeya Agiriyê li aliyê Rojhilatê ye (Güneş-Şahin, 2018: 76).

“Bêje dayê rebenê berfekê li me barî li **çiyayê Qeleniyê**

Tu sêr bike **Sîpandaxî** bişewite ji xwe ra malxirabê wa bi dar e

Eskerê şahê Ecem eskerekî giran e...” (Yıldız-Taşkın, 2018: 306)

Di dawiya kilamê da dema Tahir Xan têk diçe, hespa wî Gogerçîn ku li ber çavê wî gelekî bi qîmet e li dû wî bêxwedî dimîne. Çaxê hespê hildidin dibin ev dilê kesê ku kilamê dibêje dişewitîne, lewra hesp êdî bêxwedî maye û ev jî tê meneya têkçûyîna wî. Dema berê hespa wî Gogerçîn didin Kela Makoyê Şakiro wiha dibêje:

“Tu sêr bike dîzginiya Gogerçînê girtin

Berê wî dane **Kela Makuyê**

Serê mihîna kirin yextirme ye” (Yıldız-Taşkın, 2018: 306)

Wek ku tê zanîn Şakiro dema kilaman dibêje hin caran an gotinên kilamê diguherîne, jê kêm dike yan jî li ser wê hin tiştan zêde dike ku versiyonên cuda derdikevin meydana. Di vê kilamê da jî dema em hem berhema Yıldız û Taşkın û hem jî berhema Güneş û Şahin dinihêrin kilam dibe ku ne versiyonên cuda bin, kilamên cuda ne lê mijar heman mijar e. Güneş û Şahin dema ev kilam deşîfre kirine ji bilî Kela Makoyê navê cihekî din jî nivîsîne ku ew jî “Sera Mexînayê” ye û wiha ye:

“...tu bala xwe bidê bi dîzgîna Gogerçîn girtin

berê wê dane **Kela Makuyê Sera Mexîna**

îro ji êvar da kirin yextirme ye...” (Güneş-Şahin, 2018: 77).

Li gor agahiya wek jêrenot nivîsîne Mexîna gundekî li ser bajarê Xoyê ye û dikeve bakurê Urmiyeyê. Mako bajarekî nêzîkî Urmiyeyê ye ku sînorên wê û Bazîda navçeya Agiriyê digihêjin hev. Ji ber wê nêzîkbûna sînoran eşîra Celaliyan demekê li wir serdest bûne. Ev keleha behsa wê tê kirin yanê Kela Makoyê (Qaban Castle) hê jî heye. Bi tevahî nebe jî qismekî wê ye mezin hilweşiya ye, lê hin jî bermayiyên wê hene.

Ji ber ku mijara me ne kilamên eşq, evîn, siruşt û şahiyê ne gelemperî mînak ji mekanên şer û pevçûn lê çêbûne û ji vê hêlê va di nav rûpelên dîrokê da cih girtine tînan dayîn. Ev mînaka niha jî dîsa yek ji wan mekanaan e. Dîsa şer û pevçûnek li mekanên Kurdan çêbûye ku kilama “Mala Mîrza Begê” behsa wê dike. Li gor agahiyên Yıldız û Taşkın bûyereke dîrokî li Deşta Xerzanê çêdibe, cendirmeyên Xelatê, Seyarê Elî, başbozixên Kosorê û Ûsivê Mamokî li dijî Sidîqê Mala Kekê Salih taqîbatê digerin (2018: 308). Di kilamê da navê “Deşta Xerzan”, “Kirrê Milazgirê”, “Xelat”, “Kopa Mûşê”, “Xinûs”, “Lîz”, “Newala Gamêşvan”, “Xinûk” û “Elcewaz”ê tînan bilêvkirin ku wiha ye:

“Lê dayê rebenê sibe bû şerekî li me çê bû qalekê li me qewimî  
Li **kirrê Melazgirê** tu sêr bike gelo vê sibengê ber û berrî vê **Xelatê**

...

Kesekî xwedanxêr tune ciwabekê bide **newala Gamêşvan** ra  
Nuh Begê Medenî ra

...

Dayê sibe ye bû şerekî li me çêbû qalekê li me qewimî  
Li **kirrê Melazgirê** tu sêr bike li **Xinûkê** ber û berî vê **Xelatê**  
Hela bala xwe bidê vê sibengê  
Agirê kulê bikeve **Seyara Selî Kopa Mûşê Milazgirê Xinûsê**  
Tevî başbozixa **Kosorê** Ûsivê Mamokî  
Hilanî mudurê **Lîzê** siwariya **Elcewazê** cendirme **Xelatê**

Digeriya gelî bi gelî newal bi newal devî bi devî...” (Yıldız-Taşkın, 2018: 308-309)

Di kilamê da bajarên ku navê wan derbas dibin yek Mûş, yê din jî Bidlîs û Batman in. Dema em berê xwe didin Mûşê behsa navçeyên Kop (tirkî wek Bulanık hatiye guhertin) û Milazgirê (tirkî wek Malazgirt hatiye guhertin) tê kirin. Ji bilî vê navê bajaroka Lîzê (tirkî wek Erentepe hatiye guhertin) jî balê dikşîne ku ev der jî li ser navçeya Kopê ye. Mûş bi deşta xwe ya mezin û bi bereket tê zanîn. Bidlîs, Erzirom, Wan û Agirî jî wek bajarên cînar li derûdora wê ne. Navên Kop, Lîz, Milazgir jî navên ermenkî ne ku li vê herêmê qasî Kurdan gelek Ermenî jî jiyane. Yanê ev mekanên Kurdan ji hêla nijadên din yê wek Tirk, Erebb, Ermeniyân va jî cihên girîng in û ji hêla bîra civakî va di bîra wan nijadên din da jî wek cihên taybet yê ku bîranînen wan lê derbas bûne xwe diparêzin.

Ji bilî vê behsa Xelat (tirkî wek Ahlat hatiye guhertin) û Elcewazê (tirkî wek Adilcevaz hatiye guherîn) tê kirin ku ev mekan jî navçeyên Bidlîsê (tirkî wek Bitlis hatiye binavkirin) ne. Ji hêla siruşt, ber û berhemên xwe va em dizanin ku ev der cihên gelek xweş in. Mekanekî din ya ku navê wê di kilamê da dibihûre jî Deşta Xerzan e (tirkî wek Garzan tê binavkirin). Herêma Xerzanê herêmeke dîrokî û balkêş e ku di navbera çemên Batmanê, Dicle û Botanê da ye û ji Pira Mala Badê heta Bidlîsê ye. Xerzan, forma pirjimariya “xerz”ê ye ku meneya wê jî rez, bostan, baxçe, fêkî û nebat e. Ji ber ku bax û baxçeyên Xerzanê bi nav û deng in, navê wê herêmê Xerzan e. Di dîroka Antîk da Yûnan û Roman herêm wek ”Arzanane” bi nav kirîne û nivîsîne. Ereban gotiye “Erzen”, Tirkan gotiye “Garzan”, Ermeniyên jî gotiye “Arzan (Xerzan, 2022). Wek ku tê dîtin cih heman cih e, lê ji hêla nijadên din va navên cuda hatine bikaranîn ku her yekî li gor ziman û çanda xwe navek bi kar aniye. Ev jî nîşan dide ku tesîra ziman û çandê di civakê da çawa ku li ser her tiştî dike, her wisa tesîrê li ser binavkirina cih û waran jî dike.

Versiyoneke din a vê kilamê di berhema Güneş û Şahin da jî bi navê “Sidîqê Delal” hatiye binavkirin. Heke em ji wir jî çend risteyan bidin dîsa navên “Xilûk”, “Milazgir”, “Xelat”, “Kop,” “Mûş”, “Xinûs”, “Lîz”, “Sût”, “Newala Gamêşvan”, “Elcewaz”, “Xelat”, “Sarisû” û “Kosor”ê hatine vegotin:

“E ê hê dayê lê lê lê rebenê sibe ye şerekî li me çêbû

Qaleka li me qewimî

Li kîrê li **Milazgirê** li **Xilûkê** weyla li mi nemayê çêbiye

Li ber û berê vê **Xelatê**

Hela sêr bike li bêbavya miletê **Sarisûyê**

Agirê kulê bikeve mala Seyara gelê bi **Kopê**, **Mûş** û **Milazgirê**, **Xinûsê**

Tevî başbozixa **Kosorê**, Êsivê Mamokî ji xwe ra hilanî mûdurê **Lîzê**

Siwariya **Elcewazê**, cendurmê **Xelatê**

Vê sibengê digeriyan gelî bi gelî, newal bi newal, devî bi devî

Li şax û mesîlê gelyê di **Sûtê**

Li dû Sidîqê delalî berxê malê Kekê Salihê mi

Ji êvar da digerîne mifrezê tetbîqatê

Şemsedîn digo Ezedîno we le bavê bavê mino çê bi çê bixebite

Keskî xwedanî xêra tunîne ciwabekî bide **newala Gamêşvanê**

Ji Nûh Begê Medenî ra bibê mala we xirab be



Derbekî bi dest berdane bedena Sidîqê delalî...” (Güneş-Şahin, 2018: 52-53)

Sidîqê Delal yê ji eşîra Hesena û kurê Faris û Gulnaz Xanimê ye di kilamê da tê behskirin. Kilam behsa şerê wî, têkçûn û kuştina wî dike. Li gor agahiya ku Güneş û Şahin didin, dema ew tê kuştin û serê wî û serê Ezedîn tê jêkirin Gulnaz Xanim di hewşa qereqola Mûşê da lingê xwe serê wan ên jêkirî dixê û dibêje “Bexê nêr ji bona kêr e” û piştî vê tevgera xwe ya jîr di nav Kurdan da bi nav û deng dibe (2018: 52). Di kilamê da Xilûka ku navê wê derbas dibe gundekî li ser navçeya Xelatê ya Bidlîsê ye. Gamêşvan gundekî li ser navçeya Patnosê ye, Kop û Milazgir jî navçeyên bajarê Mûşê ne. Lîz navê wî cihê ku wek Erentepe hatiye guherandin bajarokekî navçeya Kopê ye ku li hemberî gundê Gulçîmanê ye. Sût li quntara Çiyayê Sîpanê navê zozanekê ye ku geliyek jî li wir heye û ji ber vê ye di kilamê da wek geliyê Sûtê hatiye bikaranîn.

Di vê xalê da heke em hinekî behsa guherandin û venavandina cih û waran bikin divê bê gotin ku di avabûna Komara Tirkiyeyê da çawa ku di her qada civakê da gelek guherîn hatin kirin, zagon û qanûnên nû derketin, di vê mijarê da jî gav hatin avêtin. Helbet sedema guhertina navê cih û waran mijarên desthilatdarî, nasname, polîtîkayên dijî nijad û zimanên din tîne pêşberî me. Ev hewleke siyasî ya dijî bîra civakê ye, hewl tê dayîn ku navê cih û waran di hişê civakê da bê guhertin, şopên nasname û çandê ji holê bên rakirin û civak li gor cih û navên nû tevbigere. Lê helbet wek ku me berê jî gotibû her çiqas gavên bi vî awayî bên avêtin, li ser lewhe û tabelayan nav bên guheradin, di belgeyên fermî da nav li gor hişmendîya fermî bên nivîsîn jî, civak wisa bi hêsanî destûrê nade vê. Civak nahêle ku ev navên di hişê wan da bi cih bûne û bîreke hevpar ava kirine ji nişkê va bên guherandin. Ferdên civakê dîsa jî di nav xwe da wan navên berê yên ji perçeyek hiş û çanda wan e bi kar tînin. Jixwe em di çanda devkî da jî vê yekê bi eşkere dibînin. Lewra kilamên ku ji bo mekanê mînak hatin nîşandan, yên navê cih û waran tê da derbas dibin vê dijeyatiya fermî bi zelalî nîşan didin. Delikaya jî balê dikşîne ser girîngiya dengbêjan ku ew navê cih û waran bi kilamên xwe diparêzin û vê mijarê wiha tîne ziman:

“Ji bo destnîşankirina nirx û wateyên navê cihan ji bo çanda kurdî û zanîna kurdî ya gelêrî, di nav kilamên dengbêjan de rol û fonksiyonên navê cihan -çi wateyî, çi jî dêsmanî (binyadî)- destnîşan dike. Lewma, piştî navguhertinê rola dengbêj a di parastina nexşeyên devkî yên navên kurdî de giring e û wan di veguhastina zanîna gelêrî û bîra raboriyê de hin formên berxwedanê nîşan dane

ku meriv dikare wan di pêwendeke sembolîk û bîra mekanî de binirxîne.” (2021: 10).

Kilama Bekir Beg û Mamed Axa yek ji wan kilamên Şakiro ye ku behsa bûyereke di navbera axa û begekî Kurd da qewimiye dike. Bûyer di navbera Bekir Beg û Mamed Axa da derbas dibe. Navê hin mekanên ku di vê kilamê dibihûrin ev in:

“...Xwîşka te ya Gewrê êtîm maye

Bixemilîne ji mi ra bişîne

Eger dişînî bişîne gava tu naşînî

Sibê li **girê Tirbûşê** li **newala Dizika** li serê şaxan û mesîla

Li ser **kaniya Qîzan û Bûka**

Sêr bike vê sibengê destbiratiya min û te va bibe qetilxûnê yadê...”

(Yıldız-Taşkın, 2018: 352)

Li gor agahiyên kilamê Bekir Begê ku çav berdaye Gewrêya xwîşka Mamed Axa ji wî ra nameyekê dişîne û dibêje qasî ku wî bihîstiyê bavê wî miriyê û xwîşka wî Gewrê êtîm maye. Bila ew xwîşka xwe Gewrê ji wî ra bişîne, heke ew neşîne wê şerekî giran di navbera wan da çêbibe. Mamed Axa li ser vê tevgerê gelekî aciz dibe û bi nameyekê bersivê ji wî ra dişîne. Jê ra dibêje xwîşka wê Gewrê biçûk e, ne hevtayê wî ye û bila dev ji van gotinên nebaş berde. Lê Bekir Axa vê carê dîsa nameyekê dişîne û dibêje heke dilê wî li ber xwîşka wî nayê, du jinên Mamed Axa hene ku bila jina biçûk ya nazik û xweşik ji wî ra bixemilîne û bişîne. Li ser van gotinan Mamed Axa jê ra nameyekê din dişîne û dibêje namûs tiştêkî giran e, bi pereyan nîne û bila bê ew ê şer bikin, yek ji wan yek wê bê kuştin.

Mamed Axa eskerên xwe hildide diçe li ber konê Bekir Beg konê xwe vedigire. Dema Bekir Axa vî eskerê giran dibîne, çavê wî gelekî ditirse û jina xwe ra dibêje bila here ji Mamed Axa ra bibêje haya wî ji wan gotinan tune, kesên xwestine navbera wan xirab bikin fesadî kirine û bila ew eskerên xwe ji vir vekişîne. Lê Mamed Axa eskerên xwe venakişîne û dibêje bila bê ew ê şer bikin kî hat kuştin yê din wê jina wî ji xwe ra bîne. Di dawiyê da ew êrîşê hevdu dikin Mamed Axa Bekir Beg dikuje, jina wî ya biçûk jî ji xwe ra tîne. Wek li jor jî hat destnîşankirin navê hin mekanan di vê kilamê da tîne vegotin ku ev der jî herêma Kurdan e.

Kilama “Bavê Ebdula” jî cureyeke zêmarê ye ku xwîşka Evdila li ser kuştina birayê xwe ji kezebê dinale, êş û xembariya xwe vedibêje. Di kilamê da cihên ku navê wan tîne gotin “Newala Qaqizmanê”, “Geliyê Beraza”, “Newala Tirwêsê”, “Warê

Şehîd”, “Armutli” û “Sariqamûş” in. Dema em berê xwe didin van rêzikên kilamê ew wiha tên bilêvkin:

“...Lawo vê subengê  
Çar hev çaqal û dizê **Newala Qaqizmanê** wê li te derên  
Vê subengê malxirabo  
Wê xira bikin konê mala bavê mi gulîbirî **Geliyê Beraza**  
...  
Sube ye li **Newala Tirwêrê** li **Warê Şehîd**  
Vê subengê li gaza bilind ketim li serê çilan û çiya  
Tu seyir bike vê subengê du hev dizê **Newala Qaqizmanê**  
Gidîno vê subengê her du bira bûn  
Tevî duwazde siwaran derketin pêşiya Emîn Efendî  
Bexê mala Hecî Temir gula Beraza  
...  
Gidîno vê subengê malxirabo vê li te derê cote dizê **Newala Qaqizmanê**  
Bexê vê sibengê tu sêr bike **Armutluyê** şewitiya **Sarêqamuşê**  
Lawo vê subengê malxirabo birangên min ketine nav  
Dujminan van gawira...” (Yıldız-Taşkın, 2018: 367-369)

Geliyê Beraza li ser Qereyaziya navçeya Erziromê ye, eşîra Beraza ji Sirûca Rihayê hatine Serhedê ku ihtimale ku ew mintiqe ji ber vê wiha hatiye binavkirin. Armutluya ku navê wê di kilamê da derbas dibe jî gundekî li ser Sariqamîşa navçeya Qersê ye. Gelemperî em dibînin ku mekanên behsa wan tên kirin dorhêlên Sariqamîşa navçeya Qersê ne, yanê li Serhedê ne.

Kilama “Elî Begê-Bexê Mala Paşê” a ku ji ber mirina Elî Begê kurê Salih Beg û neviyê Kor Huseyn Paşa (paşayê mîralaya Hemîdiyan a di dema Osmaniyan da) hatiye gotin jî kilameke navdar e ku Şakiro û dengbêjên din dibêjin. Di vê zêmara ji bo jehrdayîn û kuştina Elî Beg hatiye gotin da jî navê “Hozdemir”, “Qizqapan”, “Erdîş”, “Xelat”, “Elcewaz”, “Patnos”, “Zomik” û “Geliyê Zîlan” wiha derbas dibin:

“Digo de lê lê Xezalê nemayê sibe bû  
Ezê li dîharî **Hozdemirê**  
Warê mala Paşê diketim  
Ji dilê min û te ra  
Gelo vê sibengê li hûr deviya ye  
Xwezila ji xêrê xweziyê di Xwedê ra  
Mî çavê serê xwe bidîta

Bavê Elî Kekê Ûsê siwarê Seyro  
Ji kavilya **Qizqapanê** siwar bibiye  
Komê xulama li dû bûna bi sê ciyaye  
....  
Lê lê dayê rebenê sibe bû  
Ezê diçûme **Erdîşa** şewitî bişewite  
Ji dilê min û te ra  
Ber û berî vê **Xelatê** li kevir û taşa  
Sêr bike li tilî bêçiyê Elî Begê berxê Mala Paşê  
Li gustîla hehû rebenê gelo dîsa li van qaşa”

...  
Kesekî tune cuwabekî bide Nadir Begê  
Bêje mala te xira be  
Îro ji êvara Xwedê da di şewitiya **Elcewazê** da  
Elî Beg nexweş e pir bedhal e

...  
Lê lê dayê rebenê sibe bû gelo vê sibengê  
Ezê li dîharî Patnosê diketim  
Dilê min û te ra wa li til e  
Mi dî Elî Beg ji gavê din da ji malê derketiye  
Çentê efendiyê ca li mil e  
Xwedê xirav bike berê xwe da şewitiya **Erdîşê** berjêr dimilmile  
Gelî gundî cîarno  
Minê bala xwe berdayê bi made ye  
Kesekî xwedanê xêra tune  
Ciwabekî ji Nadir Begê ra bihere  
Bêje mala te xirav be tu li **Zomikê** çî rûniştî  
Hela rabe ciwabekî nebxêrê hatiye  
Dibê Elî Beg ji **Erdîşê** çûye **Elcewazê**  
Nexweş e pir bedhal e

.....  
Lê lê dayê rebenê sibe bû gelo vê sibengê  
Ezê li dîharî **Patnosê** diketim  
Dilê min û te ra gelo vê sibengê bi qewax e  
Hela sêr bike ezê daketime berê **Geliyê Zilan** serê **Erdîşê...**” (Güneş-

Şahin, 2018: 105-107)

“Hozdemir”, “Qizqapan” û “Zomik” navê sê gundan e ku her sê gund jî li ser Patnosa navçeya Agiriyê ne. Jixwe di kilamê da navê “Patnos”ê jî li gel van navan tê behskirin. Ji bilî vê “Erdîş”, “Xelat”, “Elcewaz”, “Patnos” û “Geliyê Zîlan” jî wek mekan balê dikşînin. “Xelat” û “Elcewaz” navçeyên Bidlîsê ne û di gelek kilamên din da jî behsa wan deveran tê kirin. Wekî din “Erdîş” û “Geliyê Zîlan” jî dîsa di nav rêzikên kilamê da dibihûrin ku Erdîş navçeyeke Wanê ye. “Geliyê Zîlan” jî dîsa di nav sîronên bajarê Wanê da ye ku mixabin bi “Komkujiya Zîlan”ê va tê bi bîr anîn. Piştî van agahiyan em dibînin ku tevahî gund, navçe û herêmên li ser sê bajaran di kilamê da tînin behskirin ku yek Agirî, ya din Bidlîs û ya sêyem jî Wan e. Dema em berê xwe didin van bajaran em têdigihêjin ku ew di nav sînorên herêma Serhedê da ne û bajarên navdar in. Di kilamê da bûyerên qewimîne wek mekan li bajarên Serhedê çêbûne. Ev der çawa di bîra însanan da zindî ne, her wisa ji hêla bîra mekanî va jî zindî ne û îro jî di nav civakê da baş tînin zanîn.

Di kilama “Ferzende û Xalis Beg” da navê çend cih û waran derbas dibe ku dema em dêhna xwe didinê behsa “Serhed”, “Mûrad”, “Kela Milazgirê”, “Gomika Qoçalî”, “Kesûk”, “Xelat”, “Behra Wanê”, “Elcewaz” “Patnos” û “Qizqapan”ê tê kirin ku Şakiro wiha distirê:

“Eman lo Mîro lo Mîro lo lo Mîro  
 Sibe ye vê sibengê minê bala xwe berda  
 Ezê li diharê **Kela Milazgirê** diketim  
 Ji dilê min û te ra li devê vê **Mûradê** hela bala xwe bidê  
 Ezê çî bikim îro ji êvara Xwedê da felek xayîn e  
 Emê ji xwe ra bi kurmancî bibêjin dayê gelo bi berjêrî bibêjin yadê  
 Tu dêhna xwe bidê vê sibengê bihara welatê me **Serhedê** hatiye  
 Xwedê xira bike esker li qolinca Kekê Elfesya vê sibengê siwar bûye  
 Ezê dikim nakim vê sibengê şewitiya **Mûradê** kalekal e tu car..  
 ...  
 Ferzende digo lawo berê xwe bidine vê sibengê  
 Gelî gundî cîarno vê sibengê **Gomika Qoçalî** derbas bibine binê

#### **Kesûkê**

Li Mîro lo lo Mîro  
 Were lo bavo lo bavo  
 Lo bavo loo bavo lo bavo lo bavo Îslamî ye  
 ...

Lo lo bavo sibe ye sêr bike vê sibengê li me û şerê ser **Xelatê**  
 Gidîno gelo sibe ye sêr bike li me û şerê ser **Xelatê**  
 Eskerê Bavê Xalis Kekê Mexsê giran e hicum danê  
 Tu dêhna xwe bidê hinek ketine **Behra Wanê**  
 Milaîketê asîmana ji xwe ra hatiye selatê  
 ...  
 Vê sibengê ordiya kafîrê Êris li pêşiya me ji xwe ra dimeşiya  
 Ketiye vê sibengê **Elcewazê**  
 Lo Mîro lo Mîro lo lo Mîro  
 ....  
 Di nav xwe da bêje va hicûm hicûma mêrê di Sîpka ne  
 Hicûm hicûma Bavê Xalis Kekê Mexsê vê sibengê hicûma di Sîpka ne  
 Gelo vê sibengê emê berdine derxin rasta **Patnosê**  
 Ez ji te ra sond bixwim îro qonaxa me **Qizqapan e.**” (Güneş-Şahin, 2018:

41)

Dema navên di vê kilamê da derbas dibin bên nirxandin meriv dikare bibêje di nav wan da ahengek heye. Lewra di her sê bendên dawîn da wek kafîye di dawiya risteyan da hatine bikaranîn ku li hev tên. Ev koma navan ên di nav risteyên kilamê da belav bûne ji hêla Kurdan va cihên nas û beled in, hemû jî li herêma Serhedê ne û li ber çavên guhdaran nexşeyeke xeyalî ava dikin. Guhdar dema navê van deran bibihîzin dizanin ku ew der li ku ne, bi kîjan tiştan va meşhur in û kîjan bûyerên girîng li wir qewimîne.

Li ser Seîdê Nado yê ku wek Bavê Dilşayê tê nasîn çend kilam hene ku yek behsa girtina wî û yek jî behsa kuştina wî ya bi destê Êrisan dike. Di kilama jêr ya behsa girtina wî û birina wî ya Erziromê tê kirin da navê Bulanixa navçeya Mûşê û Erziromê derbas dibe ku ev herdu der jî dîsa di nav sînorên Serhedê da ne.

“Eman eman eman...

gidî bira li me nehata sura sibê gelo vê sibengê bîna bakî **Bulanixê**  
 reben ez im vê sibengê Gêjo di bin Bavê Dilşayê da ne dixare ne dimeşe  
 tu sêr bike gelo kefê davê ser sulixê  
 gava berê Bavê Dilşayê dane taşxana **Erziruma** şewitî  
 ez ji te ra sond bixwim çîqa qumandarê dewletê hene  
 tamamî vê sibengê li qarişî Bavê Dilşayê sekînî  
 hewar reben ez im li resimê li selamlîxê  
 eman eman eman... curnalî çetin e” (Güneş-Şahin, 2018: 75)

Seîdê Nado mêrekî ji eşîra Cibran û ji malbata Elî Axa ye, ji ber wêrekî û şerkariya xwe li herêmê gelekî navdar bûye. Ev malbat ji Anêra gundê li ser Gimgima navçeya Mûşê ye. Di kilamê da navê navçeyê Mûşê (Bulanix) derbas dibe ku ev der ne ji bo vê malbatê û ne jî ji bo Kurdan cihekî xerîb e, ji hêla gel va baş tê zanîn. Seîdê Nado çend caran ji ber sedemên cuda bi hêzên dewletê va şer kiriye, hatiye girtin ku em ji van ristên kilamê têdigihêjin ku wî birine bajarê Erziromê û avêtine hepsê. Li gor agahiyên kilama behsa kuştine wî dike (1915) jî heke mijar bê nirxandin em dikarin bibêjin ku girtin û birina wî ya Erziromê ya di vê kilamê da derbas dibe texmînî di navbera salên 1912 û 1914yan da ye. Erzirom wek bajarekî mezin li herêmê balê dikşîne ku destê dewletê li vir gelekî xurt e.

Aydinkaya (2019: 17) bi belgeyêke telgrafê ya ku dîroka wê 1912 ye va der barê Seîdê Nado da hin agahiyên dide. Li gor agahiyên wî Nado di nav hêzên Hemîdiyeyê da cih girtiye, bi malbatî serhildaneke herêmî ya biçûk kirine, apê wî Cindî ji ber vê hatiye nefîkirin û navbera wan û Ermeniyên jî nebaş bûye. Piştî demekê ji ber ku Şefê Cemiyeta Îxtîlalê ya Qafkasyayê û Komîserê Partiya Îttihat û Teraqqiyê (ÎTC) Bahattin Şakîrê ku Talat Paşa ji bo qirkirina Ermeniyên di navbera Erzirom û Mûşê da ew şandiye Erziromê nav û denge Seîdê Nado dibihîze, wî vedixwîne Erziromê û qanî dike ku ew bi hêzên xwe va beşdarî Teşkilata Mexsûsayê bibe.

Me berê jî gotibû ku bîra civakî li gor kom, nijad û gelan cuda tê avakirin, her yek ya xwe li ser ya din dixwe û dibêje dîrok û bîra wan rasttir e. Her çiqas pesnê Seîdê Nado ji hêla Kurdan va bê dayîn û ew li gor bîra civakî ya Kurdan wek mêrxas û şervan bê binavkirin jî, li gor vê agahiyê û agahiyên din wî bi dewletê ra jî hevkarî kiriye û ew bi hev ra xebitîne. Ev mijar dibe ku bê rexnekirin û bi nêrînên din va bîr nirxandin, lê li vir mijar ji ber ku mekan e, em di kilamê da dibînin ku navê navçeya Bulanixê carekê û ya Erziromê jî du caran wek “Erziroma şewitî” û “Erziroma rengîn” tê bilêvkirin. Dengbêj dijayetiye di heman kilamê da wek hunereke edebî bi kar aniyê ku “şewitî” yanê bila xirab bibe û here, li dijî vê jî wek “rengîn” yanê xweş û zindî teswîr kiriye.

Navê Bulanixê ya resen “Kop” e, ev navekî ermenkî ye û li me dide zanîn ku Ermenî li vir jiyane û bi zimanê xwe navek li navçeyê kirine. Jixwe dema bê lêkolînkirin wê bê dîtin ku gelek navên cih û warên li Mûşê bi ermenkî ne. Ez bi xwe jî ji navçeya Bulanixê me ku dikarim navê gelek gundan yê ermenkî wek mînak wiha rêz bikim; Abrî, Akrak, Arincik, Gebolan, Kopo, Koxak, Leter, Lîz, Mîrbar, Odinçur,

Pîyong, Pırkaşen, Têxut û hwd. Di bin ronahiya van agahiyan da em têdigihêjin ku Kurd û Ermenî bi hev ra jiyane, ew cih û mekanên wan ên bi zimanê xwe hatine binavkirin. Lê paşê ev der bi destê dewletê bi navên tirkî va hatine guherandin. Her çiqas hegemonyaya fermî van navan biguhere jî gel û nijadên cuda yên li herêmê bi rêya çand û dîroka xwe ya devkî navê cih û waran ya resen parastine. Wek berxwedanekê û dijderketina fermî van navan di hişê nifşê nû da veşartine.

Di kilama “Xalis Beg”ê da behsa şerekî tê kirin û navê “Ban”ê derbas dibe ku ew gundekî li ser Milazgira navçeya Mûşê ye. Dîsa navê çiyayekî “Çiyayê Qertewîn”ê jî di kilamê da tê bilêvkirin ku ew jî çiyayekî di navbera Milazgira navçeya Mûşê, Patnos û Dutaxa navçeyên Agiriyê da ye. Xalis Beg dibêje eskerên Cumhuriyetê li Mûradê rê li wan biriye, lê ew ê mêra bikujin û berê xwe bidin Çiyayê Qertewînê. Şakiro kilamê wiha dibêje:

“Axao axao axao...

Herê maqûlo sibe ye qaleka li me qewimî

Li **Bana** xopa hey la lo mîro li qûna çiyê

Tu dêhna xwe bidê gule tene Xalis Begê berxê Mala Sêrxwûn

Bavê Xanimê gula qaçaxa fenanî taviyê...

....

Ji me ra dibêjin mala mêrkûj Mala Sêrxwûn e

Emê ji xwe ra mêra bikujin dîsa piştta xwe pêda bikin

Berê xwe bidin **Çiyayê Qertewînê...**” (Güneş-Şahin, 2018: 44)

Kilama “Axao” yek ji wan kilamên Şakiro yê herî belavbûyî ye ku gelek kesan hin rêzikên wê ji ber kirine. Di kilamê da navê “Cemalverdî”, “Dignûg”, “Mûrad” û “Intab” tên bilêvkirin ku ev der jî dîsa di nav sînorên herêma Serhedê da ne û gelek kilamên din ên Şakiro da jî dîsa heman nav derbas dibin. Seyîdxan û birayê wî Teyfîqê ji eşîra Seyîdan dema bangî hev dikin di nav kilamê da wiha behsa van navan dikin:

“Lo Axao Axao Axao...

Lo lo maqûlo sibe bû li diharê **Cemalverdî** diketim bavêj e

Tu bala xwe bidê helehelê lawê bava

Qîrçînê çapiliyan û martêlya

Tivinga destê Seyîdxan malê Romê ye

Barûda xwe dirêj e, gulê xwe xweş davêje

...

Teyfûg bi sê dangan bang dikirî go Seyîdxan mala te xira be



Helhele ez heme, Bavê Salih berxê Mala Êsivê Seydo  
 Peyayê xerîb, mêtê mêtexas, kewê ribat, ne z birayê te me  
 Mi bi telaqê jinberdanê sond xwarî  
 Li devê **Mûradê** fişeng avêtî devê çapilyê  
 Gelo vê sibengê dere îro li **Cemalverdi** mêra bikûjim  
 Fenanî miya ku berxa xwe wenda ke, dê weledê milê xwe bavêje  
 ...  
 Sidîqê Hecî Mistefa Begê digo wele nabî bîle nabî  
 Mi bi serê Şêx Badînê **Dignûgê** sond xwarî tu car nabî  
 Heya li dunyayê sax û silamet bim  
 Fîrarê Seyîdan û Beraza nayê bi silametî bi ser mi ra derbas nabî rabe  
 ...  
 Sibe ye Mûsa Beg derketî banê qesrê  
 Bi sê denga bang dikirî Sidîqê Hecî Mistefa Begê  
 Di bextê gora bavê te ketime  
 Serê xwe ji xewa şêrîn bilind ke  
 Hela bala xwe bidê helhelê lawê bava  
 Qîrçinyê çapêlyan û martêlya  
 Fîrarê Seyîdan û Beraza bi lîmêja sibê ra gund hilanî  
 Ca agirê kulê bikeve mala xelkê **Intabê**  
 Ser serê egîtê mala bavê mi nemayê ji êvar da agir dada kirin kafîstanî  
 rabe...”

(Güneş-Şahin, 2018: 45-46-47)

Navê Intabê (Entab, Dutax, Tutak) hin kilamên din ên Şakiro da jî derbas dibin ku ew herêmeke bajarê Agiriyê ye û wek navê Agiriyê navê vê derê jî hatiye guherîn. Delikaya dema behsa navguhertina bajarê Agiriyê û navçeyên wê dike, dibêje navê Agiriyê ji heyama Osmaniyan heta niha wek Karakilise, Karaköse, Bayezid û Ağrı (tirkî) çar caran guheriye û ji bo navê Entabê jî agahiyek wiha dide “Berê navê herêma Dutaxê wekî Entab dihat binavkirin, ji ber nifûsa tarixî ya Êzdiyan ji vê herêmê re gotine Êzdîxan (2021: 101). Ji bo navê Cemalvêrdiyê jî Nişanyan dibêje ew li ser Dutaxa Agiriyê ye û niha navê vê derê wek Bulutpinar hatiye guherandin (Nişanyan, 2010).

Di kilama “Bavê Beced” (Şêx Fexrî) da navê “Sînan”, ”Bismil”, “Geliyê Goderne”, “Newala Elika”, “Hezro”, “Xerza” “Koşka Zerzelê” û “Sencê Reza” tê

behskirin ku ev herêm li devera Batmanê ne. Ji Serhedê îja em dadikevin jêr û ev herêm jî di nexşerêya axa Kurdan da tê pêşberî me ku kilam wiha ye:

“Dilşê digo lo lo Beced berxê sibê bû diçûme şewitiya **Sînan û Bismilê**

Mi rebenê nizanibû çi bû, çi qewimî, ax lo çi çiriya

Ew agirê kulê bikeve mala **cendurmê Sînanê**

Mifreza **Bismilê**, eşîra Badika, giregirê jê di Xiya

Li derê dîwana Bavê Beced Şêxê Kubar

Şêwr û mişêwrê bû lo li hev civiya

...

Agirê kulê bikeve mala qumandanê **Bismilê**

Mi dî mifreza xwe hilanî ketibû **Geliyê Goderbê** li **Newala Elika**

Li Hafê Reza li dû bavê Beced Şêxê Kubar digeriya

Derbekî bi dest berdane bedena Bavê Beced

Cinyazê Bavê Beced davêne makîna

Berê wî dane şewitya **Hezro** datanî

Dema li derê hukumata **Hezro** datanî

Min dî Dilşê li çogê xwe dixist digo

Lo lo Beced berxê hînga min dizanî bû

Ûrt û ocaxê mala bavê Becedê mi qeliya

...

Roka me derketî ji qudretê ji mala Xwedê lo ji aliyê **Xerza**

Gidî şewq û şemalê dabû bejna Bavê Beced Şêxê Kubar

**Koşka Zerzelê** gelo li Sencê Reza... (Güneş-Şahin, 2018: 54-55)

Di nav risteyên kilamê da xaleke balê dikşîne jî gotina “agirê kulê bikeve” ye. Ev form di dengbêjiyê da gelek caran tê bikaranîn. Kesê vê gotinê bilêv dike ji ber ku tiştêk ji dest nayê, bêçare ye û dilê wî/wê pir diêşe vê îfadeyê wek nifrekê dibêje. Li vir dengbêj dixwaze agirê kulê bikeve mala cendirmê Sînanê, mala qumandanê Bismilê ku ew ji ber nexweşiyê û halê xirab bimirin û dilê wî ancax rehet bibe. Kilam li hemberî neheqiyê dengê xwe yê dijber bilind dike, kuştina ku desthilatdar normalîze dikin û cinyazê wan davêjin makîna û dişînin mekanên Kurd lê dijîn qebûl nake. Lewra destê wan û qeweta wan nagihêje ew xwe bigihînin lehengan û ji destên wan xelas bikin. Şûna vê jî nifir tînin kirin, ax û zar tê kişandin ku çawa merivê wan zirar dibîne, ew jî bila zirarê bibînin ku dilê wan hinekî rehet be. Di kilama “Berxê Mala Hecî Temir Axa” da jî navê “Kela Kelereş”ê hatiye bilêvkirin;

“...Axao sibe ye ezê çûme **Kela Kelereşê**

Ji dilê min û te ra bişewite xweş kele ye  
Minê dêhna xwe berdayê bavê Evdila kekê Miheme Sidiq mêrkî mêrxas  
e...” (Güneş-Şahin, 2018: 50)

Der barê navê Kelereşê da Ali Husein Kerim dibêje Kelareş (Calareş) li gelek deverên Kurdistanê tê bikaranîn, lê cihê herî navdar gund û newaleke li Urmiyeyê ya mintiqeya Bradostê ye (2011: 320). Dema em berê xwe didin kilamê Kelereşa ku li vir derbas dibe ne ew der e, ev der di nav sînorên bajarê Mûşê da ye. Gundê Kelereşê ya ku navê wî yê niha wek Kara Kale guherandine tirkî li ser rêya navçeyên Dêrxas (Hasköy), Kop û Mûşê ye. Kelereş wek cihekî gelî ye, der û dora Kelereşê gundên Qazana (Dereiçi) û Tîl hene.

Di kilama “Siwaro Ji Xweytê Hetanî Xweytê” da navê “Îran”, Tûran” û “Xweytê” derbas dibe ku Şakiro dibêje:

“Siwar heyran sibe ye ji **Xweytê** hetanî wê ca ji **Xweytê**  
De Helê rebenê Gulê gorînê  
Sibe ye birek siwarê mala bavê mi serkûrê siwar bûne  
Ji **Îranê** ji **Tûranê** ji cerdê ji cûrdê  
Ji xwe ra dajo li terqa rê tê...” (Güneş-Şahin, 2018: 511)

Di gelek kilaman da çawa du jin (xwîşk, bûk û xwesî, qîz û dayik) bangî hev dikin li vir jî Helê û Gulê bangî hev dikin û xwe wek “reben”, “serkûr” û “gorî” dinirxînin. Lewra siwarê mala bavê wan hespê dajo û dîsa bûyerek nexêr li holê heye. Navên du cihan balê dikşînin ku ew jî “Îran”, Tûran” û “Xweytê” ye. Li gor mekanên li bakur ev der di kilaman da kêmtir derdikevin pêş me, lê dîsa jî em dizanin ku ew nêzîkî sînor in.

Wek mekan “Îran” di kilameke din ya bi navê “Lo Mîro Îslamî Tuneye -Evdal û Kerem” da jî derbas dibe. Evdal û Keremê ji Mala Mistefa Axa li Îranê tên kuştin. Ferzende Begê li vir wek Bavê Elfesya hatiye nivîsandin û ev leqeba wî ji hêla civakê va tê zanîn sond dixwe ku ew ê terka cinazê wan neke. Xala balkêş li vir ev e ku Kurdên ku navê wan hatine gotin ne li ser axa xwe, li cih û warekî li gor wan xerîbî ye (Îran, hewşa Emir Tûman) hatine kuştin. Her çiqas Kurd li wir jî bijîn kesên di kilamê da tên behskirin ji bakur çûne û li wir hatine kuştin:

“...Xezalê go de lê lê Xanimê le dayê rebenê  
heyfa mi nayê bi tu heyfê heyfa mi tê li wê heyfê  
Xaliqê Alemê axa herdu peyayê Mala Mistefa Axa kişandî şewitiya

**Îranê**

wey la li mi nemayê **topraxa kafirê Şahê Ecem e**

tu bala xwe bidê li **hewşa Emir Tûman**

Bavê Elfesya sond xwarî bi sonda qesemê îro tê kuştinê

tu cara ranabe ser ji cinyazê Evdal û Kerem e...” (Güneş-Şahin, 2018:

84)

Bîr her çiqas şexsî be jî, ew ji hêla civakê va tê avakirin û ji ber vê divê wek îfadeyeke mecazî neyê nirxandin (Assmann, 2018: 44). Her çiqas Kurd hemû yek bi yek xwedî bîreke şexsî bin jî wek Assmann jî tîne ziman bîra wan ji hêla civakê va tê avakirin. Hin bûyer tesîrê li ser hemû endamên civakê dikin, şopên girîng di bîra wan da dihêlin ku ew di dîrokê da cih digirin û dibin malê civakê. Ne mecbur e ku hemû endamên civakê yek bi yek rastî wê bûyerê bîn, lê ji ber ku wê bûyerê tesîr li ser kal û bavên wan, mekanên wan û neteweya wan kiriye rasterast nebe jî ji hêlekê va tesîrê li ser her yek endamên civakê jî dike. Serhildana Şêx Seîd jî di bîra Kurdan da şopeke wiha hiştiye ku bi rêya kilaman gihîştiye nîfşên nû û ev bûyer jî wê demê qewimiye.

Dema pirtûkên dîrokê yên di dibistanan da ji bo perwerdeyê tîne bikaranîn bîn xwendin, çaxê behsa avabûna komarê û bûyerên wê demê tê kirin behsa bûyera Serhildana Şêx Seîd jî tê kirin. Lê ev serhildan gelekî nebaş tê nîşandan û bi zimanekî gelekî neyînî tê behskirin ku ev bûyer di hişê xwendekaran da bi vî awayî bi cih bibe. Lê heman bûyer di bîra civakî ya kurdî da jî bi awayekî gelekî cuda tê vegotin ku çanda dengbêjiyê jî behsa wê dike. Di vê çandê da hewl tê dayîn ku ev bûyera dîrokî bi dengê dengbêjan wek bîreke dijî fermiyetê bigihêje guhê guhdaran. Dengbêj Şakiro jî yek ji wê endamê çanda dengbêjiyê wek dîroknûsekî bi dengê xwe kilama “Kekê Xiyasedîn” ya behsa Şêx Seîd, serhildan, îdamkirin û têkçûna wî dike gihandiye roja me. Di kilama “Kekê Xiyasedîn” ya ku behsa vê bûyera dîroka nêzîk (di dema destpêka Komara Tirkiyeyê da qewimiye) dike da wek mekan navê “Qolhesar”, “Bîngol”, “Enqere”, “Serhed”, “Kela Xinûsê”, “Xêmûrpêt” û “Diyarbekir”ê derbas dibe ku li vir ev mekan wek simbol cihên balkêş in. Qolhesar gundê Şêx Seîd e, Bîngol cihê ku serhildan belav dibe ye, Enqere sembola fermiyet û dewletê ye, Diyarbekir jî wek navendeke girîng a Kurdan e ku serhildan lê têk diçe û ew li wir tê îdamkirin. Risteyên kilamê van mekanaan wiha pêşkêşî me dike:

“Heyla ha lê wey lê wey lê...”

Le bira şewqa **Kela Xinûsê** lê nexista

Li **Bîngolê** ji xwe ra çiya bi çiya lo hoy oy

Bira neda bimbareka **Qolhesarê** derê mala efendî

Mizgeftan û camiyan lê hê  
Di destê Kekê Xiyasedin digirtin kelemçe dikirin  
Dane pêşiya cotê cendurmê sungûliya lo lo  
Berê wî dane **Enqerê** Horgofê nava hezar û pênsed mêrê di girtiya

....

Lê bira şewqa **Kela Xinûsê** çiya li çiya nexîne

**Sura Enqerê** tê gimînê

Bîna bayê **Xêmûrpêtê** xeberê ji mi ra tinî lo hoy oy

Bi destê kekê Xiyasedîn digirtin kelemçe dikirin

Dane pêşiya cotê cendurmê sungûlî ne

....

Hela tu rabê emê bi destê hevdu bigirin xwe berdine bajara **Diyarbakir**

Li ser tirba Şêx Şemsedîne

Belkî ji ba Xwedê da ricaçî be efya van mefiya derfîne...” (Güneş-Şahin,

2018: 58)

Kilama “Îbo Begê Parsînî” jî kilameke balkêş e ku di vê xebatê da bi hûrgilî behsa wê hat kirin. Trajediyeke mezin di vê kilamê da heye ku koka malbatekê bi destê xwediyê malbatê “Îbo Beg” bi mecburî tê qelandin. Bûyer li hêla Erziromê derbas dibe, navê “Parsîna Jêrîn” û “Parsîna Jorîn” di kilamê da hatine bilêvkirin ku Parsîn navê navçeyeke Erziromê ye li herêma Hesenqeale û Xorasanê ye (Aras, 2009: 85). Wek gelek navên din ev der jî wek “Hasankale” (Pasinler) hatiye guherandin û navekî tirkî li vê derê hatiye kirin.

“...nihêrî Xaçîkî serxoş e, qaymeqamê kimandanê wî kesekî hay ji xwe nîne

leganê ji ber sapokê dikişîne

berî qapaxa serê Xaçîkê tê da qapaxa serê wî hiltîne

mejiyê vî marusê bi remaqê dîwanê va dimîne

koka qaymeqama kimandara li wan tîne

yek di nava hespa da dimîne

xwe bi **Parsîna Jêrîn** ra digihîne

go kimandanekî li **Parsîna Jorîn**

saldatekî derketiye...” (Güneş-Şahin, 2018: 70)

Dema em berê xwe didin hemû van kilamên ku navên kurdî lê derbas dibin, em dibînin ku ev der wek nav gelemperî bi kurdî ne, şopên Kurdan li ser van deran heye, nifş bi nifş derbasî dahatûyê bûne û di bîra civakê da bûne mekanên nas û hevpar. Bilgî jî dema behsa avakirina dîrokê ya bajaran û bîra hevpar dike dibêje ew di xwe

da bîreke hevpar, bîranînên hevpar ên bajêr dihewînin, bi gotineke din bajêr an jî hin mekanên li bajêr, abîde, avahî an jî kuçe wek ‘cîhên bîrê’ tînen veguhastin (Bilgin, 2013: 67). Di van kilaman da jî navê bajaran, kuçeyan û gelek deveran heye, Kurd van deran bi navên wan ên kurdî dizanin û bi saya wan û dîroka wan bîreke hevpar ava dikin. Dema navê wan bi tirkî yan jî bi zimanekî din tê guhertin gelek kes hê jî navên wan ên berê bi kar tînin ku ev jî ji xurtbûna bîra civakî tê. Her çiqas ev der bi navên din hatibin binavkirin û hewl hatibe dayîn ku tîkiliya mekan, ziman û bîrê qût bibe jî ev armanc gelek caran neçûye serî û civakê rê li ber vê tevgerê girtiye.

Ji bo mijara navguhertinê mînakeke herî baş navê bajarê Dêrsimê ye. Navê Dêrsimê piştî Terteleya 1938an wek Tunceli (Tunç Eli) tê guherandin û hewl tê dayîn ku der barê wê heyamê û beriya wê da civak tu tiştî bi bîr neyne. Kesên beriya 1938an (Terteleya Dêrsimê) li Dêrsimê jiyane pergala wê heyamê meşrû nabînin û ji bo qetilkirina civakê tu bersiveke wan tune. Ji bo kesên bûne şahidê komkujiyê û jê sax xelas bûne bibîranîna komkujiyê, pirsîna sedema terteleiyê û behskirina vê bûyerê hatiye qedexekirin, hewl tê dayîn ku agahiyên der barê wê demê da (bîra civakî) ji holê bînin rakirin (Arik, 2012: 418). Her çiqas desthilatiya fermî vê hewlê bide jî navê Dêrsimê û siruştaya wê di gelek kilaman da derbas dibe, lê ne bi navê wê yê nû yê wek bi “Tuncelî” hatiye guherandin. Mînak dema Surmeli Memed Paşa di dema Osmaniyan da ji bo serhildaneke li Kozana Edenê bitepisîna rê dikeve ku here Kozanê ji Dêrsimê derbas dibe. Eskerên wî ji çiyayên Dêrsimê yê biheybet ditirsin û hejmetkar dimînin. Dengbêj Evdalê Zeynikê wê demê li ser Dêrsimê kilamekê dibêje ku tê da pesnê av, kanî, gelî û golên Dêrsimê tê dayîn (Tuncer-Güzelsoy, 2019: 1133). Kilam ji devê dengbêjê Yêrîvanê Şebabê Egîd hatiye nivîsîn ku çend risteyên kilamê wiha ne;

“...Wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo,  
Wey lo dilo, marimo, ne min go ezê çûme Dêrsimê, xweş Dêrsim e,  
Ax de avên çema li kanîka, li geliya, li gola li ser min da tene  
Gimegim e, zimezim e, wey dil, wey dil...  
Di vê kilama tirkî ya ku dibêje...” (Beğik, 2018: 182).

Ne tenê di kilamên kurdî da, di kilamên tirkî da jî navê vî bajarê qedîm wek Dêrsim hatiye bikaranîn. Ev jî nîşan dide ku di navbera mekan û bîrê da tîkiliyeke xurt heye û ev tîkilî wisa bi hêsanî qut nabe. Ji ber vê ye ku hê jî dema navê bajêr di kilamên

du zimanên cuda da tê gotin navê wê yê resen û qedîm tê guhê însanan. Ji bo mînak çend rêzikên ji kilameke tirkî ya bi navê” Dersim Dört Dağ İçinde” wiha ne:

“Dersim dört dağ içinde  
Gülü var bağ içinde  
Hak Dersimi saklasın  
Bir yarım var içinde”

Di vê kilama tirkî da dibêje “Dêrsim di nav çar çiyayan da ye, di nav baxên wê da gulên wê hene, Xwedê Dêrsimê biparêze, yareke min tê da heye”. Wek bê dîtî navê vî bajarî wek “Dêrsim” hatiye bikaranîn û behsa xweşikiya siruştê wê tê kirin. Ev kilam bi zimanê tirkî ye û navê vî bajarî her çiqas wek Tunceli hatibe guherandin jî ew dîsa jî bi navê xwe yê resen û qedîm hatiye bikaranîn.

Wek encam heke kilamên tê da navê meknan derbas dibin bîn lêkolînkirin tê dîtî ku der barê erdnîgariya Kurdistan da gelek agahî hene. Dengbêjan bi dengê xwe ev agahî gihandine nîfşên nû ku Şakiro jî yek ji wan dengbêjan e. Di kilamên Şakiro da her çiqas navê van meknan ku me nîrxandin bîn kirin jî, meknan sereke yên ku şer û pevçûn lê çêbûne û kilam afirandine bajarên Mûş, Bidlîs, Agirî û Erzirom û navçeyên wan in. Demên berê bûyereke li herêmekê diqewimî li herêmên din zûbizû nedihat bihîstin, lê bi saya kilamên dengbêjan ew bûyer û geşedanên qewimîne digihîştin herêmên din jî. Bi vê hêlê va dengbêjan di bîra xwe û bîra civakê da bûyer arşîv dikirin, di nav wan da wek pireyekê tîkiliyek ava dikirin ku ew neyên jibîrkirin. Bi van kilamên mînak hatin nîşandan va derket holê ku Dengbêj Şakiro dîrok û çanda qedîm a Kurdistan ya ku tê da meknan û siruştê jî heye bi dengê xwe gihandiye roja me û bîra civakê zindî hiştiye. Piştî lêkolîna ser van kilaman me dît ku navê bajarên mezin yên wek Enqere, Diyarbekir, Mûş, Batman, Bîngol û hwd di gelek kilaman da derbas dibin. Li gel vê navê gelek gund, bajarok, navçe û taxan jî em di van kilaman da seh dikin. Ji bilî van, navê kuçe û kolanan, deşt, çiya, gol, pire, newal, banî, gelî û hwd jî wek siruştê û erdnîgarî di kilaman da xwe didin der ku haya me ji van deran jî çêdibe.

#### 4.4. ŞOPÊN DÎROKÊ

Bîra civakî her çiqas komî be jî, ji hêlekê va pêvajoyeke şexsî ye jî, lewra her şexsek ji perçeyek xwe li ser wê zêde dike û paşê ev di rabirdûyê da dimînin û dibin dîrok. Wek berê jî hatibû gotin dîrok bûyerên qewimîne qeyd dike û nahêle ew bîn jibîrkirin. Lê dema tê qeydkirin li gor hêz û berjewendiyên dibe bê guherandin,

perçeyekî wê yan jî bi tevahî neyê qeydkirin ku bûyer bîn veşartin û êdî behsa wan neyê kirin. Ji ber vê ye ku çand û dîroka devkî, edebiyat, sînema, muzîk, kilam, stran, abîde, peyker, muze û gelek tiştên din bi vî rengî nahêlin ku ew bîn veşartin an jî ji holê rabin. Ew dîrokeke req û hişk nerm dikin, şûna wê dîrokeke biqîmet ava dikin, deng û rengê kom û gelên din jî bi me didin zanîn.

Heke ji bo mînak em lê binêhêrin, dema behsa şerekî û hejmara kesên di şer da hatine kuştin tê kirin bi zimanekî hişk û wek agahiyên îstatîstîkî reqem tîn bilêvkirin ku ev tesîreke mezin li ser însanan nake. Lê dema bi saya çîrok, kilam an jî filmekê behsa şer bê kirin, an jî çîroka şexsekî beşdarî vî şerî bûye bi hunerane bê vegotin ev dexmeyerê li ser hiş û dilê însanan dihêle, demeke dirêj tesîra wê di hiş da dimîne. Çima wisa dibe gelo? Lewra êdî mesele ne reqem e û ne agahî ye, mesele êdî însan û serpêhatiyên wî ne. Bi saya kilam, çîrok an jî filmekê êdî ew însan an jî bûyer meneyerê di xwe da dihevine û di bîrê da tîn veşartin. Bi saya wê dîrok şopekê di hiş da dihêle, di navbera rabirdû û îro da pîreyekê ava dike û nahêle bûyer bîn jibîrkirin. Ji ber vê ye însan gelek şexs û bûyerên di pirtûkên dîrokê da tîn behskirin ji bîr dikin, lê dema ew di kilamê an jî çîrokekê da guhdar bikin zûbizû ji bîr nakin.

Dîrok bûyerên girîng ên di civakan da qewimîne bi saya belge, qanûn, peyman, ewraqên fermî û hwd qeyd dike ku ew neyên jibîrkirin. Ev ji ber ku fermî ne, sînor û nasnameyên fermî ava dikin, guh nadin yê “dîtir”, yanê kesên ne ji wan. Lê wek hatibû gotin çîrok, kilam, muzîk, film, roman û hwd li gor çarçoveyeke din van agahiyên dîrokê rexne dikin, vediçêrin, tiştên veşartî derdixin holê û bi hêlekê va jî alîkariya dîrokê dikin ku bîreke civakî û çandî ava bibe û nahelên bûyer di nav demê da bîn jibîrkirin. Dengbêj jî wek berê hatibû destnîşankirin di avakirina vê “bîra dij” da xwedî cihekî girîng in. Ew bûyeran û şexsan bi saya kilamên xwe wek kirdeyên polîtîk digihînin dahatûyê û bîreke civakî ava dikin.

Di bin beşa dîrokê da kilamên hatin analîzkirin hemû jî ji beşek dîroka devkî ne û di bîra civakî ya Kurdan da cihekî girîng digirin. Ji van kilaman jê gelek behsa bûyerên dîrokî yê di dawiya sedsala 19emîn û destpêka sedsala 20emîn da qewimîne dikin. Di roja me da hin kesên bûne şahidê van bûyeran û yê ji wan malbat û eşîrên wê demê ne hê jî dijîn û behsa van bûyeran dikin. Ev kes qasî ku tê bîra wan li gor nêrîn û baweriya xwe behsa şer, pevçûn, serhildan, komkujî û kesan (lehengan) dikin. Ji ber ku ew ji hêla dîroka devkî û bîra civakî va kesên girîng in divê bi wan ra têkilî



bên danîn û agahiyên der barê wan rojan da bên qeydkirin ku dîrokeke hevpar bê parastin.

Der barê kilamên dîrokî da Propp dibêje armanca kilama dîrokî ew e ku rastiya hozan bûye şahidê wê bê teswîrkirin û destnîşan dike ku divê hozan wê binirxîne (1998: 60-61). Dibêje di kilama dîrokî da dîrok, erdnîgarî û topografî heye, lehengên van kilaman jî xwedî hin navan û taybetmendiyên şexsî ne. Ev gotinên Propp mînakên ku wê niha bên dayîn piştrast dikin, lewra ev kilam behsa dîrokê, lehengan, erdnîgariyê û çanda kurdî dikin. Her çiqas kilamên ji hêla dengbêjan va hatine gotin yek bi yek piştî şahidiya dengbêjan yên wê bûyerê nebin jî, gelekê wan piştî demeke nêzîk a bûyeran hatine çêkirin û bi rêya devkî gihîştine dengbêjên din û guhdaran.

#### **4.4.1. Serhildaneke Têkçûyî: Kilama “Kekê Xiyasedîn”**

Di dîroka gelan da gelek caran di navbera pergala (rejim, desthilatî hwd) berê û ya nû da bi eşkere yan jî veşartî şer çêbûne û yên bi ser ketine ji bo meşruiyeta xwe nîşan bidin gelek tişt kirine ku xwe bidin qebûlkirin. Connerton jî balê dikêşe ser vê mijarê û dibêje di navbera heyama niha û ya beriya wê da bi xetên eşkere xêz tînin kişandin ku ew ji hev bên veqetandin, ji bo rê li hemberî êrîşên pergala nû bên girtin set (dîwar) tînin avakirin û paşê mînakê îdamkirina qralê Fransayê XVI. Louis nîşan dide (Connerton, 2014: 16-18). Wek îdamkirina qralê Fransayê îdamkirina gelek kesan li cihekî kamuyê yanê li ber çavên însanan tê kirin ku peyama têkçûyîna şexsan û fikrên wan bê qebûlkirin. Di nav sînorên vê mijarê da em dixwazin şîroveya kilama Kekê Xiyasedîn bikin ku serhildanek çawa têk diçe û piştî wê têkçûyîna di bîra civakê da rewşeke çawa derdikeve holê nîşan bidin.

Di bîra civakî da qasî mekan, bûyer û dîrokê tiştekî din ê herî girîng jî şexsiyet in. Lewra ew bi kirin, gotin û jiyana xwe va dibin kesên berbiçav û şopa xwe di dîrok û civakê da dihêlin. Piştî mirina wan jî behsa navê wan, kirinên wan, berhemên wan an jî bûyerên hatine serê wan tê kirin. Ev kes bi kirin û serpêhatiyên xwe ji nifşên nû ra dibin mînak û tesîrê li ser jiyana wan dikin. Di dîroka Kurdan da jî gelek kesên navê wan hê jî tînin bibîranîn hene ku yek ji wan jî Şêx Seîd e. Şêx Seîd şexsiyeteke navdar e ku li hemberî Komara Tirkîyeyê ya nû hatiye avakirin serî rakirîye, lê negihîştîye armanca xwe. Her çiqas di dîroka fermî ya Tirkan da ew wek “eşqîya”, “serhildêr” û “paşverû” hatibe binavkirin jî, di dîrok û bîra civakî ya Kurdan da jî gelekî pesnê wî hatiye dayîn û ew wek leheng hatiye qebûlkirin. Li vir divê bê behskirin ku binavkirina

“eşqiya”, “serhildêr” û hwd vebêjeke fermî ye, dixwaze nasnameya wan kesan û armanca wan biçûk bike, der barê wan da agahiyên şaş bide, wan wek kesên hov, nezan, gundî, ji şaristaniyê dûrketî û dinyanedîtî nîşan bide. Ev sifata di dema avabûna komarê da bi salan di her qadê da bi rêk û pêk hatine bikaranîn ku herî zêde di nûçeyên wê demê da mirov dikare şopa vê bibîne. Lewra civak bi destê çapemeniyê fêrî vê fikrê bûye, ew îmajê Kurdan a bi van sifaten neyînî va hatiye avakirin di hişê însanan da cih girtiye. Bi van gotinan va îmajê Kurdan a neyînî ji bo avakirina nasnameya Tirkan û komarê hatiye bikaranîn.

Li aliyê fermî ew wisa bê behskirin jî, li aliyê Kurdan jî ew xwedî nasnameyeke gelekî cuda ye. Di nav bîra civakî ya Kurdan da ew wek şêx, şoreşger, serhildêr, rûspî û hwd hatiye behskirin û hê jî pesnê wî tê dayîn û gelek Kurd bi wî serbilind dibin. Der barê wî da gelek pirtûk û roman hatine nivîsin, kilam hatine gotin û di civatan da navê wî yek ji wan navê lehengên Kurdan tê behskirin. Mînak nivîskar Jan Dost li ser wî romeneke dîrokî ya bi navê “3 Gav û 3 Darek” nivîsiye ku behsa şeva dawî ya îdamkirina Şêx Seîd dike, hewl dide ku ev kesê dîrokî di bîra civakê da her zindî bimîne. Ji bilî wî Seyîdxan Kurij bi navê “Şêx Seîd Hareketî -Tanıkların Anlatımı İle” (Bi Vegotina Şahidan va Tevgera Şêx Seîd) pirtûkek û Tahsin Sever jî bi navê “1925 Hareketi Azadi Cemiyeti” (Tevgera 1925an Cemiyeta Azadiyê ) pirtûkek nivîsîne ku ev mînakên ji roja me ne. Berê jî der barê Şêx Seîd da gelek nivîs hatine nivîsîn ku yek ji wan jî nivîseke Osman Sebrî ye. Wî di hejmara 21emîn a kovara *Hawarê* ya sala 1933an da hestên xwe yê der barê Şêx Seîd da wiha aniye ziman;

“Ey ke’ba qewmîyeta min Şêx Seîdê Kal! Te...te...te zincîra dîliya qewmê min bi zexmiya din, piraniya zanîn û rastîya xwe qetand. Wekî şêr ku ji qefesê bi derkeve. Ev qewmê ku çarsed hindê sal in xwe ji bîr kiribû, xwe winda kiribû, bênav û bêzanîn mabû, ketibû xewa mirinê, di wê xwedê de ew şêr, te hişyar kir. Neyarê ku dixwest me û navê me û zimanê me ji dinê hilîne te di destê wî de lê da û şikand. Ji roja ku te serî danîye û vir de kîjan Kurd çî bike û li Kurdistanê çî bibe hemû kurê te ne, çî ku bingeha wî xaniyî te veda û hîmê wê te danî. Heya ku dinê hebe ew kesên ku di bin navê Kurd û Kurdîtiyê de bijîn minetdarên kir û qencîya te ne. Çî ku ji wê rojê û vir de bavê Kurdîtiyê yê paşîn tu yî û dê her tu bî...” (Sebrî, 2016: 37).

Der barê Şêx Seîd da tenê pirtûk û nivîs nehatine nivîsîn, gelek kilam jî hatine gotin ku kilama Dengbêj Şakiro ya “Kekê Xiyasedîn” ji wan yek e. Qasî tê gotin pênc qîz û pênc kurên Şêx Seîd hene ku Xiyasedîn di nav kurên wî da yê duyem e û ev

kilam bi navê wî hatiye gotin. Lewra di nav çanda Kurdan da “bavê filankesê”, an jî “kekê filankesê” îfadeyeke navdar e. Çima ji bo vê kilamê navê kurekî wî yê din na, lê navê Xiyasedîn hatiye hîlbijartin û şûna “Bavê Xiyasedîn” gotina “Kekê Xiyasedîn” hatiye tercîhkirin divê der barê vê da jî hin lêkolîn bîn kirin. Şakiro vê kilamê bi dengê şewat û terzeke cuda dibêje, di seranserê kilamê da şîn û xembarî heye. Dema ew dixulxulîne yê guhdar dîkin fêm dîkin ku tişteki xirab hatiye serê Kekê Xiyasedîn, ji ber vê ew şewat di dengê wî da xwe dide der. Kilam wiha dest pê dike;

“Heyla ha lê wey lê wey lê...”

Le bira şewqa Kela Xînûsê lê nexista

Li Bîngolê ji xwe ra çiya bi çiya lo hoy oy

Bira neda **bimbareka Qolhesarê** derê mala efendî

Mizgeftan û camiyan lê hê

Di destê **Kekê Xiyasedîn** digirtin kelemçe dikirin

Dane pêşiya cotê cendurmê sungûliya lo lo

Berê wî dane **Enqerê Horgofê** nava hezar û pênsed mêrê di girtiya

Lema **keleka dînê Îslamê** ji xwe ra welgeriya lo hoy oy...” (Güneş-

Şahin, 2018: 57)

Di avabûna bîra civakî da wek hatibû gotin mekan cihekî girîng digire ku di destpêka kilamê da jî çend navên herêmê yê wek Xînûs, Bîngol û Qolhesarê derbas dibin. Navê ku herî zêde balê dikşîne Qolhesar e. Lewra divê bê zanîn ku Qolhesar navê gundê Şêx Seîd e û çavkaniya jiyana wî sembolîze dike. Jiyana wî li vir derbas bûye, wî di mizgeftan da ders daye feqîyan û wek rûspiyê wê herêmê tê nasîn û ev der ji hêla mekanê va cihekî “bimbarek” tê binavkirin. Bi vê gotinê va di şexsê wî da rêz li ber gundê wî jî tê girtin, pîroziyek li ser vî gundî tê barkirin. Hewl tê dayîn ku Qolhesar di hişê civakê da wek cihekî pîroz bi cih bibe. Wek navê gelek cihan navê vê derê jî paşê bi zimanê tirkî wek “Kolhisar” hatiye guherandin.

Ev der her çiqas ji bo Kurdan cihekî nas û “bimbarek” be, Enqereya paytexta komarê jî li ber çavê Kurdan ewqas cihekî nenas û sar e. Di kilamê da paşê tê gotin ji wir (Enqere) têlêfon li ser têlêfonê tê. Ev jî nîşaneyê fermana ji bo wî hatiye dayîn ku ev ferman paşê digihêje Kurdan. Bi kurtasî Enqere cihê fermiyetê ye, ji wir ferman tî dayîn, hikûmetê û dewletê temsîl dike. Ji ber vê ye ku dema kesek ji ber sûcên polîtîk tê girtin berê wî didin Enqereyê ku ew bê darizandin. Di berdewamiya kilamê da tê gotin ku Şêx Seîd hatiye girtin, destê wî kelemçe kirine û bi zora cotek cendirmeyan yê di destê wan da sungilî hene berê wî dane Enqereya Horgof. Peyveke balkêş

“horgof” li vir hatiye vegotin ku “horg” tê meneya şêwr, dîwan û meclisê (Îzolî, 2007: 291). Li gor konteksa kilamê horgofa vir Enqere temsiliyeta dewletê dike û dijî dînê Îslamê ye. Ji ber ku ew tê girtin, berê wî didin Enqereya horgof û keleka dînê Îslamê (kelek sembola dînê Îslamê ye) weldigere yanê serhildan nagihêje armanca xwe û têk diçe.

Kelemçekirina destan di gelek civakan da heye ku sembola têkçûyînê ye û girtinê referans dike. Zeraq jî balê dikşîne du meneyên kelemçeyê ku yek “girtîbûna qaçaxî” û ya din jî “girtîbûna polîtîk” e ku ji ber vê berê wî didin Enqereyê (2020: 17). Em li vir girtineke polîtîk dibînin û her çiqas bi kelemçekirina destan va behsa têkçûna lehengekî bê kirin jî, di şexsê wî da ya ku tê teswîrkirin têkçûna milletê Kurd e. Dema destê wî tê kelemçekirin û di dawîya dawîn ew tê îdamkirin wek metafor ev tê meneya kokbirîna gelê Kurd û têkçûna Kurdan.

Wek ku di rêzikên kilamê da tê dîtin Şêx Seîd Kurdekî dîndar yê li ser şopa dînê Îslamê ye, ne wek şêx û melayekî dewletê yê ji rêzê ye. Di civaka ku tê da dijî ew wek rûspiyeke tê hesibandin, qedrê wî tê girtin û wek rêber tê qebûlkirin. Dema Komara Tirkiyeyê tê avakirin qanûnên nû tên derxistin, zagoneke nû jî tê avakirin û hewl tê dayîn ku çand, dîrok, dîn û edetên berê biguherin û civak derbasî jiyaneke “nûjen” bibe. Di nav van da girtina hucre, medrese û mizgeftan, qanûna bikaranîna şewqeyê, guherîna cil û bergan heye û gelek tiştên bi vî rengî êdî wek qanûn pêşkêşî civakê tê kirin ku ew mecburî qebûl bikin. Şêx Seîd jî wek Kurdekî li ser şopa Îslamê dijî van qanûn û zagonan derdikeve, wan qebûl nake û serî hildide. Serhildana wî ya li ser vê erdnîgariyê pêleke mezin dide li ber xwe, lê ew di dawîya dawî têk diçe. Ew û rêhevalên wî piştî serhildanê tên dardakirin. Sureyya Bedirxan dema behsa serhildana 1925an dike dibêje hikûmeta Tirkan qolordiya 9emîn a li Erziromê, qolordiya 8emîn a li Erzincanê û qolordiya 7emîn a li Diyarbekirê şand ser Kurdan, lê ew têk çûn û Diyarbekir hat bidestxistin. Bedirxan (1994: 51) sedema têkçûna serhildanê jî wiha nîşan dide:

Artêşeke Tirkan a 25 hezar kesî li gor şertên Peymana Franklîn-Bouïllonê ya dîroka wê 1921 e bi rêya trenê hatin û li dû Kurdan ketin. Kurd bi vî awayî di nav du agirana da man. Wisa dizanibûn ku li gor planên seferberiyê Sûriye, Iraq û Îrana li piştî wan e, lê ew bêalî man... Piştî pevçûneke 4 mehan ji ber şerê gerillayê paşva vekişyan.

Der barê hejmara serhildêran, eskerên ji bo têkbirina wan hatine şandin, bûyerê wê demê çêbûne da agahiyên li hev nagirin hene, lê mijar ne ev e. Xala girîng ew e ku bûyereke dîrokî qewimiye û encamên trajîk derketine holê. Di kilamê da bi kurtasî behsa vê yekê tê kirin û metaforeke “keleka dînê Îslamê” jî hatiye bikaranîn. Têkçûna Şêx Seîd bi gotinên “keleka dînê îslamê welgeriya” ango binav bû wiha tê bilêvkirin:

“Bi destê Kekê Xiyasedin digirtin kelemçe dikirin  
Dane pêşiya cotê cendurmê sungûliya lo lo  
Berê wî dane Enqerê Horgofê nava hezar û pênsed mêrê di girtiya  
Lema **keleka dînê Îslamê ji xwe ra welgeriya** lo hoy oy” ...” (Güneş-Şahin, 2018: 57)

Heps, girtîgeh an jî zindan navê wî her çî dibe bila bibe, ji bo cezakirina bedenê û hiş, çavtirsandina civakê tîk bikaranîn. Kesên ji ber sedemên polîtîk li van deran girtîne jê gelek şûna ku poşman bin, fikrên xwe ji berê xurttir dikin û ji ya xwe nayên xwarê. Ji ber vê, di gelek civakan da tu meneyeke van girtîgehan nemaye û her wisa jî destdayîna beden û hiş a li van deran kêr nayê. Ji bo Şêx Seîd jî her wisa bûye û heta ku bê dardakirin jî di girtîgehê da ji fikra xwe nehatiye xwarê. Kilam bi behskirina Xoce Îlyas (Elyas) dewam dike ku ev nav bala guhdaran dikêşîne. Xoce Îlyas wek xoceyê dewletê tê nirxandin, tevgerên wî yê dijî jiyana berê û alîgiriya wî ya dewletê bi gotina “xocê cumhuriyetê” tê rexnekirin. Li gor kilamê ew tîlefônî Şêx Elî Rizayê kurê Şêx Seîd dike û dibêje bila hucre, mizgeft û medrese bîk girtin, êdî li van mekanaan ders neyên dayîn, feqî veqerîn malên xwe û dewlet çî dixwaze bila li gor wê bê tevgerîn. Dengbêj wiha behsa Xoce Îlyas û tevgerên wî dike;

“...**Xoce Elyas xocê cumhûretê**  
Rûniştî li kavilya Enqerê li serê van tîla  
Tîl li ser tîlê dida welatê Serhedê li ba **Şêx Elî Riza**  
Digo mala te xira be  
Tuyê **kilîta lêxe li derê hucran û camiyan û medresa**  
Tu nizanî li piştî kekê Xiyasedîn dersê mede van feqiya  
Tu nizanî piştî kekê Xiyasedîn  
Qanûna me bû qanûna Nîgalo duwalê ecnebiya le yê  
Lê bira tu gula şêxanî bira  
Piçûkê biran î bira  
Xûliyê di şewqan î bira

Welatê xerîbê derdê pûçê bê derman î bira  
Heya dunya xweş ava be  
Keder û meraqa me hemyan î bira  
Welatê xerîb û xerîbistanê tu sêr bike  
Çima derdê pûçê bê derman î (Güneş-Şahin, 2018: 57)

Der barê Xoce Îlyas Samî da agahiyên derdikevin pêş ev in ku ew bi eslê xwe ji Mûşê ye. Di nav xelkê Mûşê da wek alimekî gelekî tê hezkirin tê hesibandin û berê jî endamê Cemiyeta Kurdistan Tealiyê ye, lê piştî demekê ji bo dewletê xebitiye (Beğik, 2018: 99). Paşê wek endamê meclisê yanê parlamenterê Mûşê wezîfe kiriye. Li gor agahiyên Aydınkaya dide (2019) dema Ermeniyên Mûşê tîr qirkirin (1915) Xoce Îlyas wek mifetişê ÎTCyê diçe Mûşê, li Mizgefta Mezin a bajêr weazên cîhadê dide gel, ji bo planên dewletê yêr vê qirkirinê bi rêk û pêk bê meşandin gelekî hewl dide. Heta wisa ku ji mebusê Mûşê Kexam Karabetyanê ji vê qirkirinê xelas bûye ra dibêje ‘heke tu li Mûşê bûbûyayî minê guleya ewil berda te’ û dest dide ser mal û milkên gelek malbatên Ermenî yêr wek Keşîşyan, Mezrigyan, Baduhasyan û Amrixyanan.

Helbet nirxandina şexsan û dîrokê li gor kom û nijadan cuda tîr nirxandin, aliyek wan baş û aliyên din jî nebaş nîşan didin û bîreke civakî ya ji hev cuda tê pêşberî hev ku mesela Xoce Îlyas jî her wiha ye. Ji hêla dîrokê va heke bê nirxandin tê dîtin ku ev bûyerên qewimîne û kesên behsa wan hatine kirin wê demê di rojevê da bûne û bi saya dengbêjan gihîştine îro. Yanê ev bûyera bi deve dengbêj hatiye gotin, êdî ne bîreke şexsî ye, bûye bîra civakî û wisa zindî maye. Kilam dewam dike û tê gotin deste Kekê Xiyasedîn tê kelemçekirin, li pêş cendirmeyên bi sungulî berê wî didin Enqereyê û ji bilî wî hezar û pêncsed kesên din jî tîr sirgûnkirin. Ev hejmar helbet ne hejmareke teqez e, yêr tîr girtin, îdamkirin û sirgûnkirin ne ewqas in. Lê wek metaforeke hejmarî ev di kilamên din da jî dema behsa sirgûn an jî hejmarê hêzên dijî hevdu şer dikin dîsa bi vî awayî tê bikaranîn. Piştî vê, ji bo van tiştên xirab felek tê sûcdarkirin û îfadeya “feleka malixirab” tê bikaranîn ku berê jî behsa vê mijarê hatibû kirin. Paşê tê gotin ewê ji bo efûkirina Şêx Seîd û rêhevalên wî herin li ser tirba Şêx Şemsedîn ku bila ew ji Xwedê rica bike ev kesên dil hatine girtin bîr berdan:

“Lo oy hoy oy oy  
Heyla ha lê wey lê wey lê ...  
Lê bira şewqa Kela Xinûsê çiya li çiya nexîne  
Sura Enqerê tê gimînê

Bîna bayê Xêmpêrê xeberê ji mi ra tinî lo hoy oy  
**Bi destê kekê Xiyasedîn digirtin kelemçe dikirin**  
**Dane pêşiya cotê cendurmê sungûlî ne**  
**Berê wî dane Enqerê Horgofê nava hezar û pênsed mêrê di mefine**  
**Feleka malixirab lema keleka dînê Îslamê weldigerîne**  
 Xoce Elyas xocê cumhûretê  
 Rûniştî li Enqera rengînê  
 Têl li ser têtê li Şêx Elî Riza ra dişîne lo oy oy  
 Dibê rabin kilîtan li derê hucran û camiyan û medresa bixîne  
 Tu nizanî li piştî kekê Xiyasedîn  
 Qanûna me bû qanûna Nîgalo duwalê ecnebînê  
 Hela tu rabê emê bi destê hevdu bigirin xwe berdine bajara Diyarbekir  
 Li ser tirba Şêx Şemsedîne  
 Belkî ji ba Xwedê da ricaçî be efya van mefiya derfîne  
 Fezîle bûka sê mehan e  
 Bira çavê wê li rê û dirba nemîne lê hê” (Güneş-Şahin, 2018: 58)

Berê behsa gotina “qanûna Nîgalo duwalê ecnebînê” hatibû kirin û li vir jî divê dîsa bal bê kişandin ku ev qanûna nû ya komarê ya ku xilafetê ji holê radike, jiyaneke nû û sekuler ava dike tê rexnekirin. Nîgolayê behsa wî tê kirin Çarê 2yemîn ê dewleta Ûris Nîkolay Aleksandrowîç Romanov e, ew li vir neyînî tê nîşandan û tê gotin ew naxwazin bi van qanûnên yên wek qanûna Nîgolay va bîn rêvebirin. Wek di gelemperiya kilamê da derbas dibe, di dawiya kilamê da jî tê gotin Şêx Seîd gula şêxan e, biçûkê birayan e û ji bo rewşa wî ya xirab dengbêj dilê xwe dişewitîne û dibêje heta dinya xweş ava be, yanê heta ew li ser rûyê erdê bimînin ewê vê derd û keserê her tim bikşînin. Li ser navê civakê jî hatiye axaftin, bi îfadeya “keder û keser û meraqa me hemyan î” va hatiye destnîşankirin ji bo hemû civakê ewê her tim bê bibîranîn û civakê wî û kirinên wî tu caran wê ji bîr neke:

“...Lê **bira tu gula şêxan î bira**  
**Piçûkê biran î bira**  
 Xûlyê di şewqan î bira  
 Hêsîr û dilê Misto Kemal qanûna ters e giran î bira  
 Welatê xerîbê derdê pûçê bê derman î lo bira  
 Hela bala xwe bidê heya dunya xweş ava be  
**keder û keser û meraqa me hemyan î**  
 lo oy lo bê hoy oy oy.” (Güneş-Şahin, 2018: 58)

Her çiqas dengbêj bibêje ji bo efûkirina Şêx Seîd û hevalên wî ew ê berê xwe bidin ser tirba Şêx Semsedîn jî, ew hêvî û daxwaz pêk nayê, Şêx Seîd û hevalên wî yên ku serî hildane di dadgehê da tên darizandin. Di 27ê Hezîrana 1925an dozger Ahmet Süreyya Örguevren îdianameya wan dixwîne û 47 kes li Daxkapiya taxa Diyarbekirê li ser 47 sêdaran tên îdamkirin. Der barê wan keliyên wî yên dawîn yên ku wê bê îdamkirin da Çevik wiha dibêje (1994: 16-17):

Şêx Seîd wexta diçe ber îdamê, li ber derî ji heyeta mehkemê Ali Saib dibîne û lê vedigere û vê gotina dîrokî dibêje: “Mafê bizna kol ji bizna bi qilonç re namîne.” Berî ku Şêx Seîd îdam bikin, Şêxê delal li kaxezekê wisa nivîsandiye: “Perwa (tirs) min tineye ku hûn min li darên bêqîmet de dardabikin. Bêguman rêya min ji bo Îslam û Xwedê ye... Jiyana qediya. Ez bi ti awayî poşman nînim ku min xwe di rêya milletê xwe de feda kiriye. Li pêşiyê neviyên me ji rûyên me li ber dijmin mehcûb nebin, ew ji bo me bes e.

Ev gotina Şêx Seîd ya beriya îdamkirina wî li ber sêdarê ji hêla gelek Kurdan ve tê zanîn ku ev jî perçeyek bîra hevpar ya civakê ye, qedereke hevpar û hestên hevpar xwe nîşan didin. Di kilaman da yên kilamê çêkirine û dengbêjên ku bûne berdevkê wan xwe dikin şuna lehengan, qedera wan a hevpar dijîn. Dema leheng qehremaniyê nîşan bide bi wî serfiraz dibin, dema leheng têk diçe ji bo wî xemgîn dibin û heyfa xwe bi wî tînin. Di kilamê da jî ev yek baş tê dîtin, leheng hatiye romantîzekirin, piştgiriya wî hatiye kirin, ji ber têkçûna wî êş û keder hatiye kişandin û ji wî ra soz hatiye dayîn ku ew ê tu car neyê jibîrkin.

Piştî têkçûna Şêx Seîd gora wî û rêhevalên wî nehatiye eşkerekirin, hê jî bi zanetî tê veşartin ku ev mijar îro jî tê rojevê. Heke gorên wan bîna eşkerekirin divê navê wan, dîroka jidayikbûna wan û mirina wan li ser kêlikên merzel bîna nivîsîn ku ev jî di bîra civakê da wek mekan û abîde wê bibin sembol û cihên bibîranînê. Piştî vê jî di navbera wan û civakê da têkiliyeke heta niha bi hestan ava bûye wê bi awayekî şênber dewam bike, kesên li ser şopa wî û rêhevalên wî tevdigerin wê herin ziyareta gora wan ku evê jî bibe sedema berdewamiya fikrên wan. Ji ber ku rê li ber vê bê girtin ew baş nehatine defînkirin û gora wan nehatiye eşkerekirin. Ji bo têkiliya di nav gelê Kurd û wan da heye bê qutkirin û ew di bîra civakê da neyên bibîranîn ev yek bi zanetî hatiye kirin. Kêlikekî wan ya navê wan li ser bê nivîsîn jî tune ku ev pir balkêş e. Kêlik tê meneya karê di dirûnê da tê kirin yanê du tiştan bi hev va zeliqandin û dirûnê ku desthilatiyê nehîştîye bi rêya kêlikê (gora wî) ew û civak bi hev va bizeliqin û fikrên wî bi saya vê kêlikekî dewam bike. Her çiqas gora wî û rêhevalên wî neyên zanîn jî



wek sembolekê ew di bîra civakê da ji nifşan derbasî nifşan bûye. Endamên civakê di bîra xwe da navê wî û serhildana wî parastine û wisa xuya dike ku wê bi saya kilam, metnên edebî (helbest, roman pirtûk) maqaleyên akademîk, merasimên bibîranînê va wê tim bê parastin.

Malbata wî û gelek şexs, dezgeh û saziyên Kurdan ji wê demê heta niha gelek caran serî li saziyên fermî dane ku cihê gora wî û rêhevalên wî bila bê eşkerekirin, lê hê jî tu bersiveke erênî ji bo vê nehatiye dayîn. Gor, peyker û abîde ji hêla bîra civakî va cihên girîng in, ji bo bîreke hevpar ava bibe tesîrê li ser civakê dikin. Lê li cîhanê gelek caran desthilatdar bi zanetî naxwazin gora hin kesan eşkere bikin ku li Tirkîyeyê jî ji bo Kurdan heman rewş heye, heta gelek caran abîde, peyker, gorên hin kesan û hin berhemên dîrokî hatine hilweşandin ku têkiliya rabirdûyê û dema niha bê qutkirin. Ji ber vê tevgerê gora Şêx Seîd, Seîdê Kurdî û gelek kesên din hê jî nayên zanîn ku ev li hemberî bîra civakî astengî û rêlibergirtinek e.

#### **4.4.2. Kilama “Asyayê” û Serpêhatiyên Ferzende Beg**

Piştî kilama Kekê Xiyasedîn ya behsa bûyerên 1925an û serpêhatiya Şêx Seîd dike divê behsa kilama “Asyayê” jî bê kirin, lewra ew rasterast bi hev ra têkildar nebin jî ji hêla dîroka ku qewimîne û kesên behsa wan tê kirin va di navbera wan da xalên hevbeş hene. Ev kilama jî di serdema Serhildana Şêx Seîd da çêbûye. Kesên piştî têkçûna serhildanê xwestine ji nav lepên hikûmatê xwe xelas bikin çav berdane çûyina binxetê û aliyê din ê sînor yê wekî Sûriye û Îranê. Kilam behsa komeke Kurdên di nav da Ferzende Beg jî heye û hewl didin herin aliyê Îranê û serpêhatiyên wan dike. Di dema Serhildana Şêx Seîd da û piştî wê hin bûyerên dîrokî qewimîn e ku dengbêjên herêmê li ser wan gelek kilam çêkirine. Kilama “Asyayê” jî di nav van kilamên klasîk da cih digire ku şopên wê demê di xwe da dihewîne. Her çiqas dengbêjên din jî vê kilamê bibêjin, ew herî zêde bi saya Dengbêj Şakiro belav bûye. Ev kilama bi devê du jinan (Asya û Besra) û mêrekî (Fertzende Beg) hatiye gotin li ser şerê Ferzende Beg û hêzên Îranê disekine.

Di kilamê da ji bilî gotin û îfadeyên herdu jinan, Ferzende Beg jî di çend rêzikan da hin gotinan ji jina xwe ra dibêje em ê behsa wan jî bikin. Wekî din, Silêmanê Ehmed jî di kilamê da navekî balkêş e ku ew bavê Ferzende Beg e û di şer da tê kuştin. Keremê Qolaxasî, Emer, Mistefa Beg, Evdal jî dîsa navên balkêş in ku di kilamê da hatine bilêvkirin. Di destpêka teorîk da hatibû gotin ku têgehên ziman, nasname, civak,

bîranîn, jibîrkin, şahidî, rabirdû, dîrok û mekan wek mijarên sereke dikevin nav mijara bîrê ku em di kilamê da şopên van hemûyan dibînin. Mînak navê hin cih û mekanaan (Îran, sûra kafirî Salah li hewşa kafirê Emîr Tûman), navê hin çek û sîlehan (top, tomatîk, gule, barûd, makînelî), navê eşîr û malbatan (Hesenan, Heyderan, Cibiran, Mala Şêx), navên nijad, dîn, bawerî û komên din (Ecem, Qecer, Rom, beşîncî mezheb, papaxgenî), navê Elfesyayê kurê Ferzende Begê û Eznawirê hespê wî jî di kilamê da derbas dibin ku em gelek agahiyên vê bûyera dîrokî bi saya kilamê hîn dibin.

Ferzende Beg kî ye, çima bûye mijara vê kilamê û di bîra civakî ya Kurdan da wek lehengekî tê bibîranîn pirsên girîng in. Dema em li dû bersivên van pirsan dikevin dibînin ku ew wê demê wek kurê Silêmanê Ehmed yê ji eşîra Hesenan bi mêrxasî û şervaniya xwe va li herêmê kesekî gelek bi nav û deng e. Li gor agahiyên Ekrem Malbat dide (2018) ew di navbera salên 1880-1885an da li Milazgira navçeya Mûşê hatiye dinyayê û beşdarî gelek şer û serhildanan dibe ku yek ji van jî Serhildana Şêx Seîd e. Dema serhildan têk diçe û Şêx Seîd dizane êdî ew ê bîr girtin birayê xwe û kurê xwe jî di nav da hin kesan dişîne Kopa navçeya Mûşê -ew der di bin kontrola Ferzende Beg da ye- ku Ferzende Beg wan bigihîne aliyê Îranê. Ferzende Beg, apê wî Xalid Beg, kesên ji malbata Şêx Seîd û hinekên din bi rê dikevin ku herin Îranê, lê rêwîti û gihandina wan a Îranê wisa bi hêsanî nameşe. Urmîyeya Îranê wê demê di bin kontrola serokê eşîra Şikakiyan Simko Axa da ye û ji mintiqeya bakur ewletir e. Gelek kesên ji sirgûn, şer, pevçûn û serhildanan direvin, yê firar in wê demê hewl didin xwe bispêrin wê derê da ku neyên girtin. Dema Ferzende Beg û koma wî rê dikevin ku herin Urmîyeyê li ser sînorê Îranê şevê dimînin. Qereqoleke eskerên Îranê lê ye, cawê hildide ku ew firar in, qomitanê Îranî ji Ferzende Beg û koma wî ra dibêje bila ew çek û sîlehên xwe teslîm bikin û wisa derbas bibin herin, lê ev şertê wî nayê qebûlkin û pevçûnek di navbera wan da çêdibe û hin Kurd tînin kuştin.

Şêx Elî Rizayê kurê Şêx Seîd dema behsa vê bîranîna xwe dike der barê derbasbûna wan a Îranê da agahiyê dide ku wan xwestiye ji Îranê derbas bibin û herin Şemdînanê û bi eşîrên wir va bibin yek û şer bidomînin, lê ji ber ku hêzên Îranê sîlehên wan xwestiye Şemsedînê kurê Xalid Beg, Nebo (Nebo Keleşê fermandarê Şêx Seîd) û Mehmet Şerîf ev daxwaz qebûl nekirine û Çavreşê Hesenanî guleyek berdaye zabîtê Îranî û pevçûn çêbûye. Bi guleberdana hêzên Îranî ya bi mîtralyozan va ji aliyê Kurdan 25 kes hatine kuştin, hinek hatine girtin û yê mayî jî (15-20 kes) teslîm bûne ku Şêx Elî Riza bi xwe jî di wê pevçûnê da ji serê xwe birîndar bûye (Fîrat, 2022: 40-41, 48).

Şêx Diyadînê birayê Şêx Seîd, Kerem Begê Zirkî, Silêman Begê bavê Ferzende Beg, Reşîd Efendî, Şemsedîn Begê kurê Xalid Beg û hinekên din di vê pevçûnê da tîn kuştin, hin kes jî dîl tîn girtin, lê Ferzende Beg û yê din xelas dibin û xwe digihînin cem Simko Axa û demekê li wir dimînin (Kahraman, 2004: 214). Simko Axa ji ber ku ew firar in wisa bi dilgermî wan pêşwazî nake, lê dîsa jî wek mêvan wan li wir dihewîne. Dema Serhildana Agiriyê dest pê dike û di sala 1929an da şerê Agiriyê xurt dibe Ferzende Beg naxwaze li wir bimîne, hêzên xwe hildide û diçe beşdarî serhildanê dibe. Îhsan Nûrî Paşa (1984: 28) der barê beşdarbûna wî ya serhildanê da vê agahiyê dide me:

Ferzende Beg ku ji eşîra Hesênî bû û di dema şerê Şêx Seîdê Mezin da bajêrê Melazgirtê ji destê Romê derxistibû, ligel brayê xwe Kazim Beg, kurapê wî û çend mêrên Hesênî xwe gihandin bi Agrî. Xalis Beg, kurê Abdulmecîd Begê Sipkî, Taceddîn Beg, ji serokên xêlê Zerkî, Edoyê Ezîziyê Heyderî, reîsek canbêzaran, Ehmedê Hacî Bro ligel çend brayên xwe, Seyid Abdulwehab Efendî û kurapê wî Seyid Resûlê Berzencî ku ji ciyê durxistina xwe, Izmîr, helati bûn, yek li dû yekî hatin Agrî.

Osman Sebrî wextê behsa lehengiya Ferzende Beg dike dibêje: “Di serhildana Agiriyê da ji bo parastina sînorên çiyê û gaziyan bilez hewcedariya siwariyan bi hespan hebûye ku wek wezîfe ji Ferzende Beg tê xwestin ew li herêmê bigere, ji gundan ji bo şervanan hespan berhev bike. Ferzende Beg û merivên wî dema ji çiyê dadikevin gundan li pêş Geliyê Zilan alayeke eskerên Tirk derdikeve pêşberî Ferzende Beg û pevçûn çêdibe, lê ew wan tîk dibe, hesp û cebilxaneya Tirkan jî dibe, heta carekê jî ew giran birîndar dibe, lê ew dev ji serhildanê bernade (2016: 27-29).

Wek Serhildana Şêx Seîd, di Serhildana Agiriyê da jî Kurd bi ser nakevin û piştê demekê tîk diçin. Îhsan Nûrî Paşa û jina wî diçin Îranê, Ferzende Beg, Biroyê Heskî Têlî û eskerên wan hinekî zehmetiyê dikşînin, lê paşê ew jî xwe digihînin Îranê. Di sala 1931ê da dema li Makoya Îranê Serhildana Makoyê çêdibe Ferzende Beg û Biroyê Heskî Têlî vê carê jî li hemberî Îranê beşdarî vî şerî dibin. Lê Biroyê Heskî Têlî di şer da tîk kuştin, Ferzende Beg jî birîndar dibe û dîl tîk girtin (Alakom, 2021: 3). Ew li navçeya Qesrî Sencerê ya nêzîkî Tehranê di girtîgehê da tîk girtin, jina wî Besra û kurê wî Elfesya jî li Tehranê di bin çavdêriya Îranê da dimînin.

Nadir Begê kurê Kor Huseyn Paşa yê bi Ferzende Beg ra di heman girtîgehê da girtiye di bîranînên xwe da behs dike ku rejima Îranê gelekî êş bi wî daye kişandin û îşkence li wî kiriye. Ew beriya sala 1939an li girtîgehê tîk jehrîkirin û kuştin. Osman

Sebrî (2016: 77) dema behsa çiyayê Agiriyê dike behsê tîne ser wêrekiya Ferzende Beg û der barê birîndarbûn û jehrîkirina wî da wiha agahiyê dide:

Wê rojê neyar sed û sî guleyên topan li kozika torinê Hesenan dabûn û şeş birînên xedar di ran û parsûyên wî da vekiribûn. Roj nêzîkî êvarê bû ku bi hikmê topan qûça ku qelaçe li ser bi carekê ser û bin bû. Toz û dûman di qelaçeya Ferzende de wekî ewrekî gewr radibûn û li qûntarên te belav bûbûn. Mirov bawer nedibûn ku di nav wê birkana êgir û dûmanê de tinawir bimîne. Lê Ferzende, wekî şêrê ku di hewingê de bibirîn dibe; hîn nuh dest bi halan û zirtan dikir. Wê gavê hevalan digotê: “Fertzende! Neyar cihê te nasiye û birînên te xedar in, rabe em hinekî te bi şûn de bibin.” Ewî bi dengê xwe yê box li wan vedigerand: “Mala we neava, ma hûn nizanin ku mêrxasên mala Emer ji me torinên malbatê re riya revê venekirine. Şêrên Ava Heftreng û Mêrgekulavê hîn di bîra me de ne. Lê bidin û neyar serwextî halê xwe nekin. Mirin jî bi camêrî xweş e.” Ev pandîyê te yê mêrxas di Keleha Xoyê de berî du salan hat jehirandin.

Navê Ferzende Begê Hesênî di gelek kilaman da derbas dibe û behsa egîdî, mêrxasî, şervanî û qehremaniya wî tê kirin. Di vê kilamê da jî ev pesindayîn xwe dide der û rêzikên kilamê nîşan didin ku navê wî di dîrokê da navekî girîng e. Di çanda Kurdan da dema pesnê mêrekî bê dayîn û behsa wî bê kirin dibêjin bavê filankesê, kurê filankesê, neviyê filankesê, ji filan eşîrê, siwarê filan hespê û hwd. Ev gotin û form ji bo rêznîşandanê û pesindayîna tîna bikaranîn, kodên mêranî û feodalîzmê di xwe da dihewînin. Ji bo ku urt û ocaxa malbatekê neqele kur yanî mêr kesên girîng tîna hesibandin, lewra malbat û eşîr bi saya wan dewam dikin. Dema ew bîna kuştin berdewamiya wan jî ji holê radibe. Di gelek kilaman da û berhemên din ên çanda devkî da em van form û qaliban dibînin.

Wextê em berê xwe didin vê kilamê ya behsa Ferzende Beg tê kirin jî di hin cihan da ew wek “Bavê Elfesya” yanê bi navê kurê xwe, hin caran jî wek “Siwarê Eznawir” yanê bi navê hespa xwe tê behskirin. Der barê navê Elfesya da hin cihan “Fertzende Begê bavê “Efrasîyab” jî tê gotin (Sebrî, 2016: 28). Ji bo navê hespa wî jî Eznawir hatiye bikaranîn. Navê Ferzende Beg di kilamê da hin caran jî wek “qaçaxê Romê” û “fîrarê dewletê” tê bikaranîn.

Metafora hespê di gelek kilam û çîrokên Kurdan da balê dikêşe ku di vê kilamê da jî navê hespa Ferzende Beg hatiye bilêvkirin. Em dibînin ku ew siwarê Eznawir e, hespê wî gelekî bi qîmet û navdar e û ji hêla xwediyê xwe va gelekî tê hezkirin. Dema em berê xwe didin navê Eznawir (Aznawur) em dibînin ku ew peyveke gurgîkî ye û tê

meneya “mezin, qerase, bihêrs, sert, rûtirş û zalim” (Komisyon, 2011: 217-218). Li gor van agahiyan meriv dikare bibêje ku ev hesp hespeke mezin, xurt û bi heybet e, çavê însanan ditirsîne ku ji ber van taybetmendiyên wî ew bi zanetî wek nav hatiye bijartin.

Di şer û pevçûnan da ji ber ku hêz û taqeta wan kêm e zirara herî mezin digihêje jin, zarok, kal û pîran, ew dikevin li ber destan û perîşan dibin. Lê her çiqas rewş wisa be jî wek her miletî di nav miletê Kurd da jî jinên wêrek yên wek “şêrejin” tên binavkirin hene. Ew li gel mêr, bav û birayên xwe di şer da cih digirin û naxwazin wisa bêçare û belengaz teslîmê kesên li hemberî xwe bibin. Jinên Kurd jî li gor dema ku lê jiyane gelekî baş hespan siwar bûne, çek û sîleh bi kar anîne û derketine hemberî mêran ku vê yekê bala gelek mîsyoner û dîplomatên biyanî jî kişandiye (Kutlay, 2011: 361). Di vê kilamê da jî di çend rêzikan da behsa Besra Xanima jina Ferzende Beg ya li pişt mêrê xwe bûye û dergûşa wî tê kirin. Dema Asya Xanima diya Ferzende Beg ji bûka xwe Besrayê ra dibêje dergûşa milê wê (Elfesya) law e, bila ew destê Elfesya bigire û ji nav şer derkeve here Besra Xanim wek gelek jinên kurd wiha bersivê dide xwesiya xwe:

“...Lê dayê rebenê ji te ra ne eyb e tu ji mi ra dibêjî gotinê were  
bira dergûşa milê mi li dora lingê eşîra Mala Emer  
herdu peyayê Mala Mistefa Axa tev bigere...” (Güneş-Şahin,

2018: 63)

Em bi van gotinên Besra Xanimê têdigihêjin ku her çiqas dergûşa wê kur be û li gor çanda Kurdan qîmeta wî zêde be jî, li hemberî mezin, mêr û mêrxasên malbatê tu qîmeta wî tune. Ji ber vê ji xwesiya xwe ra dibêje bila “ew dora lingê wan bigere” yanî qurbana wan be, çi dibe bila bibe ew ê terka mêrê xwe û malbatê neke. Qasî ku tê zanîn Besra Xanim û Asya Xanim jî di Serhildana Agiriyê da beşdarî refên şervanan bûne. Rojnamevana îngiliz Rosîta Forbes ya di dema serhildanê da li ser sînor bûye jî şahidiya şerkeriya jinên Kurd kiriye û dibêje jinên Kurd nizanin tirs çi ye (Alakom, 2011: 136). Dema em berê xwe didin Besra Xanimê em dibînin ku ew bi sê kesan ra zewiciye ku Ferzende Beg mêrê wî yê duyem e. Besra Xanim ewil jina Mihê Mirzê bûye. Dema Zubeyîr û Mihêyê mêrê wê li ser meseleyekê li hev dixin û Mihê tê kuştin, Besra Xanim bî dimîne. Ferzende Beg, Besrayê direvîne û bi Besrayê ra dizewice (Aras, 2009: 34-35). Di vê xalê da divê bê destnîşankirin ku Elfesyayê kurê Besra Xanimê yê ji Ferzende bûye her çiqas zêdetir bê zanîn jî, kurekî wê yê ji Mihê çêbûye

heye ku ew jî Fesîh e. Fesîhê kurê Besra Xanimê ji ber ku diya wî cara duyem dizewice û ew bê bav û bê dê dimîne gelekî êşê dikşîne û li gor agahiyan ew 14-15 salî beşdarî nav merivên Elîcan dibe û di serhildanên Kurdan da dibe şervan, lê ew her tim di dilê xwe da dijminatîya Ferzende Begê dike.<sup>24</sup>

Besra Xanima jina Ferzende Beg ya di kilaman da navê wê tê bilêvkirin wek jineke jêhatî rêhevala Ferzende Beg e, piştgir û hevjîna wî ye û ji ber vê jêhatîbûna xwe di bîra civakî ya Kurdan da ew jî wek mêrê xwe cihekî taybet digire. Dema Ferzende Beg dimire jî, ew li wî xwedî derdikeve, termê mêrê xwe yê ku herdu çavên wî hatine derxistin ji girtîgehê teslîm hildide, li Tehranê wî defin dike û li ser kêlika gora wî jî “Mîrê Mêran Ferzende Beg” dide nivîsandin (Süphandağ, 2021: 263).

Di beşa teoriyê da hatibû gotin ku dîroka fermî li gor berjewendiyên xwe agahiyan belav dike û kesên dijî xwe bi sîfatên “serhildêr”, “eşqîya” û hwd bi nav dike, lê bi vê tevgera Besra Xanimê (defînkirina cinazê mêrê xwe û nivîsandina mîrê mîran) em careke din dibînin ku bîreke civakî ya dijî desthilatan wiha û bi van tevgerên dij ava dibe. Lewra yên vê kilamê guhdar dikin, yên herin ser gora wî û yên van serhildanan bişopînin bi saya van agahiyan û hişmendiya xwe dibînin ku ew wek ku tê gotin ne “eşqîya” an jî “serhildêr” e. Bi saya vê bîra alternatîf em rastiyeke din jî dibînin û ev bîr ji hêla civakê va tê pejirandin, di nav nişan da her wisa belav dibe.

Dema Ferzende Beg di Hepsa Qesrê da tê hepiskirin Besra Xanim jî bi salan di hepsa malê da tê girtin. Piştî mirina Ferzende Beg (1939) jî Îran biryara hepsê ya Besra Xanimê betal nake. Li ser vê yekê ew daxwaznameyekê (di 3yê mijdara 1941ê da) ji rêvebirên Îranê ra dinivîse ku bila êdî bê berdand û piştî vê daxwaznameyê ew tê berdand û vedigere welêt (Yüksel, 2016: 667). Li gor agahiyên Zerîfa Xanima jina Nadir Begê kurê Kor Huseyn Paşa, Besra bi tiyê xwe Kazim (birayê Ferzende Beg) ra dizewice û

---

<sup>24</sup> Li gor agahiyên Mehmet Tosun (gelek caran rû bir û bi Fesîh ra li Kopa navçeya Mûşê axiviye û serpêhatiyên wî guhdar kiriye) Fesîh li Kopê li cem wî rûniştiye behsa zewaca diya xwe ya bi Ferzende ra, serpêhatiyên xwe, çûyina xwe ya Sûriyeyê filan kiriye. Fesîh dibêje dema bavê wî Mihê tê kuştin Elî Zîverê mezinê eşîrê diya wî bi zorê dide mêr. Dema wê dibin şimikeke diya wî di rê da dikeve Fesîh dixwaze xwe bigihîne wê, lê nikare. Ji ber ku êtîm û sêwî dimîne di 14-15 saliya xwe da dibe qaçax û beşdarî çeteya Elîcan dibe. Lê li gor agahiyên Ahmed Aras didin jî Ferzende tê û Besra Xanimê direvîne (Aras, 2009: 35).

paşê vedigerin Qeyseriyê, lê ji ber van bûyerên travmatîk derûniya wê gelekî xirab dibe û ew dîn dibe (Süphandağ, 2021: 263).

Kilama “Asyayê” dema tê guhdarîkirin ew rewşa travmatîk ya Ferzende Beg tê da ye, kodên eşîriyê, metaforên çanda kurdî, pevçûna xurt a di navbera Ferzende Beg û yê li hemberî wî xwe bi zelalî nîşan didin. Ji bilî naveroka kilamê dema Şakiro bi dengê biêş dike kalekal û kilamê dibêje ew bûyer, pevçûn û rewşa wê demê wek filmeke dîrokî teswîrekê li ber çavan radixe. Di gelek kilaman da jinek bangî jinekê dike û dibêje “rebenê, porkurê, gulîbirê hela rabe, binihêre û hwd” ku di vê kilamê da jî em van gotinên kurdî dibînin. Lewra li vir jî Asyaya diya Ferzende Beg ji bûka xwe Besrayê ra dibêje “dayê rebenê sibe ye şerekî li me çêbû qaleka li me qewimî” û egîdê mala wan (Fertzende) yê ku gelek kes pesnê wî didin li hemberî hêzên Îranê di kesîriyê û tengasiyê da maye. Dema em berê xwe didin kilamê em dibînin du jin bangî hev dikin û ji xwe ra dibêjin “ez reben im”.

Wek gelek çandan di çanda kurdî da jî dayik, jin û xwîşk wek stûna malan hêlînê çêdikin, bermaliyê dikin, dertkêş û kedkar in. Bav, bira, mêr an jî kurê wan wextê diêşin an jî hestiyar dibin xwe davêjin hembêza wan û li wir aş dibin. Ji ber xulqiyetê (biyolojî û derûniyê) gelemperî jin li gor mêran bêtir hestiyar, diltenik û hesas in. Ji ber vê yekê ye ku dema bûyerek biqewime ewil jin xemgîn dibin û hêşiran dibarînin. Di civaka Kurdan da ya ku mêr lê serdest in jî, jin gelekî girêdayî bav, bira, mêr an jî kurê xwe ne, dema tiştêk bê serê wan, yek ji wan nexweş bikeve, bimre yan jî bê kuştin jinên malbatê êdî xwe tune dihesibînin; dibin reben, porê xwe kur dikin, guliyên xwe dibirin, dibêjin ew ê mala xwe mîrat bikin û ocaxa xwe kor bikin. Lewra êş û kesera mirina hezkiriyên xwe (bav, bira, kur) di dil û hinavên xwe da bi kurahî dikişînin. Di gelek kilaman da ev îfadeyên xwefedakirinê û qurbankirinê hene ku mînak: Ez gorî, ez qurbana te me, ez reben im, nemayê, ez nemînim, min porkurê, min gulîbirê, min kezîkurê, min serkurê û hwd. Schafers dibêje ev îfade nîşan didin ku dema jin xwe terîf dikin jiyana xwe bi şexsiyeta kesên din va girê didin (2016: 27). Di vê kilamê da jî Asya û Besra dibêjin ew reben, belengaz û xemgîn in, lewra egîdê mala wan Ferzende Beg di nav şerekî giran da ye, birîndar e û ew dixwazin xwe ji bo wî feda û qurban bikin.

Piştî îfadeya “reben im”ê mirov dikare li vir balê bikêşîne hin gotinên din yê jin dibêjin ku ew “gulîbir”, “porkur”, “kezîkur” û “serkur” in û di gelek kilaman da rastî me tên. Ev çanda kurdî wek metafor dibe ji gelek aliyan va kûr û dûr bê

analîzkirin. Por ji bo jinan yek ji nîşaneyê bedewbûn û xweşikiyê ye. Her çiqas îro jin bi rehetî dikarin porê xwe jê bikin, şiklên cuda bidin porê xwe, hene û boyaxê lê bikin jî, berê nikaribûn wisa bi rehetî porê xwe kur bikirana. He jî di hin malan de dema keçikek porê jê bike mezinên malê wan şermezar dikin û dibêjin “Ma bav û birayê te miriye, te çima porê xwe kur kir?” Lewra di civaka Kurdan da ji bo jinan porkurkirin tevgerê nexweş û şerm e. Ancax ji ber sedema mirina mêr, bav, bira an jî eqrebayekî mêr yê ji malbatê jin dikare porê xwe kur bike û guliyên xwe bibire. Ji ber êş û kedera wan a mezin jin diqehirin û bi kurkirina por û guliyên va dixwazin peyameke xurt bidin civakê ku ew xwe ji hêla derûniyê va xwe tune dikin, dijî jiyînê derdikevin û xweşikiya xwe ya şikl û şemalê ya fizîkî ji holê radikin. Dixwazin bibêjin êdî piştî mirina egîd û mêrxasên wan tu meneya jîyanê nemaye, ew sax bin jî êş û kedera wan wê heya mirinê dewam bike.

Wek hêmaneke sereke mekan jî di bîra civakî da cihekî girîng digire ku me bi hûrgilî behs kiribû. Di hişê merivan da mekan bi navên xwe, bi sînorên xwe û bi bûyerên lê qewimîne va nexşeyekê ava dikin. Wextê şexs an jî civak bûyerekê bînin bîra xwe mekanê jî bi bîr tînin, lewra bûyer miheqeq li cihekî (mal, baxçe, gund, bajar, welat, behr, çol, gol û hwd) diqewimin û pîrsa “li ku?” dibersivînin. Dema em berê xwe didin mekanê ku di kilamê da behsa wê tê kirin ew cihê ku şer lê hatiye kirin e. Em ji van risteyan xwe digihînin agahiyê ku şer li Îranê, hewşa Emîr Tûman çêbûye;

“dayê rebenê sibe ye şereka li me çêbû qaleka li me qewimî

li sûra kafîrî Salah **li hewşa kafîrê Emîr Tûman**”

....

cewabekî nebixêrê hatî dibêje îro sê roj û sê şev e

erz û eyalê Mala Emer li kaviliya **Îranê**,

li ser piştê manegiya cî nabîne star tunîne lê peyabî (Güneş-Şahin, 2018:

61-62)

Li gor agahiya Yüksel dide Emir Tûman rutbeyeke eskerî ye ku tê wateya tumgeneral ango ew kesê ku femandariya deh hezar kesan dike (2016: 664). Li gor deşîfeya kilamê ya Güneş û Şahin kirine jî navê Emîr Tûman wek navekî taybet, mezin hatiye nivîsîn û dibe ku ev navê şexsekî be jî (2018: 61). Li gor belgeyê fermî ya ku dîroka wê 26ê Gulana 1930 e jî di navbera serhildêr û hêzên Îranê da li Akgolê şer çêbûye û kurapê Emîr Tûman jî hatiye kuştin (Kara, 2010: 382). Belgeyê arşîva Fransayê ya ku dîroka wê 20ê Hezîrana 1928an e dibêje Îranê sînorên xwe ji Kurdan ra girtiye û “Amir Leşker” ji du mehan vir va li Makuyê xebatên girtina deriyên sînor



yên dijî Kurdên Osmaniyan bi xwe dişopîne (Ciğerli- Le Saout, 2022: 228). Di bin siya van agahiyan da Emîr Tûman dibe ku şexsek be, an jî rûtbeyeke eskerî fermanîdarê serokê eskeran be, lê bi zelalî hêzên Îranê simbolîze dike.

Di kilamê da behsa Asya Xanima diya Ferzende Beg jî hatiye kirin, lê jina ku zêdetir derdikeve pêş Besra Xanima jina wî ye. Em li vir şopên bîra şexsî dibînin ku Besra Xanim bi gotina “mêr ser mi ra qe tunene” va hewl dide bîne bîra mêrê xwe ku ew kesekî jêhatî û leheng e, bila vê yekê ji bîr neke. Di navbera wê û Ferzende Beg da axaftineke wiha derbas dibe:

“Ferzende mala te xira be  
te digo ez Ferzende me ez Ferzende me  
ez bavê Elfesiya siwarê Eznawir im  
xwedanê kuçuk çapiliyê me  
li welatî dordincî ordiyê **mêr ser mi ra qe tunene**” (Güneş-Şahin, 2018:

61)

Li vir her çiqas îfadeyên wek “berxê mala bavê min”, “xortê mala bavê min”, “tayê tenê”, “peyayê mala bavê min”, “egîtê mala bavê min, “palewan” û hwd yên di gelek kilaman da derbas dibin nehatibin bikaranîn jî, bi “bavê Elfesiya”, “siwarê Eznawir” û “mêr ser mi ra qe tunene” va bi têra xwe pesnê egîdî û mêrxasiya Ferzende Beg tê dayîn. Li ber çavê Besra Xanimê û civakê Ferzende Beg mêrekî li ser mêran ra ye, qedir û qîmeta wî zêde ye.

Di vê keliyê da heke em hinekî behsa îfadeyên wek “egîtê mala bavê min”, “bavê filankesê”, “mêr ser wî ra tunene”, “egîd û mêrxas” û hwd yên di kilaman da bîne qalib bikin, em dibînin ku ev gotinên pesindayîne ne. Çaxê jin pesnê mêrên malbata xwe didin, behsa qehremanî, şervanî û wêrebûna wan dikin van gotinan bi kar tînin û ev gelemperî di stranên şer û lehengiyê da derbas dibin. Bi van gotinan Besra Xanim dixwaze Ferzende Beg ji bo şer gur bike, motîvasyona wî zêde bike ku ew li ser hemdê xwe va bê û yên li hemberî xwe têk bibe. Him pesnê wêrebûna wî dide û him jî bibîrxistina rojên berê va naxwaze mêrê wî têk biçe. Lê Ferzende Beg ji bo ku balê bikişîne giraniya şer, rewşa nebaş ya ku tê da ye û hêz û cebilxaneya xwe ya kêr bike wiha dibêje:

“Besrayê agirê kulê di qapiyê te ketê  
ezê bi cotek gulê tometîka vî zalimê birîndar im  
eva ne şerê Hesenan e  
ne şerê Heyderan e

ne şerê Cibiran e  
 ne şerê donzdeh bavê eşîrane  
 hewşa kafirê Emîr Tûman e  
 Ecem e beşîncî mezheb e, bê dîn û bê îman e  
 li ser serê me hurmînê topan e, girregirrê tometîkan û makînilyan e  
 li me biriye deqe û saniyê  
 nade me da tu mohlet û tu eman e” (Güneş-Şahin, 2018: 61)

Ferzende bi van gotinan dixwaze ji Besrayê ra bibêje êdî qîmeta mêranî û şervaniyê nemaye, ew çiqas jîr û jêhatî be jî wextê şert û merc ne wek hev bin, hêza wî li gor yê hember kê m be (mekan, çek û cebilxane) û di ser da jî ew birîndar bibe (gavê din da dikim nakim tiliya mina eşhedê ji xwe ra li mi nagere) ew ê têk biçê. Li vir trajediya şer, şert û mercên xirab ên şer baş tên dîtin. Her çiqas di gelek belgeyên fermî û yê biyaniyan da behsa wêrektî û şervaniya Kurdan bê kirin jî (Moltke, 1999: 230) ew tena serê xwe têrê nake. Ji ber sedemên din yê wek kêmasiya çek, cebilxane, balafir, pitşgîrî û milîsiya hin eşîr û malbatan ya ji bo dewletê, astengiya erdnîgariyê (rê û dirb hin caran ji ber sermayê û hin caran jî ji ber germê tengasiyê derdixe), kêmasiya xwarin, xurek, hesp, cil û berg û hwd ew zû yan jî dereng têk diçin.

Qasî mekanê, nasname jî di avakirina bîrê da gelekî girîng e û ev aîdiyeta nasnameyê ya ji hêla endamên civakê va tê pejirandin, şopa xwe li ser bîrê dixê. Di kilamên şer û pevçûnê yê li hemberî nijad û kesên da ji dîn û baweriyên din hin hêmanên balê dikşînin hene. Di van da zêdetir pesnê şervan û lehengên Kurd tên dayîn, dînê Îslamê wek dînê pîroz tê nîşandan, ewên li hember biçûk tên dîtin, li ser navê Xwedê, Pêxember, Qur’an, telaq û jinberdanê sond tê xwarin ku ewê yan bikujin an jî bên kuştin. Hin peyvên di kilaman da xwe didin der wek “qetla wî mîna qetla du mirîşkan e”, “kafir”, “marûs”, “gawir”, “duwalê ecnebî”, “Rom”, “roma vîrek”, “eskerên Romê”, “beşîncî mezheb” û hwd dibe mînak bîrê nîşandan. Di vê kilamê da jî gotinên bi vî rengî hene ku ji devê Ferzende Beg der barê îraniyan (ecem) da tînin gotin:

“Axao hey li min li min li min  
 wê maqûlo hey li min li min li min  
 Asyayê bi sê denga bang dikirî go de lê lê Besrayê  
 dayê rebenê sibe ye şereka li me çêbû qaleka li me qewimî  
 li sûra **kafirî** Salah li hewşa **kafirê** Emîr Tûman  
 weyla li mi nemayê tu sêr bike îro ji êvar da li ser kaniyê

îro ji êvara Xwedê da tê girmîna tometîka vî **zalimî**, nemînîm sewta vê boriyê

**Ecem e beşîncî mezheb e dîn û duşman e**

gule barûdê bi ser serê me da dibarîni fenanî taviyê

va **zalima dîn û duşman e**

tu sêr bike li me biriye nade me da deqe û mohlet û saniyê

...

**Ecem e beşîncî mezheb e, bê dîn û bê îman e**

li ser serê me hurmînê topan e, girregirrê tometîkan û makînilyan e

li me biriye deqe û saniyê

nade me da tu mohlet û tu eman e

gavê din da li **qarişî şerîata Mihemed sekiniye**

ji êvar da ji min ra dixwîni meydan û fermane ...” (Güneş-Şahin, 2018:

61)

Di kilamê da peyvên “kafir”, “ecem”, “zalim”, “beşîncî mezheb”, “bê dîn û bê îman”, “zalimê dîn û duşman” û “yên dijî şerîeta Mihemed” hatine bikaranîn. Di çavê Ferzende Beg da ew li ser mezhebekî cuda ne (şîî, ne sunî ne) ji ber vê jî ew kesên ji rê derketî, yê dijî şerîeta Îslamê û Pêxember in, zalim û dijmin in yanê biçûkdîtin û ji wan qayîlnebûnek li holê heye. Nasnameya heyî yanê ya Kurdan û ya dînî ji ser yê hemberî xwe ra tê girtin û zêde qîmettir tê hesibandin. Dîsa çend gotinên neyînî, yê ji bo Ecem û Tirkan hatine gotin û wan biçûk dibînin hene. Di kilamê da tê gotin Kerem Begê (Keremê Qolaxasî) ku bi sê guleyan birîndar e, ji Evdal ra dibêje ew du peyayên mala Mistefa Axa û berxê Mala Evdalê Mistê ne û bi maleke minanî Mala Emerê kulîxwur ra heval in, lê ka binihêre ev çi zilm û rewşeke xirab e ku hatiye serê wan û wiha dewam dike;

“çar **tixayê Qeceran** û **sêrbazan** û **papaxgenî** derê qonaxa li me bigirin

me herdu malê bi **kulîxwur** ra bibêjin

lawo tifingên destê xwe daynin teslîmê **nêçelîngê** me bin” (Güneş-Şahin, 2018: 62)

Li vir dema dibêje “em” filankes bin, hevalê filan malbatê bin em çawa dikarin wisa bi hêsanî teslîm bibin, aîdiyetek, hevkarîyek, şîrîkatiyek û nasnameyêke kolektîf heye. Zeraq jî ji bo van risteyên kilamê dibêje ev gotin sembola hevpariyê saz dikin, sedemên hebûna vê hevpariyê netewe ye ku dijberiyêke bêjarî jî li hember serdestiyê

saz dikin (2020: 16). Li vir sîwaneke mezin ya malbat, eşîr û Kurdan -ev nasname û netewekî jî di xwe da dihewîne- tê berçav ku ew jî wek her yek ferdên wê malbatê di binê wê siwanê da ne. Lewra ew Kurd in, koka wan ji malbatên mezin û eşîran tê û ew xwedî nav û deng in. Xwe li ser yên din ra dibînin, xwerazîbûn û xwebaweriyek di van gotinan da xwe dide der.

Wekî din peyveke balkêş “gulîxwûn” yanê kulîxwîr e ku di vê peyvê da jî aîdiyetek heye, xwe di bin sîwana malbateke wisa hatiye nasîn da dîtî heye. Li gor agahiya Ömer Güneş ew şaş hatiye deşîfrekirin ku orjînalê peyvê kulîxwîr e û çîrokeke vê peyvê jî heye. Dema em li dû çîroka vê peyvê ketin me dît ku ev peyv jî ji hêla bîra civakî va gelek agahiyên balkêş di xwe da dihewîne. Mijarên Şerê Dinyayê yê Yekemîn (1914), şerê Êris û Tirkan, hatina Êrisan a herêma Serhedê, koç û muhaciriya Kurdan ya ji herêmê, xelayiya wê demê, tunebûna xwarin û xurekan û bûyerên bi vî rengî bi vê peyvê ra eleqedar in. Di dema Şerê Dinyayê yê Yekemîn da Êris tîna Serhedê dagir dikin, gelek malbat û eşîr ji ber wan direvin ku koçî bajarên wek Riha (Sîwerek), Diyarbekir û Batmanê bikin. Di wê mihacirtiyê da xela çêdibe, ew di rê da tî û birçî dimînin. Ev malbatên koçber ji bo ku ji birçînan nemirin çî dikeve ber wan dixwin. Heywanên wek beq, kosî, kulî, pincarên wek tirşok, rehên gîha, şekirokê gîha, qanok û hwd dibe xwarina wan.

Li gor agahiyên Dengbêj Sebriyê Agirî dide dema ew zarok bûye merivekî bi navê Hecî Eyno (90 salî) yê li Kêranlixê (Gundê Milazgirê) cinarê Silêmanê Ehmed (bavê Ferzende Beg) bûye ji hinekan ra behsa vê mihacirtiyê, xelaya çêbûye û xwarina kuliyan kiriye ku wî ev agahî bi guhê xwe ji wî bihîstine. Ji gotinên Hecî Eyno yên ku Sebriyê Agiriyê neqil dike di wê mihacirtiyê da malbata Ferzende Beg jî koç dike, lê ew naçin Riha, Batman û Diyarbekirê, tenê qasî demekê li ser çiya û baniyan dimînin. Kesekî genimê wî hebûye kotikek genim bi zêrekî difroşe Silêmanê Ehmed û ji ber vê tunebûn û birçîbûnê malbatê çî dîtiye xwariye ku wê demê kulî jî hatine xwarin. Ji ber ku malbat kuliyan dixwe piştî demekê navê malbatê wek “kulîxur” dimîne, mîlet henekên xwe bi wan dike û bi vê peyva wek navlêkekê bo wan biçûk bikin bi kar tînin, lê paşê ev nav ji bo mêranî û pesindayîne tê bikaranîn (Sebriyê Agirî, Pêwendiya tîlefoni, 22yê Çileyê Pêşîn a 2021ê).

Di kilamê da ev sifata ku li malbatê hatiye barkirin ne ji bo biçûkdîtinê, berevajî vê ji bo pesindayîne hatiye bikaranîn. Lewra tê gotin ku ew malbata wiha jêhatî ya ji xelayiyê jî xelas bûye çawa dikare bi hêsanî dev ji çekên xwe berde û di hewşa dora

wan hatiye dorpêçkirin da hema wisa bê şer û pevçûn teslîm bibe. Nijad û nasnameya xwe, malbat û eşîra xwe ji ser îraniyan ra girtin li vir balê dikşîne. Li gor van agahiyan dema em berê xwe bidin kuliyan wek heywan girtina kuliyan zehmet e, lewra ew zû hereket dikin, baz didin diçin ku meriv nikare bi hêsanî wan bigire. Ew ancax bi saya jêhatîbûnê dikarin bên girtin û xwarina wan jî ji bo însanan bi rastî tiştêkî zehmet e. Çend çandên dinyayê jê derxe, kêr civak wan dikarin bixwin. Li gor çanda Kurdan jî ancax meriv di xelayiyê da be ji bo ku ji bîrçîbûnê nemire dikare bixwe, wekî din madê însanan naçe xwarina heywanên wiha. Di kilamê da ev sifata ku li malbatê hatiye barkirin ne ji bo biçûkdîtinê, berevajî vê ji bo pesindayînê hatiye bikaranîn. Lewra tê gotin ku ew endamên vê malbata wiha jêhatî, dikarin di nav her şert û mercî da bijîn, ewên ku ji xelayiyê jî xelas bûne çawa dikarin wisa bi hêsanî dev ji çekên xwe berdin û teslîm bibin. Li vir nasnameya xwe, malbat û eşîra xwe ji ser îraniyan ra girtin xwe dide der.

Ji hêla nasnameyê va heke bê nîrxandin peyva “tixa” jî peyveke balkêş e. Tixa bi zimanê ermenî ji bo mêran “kur û lawan” tê bikaranîn, lê li vir kesên li hember ji bo “xirab, nebaş, bêkêr, qenc, nûgihîştî” bên teswîrkirin û biçûk bên dîtin ev peyv hatiye bikaranîn. Bi vê peyvê va heqaret li wan tê kirin û tê gotin ka ew zarokên duh û pêr çî ne ku meriv teslîmî wan bibe û dev ji şer berde. Di nav Kurdan da dema zarok nehs (har) bibin û tiştên xirab bikin car caran dayikên wan bi wan hêrs dibin û ji wan ra dibêjin “tixayê fila” û li ser wan da diqîrin. Ev jî nîşan dide ku File, Ermenî, yê biyanî ji ber dîne wan (ne misilman in) biçûk tînin dîtin. Dîsa peyveke din heye ku ew jî “Qecer” e û ji bo “Kaçar”an yanê şaxeke Tirkan e, di navbera salên 1794 û 1925an da li Îranê xanedanek ava kiriye hatiye bikaranîn û tê gotin ku ew naxwazîni teslîmî van Qeceran bibin. Ji bilî vê wek wate Qecer di nav Kurmancan da ji bo kesên dexes û xayîn jî tê bikaranîn (Murad Celalî, Pêwendîya telefonî, 27ê Çileyê Paşîn a 2023yan).

Peyva “sêrbaz” ya di hin çavkaniyan da wisa hatiye deşîfrekirin (Güneş û Şahin, 2018: 62, Yüksel, 2016: 664, Yıldız-Taşkın, 2018: 72) jî wek kesên sêhr û sihrê dikin, dek û dolaban digerin tînin bikaranîn ku ji bo Eceman ev sifata berbelav e. Lewra di nav gel da tê gotin “heke Ecem hingiv bide te jî jê bawer neke, dibe ku di hundir da jehr hebe” yanê miheqeq dek û dolaban, sêrbazîyan dikare bike. Dibe ku ev peyv wek “serbaz”a bi farisî be jî û ji bo rûtbeyeke eskerî jî hatibe bikaranîn, lê ya zêdetir tê fêmkirin sêrbazî ye.

Peyva “papaxgenî” û “nêçelîk” jî peyvên balkêş in ku di kilamê da tèn behskirin. Nêçelîk (naçelnîg) ji bo eskerên Êris têt gotin ku derbasî zimanê ezerî bûye û ew naxwazin teslîmî van “tixa” “sêrbaz”, “papaxgenî”, “qeçer” û “nêçelîkan” bibin. Papaxgenî jî helbet xwedî paşxaneyekê ye ku ji bo Eceman têt bikaranîn û heta wisa ku gotineke wek “Ecemê papaxgenî tu cara nabe medenî” jî di nav civakê da têt gotin. Papax ji bo kum, şewqe û kolozê didin serî têt bikaranîn. Bi vê gotinê va têt destnîşankirin ku ev eskerên papaxan didin serê xwe dema xwîdan didin û bêhna xwîdana wan tîrş û pîs têt ew wek bêhneke genî xwe dide der. Di bin siya van hemû agahiyan da dikare bê gotin ku ew naxwazin teslîmî van “tixa” “sêrbaz”, “papaxgenî”, “qeçer” û “nêçelîkan” bibin.

Di kilamê da xaleke din a balkêş jî peyva “Rom”ê ye ku ev jî ji bo Tirkan têt bikaranîn. Lewra Ferzende Beg li vir xwe wek “qaçaxê Romê”, “fîrarê dewletê” û “canfîdayê Mala Şêx” bi nav dike. Mala Emer (kalikê Ferzende) malbateke dijî dewletê ye, fîrar û qaçax ji wê malbatê derketine ji ber vê peyva “Rom” hatiye bilêvkirin û dibêje ew ji destê Tirkan reviyaye hatiye Êranê çawa dibe ku wisa bi hêsanî teslîmî Eceman bibe:

“em hene ji berê di paş da qaçaxê Romê ni  
fîrarê dewletê ni, berxê Mala Emer in  
piçûk û mezinê me rabûne ranebûne  
mirîd û canfîdayê Mala Şêx in bego.” (Güneş-Şahin, 2018: 62)

Bi van rêzikan va têt gotin ku Ferzende Begê ku ji destê Tirkan reviyaye hatiye Êranê çawa dibe ku wisa bi hêsanî teslîmî Eceman bibe. Li vir pesnê endamên malbatê têt dayîn û têt gotin biçûk û mezinên vê malbata navdar rabûne ranebûne yanê ji berê va bûne murîd û canfîdayên Mala Şêx. Ev îfadeya “Mala Şêx” dibe ku ji bo Şêx Seîd hatibe gotin, lewra ew di nav hereketa Şêx Seîd da ye, ji bo xwe û malbata Şêx ji destê hikûmatê xelas bike hewl dide here Êranê ku xwe wek canfîdayê Mala Şêx pênase dike. Ji ber vê ye ku ew ji kesî natirsin û wisa bi hêsanî teslîm nabin. Ev hemû peyvên ji bo Ecem, Tirk û Ermeniyan hatine bikaranîn balê dikşîne ser nasnameyê ku ew xwe wek Kurd ji van nijad û qewman mezin û baştir dibînin û naxwazin teslîmî wan bibin û lekeyeke reş bê li ser nasnameya wan, kurdbûn û lehengiya wan. Ji bilî van Ferzende Beg dibêje ev ne şerê eşîran e û wiha pê da diçe;

“...eva ne şerê Hesenan e  
ne şerê Heyderan e  
ne şerê Cibiran e

ne şerê donzdeh bavê eşîrane...” (Güneş-Şahin, 2018: 61)

Bi van gotinên wî em têdigihêjin ku ev şerekî giran e û der barê navê hin eşîr û malbatên Kurdan da jî em dibin xwedî agahî. Di kilamê da behsa eşîra Hesenan, Heyderan, Cibiriyân û malbatên Mala Mistefa Axa, Mala Emer (kalikê Ferzende Beg) û Mala Şêx (Şêx Seîd) tê kirin. Ev nav me didin zanîn ku ew li herêmê eşîr û malbatên mezin û navdar in, ji ber gelek bûyer, şer û pevçûnan di bîra civaka Kurd da cihê xwe diparêzin.

Di kilamê da çend rêzikên din ên balkêş jî hene ku der barê alayên Hemîdiyeyê da ne. Rûtbe û nîşaneyên alaya Hemîdîyan li ber çavê însanên wê demê bi qîmet e, lewra sembola hêz û dewletê ye. Her çiqas nasnameya Kurd û eşîran di kilamê da bê pesindayîn jî nasnameyeke din jî tê dîtin ku ew jî sîwana Osmaniyan e, lewra ew xwe aîdî alayên Hemîdiyeyan dibînin. Di kilamê da bi devê Ferzende tê gotin ku heyfa wî nayê kuştina Silêmanê Ehmed û koma Hesenan, heyfa wî tê li wê heyfê ku rûtbe û nîşaneyên alaya Hemîdîyan ji milê wan hatine bişkivandin, bi dek û dolaban rê li ber wan hatiye girtin ku ew teslîm bin:

“...îro ji êvara Xwedê da ezê bi cotek gulê tometîka vî zalimê birîndar  
im  
cinyazê Silêmanê Ehmed komê Hesena li pêş çavê min e  
heyfa mi nayê bi kuştina Silêmanê Ehmed koma Hesena ne  
heyfa min tê li wê heyfê ji êvara Xwedê da  
li qarîşê mi ji mila vekirin **rûtbe û nîşan û elametê Hemîdiyê...**”

(Güneş-Şahin, 2018: 61-62)

Alayên Hemîdiyeyê di 1891ê da ji ber polîtîkaya padişahê Osmaniyan Evdilhemîdê 2yemîn ya ji eşîrên Kurdan hatin avakirin ku dijî Ermenî û Êrîsan tevbigerin û sînorên împaratoriye biparêzin (Kutlay, 1992: 24). Wê demê eşîr û serokeşîr ji bo ku beşdarî alayên Hemîdiyeyê yên ku derfetên gelek mezin di xwe da dihewandin bibin ketin pêşbirkê, lê Êzdî, Elewî, Şîî, Durzî nehatin qebûlkirin, tenê eşîrên Kurd, Qarapapax û Ereba hatin qebûlkirin (Süphandağ, 2012: 63). Bi saya van alayan sînorên dewleta Osmaniyan dihat parastin, eşîrên Kurdan bi dewletê va dihatin girêdan, eşîrên beşdarî van alayan dibûn baceke kêr didan dewletê û li herêmê hêza wan zêde dibû ku car caran zext li eşîrên din dikirin (Yıldırım, 2013: 73-74). Alayên Hemîdiyeyê her çiqas di destpêkê da li gor dilê dewletê tevbigerin jî, di nav demê da hêza eşîrên Kurd xurt bû, armanca dewletê ya ku dixwest Kurdan bi dewletê va girê bide jî bi destê dewletê têk çû û tesîreke mayînde li ser tîkiliyên dewletê, civakê û

herêmê çêbû (Klein, 2014: 18). Di kilamê da jî bal li ser rastiyeke wê demê tê kişandin ku her çiqas ew dijî dewletê bin jî ji ber şert û mercan, polîtîkayên dewletê ji hêlekê va girêdayî dewletê bûn û li ser navê wî dijî kom û nijadên din şer dikirin û dibûn parêzvanên sînorên Osmaniyan. Di kilamê da hem ew ji destê hêzên Tirk direvin û hem jî heyfa wan li arme û nîşaneyên Hemîdiyeyê tê ku ev jî dibe wek nakokiyekê bê şîrovekirin û li ser bê axaftin.

Di gelek kilamên bi vî rengî da navê hin çek û alavên şer derbas dibin ku ew jî der barê teknolojiya leşkerî ya li herêmê, aboriya wê demê ya eşîran, marqeyên çek û cebilxaneyan, têkiliya bikaranîna çek û mêrantiyê, cureyên şer û pevçûnê û hwd da agahiyên berfireh didin me. Kesên diçin şer hespan siwar dibin, çekên marqeyên wan hatine gotin bi kar tînin, cil û bergên ku bikaribin fişeng û guleyan, xençer û şûran tê da bi cih bikin li xwe dikin, kum û kolozan didin serê xwe, barûd û alavên din li cem xwe dibin. Em van hûrgiliyan dikarin di nav ristên kilaman da hîn bibin ku di kilama “Asyayê” da jî dema Ferzende Beg behsa rewşa xwe ya tengezariyê dike navê hin çekan dibêje. Di kilamê da “gule”, “barûd” fenanî taviyê li ser Ferzende Beg û rêhevalên wî da dibarin, çekên “tomatîk”, “kuçik çapilî”, “makînelî” û “sûstem” tên bikaranîn û ji wan ra qet muhlet û wext nayê dayîn ku ew bi ser xwe da bîn.

Herî dawîn em dikarin bibêjin hin kilam hene ku hemû hêmanên (ziman, mekan, nasname, dîrok û tevgerên bedenî) bîra civakî ava dikin û diparêzin dikarin bi xwe da bihewînin, lê hin kilam jî tenê xwediyê çend hêmanan in ku kilama “Asyayê” jî wiha ye. Ji van hêmanên bîra civakî ava dikin yên herî zêde di kilamê da hene dîrok, nasname û mekan bûn ku me ev derxistin pêş û kilam di wê çarçoveyê da hat nirxandin. Wek ku hat dîtin bûyereke dîrokî çêbûye, mekan Îran e, nasnameyên cuda li hemberî nijad û nasnameya Kurdan sekinîne û bi serokatiya Kurdekî (Fertzende Beg) pevçûnek derketiye ku kuştî û birîndar çêbûne. Ev bûyer, kes û hûrgiliyên kilamê bi devê dengbêjan heta îro hatiye û di bîra civakê da zindî maye.

#### **4.4.3. Mêrxasên Mala Emer: Kilama “Silêmanê Ehmed”**

Nivîsandina dîrokê ji hêlekê va qadeke polîtîk e, ji ber vê gelên dîroka xwe dinivîsin hewl didin simbolên xwe yên neteweyî, ziman û çanda xwe derxin pêş ku li ser rûyê erdê tim bîn bibîranîn. Civakên nivîs pêş neketine jî bi rêya devkî vê yekê dikin û dîroka xwe diparêzin ku me gotibû Kurd jî ji vê hêlê va gelekî xurt in. Bûyerên qewimîne bi dengê jinan, dengbêjan û ferdên din ên civakê tim hatine dubarekirin ku



di hişê însanan da bi cih bibin. Ev kilam jî behsa bûyerên dîrokî dike ku bi rêya çanda devkî di bîra civakê da hatiye bicihkirin. Kilam ji hêla cureyê va zêmar e û xuya dike ku dengbêj ji devê Asya Xanimê li ser Silêmanê Ehmed û kurên wî gotiye. Kilama Silêmanê Ehmed ji hêla dîrok, nasname û mekanê va kilamake girîng e. Silêmanê Ehmed yê ku navê xwe daye kilamê mêrxasekî ji eşîra Hesenan e û ji Mala Emer e. Eşîra Hesenan ya ji Milazgira navçeya Mûşê ye di dîrok û bîra civakî ya Kurdan da wek eşîreke navdar tê zanîn û di gelek kilaman da jî hem behsa navê eşîrê û hem jî behsa lehengên ji wê eşîrê tê kirin. Ew wek bavê Ferzende Beg jî tê nasîn, mêrxasî û şervaniya wî gihîştîye kurê wî ku me behsa lehengiya wî kiribû. Der barê dîroka jidayikbûna Silêmanê Ehmed da em ne xwedî agahiyên tekûz in, lê der barê mirina wî da em dikarin sala 1925an wek dîrok nîşan bidin. Di Serhildana Şêx Seîd da (1925) dema ew bi malbatî çend kesên din va derbasî Îranê dibin, li ser sînor ew û Keremê Qolaxasî yê navê wî jî di kilamê da derbas dibe û hin kesên din ji hêla hêzên Îranê va tên kuştin.

Silêmanê Ehmed li gor heyama lê jiyaye merivekî navdar e, dewlemend e û xwedî malbateke mezin e. Di Serhildana Şêx Seîd da wek gelek Kurdên herêmê ew tevî kurên xwe piştgiriyê dide serhildanê û jixwe ji ber vê alîgiriyê mecbur dimînin terka mal û halên xwe bikin. Di kilamê da ji bilî Silêmanê Ehmed behsa çend navên din jî tê kirin ku ew; Asya Xanim, Besra Xanim, Kazim Beg, Ferzende Beg, Keremê Qolaxasî ne. Asya Xanim jina Silêmanê Ehmed e ku kilameke Dengbêj Şakiro bi navê wê ye û me behsa vê kilama wî ya bi navê “Asyayê” kiribû. Asya Xanim xwesiya Besrayê û diya Ferzende Beg û Kazim Beg e, kilam bi bangkirina wê dest pê dike. Besra Xanim bûka Silêmanê Ehmed û Asya Xanimê ye, jina Ferzende Beg e. Ferzende Beg û Kazim Beg jî kurên Asya Xanim û Silêmanê Ehmed in ku di dema Serhildana Şêx Seîd da ew bi malbatî bi çend kesan va derbasî Îranê dibin, lê wek ku me got bavê wan li wir di pevçûnê da tê kuştin.

“Ax li lo li lo li lo li lo ...

**Asyayê bi sê denga bang dikirî gote Besrayê**

lê dayê **rebenê** dilê mi dibê ji êvarê hetanî mîla ber şefeqê

sibe ye **Bavê Kazim Siwarê Alece**

tevî **sêsid siwarê Mala Emer** va ji **Rasta Tuciyê** siwar bû

bi zereqa tavê ra xwe dabû **kirrê Tendûrekê...**” (Güneş-Şahin, 2018: 59)

Di van rêzikên kilamê yên ku Asya Xanim bi sê dengan bangî bûka xwe Besrayê dike da ew navê mêrê xwe nabêje. Ew kevneşopiyêke Kurdan ya ku mêr bi navê kurên xwe tên behskirin bi kar tîne. Şûna ku bibêje Silêmanê Ehmed gotina “Bavê Kazim” bi lêv dike. Her çiqas di gelek kilaman da zêdetir behsa Ferzende Beg bê kirin jî, şûna “Bavê Ferzende” li vir gotina “Bavê Kazim” tê bikaranîn. Lê, di berdwamiya kilamê da bi devê Silêmanê Ehmed bang li Ferzende tê kirin û gotina “bavê te” tê bikaranîn ku em têdigihêjin ku ev îfade tê meneya “Bavê Ferzende”. Bi van herdu gotinan va navê du kurên Silêmanê Ehmed bi saya vê kilamê di bîra civakê da tên bicihkirin. Wek gelek kilaman di vê kilamê da jî behsa hespa leheng tê kirin ku Silêmanê Ehmed wek “Siwarê Alece” tê terîfkirin.

Dema behsa siwaran tê kirin gelek caran wek metafor hejmarên sêsed, pêncsed an jî hezar û pêncsed derdikevin pêş me ku di vê kilamê da jî ji bo hejmara siwarên Mala Emer (binemala Silêmanê Ehmed e) sêsed siwar hatiye gotin. Îhtimaleke mezin ev hejmar ne sêsed e, lê ji bo ku di kilamê da lihevhatinek çêbibe, hunera vegotinê rengê xwe bide kilamê û bal ser siwarên jêhatî bê kişandin ev gotin hatiye bilêvkirin. Li gor rêzikên dewam dikin Siwarê Alece û sêsed siwar ji Rasta Tuciyê siwar bûne û serê sibê zeraqa tavê va xwe gihandine kîrê Tendurekê.

Ji hêla nasnameyê va heke em gotinên kilamê binirxînin kesên tên behskirin endamên malbateke Kurd in, ji eşîra Hesenan in. Ev malbata Kurd dijî qanûnên nû yên komarê ne û ji ber vê dijayetiye beşdarî serhildanan dibin û mecbur dimînin terka cih û warên xwe bikin. Dema ji welêt rê dikevin ku herin dervayî sînor hin serpêhatiyên xirab çêdibin û malbat perçe perçe dibe. Hinek tên kuştin (Silêmanê Ehmed), hinek birîndar dibin (Fertzende Beg) û hinek jî (Kazim Beg û Besra Xanim) piştî salan vedigerin axa xwe, lê perîşan dibin û aqil ji serî davêjin (Besra Xanim) dîn dibin ku trajediyêke mezin dibe para vê malbatê. Ji bilî nasnameya kurdbûnê nasnameya dîndariyê jî ji hêlekê va derdikeve pêş me ku ew jî aîdiyeta dîne Îslamê ye. Ew misilman in û bi risteyên kilamê va dibêjin “bi sonda qesemê, bi sonda tamam” (ev cureyek sondxwarinê ye) ew van qanûnên nû (mînak ya şewqeyê) qebûl nakin. Qanûna şewqeyê ya ku bûye mijara vê kilamê di 28ê Mijdara 1925an da di Rojnameya Fermî da hat weşandin ku gel qebûl bike û dijî wê tevnegere (Resmî Gazete, 1925).

Ji ber ku kilam rasterast behsa hin kesan û bûyerên dîrokî dike ji hêla dîrokê va jî kilameke girîng e. Kesên navên wan hatine gotin ji perçeyek şexsiyetên dîroka Kurdan in û mijarên tên behskirin jî di dîroka Kurdan da mijarên girîng in, der barê wê

heyamê da agahiyân didin me. Em têdigihêjin wê demê rêvebiriyeke padişahiyê heye, Siltan Evdilhemîdê navê wî tê behskirin padişahê Osmaniyan e. Di dema wî da xilafet heye, meriv şaşikê didin serê xwe, lê paşê hin bûyer diqewimin û ji text tê daxistin û piştî demekê jî komar ava dibe. Ji bilî sergirtina mêran ya rojane di nav sînorê Împaratoriya Osmaniyan da û hema bibêje li hemû Rojhilatê şaşik sembola dîn, ilm û îrfanê ye. Ji ber ku komara nû êdî şaşikê qedexe dike û şewqeyê li ser însanan ferz dike, gelek guherînên nû yên ne li gor dilê civakê tînin kirin însan radibin ser piyan, serhildanan dikin ku Serhildana Şêx Seîd jî yek ji wan e. Bi gotinên kilamê em têdigihêjin ku mêrên Mala Emer bi bav, kur û siwarên din ên ji malbatê va dijî vê qanûna nû û zagonê ne û ji ber van bûyeran beşdarî serhildanan dibin.

Ji hêla mekanê va dema em berê xwe didin kilamê navê du cihan “Rasta Tuciyê” û “Kirrê Tendurekê” tînin behskirin. Silêmanê Ehmed, Ferzende Beg, Kazim Beg, Keremê Qolaxasî û siwarên din ji Rasta Tuciyê ya ku herêmeke li Giyadînê ye siwar bûne û bi zeraqa tavê va xwe gihandine kirrê Tendurekê. Peyva kirr ji bo cihên bilind û asê tê bikaranîn ku ev ji bo Çiyayê Tendurekê (çiyayekî volkanîk e) hatiye gotin. Çiyayê Tendurekê di navbera sînorên Bazîda navçeya Agiriyê û Çaldêrana navçeya Wanê da ye. Piyê van mêrên dixwazin ji wê herêmê ji sînor derbas bibin û herin Îranê li van deran ketiye. Li Bazîdê û wê herêmê ji ber ku eşîra Celaliyan xwedî nifûseke zêde ye ew rastî eşîra Celaliyan jî hatine. Silêmanê Ehmed ji bo eşîra Celaliyan sifata “bêbext”ê bi kar tîne û wiha bangî kurê xwe Ferzende Beg û Keremê Qolaxasî dike:

“Silêmanê Ehmed bi sê denga bang dikirî  
 go: Ferzende, Keremê Qolaxasî bavê bavê mino bo  
 hûnê mêrê mêr bin, çê bin çê bixebitin  
 li pêşiya me gaziya Celaliyanî bêbext e  
 li milê me yê rastê eskerê qerenîzamê giran e  
 taqeta bavê te pêda nari bi  
 le bavê te sond xwariye bi sonda qesemê  
 li piştî qanûna Sultan Evdilhemîd qebûl nakim şewqê vî zalimî  
 emê rûnên gilî û gazinê bikin ji çerx û qasidê Qol Felekê  
 wax li lo li lo li lo  
 ezê bi rebena cotê tiregûnê Mala Emer im li lo li lo berxê...” (Güneş-Şahin,

2018: 59)

Vê qisma kilamê da Silêmanê Ehmed gotineke di nav Kurdan da navdar e bi kar tîne ku ew jî îfadeya “bavê bavê mino” ye. Di çanda kurdî da ev îfade ji bo hezkirina mêran, pesindayîna wan tê bikaranîn. Ji bo ku kesek der barê tiştekî da bê motîfekirin û ew wêrek tevbigere tê gotin û wek mene piştevaniyê di xwe da dihewîne. Paşê ew şîretê dike û dibêje “mêrê mêr bin, çê bin û çê bixebitin” yanê bibin mêrên mêrxas û baş. Di destpêkê da me gotibû Silêmanê Ehmed xwe wek “Bavê Ferzende” bi nav dike ku em ji van risteyên kilamê yê dibêje “taqeta bavê te pêda nari bi/le bavê te sond xwariye bi sonda qesemê” dibînin ku bavê wî bi lehengiya kurê xwe bawer e û wî ji xwe ra wek piştîmêr dibîne.

Ji ber ku ew ji destê eskerê qerenîzamê direvin û dixwazin herin Îranê mecbur in ji herêma eşîra Celaliyan derbas bibin. Lê ji ber ku ew li pêşîya wan in, jê hinek astengiyan li ber wan datînin dibêje Celalî bêbext in, dibe ku wan teslîm bikin. Ji ber vê jixwe dibêje çê bin çê bixebitin û ji bo bavê xwe bibin piştîmêr ku ew ji destê wan xelas bibin û herin. “Çerx û qasidê qol felekê” jî îfadeyeke balkêş e, bere jî hatibû behskirin dema bûyerek nebaş biqewime ji bo sûcdarkirinê felek berpirsyar tê nîşandan û li vir tê gotin heke felek ji wan ra xirabiyê bike û ew negihêjin armanca xwe qol felek yanê ezraîl wê rûhê wan bistîne û ew ê jî rûnên ji xwe ra gilî û gazindan bikin.

Di rêzikên dawîn da ji bo lehengiya mêrên malbatê dengbêj bi devê jinê dibêje “Ezê bi rebena cotê tiregûnê Mala Emer im bexê”. Di kilaman da em gelek caran rastî peyv û gotinên tirkî, erebî, farisî û rûsî tînin, lê kêman caran peyvên îngilizî tînin bikaranîn ku tiregûn (dragon) jî yek ji wan peyvên e û li vir bala me dikşîne. Dengbêj bi devê jinê gotina “ez reben im” bi lêv dike ku ev form ji bo êşa tê kişandin û bêçaretîyê tê gotin. Kesa ku dibêje “reben im” xwe ji bo mêrên hatine kuştin, birîndar bûne an jî rastî pevçûnê hatine gorî dike, heyfa xwe bi wan û lehengiyan wan tîne.

Heke em bînin ser peyva tiregûnê (dragon) ew di zimanê îngilizî da tê meneya ejderhayê. Dengbêj bi devê jina malbatê pesnê Silêmanê Ehmed û Ferzende Beg dide û ji ber ku du mêr in wan wek “cotê tiregûnê” teswîr dike. Li vir hunera teşbîhê yanê şibandîne heye ku wan dişibîne ejderhayê (ziya-zîha û cinawêr), metaforek jî hatiye bikaranîn. Ejderha ji ber ku cinawerekî-heywanekî qirase ye, ji devê wî agir derdikeve, tirs û xofê dike nav dil û hinavên însanan di mîtolojiyê da jî sembola hêzê, jêhatîbûnê, ezamet û pîroziyê ye. Di gelek civakan da ejderha di çîrok, destan û mîtolojiyê da derbas dibin, mene û teswîrên ejderhayan jî cuda ye. Carna ew bi sê û çar, carna jî bi heft serî derdikevin pêş me, çavên wan mezin in, xezîneyan diparêzin û dijî hin kesan

jî şer dikin. Ew li ser kevir, kaxiz û minyaturan carna wek marên qirase hatine bixêzkirin, carna jî bi per û bask yên agir ji devê wan derdikevin û dikarin bifirin hatine xêzkirin. Di Sûreya Erafê, ayeta 107an a Qur'anê da wextê behsa qiseya Hezretî Mûsa tê kirin tê gotin ku ew dijî Firewn û yên ji wî bawer nakin gopalê xwe davêje erdê hema nişkêva gopalê wî dibe ejderha (hinekan wek ejderha, hinekan jî wek marê mezin wergerandiye). Di *Şehnnameya Fîrdewsî* da jî Behram Gûrê hikûmdarê Eceman dijî ejderhayan şer dike û di minyaturan da ew wisa tê teswîrkirin. Di çanda Osmaniyan da jî dema em berê xwe didin edebiyata klasîk hin şair porê yara xwe, an jî gotinên xwe dişibînin ejderhayan. Ji bilî çanda Farisan, Osmaniyan û rojavayê (şûna agir av ji devê wan derdikeve) ew herî zêde di çanda Çîniyan da berbelav e. Di salnameya Çînê da sala ejderhayê heye û hin malbat dixwazin zarokên wan di wê salê da bîn dinyayê ku bihêz, jêhatî û aqil bin.

Di encamê da em dikarin bibêjin malbateke ji eşîra Hesenan dijayetiya dewletê û qanûnên wê kiriye, ji ber vê beşdarî serhildana Şêx Seîd bûye. Dema ku serhildan ber bi têkçûnê diçe ji bo ku neyên girtin an jî nefikirin bi malbatî û hin kesên din va bi rê ketine ku herin Îranê. Lê li wir aqûbet li gor dilê wan neçûye serî, Silêmanê Ehmed, Keremê Qolaxasî û çend kesên din hatine kuştin, hinek birîndar bûne û hinek jî sax filitîne, piştî demekê vegeyriyane welêt. Bayê felekê li wan jî dixê, ew malbata Kurd ya di mal û halê xwe da ye, jiyana xwe ya rojane dimeşîne wek gelek malbatên din ji ber sedemên polîtîk şepirze û perçe perçe dibe.

#### **4.4.4. Mêrekî Ji Eşîra Zîrkan: Kilama “Keremê Qolaxasî”**

Di nav kilamên Şakiro da gelek kilam li ser navê hin kesan hatine çêkirin ku ew di dîrok û bîra civakî ya Kurdan da kesên navdar in. Tesîra wan li ser bûyeran çêbûye, an bûyer bi xwe hatine serê wan an jî bi saya wan bûyer safî bûne. Şêx Seîd, Ferzende Beg, Xalis Beg, Silêmanê Ehmed, Keremê Qolaxasî, Îbo Begê Parsînî, Xalid Begê Cibrî û gelekên din hin navên sereke ne ku zûtir tîna bîra Kurdan. Ji wan yek jî Keremê Qolaxasî (Kerem Begê Zirkanî) yê ji eşîra Zirka ye. Kerem kurê Ehmedê Qolaxasî ye ku qolaxasî di dema Osmaniyan da bi meneya serefserê pispor ango “Kıdemli Yüzbaşı” dihat bikaranîn û ji ber bavê xwe yê qolaxasî ew wisa hatiye binavkirin (Beğik, 2018: 84).

Dema Serhildana Şêx Seîd (1925) çêdibe Keremê Qolaxasiyê ku yek ji fermandarê şervanên Şêx Seîd e, bi Ferzende Beg, Şêx Elî Rizayê kurê Şêx Seîd û hin kesên din

va ji bo ku ji nav lepên eskerên Tirkan xwe xelas bikin diçin Îranê. Eskerên Îranê dibêjin divê ew çekên xwe daynin û wisa ji sînor derbas bin bikevin welêt û wan hişyar dikin. Hin kesên ji wê komê naxwazin sîlehên xwe bidin hêzên Îranê, guleyan diteqînin û pevçûn çêdibe. Keremê Qolaxasî û çend kesan din ên ji koma Kurdan di wê xirecirê da têt kuştin. Evdalê kurapê wî jî wek wî li wir têt kuştin ku ew ji Malbata Mistefa Axa ne û wek Mala Qolaxasî û Mala Evdalê (Evdila) Mistê têt binavkirin. Kilameke Şakiro rasterast li ser navê Keremê Qolaxasî hatiye gotin ku wiha dest pê dike:

“Lo axao axao axao

lo lo maqûlo sibe bû ezê çûme textê Qereyaziyê

bişewite ji dilê min û te ra bi kevir e

hela bala xwe bidê vê sibengê sibe ye malxirabo

eskerê Keremê Qolaxasî giran e tamamî tolmexwir e

ji êvara Xwedê da vê sibengê bi ser eşîra Zirikî da

hewar Xwedê gelo vê sibengê kalekal e, zarezar e

ji êvar da wa birebir e

**Keremê Qolaxasî vê sibengê bi sê denga bang dikir**

**go Evdal bira em hene**

**berxê Mala Evdalê Mistê ne**

**mêrê mêrxas gelo berxê Mala Qolaxasî**

**lawo emê tim û tim cara qarşî xelqê mêrne çê ne...**” (Güneş-Şahin, 2018:

98)

Di kilamê da Keremê Qolaxasî û pismamê wî Evdal li dijî eskerên Heyder Efendî (yek ji qomitanekî Tirkan e) şer dikin. Qasî ku têt texmînkirin ev şer dora 1924-1925an da çêbûye, lewra wek ku hat gotin ew piştî serhildanê li Îranê têt kuştin. Wek hin caran di gelek kilaman da derdikeve pêşberî me li vir jî ji bo xurtkirina îfadeyê, balkişandin û hişyariyê bi sê denga bang têt kirin. Keremê Qolaxasî jî bi sê denga bangê Evdal dike û dibêje ew berxê Mala Evdalê Mistê ne, mêrên mêrxas in, berxê Mala Qolaxasî ne û pesindayina xwe û malbata xwe wiha didomîne:

“...lawo emê tim û tim cara qarşî xelqê mernê çê ne

tu rabi vê sibengê malxirabo

ez ji te ra sond bixwim sonda qesemê

gere eskerê Heyder Efendî vê sibengê ji xwe ra li ser esker nesequine

ez ji te ra sond bixwim gere nava êlan û eşîran da

serî ji îro şûnda ser xwe negire

hela bala xwe bidê vê sibengê xelq tim û tim cara

**bêje eskerê Keremê Qolaxasî tamamî tolmexwir e...**” (Güneş-Şahin, 2018: 98)

Di civaka Kurd da wek ku tê zanîn xwarina goşt, birinc, savar, kifte, dolme (tolme) û mehir (girar) xwarinên navdar in û yê rewşa wan baş bin her tim van xwarinan dixwin. Di destpêka kilamê da jî dengbêj ji bo pesnê eskerên Keremê Qolaxasî bide dibêje eskerên wî zêde ye (peyva giranê hatiye bikaranîn) û tolmexwir e. Çima peyva tolmexwirê hatiye bikaranîn dema em lê dinihêrin ew sifateke û ji bo pesnê eskeran bê dayîn hatiye bikaranîn. Ji ber vê dibêje ev eskerên xurt û bihêz yê tolmexwir in zûbizû têk naçin, lewra ew şervanên gelekî jêhatî ne. Îfadeyên wek vê di nav çanda kurdî da hene ku li gor mînaka Dengbêj Sebriyê Agirî jî dide gotineke wiha heye: “lawo ez soresavarê dixwim, ez savarê sor dixwim tu min nikarî” û ev jî ji bo pesindayîne û çavtirsandina kesê li hemberî xwe tê bikaranîn (Sebriyê Agirî, Pêwendiya têlefônî, 20ê Gulana 2022yan).

Keremê Qolaxasî dibêje ew li hemberî xelkê merivên çê û baş in û sond dixwe ku divê eskerê Heyder Efendî li ser esker nesekine û bê kuştin. Wek peyv sond Kurmancî û qesem jî Erebi ye ku li vir bi hev ra hatine bikaranîn. Bikaranîna her du peyvên ya li kêleka hev wate tê saxlemkirin û xurtkirin. Lê bi îfadeya “Heyder Efendî tevî alayîkî eskerê xwe ji xwe ra vê sibengê jor da girtiye dimeşe anî fenanî şet e” em têdigihêjin ku hejmara eskerên Heyder Efendî gelekî zêde ye û ji ber vê şerekî mezin di navbera eskerên Heyder Efendî û yê Keremê Qolaxasî (xwe wek berxê Mala Axê û fenanî gurê ji gurê xwedayî) da çêdibe ku dengbêj wiha dewam dike:

“...Lo axao axao  
sibe ye vê sibengê birayê mezin Nusret e  
tu dêhna xwe bidê vê sibengê malxirabo birayê mezin Nusret e  
Kerem, Evdal jê ra kirin gilî gazin û hurmete  
**tu dêhna xwe bidê vê sibengê Heyder Efendî tevî alayîkî eskerê xwe  
ji xwe ra vê sibengê jor da girtiye dimeşe anî fenanî şet e  
berxê Mala Axê ji mal siwar bûne  
ez ji te ra sond bixwim vê sibengê fenanî gurê ji gurê xwedayî ne**  
gulle barûda li ser da dibarîne fenanî qiyamet e  
tu dêhna xwe bidê vê sibengê malxirabo  
dîtina Heyder Efendî  
esker û alayê ji xwe ra vê sibengê kir hesret e lawo  
lo axao axao ...

tu sêr bike vê sibengê girêdana siwariya di berê  
na wele kilê çavê cotê xanima

Birca Belek şewitiya Qizqaniyê da bêxwedî mao.” (Güneş-Şahin, 2018: 99)

Ji gotina “gulle barûda li ser da dibarîne fenanî qiyamet e” rewşa şer tê teswîrkirin. Jixwe peyva qiyametê ji bo rewşeke nebaş, qerebalix, xirecir û tevliheviyê gelek caran di nav gel da tê bikaranîn. Mînak ji bo cihekî qerebalix dibêjin “wisa bû te digot qiyamet e”, yan jî ji bo tevlihevî û xirecirê dibêjin “wek qiyametê bû kesî kes nedidît”. Li vir jî dengbêj dibêje Keremê Qolaxasî û yên hemberî wan êrîşeke mezin dibin ser hev û şerekî dijwar di navbera wan da çêdibe ku wek qiyametê guleyan dibarînin.

Ji ber ku Qizqanî gundekî li ser Qereyaziya navçeya Erziromê ye û gundê Keremê Qolaxasî ye nave gund jî di nav rêzikên kilamê da derbas dibe. Ji hêla mekanê va heke meriv bifikire referansa mekanê jî li vir heye. Di bîra civakê da gundê Qizqaniyê wek gundê wî bi cih dike û guhdar nexşerêyekê tînin li ber çavên xwe û têdigêhêjin ku ev gund li ser Qereyaziyê ye. Birca Belek ji bo avahî û mala wî ya mezin hatiye bikaranîn û tê gotin Qizqanî bişewite Birca Belek û cotê xaniman bê xwedî mane. Îhtimaleke mezin du jinên wî hebû ne ku îfadeya “cotê xaniman” hatiye bikaranîn, yan jî wek hin kilaman di vê kilamê da jî ev ji bo lihevhatina risteyên kilamê hatiye gotin. Şakiro wiha dewam dike:

“...Lo axao axao  
sibe ye ezê li diyarê textê **Qarayaziyê, Qizqaniyê**  
diketim dilê min û te ra  
vê sibengê tu dêhna xwe bidê hewara me Xwedê  
îro ji êvara Xwedê da herkesî ji kêfê ra agir dadanî  
hela bala xwe bidê vê sibengê siwar û peyayê Zirika siwar bûne  
Mala Axê maleke bi tenê ne  
tu dêhna xwe bidê Keremê Qolaxasî, Evdal  
li derê **Birca Belek** senîne  
herkesî di tanga xwe da hicûm danê  
**ez çi bikim felek xayîne** vê sibengê malxirabo  
berxê malê Qolaxasî Evdalê Mistê ra nadomîne  
tu dêhna xwe bidê hukûmeta Turkiyayê  
temamî vê sibengê li qolincê siwar bûye  
**hukûmeta Turkiyayê tevî eşîra Kurdistanê**  
**ez çi bikim felek xayîn e** vê sibengê malxirabo  
Keremê Qolaxasî, Evdalê bira



berê xwe dane Mala Silêmanê Ehmed ba **Ferzende**

got tu were vê sibengê îro şûnda nava Turkiyayê îdara me nabe

emê ji xwe ra vê sibengê berê xwe bidin şewitiya vê **Îranê**

lo axao axao

tu sêr bike vê sibengê kilê çavê cotê xanima

sibe ye vê sibengê Birca Belek

şewitiya Qizqaniyê da ji xwe ra bêxwedî jê mao.” (Güneş-Şahin, 2018: 99)

Dema em dewam bikin di kilamê da tê destnîşankirin ku felek ji bo Keremê Qolaxasî û Evdal xayîn e, lewra li dû wan ketine û ji ber wê wan berê xwe dane Ferzende Begê kurê Silêmanê Ehmed û jê ra dibêjin êdî sitara wan li Tirkiyeyê nemaye û dive ew ji welêt (peyva Kurdistanê hatiye gotin) derkevin û xwe bigihînin Îranê. Ew Ferzende Begê ku pesnê lehengiya wî di çend kilamên din da tê dayîn di vê kilamê da jî derbas dibe ku ew dixwazin berê xwe bidin cem wî. Osman Sebrî ji bo lehengiya Ferzende Beg dibêje ji ber ku wî gelek qehremanî nîşan daye û yên dijî xwe têk biriye, wan jixwe fedî kirine. Ji bo ku têkçûna xwe li hemberî fermanarên xwe biparêzin raporeke derew şandine serdarên xwe û gotine eşîrên li Geliyê Zîlanê piştgirî dane Ferzende Beg, ew loma têk çûne. Piştî vê raporê 80 gundên li Geliyê Zîlanê bi kal, pîr, jin û zarokan va hatine şewitandin (2016: 29). Ew Ferzende Begê ku Sebrî jî pesnê lehengiya wî dide bi van kesan ra diçe ser sînorê Îranê ku pêsîra xwe xilas bike, lê wê derê jî xelasiya wan tune. Evdal, Silêmanê Ehmed û hin kesên din li wir tîn kuştin, Ferzende Beg jî paşê di girtîgehê da tê jehrîkirin. Şervanî û cengaweriya wan têrê nake ku ew xwe ji destê Tirkiye û Îranê xelas bikin. Wek kilamên din di vê kilamê da jî mekan, nasname, dîrok û bikaranîna ziman wek hêmanên bîra civakî di nav xwe da hercûmerc bûne, bi hev ra hatine bikaranîn.

#### **4.4.5. Hevalbendiya Du Biyarên Şerker: Kilama “Axao”**

Kilama “Axao” behsa hevalbendiya du birayan Seyîdxan û Tewfîq dike. Seyîdxan li gundê Qicixa ser Mûşê hatiye dinyayê, ji malbata Seyîdan ya şaxeke eşîra Hesenan e. Ji malbata wî ra dibêjin Mala Ûsivê Seydo. Birayê wî Tewfîq e ku wek Seyîdxan der barê Tewfîq da jî kilam hatine gotin. Seyîdxan di nav Kurdan da bi mêrxasî û wêrekî ya xwe va navdar bûye. Aras jî balê dikşîne ser mêrxasiya Seyîdxan û ji bo mêrxasiya wî du mînan nîşan dide. Ya ewil piştî şerekî di navbera eşîra Cibran û Seyîdxan wext derbas dibe û firsend dikeve destê Seyîdxan ku ew tola xwe hilde, lê şûna ku ew tola xwe hilde birayê Seîdê Nado û merivên wî nakuje û dibêje bihêlin bila

herin, ya duduyan jî Hecî Mûsa Begê Xweytî, Qasim Beg bi merivên xwe va êrîşî gundê Seyîdxan dikin û şervanên Xweytiyan direvin diçin, lê Qasim Beg tenê dimîne û Seyîdxan wî jî nakuje û berdide (2009: 18-20). Ev tevgerên wî yên ku emanê dide kesên hemberî xwe, wan berdide û nakuje wek mêrxasî tê qebûlkirin û di nav civakê da tim pesnê wî tê dayîn. Her çiqas rasterast der barê jiyana wî da nebe jî derhêner û lîstikvanê navdar Yılmaz Güney jî filmeke bi navê “Seyithan” çêkiriye û tê gotin wî tesîr ji kesayetî û mêrxasiya Seyîdxan girtiye, ji ber vê filmeke behsa mêrxasiyê dike çêkiriye.

Di Şerê Dinyayê yê Yekemîn da Êris dikeve nav Kopa navçeya Mûşê. Dîsa li gor agahiyên Aras dide Seîdê Nado, Derwêşê Êsivê Seydo û merivên wan dijî Êrisan şerekî dijwar dikin, Kopê ji destê Êrisan xelas dikin û di wî şerî da tîn kuştin, lê Seyîdan ji wir sax difilite. Piştî demekê di dozeke mêrkuştinê da tê girtin û heta 1926an di girtîgeha Mûşê da dimîne û paşê tê berdan. Dema diçe Îranê û vedigere hikûmat kuştina yanzdeh eskeran hincet nîşan dide û wî dişîne girtîgeha Diyarbekirê (2009: 20-21). Serpêhatiyên Seyîdxan li vir xelas nabin helbet, di nav demê da gelek tiştên din jî tîn serê wî.

Piştî serhildana Şêx Seîd gelek axa, beg û rûspiyên Kurdan yên ku di serhildanê da cih girtine heta ku di mehkemeyên Îstiqlalê da bîn îdamkirin an jî bîn cezakirin di hespsê da hatine girtin. Wê demê Seyîdxan jî bi wan ra di heman girtîgehê da ye û bi tevger û axaftinên xwe bala Osman Sebrî dikşîne. Di 1926an da dema ew di girtîgeha Diyarbekirê da ye Osman Sebrî jî li wir e ku wiha behsa hevnasiya xwe û Seyîdxan dike:

“Dema girtî ji mehkemeyê vedigeriyan, xelkê zindanê diçûn hemberê dergeh da bizanibin kî bi darve dibe û kî hikim xwariye. Wê rojê ez jî tevî kesên ku li hemberê dergehê zindanê çavnêriya hatina xelkên mehkemeyê dikir rawestîyabûm. Di pêşiya kesên ku ji mehkemeyê vegeiriyan de xortekî dirêj û rûgeş derbasî hundir bû, yekî ji çavdaran jê pirsî;

-Seyîdxan; çend sal hikim dane te?

Wî bi tinazî lê vegerand û got

-Gora bavê wan, min yazdeh ji wan kuştin, wan deh sal dane min.

Peyayekî wan belaş çû.

Holê min Seyîdxan dît, careke din keys neket min ku bibînim. Kesên hikim dixwar, zûka dihatin dişandin bo zindanên Tirkan da ku ji bo girtiyan nû cih di zindanê de hebe.” (2016: 30-31).

Bi van gotinên Osman Sebrî meriv têdigêhêje ku Seyîdxan hem wêrek û hem jî kesekî nuktedan bûye, mêrkuştinê tiştêkî normal dihesibîne ku henekên xwe dike û li ber cezakirina xwe nakeve. Piştî ku Serhildana Agiriyê têk diçe û dewlet li dû Kurdên beşdarî serhildanê bûne dikeve gelek Kurd direvin dibin firar, hinek diçin binxetê û hinek jî jixwe tên kuştin û neffikirin. Di 1931ê da Elîcan li Çepê ya Qereyaziya Erziromê merivên xwe berhev dike û serî hildide. Qasî hefteyek û deh rojên piştî wî îja Seyîdxan û rêhevalên wî serî hildidin, lê paşê ew digihêjên hev û ew du komên cuda dibin yek û li hemberî dewletê şer dikin. (Aras, 2009: 39, Çelik, 2015: 186)

Seyîdxan gelo çima serî hildide û dijî dewletê şer dike heke em li dû vê pirsê bikevin bersiva vê pirsê Seyîdxan bi xwe dide. Fesîhê Mihê Mirzê axaftineke xwe û Seyîdxan wiha neqil dike:

"Hun jî dizanin em Seyîdan du ber in. Û belkî ev sed sal e ku em ji hev mêran dikûjin. Em bi vî karî bûne dujminê hevê xwînî. Bera me Elyazî ye, ya din jî Elîkan in. Mezinê Elîkan Cûma ye, pir dewlemend e. Ewî çûye li Mûşê Avukat Ehmedê Ano dîtîye, pere danê û li Enqerê gilîyê min kiriye. Gotiye Ferzendê Silêmanê Ehmed ji Kîrrê Gilîdaxê hatiye mala Seyîdxan. Wî Ferzende kirîye mêvan û bûye hevkarê wî. Ez bi muqeddesata sond duxum ku ew ne rast e. Ferzende par bi heft sîyarên xwe va hatibû çîyayê gundê me, li çîyê birçî mabûn. Ji min ra xeber şandibûn ku ji wan ra nan bişînim. Min Ferzende nedît û min ji wan ra nan jî neşand. Ji bo tiştên nebûyî a wiha bi pêşîra min girtin." (Aras, 2009: 40)

Di şerê Agiriyê da qasî navê Ferzende Beg û Îhsan Nûrî Paşa, navê Seyîdxan û Elîcan jî gelekî derbas dibin ku Osman Sebrî wiha pesnê wan dide (2016: 32):

Îhsan Nûrî Paşa û Ferzende ji qûntarên Agiriyê derketin û wan xwe spart dewleta Îranê. Hingê di nava welêt da kesên mêrxas cih cih tiving ji destên xwe neavêtibûn û serî ji zorbazên Tirk re nedanîn. Li Serhedan Seyîdxan û Elîcan her yekî pazdeh bîst siwar dabûn dor xwe û şerê dijmin dikir. Ji bo van herdu camêran cihekî xuya tunebû. Wekî teyrên nêçîrvan di kîjan erdî de keysa leşkerên Tirk biketa, wan wekî birûskê lê dida û derbasî aliyê din dibû. Hikûmeta Tirk gelekî bi wan re westiyabû. Alayîyeke leşkeran berdabû pey wan, lê wê alayîyê nedikarî şerê wan bike, ne jî pêşîya kirên wan bigire. Bi vî awayî di navbera wîlayetên Erzirom, Mûş û Bidlîsê da diçûn û dihatin.

Elîcan di sala 1931ê da tê kuştin û siwarên wî jî digihêjin birayê wî Seyîdxan. Ji ber ku Seyîdxan û hêzên wî gelekî xurt şer dikin û destê hikûmatê nagêhêje wan dewsa wê gundan dişewitînin. Seyîdxan jî ji bo ku zêde zîrar negihêje gundiyan

dixwaze derbasî aliye Sûriyeyê bibe, lê sîxur cawê didin hikûmatê ku ewê here. Li ser vê hikûmat gelek eskeran dişîne aliye Çiyayê Mêrdînê kemîn tê danîn ku rê li ber wî û siwarên wî bê girtin. Dîsa Osman Sebrî behsa vê bûyerê dike û dibêje di navbera hêzên hikûmatê û Seyîdxan da şer û pevçûneke mezin çêdibe lê tenê pismamê wî Silêman Axa û biraziyê wî Mistefa birîndar dibin. Dema ew ji vê kemîn û pevçûnê xwe xilas dikin xwe digihînin gundekî Deştê Mêrdînê eskerên hikûmatê yê li wir xwe veşartine guleyan direşînin û Seyîdxan tê kuştin (Sebrî, 2016: 33-34). Gora Seyîdxan li Mêrdînê di navbera gundên Tizyan û Zonê da ye.

Em dema berê xwe bidin vê kilama Şakiro ya der barê Seyîdxan û birayê wî Tewfîq da tê dîtîn ku ji hêla naverok, gotin û şeweyê va gelek kod, metafor, sembol û gotinên çanda kurdî tê da hene. Li gor texmînê di navbera salên 1930-31ê da dema herdu bira û merivên wan hewl didin ji destê hikûmatê xelas bibin û herin binxetê (Sûriye) li hêla Mêrdînê eşîra Sîpka rê li ber wan digire û nahêle ew herin. Ji ber ku piştgiriya dewletê dikin û rê li ber Seyîdxan û Tewfîq digirin di navbera wan da pevçûn çêdibe ku kilam behsa vê bûyerê dike.

Kilam piştî îfadeya “Axao Axao” ya ji bo xurtkirina gotinê çend caran li dû hev hatiye dubarekirin, bi navê mekanekî va dest pê dike ku ev der “Cemalvêrdî” ye. Cemalvêrdiya wek cih û war navê wê di gelek kilaman da hatiye bilêvkirin gundekî li ser Dutaxa navçeya Agiriyê ye, lê çawa ku gelek navên cih û warên Kurdan hatine guhertin navê vê derê jî tirkî wek “Bulutpınar” hatiye guherandin. Lê ji hêla bîra mekanê va ev der hê jî di nav Kurdan da wek Cemalvêrdî tê bikaranîn û civak guh nade navê wê yê tirkî. Di girîzgaha kilamê da pesnê lehengî û şervaniya Seyîdxan tê dayîn ku wiha ye:

“Lo Axao Axao Axao...

lo lo maqûlo sibe bû li dîharê Cemalvêrdî diketim bavêj e

tu bala xwe bidê helehelê lawê bava

qîrçînê çapiliyan û martêlya

**tivinga destê Seyîdxan malê Romê ye**

**barûda xwe dirêje, gulê xwe xweş davêje**

**herçî dîwana egîtê mala bavê mi tê da rûniştî be**

**bira kes rûmenê methê mêranya xwe nede, xeberê kin û dirêj mebêje**

rabe, herçî dîwana egîtê mala bavê mi rebenê tê da rûniştî be

bira kes rûmenê methê mêranya xwe nede

xeberê kin û dirêj mebêje wê...” (Güneş-Şahin, 2018: 45)

Bi rastî jî di kilamê da îfadeyên balkêş hene. Navê çek û cebilxaneyê ku Seyîdxan bi kar tîne wek “çapilî”, “martêl”, “tiving”, “gule” û “barûd” tên rêzkirin û tê gotin ew vana xweş bi kar tîne. Tivinga wî jî wek malê Romê yanî çekeke ji hêla artêşa Tirkan va jî tê bikaranîn tê pesindayîn ku diyar e li gor çekên wê demê çekeke baş û bi qîmet e. Ji ber ku behsa şerkariya Seyîdxan tê kirin guhdarên kilamê di hişê xwe da şer û pevçûneke giran difikirin û lehengekî bihêz û wêrek, yê ji tu tiştêkî natirse tê ber çavên wan. Em têdigihêjin ku ev gotin bi devê jinekê tên gotin, lewra “egîtê mala bavê min” wek gelek kilamên din li vir jî hatiye bikaranîn. Pesindayîneke wisa zêde heye ku dibêje egîdê mala bavê wî Seyîdxan mêrekî li ser mêran ra ye, şervanekî wêrek e û ji ber vê dema li dîwan û meclisekê rûnê bila kes behsa mêraniya xwe neke û methê mêraniya xwe nede. Lewra tu kes wê nikaribe wek wî mêr û camêr be, ew ê li hemberî pesindayîna xwe şermî bin û navê wan wê xirab be. Îfadeya “xeberê kin û dirêj mehbêje” jî ji bo hişyariya bila kes pesnê xwe nede hatiye bikaranîn ku ev jî dewlemendiya ziman nîşan dide.

Çawa ku di destpêkê da pesnê Seyîdxan hatibû dayîn di berdewamiya kilamê da pesnê Tewfîq jî her wisa tê dayîn. Teyfîq (Teyfûq) bi devê xwe pesnê xwe dide ku motîvasyona Seyîdxan zêde bibe, dixwaze bibêje ew piştî birayê xwe ye. Wek hin kilamên din li vir jî bi sê dangan bangkirin heye ku îfadeya balkişandinê ye û wek motîfa hejmarê yên wek sê, heft çil û hwd dibe bê nixandin. Bi sê dangan va dixwaze bala birayê xwe Seyîdxan bikşîne ku hevdu ji bo şer gurr bikin û şerekî baş bikin. Kilam wiha dewam dike:

“Teyfûq bi sê denga bang dikirî go Seyîdxan mala te xira be  
helhele ez heme, Bavê Salih berxê Mala Êsivê Seydo  
peyayê xerîb, mêrê mêrxas, kewê ribat, ne ez birayê te me

**mi bi telaqê jinberdanê sond xwarî**

li devê Mûradê fişeng avêtî devê çapilyê  
gelo vê sibengê gere îro li Cemalvêrdî mêra bikujim

fenanî miya ku berxa xwe wenda ke, dê weledê milê xwe bavêje...”

(Güneş-Şahin, 2018: 45)

Teyfîq dibêje ew wek mêrekî mêrxas Bavê Salih e, ji binemala Mala Êsivê Seydo ye û birayê Seyîdxan e. Ji ber ku wan sond xwariye ew ê mêran bikujin, wî li devê Muradê fişeng avêtiye sîleha xwe çapilyê û divê ew wêrek û bihêz tevbigerin û ji gotina xwe neyên xwarê. Di nav Kurdan da cureyên sondxwarinê hene ku yek ji wan jî sondwarina bi telaqê jinê ye. Kurd jî wek gelên din li ser navê Xwedê, Pêxember,

dîn, îman, Qur'an û li gor pîroziyên baweriya xwe, li ser navê hezkiriyên xwe û hin tiştên din sond dixwin. Lê ji bo mêran cureyek sondxwarinê ya balkêş heye ku ew jî telaq e, yanî mehra jinê ye ku pê ra zewicî ye. Heke bi vê îfadeyê sond bê xwarin tê zanîn ku ew sondeke gelekî mezin e, tişta ji bo wê sond hatiye xwarin pêk neyê divê jin bê berdan. Ji ber ku ev sondeke mezin e wisa zûbizû ev sond nayê xwarin û dema kesek vê sondê bibîhîze divê bitirse, lewra aqûbet wê nebaş be. Tewfîq jî vê sondxwarinê bi bîr dixê û dibêje ew heta neyên kuştin û mêran nekujin ew ê dev ji vê pevçûnê bernedin.

Teşbîh û şibandinên gelekî xurt di kilamê da xwe nîşan didin. Mînak; tê gotin ew ê wisa mêran bikujin, wê wek roja qiyametê şerekî wisa xurt bikin ku ji ber tirsê wî şerî kes nizane wê çî bike. Rewşa vî şerî dişibîne qiyametê ku mîh wê bikeve talaşa xwe û berxa xwe winda bike, dayik wê ewladê xwe ji milê xwe bavêje. Ji van teşbîhan bal tê kişandin ku her kesê bikeve talaşa xwe û ew ê yên din nefikire. Kilam dîsa bi devê jinê tê gotin ku dibêje egîtê mala bavê wê helan dane û ewê şer bikin:

“helan danê, helan danê, egîtê mala bavê mi nemayê helan danê

**ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê bi navê Quranê**

berxê mala bavê min bîna barûdê hildanê

sond xwarine bi telaqê jinberdanê

heya mêra nekujin bi silametî ranabin ji erasa vê meydanê...” (Güneş-

Şahin, 2018: 45)

Li vir jî sond tê xwarin û jina ku kilam çêkiriye dibêje ew li ser navê Qur'anê sondê dixwe ku berxên mala bavê wê (Teyfîq û Seyîdxan) bêhna gule û barûdê hildane, xwe ji bo şer amade kirine û bi telaqê jinberdanê sond xwarine ku ew heta mêran nekujin an jî neyên kuştin wê ji qada şer venekîşin û venegerin malên xwe. Di vê kêlikê da bangkirina Seyîdxan tê bihîstin ku ew bangî Sidîqê Hecî Mistefa Begê dike ku bila ew pêşiya wan berde, ew derbas bin herin û ji destê hikûmatê xelas bin. Lewra hikûmat jî bo wan bikuje, zar û zêrçên wan sirgûn bike li dû wan e û firar dixwazin ji nav lepên eskeran xelas bibin. Banga Seyîdxan a ji bo Sidîqê Hecî Mistefa Begê ji eşîra Sîpka wiha ye:

“Lo axao axao axao axao...”

lo lo maqûlo sibe bû li dîharê Cemalvêrdî diketim darî ter e

sibe ye Seyîdxan derketî banê qesrê

**bi sê denga bang dikirî Sidîqê Hecî Mistefa Begê**

**di bextê gora bavê te ketime**

**pêşiya firarê me berde**

**gidî firar güne ne bira derbas be here**

**hey malmîrat!**

**çima tu nizanî çend salê me tamam bû hukumeta Cumhûriyetê**

**li sirgûnkirina çolix û çocix û birîna serê me digere...**” (Güneş-Şahin,

2018: 45-46)

Seyîdxan hewl dide bi sê dangan bang bike Sidîqê Hecî Mistefa Beg ku bala wî bikşîne. Seyîdxan bang dike û jê ra dibêje destûrê bide firaran ku ew ji wê xeleşê bifilitin û ji nav lepên dewletê xwe xelas bikin. Li gor agahiya ku Güneş û Şahin didin Sidîqê Hecî Mistefa Beg yek ji giregirên eşîra Sîpka ye, pismamê Evdilmecît Begê, neviyê Hecî Êsiv Paşa ye û ji ber piştgiriya dewletê rê li ber hêzên rêxistina Xoybûnê girtiye û bi wan ra şer kiriye (Güneş-Şahin, 2018: 45-46). Di kilamê da îfadeya “bextê gora bavê te ketime” ji bo emanxwestinê, xweavêtinabextê kesekî tê bikaranîn ku xîtabî hestan dike. Rehm ji wî kesê hember tê xwestin ku ew bê rehmê û yê li emanê dixwaze bihêle bila ew here. Lê ji ber ku Sidîqê Hecî Mistefa Beg destûrê nade firaran Seyîdxan bi gotina “malmîrat”ê bi kar tîne bi vê gotinê va li wî hers dibe û dibêje qey tu nizanî hikumeta Cumhûriyetê dixwaze serê wan jê bike, çolix û çocixên wan jî bi sirgûnkirinê ceza bike. Dema em guhdariya kilamê dikin Şakiro wiha pê da diçe:

“Sidîqê Hecî Mistefa Begê digo wele nabî bile nabî

**mi bi serê Şêx Badînê erdê Dignûgê sond xwarî tu car nabî**

heya li dunyayê sax û silamet bim

firarê Seyîdan û Beraza nayê bi silametî bi ser mi ra derbas nabî rabe...”

(Güneş-Şahin, 2018: 46)

Seyîdxan her çiqas xwe bavêje bextê wî jî, Sidîqê Hecî Mistefa Beg bi serê Şêx Badînê Dignûgê (gundekî Milazgira navçeya Mûşê ye) sond dixwe û dibêje heta ew sax be, ew destûrê nade firarên malbata Seyîdan û Berazan ku ew wisa destên xwe bihejînin û ji nav wan derkevin herin. Li vir di aliyê Seyîdxan û hêzên wî da bêçarebûnek û hêrseke mezin dibe bê texmînkirin, lewra ew naxwazin hevdu bikujin an jî bibin hêsîrên dewletê, lê rê li ber wan hatiye girtin û ji bilî qirkirina hev tu rê li ber wan tune. Di berdewamiya kilamê da dîsa dengê Tewfîq tê bihîstin:

**“hey malmîrat! ji şerefa mala me ra eyb e**

**li ber xelkê tu negere**

tu nizanî peyayê bikeve qarşî kozika birayê te bi tenê

ez ji te ra sond bixwim bi telaqê jinberdanê

bi saxî û bi silametî bi ser çolix û çocixê xwe da venagere ...” (Güneş-Şahin, 2018: 46)

Çend rêzikên beriya vê dîsa Tewfîq dubare dike ku ew mêrekî mêrxas e, pesnê xwe yê wêrebûn û şervaniyê dide û dû ra jî ji ber ku Seyîdxan li hemberî Sidîqê Hecî Mistefa Begê emanê dixwaze li wî hers dibe û dibêje malmîrat ji bo şerefa malbata wan emanxwestin tişteki eyb e, bila ew li ber xelkê negere, devê xwe li ber wan xwar neke, lewra wî sond xwariye ku kesek wê bi sax û silamet bi ser zarokên xwe da venagere. Destûr li koma Seyîdan û Berazan nayê dayîn ku em navekî din jî di kilamê da dibihîzin ew jî nave Mûsa Begê apê Sidîqê Hecî Mistefa Begê ye. Mûsa Beg wiha bangî biraziyê xwe dike:

“Lo axao axao axao...

lo lo maqûlo sibe bû li dîharê Cemalvêrdî diketim çem û kanî

**sibe ye Mûsa Beg derketî banê qesrê**

**bi sê denga bang dikirî Sidîqê Hecî Mistefa Begê**

di bextê gora bavê te ketime

serê xwe ji xewa şêrîn bilind ke

hela bala xwe bidê helhelê lawê bava

qîrçînyê çapêlyan û martêlyan

fîrarê Seyîdan û Beraza bi limêja sibê ra gund hilanî...” (Güneş-Şahin,

2018: 47)

Mûsa Begê apê Sidîqê Hecî Mistefa Begê jî wek yê din dema bangî biraziyê xwe dike bi sê denga bang dike ku ew serê xwe ji xewa şêrîn rake û bibîne fîrarên Seyîdan û Berazan ketine gund bi çekên çapilî û martêlyan şerekî mezin dikan, bi gotina “lawê bava” jî balê dikşîne ser mêrxasî, wêrebûn û şervaniya wan. Di berdewamiya kilamê da dîsa bi devê jinê tê gotin egîten mala bavê wê (Seyîdxan, Tewfîq û koma wan refere dike) di nav tengasiyê da ne û nîfireke balkêş ya “agirê kulê bikeve mala xelkê Intabê” dike. Intab nave herêma Dutaxa Agiriyê ye, li gor gundê Cemalvêrdiyê herêmeke mezintir e û hêrsa xwe wiha ji wan ra tine “ser serê egîte mala bavê mi nemayê ji êvar da agir dada kirin kafiristanî”. Hestên bêçarebûnê, hers û pesindayîna mêrxasan hemû di van gotinan da tevlihev in. Rikê xwe bi wan kesan tine ku rê li ber mêrên malbata wê hatiye girtin û ew nikarin ji destê dewletê xelas bibin. Kilam dîsa bi devê Tewfîq va dewam dike ku dibêje ew ê li Cemalvêrdî Sidîqê Hecî Mistefa Begê, Mûsa Begê, Mamê Begê û komê wan a xulaman bikuje û heyfa xwe hilde:



“Teyfûq bi sê denga bang dikirî digo Seyîdxan mala te xira be  
 helhel e ez heme Bavê Salih berxê Mala Ûsivê Seydo  
 peyayê xerîb mêrê mêrxas, kewê ribat, ne ez birayê te me  
 mi bi telaqê jinberdanê sond dixwarî  
 li devê Mûradê fîşeng avêtî devê çapilyê  
**gere îro li Cemalvêrdî Sidîqê Hecî Mistefa Begê, Mûsa Begê**  
**tevê Mamê Begê komê xulama bikujim**  
**li qarşî çolix û çocixê wan, çek û sîlehê wan ji desta bistînim bi mêranî**  
**xelk bizanibi lawê bava hebû**  
**li piştî xirabîya xelkê**  
**ji bîr nekîr heyfa xwe hîlanî**  
 helan danê helan danê  
 egîtê mala bavê mi nemayê helan danê  
 ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê bi navê Quranê  
**berxê mala bavê mi gulîbirê bi dil û cîgerê xwe guven in**  
 sond xwarine bi telaqê jinberdanê heya mêra nekujin  
 bi silametî ranabin ji erasa vê meydanê. (Güneş-Şahin, 2018: 47)

Di dawîya kilamê da jî meydanxwendina li hemberî Mûsa Beg, Sidîqê Hecî Mistefa Beg û yên rê li ber koma Seyîdan û Berazan girtine tê xwendin. Tewfîq dibêje ewê şerekî wisa bike, heyfa xwe hilde ku nave wî di nav xelkê da bi nav û deng bibe, ewê bibêjin lawê bavan hebûn ku piştî xirabiyê (ji ber ku destûrê nadin, bi dewletê ra tevdişerîna îxanetê qest dîke) serî netewandin, şer kirin û heyfa xwe hildan. Qasî ku tê gotin Mûsa Beg, Sidîqê Hecî Mistefa Beg û çend merivên din di vî şerî da tên kuştin, Seyîdxan jî birîndar dibe.

Gotina “berxê mala bavê mi gulîbirê bi dil û cîgerê xwe guven in” dibe wek gotineke dawîn a kilamê bê destnîşankirin ku balê dikşîne ser şîngirtinê û wêrebûna mêran. Peyva gulîbirê wek ku tê zanîn peyveke jinane ye, piştî mirina mêrên malbatê ji bo şîngirtinê jin porê xwe kur dikin, guliyên xwe dibirin. Jina ku vê zêmarê dibêje xwe wek gulîbir pênase dîke, êşa xwe jî bi gotina “berxê mala bavê mi gulîbirê bi dil û cîgerê xwe guven in” sivik dîke. Ew dîsa pesnê mêrên malbatê dide ku ew dil û cegerên xwe bawer in, wêrek in, şer natirsin û jixwe di wê rêyê da jî mêrane mêr kuştine û paşê jî di taliya emrê xwe da hatine kuştin.

Di vê kilamê da jî dîsa leheng, mekan, nasnameya kurdbûnê ya dijî dewletê û nasnameya eşîrtî û mêranîyê, dewlemendiya ziman, dîrok hemû bi hev ra mohra xwe

kilamê xistine û wek hêmanên bîra civakê ava dikin derdikevin pêş me. Di heman demê da bîr li hemberî bîrê ye jî, lewra eşîrên Seyîdan û Berazan li gor xwe bîrek ava kirine, lê eşîra Sîpka jî li gor xwe bîrek ava kirine, heke niha ji endamên van eşîran bê pirsîn her yek wê bîra xwe ya hatiye avakirin behsa bûyerê bike, kal û bavên xwe navdar nîşan bide. Lê bîra hevpar ew e ku ew pev çûne, di dawiyê da mêr hatine kuştin û ev trajediya mezin di nav dîroka Kurdan da bi dengê dengbêjan hatiye gotin ku neyê jibîrkin.

#### **4.4.6. Bûyereke Ji Dema Komkujiya Geliyê Zîlan: Kilama “Keremê Elî”**

Di destpêkê da dema behsa hin bûyerên sereke yên ji kilaman ra bûne palgeh hatin kirin, nave Komkujiya Geliyê Zîlan (Qirkirina Geliyê Zîlan) jî hatibû bilêvkirin ku ew yek ji wan travmeyên mezin a gelê Kurd e. Di bîra civakî ya Kurdan da gelek travma hene ku civaka Kurd tînin bal hev û têkiliyeke xurt di nav wan da ava dikin ku ev komkuji jî ji wan yek e. Travma peyveke yûnanî ye û her çiqas ewil birîneke fizîkî ya li ser laş bîne hişê mirovan jî bi meneya xwe ya derûnasiyê û mecazî ew “birîn” an jî “êşîn”ê (Çelik, 2015: 183). Yanê hestan eleqedar dike, rûh diêşe û birîndar dibe. Dema ji hêla derûnasiyê va bê şîrovekirin travma ew birîna derûniyê ye ku heke şoqeke hestiyarî ya wê neyê tedawîkirin û bîranîna wê bê tepisandin derdikeve holê (Olick, 2014: 197). Çawa ku travmayên şexsî hebin, travmayên civakî (travmayên girseyî û komî) jî hene ku ew jî yek ji wan e.

Travma meneyeke neyînî di xwe da dihewîne, behsa tesîrên nebaş ên li ser rûhê însanan û civakê dike. Ev tesîrên nebaş her çiqas neyînî bin jî dikarin di navbera şexsan da an jî endamên civakê da têkiliyeke erênî jî ava bikin, hesteke hevpar derxin holê. Lewra mexdûriyetek, êşa dil û rûh, bîranînên nebaş û hestên neyînî dikarin qedereke hevpar, têkiliyên taybet di nav însanan da ava bikin. Ew jî ji bo Kurdan êş û travmayeke mezin û dîrokî ye ku tesîra wê hê jî li ser civakê heye û wek Terteleya Dêrsimê û Komkujiya Helebçeyê bîreke hevpar ava kiriye. Her çiqas hemû Kurd di wê demê da nejiyabin jî, dema navê vê komkujiyê dibihîzin an agahiyan dixwînin ew êş û birîn di derûniya wan da jî peyda dibe, ev êşa hevpar û travmaya civakî yekîtiya bîr û dîroka wan ava dike.

Dema bûyerên travmatîk çêdibin ew êş û xembariya giran nikare bi rêya gotin û peyvan bê vegotin. Lewra gotin, peyv, simbol û metaforên di hişê însanan da têra wê yekê nakin ku ev travma û hestên bîr bilêvkirin. Lê dîsa jî dengbêj, hunermend, nivîskar, şair, derhêner û hozan hewl didin ku van hestên travmatîk bînin ziman. Der

barê vê komkujiyê da jî gelek kilam, nivîs, serpêhatî, çîrok û pirtûk hene ku nehîştine ew bê jibîrkirin. Ji ber vê ye ku di bîra civakî ya Kurdan da ew her tim zindî maye. Kilama “Keremê Elî” yek ji wan kilaman e ku behsa bûyereke dema Geliyê Zîlan dike. Her çiqas kilam yek bi yek rasterast behsa kirinên Geliyê Zîlan neke jî, nav, mekan û bûyerên di nav rêzikên kilamê da derbas dibin ji gelek aliyan va der barê wê demê, komkujiyê û tiştên qewimî da agahiyan didin me. Kilama “Keremê Elî” behsa kesekî bi navê Kerem dike ku piştî komkujiyê dîl hatiye girtin û di hepsê da hatiye kuştin (Yıldız-Taşkın, 2018: 387). Keremê beşdarî Serhildana Agiriyê bûye bi eslê xwe ji Erdîşa navçeya Wanê ye û ji eşîra Hemoya ne (Güneş-Şahin, 2018: 92).

Li vir dîrok, nasname û bîreke hevpar ya der heqê Geliyê Zîlan da heye ku bi saya kilamê hatiye avakirin û bala guhdaran dikşîne. Her çiqas navê şexsekî (Keremê Elî) di serenava kilamê da der bas bibe jî, di tevahiya kilamê da hestên hevpar, bîreke hevpar heye. Lewra dengbêjê der barê komkujiyê, qurbanî û mexdûrên wê demê da kilamê dibêje qasî ku xîtabê hîş û bîra civakê dike, her wisa xîtabê hestên guhdaran jî dike. Tiştên xîtabê hestên merivan dikin, tevahî ji holê ranabin û der barê rabirdûya me da hebûnê didomînin, ji ber vê bîra der barê hestan da zû nayên jibîrkirin (Halbwachs, 2016: 55). Yên kilamê guhdar bikin jî dikarin van hestên hevpar parve bikin û herin wê dîroka nêzîk û bibin şîrkên êşa malbata Keremê Elî û mexdûrên Geliyê Zîlan.

Heke em berê xwe bidin kilamê em dibînin bûyera ku hatiye vegotin (kuştina Keremê Elî) li herêma Geliyê Zîlan ya li Erdîşa navçeya Wanê çêbûye. Kilam der barê bûyereke travmatîk da agahiyê dide me û li ser rewşa wê demê disekine. Wek gelek kilamên din di vê kilamê da jî du jinên bikeder hene, yek ji wan bi dengêkî dilşewat bangî ya din dike ku kilam bi vê bangê dest pê dike:

**“Bê Nacyarê wêê digo Dîdo da dayê**

**sibe ye dilê min ê bi kulê bi kederê bi mereq**

ji gavê din da li halê dilê min mêze kir

sibe bû mi di Keremê Elî Kekê Fadîmê Bavê Sulhê

li ber pencera **mapûsxana Erdîşa kavil** rûniştî

ji gavê din da ji kêf ra simêla sor hene kir” (Güneş-Şahin, 2018: 92)

Ji ber ku di berdewamiya kilamê da dibêje “xwengê bi reben be” em têdigihêjin ku Nacyar xwîşk an jî dotmama Kerem e, bangî Dîdoyê dike dibêje dilê wê bi kul û keder e, yanê behsa hestên xwe yên xembar dike. Sedema xembariya wê jî rewşa

Keremê Elî ye ku ew di mapûsxaneyâ (girtîgeh) Erdîşê da girtî ye. Ji ber ku Kekê Fadîmê û Bavê Sulhê Kerem di girtîgehê da ye dibêje bila Erdîş kavil (xerab) bibe. Kilam bi axaftina di navbera Keremê Elî û kesekî din da (mêrekî jê ra dibêje apo) dewam dike. Lê gotina “eza” jî balê dikşîne jinê û her kî/kê be jî axaftinek çêdibe û dengbêj wiha dibêje:

“...eza di ber ra derbas dibûm mi go Keremo lo lawo  
derd û kulê dunyayê pir hindik bûn  
va çi derman bû ji gavê din da te yê bi ser da li simêla xwe kir,  
digo apo mala te xera be birîna mi kûr e pir xedar e  
derba bêxwediya **filîntê** ye  
germa kaviliya **Heyderbegê, Aşê keşîş, Kanya Mara** lêxisto  
ji xwe ra bêfayde kir” (Güneş-Şahin, 2018: 92)

Li gor agahiya tê dayîn ji ber derba çekeke bi navê filînteyê Kerem birîndar bûye, xwîna sor gevez li ser simbêla wî da dirêje û yê ku jê ra dibêje “lawo” ji ber rewşa wî xembar dibe û xwîne dişibîne heneyê û dibêje “derdên dinyayê têrê nake îja ser da te simbêla xwe hene kir” û xembar dibe. Teşbîh û hunera di kilamê da balkêş e ku xwîn wek hene ye hatiye teswîrkirin. Navê Heyderbega gundekî li ser navçeya Erdîşê û navên du cihên din yanê Aşê Keşîş û Kanya Mara jî wek bîra mekanî bala guhdaran dikşînin. Wek tê zanîn komkujiya Geliyê Zîlan li ser mintiqeyê mezîna çêbûye û li gor agahiya İşler dide Keremê Elî li Erdîşê piştî mehkemeyê tê berdand, lê ji ber ku Silê Lorik (Axayê Pêrtaxê) mixbiriya wî û hinekên din dike esker dide peywan û ew li ser rêya gundê Pêrtaxê, li rex Aşê Keşîş tên kuştin (2016: 391). Di berdewamiya kilamê da behsa gelê herêmê, navê hin bajarok û gundan, malbata Hemoyan û kesên Komkujiya Geliyê Zîlan bi rê va birine tê kirin ku Şakiro wiha distrê:

“...wele heyfa mi nayê li tu heyfê heyfa mi tê li wê heyfê  
ji gavê din da xelkê **Pilûrê Pilûrvangê**  
xelkîne **Çelebîbaxê, Yekmalê, Erdîşê**  
ji xwe ra li mi mêze kir  
**Dewrêş Begê, Şewketê Walî** nava çarşiya Erdîşê da berjêr meş kir  
li derê qîşle qawîşê eskeriyê cendurma sekinî şêwr û mişêwre kir  
nav du cendurma da digo  
hûnê derbekî bi dest berdine bedena Keremê Elî Kekê Fadîmê Bavê Sulhê  
emê bizanibin me yê heyfekî ji Gelîkê Zîlan  
ji çuqa **Hemoya** pê da heyfekî giran bi destê xwe vekir

birîndaro wey la birîn kûro

xweng bi reben be hey wax he yû li minê (Güneş-Şahin, 2018: 92)

Gotina “Heyfa min nayê wê heyfê ji bo kesên kilaman guhdar dikin” îfadeyeke nas e, wek gelek kilamên din di vê kilamê da jî dengbêj heman gotinê digihîne kerika guhê me. Ji hêla hestan va bêçarefî, xembarî û heyfa xwe li tiştêkî an jî kesekî anîn xwe nîşan dide. Kerem dibêje tu tişt zora wî naçe, lê tiştê ku zora wî diçe ew e ku xelkê Çelebîbaxê (bajorekeke Erdîşê ye) û Pilûr, Pilûrvang û Yekmalê (gundên li ser Erdîşê ne) li wî mêze kirine, yanê girtina wî dîtine. Ji bo kesekî beşdarî serhildanekê bibe, mêran bikuje, dijî dewletê serî rake û paşê bê girtin rewşeke xirab e, vê wek şermezariyê dihesibîne. Ji ber ku ev nîşaneyê têkçûnê ye û kêr zêde tê zanîn ku aqûbet wê çi bibe, hestên hêrs û bêçaritîyê bi hev ra xwe didin der.

Ev cihên ku di kilamê da tên rêzkirin ji hêla mekanê va mekanên bîrê ne, guhdarên kilamê der barê bajarok, gund, kanî, aş û navçeyên wê herêmê da dibin xwedî agahî. Têdigihêjin ku ew li ser navçeya Erdîşê yanê di nav sînorên Komkujiya Geliyê Zîlanê da ne. Paşê navê Derwêş Beg derbas dibe ku ew navê albay Derwêş Beg (bi tirkî Derviş Bey) e ji ber kirinên xwe yê Komkujiya Geliyê Zîlanê wek “Qesabê Zîlanê” tê binavkirin. Ew bi eslê xwe ji malbateke Rumeliyê ye û hevalê çekdar ê Îsmet Paşa û Atatürk e. Derwêş Beg Zavayê Nuredîn Paşa ye ku wî jî serhildana Koçgiriye tepisandîye, piştî Komkujiya Geliyê Zîlan rûtbeya Derwêş Beg bi generaltîyê va hatiye xelatkirin (Ulugana, 2010: 176).

Derwêş Begê navê wî di kilamê da derbas dibe di bîra hevpar a Kurdan da wek hat gotin qesabê Geliyê Zîlan tê zanîn. Sedema vê jî ew e ku li ser daxwaz û fermana wî gelek kes hatine kuştin, birîndar bûne, an jî hatine sirgûnkirin. Bi destê wî dehan gund hatine şewitandin ku wek kesekî hêzê dewletê simbolîze dike, her tim bi şermezarkirinê û nefrete tê bibîranîn. Wek di rêzikên kilamê da jî tê gotin Derwêş Beg û Şewketê Walî di nav çarşiyê da bi pozbilindî dimeşin, paşê li qîşleyê ji cendirmeyan ra dibêjin derbekî berdîn (îşkence bikin, birîndar bikin, bikujin) bedena Keremê Elî ku ew heyfa (tola) xwe bistînin. Çima behsa heyfhildanê hatiye kirin diyar e, lewra beşdarî Serhildana Agiriyê bûye û dijî dewletê şer kiriye. Ji ber vê kirina xwe wek yê din ew “eşqîya” ye, hatiye girtin û divê ew bi canê xwe bê cezakirin. Ji ber ku ew ji malbata Hemoya ye navê malbata wî jî hatiye gotin ku ew jî wek gelek endamên malbatê wê bê kuştin. Li gor berdewamiya kilamê Nacyarê dibêje ew çûye mapûsxaneyê Erdîşê xwe berdaye nav girtîyan (qandar û qatilan û girtîya) ku pîrsa

Keremê Elî bike û yekî jê ra gotiye xwengê here hewşa Îdrîsê Cewer Efendî nava cinyaze û kuştiyan tu yê wî bibînî:

“Bê Nacyarê digo Dîdo da dayê  
sibe ye dilê min ê bi kulê bi kederê bi mereq  
ji gavê din da li halê dilê mi giriyayê  
wele minê xwe berdabû Erdîşa kavil nava qandar û qatilan û girtiya  
ezê çûme derê mapûsxana Erdîşê  
minê kiriye siwal û pîrsa Keremê Elî Kekê Fadîmê Bavê Sulhê  
qeytane ji qeytanê dorê di şewqiyê  
mi dî xwedanekî xêra rabû li ser darî piya go xwenga min  
xwe berde hewşa Îdrîsê Cewer Efendî<sup>25</sup> nava cinyazan û kuştiya  
minê xwe berdabû hewşa Îdrîsê Cewer Efendî nava cinyazan û kuştiya  
ezê ketime nava cinyazan û kuştiya geryame...” (Güneş-Şahin, 2018: 92)

Di dema komkujiyê û heyama piştî wê li herêmê tiştêkî balkêş jî kesên milîs û muxbîr in. Ji ber ku esker û wezîfedarên dewletê herêmê, eşîran û têkiliyên wan baş nizanin gelek Kurdên wê demê alîkariya wan kirine û bûne sedema qirkirina gelê xwe. Derwêş Beg jixwe merivê dewletê ye fermana kuştinan dide, lê wek di kilamê da jî tê gotin Îdrîsê Cewer Efendî (Îdrîs Erdînc) jî wê demê kesekî navdar e. Li gor agahiyên İşler dide Cewer Efendiyê ji qebîleya Soriyan ya şaxeke eşîra Celaliyan û kurên wî (Îdrîs, Silêman) wê demê gelek bûyerên nebaş kirine, Îdrîsê Cewer Efendî Şaredarê Erdîşê ye, çawa ku mal û milkên herêmê li gundan dikeve destê Sidîqê Hesoyê ji qebîleya Soriyan, li bajêr jî Îdrîs Beg dest dide ser mal û milkên xelkê (2016: 581, 582, 584). Wek ji kilamê jî tê fêmkirin û Ulugana jî vê agahiyê dide (2013: 52) Keremê Elî ji ber hedefnîşandana Îdrîs Beg ji Hepsa Erdîşê tê derxistin û wek gelek Kurdan ew jî li hewşa mala wî tê kuştin. Di berdewamiya kilamê da em dibînin ku xwanga Keremê Elî xwe digihîne hewşa Îdrîsê Cewer Efendî destê birayê xwe digire radike ser piyan lê mixabin niqutek xwîna sor gevez li ser birûyê wî, dev û lêvên wî, simbêla wî ya sor û hinarekên wî da diniquite û êdî tu çare ji wî ra tune:

“minê bi destê Keremê Elî kekê Fadîmê, Bavê Sulhê girtiye  
ji kedera dilê xwe yê bi kulê bi mereq ra **rakirî ser darî piya**  
mi dî **niqutek xwîna gewez ji çatmê buriyê da diniqufî**  
**bi ser dev û lêvê şekirî simêla sore narincî**  
na wele ji kedera dilê mi ra **ser henarê di rûyayê...**” (Güneş-Şahin, 2018: 92)

<sup>25</sup> Ji Erdîşê, ji eşîra Celaliya ji milê Soriya ye.

Ev kilama cureya wê zêmar e bi hestên jinê va dewam dike, tê gotin birîndarên mala bavê wê gelek in, ji ber birîndar û kuştiyan dilê wê tijî kul û keder e û ev jî li ser wan derdan zêde bûye û ew ê ji dilê xwe û birîndarên mala bavê xwe ra melhemekê çêbike. Em hin kilamên din da jî rastî behsa çêkirina melhemê ya ji bo dermankirina birînan tên. Çêkirina melhemê û dermankirina birîn, êş û kederan jî bi awayekî hunerî wiha tê vegotin:

“lê lê dayê rebenê birîndarê mala bavê mi pir û pir gelek in  
birîndarê nava ciya  
ezê rûnê ji kedera dilê xwe ra melhemekî çêbikim  
bi kîlo bi qirama bi derhema  
gelo ji xwe ra wa bi kevçiya  
li ber serê birîndarê mala bavê xwe rebenê ji kêfê ra bikim donzdeh ciya...”

(Güneş-Şahin, 2018: 92)

Di dawiya kilamê da behsa komkujiya Geliyê Zilan tê kirin û ew wek “kesîret” tê binavkirin. Ji bo vê kesîretê tê gotin heçî kesê ji xwe ra bêje misilman, dîn û îmana wî/wê hebe divê heta dinya xweş ava be (yanê heta ew li ser rûyê erdê bijî û bimire) vê komkujiyê ji bîr neke. Li vir referanseke dînî heye ku bangî hestên dînî tê kirin û tê gotin yên Xwedê bawer dikin divê vê komkujiyê ji bîr nekin. Xaleke din jî ew e ku rasterast neyê gotin jî tê xwestin bîreke civakî divê hebe û civakê vê bûyerê her tim di bîra xwe da veşêre ku ew neyê jibîrkin.

“...herçî kesê ku navê wî musulman be  
dîn û îman ji bonê hebe  
heyânî dunya xweş ava be ewê rûnê malxirabo  
ji bîr naki kesîreta Geliyê Zilan  
dayê rebenê çolix û çocixê serê van singûya  
birîndaro wey la birîn kûro xweng bi reben be  
hey wax hewû li minê ...” (Güneş-Şahin, 2018: 92)

Gotinên kilamê yên dawîn digihêje armanca xwe, lewra dema em berê xwe didin bîra civakî ya Kurdan wek di vê kilamê da jî tê gotin bûyer ji hêla civakê wek komkuji (kesîret) tê qebûlkirin, kesên hatine kuştin jî ne wek gotinên fermî eşqiya û rêbir in, berevajî vê ew leheng, egîd û mêrxas in. Mînak, çawa ku pesnê Keremê Elî tê dayîn, dijî vê Derwêş Beg, Îdrîsê Cewo û yên wek wan jî wek “qesab”, “zalim” û “kujer” biçûk tên dîtin û wek kesên xirab tên şermezarkirin. Ji ber ku hêz, pere, nav û dengên wan hebûye bi rehetî gelek neheqî kirine, meriv dane kuştin, dest dane ser mal

û milkên xelkê, çav berdane jin û qîzên malbatên wan, bi pereyan fetwayan dane û bi şahidên derewîn va gelek tiştên xirab yê bi vî rengî kirine di çavê civakê da ew kesên bêqîmet in.

Der barê komkujî û serhildanan da ji bo parastina hin kesan di sala 1931ê da qanûnek ketiye rewacê ku kesên wê demê gelek meriv kuştine bila sûcdar neyên qebûlkin û neyên darizandin. Li gor wê qanûnê li Erdîş, Zîlan, Agirî, Erzirom û Pulumurê hin bûyer qewimîn û ji ber van bûyeran meriv hatine kuştin ku ev jî tevgerê normal e û kuştina wan ne sûc e (Kahraman 2004: 239). Li gor madeya 1emîn a vê qanûnê ya hejmara wê 1850 ye û di 20ê Tîrmeha 1931ê da ketiye rewacê ji 20ê hezîrana 1930ê bigire heta 1ê çileyê pêşîn a 1930 esker, wezîfedarên dewletê, bekçî, gundparêz, milîs û gelê ku ji ber van serhildan û bûyeran meriv kuştine, ne sûcdar in (Resmî Gazete, 29 Temmuz 1931, Sayı: 1859).

#### **4.5. ŞOPÊN TEVGERÊN BEDENÎ**

Beden gewdeyê jîndaran e ku ji serî, mil, çîp û ezayan pêk tê. Her çiqas ji hêla fizîkî va beden ji serî, mil, çîp û ezayan pêk bê jî, gelek mene û îfadeyan nîşan dide (Bourse, 2009: 163). Hem ji aliyê şexsî û hem jî ji aliyê civakî va beden û tevgerên bedenî gelek meneyan di xwe da dihewînin. Ji ber vê ew tenê tiştekî cismanî nîne, xwedî gelek meneyan e ku di avakirina bîr û çandê da jî rolekê dilîze û wan digihîne nîfşên dahatûyê. Tevgerên wek rabûn û rûniştin, silavdayîn, şiklê xwarin û vexwarinê, şahî û şingirtin, definkirina miriyan, ken û bişirîn, cezakirin û xelatdayîn, moda (cil û berg), spor û gelek tiştên rojane yê bi bedenê tîn kirin, an jî tevgerên wek destkeleşkirin, îşkence, destdirêjî, serjêkirin, mecburîkirina ûnîformayê, girtin (hepiskirin) û hwd li ser bedenê tîn kirin hemû xwedî gelek meneyan in ku dikarin bibin nîşaneyê hin sembol, fikr û baweriyan.

Her çiqas hin tevgerên bedenî yê wek ken, girî, hêrs, silavdayîn, rabûn û rûniştin, xwarin û vexwarin yê li sersanserê dinyayê tîn heman meneyê hebin jî, ji hêla nîşandana wan va civak ji ber çanda xwe ji hev cuda dibin. Her civak xwedî hin tevgerên bedenî ne ku ev tevger ji nîşan derbasî yê din dibin, çand û bîrê ava dikin. Connerton jî balê dikêşe ser tevgerên bedenî û dibêje ew ji bo bîrê piştgiriyê bîtesîr ava dikin (2014: 172-173). Eleqeya tevgerên bedenî bi kevneşopî, dîn, çand, siyasat û civakê ra heye, ew peyam, mene, fikr û baweriyan radigihînin me û di avakirina bîra civakî da xaleke girîng in. Beden ji hêla bîra civakî va hem kirde ye û hem jî bireser e,



yanê li aliyekê va di nav rê û rêbazên bîra civakî da ava dibe û li aliyê din jî di avakirina bîra civakî da tesîrê dike (Karaaslan, 2014: 122).

Dema ji bo guherandina civakekê hewl tê dayîn çawa ku li ser nasname, ziman û çandê guherîn tên kirin, her wisa li ser beden û tevgerên bedenî jî zext tê kirin ku guherîn çêbin. Ev ji xwarin û vexwarinê, ji rabûn û rûniştinê, şahî û şingirtinê dest pê dike heta cil û bergan, dewam dike. Bi guherandina wan va civak asîmîle dibe, dihêle û rojek tê ji wan tu bermayî jî ji holê namîne. Wek ku Karaaslan jî destnîşan dike ji bo bedenê jî dema bi destê dibistan, mehkeme, meclis, eskeriyê yanê bi saziyên fermî midaxele tên kirin hewl tê dayîn ku bê nîşandan ka desthilat kî ye (2014: 123).

Bi xalên sereke tevgerên bedenî ji rabûn û rûniştandin, xwarin û vexwarin, şiklê lixwekirina cil û bergan, silavdayîn, axaftin, hêrsbûn, ken û bişirîn, şahî û hwd pêk tê, jê hinek bi saya perwerdeyê bên hînbûn jî, gelemperî ew hema wisa xwezayî bi çavdayinê di nav ferdên civakê da belav dibin û tên hînbûn. Li ser her yekê gelek tişt dibe bên gotin û mînak bên nîşandan, lê di vê xebatê da ji ber ku me behsa kilamên naveroka wan dîrok, şer, pevçûn, komkujî, sirgûn û serhildanên di bîra civaka Kurdan da cih girtine kir, me xwest em çend tevgerên bedenî yên dikevin nav sînorên vê mijarê derxin pêş. Ji wan kilaman gelek ji ber kuştin, girtin an jî sirgûnkirina şexsan û gelê Kurd hatine gotin û cureya wan jî zêmar e. Ji bo vê me jî hewl da em çend tevgerên sereke yên di van kilaman da derbas bûne bidin nîşandan.

Însan gelek caran dema diqehirin û xemgîn dibin berê xwe didin kesên din, li ser wan da diqîrin, li wan dixin an jî zîrarê didin kesên li hemberî xwe. Carna jî ji bo ku zîrarê nedin kesên din berê xwe didin eşyayekê wê davêjin erdê, dişkînin û dixwazin hêrs û xemgîniya xwe wisa ji dilê xwe bavêjin. Ji bilî van rêyêke din jî heye ku însan rasterast xwe ceza dikan, zîrarê didin xwe ku ev jî hem ji hêla derûniyê va û hem jî ji hêla çandê va tevgerêke bedenî ya taybet e balê dikêşîne. Mînak por tê jêkirin, gulî tên birîn, dest li çokan tê xistin, rû jî her wisa bi neynûkan va tê verûn û tê xwînkirin. Ev tevger gelemperî ji hêla jinan va tên kirin, nîşaneyê xemgînî, hêrs, êş û elema hundir e ku dixwazin van hestên neyînî bavêjin derva û hinekî dilê xwe rehet bikin.

Her çiqas ev tevger carna neyên pejirandin jî di civaka Kurdan da hin caran derdikevin pêşberî me ku me şopên wan di kilaman da jî tesbît kir. Dema kesek qezayeke mezin bike, tişteki nebaş bê serê wî/wê, ew bimire yan jî bê kuştin jinên malbata wî/wê kesî bi destên xwe tepan ser çavên xwe dixin, bi neynûkên xwe va rûyê

xwe vedirûn, digrîn û diqîjin. Heke kesek destê wan negre û rê li ber wan negre ew heta ku xwîn ji rûyê wan biherike vê tevgerê didomînin. Ev perçeyekî çandê ye ku di demên berê da zêdetir berbelav bû, lê hêdî hêdî kêm dibe. Ji ber ku tesîrê li ser civakê kiriye di kilaman da jî em şopên van tevgerên bedenî dibînin. Nîfşên nû jê gelek van tevgerên bedenî di nav malbat û eqrebayên xwe da nebînin jî bi saya kilaman haya wan ji wan çêdibe, ev tevger di bîra civakê da tîn parastin.

Mirin ne tenê ji bo însanan, ji bo hemû candaran e. Piştî mirinê hin hest û tevgerên bedenî tîn nîşandan ku wek însanan heywan jî her wisa ji ber mirinê xemgîn dibin. Dema em berê xwe bidin heywanan, wextê xwediyê wan, çêlikên wan, cotê wan bimirin ew jî wek însanan xemgîn dibin û ji ber vê êşa xwe carna dinalin, carna xwarinê naxwin û carna jî demeke dirêj ji der û dora xwe dûr disekin. Li hemberî mirinê heke heywan jî evqas xwedî hest û xemginiyê bin, de îja însanên xwedî dil û mêjî ne bifikirin ku xemgîniya wan çiqas zêde ye. Dema ji malbat, heval û hogirên mirov kesek bimire ji hêla xembariyê va ew barekî wisa giran hildigirin ku nikarin bi rojan, mehan heta bi salan li ser xwe va bîn, kilamên li ser wan hatine gotin jî nîşaneyê vê ne.

Di gelek civakan da (di navbera wan da cudahî hebe jî) çanda şingirtinê heye û hin caran ji hêla tiştên tîn kirin va dişibin hev. Mînak rondikan dirêjin, xemgîn dibin, dilorînin û gelemperî cil û bergên reş li xwe dikin. Di nav Kurdan da jî ev tiştên tîn kirin dikevin nav sînoren çanda şingirtinê. Ji van hinek berê jî hatibûn behskirin ku bi kurtasî dibe bê gotin jin cil û bergên xwe berevajî li xwe dikin, carna kincên xwe diqelêşin, porê xwe vedirûn, laçika serê xwe davêjin, porê xwe kur dikin, guliyên xwe dibirin, li sing û çokên xwe dixin, dilorînin, zêmaran dibêjin, teniyê li rûyê xwe didin, diqîrin û diqajin.

Di merasimên cinazeyan da ev tevgerên bedenî wek tiştên ji rêzê ne normal tîn qebûlkirin, meriv bi çavên ecêbmayî li wan kesan nanihêrin. Lewra tê zanîn ku êşeke mezin li holê heye û ew kes dixwazin êşa xwe siviktir bikin. Li gor jinan kêmbê jî, mêr jî carna çokên xwe dixin, li ber xwe da dixin axîn û nalîn, bêhneke kûr dikşînin, jê hinek piştî miriyên xwe çend rojan rihê xwe berdidin û demekê kur nakin. Ev hemû jî ji bo ku însan bikaribin li hemberî êşê xwe rabigirin tevgerên bedenê ne ku tîn kirin. Lê di nav demê da ji ber guherîna civakê, hişmendî û nêrînê ji van hinek êdî nayên kirin. Gelemperî di nav jiyana bajêr da terka van tiştan hatiye kirin, lê meriv dikare hin gund û navçeyan hê jî van tevgeran bibîne.

Çawa ku di meha muharemê da şî ji ber kuştina Hezretî Huseyîn şîna Kerbelayê dikin, bi zînciran li sing û pişt xwe dixin ku xwîn biherike, di nav Kurdan da jî jin bi kulman va rû, sing û çokên xwe dixin. Ev xemgîniyeke mezin nîşan dide û di şînan da tevgerêke bedenî ya sereke ye. Gelemperî dê, xwîşk, hezkirî yan jî jina kesê miriye wisa dikin û dilorînin. Ev tevger êşa dil û hinavê tîne ziman û siviktir dike. Kesên wisa dikin zêmaran jî dibêjin ku Propp dema behsa zêmaran dike dibêje her zêmar xwedî motîfekê ye, biyografiyeke wê heye û jina ku zêmarê dibêje xwe berdide nav bîranînên jiyana xwe û wî kesê mirî (1998: 54). Bi rastî jî dema yek dimire û meriv diçe serxweşiyê yan jî merasima defînkirinê tê dîtin ku hin kes, bi taybetî jî jin zêmaran dibêjin, ji bo wan rondikan dibarînin û li ber wî/wê kesê miriye dikevin. Gelek caran dema şîna tê girtin yê bi wan ra jî digirînin êşên xwe û miriyên xwe tînin bîra xwe, dibin şîrîkê vê eş û xembariyê.

#### **4.5.1. Destên xwe li çokên xwexistin**

Însan dema dimirin an jî tîna kuştin li gor çand, bawerî û edetên wê civakê ew tîna binaxkirin an jî tîna şewitandin ku beden li erdê nemîne. Ev li hemberî bedenê rêzgirtinek e. Her çiqas rûh ji bedenê vekişe jî însan qîmetê didin beden û nahêlin ku ew li holê bimîne. Di şer û pevçûnên herî giran da jî kesên dijminatîya hev kirine gelemperî destûrê dane hev ku ew cinazeyên xwe bibin û defîn bikin. Lê mixabin di dîrokê da em hin caran dibînin ku şexs an jî civakên bûne neyarên hev cinazeyan erdê hîştine, nehîştine bîna defînkirin û şîna wan bê girtin. Heta wisa ku hin caran cinazeyên hatine defînkirin jî ji binê erdê derxistine, merzelên wan xirab kirine û peykerên ji bo wan hatine avakirin jî hilweşandine. Sedema vê bêrêziyê û cezabîrîna jî ew e ku nexwestine ew kes di bîra civakê da cih bigirin û bibin kesên navdar. Lê her çiqas ev tevgerên hovane û dûrî mirovahiyê hatibin kirin jî ferdên civakê li beden, merzel û peykerên van kesan xwedî derketine, di salvegera mirina wan da ew bibîr anîne, hewl dane fikr û bawerîya van kesan her tim zindî bimîne. Yanê însan dijî vê guhnedana rê û rêbazên mirovahiyê ya ku şermeke mezin sekinîne û hewl dane rê li ber vê bêrêziyê bigirin.

Kilamên ji bo mijara tevgerên bedenî hatin hilbijartin gelemperî behsa şîngirtinê dikin. Dema em berê xwe didin wan dibînin ku jinên civakê ji ber mirin û kuştina kesekî digirînin, destên xwe li çokên xwe dixin, bi hewar û qîrîna va hewl didin şîna wan bikin. Di gelek civakan da ji bo mêran girî nîşaneyê bêhêzî û qelsiyê ye, li

ser navê mêraniyê ew wek şerm tê qebûlkin. Ji bêr vê nêrîn û hişmendiya civakê mêr wek jinan nikarin bi rehetî bigirîn, dilê xwe rehet bikin, xembariya xwe nîşan bidin. Hin caran ji ber êşa ku davêjin hundirê xwe hin mêr ji hêla derûniyê û bedenê va nexweş dikevin. Lê jin li gor mêran dikarin bi rehetî bigirîn û rondikan bibarînin. Ji hêla xulqiyetê va jî ji ber ku jin zêdetir hestiyar û diltenik in, zûtir digirîn, zêmaran dibêjin û destên xwe li çokên xwe dixin ku êşa xwe ya hundir bavêjin. Ev tevgerên bedenî di nav kilaman da jî xwe nîşan dide ku em dikarin kilama Dengbêj Şakiro ya bi navê “Bavê Beced” bo mînakê şîrove bikin.

“...derbekî bi dest berdane bedena Bavê Beced

**cinyazê Bavê Beced davêne makîna**

**berê wî dane şewitya Hezro**

dema li derê hukumata Hezro datanî

min dî **Dilşa li çogê xwe dixist** digo

lo lo Beced berxê hînga min dizanî bû

ûrt û ocaxê mala bavê Becedê mi qeliya...” (Güneş-Şahin, 2018: 54)

Dengbêj dibêje dema cinazê Bavê Beced davêjin makîneyê û ew digihêje Hezroyê Dilşa digirî, zêmaran dibêje û destên xwe çokên xwe dixê ku ev tevgera Dilşayê tevgereke bedenî ye. Bi çokênxwexistinê va Dilşa êşa xwe sivik dike, bêçaretîya xwe ya li ber mirinê nîşan dide û hewl dide êş û elema dikşîne nîşan bide. Ev tevger li hemberî êşê piçekî be jî ji hêla derûniyê va însanan diparêze, ji nişan derbasî nişên din bûye. Ev jî wek gelek tevgerên din bi rêya perwerdeyê nayê hînkirin, ferdên civakê çav didin hev û ew bi siruştî dibe perçeyek şîngirtinê û bîra civakê da cih digire. Tê dîtî ku Dilşa ji ber kuştina Bavê Beced li ber xwe dikeve, ji ber xemgîniyê dibêje bi mirina wî va urt û ocaxa bavê wê qeliyaye. Îfadeya “urt û ocaxa bavê min qeliya” di gelek kilamên din da jî tê bihîstin, mebesta ew e ku dixwaze bê gotin bi mirina mêr û camêran va dawî bi malbatê hatiye. Di vê îfadeyê da bêçaretî, xemgînî û heyflêanîn hestên hevpar in ku derdikevin pêşberî me. Li gor nêrîna civaka Kurd malbat bi saya mêran li ser piyan dimînin, dema mêr bîn kuştin dawî bi malbatê tê û ew ji holê radibin. Qîmetdayîna mêran û malbat bi van îfadeyan va tîr destnîşankirin.

Gotineke pêşyan a kurdî dibêje “Ga dimire çêrm dimîne, mêr dimire nav dimîne” ku ev gotin balê dikşîne ser kesayetiyeke baş, mêrxasî û egîdiyê û hişyariyê dide însanan ku bila ew karên baş bikin, camêr û mêrxas bin ku dema mirin navê wan li ser rûyê dinyayê tim caran bimîne. Di bin siya vê gotinê da dema em berê xwe didin

kilamên Şakiro em dibînin ku di şer û pevçûnan da mêr mirine an jî hatine kuştin, lê nav û dengê wan ji ber mêrxasî û şervaniya wan li ser rûyê dinyayê maye, di bîra civakê da ew tên bibîranîn. Me di gelek kilaman da mînakên vê nîşan dan û der barê wan şexsiyetan da agahiyên berfireh pêşkêş kir. Ji ser mirina wan ra çiqas sal derbas bibin jî ew di bîra civakê da cih digirin û tên bibîranîn. Gotineke pêşiyar a Misiriyan jî dibêje “Navê mêrekî çiqas bê bibîranîn (gotin) ew kes ewqas dijî” (Assmann 2018: 71). Hema hema di hemû civakan da ritûelên bibîranîna miriyan û merasimên cinazeyan tên kirin û hin tevgerên bedenî di van da derdikevin pêş. Ev bibîranîn di navbera ferdên civakê da têkiliyeke xurt ava dikin, nîşaneyê aîdiyetê ya civakê ye jî. Bi van bibîranînan va bîreke hevpar derdikeve holê û mirina kal û bavên navdar va nasnameyeke hevpar çêdibe. Dema kesek dimire hin caran meriv destên xwe li çokên xwe dixin û dixwazin nîşan bidin ka çiqas ew ji ber vê mirinê li ber xwe dikevin. Di kilama Şakiro ya bi navê “Seîdo” an jî “Seîdo Berxê Min” da ev tevgera bedenî wiha derdikeve pêşberî me:

“...bê agirê kulê bikeve mala bira, pismam û qewmê xayîn

Ca belqitiyê Mistiko, Hesoyê xulam li Kevanê Kêrê

Derbekî dest berdane bedena bavê Ehmedê mi rebenê

Tu sêr bike Hesoyê Îbrahîm neyarê kal û bava ne

Li sûka Diyarbekir di ser cenazê tere tê

**Destê wî li pêşîrê li çokê xwe dixist**

**Dibê sed yazix û sed korayî te axayê**” (Güneş-Şahin, 2018: 500)

Li gor agahiyên Demirer dide (2008: 65-66) Seîd ji hêla birayê xwe Mistefa yê ji dêmariya wî Perîxanê va dema ji Serpirê diçe Şikefta ji paşva bi guleberdanê tê kuştin. Em ji rêzikên kilamê dizanin ku jinek van gotinan bilêv dike, lewra peyva “mi rebenê” hatiye bikaranîn ku di civaka Kurdan da jin vê gotinê ji bo xwe dibêjin, qedera xwe û kesê mirî (hevqederî) dikin yek. Di berdehamiya kilamê da îfadeya dest li pêşîrê û liçokênxwexistin tê pêşberî me ku “destlipêşîrê” nîşaneyê bêçaretîyê ye, li hemberî wê rewşê tiştêk ji dest nayê. “Sed yazix û korayî” jî dîsa gotinên xembariyê ne ku dema meriv ji bo kesekî li ber xwe dikeve û gunehê xwe li kesekî tîne tê îfadekirin. Çav ji ber ku ezayekî însanan a herî girîng e, dinya bi çavan tê dîtîn pir bi qîmet e. Dema yek dimre hezkiriyên wî/wê dibêjin “çavê min kor be”, “korayî”, “çavên min birijin” û gotinên bi vî rengî li dû hev rêz dibin. Kesên van gotinan dibêjin cezayê li xwe dibirin ku wan li hemberî mirinê rê negirtiye û tiştêk ji destê wan nehatiye.

Kilama “Bavê Dilşayê” jî di nav kilamên Şakiro da kilameke navdar e ku li vir jî destên xwe li çokênxwexistin derbas dibe. Heke kilam bê guhdarîkirin dengbêj dibêje Kokê li çokên xwe dixê û ji Cindî ra dibêje korayî yanê çavê wan kor be ku Seîd hatiye kuştin. Kokê xwesiya Seîdê Nado ye ku ji ber kuştina zavayê xwe xemgîn e, şînê digire û Cindiyê apê Seîd ra dibêje gawiran ew şehîd kiriye:

“Axao şerekî li me çêbû li orta Kopê li Dêrikê  
hê wê hê bi qewaxê  
şahde û şûhdê Bavê Dilşayê li dunyayê pir gelek e  
firqekek eskerê kafirê Sarî Moskof  
îro ji êvar da rakiriye ji Kopê hê hê ji toprax e  
mi dî ji gavê din da Kokê ji wê da dihat **li çogê xwe dixist gelo digiriya**  
heywax li mi hê hê wê hê waxewaxê  
digo Cindî korayî di çavê min û te da hato  
derbekî gawir bedena Bavê Dilşayê ketiye  
tu sêr bike cinyazê Bavê Dilşayê  
li ser piştta Gêjo girêdane qisqivrax e  
bê Seîd here hê wê hê ku rêya dîn e  
bi gotinê alim û kitêba dibê herçî kesê gula Êris pêra lêkeve  
hewû gidî gelo xalis şehîd e şik û şubhe ji bonê tunîne” (Güneş-Şahin,

2018: 74)

Ji bo agahiyên berfireh dema em guh didin Ömer Güneş dibêje Seîd ji eşîra Cibiran e, koka wî digihêje malbata Elî Axa ku ew kalikê Seîd e. Yanê Elî Axa bavê Dirbo ye Nado û Cindî jî kurên Dirbo ne, Seîd jî kurê Nado ye ew ap û birazî ne. Dema Şerê Kopê (navçeya Mûşê ye) çêdibe Cindî û Êris dikevin pêşîra hev Seîd ji bo apê xwe xelas bike diçe û li wir tê kuştin (Ömer Güneş, Pêwendiya têlefônî, 16ê Çileyaya Paşîn a 2022yan). Seîdê ku hatiye kuştin di nav kilamê da wek şehîd hatiye binavkirin.

Kurd gelemperî bi navê kurê xwe pesnê xwe didin û wisa tên nasîn, lê li vir xaleke balkêş ew e ku Seîdê Nado bi navê qîza xwe Dilşayê tê nasîn. Her çiqas zarokên wî yên din hebin jî (Zeko û yên din) ew bavê Dilşaya şervan e. Dilşa wek gelek jinên Kurd şengesîwarek e û li gel bavê xwe beşdarî şer û pevçûnan bûye (Gimgimî, 2021). Li vir bi çend hevokan va meriv dikare dîsa destnîşan bike ku wêrekî û jêhatîbûna jinên Kurd her dem bal kişandiye. Wisa ku di dîrokê da gelek mîsyoneran behsa cengawerî û şerkariya jinên Kurd kiriye, yek ji wan jî Konsolosê Erziromê yê Îngiltereyê James Brant e. Brant di gera xwe ya sala 1838an da çavdêriya civaka Kurd kiriye û der barê

jinên kurd da gotiye ew qasî mêran dikarin çekan baş bi kar bînin û gelekî cengawer in (Hozan, 2021: 19). William Heude jî jinên Kurd dişibîne amazonan û dibêje ew li gel mêrên xwe li ser piştê hespan bi awayekî wêrek û jêhatî diçin û tên, James Silk Buckingham jî dibêje jinên Kurd wekî mêrên Kurd eleqeyeke zêde nîşanî çek û sîlehan didin (Tarduş, 2021: 30).

Mînaekeke din ya ji bo destên xwe li çokanxistinê jî di kilama “Kordîna Qerebulaxê” da xwe nîşan dide. Dengbêj dibêje hermetek yanê jineka (bûk e) di destê wê da dergûşeke lawîn heye ji wê aliyê va bigîrî tê û destên xwe li çokên xwe dixê û dibêje “bira ax hê bira” û behsa fermana generalê Tirk Nedayî Beg dike. Li gor rêzikên kilamê em têdigihêjin ku piştî Serhildana Agiriyê wî fermana kuştin û sirgûnkirina Kurdan daye, ji ber vê fermanê birayê wê hatiye kuştin û cinazê wî li hewşa lawê Şewêş Efendî maye. Yê mayîne jî sirgûnî Sînop û Zonguldaxê (ne erdnîgariya Kurdan e) bûne ku rêzikên kilamê wiha ne:

“Hewû rebenê sibe ye dilê mi gulîbira Xwedê  
pira serê donzdeh rêya, heft newala  
ji bextê agîtê mala bavê xwe rebena Xwedê ra  
di ser ra derbas bikim cotek karî karxezala  
ez rûniştim li Kordîna Qerebulaxê li mifreza Taxilkiya  
li serê têt û telgiraf û li nava hogir û hevala  
**mi dî hermetekî bûkîn e di desta da dergûşekî lawîn e**  
**kolosekî spî ye li ser desta bû ji wê da dihat û li çogê xwe dixist**  
**digiriya digo lo bira ê hê bira ax hê bira...**  
lê lê anê rebenê "lo bira lo bira" dikir digiriya  
ber bi taşxana Bazîda şewitî wa direviya  
minê xwe berdabû pêşiyê  
mi go xwenga mi gelo çi bû, çi qewimî, wa çi ciriya  
go bira belkî agirê kulê bikeve mala Nedayî Begê  
saet li şeşê di şevê bû ji ba xwe da derxistî fermana serê di Kurda  
ji taşxana Bazîda şewitî dibijêre agîtan û efrîtan û cindiya...” (Güneş-Şahin,  
2018: 94)

Kilameke balkêş ya ku gelekî pesnê mêrekî dide û ji ber kuştina wî wek zêmar tê gotin jî kilama “Hey Lê Riza” ye. Îfadeyên gelek dewlemend yê wek “gula Mala Emer”, “serdilka Mala Eshed”, “qaçax û firyar û serkêşê dewletê”, “qesasê dînê filan”, “fenanî kulîlka nava gulan û sêva”, “padîşakî mezin”, “eflazê şîrîn”, “dev û lêvê

şekirî”, “simêla sor û narincî”, “xweşmijûl û qisedan” ji bo pesindayîna wî hatiye bikaranîn. Piştî kuştina wî (Perîşan dibêje yeqîn derman danê) yên mayîn şîne digirin, por û guliyên xwe dibirin û destên xwe li çokên xwe dixin. Li vir jî Perîşan êşa di hundirê xwe da bi vê tevgera bedenê va nîşan dide. Ji perçeyek rêzikên kilamê yên bi mijarê ra eleqedar in wiha ye:

“Rizakê ez bi qurban ji bona te çûme Mûşa şewitî  
hey wax li min hey wax gidî  
gidîno ji bona te çûme Mûşa şewitî ez nizanim çi bû çi qewimî  
hey wax li mi lo çi ciriya  
lo lo hey la Riza  
Perîşanê marûmê tu sêr bike  
bi limêja sibê ra sê firçe eskerê qerenîzamê  
li derê dîwana Bavê Koroxlî, nexêr e  
gava berê Bavê Koroxli dane Mûşa şewitî  
**Perîşanê li çogê xwe dixist digo heywax li mi Rizakê, digiriya**  
lo lo hey la Riza (Güneş-Şahin, 2018: 494)

#### **4.5.2. Tunekirina Zayendê (Jinbûnê): Gulîbirîn-Porkurkirin**

Di beşa ewil a vê xebatê da dema behsa tevgerên bedenî hatibû kirin me destnîşan kiribû ku der barê bedenê û biryara li ser bedenê da nîqaş tîn kirin. Yên girîngiyê didin şexsan dibêjin beden şexsî ye û divê şexs bi xwe der barê wê da biryarê bidin, lê kesên serdestiya dîn û dewletê diparêzin jî dibêjin heqê dewletê û dîn li ser bedena şexsan heye û biryar ya wan e. Der barê kurtaj, otenazî (euthanasia), rojiya mirinê, rojiya birçîbûnê, îdam û xwekuştinê da herdu alî li gor xwe fikrên xwe parve dikin. Di bin siya van nêrînan da heke em behsa gulîbirîn û porjêkirinê bikin, dibe bê gotin ku ev biryareke şexsî ye, yanê şexsan eleqedar dike. Lewra jêkirina por li ser bedenê tevgerê ku biryara wê jî şexs bi xwe dide. Li vir mijar jin in ku ew wek tevgerêke bedenî porê xwe bêqîmet dikin, li ser hezkirî, bav, bira, ap, xal û mêrên din yên eşîrê da jê dikin. Dev ji xweşikbûna xwe berdidin, çavê xwe kil nakin, xeml û rewşa bejn û bala xwe yanê bedenê berdidin.

Connerton dibêje di salên dawîn da beden wek hilgirê hin meneyên civakî û siyasî balê dikşîne (2014: 174) ku em jî li ser heman fikrê ne, lewra hin tevgerên bedenê û tevgerên dijî bedenê tîn kirin carna dikarin bibin tevgerên girseyî û ji hêla siyasî û civakî va reng bidin civakê û hin tiştan biguherînin. Di vê xalê da meriv dikare



behsa bûyereke di demek nêzîk da qewimî bike ku wisa xuya dike ewê di bîra civakê da zindî bimîne. Ev bûyer ji bilî mijareke siyasî û neteweyî mijareke çandî ye jî, bi bedenê ra eleqedar e û zayenda civakî di xwe da dihewîne. Ev tevgera li ser bedenê hat kirin di çanda Kurdan da berbelav e û haya gelek civakan ji vê çandê tunebû, lê bi saya vê bûyerê haya wan jê çêbû.

Di Îlona 2022yan da li Îranê (Rojhilat) bûyerek qewimî. Keçeke Kurd ya bi navê Jîna (Mehsa) Emînî ji ber ku laçika (şarpe) serê xwe vekir (an jî laçik bi xwe hinekî vebû) ji hêla hêzên Îranê va hat binçavkirin. Ji ber ku di binçavkirinê da tundî li wê hat kirin (hat îdiakirin ku îşkence dît) ew mir. Hin jinên Kurd yên li wî bajarî dijîn piştî mirina wê ji bo ku bertekê nîşanî qanûna mecburîkirina sergirtinê bidin, hêzên rejimê şermezar bikin û bidin zanîn ku ew ji ber vê qanûnê û mirina Jînayê aciz in porê xwe jê kirin. Piştî tevgera wan ne tenê li Îranê li gelek welatên dinyayê (Tirkiye, Iraq, Amerîka, Kanada, Almanya) jinên ku xwestin piştgiriyê bidin jinên Îranê û şîna Jîna Emîniyê bigirin li meydana û malên xwe porê xwe kur kirin. Jinan dîmenên xwe yên porjêkirinê li ser medyaya civakî parvekirin û tevgerên wan li dinyayê gelekî deng veda. Ji vê mînakê jî em careke din lê mikur tîn ku tevgera bedenî ya ji perçeyek çanda kurdî ye ji bilî şingirtinê dikare bibe tevgera polîtîk, meneyeke siyasî hilbigire û ji bo berteknîşandanê jî bê bikaranîn. Ev tevgera jinan ya şexsî dikare bibe tevgera girseyî û dijî desthilatan wek bertekê bê nîşandan. Li ser vê bûyera qewimî û tevgera bedenî ya ku jinên dinyayê nîşan dan gelek tişt mimkun e bîn gotin, lê bi kurtasî em dikarin bibêjin ku hem bûyer bi xwe û hem jî berteka jinan ya porkurkirinê di bîra civaka Kurdan û bîra gelek civakên din ên dinyayê da cih girt, xuya dike ku piştî salan jî ew ê bê bibîranîn, şopên wê di dahatûyê da dibe ku bîn dîtin.

Ji bo vê mijarê heke em çend mînakên din jî nîşan bidin, di kilama Şakiro ya bi navê “Kordîna Qerebulaxê” ya ku navê xwe ji gundekî li ser navçeya Bazîda Agiriyê girtiye da îfadeya “gulîbir”ê wiha hatiye bikaranîn:

“Ax lilo lilo lo lilo lo...

de lê lê dayê rebenê welatê me Serhed e ne tu war e  
hewû rebenê welatê me Serhed e ne tu war e  
sêr bike ji bextê egîtê mala bavê mi rebena Xwedê ra  
ne payîz e, ne havîn e, ne buhar e  
hela bala xwe bidê vê sibengê qoce zivistan e  
gidîno gelo her çar rojê sar e

hewû rebenê li dû agîtê mala bavê mi rebenê nefiam e  
sêr bike ji bona agîtê mala bavê mi **gulîbira** Xwedê  
ne tu cî ye gidîno gelo vê sibengê ne tu war e, ne star e

**Ez nemînîm nemînîm nemînîm...**

ca li piştî agîtê mala bavê xwe rebena Xwedê  
li dewrana ax dunyalika derewîn

hewû reben im nemînîm ku nemînîm daye...” (Güneş-Şahin, 2018: 94)

Kilam behsa fermana Nedayî Beg (Nedai Çakıroğluyê generalê artêşa Tirkan e) dike ku wî fermana Kurdan derxistiye, Kurd tên kuştin û sirgûnkirin. Jina ji ber vê rewşê li ber xwe dikeve û heyfa xwe tîne ji bo ku xwe qurbana egîdê mala bavê xwe bike û ji bo wî bimire gotina “gulîbir” û “ez nemînîm”ê dibêje. Berê jî me behsa vê yekê kiribû ku ev gotin ji hêla jinan va tên gotin, jin mirina xwe didin pêş û dixwazin nîşan bidin ku kesê bûyer hatiye serî ji bo wan çiqas hêja ye. Li gor rêzikên kilamê heke em mijarê binirxînin li vir jin kêr û meqesê hîlnade rasterast porê xwe kur nake û guliyên xwe nabire. Lê wek sîfat an jî binavkirin ji bo xwe vê îfadeyê bi kar tîne û dixwaze nîşan bide ku egîdê mala bavê wê çiqas bi qîmet e, ew dikare ji bo wî por û guliyên jî bibire û xwe bike qurban jî. Di kilama “Îsmâîlê Axê” da jî ev îfade heye. Di kilamê da navê mala Îsmâîlê Xelîl yê ku Kekê Nafî ye der bas dibe ku em ji kilamê têdigihêjin ew ji Nisêbîna navçeya Mêrdînê ye. Di berdewamiya kilamê da hin hûrgilî tên dayîn û dema behsa birîn û xwînê tê kirin peyvên “reben” û “gulîbir”ê wiha tên bilêvkirin:

“Lo lo Îsmâîlo ez bi qurban sibe bû diçûm Talyata Jêrîn Talyata Jorîn  
mi rebenê bala xwe berdaye vê sibengê gelo îşev şev e vê şeva îne  
gidî sibe bû mi dî qîz û bûkê Mala Keleşdîno  
li devê çemê jêrîn kirasşoka xwe danîne  
tu sêr bike vê sibengê ji xwe ra malxirabo rûniştine  
temam bi hev ra dikin şîne  
ca sibe bû mi dî xort û bendê Mala Keleşdîno  
tevdîr û tivdarekê xwe tamam dîne  
tu dêhna xwe bidê derketime qesr û qonaxê Îsmâîlê Xelîl Kekê Nafî  
mi rebenê bala xwe berdayê  
hewar Xwedê gelo xweş tê dengê vê Quranê  
reben ez im vê sibengê dewra vê Yasîne

gidî minê vê sibengê destê xwe kir nav yataxê nav nivînê  
deste mi ketiye nava xwûnê  
mi **rebenê** bala xwe berdayê destê mi **gulîbirê** ketiye devê hê vê birînê

bê ji xew rabe ji xew rabe ji xew rabe  
ax lo ji xew rabe lo xewgirano.” (Güneş-Şahin, 2018: 459)

Dengbêj Ferzê yê ku wek “Şahê Dengbêja”, “Şairê Rûdinyayê” û “Kewê Gozel” tê nasîn û binavkirin dema di dawetekê da bi şaşîfî ji hêla Zekiyê Mêralî tê kuştin Dengbêj Reso kilamekê li ser vê bûyera li Milazgira Mûşê qewimiye dibêje (Beğik, 2018: 106). Ev kilama Reso ji hêla Şakiro va jî tê gotin ku navê kilamê “Ferzê” ye. Kilam bi bangkirina Gulnaza jina Ferzê dest pê dike ku ew ji Beyaza jinapa Ferzê (jina Mihemedê Elikê) ra dibêje dayê rebenê rabe li gundê Kevir dawetek çêbûye. Gulnaz dibêje Kekê Miheme Salih (Ferzê) yê ku şahê dengbêjan e jî bi kêf û çoş çûye dawetê, lê ew bi destê Zekiyê Mêralî bi guleya manhêrê (cureyek demançe ye) birîndar bûye, paşê çî hatiye kirin jî ew ji mirinê nefilitî ye. Peyvên “gulîbir”, “reben” û “kezîkurkirinê” di nav rêzikên kilamê da wiha derdikevin pêşberî me:

“...lê lê dayê Zekiyê Mêralî xêrê neke wayê qe nebîne  
derbekê bi dest berda bedena kekê mi **gulîbirê**  
birîna wî kûr e pir xedar e, birîna bêxwediya manhêrê  
doxtor û sertebîb û qomîsyonê ejnebî civiyan li şewitiya Anqerê  
agirê kulê bikeve mala qaymeqamê Milazgirê, mudurê di Karê  
têl li ser têl didane şewitiya Anqerê  
geriyan negeriyani ji birîna Kekê Miheme Salih Kewê Gozel ra  
nabînin vê sibengê tu îlê **reben** ez im tu kewê  
ca Gulnazê go lê lê Beyazê

**kurrkirî be keziya serê me herduya bi tevahî**

tu rabe emê fena cara bi bangê bawêşîn kin  
bira Kekê Miheme Salih dîsa ji kêfê ra bikeve xewê birîndaro...” (Güneş-Şahin, 2018: 460)

Bûyereke girîng a behsa kuştina dengbêjekî dike, bi devê dengbêjekî din bi vê kilamê tê vegotin ku ew di bîra civakê da zindî dimîne. Kilam nahêle ev bûyer bê jibîrkirin û peyvên gulîbirîn û kurkirina keziyan di nav kilamê da ji bo şingirtinê, bêçaremayînê û êşkişandinê bi awayekî hostane hatine bikaranîn. Di berdewamiya kilamê da jî bi gotina “feleka malixirab bi me ra pir xayîn bû” va ji bo vê qedera

nebaş felek tê sûcdarkirin. Di kilama “Maopusxana Sîweregê” ya ku cureya wê zêmar e da jî peyva “porkur”ê du caran bi vî awayî hatiye bikaranîn:

“Ezê rabim derûdawê xwe li xwe bialînim  
xwe berdim Diyarbekir jor da werime kaviliya Siwêrekê  
ezê xwe berdim daîra ceza reîsî  
ku go lê lê xwengê tu hatî çî ricayê, çî dîlekê  
ezê bejim ocaxê te kor be  
gur ku hene tebayê di çolê ne  
wele tu cara sê berxa nakujin ji kozekê  
hewar Xwedê te sê tazoxlanê mala bavê mi **porkurê**  
bi derbekî avêtî mapusxana Siwêrekê  
tu yekî bide bo xatirê mi **porkurê**  
duda bavê mapûsxana Siwêrekê  
lo Rebî bi carekî wayê ax hayê...” (Güneş-Şahin, 2018: 546)

Di kilama “Siwaro Ji Xwêytê Hetanî Xwêytê” da dema Helê ji Gulê ra dibêje siwarê mala bavê wê Silê birîndar e, doxtor birînen wî bi kêr û gûzanan diqelişîne ku guleyan ji hêta wî derxe xwe wek “serkur” bi nav dike. Di kilaman da îfadeya serkurê li gor porkur û gulibirê kêmtir tê bilêvkirin, lê em dizanin ku ev form jî wek tevgereke bedenî di nav jinan da berbelav e. Gotinên ji devê Helê derdikevin wiha ne;

“Siwar heyran sibe ye ji Xwêytê hetanî wê ca ji Xwêytê  
de Helê rebenê Gulê gorînê  
sibe ye birek siwarê mala bavê mi **serkurê** siwar bûne  
ji Îranê ji Tûranê ji cerdê ji cûrdê  
ji xwe ra dajo li terqa rê tê  
siwarekî li kumêtî kapreşî siwar e  
qapûtekî reşî li milan e  
tu bala xwe bidê bi tenê dajo li pêşiyê tê  
de siwaro de siwaro de siwaro  
agirê kulê bikeve mala vî hekîmî vî doxtorî sertebîbî  
de çawa siwarê mala bavê mi **serkurê**  
li hêşiya konê erebî ji kêfê ra avêtiye di erdê  
ketiye birînen vî xweşmêrî bi kêra bi gûzana diqelêşe  
tek bi tek gula derdixe ji nermê hêtê (Güneş-Şahin, 2018: 511)

Di kilama “Bavê Tesîmê” da jî dema Têlo ji Dîdo ra dibêje birek (gelek) siwarê mala bavê wê siwarbûne xwe wek serkur bi nav dike. Dibêje ew bûka pişt perdêyê ye

û rûyê wê nagire (şerm dike) pirs bike, lê bila ew here pêşiya Bavê Îpegê û bibêje ka kekê wê çima nehatiye. Peyva serkurê di nav rêzikên kilamê da wiha hatiye gotin:

“Le hey la le Têlo digo le Dîdo da dayê  
birek siwarê mala bavê mi **serkurê** siwarbûne Londerê wa ji Xetê  
ezê bûk im bûka pişt perdê  
le rûyê mi nagire tuyê xwe berde pêşiya Bavê Îpegê  
le destê xwe bide desta, devê xwe bike rikêfa di zengûyê  
bêje apo tu xêr û silametî hatî kekê mi kanê  
le dema ku vê sibengê xwe berdabû pêşiyê  
destê xwe dabû desta devê xwe kiribû rikêfa di zengûyê  
digo apo tu bi xêr û silametî hatî kekê mi kanê (Güneş-Şahin, 2018: 90)

#### 4.5.3. Destkelemçekirin/Lingqeydkirin

Di mijara tevgerên bedenî û rola wê ya bîra civakî da kelemçekirina destan û qeydkirina lingan tevgerên balkêş in ku di gelek kilaman da tînan bikaranîn. Forma herî zêde em dibihîzin “destê wî kelemçekirin berê wî dane...” ye. Berê jî me destnîşan kiribû ku yê hêz di destên wan da ne yê serdest in (kes, eşîr, civak, dewlet) dema bixwazin fikr û tevgerê bidin qebûlkirin gelek rêyan bi kar tînin û hewl didin yê kêmhêz serî li ber wan bitewînin. Serîtewandin hem ji aliyê fizîkî û hem jî ji aliyê meneyê va nîşaneyê qebûlkirina hêzê û têkçûyîne ye. Ji ber wê ye ku heke serî neyê tewandin tê jêkirin (beden bi vî awayî tê cezakirin) ku bê nîşandan ew têk çûye. Ji bo nîşaneyê hêzê û serîtewandinê li ser bedenê hin tiştên din jî tînan kirin ku ew destkelemçekirin û lingqeydkirin e. Dema dest tînan kelemçekirin û ling tînan qeydkirin (hemû laş û beden dîl tê girtin) ew kes êdî nikare bi rehetî tevbigere, heqê xwe xwedî derkeve û rizgar bibe. Ev dîlgirtin bi kelemçekirina destan va dest pê dike, bi hepiskirina bedenê va dewam dike. Hin caran jî bi sirgûnkirina şexsî û malbatî va hemû beden (ji hêla derûnê û fizîkî va) di bin hêza otorîteyê da dîl tê girtin û jiyana wî kesî (wan kesan) serobino dibe.

Kesê destan kelemçe dike yê serdest e (hêz di destan da ye), dikare rê û rêbazan dayne û yê bîndest mecbur bihêle ku ew guh bidin van qanûnan. Kilama “Mahtuxana Sîweregê” jî bo vê mijarê mîna keke balkêş e, em dikarin têkçûyîna şexsan di vê kilamê da bi eşkere bibînin. Dema pesnê mîrên malbatê tê dayîn ji bilî çav, natik, gerden û stûyên wan ên cindî (her yek perçeyek bedenê ne) behsa

kelemçekirina destên wan, qeydên lingên wan û hepiskirina bedena wan tê kirin.  
Dengbêj van rêzikên kilamê wiha dibêje;

“Ezê rabim derdavê xwe li xwe bialînim  
xwe berdim Diyarbekir  
bêjim teyro ezê bi te kim lo lo gidiyo tuyê bi Xwedê kî  
tu hêlîna xwe li Siwêreka şewitî, Qeregêçî Mehlesiyê  
li ser Ûlû Camiyê li minara tewra jorîn çêkî  
wele çavê mi nabîne  
xortê mala bavê mi serkolosê xortê pir cindî ne  
bi tûncik û temelî ne  
natikê wan e fire ne çar tilî ne  
gerdenê wan e zirav e êlî ne  
**destê wan e kelepçelî ne**  
**lingê wan e qeydî ne**  
stûyê wan e lelekirî ne  
Feyzullah Paşa lêxistîne **li pêşiya cotê cendurmê singûlî ne**  
sibê ji mapûsxana Siwêreka şewitî dertîne  
destê wan da gimgim e, misîn e  
hetanî ser kaniya pêşiya Camiya Hesên Paşa tîne  
çavê mi rebenê qet nabîne  
tuyê qasekî pêş min va gidiano selamekî lêkî yabo...” (Güneş-Şahin,

2018: 545)

Serhildana Şêx Seîd qasî dîroka Kurdan di dîroka Tirkan da jî bûyereke gelek girîng e ku tesîra wê bi salan dewam kiriye. Piştî serhildanê herdu civakan li gor hest û nêrînên xwe li ser vê bûyera dîrokî gelek tişt gotine. Li gor dîroka fermî ew her çiqas wek eşqiya, paşverû û serhildêr bê binavkirin jî li gor civaka Kurd ew pêşengekî birûmet û lehengekî navdar e. Di kilama Şakiro ya bi nave “Kekê Xiyasedîn” da dema serhildan têk diçe û Şêx Seîd tê girtin wiha behsa destkelemçekirina wî tê kirin:

“bi destê Kekê Xiyasedîn digirtin kelemçe dikirin  
dane pêşiya cotê cendurmê sungûliya lo lo  
berê wî dane Enqerê Horgofê nava hezar û pênsed mêrê di girtiya  
lema keleka dîne Îslamê ji xwe ra welgeriya lo hoy oy...” (Güneş-Şahin,

2018: 57)

Destkelemçekirin wek ku tê dîtin li ser bedenê zexteke mezin e, hem ji hêla fizîkî û hem jî ji hêla derûniyê va dixwaze kesê hatiye girtin biçûk bixe û çavên kesên din jî

bitirsîne. Gotinên kilamê yên behsa destkelemçekirinê û cotek cendirmeyên xwedî singûyan yên li rex wî dimeşin dike me dide zanîn ku Serhildana Şêx Seîd têk çûye, bedena wî dîl hatiye girtin. Tevgerêke polîtîk û civakî li holê heye ku der bare wê da me berê jî (şîrovekirina kilama Kekê Xiyasedîn da) agahiyên berfireh dabûn.

Kilama “Bavê Şemsedîn” jî ji hêla bîrê û tevgerên bedenî va kilameke balkêş e ku peyva bîrê rasterast tê da tê bilêvkin. Tê gotin “tê bîra te” û hewl tê dayîn ku ew tiştê berê qewimiye bê bibîranîn. Dîsa tê gotin “tu nizanî hukumata niha tiştê ji bîra nake” û tê xwestin rastiyeke divê bê zanîn ku komara nû ava bûye tiştan wisa bi hêsanî ji bîra nake, wextê derfet dikeve destên wê heyfa xwe hildide, şexsan ceza dike û îdam dike. Girtina Bavê Şemsedîn û cezakirina bedena wî jî wiha tê vegotin:

“Axao axao

Hey lo maqûlo sibe ye li dîharê şehîrê Diyarbekira şewitî diketim

mi dî cotek qumandanê dewletê li derê îskanê mişêwre dikirin

bi destê Bavê Şemsedîn girtin ji qawûşa cendurma derkirin

fermana wî nivîsî avêtin stûya go Xalito

tu nizanî hukumata niha tiştê ji bîra nake

tê bîra te da cotek topê şerepnarê biniyê kona da çar kirin

avêtin teyarê teyara anîne xwarê, alet û hacetê teyarê belav kirin

tu nizane va heyfa cotê teyara ne ji te derkirin...” (Güneş-Şahin, 2018: 67)

Di kilama “Bavê Baran Begê” da jî bi tenê dest nayê kelemçekirin, di heman demê da berê wî didin duwalên ejnebiyan (yên ne misilman) ku ew berdêleke mezin bide. Cezakirina bedenê hem aliyê fizîkî û hem jî aliyê derûniyê va tê kirin ku ne ew û ne jî yên mayî dîsa bikaribin dijî dewletê tevbigerin. Ka em berê xwe bidin kilamê ev çawa hatiye gotin:

“keskî tune cuwabekî bide Cemîlê Axê mîrê Xerza ra bigihîne

bêje mala te xira be vê sibengê

bi destê Bavê Baran Begê Mîrê Hezroyê girtin

berê wî dane duwalê ejnebîne

îro vê sibengê malxirabo şûşa bilûrê ser eniya Bavê Baran Begê danîne

goşt û movika tevî hestiya dişewtîne...” (Güneş-Şahin, 2018: 72)

Ji bo destkelemçekirinê kilama “Bavê Mîr Begê Min” ya ji bo Nuh Begê kurê Mîrza Beg (Serokê eşîra Xweytî) hatiye gotin jî kilameke balkêş e. Bi gotina “Berê Mîr Begê Min dane Stenbola şewitî îstîndaqa nav duala” va behsa birina wî ya Stenbolê tê kirin. Dengbêj ji bo destkelemçekirina wî gelekî li ber xwe dikeve û gotinên xwe wiha tîne ziman;

“...sibe ye Bavê Mîr Beg ji malê siwar bû li kêlekê tê norîna Delû Qaso  
ye  
xwezil navê mirina Bavê Mîr Beg bihata nava eşîra Xwêytî ye  
destê bavê Mîr Begê mi kelemçe nekirana  
nava qîz û bûkê eşîra Xwêytî ra derbas nekirina bi navê ro ye...” (Güneş-  
Şahin, 2018: 85)

Ji gotinên kilamê em fêhm dikin ku destkelemçekirina Nuh Beg gelekî zora kesê ku vê kilamê çêkiriye diçe û wî diêşîne. Ji ber vê gotiye xwezî xebera mirina Beg bihata, lê ew wiha bi destkelemçekirî ji nav qîz û bûkên eşîrê ra nehata derbaskirin, begtî û axatiya wî evqas nehata binpêkirin. Dema ew destkelemçekirî li kêleka fermandarê Osmaniyan Delû Qaso diçe, têkçûna wî tê îlankirin û ev endamên eşîrê diêşîne. Dengbêj li ber xwe dikeve, xemgîn dibe, şerma Mîr Beg û xembariya wî ya ku dema ji nav eşîrê bi destkelemçekirî derbas dibe tîne ziman.

Mekan, ziman, dîrok, nasname û tevgerên bedenî wek pênc sitûnên sereke yên bîra civakî ava dikin di beşa ewil da bûn mijara xebata me. Di vê beşê da der barê wan da mînak hatin nîşandan û hat dîtin ku şopên her yekî di kilaman da gelekî hene. Kilamên şopa mekanê tê da hene ji ber ku navê gund, bajar, navçe, deşt, zozan, gol, kanî, çiya û newalên Kurdan di xwe da di hewînî û navê wan ên resen tîne gotin kilamên balkêş in. Kilam bi kurmancî hatine gotin, hunerên edebî di xwe da di hewînî, tesîrê li ser dil û guhê guhdaran dikin ku ji hêla ziman va jî hatin nirxandin û hat dîtin ku ziman çavkaniyeke çawa girîng e.

Wek mijareke din dîrok jî girîng e ku me şopên dîrokê di van kilaman da bi zelalî dîtin. Hem ji hêla dîroka devkî û hem jî ji hêla dîrokeke alternatîf va kilam balê dikşînin, me ev yek derxist holê. Nasname jixwe tena serê xwe mijareke berfireh e û dikeve qada zanistên din jî, me behsa şopên nasnameyê kir û hat dîtin ku gelek peyv, hevok û rêzikên kilamên Dengbêj Şakiro nasnameyê diparêzin. Tevgerên bedenî mijara dawîn a vê xebatê bû ku me bi nirxandina kilaman nîşan da ku di civaka Kurd da girîngiya wan heye û tesîrê li ser bîrê dikin.



## ENCAM

Li ser rûyê erdê însanan beriya nivîsê bi saya ziman û deng di nav xwe da têkilî danîne, hest û fikrên xwe gihandine hev û jiyanê li ser çanda devkî meşandine. Paşê bi dîtina nivîsê tesîra çanda nivîskî li ser vê jiyana devkî çêbûye û nivîs jî bûye perçeyekî jiyane. Lê ji ber sedemên cuda hemû civak di heman demê da negihîştine çanda nivîskî, ji ber vê demeke dirêj dîsa li ser çanda xwe ya devkî mane. Civakên çanda wan ya nivîskî zêde pêşva neçûne wek berê giranî dane ser deng û gotinê, çanda wan a devkî bi awayekî dewlemend herikiye. Civaka Kurdan jî yek ji wan civakan e ku çand û dîroka devkî li gor nivîsê zêde pêşva çûye. Di vê civakê da helbest, çîrok, stran, kilam, destan, mamik, biwêj, gotinên pêşyan, zûgotinok û hwd her tim hatine gotin û bûne malê gel ên hevpar. Di nav van berheman da kilam cureyeke girîng e ku xebata me li ser qismekî kilaman yên der barê bîra civakî da ne hat kirin. Vê xebatê destnîşan kir ku di avakirin û gotina kilaman da hin kesên jê ra dibêjin dengbêj derdikevin pêş me û ji wan yek jî Dengbêj Şakiro ye. Dengbêj xwedî hin taybetmendiyên in ku di avakirina çand, dîrok û bîra civakî da bibê nebê barekî girîng hildane ser milê xwe. Me bi vê xebatê va nîşan da ku Dengbêj Şakiro jî wek dengbêjekî ji herêma Serhedê di nav Kurdên Kurmancîaxêv da navdar bûye, zêde hatiye guhdarîkirin û tesîra wî gihîştîye bîra civakî.

Der barê Dengbêj Şakiro da beriya vê xebatê hin pirtûk, maqale, tez hatine nivîsîn û lêkolînên akademîk hatine kirin, lê ya ku vê xebatê ji yên din cuda dike ew e ku cara ewil kilamên wî ji hêla bîra civakî va berfirehî hatin vekolîn û li ser wan şîrove û analîz hatin kirin. Bi saya vê xebatê me derxist holê ku gelek kilamên wî rasterast bi bîra civakî ya Kurdan ra eleqedar in. Bûyerên girîng ên mohra xwe li ser dîroka Kurdan xistine bi rêya kilamên wî hatine bibîranîn û rê li ber hatiye girtin ku ev bûyer neyên jibîrkin. Ji ber ku mijara vê xebatê bîra civakî bû ji vê hêlê va ev xebat pêkan e wek xebateke girîng bê hesibandin û ji bo xebatên din ên der barê bîra civakî da bibe alîkar. Em gihîştin wê encamê ku dengbêjî ji bo ziman, çand, bîr û dîroka devkî ya kurdî çandeke qedîm û taybet e, Dengbêj Şakiro jî wek perçeyek vê çandê, dîroka kurdî ya devkî û bîra civakê bi sewt û awaza xwe parastîye û gihandîye nîfşên nû.

Bi saya vê xebatê me dît ku kilamên Dengbêj Şakiro ji hêla mijarê va curbicur in, wî li ser eşq, evîn, siruşt, mîrxasî, şer, pevçûn, serhildan û gelek mijarên din kilam gotine. Lê jê ji wan hinek rasterast dikevin nav sînorê bîra civakî û tesîrê li ser civakê dikin. Em gihîştin wê encamê ku di navbera çanda devkî û bîra civakî da têkiliyeke

xurt heye, dengbêj dikare bi kilamên xwe va bîra civakê ava bike, biparêze û rê li ber bişaftinê bigire. Dengbêj Şakiro jî di vê mijarê da bûye kesekî girîng e û hem di avakirin û hem jî parastina bîra civakî da tesîreke wî ya xurt çêbûye. Bi saya kilamên wî gelek bûyerên dîrokî û şexsên demên berê navdar in hatine behskirin, hem di bîra civakê û hem jî di dîroka Kurdan ya devkî da cihê xwe parastine.

Di hemû qadên jiyanê da jin xwedî kedeke mezin in, bibê nebê tesîrê li ser malbat, civak û jiyanê dikin. Di civaka Kurdan ya ku serdestiya mêran zêde ye da jî her çiqas gelek caran rasterast pêş çavan xuya neke jî tesîra jinan her tim hebûye û di roja me da ev tesîr her ku diçe zêdetir derdikeve pêş. Dema kilamên vê xebatê hatin nirxandin hat dît ku di kilamên Dengbêj Şakiro da mohra jinan gelekî zêde ye. Her çiqas kilam bi devê mêran hatibin gotin -Dengbêj Şakiro jî ji wan yek e-, pesnê mêran hatibe dayîn, şerkarî û wêrekiya wan derketibe pêş û piştî mirina wan şîna mêran hatibe kirin jî di pişt perdêyê da yên ku pesnê wan dane, behsa mêrxasiya wan kirine û şîna girtine jin in. Di vê xebatê da me dît ku jinên derfeta wan çênebûye dengbêjiyê bikin, hestên xwe gelekî baş anîne ziman û dengbêjan jî van hest û ramanên wan wek kilam gihandine roja me. Ji ber vê, di kilamên Dengbêj Şakiro da tê dît ku jinan gelek caran pesnê mêrên malbat û civaka xwe dane û ji bo vê jî îfadeyên wek egîdê mala bavê min, bexê mala bavê min, mêrê mêran û hwd gotine. Dema mêrên malbatê di şer û pevçûnan da ketine tengasiyê jinan kiriye hewar û gazî ku bila mêrên civakê herin pişt wan bikin ku ew bê piştîmêr nemînin, ji wê tengasiyê xelas bibin. Piştî mirina mêrên malbatê jinan ji bo kesên ku wan kuştine nifirên mezin kirine û şîna girtine, ji bo vê jî giriyane, porê xwe jêkirine, destên xwe li çokên xwe xistine û xwestine şîna mêrên malbatê ew bi xwe bimirin. Gelek caran jî felek sûcdar kirine û neheqiya felekê qebûl nekirine.

Li gor teoriya Halbwachs, Assmann û Connerton yên ku me di vê xebatê da ji xwe ra kirin palgeh em gihîştin wê encamê ku bîr tenê ne mijara derûnnasî û norolojiyê ye, ew dikeve qadên civaknasî, dîrok, felsefe, muzîk, çand û hwd, ji ber vê jî navberdisiplinî ye û mijara xebata me ra jî eleqedar e. Dîsa li gor vê teoriyê, me destnîşan kir ku çawa bîra şexsan heye, her wisa bîra civakan jî heye û çavkaniyên bîra civakî ji nasname, ziman, dîrok, mekan û tevgerên bedenî pêk tê. Lêkolîna me ya li ser kilamên Dengbêj Şakiro nîşan da ku şopên van çavkaniyan di gelek kilaman da, bi taybetî jî di yên dîrokî da hene û ew bûne sedem ku di civakê da bîreke hevpar ava bibe. Li gel vê, em gihîştin wê encamê ku bîra civakî ji hêla her yek şexsekî civakê va

tê avakirin, malbat, kesên girîng û navdar (şair, helbestvan, hozan, dengbêj û hwd), berhemên nivîskî û devkî, dibistan, mehkeme, mekanên dînî, peyker, muze û saziyên fermî hemû di avakirina bîrê da rolekê hildigirin ser xwe û bîr bi destên wan tê parastin.

Her çiqas kilamên Dengbêj Şakiro yên li ser eşq, evîn, raman û xwezayê hebin jî, di vê xebatê da em li ser yên şer, pevçûn, lehengî û serhildananan rawestiyên û em gihîştin wê encamê ku ev kilam bi taybetî li ser bûyerên di sedsala 20emîn da qewimîne hatine gotin. Bi saya van kilaman me dît ku gelek bûyerên girîng yên wek şer û pevçûnên di navbera eşîrên Kurdan da, şerên dijî dewletan (Tirkiye, Îran), serhildanên dijî dewletê (Serhildana Şêx Seîd û Serhildana Agiriyê), komkujî (Komkujîya Geliyê Zîlan), Şerê Dinyayê yê Yekemîn, Şerê Balkanan, şerên dijî welat û nijadên din (Şerê Selanikê, Şerê Osmaniyan û Êrisan), avakirina Komara Tirkiyeyê û tesîrên wê yên li ser civakê di bîra civaka kurdî da cih girtine û bi awayekî dijî dîroka fermî tînin bibîranîn. Bi rêya çavkaniyên teoriyê û kilamên Şakiro me derxist holê ku bîra civakî heye, ev bîr li gor bîra fermî bîreke alternatîf e. Me bi vê xebatê va piştrast kir ku wek gelek tiştên din bîra civakî ya Kurdan jî bi saya çand û dîroka devkî hatiye parastin û gihîştîye roja me.

Di netewebûnê da çawa ku ziman, dîrok, nasname û çand girîng in, êş û janên hevpar jî her wisa gelekî girîng in. Hewce nake her yek ferdê civakê rasterast wê êş û janê bikişîne û bibe şahidê wê bûyerê, piştî sal û sedsalan jî ew êş mimkun e bi komî bînin bibîranîn. Wek gotina Gellner netewe bi trajediyên hevpar ava dibin, di dîroka Kurdan da jî gelek êşên hevpar hene ku gel tîne bal hev û di nav wan da nêzîkatiyekê ava dike. Di kilamên xebat li ser hatin kirin da me dît ku di şer, pevçûn, komkujî û serhildanan da gelek êş û azar hatine kişandin, travmayên mezin yên bi dehan salan dewam bikin çêbûne. Wek encam me nîşan da ku Dengbêj Şakiro bi deng û sewta xwe van bûyerên dîrokî, lehengên wê demê û travmayên mezin ên ku tesir li ser civakê kirine gihandine nîfşên nû. Ev bûyerên dîrokî û lehengên wê demê bi saya kilamên Şakiro û dengbêjên din nehatine jibîrkirin, di bîra civakî ya Kurdan da heta roja îroyîn zindî mane û wê bimînin jî.

Meriv di civaka ku lê hatiye dinyayê da xwebawer û rehet e, xwe wek perçeyeke wê civakê dihesibîne û ji ber vê aîdiyetê di ewlehiyê da ye. Lê wextê ji ber sedemekê derûnî, aborî an jî siyasî mecbur dimîne yan jî tê mecburkirin ku ji civaka xwe derkeve yan jî bi rêya sirgûnê bê qewirandin dibe xwedî nexweşiyên fizikî û derûnî, travma û êşên mezin di rûhê wî/wê da çêdibin. Lewra ew terka însanên nas û

dost dike, ji wê hawirê ku lê jiyaye vediqete û diçe cih û warên xerîb. Ev civaka nenas û merivên ne ji nijad û civaka wî jî tesîrên nebaş li ser rûh û derûniyê dike û ew êdî nikare wek berê bijî. Di vê xebatê da bi rêya kilaman me derxist holê ku di civaka Kurdan da gelek caran sirgûnên şexsî yan jî komî çêbûne, kesên hatine sirgûnkirin di tengasiyê da mane û şopên wê her tim li ser wan çêbûye. Bi kurtasî sirgûn bûye perçeyek jiyana Kurdan û Dengbêj Şakiro jî di kilamên xwe da gelek caran behsa vê mijarê kiriye.

Gund, bajar, welat, çiya, deşt, newal, gol û cihên din her tim bûne jîngeha însanan û wan ev der bi zimanê xwe bi nav kirine, bi van mekanan ra têkiliyeke xurt ava kirine. Navdayîna wan a bi zimanê zikmakî ji bo wê civakê bûye tevgerê neteweyî ya girîng. Ji bo Kurdan jî her tim wisa bûye, wan bi zimanê kurdî nav dane mekanên xwe û dema behsa bajar, çiya yan jî golekê hatibe kirin hemû Kurdan kêma zêde fêma kiriye ku ew der li ku ye, nexşerêyeke hişî di hişê wan da çêbûye. Lê di nav demê da navên kurdî yên ku ji Kurdan ra bûne wek nasnameya neteweyî ji ber sedemên polîtîk hatine guhertin û ev der bi zimanên din (tirkî, erebî, farisî) hatine binavkirin. Di vê xebatê da me bi rêya kilamên Dengbêj Şakiro behsa navê gelek gund, navçe, bajar, welat, mêrg, deşt, çiya, zozan, kanî, newal, gelî, ziyaret, çem û golan kir û me destnîşan kir ku ew der di bîra civakî ya Kurdan da bi navên xwe yên kurdî tên zanîn, gelek mene û qîmet li wan hatine barkirin. Dema em li ser wan hûr bûn me dît ku navê hinek cih û waran her çiqas di nav demê da bi zimanên din hatibin guhertin jî çanda dengbêjiyê nehîştîye ku ew der navên xwe yên resen winda bikin. Her wiha, me bi saya vê xebatê nîşan da ku di navbera mekan û bîra civakî da têkiliyeke xurt heye û Dengbêj Şakiro bi kilamên xwe gelekî bi hûrgilî behsa navê cih û warên Kurdan, bi taybetî jî yên li herêma Serhedê kiriye û kilamên wî rê li ber bişaftina navan girtiye.

Wek encam xaleke din ya girîng jî ew e ku gelek gotin, metafor, sembol û kodên çanda kurdî di kilamên Şakiro da hatine bikaranîn û bi saya wan em der barê van da agahiyên bi hûrgilî hîn dibin. Her çiqas kilamên wî behsa şer, pevçûn, komkujî û serhildanan bikin jî, bi saya van kilaman em hin agahiyên behsa wê demê dikin jî bi dest dixin. Di encama vekolîna kilamên Dengbêj Şakiro da me dît ku navê gelek êl, eşîr, malbat, nijad û mezheban hatine bilêvkirin. Dema pevçûnên di navbera malbat û eşîran da hatiye behskirin navê serok û giregirên eşîr û malbatan, axa, beg, xulam, mêrxas, leheng, qîz, bûk û jinên wan di kilaman da derbas dibin. Jê hinek wek xayîn, nebaş, bêmerhemet û hwd bi sîfatên neyînî tên behskirin, hinek jî wek egîd, mêrxas,

cengawer, mêrê meran, qehreman û leheng bi îfadeyên erênî tên bibîranîn. Ne tenê behsa şexs û însanan, her wisa behsa hespên wan jî tê kirin ku me di xebatê da gelekî berfireh behsa metafora hespê kir û nîşan da ku wê demê hesp heywanên çiqas girîng in, têkiliya wan a xurt bi siwarên wan ra heye û civakê gelek meneyên biqîmet bi wan bar kiriye. Her wisa Dengbêj Şakiro behsa çek û alavên van malbat, eşîr, nijad û komên din jî kiriye ku em der barê teknolojiya wê demê, cureyên şer, curbicurbûna çek û sîlehan da jî dibin xwedî agahî.

Bi saya vê xebatê me dît ku di çanda dengbêjiyê da gelek şopên nasnameyê hene û ew bi bîra civakî ra eleqedar in. Dengbêj Şakiro di kilamên xwe da nasnameya kurdûnê derxistiye pêş, hin caran rastreast gotiye Kurd, Kurmanc, welatê Serhedê, eşîr, malbat û hwd, hin caran jî behsa nasnameya dînî ya Kurdan kiriye û gotiye misilman an jî busulman. Dijî vê nasnameya neteweyî û dînî behsa nijadên din jî kiriye û wan jî wek gawir, ecnebî, beşîncî mezheb, Êris, Ecem, marûs û hwd bi nav kiriye. Me şopa gelek dîn, nijad, netewe û mezhebên cuda yên wek Ermenî, Ecem, Êris, Alman, Bulxar, xaçparêz, kafir û hwd dît. Ji bilî nasnameyê, ziman jî wek perçeyek bîra civakî di kilaman da gelekî baş hatiye bikaranîn, biwêj, gotinên baş, şibandin, nifir, dia û hwd gotin xemilandine û bi dubarekirinê va nehatine jibîrkirin.

Vê xebatê nîşan da ku beden û tevgerên bedenî ne bi tenê şexsî ne, aliyekî wan ê civakî jî heye. Di gelek civakan da her çiqas tevgerên bedenî yên dişibin hev hebin jî, her wisa yên ji hev cuda jî hene. Me nîşan da ku hin tevgerên bedenî yên kilaman behsa wan kirine di nav Kurdan da li gor civakên din zêde ne. Dengbêj Şakiro di kilamên xwe da behsa hinekan kiriye ku ew bi taybetî ji hêla jinan va tên nîşandan. Me wek encam ev agahî bi dest xist ku jinên Kurd bedena xwe piştî hin rewşên travmatîk yên wek mirina bav, bira, mêr, ap, xal û pismam dixwazin bikin qurban, şuna wan ew bi xwe bimirin. Ji ber êş û jana mirina wan jî xwe tune dihesibînin, porê xwe jê dikin, vedirûn, keziyên xwe kur dikin, destên xwe li çokên xwe dixin, dikin hawar û gazî, digirîn û şîngirtinê bi van tevgerên bedenî va nîşan didin.

Encameke girîng jî bi saya vê xebatê me tesbît kir ku dîrok du alî tê gotin û nivîsîn; yek ya fermî ye bi destê dewlet û desthilatdaran û ya din jî bi destê komên bindest tê nivîsîn û gotin. Li gor çavkaniyan û naveroka kilaman me dît ku dîroka fermî şer û pevçûnan wek eşqiya û talankerî, yên beşdarî van bûyeran bûne jî wek eşqiya, talanker, paşverû û sîfatên neyînî bi nav dike û hewl dide wan reş bike. Lê berevajî vê, di bîra civakî ya Kurdan da jî serhildan û şerên çêbûne wek şerê azadî û serxwebûnê

hatine binavkirin, kesên beşdarî van bûyeran bûne û di van serhildanan da derketine pêş jî wek pêşeng, qehreman, egîd, mêr, şêr, çargurcîk, dilpola, beg, axa û hwd hatine binavkirin. Ev kes li gor bîra civakî ya Kurdan di şer û pevçûnan da ji ber mêranî, cengawerî, wêrekî, başbikaranîna çek û sîlehan, jîrbûn û jêhatîbûna xwe bi ser ketine û kesên li hemberî xwe têk birine. Lê hin caran jî ewên ewqas pesnê wan hatine dayîn bi ser neketine, di şer û pevçûnan da birîndar bûne û hatine kuştin ku kilam gelek caran ji bo şîngirtina wan hatine gotin.

Xaleke din ya ku divê wek encam bê destnîşankirin jî ew e ku di kilamên Dengbêj Şakiro da gelek caran pesnê hin eşîr û malbatan tên dayîn, lê hin caran jî çend malbat û eşîr wek nebaş û xayîn tên pênasekirin. Ev jî wek perçeyek dîroka devkî û bîra civakî derdikeve pêş me û tê dîtin ku du bîrên dijî hev yên ji bo malbat eşîran hatine avakirin. Yanê li gor vê, der barê bûyereke û pevçûneke di navbera wan da herdu malbat û eşîr xwedî bîrên cuda ne. Bi saya van kilaman em dibînin ku bîreke dij (alternatîve) ne tenê ji bo desthilardar û dîroka fermî, her wisa di nav civaka Kurd bi xwe da jî heye. Aliyek pesnê endamên malbata xwe dide, aliyek jî yên li hemberî xwe biçûk û nebaş dihesibîne.

Herî dawîn xebata me derxist holê ku kilamên Dengbêj Şakiro ji bo nasnameya kurdî, bîra civakî, ziman, dîrok, erdnîgarî û çanda kurdî çavkaniyên dewlemend in, ji her yek kilamê çend mijarên lêkolînê derdikevin û ew hêjayî lêkolînê ne. Em hêvî dikin bi saya vê xebatê kilamên Dengbêj Şakiro yên me li ser lêkolîn kirin ji bo lêkolîner û dildarên kurdî bibin çavkanî û nexşerê ku li ser wan xebatên zêdetir bên kirin û ev xebat jî di bîra civakê da bê parastin.

## ÇAVKANÎ

### PIRTÛK

- Alakom, R. (2011). *Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Alakom, R. (2011). *Bir Türk Subayının Ağrı İsyanı Anıları*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Alan, R. (2013). *Bendname Li Ser Ruhê Edebiyatekê*. Stenbol: Peywend.
- Allison. C.- Kreyenbroek. P. (2008). “*Kürt Kimliği ve Kültürü*”. (Çev. Ümit Aydoğmuş). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Alpaslan, G. G. (2002). *XIX. Yüzyıl Yazılı Anlatılarında Sözlü Kültür Etkileri*. Ankara: Kültür Bakanlığı Yayınları.
- Anderson, B. (1995). *Hayali Cemaatler Milliyetçiliğin Kökenleri Ve Yayılması*. İstanbul: Metis Yayınları.
- Antolojiya Dengbêjan 1*. (2011). Diyarbakir: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbakirê.
- Antolojiya Dengbêjan-2*. (2011). Diyarbakir. Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbakirê.
- Aras, A. (2004). *Efsanevi Kürt Şairi Evdalê Zeynikê*, İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Aras. A. (2009). *Serhildana Seyîdan û Berazan (Seyîdan û Elîcan)*. İstanbul: Peri Yayınları.
- Aras. A. (2018). *Evdalê Zeynikê Şairê Kurda yê Efsanewî*. Stenbol: Nûbihar.
- Arik, S. A. (2012). *Yakın Doğu'da Koçgîrî & Dersim Kızılbaş Kürd Soykırımı*. İstanbul: Peri Yayınları.
- Arslan, R. (2015). *İmajdan Kimliğe Cumhuriyet Dönemi Romanlarında Kürtler*. Diyarbakır: J&J Yayınları.
- Assman, J. (2018). *Kültürel Bellek Eski Yüksel Kültürlerde Yazı, Hatırlama ve Politik Kimlik* (Çev. Ayşe Tekin), İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Bakırcıoğlu, R. (2012). *Ansiklopedik Eğitim ve Psikoloji Sözlüğü*. Ankara: Anı Yayınları.
- Basooğlu, K. (2011). *Delal Zilan Katliamı ve Gerçekleri*. İstanbul: Do Yayınları.
- Başkaya, F. (2009). *Resmi Tarih Tartışmaları-2*. İstanbul: Türkiye ve Orta Doğu Forumu Vakfı -Özgür Üniversite Yayınları.
- Bauman, Z. (2017). *Kimlik*. Ankara: Heretik Yayınları.
- Bedirhan, S. (1994). *Kürt Davası ve Hoybun*. İstanbul: Med Yayınları.
- Beğik, M. (2018). *Reso Şahê Dengbêjan*. Stenbol: Nûbihar.

- Benjamin, W. (1993). *Son Bakışta Aşk*, İstanbul: Metis Yayınları.
- Bereh, B. (2011). *Dilê Min Palgeh Ji Işqê Re*. Diyarbakir: Lîs.
- Bergson, H. (2015). *Madde ve Bellek*. Ankara: Dost Kitabevi.
- Beşikçi, İ. (2013). *Rejimin Niteliği ve Kürtler*. İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları.
- Bilgin, N. (2013). *Tarih ve Kollektif Bellek*. İstanbul: Bağlam Yayıncılık.
- Bourse. M. (2009). *Melezliğe Övgü*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Bozarlan, H. (2004). *Türkiye'nin Modern Tarihi*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Bozkuş. D. Y. (2011). "Kürt Toplumunda Kadın Dengbêjler" içinde *Kültürlerarası İletişim Bağlamında İnsana Dair Duygular ve Ritüeller* (Ed. Necla Mora). Ankara: Nobel Yayınları.
- Bruinessen, M. V. (2009). *Kürdolojinin Bahçesinde Kürdologlar ve Kürdoloji Üzerine Söyleşi ve Makaleler*. İstanbul: Vate Yayınları.
- Caunce, S. (2018). *Sözlü Tarih ve Yerel Tarihçi*. (Çev. Can, B. B & Yalçinkaya.A). İstanbul: Tarih Vakfı.
- Celâlî, M. (2016). *Mela Mehmûdê Bazîdî û Adat û Rusûmatname'nê Tewayifê Ekradiye*. Stenbol: Nûbihar.
- Cizirî, Ş. (2020). *Edebiyata Devkî û Şer*. Diyarbakir: Lîs.
- Ciğerli S.-Le Saout D. (2022). *Fransız Diplomatik Arşivlerinde Kürtler Kürt Milliyetçiliğinin Ortaya Çıkışı (1874-1945)*. (Çev. Heval Bucak). İstanbul: Avesta Yayınları.
- Connerton, P. (2014). *Toplumlar Nasıl Anımsar*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Çifçi, T. (2014). *Kilam û Jin-Di Kilamên Evînî Yên Dengbêjan De Temaya Jinê*. Stenbol: Nûbihar
- Çelik. D. (2014). "Dengbêjliğin Erilliği ve Küçük Kadın Dengbêjler" içinde *Kadın Hayatlarını Yazmak: Oto/Biyografi, Yaşam Anlatıları, Mitler ve Tarih Yazımı Uluslararası Sempozyum Bildiri Kitabı 19-24 Nisan 2014- İstanbul*. (Ed. Birsen Talay Keşoğlu & Leyla Şimşek Rathke). İstanbul: Kadın Eserleri Kütüphanesive Bilgi Merkezi Vakfı.
- Demirer. H. (2008). *Ha Wer Delal Emînê Perîxanê'nin Hayatı*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Ellul, J. (2004). *Sözün Düşüşü*, (Çev. Hüsamettin Arslan). İstanbul: Paradigma.
- Evdirehman, E. (2004). *Xatê Xanim*. Diyarbakir: Lîs.



- Fanon, F. (2020). *Siyah Deri Beyaz Maskeler*. İstanbul: Metis Yayınları.
- Fanon, F. (2020). *Yeryüzünün Lanetlileri*. İstanbul: Versus Kitap.
- Faroqhi, S. (2012). *Osmanlı İmparatorluğu Tarihi*. (Çev: Ercan Ertürk). İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.
- Fırat, D- Fırat D. (2022) *Şeyh Said Oğlu Şeyh Ali Rıza Hatıraları Babam Şeyh Said*. Ankara: 40 Kitap Yayınları.
- Fırat, N. (2015). *Aşiret ve İsyan Batı'nın Kürt Algısı*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Foucault, M. (1992). *Hapishanenin Doğuşu*. Ankara: İmge Kitabevi Yayınları.
- Foucault, M. (2011). *Büyük Kapatılma Seçme Yazılar-3*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Gellner, E. (1992). *Uluslar ve Ulusçuluk*. (Çev. Büşra Eraslanlı Behar- Günay Göksu Özdoğan). İstanbul: İnsan Yayınları.
- Gorgas, J., T. (2020). *Kürt Milli Cemiyeti Xoybûn İlk Milliyetçi Kürt Örgütüne Dair Efsaneler Gerçekler*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Gültekin, N. (2020). *Şahidekî Komkujiya Geliyê Zilan Tahir Nas*. Diyarbakir: Lîs.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2018). *Antolojiya Dengbêjan-1 Dengbêj Reso*. Stenbol: Nûbihar.
- Güneş, Ö. & Şahin, İ. (2018). *Antolojiya Dengbêjan-2 Dengbêj Şakiro*. Stenbol: Nûbihar.
- Halbwachs, M. (2016). *Hafıza'nın Toplumsal Çerçeveleri*. (Çev. Erdoğan, İ). Ankara: Heretik.
- Halbwachs, M. (2018). *Kolektif Hafıza*. (Çev: Barış, B). Ankara: Heretik.
- Hikmet, B. (2012). "Dengbêj Geleneği" içinde *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*. (Ed. Vecdi Erbay), İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Hobsbawm, E. J. (2001). *Tarih Üzerine*. Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.
- Hobsbawm, E. J. (2010). *1780'den Günümüze Milletler ve Milliyetçilik Program: Mit, Gerçeklik*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- İlhan, M. E. (2019) *Kültürel Bellek- Sözlü Kültürden Yazılı Kültüre Hatırlama (Halkbilimsel Bir Yaklaşım Denemesi)*. Ankara: Doğu Batı Yayınları.
- İnalçık, H. (2003). *Şâir ve Patron Patrimonyal Devlet ve Sanat Üzerinde Sosyolojik Bir İnceleme*. İstanbul: Doğu Batı.
- İşler, İ. (2016). *Zilan Dosyası-2*. Van: Sitav Yayınevi.
- Jwaideh, W. (2009), *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi Kökenleri ve Gelişimi*, İstanbul: İletişim Yayınları.

- Kahraman.A. (2004). *Kürt İsyamları (Tedip ve Tenkil)*. İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Kardaş, C. (2017). *Aşığın Sazı Dengbêjin Sesi (Dengbêjlik ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme)*. Ankara: Eğiten Kitap.
- Kerim, A. H. (2011). *Balkan Yarımadasında Kürtler*. İstanbul: Evrensel Basım Yayın.
- Keskin. N. (2019). *Folklor û Edebiyata Geleri*. Stenbol: Avesta Yayınları.
- Kevirbirî, S. (2009). *Filîtê Quto; 20 Kilam,20 Qeimîn*. Stenbol: Weşanxaneyaya Do.
- Kevirbirî, S. (2009). *Sedsala Qêrînekê; Karapêtê Xaço*. Stenbol: Weşanxaneyaya Do.
- Kızılkaya, M. (2000). *Kayıp Diwan: Sözlü Kürt Kültüründen Üç Örnek*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Klein. J. (2014). *Hamidiye Alayları İmparatorluğun Sınır Boyları ve Kürt Aşiretleri*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Koç, Ç. T. (2019). *The 'New' One of The Old Media: Understanding Electronic Culture. Debates On Media & Communication Studies* (Ed. Emrah Doğan- Nuran Öze). London: Ijopec Publication.
- Kutlay, N. (1992). *İttihat Terakki ve Kürtler*. Ankara: Beybun Yayınları.
- Kutlay, N. (2011). *21.Yüzyıla Girerken Kürtler*. İstanbul: Peri Yayınları.
- Lefebvre, H. (2016). *Mekanın Üretimi*. (Çev. Ergüden, İ). Ankara: Sel Yayınları.
- Levi-Strauss, C. (2013). *Mit ve Anlam*. (Çev. Demir, G.Y). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Luire. A. R. (1971). *The Man With a Shattered World*. Massachusetts: Harvard University Press.
- Maalouf, A. (2002). *Ölümcül Kimlikler*. (Çev: Bora, A.) İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Misztal, B. A. (2003). *Theories of Social Remembering*. Philadelphia: Open University Press Maidenhead.
- Moltke. H.K. (1999). *Moltke 'nin Türkiye Mektupları*.İstanbul: Remzi Kitapevi.
- Mutlu, E. (1996). *Kürt Müziği*. (K.Nezan, M. R. İzadı, A. Tatsumura, E. Mutlu, C. Poche, D. Christensen, A. Komitas) ) İstanbul: Avesta Yayınları.
- Neyzi, L. (2013). *"Ben Kimim?" Türkiye 'de Sözlü Tarih, Kimlik ve Öznellik*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Nezan, K. (1996). *Kürt Müziği*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Noel. E. W.C. (2009). *Kürdistan 1919 Binbaşısı Noel'in Günlüğü*. İstanbul: Avesta Yayınları.

- Nora. P. (2006). *Hafıza mekanları* (Çev. Özcan, M.E.). Ankara: Dost Kitabevi.
- Ong, W. J. (2018). *Sözlü ve Yazılı Kültür Sözü'nün Teknolojileşmesi*. (Çev. S. Postacıoğlu Banon). İstanbul: Metis yayınları.
- Ortaylı, İ. (2011). *Tarih Yazıcılık Üzerine*. Ankara: Cedit Yayınları.
- Öncü, M. (2009). *Gotinên Pêşiyên*. Stenbol: Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.
- Özağaçhanlı, Z. (2013). "Kürtlerde Sözlü Kültür ve Hikâye Anlatıcılığı: Dengbêjlik Örneği" içinde *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*. (Ed. Yıldız. M. C.) Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- Özbilge, N. (2020). *Çekirgeler, Kürtler ve Devlet Erken Cumhuriyet Dönemine Yeniden Bakmak*. İstanbul: Tarih Vakfı Yurt Yayınları.
- Üngör, U.Ü. (2016) *Modern Türkiye'nin İnşası Doğu Anadolu'da Ulus, Devlet ve Şiddet (1913-1950)*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Parıltı, A. (2006). *Dengbêjler: Sözü'nün Yazgısı*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Propp, V. (1998). *Folklor Teori Ve Tarih* (Çev. Necdet Hasgül, Tolga Tanyel). İstanbul: Avesta.
- Renan. E. (2016). *Ulus Nedir?*. (Çev. Gökçe Yavaş). İstanbul: Pinhan Yayıncılık
- Ricoeur. P. (2017). *Hafıza, Tarih, Unutuş*. (Çev. Özcan. M.E.), İstanbul: Metis Yayınları.
- Ronî, M. (2012) "Dengbêjlik ve Edebiyat" içinde, *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Türkçe Edebiyat*, (Ed. Vecdi Erbay), İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Said, E. (2006). *Kış Ruhu*. İstanbul: Metis Yayınları.
- Sancar, M. (2016). *Geçmişle Hesaplaşma Unutma Kültüründen Hatırlama Kültürüne*. İstanbul: İletişim Yayınları.
- Sanders, B. (2010). *Öküz'ün A'sı Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi* (Çev. Şehnaz Tahir). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Schacter, D. (2001). *The Seven Sins of Memory, How The Mind Forgets and Remembers*. New York: Houghton Mifflin Company.
- Schudson, M. (1992). *In Watergate in American Memory: How The Remember, Forget, and Reconstruct the Past*. New York: Basic Books.
- Sebrî, O. (2016). *Çar Leheng*. Diyarbakir: Lîs.
- Sebrî, O. (2016). *Li Gorisraneke Amedê*. Diyarbakir: Lîs.
- Süphandağ, K. (2012). *Hamidiye Alayları Ağrı Direnişi ve Zilan Katliamı*. İstanbul: Peri Yayınları.

- Süphandağ, K. (2021). *Osmanlı Arşiv Belgelerinde Heyderan Aşireti ve Ağrı Direnişi*. İstanbul: Pel Yayınları.
- Taşkın, H.- Yıldız, A. (2019). *Kewê Ribat Şakiro*. Stenbol: Nûbihar.
- Tekin, B. (2017). *Kürt Sorunu ve Sayılmayan İsyandar (1514-1919)*. Diyarbakır: Dara Yayınları.
- Thiong'o, W. N. (2018). *Rizgarkirina Hiş Ji Mêtingeriyê; Di Wêjeya Afrikî De Siyaseta Zimên*. Diyarbekir: Lîs.
- Ulugana, S. (2010). *Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı(1926-1931)*. İstanbul: Peri Yayınları.
- Ulugana, S. (2015). “*Tradîsyon û Duajoyên Ewdalê Zeynikê*”, tê da *Edebiyata Kurdî ya Gelerî, Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur- Berawirdî*, (Ed. Ramazan Pertev), Stenbol: Avesta.
- Uzun, M. (2001). *Dengbêjlerim*. İstanbul: Gendaş Kültür Yayınları.
- Wolf, V. (1998). *Kendine Ait Bir Oda*. İstanbul: Afa Yayınları.
- Üngör, U. Ü. (2016). *Modern Türkiye'nin İnşası Doğu Anadolu'da Ulus Devlet ve Şiddet (1913-1950)*, İstanbul: İletişim Yayınları.
- Yalçın, Heckman, L. (2012). *Kürtlerde Aşiret ve Akrabalık İlişkileri*. (Çev. Gülhan Erkaya). İstanbul: İletişim Yayınları.
- Yaş, Z. (2016). *Şakarên Muzîka Kurdî -2*. Diyarbekir: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê.
- Yıldırım, E. (2013). *20. Yüzyılda Kürdistan ve Sınırlar Sınırsız Kürdistan'ın İçindeki Sınırların Tarihi*. Mersin: Azad Yayınevi.
- Yüksel, M. (2019). *Burası Muş'tur Tarih, Toplum, Kültür ve Edebiyat*. (Ed. Ercan Çağlayan), İstanbul: Pınar Yayınları.

## **KOVAR**

- Aras, A. (1997). “Ewdalê Zeynikê Lirîzma Kurdî Gihandiye Dereceya Herî Bilind”, Nûdem, (Hevpeyvîn: Mustafa Aladağ). j. 23.
- Aras, A. (1996). “Şahê Dengbêjan Şakiro Vefat Kir”, *Ronahî*, j. 58, 29 Hezîran-5 Tîrmeh 1996, r. 8.
- Atik A.&Erdoğan, Ş., B. (2014). “Toplumsal Bellek Ve Medya”. *Atatürk İletişim Dergisi*, j. 6, r. 1-16.
- Baltacı, A. (2019). Nitel Araştırma Süreci, *Ahi Evran Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Cilt 5, Sayı 2, r 368-388.

- Bedirxan, C. A. (1932). *Hawar* “Gazinda Xencera Min”. j.12 r. 1-2.
- Çelik, A. (2015). “1915, Kürtler ve Diyarbekir: Toplumsal Hafızanın Kaynakları ve Kuşaklararası Aktarımı Üzerine Bazı Tespitler”. *Ayrıntı Dergi*. j.9, r. 96-105.
- Çelik, A. (2015). “Eşîra Xiyana, Bîra Kollektîf û Travma: Êşeke Patetîk Li Dor Kilama Reben im”. *Wêje û Rexne*, j. 4, r. 180-202.
- Çelik, M. (2022). “Di Kilamên Dengbêjan de Rengvedana Afatên Siruştî û Nexweşîyan”. *Kurdiname*, j. 6, r. 93-104.
- Çevik, S. (1994). “70 Saliya Xwe de Serhildana Şêx Seîd”, *Kovara Nûbiharê*, j. 17, İstanbul, r. 8-17.
- Çiftçi, E. (2018). “Heyderan Aşireti Örneğinde Aşiret-Devlet Arasındaki Simbiyotik İlişki”. *Kürt Tarihi*, j. 32. r. 36-43.
- Dît. Nedim. (2006). “Dengbêj Geleneğinin Sonu ya da Bu Geleneğin Son Halkası: Reso”. *Kovara Bîr*. j.6.
- Erkal, A. (2017). “Toplumsal Hafızanın Muhafızları: Aşıklık Geleneği”. *Sosyoloji Dergisi*. S. 10, s. 151-165.
- Fayda, M. (2011). Tarih. *TDV İslam Ansiklopedisi*, İstanbul. Cilt 40. r. 30-36.
- Gültekin, A.K. (2018). “Aşiret Ne Anlatır?” *Kürt Tarihi Dergisi*, j. 32. r. 12-19.
- Hamelink. W.-Barış. H. (2014). “Dengbêj Di Sînoran De: Sînor û Dewlet Bi Nêrina Kilambêjên Kurd”. *Kovara Wêje û Rexne*. j.3 r.173-200.
- Hêja. (2015). “Hegemonyaya Bavkanî jî Dişikê: Mîkro Têkoşîn û Mîkro-Şoreşa Dengbêja Jin”. *Kovara Zarema*. j. 4, r.38-49.
- Hozan, S. (2021). “1838 Yazında Kürdistan”. *Kürt Tarihi*, j. 46. r. 14-21.
- İnce, G. B. (2016). “Ulusal Kimlik, Kolektif Bellek ve Edebiyat: Dersimli Kız Romanında Resmi Bellek Temaları”. *Monograf Edebiyat Eleştirisi Dergisi*. s. 5, s. 36-68.
- Karacan, H. &Nayman, R. (2014). “Dengbêj Salihê Qubînî ile Karapêtê Xaço'nun Şarkılarında Aşiret Kavgaçları: Filîtê Qutoile Elî Etmanki Kavgası” *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Cild 16, j. 2, r. 361-388.
- Kardaş, C. (2012) “Toplumsal Olayların Dengbêjler Aracılığıyla Sözlü Kültüre Aktarılması”. *Batman University Journal of Life Sciences*, Volume 1, Number 1
- Karaaslan, F. (2017). “Hafızanın Sosyo-Psikolojik Bağlamı”. *Sosyoloji Dergisi*. S. 10, s. 25-36.
- Nûrî Paşa, Î. (1984). “Serhîlanîna Çiyayê Agirî”. *Kovara Hêvî*, j.2, r.19-28

- Olick, J.K. (2014). "Kollektif Bellek: İki Farklı Kültür", (Çev.Meral Güneşdoğmuş). *Moment Dergi*, s.1 (2), s.175-211.
- Özen, Ş. (2021). "Kürdistan 1919 Binbaşı Noel'in Günlüğü". *Kürt Tarihi Dergisi*. j. 46. r. 36-41.
- Özer, A. (2018). "Bırukan Aşiretine Sosyolojik Bir Bakış". *Kürt Tarihi Dergisi*. j. 32. r. 50-57.
- Öztürk, S. (2016). "Kewê Ribat Dengbêj Şakiro". *Kürt Tarihi Dergisi*, j.27, r. 43-47.
- Qedrîcan. (1932). "Di Şorezareqê de", *Kovara Hawar*, j.10, r. 4-5.
- Sağnıç, F.H. (1994). "Bandûra Zimên Li Ser Gel". *Nûbihar*, j. 20, r. 15-18.
- Schafers. M. (2016). "Utançtan Kamusal Sese Kadın Dengbêjler, Acının İşlenişi ve Kürt Tarihi". (Çev: Ergin Öpengin). *Kürt Tarihi Dergisi*, S.26, s. 24-29.
- Sennet, R. (2017). "Hafızayı Rahatsız Etmek". *Sosyoloji Divanı Dergisi*. S.10, s. 9-24.
- Tarduş. İ. (2021). "19. Yüzyıl İngiliz Seyyahlarının Gözüyle Kürt Kadını". *Kürt Tarihi*, j. 46. r. 28-35.
- Ulugana, S. (2013). "Gıdıkzadeler ve Milisliğin Kısa Bir Anatomisi". *Kürt Tarihi*. j. 5, r. 48-53.
- Ulutaş, E. (2017). "Toplumsal Hafıza ve Dengbêjler". *Sosyoloji Divanı Dergisi*. S.10. s. 139-150.
- Yıldırımçakar. M. (2020). "Denbêjiya Jinê Ji Hêla Patronaj, Perwerdehî, Rol û Nêrîna Cîvakî û Îcrakirina Hunerê Ve". *Kovara Kurdînameyê ya Navneteweyî*, j. 2, r. 87-96.
- Yorulmaz, A. (2017). "Dengbêjler ve Sözlü Tarih Dosyası Üzerine Bir Eleştiri". *Kürt Tarihi Dergisi*, j. 28, r. 53-57.
- Yüksel, M. (2016). "Wendy Hamelink ile Söyleşi: Dengbêj Şarkıları Tarihsel Derinliğe Sahip". *Kürt Tarihi Dergisi*. j. 26, r. 30-37.
- Yüksel, M. (2016). "On the borders of the Turkish and Iranian nation-states: the story of Ferzende and Besra". *Middle Eastern Studies*. j. 52, Volume: 4, r. 656-676.

## **TEZ**

- Aykaç, Y. (2020). *Kürt Mirliklerinde Edebi Patronaj (1514-1846)*. Dicle Üniversitesi SBE. Diyarbakır. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).

- Çaçan, R.S. (2013). *The Dengbêjî Tradition Among Kurdish-Kurmanj Communities: Narrative And Performance During The Late Nineteenth And Twentieth Centuries*. Boğaziçi University. İstanbul. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Çakır, N. A. (2011) *The Representation of the Dengbêj Tradition in Kurdish Contemporary Popular Discourse*. University of Exeter England, United Kingdom (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi).
- Chasan, K. (2018). *I. Balkan Savaşında Yunanistan (Yunan Kaynaklarına Göre)*. Trakya Üniversitesi SBE. Edirne. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Çelik, D. (2017). *Dengbêjlik Geleneği ve Türkiye'deki Kürt Tiyatrosuna Etkileri*. İstanbul Üniversitesi SBE. İstanbul. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Çeviker, L. (2009). *Şiddet ve Toplumsal Hafıza*, Ankara Üniversitesi. Ankara. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Delikaya, Ö. (2021). *Venandina Cihûwaran Li Komara Tirkiyeyê: Mînaka Agiriyê. Zaningeha Bîngolê. Enstîtuya Zimanên Zindî. Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî. Bîngol. (Teza Doktorayê ya Neweşandî)*.
- Gürür, Z. (2014). *Dengbêjî Di Peywenda Patronajê De. Zaningeha Mardîn Artukluyê. Mêrdîn. (Teza Lisansa Bilind ya Çapnebûyî)*.
- Hamelink, W. (2016). *The Sung Home Narrative, Morality And The Kurdish Nation*. Leiden University. Netherlands (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Kara, P. (2010). *Türkiye İnan İlişkileri*. Konya. Konya Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Karaarslan, F. (2014). *Modern Dünyada Toplumsal Hafıza ve Dönüşümü*, Selçuk Üniversitesi SBE, Konya. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Oral, S. S. (2018). *“Handan İpekçi Sinemasında Kolektif Bellek”*. Marmara Üniversitesi. İstanbul. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).
- Öztürk, S. (2012). *Kadın Kimliği Bağlamında Kültürel Bellek Ve Van Merkezdeki Kadın Dengbêjliği Yansımaları*. İstanbul Teknik Üniversitesi SBE. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi).
- Öztürk, S. (2014). *Di Tradîsyona Dengbêjiya Kurdî De Şakiro (Jiyan û Berhem)*. Mêrdîn. (Teza Lîsansa Bilind ya Neweşandî).
- Taş, F. (2015). *Dengbêjlik Geleneği ve Dönüşümler*. Ankara. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi).

Uygar, Y. (2009). “Kültürel Bellek ve Dengbêjlik: Doğu Anadoludaki “Dengbêjlik” Geleneğinde Bellek Üretimi”. Mimar Sinan Üniversitesi. İstanbul. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi).

Yeşilmen, D. “*Temaya Sirgûnê Di Çar Romanên Kurdî (Kurmançî) De*” Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê. Mêrdîn. (Teza Lîsansa Bilind ya Neweşandî).

Yüksel, M. (2011). “*Dengbêj, Mullah, Intelligentsia: The Survival And Revival Of The Kurdish-Kurmanji Language In The Middle East, 1925-1960*” Chicaco. (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî).

Zeyrek. S. (2012). *Birinci Balkan Savaşı Yenilgisinin İç ve Dış Sebepleri*. İstanbul Üniversitesi SBE. İstanbul. (Yayımlanmamış Doktora Tezi).

### **SEMPOZYUM**

Ertekin. N. (2019). “*Zêmar Di Dengbêjiyê De: Dengbêj Şakiro Wek Numûne*”

Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyumu 19-20 Nisan 2019 Şırnak

Kardaş, C. (2011) “*Dengbêjlerde Toplumsal Belek ve Alikê Batte Olayının Dengbêjlere Yansıma Şekli*”. Uluslararası Midyat Sempozyumu 7-9 Ekim 2011 Mardin.

Kardaş, C. (2011) “*Halk Kahramanı Bağlamında Şem'un Hanne Haydo*”. Geçmişten Günümüze İdil Sempozyumu. 11-13 Mart 2011 Şırnak.

### **FERHENG**

Bakırcıoğlu, R. (2012). *Ansiklopedik Eğitim ve Psikoloji Sözlüğü*. Ankara: Anı Yayınları.

Bozarlan. M.E. (2011). *Ferhenga Kurdî*, Stenbol: Weşanên Deng.

Emiroğlu. K. & Aydın. S. (2003). *Antropoloji Sözlüğü*. Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.

Farqînî, Z. (2004). *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Stenbol: Weşanên Enstîtûya Kurdî.

Îzolî. D. (2007). *Ferheng Kurdî-Tirkî Tirkî-Kurdî*. Diyarbekir: Weşanên Deng.

Komisyon (2011). *Türkçe Sözlük*. (Hazırlayan Şükrü Haluk Akalın). Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.

Marshall, G. (2005). *Sosyoloji Sözlüğü*. Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.

Örnek, S. V. (1971). *Etnoloji Sözlüğü*. Ankara: Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Yayınları.



Paşa, Y. Z. (1978). *Kürtçe-Türkçe Sözlük*. (Çeviren ve Yeniden Düzenleyen: Mehmet Emin Bozarlan). İstanbul: Çıra Yayınları.

Winn. P. (2001). *Dictionary of Biological Psychology*. New York: Routledge.

### **ÇAVKANIYÊN ELEKTRONİK**

Adnan Çelik& Namık Kemal Dinç, “1915 Diyarbekir ve Kürtler : Toplumsal Hafızanın Kaynakları ve Kuşaklararası Aktarımı Üzerine Bazı Tespitler”

<https://ayrintidergi.com.tr/1915-diyarbakir-ve-kurtler-toplumsal-hafizanin-kaynaklari-ve-kusaklararasi-aktarimi-uzerine-bazi-tespitler/>, (11.06.2020).

Ahmad Mohammadpour-Kamal Soleimani, (2019) “Lêpirsîna Eşîrtîyê: Muamaya “Eşîrtî”yê di Xebatên Sosyolojîk ên li ser Rojhilata Navîn de”

<http://blog.kovarazarema.com/lepirsina-esirtiye-muamaya-esirtiye-di-xebaten-sosyolojik-en-li-ser-rojhilata-navin-de/>, (04.06.2022).

Dara Gimgimî, (2021). “Li Ser Seîdê Nado (Bavê Dilşayê)”,

<https://www.bernamegeh.org/2021/09/24/seide-nado-bave-dilsaye-dara-gimgimi/>, (16.12. 2022).

Dengbêj Seyîdxanê Boyaxçî, (2018). “Keçika Qereçî”

<https://www.youtube.com/watch?v=1vmmeXonBQ8>, (11.05.2021).

Dilawer Zeraq (2020). “Bêjara Polîtîk di Kilamên Şakiro da”

[https://diyarname.com/files/Bejara\\_Politik\\_di\\_Kilamen\\_Sakiro\\_da.pdf](https://diyarname.com/files/Bejara_Politik_di_Kilamen_Sakiro_da.pdf)

Ekrem Malbat, (2018). “Eşîra Hesena-1 (Ferzende Beg)”,

<https://www.youtube.com/watch?v=wk-C10E0fV8>, (10. 12. 2021).

Enstîtûya Kurdî ya Parîsê “Dengbêj”,

<http://www.institutkurde.org/publications/kurmanci/dictionnaire/>, (15.05.2021)

Fırat Aydınkaya, (2019). “Şifreli bir telgrafın izinde: Muş Ermenilerine ne oldu?”

<https://www.gazeteduvar.com.tr/forum/2019/04/24/sifreli-bir-telgrafin-izinde-mus-ermenilerine-ne-oldu> 16.01.2022, (24.04.2019).

İkram Oğuz, “Kewê ribat û şahê dengbêjan: Şakiro”

<https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2020/06/22/kewe-ribat-u-sahe-dengbejan-sakiro> (13.07.2021).

Joshua, Fishman, “What Do You Lose When You Lose Your Language?”,

<https://files.eric.ed.gov/fulltext/ED395732.pdf>, (5.09.2020).

Resmi Gazete, “29 Temmuz 1931 İsyân mıntakasında işlenen ef’alin suç sayılamayacağına dair kanun, <https://www.resmigazete.gov.tr/arsiv/1859.pdf>, (14.06.2022).

Resmi Gazete, “25 Kasım 1935 Şapka İktisası Hakkında Kanun”,

<https://www.resmigazete.gov.tr/arsiv/230.pdf>, (24.06.2022).

Rohat Alakom, (2021), “Tek şahsiyet çok isim: Ağrı İsyanı lideri İbrahim Aúa ve adları”, <https://www.gazeteduvar.com.tr/tek-sahsiyet-cok-isim-agri-isyani-lideri-ibrahim-aga-ve-adlari-haber-1543326> , (26.11.2022).

Sevan Nişanyan (2010), “Index Anatolicus- Yer Adları, Türkiye ve Çevre Ülkeler Yerleşim Birimleri Envanteri”,

<https://nisanyanmap.com/?y=diyarbak%C4%B1r&lv=&t=&cry=TR&ua=10>, (5.08.2022).

Şemoyê Memê, (2013). “Di Zargotina Kurdî da Hesp”

[https://www.academia.edu/38468141/DI\\_ZARGOTINA\\_KURD%C3%8E\\_DE\\_HES](https://www.academia.edu/38468141/DI_ZARGOTINA_KURD%C3%8E_DE_HES) P, (17.03.2022 ).

Vakit (1930), “Eşkıya Kamîlen tenkil olundu”,

[http://nek.istanbul.edu.tr:4444/ekos/GAZETE/vakit/vakit\\_1930/vakit\\_1930\\_temmuz/vakit\\_1930\\_temmuz\\_13\\_.pdf](http://nek.istanbul.edu.tr:4444/ekos/GAZETE/vakit/vakit_1930/vakit_1930_temmuz/vakit_1930_temmuz_13_.pdf)

Xwerzî Xerzan, (2022). “Li Berxwedana Çiyayên Xerzan- 1925/1937 (Beşa Pêşîn)”,  
[https://krd.riataza.com/2021/01/18/liberxwedana-ciyayen-xerzan-1925-1937-besa-pesin/?\\_cf\\_chl\\_jschl\\_tk\\_\\_=pmd\\_Dlgo6Y2Nu08mAgLunb\\_kiFRsBb.ed0Tln4WXcYrBpQk-1630143952-0-gqNtZGzNAiWjcnBszQil](https://krd.riataza.com/2021/01/18/liberxwedana-ciyayen-xerzan-1925-1937-besa-pesin/?_cf_chl_jschl_tk__=pmd_Dlgo6Y2Nu08mAgLunb_kiFRsBb.ed0Tln4WXcYrBpQk-1630143952-0-gqNtZGzNAiWjcnBszQil), (28.08.2022).

## ÇAVKANIYÊN DEVKÎ

### Nav-Paşnav, Temen, Dema Têkiliyê, Cih, Pîşe

Ahmet Aras 78, 25.09.2021, Îzmir, Nivîskar-Lêkolîner  
Ali Rıza Emre 66, 30.05.2021, Enqere, Endezyar  
Dengbêj Salihê Qûbînê, 73,12.06.2022, Batman, Dengbêj  
Dengbêj Sebriyê Agirî 58, 06.06.2022, Stenbol, Dengbêj  
Ferhat Çaki 38, 3.12.2022, Mûş, Karsaz  
Îbrahim Yenigül 73, 24.03.2022 Enqere, Teqawîdbûyî  
Îlyas Sayım 40, 21.12.2021, Mûş, Akademîsyen  
Îsmail Beşikçi 80, 12.12.2021 Stenbol, Nivîskar-Lêkolîner  
Mehmet Tosun 78,18.02.2020, Stenbol, Teqawîdbûyî  
Metin Deniz 63, 02.01.2021, Almanya, Esnaf  
Murat Budak 73,16.06.2022, Îzmir, Karsaz  
Murat Celalî 43, 27. 01.2023, Stenbol, Lêkolîner-Nivîskar  
Ömer Güneş 45, 25.05.2021, Almanya, Parêzer  
Rohat Alakom 67, 15.02.2022 Swêd, Nivîskar Lêkolîner  
Tevfik Deniz 76, 30.21.2022, Stenbol, Dengbêj

**PÊVEK 1.****LÎSTEYA KILAMÊN KU BÛN MIJARA VÊ XEBATÊ**

1	Asyayê
2	Axao
3	Axao Ferman e
4	Bavê Baran Begê
5	Bavê Beced- Şêx Fexrî
6	Bavê Dilşayê
7	Bavê Dilşayê –Curnalî Çetîn e-
8	Bavê Evdila
9	Bavê Mîr Begê Min
10	Bavê Seyîd Betal
11	Bavê Şemsedîn
12	Bavê Tesîmê
13	Bavê Xalis Kekê Mexsê
14	Bavê Xanimê
15	Berxê Mala Hecî Temir Axa
16	Cewer Beg Bavê Gulîzerê
17	Dêran Kejik
18	Dewrêşê Evdî
19	Eliyê Purto
20	Elî Begê Berxê Mala Paşê
21	Elîfê, Emînê-Ûskan
22	Ez Reben im
23	Ferzê
24	Ferzende û Xalis Beg
25	Geliyê Zîlan
26	Heseno Lo Lawo
27	Hey Lo Metê-Mihemedê Elî Begê
28	Hemedê Elî Begê Kekê Zahido Siwarê Tîran
29	Hemê Mûsekî
30	Her Sê Makûmê Sîwerekê
31	Heyla Riza
32	Îbo Begê Parsinî
33	Îsmailê Axê
34	Kekê Xiyasedîn
35	Keremê Elî
36	Keremê Qolaxasî
37	Kordîna Qerebulaxê
38	Lo Mîro Îslamî Tune -Evdal û Kerem-
39	Mala Mîrza Begê
40	Mamed Axa û Bekir Beg
41	Melûl Siwaro
42	Nemînim Ji Axê Ra – Bavê Cemîl
43	Seîdo Berxê Min
44	Sê Zerî

45	Sidîqê Delal
46	Silêmanê Ehmed
47	Silêmanê Keçel Bavê Mexsê
48	Sîwaro Ji Xweytê Hetanî Xweytê
49	Siwar
50	Şerê Mala Nêsir
51	Şerê Selanîkê
52	Şerê Tarxan
53	Teyrê Îspîrê
54	Xalis Beg
55	Welatê Xurbetê

## PÊVEK 2.

### ÇEND KILAMÊN SEREKE YÊN BÛN MIJARA VÊ XEBATÊ

#### ASYAYÊ

Axao hey li min li min li min  
wê maqûlo hey li min li min li min  
Asyayê bi sê denga bang dikirî go de lê lê Besrayê  
dayê rebenê sibe ye şereka li me çêbû qaleka li me qewimî  
li sûra kafirî Salah li hewşa kafirê Emîr Tûman  
weyla li mi nemayê tu sêr bike îro ji êvar da li ser kaniyê  
îro ji êvara Xwedê da tê girmîna tometîka vî zalimî, nemînim sewta vê boriyê  
Ecem e beşîncî mezheb e dîn û duşman e  
gule barûdê bi ser serê me da dibarîni fenanî taviyê  
va zalima dîn û duşman e  
tu sêr bike li me biriye nade me da deqe û mohlet û saniyê  
Besrayê bi sê denga bang dikirî go Ferzende mala te xira be  
te digo ez Ferzende me ez Ferzende me  
ez bavê Elfesiya siwarê Eznawir im  
xwedanê kuçuk çapiliyê me  
li welatî dordincî ordiyê mêr ser mi ra qe tunene  
go Besrayê agirê kulê di qapiyê te ketê  
ezê bi cotek gulê tometîka vî zalimê birîndar im  
eva ne şerê Hesenan e  
ne şerê Heyderan e  
ne şerê Cibiran e  
ne şerê donzdeh bavê eşîrane  
hewşa kafirê Emîr Tûman e  
Ecem e beşîncî mezheb e, bê dîn û bê îman e  
li ser serê me hurmîne topan e, girregirrê tometîkan û makînilyan e  
li me biriye deqe û saniyê  
nade me da tu mohlet û tu eman e  
gavê din da li qarişî şerîata Mihemed sekiniye  
ji êvar da ji min ra dixwîni meydan û fermane  
îro ji êvara Xwedê da ezê bi cotek gulê tometîka vî zalimê birîndar im  
cinyazê Silêmanê Ehmed komê Hesena li pêş çavê min e  
heyfa mi nayê bi kuştina Silêmanê Ehmed koma Hesena ne  
heyfa min tê li wê heyfê ji êvara Xwedê da

li qarîşê mi ji mila vekirin rutbe û nîşan û elametê Hemîdiyê  
 Lo axao wele nabî, bîle nabî  
 şer giran e, Keremê Qolaxasî mêrkî mêrxas e bi sê gula birîndar e  
 tê kuştinê tu caran tu zemana jê venabî  
 cewabekî nebixêrê hatî dibêje îro sê roj û sê şev e  
 erz û eyalê Mala Emer li kaviliya Îranê,  
 li ser piştê manegiya cî nabîne star tunîne lê peyabî  
 esker em bin esker em bin em berxê Mala Emer bin  
 qaçaxê Romê bin, firarê dewletê bin  
 Kerem digote Evdal digo  
 em du peyayê Mala Mistefa Axa, du tayê bi tenê bin  
 berxê Mala Evdalê Mistê bin  
 bi malekî minanî Mala Emerê gulîxwûn ra bi heval bin  
 sêr bike li me û li vê zilmê  
 çar tixayê Qeceran û sêrbazan û papaxgenî derê qonaxa li me bigirin  
 me herdu malê bi gulîxwûn ra bibêjin  
 lawo tîfingên destê xwe daynin teslîmê nêçelîngê me bin  
 Ê de lêxin bavê bavê mino de lêxin  
 sûtêma ji hustiyê xwe da bînin  
 qûndaxê martêliyan û çepilya li erdê xin  
 em hene ji berê di paş da qaçaxê Romê ni  
 firarê dewletê ni berxê Mala Emer in  
 biçûk û mezinê me rabûni ranebûne  
 mirîd û canfîdayê Mala Şêx in bego  
 Bê axao hey li min li min li min  
 Asyayê bi sê denga bang dikirî go de lê lê lê lê Besrayê  
 dayê rebenê sibe ye şereka li me çêbû  
 qaleka li me qewimî li sûra kafirî Salah  
 li hewşa kafirê Emir Tûman dayê rebenê wa bigere  
 mi dî teyrê ecelê ji êvar da  
 li ser serê Silêmanê Ehmed komê Hesena tev digere  
 bawer bike qerebalix e yeqîn şer e  
 Asyayê digoti Besrayê da dayê dergûşa milê te lawîn e  
 tu bi destê Elfesya bigiri ji navê derkev here  
 go lê dayê rebenê ji te ra ne eyb e tu ji mi ra dibêjî gotinê were  
 bira dergûşa milê mi li dora lingê eşîra Mala Emer

herdu peyayê Mala Mistefa Axa tev bigere  
Besrayê bi sê denga bang dikirî go Ferzende mala te xirav be  
te digot ez Ferzende me Ferzende me  
ez bavê Elfesya, siwarê Eznawir im  
xwedanê kuçuk çapilyê me  
li welatî dordincî ordiyê mêr ser mi ra qe tunene  
go Besrayê agirê kulê di qapiyê te ketê  
ezê bi cote gullê tometîka vî zalimê birîndar im  
cinyazê Silêmanê Ehmed komê Hesena li pêş çavê min e  
eva ne şerê Hesenan e  
ne şerê Heyderan e  
ne şerê Cibiran e  
ne şerê donzdeh bavê eşîran e  
hewşa kafirê Emir Tûman e  
Ecem e beşîncî mezheb e, bêdîn û bêîman e  
li ser serê me hurmînê topan e, girregirrê tometîkan û makinilyan e  
li me biriye deqe û saniye  
nade me da tu mohlet û tu eman e  
gava din da li qarişî şerîata Mihemed sekiniye  
tu sêr biki ji min ra dixwûni meydan û fermane  
cinazê Silêmanê Ehmed, komê Hesena li pêş çavê min e  
heyfa mi nayê bi kuştina Silêmanê Ehmed koma Hesena ne  
wele heyfa mi nayê bi tu heyfê, heyfa mi tê ji wê heyfê  
gavê din da dikim nakim tiliya mina eşhedê ji xwe ra li mi nagere  
Lo Axao wele nabî bîle nabî  
şer giran e Keremê Qolaxasî mêrkî mêrxas e bi sê gula birîndar e  
tê kuştinê tu cara tu zemana jê venabî  
cewabekî nebixêrê hatiye dibê îro sê roj û sê şev e  
erz û eyalê Mala Emer li kaviliya Îranê ser piştê manegiya  
cî nabîne star tunîne lê peyabî  
esker em bin, esker em bin em berxê Mala Emer bin  
qaçaxê Romê bin, firarê dewletê bin  
Kerem digote Evdal digo  
em du peyayê mala Mistefa Axa du tayê bi tenê bin  
berxê Mala Evdalê Mistê bin  
bi malekî minanê Mala Emerê gulîxwûn ra bi heval bin



sêr bike li me û li vê zilmê  
çar tixayê Qeceran û sêrbazan û papaxgenî derê qonaxa li me bigirin  
ji van herdu malê bi gulîxwûn ra bibêjin  
lao tîfingên destê xwe daynin, teslîmê nêçelîngê me bin  
Ê de lêxin, bavê bavê mino de lêxin  
sûstema ji hustiyê xwe bînin  
qûndaxê martêliyan û çepilya li erdê xin  
em hene ji berê di paş da qaçaxê Romê ni  
firarê dewletê ni, berxê Mala Emer in  
piçûk û mezinê me rabûni ranebûne  
mirîd û canfîdayê Mala Şêx in bego. (Güneş-Şahin, 2018: 61-64)

### **KEKÊ XIYASEDÎN**

“Heyla ha lê wey lê wey lê...  
Le bira şewqa Kela Xînûsê lê nexista  
Li Bîngolê ji xwe ra çiya bi çiya lo hoy oy  
Bira neda bimbareka Qolhesarê derê mala efendî  
Mizgeftan û camiyan lê hê  
Di destê Kekê Xiyasedin digirtin kelemçe dikirin  
Dane pêşiya cotê cendurmê sungûliya lo lo  
Berê wî dane Enqerê Horgofê nava hezar û pênsed mêrê di girtiya  
Lema keleka dînê Îslamê ji xwe ra welgeriya lo hoy oy  
Xoce Elyas xocê cumhûretê  
Rûniştî li kavilya Enqerê li serê van têla  
Têl li ser têtê dida welatê Serhedê li ba Şêx Elî Riza  
Digo mala te xira be  
Tuyê kilîta lêxe li derê hucran û camiyan û medresa  
Tu nizanî li piştî kekê Xiyasedîn dersê mede van feqiya  
Tu nizanî piştî kekê Xiyasedîn  
Qanûna me bû qanûna Nîgalo duwalê ecnebiya le yê  
Lê bira tu gula şêxanî bira  
Piçûkê biran î bira  
Xûliyê di şewqan î bira  
Welatê xerîbê derdê pûçê bê derman î bira  
Heya dunya xweş ava be  
Keder û meraqa me hemyan î bira

Welatê xerîb û xerîbistanê tu sêr bike  
Çima derdê xwûçê bê derman î  
Lo oy hoy oy oy  
Heyla ha lê wey lê wey lê ...  
Lê bira şewqa Kela Xinûsê çiya li çiya nexîne  
Sura Enqerê tê gimînê  
Bîna bayê Xêmrûpêtê xeberê ji mi ra tinî lo hoy oy  
Bi destê kekê Xiyasedîn digirtin kelemçe dikirin  
Dane pêşiya cotê cendurmê sungûlî ne  
Berê wî dane Enqerê Horgofê nava hezar û pênsed mêrê di mefîne  
Feleka malixirab lema keleka dînê Îslamê weldigerîne  
Xoce Elyas xocê cumhûretê  
Rûniştî li Enqera rengînê  
Têl li ser têlê li Şêx Elî Riza ra dişîne lo oy oy  
Dibê rabin kiltan li derê hucran û camiyan û medresa bixîne  
Tu nizanî li piştî kekê Xiyasedîn  
Qanûna me bû qanûna Nîgalo duwalê ecnebînê  
Hela tu rabê emê bi destê hevdu bigirin xwe berdine bajara Diyarbekir  
Li ser tirba Şêx Şemsedîne  
Belkî ji ba Xwedê da ricaçî be efya van mefiya derîne  
Fezîle bûka sê mehan e  
Bira çavê wê li rê û dirba nemîne lê hê  
Lê bira tu gula şêxan î bira  
Piçûkê biran î bira  
Xûlyê di şewqan î bira  
Hêsîr û dîlê Misto Kemal qanûna ters e giran î bira  
Welatê xerîbê derdê pûçê bê derman î lo bira  
Hela bala xwe bidê heya dunya xweş ava be  
keder û keser û meraqa me hemyan î  
lo oy lo bê hoy oy oy (Güneş-Şahin, 2018: 57-58)

#### ŞERÊ TARXAN

“Li Çiyayê Qeleniyê Sîpandaxê bişewite bi wa bi dar e

Taxima destê Apê Zezo kekê Cemîlê kîraza welatî jêr e  
Keko îmama serî karîbar e  
Bira lênexista sura sibê bîna bayê Qeleniyê ji we ra bakî sar e  
Bêxwediya bêşliyê jiêvar da di destê kekê mi da zarezar e  
Zezo digo Cemîlê lê dayê deng li kekê mi neke  
Eskerê kekê mi tune eskerê Şahê Ecem hezar e  
Îro ji êvar da bi ser serê kekê mi da hatiye xwarê  
Deng li kekê mi neke ji xewa şîrîn tu rameke  
Tirsim kekê mi bikûjin me derbas ke nava gawirê Bulxarê  
Eskerê kekê mi tune pê nikare lo lo  
lo lo lo lo lo lo lo lo...  
lo Mîrpenco birao

Hey lê dayê rebenê berfekî li me barî  
Li Çiyayê Qeleniyê Sîpandax e spî dike fenanê hêk e  
Tarxan bi sê denga bang dikirî go Têmûrxan lo bira tu rabe  
Orta min û Şahê Ecem xirab e keskî xwedanxêr tune ku ji ba xwe da çêke  
Heyfa kekê te nayê li tu heyfê heyfa mi tê li wê heyfê  
Bêxwediya bêşliyê di destê kekê te da telam daye  
Şahê Ecem merivekî bênamûs e  
Tirsim çolux û çocixê me derbasê îçeriyê ke  
Wele serê me herdu bira kozikê da jêke lo lo  
lo lo lo lo lo lo... lo Mîrpenco birao  
Zezo digo Cemîlê lê dayê weke kekê mi xweşmêr e xweş axa ye  
Qarişê Şahê Ecem yarim dewlet e  
Wey la lê nemayê yarim şah e  
Çawa li topraxa vî kafirî bê piştêmêrî bê bira ye  
Heyfa mi nayê bi kuştina kekê mi gulîbirê heyfa mi tê li wê heyfê  
Tu bala xwe bidê bi dîzgîna Gogerçînê girtin  
Berê wî dane Kela Makuyê Sera Mexîna  
Ji êvar da kirin yextirme ye  
Bi limêja sibê ra dişandin ser nalbenda ye lo lo  
lo lo lo lo lo lo...  
lo Mîrpenco birao” (Güneş-Şahin, 2018: 76-77)

## **AXAO**

Lo Axao Axao Axao...

lo lo maqûlo sibe bû li dîharê Cemalvêrdî diketim bavêj e  
tu bala xwe bidê helehelê lawê bava  
qîrçînê çapiliyan û martêlya  
tivinga destê Seyîdxan malê Romê ye  
barûda xwe dirêje, gulê xwe xweş davêje  
herçî dîwana egîte mala bavê mi tê da rûniştî be  
bira kes rûmenê methê mêranya xwe nede, xeberê kin û dirêj mebêje  
rabe, herçî dîwana egîte mala bavê mi rebenê tê da runiştî be  
bira kes rûmenê methê mêranya xwe nede  
xeberê kin û dirêj mebêje wê  
Teyfûq bi sê denga bang dikirî go Seyîdxan mala te xira be  
helhele ez heme, Bavê Salih berxê Mala Ûsivê Seydo  
peyayê xerîb, mêrê mêrxas, kewê ribat, ne ez birayê te me  
mi bi telaqê jinberdanê sond xwarî  
li devê Mûradê fişeng avêtî devê çapilyê  
gelo vê sibengê gere îro li Cemalvêrdî mêra bikujim  
fenanî miya ku berxa xwe wenda ke, dê weledê milê xwe bavêje

helan danê, helan danê, egîte mala bavê mi nemayê helan danê  
ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê bi navê Quranê  
berxê mala bavê min bîna barûdê hildanê  
sond xwarine bi telaqê jinberdanê  
heya mêra nekujin bi silametî ranabin ji erasa vê meydanê

Lo axao axao axao axao...

lo lo maqûlo sibe bû li dîharê Cemalvêrdî diketim darî ter e  
sibe ye Seyîdxan derketî banê qesrê  
bi sê denga bang dikirî Sidîqê Hecî Mistefa Begê  
di bextê gora bavê te ketime  
pêşiya firarê me berde  
gidî fîrar gune ne bira derbas be here  
hey malmîrat!  
çima tu nizanî çend salê me tamam bû hukumeta Cumhûriyetê  
li sirgûnkirina çolix û çocix û birîna serê me digere

Sidîqê Hecî Mistefa Begê digo wele nabî bile nabî  
mi bi serê Şêx Badîne erdê Dignûgê sond xwarî tu car nabî  
heya li dunyayê sax û silamet bim  
firarê Seyîdan û Beraza nayê bi silametî bi ser mi ra derbas nabî  
rabe,  
Teyfûq bi sê denga bang dikirî go Seyîdxan mala te xira be  
helhel e ez heme Bavê Salih berxê Mala Êsivê Seydo  
peyayê xerîb, mêtê merxas, kewê ribat, ne ez birayê te me  
mi bi telaqê jinberdanê sond xwarî  
li devê Mûradê fişeng avêtî devê çapilyê  
gere îro li Cemalvêrdî mêra bikujim  
ez ji te ra sond bixwim  
fenanî miya ku berxa xwe wenda ke, gidî dê weledê milê xwe bigere  
hey malmîrat! ji şerefa mala me ra eyb e  
li ber xelkê tu negere  
tu nizanî peyayê bikeve qarşî kozika birayê te bi tenê  
ez ji te ra sond bixwim bi telaqê jinberdanê  
bi saxî û bi silametî bi ser çolix û çocixê xwe da venagere

helan danê, helan danê  
egîtê mala bavê mi nemayê helan danê  
ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê bi navê Quranê  
berxê mala bavê mi gulîbirê bîna barûdê hildanê  
sond xwarine bi telaqê jinberdanê heya mêra nekujin  
bi silametî ranabin ji erasa vê meydanê  
Lo axao axao axao ...  
lo lo maqûlo sibe bû li dîharê Cemalvêrdî diketim çem û kanî  
sibe ye Mûsa Beg derketî banê qesrê  
bi sê denga bang dikirî Sidîqê Hecî Mistefa Begê  
di bextê gora bavê te ketime  
serê xwe ji xewa şêrîn bilind ke  
hela bala xwe bidê helhelê lawê bava  
qîrçînyê çapêlyan û martêlyan  
firarê Seyidan û Beraza bi limêja sibê ra gund hilanî  
ca agirê kulê bikeve mala xelkê Intabê  
ser serê egîtê mala bavê mi nemayê ji êvar da agir dada kirin kafiristanî

rabe

Teyfûq bi sê denga bang dikirî digo Seyîdxan mala te xira be  
helhel e ez heme Bavê Salih berxê Mala Ûsivê Seydo  
peyayê xerîb mêrê mêrxas, kewê ribat, ne ez birayê te me  
mi bi telaqê jinberdanê sond dixwarî  
li devê Mûradê fîşeng avêtî devê çapilyê  
gere îro li Cemalvêrdî Sidîqê Hecî Mistefa Begê, Mûsa Begê  
tevê Mamê Begê komê xulama bikujim  
li qarşî çolix û çocixê wan, çek û sîlehê wan ji desta bistînim bi mêranî  
xelk bizanibi lawê bava hebû  
li piştî xirabiya xelkê  
ji bîr nekîr heyfa xwe hilanî  
helan danê helan danê  
egîte mala bavê mi nemayê helan danê  
ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê bi navê Quranê  
berxê mala bavê mi gulîbirê bi dil û cîgerê xwe guven in  
sond xwarine bi telaqê jinberdanê heya mêra nekujin  
bi silametî ranabin ji erasa vê meydanê. (Güneş-Şahin, 2018: 45-47)

### **ÎBO BEGÊ PARSÎNÎ**

Ax wax wax wax hey wax hey wax  
sibe ye vê sibengê Îbo Begê digo lawo qehweçî berxê  
sibe ye dilê mi kînekîn e  
tu rabe vê sibengê malxirabo  
dilê mi bi kulo di kedero bi mereq û bi birîn e  
tu rabi vê sibengê ji xwe ra tevdîra dîwana axayê xwe bibîne  
vê sibengê Îbo Beg misîne destmêjê hiltîne  
derkete rewaqê 69 tewrê jorîn e  
du siwara di rêya Parsîna Jêrîn 70 dibîne  
vê sibengê li qehweçî kir qêrîne  
go berxê vê sibengê bike wa bilezîne  
tevdîra çay û qehwekî wa bibîne  
şitavekî ji dîwana axayê xwe ra bibîne  
minê du siwar li rêya Parsîna Jêrîn dîne  
Xaçîk e bi tevî kamandarê wî ne dîn e dujman e  
bira neyê tu qîsûrê li Axayê te da nebîne  
dema vê sibengê qahweçî qehwa şîr û şekir dikelîne

berdabû fîncana zêrîn e  
dabû ser tabla zîvîn e  
vê sibengê malxirabo çavê wî li rê û dirbê dimîne  
nêhêrî vê sibengê kafirê Xaçîk e  
siwarê li dû dajo qaymeqamê kimandanê wî ne  
gelo vê sibengê di derê dîwanê xwe li erdê dixîne  
tu sêr bike vê sibengê Îbo Beg hespa ji desta distîne  
tevê qehweçî hespa li hêwşa tewla da dikişîne  
sêr bike vê sibengê tu dêhna xwe bidê qehweçî  
qehwê li ber Xaçîkê kafirê Xaçî qaymeqamê kimandanê wî digerîne  
papaxê xwe ji serê xwe dertîne  
serxoş e aqil di serî da tunîne  
li binê tablê dixîne  
qahwê di ser qahweçiyê Îbo Begê da werdigerîne  
go lawo tu here ji Axayê xwe ra bibêje bidikirîne  
Necîbe Xanim qîza wî ye, Eyšan Xanim bûka wî ye  
Fadîme Xanim jina wî ye  
bira ji min û qaymeqamê kimandanê mi ra bîne  
tîne bira bîne gava ku nayni  
ezê seferekî li ser çêbikim  
heyânî dunya ava be kesî ji bîr neke  
kesî di emrê bavê xwe da şixulê wiha nedîne  
vê sibengê malxirabo qahweçî dike fixan dizarîne  
xwe bi tewlexanê ra digihîne  
tu sêr bike vê sibengê ji Îbo Begê ra dibê didikirîne  
Îbo Beg dike wa dilezîne  
vê sibengê ra xwe bi yalî heremê ra digihîne  
tu bala xwe bidê li Necîbe Xanimê kir qêrîne  
go dayka minê bike bilezîne  
qatek çekê rismê ji bavê xwe ra bîne  
vê sibengê van kafira dîn û dujman e  
dewa namûsa me dikîne  
lawo Mala Hacî Qero malekî giran e  
heyânî roja îro kesîretîke weha giran li ber çavê xwe nedîne  
tu sêr bike dema ku çekê rismê ji bavê xwe ra tîne  
Xwedê xira bike çekê rismê bi sûyê xwe da datîne

leganê ji qilif dertîne  
 di ber sapokê da diçikîne  
 xwe bi wî yalê dîwanê ra digihîne  
 nihêrî Xaçîkî serxoş e, qaymeqamê kimandanê wî kesekî hay ji xwe nîne  
 leganê ji ber sapokê dikişîne  
 berî qapaxa serê Xaçîk tê da qapaxa serê wî hiltîne  
 mejiyê vî marusê bi remaqê dîwanê va dimîne  
 koka qaymeqama kimandara li wan tîne  
 yek di nava hespa da dimîne  
 xwe bi Parsîna Jêrîn ra digihîne  
 go kimandanekî li Parsîna Jorîn  
 saldatekî 72 derketiye  
 ji gavê din da koka qaymeqama Xaçîk û kimandana li me tîne  
 vê sibengê Xwedê xira bike kesîretiya şerê ser namûsê tiştêkî bi pera nîne  
 heya dunya xweş ava be li pey Îbo Begê torinê Mala Hacî Qero  
 berxê Mala Dîbo bi Sîbo  
 emê rûnên ji xwe ra vê sibengê  
 bikin axîn û hey waxîne hey waxîne  
 Gidî dema vê gotinê dibê didikirîne  
 van marusa radîbin eskerekî giran hiltînin  
 Îbo Beg ji xwe ra bi dilekî kederê bi mereqê wa bi birîn e  
 dizane îro roja xêrê nîne  
 dema ku vê sibengê malxirabo darê dûrbînê hiltîne  
 di ber çavê xwe da diçikîne  
 li rêya Parsîna Jêrîn mêze dike  
 tîpek siwarê giran li rêya Parsîna Jêrîn dibîne  
 tu sêr bike vê sibengê li Necîbe Xanimê kir qêrîne  
 go dayka bavê xwe yê bike wa bilezîne  
 gule û barûdê, fişek û fişelixê ji bavê xwe ra bîne  
 lawo va îro roja xêrê nîne  
 bavê te gelo bira kesek tu qîsûrê li bedena bavê te nebîne  
 nebêje Îbo Begê berxê Mala Hacî Qero bêîman e bêdîn e  
 lawo dema ku vê sibengê li remaqê jorîn dibîne  
 devê çapiliyê li ser van marusan digerîne  
 koka xulam û xizmetkara, esker û vê sibengê xas saldata li van marusa tîne  
 gule barûdê Îbo Begê xilas bûne



sê fişegê wî dimîne  
 xwe bi yalê heremê ra digihîne  
 tu sêr bike derî bi ser çolix û çocixê xwe da kilît dike  
 zirza qetlê lê dixîne  
 vê sibengê koka çolix û çocixê xwe tîne  
 tu sêr bike Necîbe Xanim bi tenê dimîne  
 Xwedê xira bike derdê cîgerê tiştêkî din nîne  
 go berxê tu pişta xwe bi bavê xwe da bizivirîne  
 dema ku vê sibengê pişta xwe bi bavê xwe da dizivirîne  
 go bavo qetla mi li te helal be  
 namûsa Mala Hacî Qero namûseke giran e  
 tu qîza xwe bikuje bira namûsa te dest û pêya da nemîne  
 dema ku vê sibengê Necîbe Xanim dikuje  
 namûsa wî nav dest û pêya da namîne  
 derdikeve remaqê jorîn  
 ji xwe ra malxirabo bi leganê çend fişegê xwe diteqîne  
 Îbo Beg li wê derê ji xwe ra emrê Xwedê bi cî tîne  
 xwedanekî xêra kir qêrîne  
 go hey wax felek te çima li me wa kir  
 xelkê çolix û çocixê xwe bi destê xwe xilas kir  
 Îbo Begê torinê Mala Hacî Qero, berxê Mala Dîbo di Sîbo  
 tu sêr bike koka çolix û çocixê xwe anî  
 bi destê xwe çolix û çocixê xwe di binê şûr ra derbas kir  
 ax hey wax wax wax hey wax û wax  
 heya dunya xweş ava be Îbo Begê torinê Mala Hacî Qero  
 berxê Mala Dîbo bi Sîbo  
 emê vê sibengê ji xwe ra bikin axîn û hey waxîne hey waxîne. (Güneş-Şahin, 2018:

68-71)

### **GELİYÊ ZÎLAN**

"...Heya dunya xweş ava be gelo vê sibengê emê ji xwe ra bigerin  
 Li Zorava li Mala Hecî Mistefa  
 Ez ji te ra sond bixwim vê sibengê tim û tim cara sax be  
 Li serê çolan û çiya be  
 Heya fermana me li qanûna Tirka da rabe  
 Ez ji te ra sond bixwim vê sibengê  
 Ez dizanim heya sax û silamet bim di nava eşîrê da vê sibengê

Derd û kulê me bi serê Geliyê Zîlan be  
Tu rabe vê sibengê malxirabo  
Min ji te ra nego mala Şêxê Borezan tu cara ji me ra nabe  
De rabe de rabê de rabe...  
Axayê axa de rabe maqûlo de rabe  
Li Bavê Xanimê berxê Mala Etê, torinê Mala Sêrxwûn  
Tu rabe emê berê xwe bidine welatê Serhedê  
Av û rizqê me bira dîsa li nava eşîra Kurda be

Ca sibe ye Xalis Begê bi sê denga bang dikirî go Tajdîno mala te xira be  
Sibe ye vê sibengê malxirabo ezê sekinîm nîva derî  
Min bala xwe berdabû ezê li xwe bikim gelo çek û cilê...  
Geliyê Zîlan ji xwe ra vê sibengê belkî şixul û îdara me here serî  
Wele vê sibengê berê xwe dane Geliyê Zîlan welatê Serhedê  
Mala Hecî Mistefa tu sêr biki li Zorava sekinîm malxirabo gelo vê sibengê  
Li cem vî maqûlî vê sibengê mi newêrî  
Vê sibengê malxirabo kesek Bavê Isê kekê Mala Etê, torinê Mala Etê  
Tu sêr bike berxê Mala Sêrxwûn nas nake  
Xaliso vê sibengê ezê dipirsim Tajdîno lo gelo va peyayê xerîb kî ye  
Bi te ra tê bi ku da ca buhurî  
Go cînarê me ye esker e vê sibengê me îzna wî stendiye  
Emê ji xwe ra çend rojeka herin malê  
Bira vê sibengê bi çolix û çocik ra vê sibengê şixula wî bibî serî lo  
Wey axao wey axao wey axao...  
Bi kavirtî têr neçêriyayo bi berxtî têr nemijiyao  
Li vê sibengê ji siyaseta hukumata Tirkiyê tu sêr bike  
Di dêrîsê gunda da malxirabo ji xwe ra eman û sitara xwe nediyoye  
Tu sêr bike şevêkî di nava cî û nivîn û yataxê xwe da ranezao” (Güneş-Şahin, 2018:

48-49)

### **EZ REBEN IM**

Ez reben im hê hewû reben im ha ha ha hayê  
reben im reben im reben im reben im reben im...  
ezê bi rebena Bavê Salih peyayê bi tenê  
mabû li welatê xerîb bê piştîmêrî keko li kesîriyê da  
Hedo digo Têlo rebenê sibe ye şerekî li me çêbû  
li Çemê Xezaliyê , li ser Pira Batmanê, li Gura Seyîda bi kendal e

dema Bavê Salih ji malê siwar bû bi sonda qesemê sond xwarî  
heya li meydanê neyê kuştinê  
tu cara ji oxirê nazivire venagere malê  
dengê tivinga li ser serê egîtê mala bavê min nemayê nalenal e kalekal e  
gava li Bavê Salih dibû pêşîrtengiya di mêra  
keskî xwedanxêr tunîne ji gavê din da  
cuwabekî bide li Binxetê li ba Bavê Sulhedîn birayê dilşewitî  
bi Tirkî nizanim bi Kurmancî leqeba wî ra dibejin Seyîdxanê Kal e  
bê agirê kulê bikeve Mala Emerê Mihê, lawê Perîxanê  
Eşîra Xiya, giregirê Badika  
derbekî bi dest berdane bedena Bavê Salih peyayê Mala Êsivê Seydo  
sêr bike gelo vê sibengê eşîr nemane malxirabo di eşîra da mêr nemane  
keskî xwedanxêr tune bi orta çapiliyê xwe bigre  
li meydanê ji peyayê mala bavê mi ra bibi balgîf û berpala e  
Ez reben im hê reben im hê hê hê...  
reben im reben im reben im reben im reben im...  
ezê ji bona Bavê Salih peyayê bi tenê  
mabû li welatê xerîb gelo bê piştîmêrî keko li kesîriyê da  
Hedo digo Têlo rebenê sibe ye şerekî li me çêbû  
qalekî li me qewimî li Çemê Xezaliyê,  
li ser Pira Batmanê Gura Seyîda darî ter e  
dema Bavê Salih ji malê siwar bû bi sonda qesemê sond xwarî  
heya li meydanê neyê kuştinê tu car ji oxirê nazivire venagere  
li ser serê egîtê mala bavê mi nemayê qerebalix e  
ji gavê din da yeqîn şer e  
dengê topan û tivinga li ser serê egîtê mala bavê min gulîbirê  
tere tê diziviri vedigire  
vê sibengê peyayê mala bavê min bi dil û cîgerê xwe guven e  
heta neyê kuştinê di kozîka xwe da tevnagere  
keseke xwedanxêr tune cuwabekî ji Binxetê ra behere  
li ba Bavê Sulhedîn birayê dilşewitî  
bi Tirkî nizanim bi Kurmancî leqeba wî ra dibejin Seyîdxanê Kerr e  
bê agirê kulê bikeve mala Emerê Mihê, lawê Perîxanê  
Eşîra Xiya, giregirê Badika  
derbekî bi dest berdane bedena egîtê mala bavê mi gulîbira Xwedê  
keskî xwedanxêr tuni bi orta çapiliya xwe bigire

çend rojeka vê sibengê ji welatê Serhedê  
gidî gelo li hewariya egîtê mala bavê min here  
Ez reben im hê reben im hê hê hê reben im...  
ezê bi rebena egîtê mala bavê xwe gulîbira Xwedê  
li welatê xerîb û xerîbistanê tu sêr bike  
gelo ji xwe ra mabû bê piştêmêrî gelo wa bi tenê. (Güneş-Şahin, 2018: 103-104)

### **DÊRAN –KEJIK**

Erî dêran were dêran dêran... hey wayê  
Gulê dêranê Kejikî wêran bişewite li zinêr e  
wa li zinêr e hey wayê  
ava Corovanî kavil, Delo Elo, Girecîrnê wêran, Hesnavayê  
bi dionzdeh tîşa bi ser da şax vedaye  
îro ji êvar da himî xar e himî nêr e hey wayê  
mi dî sê siwar siwar bûne ji Milazgira tewra jêre  
siwarê pêşîn Esedî Xêlit e  
siwarî selefî siwara Fetula ye  
siwarê li dawiyê dajo çûyîn çûyîna Gêjo ye  
şêl û pêla Têlî Reşkal Riza ye  
sewta wî sewta kewî nêr e hey wayê  
Hemzoyê Hesên bi sê denga bang dikirî  
go Rizakê ez bi qurban tu nizanî Kejik ji berê di paş da  
mexelê pezê meyî nêr e hey wayê  
Riza bi sê denga li Esed û Fetulah kirî gazî  
go em îro ji ber koma Şewêşiya bikişin  
Mistefayê Cindiyê Eshediya bi Hesên Paşayê Eshediyê neyar e  
emê sibê li Milazgira jêrê  
çi bidin cuwab apê xweyî Têlî Reşkali Mistefayî kalemêr e  
gere em irqa Şewêşiya biqelînin  
bûkê serbixêlî ser malê bava da vegeînin  
herkes ji xwe ra bi destê qîzê xwe bigire bide mêr e hey wayê  
dêran dêran dêran...  
dêrana Esed û Fetulah Riza  
hersê siwarê mala bavê xwe bi tenê me hê hî bê hoy hoy  
Lê lê Gulê Fatimê rebenê sibe ye Kejikî wêran bişewite  
îro ji êvar da gelo vê sibengê malxirabo  
serejêr e wa serejêr e hey wayê

îro tu bala xwe bidê ji xwe ra berî li ba ye  
 ava Corovanî kavil, Girecîrnê wêran, Delo Elo  
 bi donzdeh tîşa bi ser da şax vedaye  
 mi dî sê siwar siwar bûne Milazgira jêr e  
 jêliv ténin fenanî ba ye hey wayê  
 siwarê pêşîn Esedî Xêlit e  
 siwarî selefî siwara Fetula ye  
 siwarê li dawiyê dajo çûyîn çûyîna Gêjo ye  
 şêl û pêla Têlî Reşkal Riza ye reben ez im  
 ebakî li nava mila ye  
 biskê ebê çar tiliya bi zêrê ecem ji xwe ra tev kildaye  
 ez ji te ra sond bixwim ji êvar da hicûm anîne koma Şewêşiya ye  
 Hemzoyê Hesên bi sê denga bang dikirî  
 go Rizakê ez bi qurban tu nizanî Kejik ji berê di paş da  
 mexelê pezê bavê bava ye hey wayê  
 Riza bi sê denga bang dikir Esed û Fetula ye  
 go em îro bikişin ji ber koma Şewêşiya ye  
 Mistefayê Cindiyê Eshediya neyar e  
 li Hesên Paşayê neyarê kal û bava ye hey wayê  
 emê sibê li Milazgira jêrê  
 çî bidin cuwab apê xwe yî Têlî Reşkali Mistefa ye  
 gere em erqa şewêşya biqelînin  
 bûkê serbixêlî bi ser malê bava da vegeînin  
 herkes ji xwe ra bi destê qîzê xwe bigire  
 ji kêfê ra bidî mêra ye hey wayê  
 dêran dêran dêran...  
 ji bo her sê egîtê mala bavê xwe rebenê bibim dêran  
 Lê lê Gulê Fatimê rebenê bira li me nehata sura sibê  
 bîna bayê Kejik ji xwe ra bakî dîn e bakî dîn e hey wayê  
 bira li bejna Esed û Fetulah, Riza  
 her sê egîtê mala bavê mi rebena Xwedê nexîne reben ez im  
 mi dî sê siwar siwar bûne li Milazgira tewra jêrîn e  
 tu bala xwe bidê siwarê pêşîn Esedî Xêlit e  
 siwarê selefî siwara Fetula ye  
 siwarê li dawiyê dajo çûyîn çûyîna Gêjo ye  
 şêl û pêla têlî reşkal Riza ye

Gêjo kefê diviskîne, hewadê xwe direşîne  
 tu bala xwe bidê kosteka saeta zêr û zîvin  
 bi ser qaşa zînê xwe da dihejîne hey wayê  
 fenanî sê gurê xwedayî ne  
 tu ba xwe bidê Hemzoyê Hesên  
 bi sê denga li koma Şewêşiya kir qêrîne  
 emê go Riza û Fetula bikujin, Esedî Xêlit dîl bigirin  
 bira ji dayê ra şewata sêlê bîne hey wayê  
 bûka malê serê xwe bilind kir ji xewa şêrîne  
 go metê marûmê eyb e  
 merû dî mala xwe da xeyba mêrê camêr nake  
 egîtê mala bavê mi bi dîl û cîgerê xwe guven in  
 peyayê ji dayê ra şewata sêlê bîne ji wan peya nîne hey wayê  
 metê marûmê peyayê mala bavê mi gulîbirê  
 mêrê tu li meydanê berdî şêra  
 xwe bidî dîhara lê bikî guhdar û sêra  
 tu bala xwe bidê herçî hespê li meydanê têne nava mala  
 ez ji te ra sond bixwim zînê vala, zengû bi xwîn e hey wayê  
 peyayê mala bavê mi gulîbirê  
 xênc ji xulama kuştine peyayê bi nav û nîşan  
 Hesên û Husên, Elî û Mihemed  
 Hemzo zavayê teze dîl girtine  
 daxistin Milazgira tewra di jêrîn e reben ez im  
 dengbêjê sibê bikin kilam û meqam  
 li civatê mîran û hakima rûnên  
 êvara Xwedê da ji xwe ra li hevduvegerînin hey wayê  
 dêran dêran dêran...  
 dêrana Esed û Fetulah, Riza  
 her sê siwarê mala bavê xwe bi tenê me, bê hoy hoy  
 Erî dêran dêran dêran... hey wayê  
 Gulê dêranê sibe ye dilê mi gulîbira Xwedê  
 pira serê heft newala, heft newala hey wayê  
 ezê bi destê her sê egîtê mala bavê xwe bigirim  
 di ser ra derbas kim fenanî sê karî karxezala reben ez im  
 tu bala xwe bidê metê marûmê egîtê mala bavê mi  
 navê xwe qeyd kirin dosyayê hukumetê derbas kirin nav duwala

hela bala xwe bidê vê sibengê  
herçî hespê li meydanê tênê nava mala  
ez ji te ra sond bixwim zengû bi xwîn e, zînê vala hey wayê  
metê marûmê xênc ji xulama kuştine peyayê bi nav û nîşan  
Hesen û Husên, Elî û Mihemed  
Hemzo zavayê teze  
îro ji êvar da hildane berxê ber her çar mala hey wayê  
dêran dêran dêran...  
Hedê digo Gulê rebenê tu rabe  
emê serê xwe kurr kin bi heft gûzan û donzdeh kêra  
çawa cuwabkî nebxêrê hatî dibê li Kejkî wêran  
Mala Emer, Mala Şewêş li hev anîne qira şêran û mêra  
he hû bê ho oy oy. (Güneş-Şahin, 2018: 447-450)